Lêvenerandinên wan rojan tanî radeyekî li ser bingehên remanên Markisîyê de dihatin bihîmkirin, -yên ku ez di xortanîya xwe de bi wan ve hatibûm bikêrkirin-. Herwehajî ligelvêjî de min rastîya mêjûwa Kurd û taybetîyên wêna nedabûn bijibîrkirin. Min di tevaya dirêjbûna jîna xwe de serxwebûna xweyî remanî dayite biparastin. Di derkevtina dijbûnan de ligel rêzana min de min baştir nîşanên rastiyê li ser gotinên Êdyolocîyan de didan bigirtin. Di nava serê min de ji Markisîya xortbûna min tiştek bigir nema ji bil nîvişkekî pêve tête biditin, yê ku ew ji kilandina serpêhatîyên salan hatîye biserkevtin û yê ku ew ji bona Nemûyên Bilindî Sincî û Civakî bi nêzîkî ve tête bidîtin, Dibe, ku Merov jê bête binêzîkkirin, belam Merov pê ve nikare bête bigihaştin[1].

---

[1]Li ser felsefa Markisî û di encamê remana Ismet de di vî warê hanê de ez û ew pir nêzîk û him jî dûrî hev jî têtin bidîtin. felsefa Xortanîya Ismet û Pevika dawîkirina wîna dûr yanji nêzîk tevaya felsefa Xortên piranîya Asya, Efrîka û Emerîka Latînî ji me re di paş dawîkirina cenga Cîhanî Yekem de ji bona Vejandina Miletên xwe û tarwarkirina sedsalên Navî di nava Welat û Civakên xwe de dide biderxitin. Magelo her Yek ji me dûr yanjî nêzîk bi vê Felsefê nehatîye bikêrkirin û wê di Zanebûn û Jîna wan de mîna zanistîyekê ma nedaye bikêrkirin?

Ez ji dil û can diwxwazim carekê bi dûr û dirêjî ve di vî warî hanê de û kêra wêna de li ser remana Vejandina milî û civakîyî Kurd de di Kurdistanê de bidim binivîsandin. Bes û bi tenha ve ez dixwazim ji bona Xwendevanan li vê derê de bi givaştî û hêjîbêtir bi gahaştî ve kêra vê Felsefê ji bona me bi beramberkirina wêna bi

Magelo divê bi destpêkirina dawîkirina bîr û bawerî û "Bibîrxisintan" ve bête bikirin, mîna ku hinek ji min didin bixwestin?

---

dema Vejandina rojava de bidim biderxistin. Vejandina tevaya rojava, ya ku jê re Sûreşa Borcuwazîyî Pêşî tête bigotin û ya ku ew di bingehê xwe de li ser Oldarîyê û jê rexnegirtin li ser tevaya Avanîya Civakê û Dewletê de tête bidîtin, di Koça Yekem de di nava sedsalên Navîn de hate bidîtin. Ev Şureşên Vejandinên hanê nehatin biserkevtin. Lêbelê wan Zalbûna Papê Roma ji nava Welatê xwe dane bihilanîn. Wan Filetî bi Elmanî, Firensî, Ingilîzî, Holendî... hd. dane bikirin. Wan mîna ku Farisan di rêya Şiîtîyê de furskirina musulmantîyê dane bikirin. Ku bi rast-û durust ve careke din ji nûve Oldarî bi karê xweyî Mîlîyî kokî ve hate birabûn: ku ew bi situna bingehê Dewletê û Serdarîyê di rêya Destûr, Qanûn û Yasan de di pêwendiyên Merov ligel Merov de û Pêwendîyên Merov ligel Dewletê de û ji bona parastina van Destûr, Qanûn û Yasan de du hêz hatin bipeydakirin: Yek jê Hêza Çekdarî û ya din Çavdêrîya Xwedê ji bona Sizadana Merov li Dunya din de û nardina wîna ji bona Buhuşt û Dujehê hatin bidîtin.

Di Koça Vejandina rojavayî Duwem de hemû bi carekê ve li ser felsefa Kilasîkîyî Yunanî hate bihîmkirin û wê di encamê dawî de tevaya Gemara sedsalê Navînî di rojava de ji reh û rîşan de date birakirin û malandin û Oldarî ji Dewletê dane parvekirin û ew ji bona Berejwedîya Dewlet û Serdarîyê dane bikaranîn.

Me Kurdan jî xwest bi saya vê felsefa Markisî û bes û bi tenha ve di rêya Şiyarbûna milî de û bi rengekî Demokrasî ve Gemara sedsalên Navînî ji Buhuşta Avsana Ereb di nava Civaka xwe de, ya ku wê ji demeke tarîyî pir dirêj de tevaya Mejîyê me, hebûna me bi Gemara xwe ve dayite bipoşandin, bidin bitarûmarkirin.

Ez li vê felsefa hanê de nenala remaneke Rastîyî bi serê xwe ve didim bitemaşekirin. Bes û bi tenha ve ez lê nala remanekê di bûna veguhertîna xwe de û ji bona demeke nîşankîrî û karê jorîyî nîşankirî lê didim bitemaşekirin; jiber vê jî di dema Şureşa Oktober de di sala 1917 de Pilîxanov û Karl Kawtiskî xwe ji Lenin dane bidûrkirin: jiber vê di dawîya dawî de Rêstika Sosyalistîyê jî hate birûxandin.

Ew jî mîna hemû remanên Merovan di Eyîndên wan de, di Destûr, Qanûn û Yasayên wan de ji bona Veguhertin, Çengbûn û Şûreşkirina civakîyî Merovanîyê di Demeke nîşankirî de hatîye bidîtin.

Bê van reman û Nigaşan wisa pêşvekevtina Merovanîyê nehatîye bidîtîn ew jî nayête dîtin. Dadgerîya giştîyî civakî dê di nava serên Merovan de hergav û dem bête bidîtin, tanî ku Merov li ser rûwê vê Zemînê de bêtin bidîtin. magelo em hemû Merov li ser rûwê vê Zemîna hanê de di her av û demê de ne Zarokên Xewin û Nigaşên xwe têtin bidîtin? Hêjîbêtir pêşkevtina Merovan van xewin û nigaşên hanê bi neçarî ve didin bidurustkirin. Cuma.

Yanjî divê ku ez wan bidim binivîsandin, yên ku ew di nava serê min de ji salan de ji nivîstan li ser şehristanîya Kurdistanê de û bi taybetî ve mêjûwa wêyî kevnar û navînî bi rengekî giştî ve û li ser ronahîya serpêhatî û li ser bingehê nuhî belavkirinan de hatine bitirşkirin? Ev jî bi xwe jî ve ji bal hinekan de ji min tête bixwestin. Vê pirsa hanê jî bi xwe jî ve ez ji mêj de li ser xwe de didim bikirin û bi taybetî ve ji wê dema ku min karê xweyî advokatîyê li Siwêsra de di sala 1990 de dayite bidawîkirin. Hêjî bi bersiva vê pirsê ve ez nehatime bigihaştin. Hêjî ez li ser wan berên berê de di karê welatî, lênerîna remanî û lêgerandina mêjûyî de di yek demê de têtim biçûyîn. Hêvîya min di van karan de tête bidîtin, kù ez dê kulîlkên din ji bona Zaroyên Kurd û Kurdistanê bikaribim bidim bipêşkeşkirin.

**Diyarîyeke hêja Mohamed Salih Cuma ji bona Xwendevanên kurmancî dide bipêşkeşkirin.**

Ji gava Parvekirina Kurdistana Osmanî ji bal Impiryalîya Ewropî de li paş cenga Cîhanîyî Yekem de û li paş Peymana Lozan de di sala 1923 de di navbera Komara Turkî û Dewletên Iraq û Surî de û bê beşkirina wêna ji Mafeyê wêyî Azadîya milî û Zanyarîyê de û kevtina wêna ji bona jêrî nîrê zordarîya Mîlî de kurmancîya -jorîn-, ya ku pê piranîya pir ji Zaroyên Gelê Kurd -du li ser sêsyan de yaxud 65% de- têtin biaxivtin, mîna zimanekî zordarlêkirî hate bidîtin. Ew ji nivîsandinê û ji karînkirina pêşkevtinê û geşbûnê hate bibêpişkkirin, di dema ku ew di berê de zimanê wêjeyî bû û Hozanên Gewreyên Mezinên Xweşxwevan û Feylesufên Kurdîyî Kilasîkîyî kevnar mîna Melê Cezîrî, Ehmedê Xanî û Feqê Teyran pê didan binivîsandin.

Ji xweşbextîyê û jiber hin hoyên mêjûyî û Dewletî, ku li vêderê de pêwistîya axvitinê li ser wan de nayête bidîtin, tanî radeyekî ji bona zaravayê soranî -kurmancîya jêrîn- hin karînên çapkirinan, belavkirinan û fêrbûnan li Kurdistana Iraqê de -û tanî radeyekî kêmtir jî jê re li Kurdistana Îranê de jî- hatin bipeydakirin. Vêna date bihiştin, ku vejandineke wêjeyî û remanîyî baş ji bona zaravayê kurmancîyî jêrîn -zaravayê soranî- bête bidîtin, ya ku ew bi zimanê nivîsandinê ve

û bi tîpên Erebî ve di heremên Jêrî de tevî zordarîya milî jî hate bikirin. Peyvdarên kurmancîya jorîn di heremên jorî de ji Kurdistana Iraqê -heremên Behdînan û Şingarê- û ji Kurdistana Îranê de -beşê jorî ji devera Ezirbêcana rojava de- dikarîbûn tanî radeyekî xwe ji wê bê pişk û parvekirinê ji xwendina zaravayên xwe bidin birizgarkirin, tevî ku xwendina zimanê wan ji bona wan bi mafeyekî serûştî ve tête bidîtin, wan xwe ji wan bê pişk û parvekirina di rêya agehdarîyên xwe de li ser belavokên li ser Kurdistanê de bi soranî, yanjî Erebî ve, yaxud bi Farisî û carcaran jî hinan ji wan bi zimanên Bêgane ve mîna Ingilîzî, Firensî, Elmanî yanjî Rusî didan birizgarîkirin. Ev karînên hanê jî tanî radeyekî ji bona Kurdên Surî jî dihatin bidîtin. -Bi serdejî ve ew di vejandina wêjeyî de hatin bibeşdarîkirin, ya ku kurmancîya -jorîn- di nava wan de ji destpêka salên sîyan de û tanî dawîya cenga Cîhanî Duwem de bi saya jêhatiyên jimarekê ji Zanevanên Gewreyên Kurdan ve, yên ku ew ji Kurdistana Turkî ji bona Surîyê li paş kevtina şûreşa Şêx Seid de hatin bibarkirin, di pêşîya wan de Mîr Celadet Berdirxan û Birayê wî Dr. Kamiran Bedirxan hate bikirin.

Belam Kurdên Turkîyê, -yên ku ew bêtir ji nîvê tevaya Zarwên Gelê Kurd -nêzîka 15-16 milyonan ji 28-30 milyonan- didin bipêkanîn. Ew ji alîyê ziman de di zînetekê bedtir de ji mayîna Zarwên Miletê xwe têtin bidîtin. Nêzîka çend milyonan ji wan zanebûna zimanê Bav û Bavpîrên xwe dane biwindakirin, -bêyî ku ew hestbûna xweyî Kurdîyî milî bidin biwindakirin. Ev jî jiber siyaseta zordarîyê, lipaşkevtina aburîyî bi zanebûn ve di Kurdistanê de û barkirina ji bona bajarên Turkîyî Gewre hate bidîtin. Hêjîbêtir li ser wan de xwendina bes û bi tenha ve bi zimanî Turkî û tîpên Latînî ve hate bidanîn. Xwendina Kurdî hate biqedexekirin. Na hêjîbêtir ew ji nivistên bêgane li ser Kurd û Kurdistanê de hatin bibêpişk û bibêparkirin. Gerjî hinekan ji wan ji xwe re jî hin ji wan nivîstan bidana bipeydakirin, wan ew nikarîbûn ji xwe re bidana bixwendin; jiber ku ew bi zaravayê soranî ve, yanjî bi zimanê Erebî ve, Farisî ve yanjî bi zimanên rojavayî ve hatibûn ninivîsandin. Kêm ji Zenevanên wan jî bi van zimanan ve dikarîbûn bidana bixwendin. Hêjîbêtir wan bigir bi carekê ve tîpên Erebî ji bil Peyên wanî oldaryê ve nikarîbûn ji xwe re bidana bixwendin.

Di salên şêstî û heftêyî de hin ji Zanevanên Kurdên Şiyar li

Turkyê de bi belavkirina hin ji nivîstên Turkî û carcaran jî Kurdî ve li ser mêjûwa Miletê xwe û zimanê wî de pê hatin birabûn. Yanjî wan hin ji nivîstên kevnar -Mîna Nivîsta Olya Çelebî- careke din dane biçapkirin. Belam pir caran ev çapemenîyên hanê ji bal Polîsan de dihatin bisitendin û Belavanên wan ji bona ber dadgehan didane bianîn. Ev karînên hanê li paş wergirtina Supah de ji bona desthilatîya Serdarîyê di sala 1980 de û lêdana wîna ji bona Desteyên Demokrasî û Kurdî bi dawî ve hatin bikirin.

Di meha cotana sala 1991 de Serdarîya Turkî di encamê xebata Gelê Kurd de û di bin givaştina bîr û bawerîya cîhanî de hate bineçarîkirin, ku ew wê givaştina girêdayî li ser bikaranîna zimanê Kurdî de di warê rojnametîyê û belavbûnê de di berê taybetî de ,-bêyî berê Serdarîyê û berê hênbûnê de û di bin tirsandina bikaranîna qanûnên tawankarîyan de, yên ku ew bi "Yekitîya Netewê Turkî"ve têtin bigirêdan-,bide bisivikkirin.

Ev karê hanê di dîwarê zordarîya milî de nala kunekê hate bidîtin û jê tevgereke zanyariyî baş û pir fireh hate bidestpêkirin, ku mîla wêna di pêkanîna xanîyên pirî belavkirinê de him bi zimanê Kurdî û him jî bi zimanê Turkî ve hate bidîtin. Herwehajî ew bi derkevtina rojnametîyeke siyasî û wêjeyî bi zimanê Kurdî -mîna Kovara Hefteyî Welat, Kovara Mehane Rewşen- yanjî bi zimanê Turkî ve, yên ku ew li ser pirsên Kurdî û demokrasîyê de dihatin bigirêdan, mîna herdu rojnameyên Özgür Güdem û Yeni Ülke û Kovara Özgür Halk hatin bidîtin. Ev hemû xanîyên hanê bi nuhtirîn mekînên çapkirinê hatibûn bikarxistin û wan cihekî bilind di nava bîr û bawerîya Kurdî û Turkî de didan bihiştin. Vî karî date bihiştin, ku -Navînîya Mêzopotamya Bilind-MKM- ji bona zanyarîyê û lêgerandinan li Istenbolê de bête bipêkanîn. -Navê Mêzopotamya Bilind bi nîşana navê Kurdistanê ve têtê bidîtin-. Herwehajî Enstituya-Instityuta Kurdî li Istenbolê de jî hate bidamezirandin. -Ezê dê ji bona ser vê danavê hanê di nivîsteke din de di bin nav û nîşana "Kocên Rêya Jînê de... bêtim bivegerandin-.

Li ser kêra helbijartinên perlemanî, yên ku ew li Turkîyê de di çirya pêşî sala 1991 de hatin bikirin, Partîya HEP ya Destûrkirî 22 cih di Civatê de ji xwe re date biwergirtin. Ew bi Wênerên xwe ve ji bona Perlemanê hate bikevtin, -yên ku Piranîya wan jî ji milîvanên Kurd

dihatin bidîtin-. Piranîya Civata vê Parlemanê Süleyman Demirel ji bona Serekê Serdarîyê date bivegerandin. Mêrza Demirel di peyva xwe de di Diyarberê de di meha berfbara sala 1991 de date bigotin: "Ku Turkî bi Hebûna Gelê Kurd ve li Turkîyê de hatîye birûniştin". Pir Kes bi vê peyva hanê ve bi çarekirina pirsa Kurdî ve bi şêweyekî aşîtîyî baş ve hatin bihêvîdarkirin.

Beramber bi van pêşketinên hanê ve min di mêjûwa 12. 5. 1992 de Nameyeke ligelhevîyî dirêj de -bi zimanê Firensî ve bi deh pelan ve- ji bona Serokê Komarê Mîrza Turgul Ozal û ji bona Serokwezîr Süleman Demirel date binardin. Min ew bi navê Serokê - Komela Mafyarên Kurd- ve date bimorkirin. Min têde date bixuyanîkirin, ku ew pêrabûnên hanê bi başbûn ve dê bidin bimujdekirin, belam ew hêjî nayên bitêrkirin.

Min di warê çarekirina pirsa Kurd de li ser bingehên gavên tên pêşneyar ji wan re dane bipêşkeşkirin[1]:

---

[1]Jiber giringbûn û liberkevtina kêra vê Namaya hanê ji bona Keç û Kurên Kurdistanê di ayinda Xebata Mîlî de ez dê wê. di tevaya dirêjbûna wê de ji Wergerandina wênayî Elemanî bidim biwergerandin. Min di jîna xwe de pir Belge û Name li ser Çarekirina ayinda Pirsa Kurd de ji xwe re dane bixwendin. Belam ez li vêderê de dixwazim ji Xwendevanên xweyî Giramî re bidim bigotin: Min hêjî weha Nameyeke qul, kur, bi kêr, vekirî û rep û rast ve ji bona Dost û Dujmin li ser ayinda Çarekirina Pirsa Kurd nedaye bidîtin. Kêr û Giringbûna wêna ji bona Kurdan û herwehajî ji bona Ereban bi giştî ve û bi taybetî ve ji bona Erebên Iraq û himjî ji bona Erebên Surî têtin bidîtin. Heger ku Erebên van herdu Welatan li ber girngbûn û pêwistiya Çarekirina Kurd de bi rengekî Demokrasî ve û li ser Berjewendîya Netewê Kurd û Netewê Ereb de neyêtin liberkevtin, dê ew nebes tenê ji Nefta Kurdisatanê herwehajî ew ji Ava wêna jî bi saya Hêza Supahîyî Turkî ve bêtin bibêpşkûparkirin û dê sînorê Dewleta Turkîyî-Kurdistanîyî Fêderalîyî Ayindeyî bide bifirehkirin û Neqşa Kurdistana di jêr Desthilatîya Osmanî de ji nuhve bidin bivegerandin û Destana xweyî sala 1515 bedtir bidin bivegerandin. Ismet Şerif ev deqa hanê bi eşkere ve di vê nameya xwe de him ji bona Turkan û himjî ji bona Ereban dayite bidiyarkirin. Em Kurd çilo Dostanîya Miletê Turk ji xwe re didin bixwestin, wehajî û pêrejî em ji bona Berjewendîya Netewê Kurd Dostanîya Miletê Ereb jî ji xwe re didin bidaxwazkirin û em bi dilsozî ji bona Dostanîya Miletê Faris, Turk û Ereb li ser bingehê Berjewendîya Kuristanê de di pêkanîna Dewleteke milîyî Serbixwe ve bidin bixebatkirin. Ez hêvîdarim, ku ev Miletên hanê di rastîya bejewendîyên xwe de di pêwistiya dostanîya xwe de ligel Netewê Kurd de dê bêtin biliberkevtin, da ku ew ji Serpêhatîyên Sedam ji xwe re hînbûnê bidin biwergirtin, da ku ew Destanên me û xwe bidin bikêmkirin. Cuma.

1. Divê hemû dadkirinên jirêderketî û qanûn ji nişkêve di Kurdistanê de bêtin bihilanîn.
2. Divê destûr bête biveguhertin û bi Hebûna milîyî Kurdî ve di Turkîyê de mîna Neteweyekî bi serêxwe ve, ku ew di Kurdistanê di nava mêjûyê de hatîyepê bipeydakirin, pê bête birûniştin.
3. Divê Turkî ji bona Dewleteke Fêderalîyî Demokrasî pêkhatî ji du Komaran Yek jê Komara Kurd û yadin jî Komara Turkî bête biveguhertin.
4. Divê bi zimanê Kurdî nala zimanekî Mîrî ve li tenişta zimanê Turkî de di hemû dam û destgehên Dewleta Fêdaralî de pê bête birûniştin.
5. Divê fêrbûna bi cêwîtî ve bi zimanê Turkî û Kurdî ve ji bona bercewendîya Kêmanîyên milîyî Turkî, yên ku ew li Kurdistanê de têtin bijîyandin, û herwehajî ji bona berjewendîya Kêmanîyên Kurdî, yên ku ew di nava Turkîya Turkan de didin bijîyandin, bête bidîtin.
6. Divê gift û go ligel Partîya PKK bête bikirin, ya ku ew Rêberîya Şûreşê li Kuristanê de dide bikirin.
7. Divê destûr ji bona hemû Partiyên Kurdistanî bête bidan, da ku ew bi jêhatîbûnên xweyî demokrasî ve li Kurdistana Turkî de û li ser bingehê pirbûna partîyan de bikaribin pê bêtin birabûn.

Rojnama Özgür Gündem ev Nameya hanê bi wergerandina wêyî Turkî ve di bin nav û nîşyna: "Pirsiyarîyan û Çarekirinan" de date bibelavkirin[1]. -Ev jî piştgirtina pêşneyarên wêna ji bal desteyên Zanevanên Kurdîyî Welatperwer dide biderxistin. Herwehajî ev Nameya hanê jî ji bal hin kovarên Turkî jî de hate bibelavkirin û wan jî piştgirtina xwe jê re mîna rojnama jorî dane biderxistin.

Belam Serdarîya Turkî di destpêka sala 1991 qanûnek bi navê

[1]Wê ew di du xelekan di Jimarên 13 û 14 tîrmeha sala 1991 de dane bibelavkirin. Ismet Şerîf Wanlî

"Qanûna Şerkirina Çetetîyê" ve date biderkirin. Li ser bingehê vê qanûnê de wê siyaseta kuştinê, xwînrijandinê û çetîtîya Dewletê di devêrên Kurdistanê de dijî Tudeyên reben date bigûrkirin. Wê her çarekirineke siyasî ji bona pirsiyarîya Kurdî yanjî her peyivandinek ligel Partiya PKK de date binayînkirin. Hêjîbêtir wê dest bi şerkirina dijî Partîya HEP ve date bikirin û wê parastîya parlemanîyî li ser Wênerên wê de xwest bide bihilanîn, da ku ew wan ji bona ber dadgehan bidin birakişandin. dam û destgehên Dewletêyî veşartî di dirêjbûna sala 1992 û tanî niha de bi kuştina Rojnamevan û Zanevanên Kurd ve bi sedan ve hatin birabûn. Di nava van Kuştîvanên Nivîsvanan de Musa Enter, Husên Deniz, Yehya Orhan, Hafiz Akdemir, Gengiz Altun û Kemal Kiliç têtin bidîtin. Herwehajî jimarên ji giringtirîn rojnamên Kurdî yanjî ji yên pişgirtîyên dozên Kurdan di dema belavbûna wan de di deverên Kurdistanê de dest li ser wan de dihatin bidanîn. Rojnamên Yeni Ülke û Özgür bi girtina xwe ve hatin bineçarîkirin.

Beramberî vê zîneta bi tirs ve Perlemana Ewropî bi wergirtina biryarekê ve di mêjûwa 16. 9. 1992 de hate birabûn, ku ew têde tûrebûna xwe beramber bi pêlênkirina Mafeyên Merov ve û Kuştina bi sedan ve ji Zanevan û rojnamevanên Kurd ve "bi şêweyekî dijî qanûnê ve" date biderbirîn. Hêjîbêtir Parlemana Ewropî ji bona çarekirina pirsiyarîya welatîyî Kurd doza girtina Kongireyekî di nava Tara Rêxistina C. S. C. E. E. Ewropî de -Kongirê ji bona Ewletîyê û Alîkarîyê di Ewropa de- date bikirin[1].

Nivîsvanê van dêran bi navê "Komela Mafyarên Kurd" ve tûrebûna xwe li ser vê siyaseta tawankar de bi nameyekê ve di mêjûwa 18. 8. 1992 de ji bona Serok Özal û Serekwezîr Demirel date binardin û wî ji wan bi girtina wan Mêrkujan û dadkirina wan ve ligora qanûnê

[1]Ev Rêxistina CSCE hanê hemû Dewletên Ewropî û di nava wan de jî Dewletên Sosyalistîyî berê jî û herwehajî Dewleta Turkî; (jiber ku ew nala Dewleteke Ewropî têtе bidîtin), di nava xwe de dide biwergirtin. Van hemû Dewletan li gora Peymana Hêlsinkîyî girêdayî de di Civîna sala 1975 de li ser xwe de Rêzlêgirtina Mafeyên Merov û Mafeyên Kêmanîyên milîyên di nava Xakê xwe de û herwehajî Rêzlêgirtina Mafeyê Çarenûsa Netewan dane bigirêdan. Ismet Şerîf Wanlî

de date bidaxwazîkirin. Ev Nameya hanê bi wergerandina zimanê Turkî ve di rojnama Özgun Gündem de hate bibelavkirin[1]. Mexabin, ku ev rojnama xebatvan, ya ku wê bi serkevtinên xwe ve cerg û hinavên desteyên regezperestên Turkan date bilerizandin, bi rawestandina derkevtina xwe ve di navînîya berfbara sala 19993 hate neçarîkirin; jiber pir ji Nivîsvanên wêna hatin bikuştin û herwehajî di Kurdistanê de dest li ser jimarên wêna de dihatin bidanîn, tevî ku ew li Ewropa de bi azadî ve dihate bifiroştin. Lêbelê ew careke din di bin zînetên dijwar de tête biderkevtin.

Di nîvê meha avdara sala 1993 de Eb-Dulah Ocelan Sikretêrê Partîya PKK û Şerokê Berê ERNK ji bona rawestandina şer di Kurdistana jêrîn de û amedebûna Partîyê ji bona destpêkirina gift û goyan ligel Serdarîya Turkî de ji bona çarekirineke aşîtîyî demokrasî ji bona pirsiyarîya Kurd di nava sînorên Dewleta Turkî de date bidazanîn. Lêbelê Serdarîya Enqera ev pêşkeşîya hanê date bivegarandin û ew li ser siyaseta xweyî mêrkujîyê û tirsandnê de di Kurdistanê de hate biçûyîn. Partîya PKK careke din ji bona xebata çekdarî di meha axlêvê de hate bineçarîkirin.

Di sala 1993 de peymanek di navbera PKK û PSKT de ji bona alîkarîyê di nava wan de hate bigirêdan, da ku ew bi hev re ji bona çarekirineke demokrasî ji bona pirsiyarîya Kurd li Turkîyê de bêtin bigihaştin.

Êdyolocîya Kemalîyî regezperestî, ya ku ew hêjî xwe di nava bingehên Dewleta Turkî de û bi taybetî ve di nava desteyên wêyî Supahî de didin bihêlînkirin, nikarîbû xweyîtîya Mîlî û bîranîna gelêrîyî Kurdî bide binabûdkirin. Hemû pêrabûnên Dewleta Turkîyî mêrgujîyê û ragiyandinê di nava dirêjbûna hevtdeha sal de ji bona nabûdkirina ziman û zanyarîya Kurd û ji bona şikenandina vîna vî Miletî di rizgarkirinê de hatin bikevtin. Kevtineke bê veger û bi dawî ve tête bidîtin; jiber ku hemû veguhertinên cîhanîyî dawî, gurbûna hesta milî û vîna rizgarkirina welatî li nik hemû çînîyên Kurd de ji yên

---

[1]Vê rojnama Özgun Gündem ev nameya hanê bi carekê ve Ducarî di Jimarên xweyî 7 û 16 keçîrnika sala 1992 de date bibelavkirin. Ismet Şerîf Wanlî

Gelêrî û Borcuwazî çi li Kurdistanê de yanjî li nik Barkirvanên Kurdan de, yên ku ew bi milyonan ve di nava bajarên Turkan de didin bijîyandin, vê rastîyê didin biderxistin. Çi kelem bin, yên ku Desthilatîyên Serdar di rêya Miletê Kurd de didin bidanîn, bêgûman geşbnûa zanyarîya welatîyî Kurdiyî armanckirî ji bona serfirazîyê û pêşvekevtinê, ya ku em wê niha li Turkîyê de didin bidîtin, nema ber bi paşkevtinê ve tête bivegerandin û dê ew her û her ber bi jorbûnê ve bête biberzkirin.

Belam Kurdên Turkîyê hêjî bi giştî ve pêwistîyên serçavîyan û belgeyan têtin biderkevtin, yên ku ew li ser şehristanîya milî û mêjûwa welatê wan de têtin bidîtin. Ew tîyê wergirtina bêtir ji van serçavîyan û belgeyan têtin bidîtin; jibervêjî ev herdu rêzên çapemanîyên hanê, yên ku Mamosta Mohamed Salih Cuma dixwaze wan bide bibelavkirin, di dema xwe de têtin bidîtin. Dê ew pir bi kar ve ji bona tevaya xwendevanên kurmancî û bi taybetî ve ji bona xwendevanên kurmancî li Kurdistana Turkî de bêtin bidîtin.

Herwehaji ez pê bawerim, ku dê ji bona van herdu rêzên hanê bext ji bona dewlemendkirina kurmancî nala zimanê nivîsandinê bête bidîtin; jiber Belavvan di ziman û rêzimana Kurdî de karîvan têtê bidîtin. Ev jî gûman lê nayête bikirin; jiber ku ew ji Zayînvanên Kurdistana Surî têtê bidîtin, ya ku têde vejandina wêjeya kurmancîyî nuh hate bidestpêkirin, mîna ku min ew li jor de date binîşandan. Herwehajî ew ji Derkevtvanên Zanistgehên Elmanî têtê bidîtin û ew di Zanistgehên wê de bi Mamosta ve têtê bidîtin. Pir sipas û şabaşî li ser van rêzên hanê de ez jê re didim bipêşkeşkirin; jiber ku wî ew bi başî ve dane bihelbijartin û wî xwe di nava salên dirêj de di wergerandin, nivîsandin û derkirina wan de dayite biwestandin.

Ez ji xwe didim bipirskirin, çima bi kurmancî û tipên wêyî Latînî ve navên bi dehan ve ji Mêjûvan û Feylesufên Ewropî nayên binivîsandin, mîna ku Xwendevan wan di van pelên hanê de ji xwe re didebidîtin, yên ku min ew bi Erebî ve dane binivîsandin û ligel jî de bi tîpên Latînî ve mîna ku di ew koka xwe de li Ewropa de têtin binivîsandin. Ez ji xwe dipirsim, çima ev navên hanê têtin "bivegurandin? Ji bona nimûne navê Mêjûvan Thucdid "Tûsîdîd" -bi sê niçikên xwe ve- têtê bikirin, yajî navê Marx bi "Markis" ve, navê Kizînofon-Xenophon bi "Kzênofon -yan jî bi Kizênofon ve, Descart bi

"Dêkart" ve û Wright bi Rayt ve tête bikirin. Weha li wan navan de tête bikirin, ku Kes nizane bê ka ew kî bûn. Gazin ji Dr. Cima jî nayête bikirin, jiber ku ew jî li ser wê rêya nihayî naskirî de tête biçûyîn, ango ew li ser wê rêyê dire, ya ku Kurdên Turkîyê ew bi koranî ve ji Turkan ji xwe re dane biwergirtin. Ev reweşta Turkîyî Kemalî di "Vegurandina" navên bêgane de bes û bi tenha ve kêmbûna zenebûna wan, payebûna wan bi xwe ve, nezanîya wan bi zimanên bêgane ve û nezanîya wan ligerandina zanistîyê û şêweyê nivîsandinê ve -ji bil jimarek pir kêm de ji wan- dide biderxitin. Bi başi ve tête bidîtin, ku navên bêgane mîna di koka xwe de bi tîpên Latînî ve bêtin binivîsandin û ligel niyazmendîyê de jî peyivandina wîyî bi kurmancîya Latînî ve di navbera du kevanan de bête binivîsandin[1].

---

[1]Ev pêşneyara Ismet û rexnegirtina wî cihê sipasê ye û divê ligora karinê guh pê bête bidan. ji alîyê din de ez dixwazim ji Xwendevanên Giramî re hin dijwarîyên vê pêşneyarê bidim biderxistin: Çima Ismet bi tenha ve niha li ser navên Latînî de tête birawestandin? Magelo di vê dunya me de bes ew bi tenê ve têtin bidîtin?

1. Niha ez nikarin bi tîpên Kurdîyî Latînî ve nebes navê Ismet û herwehajî navê xwe jî bidim binivîsandin; Jiber ne tîpên wan û nejî dengên wan di zimanê me de têtin biditin. Weha di pir zimanan de ev rastîya hanê tête biditin.

2. Ji bona nimûne ma çawa divê em navê Marx-Markis-Marks bidin binivîsandin? Bi vi rengê koka xwe ve kes ji Kurdan nikare wî navî bidebi xwendin, Her jî ew wî bide bixwendin, dê ew wî bi Marx ve bide bixwendin; ji X-ÊKsa Elmanî bi X-Xêya me ve tête binîşandan. Ev tîpaya di nava tîpên me de tête bidîtin, belam peyvîna wêna tête bicudakirin. Ev pir di nava zimanan de tête bidîtin.

3. Gava ku ez yanjî Yekekî din ji zimanekî bêgane wan navan li gora wî zimanê bêgane de dide bidîtin, yê Ku ew bi Peyvîna wî zimanî ve hatîye binivîsandin. magelo ez yanjî Yekekî din dê Insiklopêdiya Şêweyê nivîsandina wanî Kokî ji kuderê dê ji xwe re bide bipeydakirin, ya jî çend dem ji bona nivîsandina wan navan bi Şêweyê koka wan ve divê bêtebi windakirin. Bi kurtî ve divê hemû kar bête birawestandin, tanî ku ew nav di şêweyê koka xwe de bête binivîsandin.

4. Hêjî bêtir pir caran tête bidîtin, ku tîpên di nava wan navan de di Mekînên yanjî Bernamên Kompiyuteran de ji bona Nimûne Tipên Elmanîyî Ü Ö Ä nayêtin bidîtin.

Mebesta min di vê de, ku ez dixwazim bêjim, nekêm û nejî bêtir bi başî tête bidîtin,

Lêbelê tîpên Latînîyî Kurdî bi xwe jî ve pewistî bi veguhertineke -sivik- ve tête bidîtin, da ku ew bi bê dujwarî ve li ser hemû mekînên -Bernamên-Cuma- kompiyuter û tîptilîyan de li welatên cudan de -û nebes tenê li Turkîyê de- bikaribin bêtin bikaranîn. Di van veçakkirinên pêwist de divê nîşana ^ hanê bête bihilanîn, ya ku em bigir wê li ser sêyekê ji gotinan de didim bidîtin. Belê em dikarin tîpa -û- bi tîpên "ou" Firensî ve, tîpa (ê) bi tîpên "ee" û tîpa (î) bi tîpa "ie" ve bi bê dunîçikan ve, -jiber ku jî vegerandina bi kirêtî jî ve têtin biderkevtin-, bêdin biveguhertin. Herwehajî -Tîpa Şîn- bi tipên "sh" û -ç- bi tîpên "ch" ve mîna di Ingilîzî de de em dikarin pir bi hêsanê ve bidin biveguhertin, yên ku ew li ser mekînên tîptilîyan -û bernameyên kopiyuteran -Cuma- de nayêtin bidîtin[1]. Magelo Ereban bi xwe ve jî dest ji u, e û i di nivîsandina zimanê xwe de ji bona hêsankirinê û pêşvexistinê nedan biberdan?

Çakkirineke din jî di dîtina min de di nivîsandina Kurdîyî Latînî de divê bête bikirin. Piranîya Nivîsvanên Kurmançî tîpa (i) û hin caran jî tîpa (î) bi bê pêwistî û şaşbûn ve di navbera du tîpên

---

heger bête kirin, li tenişta nivîsandina peyivandina kurmancîyî nav de ew di şêweyê koka xwe de jî bête binivîsandin. Cuma

[1]Di vî warê nivîsandina Kudî de ev bi bîr û bawerîya Ismet ne pes tenê pir bi giringî ve herwehajî pir bi pêwistî ve tête dîtin. Her Yekekî, ku ew di vî warê hanê dide binivîsandin, ew pir dujwarî û kelemên bêjimar li ber xwe de dide bidîtin. Cara pêşîn Tewfîq Wehbî li ser van tîpan bi dûr û dirêjî ve ji bona bi yekkirina tîpên Latînî ji bona zaravayê kurmancî û soranî ve dayite binivîsandin û piranîya van pêşneyarên Ismet wî li wêderê de dane bipêşkeşkirin. Ev gotara wêna di salên şêstî de ji bona zimanê Elemanî hate wergerandin û ew di Kovara Kurdistan de, di Kovara Komela Xwendevanên Kurd de hate bibelavkirin. Daneyek ji vê Kovarê di nava Nivisxana min de têt bidîtin, heger ku min ew dît, dê ezê Jimar, Rûpel, Sal û Cêhê Derkevtina wêna ji bona Xwendevan bidim nivîsandin. Hêjî bêtir di zimanê Elmani de jî tîpên ä, ü himjî ew bi ea û eu têtin binivîsandin. Wan pir bi hêsanî ev pirsa hanê dane çarekirin. Ez hêvîdarim, ku dê hemû zimanê Kurd bi tîpên Latînî bête binivîsandin û herwehajî dê Zanevanên Kurd di warê ziman de vê pirsa hanê jî bi hêsanî ve bidin biçarekirin; jiber bi rastî ve çarekirina wêna pir bi giringî û kêr ve têtê bidîtin. Cuma

bêdeng de didin bikaranîn, -mîna ku ew ji bal Miletên Samî de têtin bipeyivandin-. Ew sitêr ji dilva stêr -baştir steer ligora veçakkirina tîpên nuh de-, bira ji delva bra, şikest ji delva şkest -bi baştir ve ligora veçakkirina tîpên nuh de shkest-, bilûr ji dêlva blûr -baştir blour- û Nivîskar ji dêlva Nvîskar -baştir Nvieskar- bidin binivîsandin. Magelo Ingilîz star bi "sitar" ve, Firensî astare bi "astir" ve, Elman Bruder bi "Biruder" ve û Holendî Amsterdam bi "Amistirdam" ve didin binivîsandin? Careke din ez ji bona ser vê danava hanê têtim bivegerandin.

# Perçê Yekem

## Hêjakirina Mêjûwa Mohamed Emîn Zekî ligel kurtîyekê de li ser Jîn û Nîvîsandinên wîna de.

## Hêjakirina Mêjûwa Mohamed Emîn Zekî

### Pêdeçûn

Ez dest bi kurtîyekê ve li ser jîna Mêjûvanê hêjayî de bi bîrxistî ve û li ser nivîsandinên wîna de didim bidestpêkirin, yên ku ew li ser bingehên belavokên di vî warî de hatine binivîsandin[1] û ezê dê li paş wan de hêjakirina xwe li ser mêjûwa wî de ligel dîtinên tengalkirî de li ser şêweyê nivîsandina dîroka rojhilat de bidim bikirin. Hinekî jî dê ezê Şerefname ligel Musa Xoron -Bavê "Mêjûvanên Ermenîyan- de bidim biberamberkirin.

Herwehajî mîna ku min di pêşgotinê de dayite binîşandan, ne bi rastî ve tête biderkevtin û ne jî bi dadwerî ve beramber bi Mohamed

---

[1]Min ev Kurtîya Jîna wîna û li ser Nivîsandinên wîna de ji ji Pêşekîya Bergê Yekemî Wergerandina Erebî mêjûwa wîna de dayite biwergirtin, ya ku ew ji bal Wergervanê wêna Mamosta Elî Ewnî hatîye binivîsandin. Herwehajî min ew ji serpêvekirinên Doktor Kemal Fuad jî dane biwergirtin, yên ku wî di Pêşgotina Bergê Duwemî Erebî de (Çapa London de di sala 1986 de) dayite binivîsandin. Ismet Şerîf Wanlî

Emîn Zekî ve Mêjûvanê meyî milî û û Nuhvan û Vejandvanê mêjûwa Kurd ve tête biderkevtin, ku em belavîya wîyî sala 1931 de ligel zanîstîya mêjûyî de li Ewropa de di sala 1993 de û pêşkevtina wê de bidin biberamberkirin, Mîna ku em dê wê di beşê duwem de ji van lêgerandinan bidin bidîtin. Evaya jî hîç bi kêmasîyekê ve beramber bi mêjûwa Mohamed Emîn Zekî û giringbûna wêyî pir ve ji bona lengerkirina tevgera Mîlîyî Kurd li ser rêzana zanyarîya mêjûyî de nade biderxistin. Hêjîbêtir mêjûwa wî bi yekene ve di nava mêjûwan de -piştî heftê salî jî- di dîtina dûrbûna mêja Kurd de ji heyamên kevnar tanî vê roja me jî tête bidîtin.

## Kurtîyek li ser jîna Mêjûvan û nivîsandinên wî de.

Danervan di sala 1880 de li Kurdistana jêrîn de li bajarê Sulêmanîyê de hate bizayîn. Ew di roja 9 tîrmeha sala 1948 de li bajarê Begdadê de hate bimirin. Termê wî ji bona bajarê Sulêmanîyê hate biveguhestin û ew di goristana sîwan de bi qorîna tevaya Xelke bajêr ve ligel darbesta wî de hate biveşartin. Di roja 26 gelawêja sala 1948 de di bajarê Sulêmanîyê de civîneke şûndanîyî mezin jêre hate bidanîn û têde pir peyvadrî û xweşxuwan li ser pesindana jîna wî û nivîsandinên wî de hatin bikirin, yên ku ew ji bal Mamosta Ela El-Dîn Sucadî de -1909-1948- di nivîstekê de di wê salê de jî bi xwe ve li bajarê Begdadê de bi zimanê Kurdî û Erebî ve jî date biderxistin.

Mohamed Emîn Zekî ji dibustanên Supahîyî Osmanî li Sulêmanîyê, Begdadê û Istenbolê de hate biderkevtin. Wî di nava Leşkerê Osmanî de mîna Cengmanekî di pir berên cengan de ji sala 1902 tanî kevtina Serdarîya Osmanî -di sala 1918 de- Cuma date bikarkirin. Di dema kevtina Serdarîya Osmanî de ew bi Şûna -Mîr Alay- ango bi Serheng ve hatibû bigihaştin. Wî gelek nîşanên Supahîyî hêja ji bal Serdarîya Turkî, Elemanî û Otruşê-Nemsa- de bi

destên xwe ve dane bixistin.

Di sala 1924 ew ji Istenbolê hate biderçûn û ji bona nava welatê xwe hate bivegerandin. Li paş pêvekirina Kurdistana jêrîn bi Dewleta Iraqê ve li jêrçavdêrîya Birîtanî de Mohamed Emîn Zekî heşt cihên Wezîrîyî li dûhev de -Wezîrîyên rê û ban, aburî û zanebûn- ji sala 1925 tanî 1942 de di Serdarîya Iraqê de dane biwergirtin. Herwehajî ew di salên 1928 û 1937 de Mîna Wênerê Sulêmanîyê ji bona Parlemanê hate bihelbijartin.

Mohamed Emîn Zekî Mêjûvanekî pir bi ber bû. Di dema karê wî de di nava Leşkerê Osmanî de heşt nivîst bi zimanê Turkî ve bes û bi tenha ve di warê Supahî de hatin bibelavkirin. Li ser van nivîstan Mamosta Mohamed Elî Ewnî -1897-1952-, yê ku wî nivîstên wî ji zimanê Kurdî ji bona zimanê Erebî dane biwergerandin, di nivîsandina ser jîna wîna de di Bergê Yekem de ji mêjûwa wîyî çapa Erebî de date binivîsandin.

Nivîsvanê hêja di Pêşgotina Bergê xweyî Yekem de dibêje: "Ev nivîsta hanê çawan min daye binivîsandin?" Ew vê dibêje: "Piştî ku gotina Osmanî hate bihilanîn û li cihê wê de peyva Turk û Toranî ji xwe re cihê wê date biwergirtin, bi serûştî jî ve mîna hemû Neferên Miletên tir min jî li nava wê civakê de bêtir rûmeta xwe pêhestkir û payabûna milî ez neçarkirim, ku ez li hemû kêsekê de vê pêhestbûna xwe bidim bixuyanîkirin". Ango pêkhatina hesta milîyî Kurdî li nik Danervan de vegerandina karekî serûştî beramber bi nemana hestkirina pêwendîya musulmantîyê ve di Selteneta Osmanî û veguhertina wêna de bi hesta milîyî Turkî ve dihate bidîtin. Merov dikare vê pêşkevtina hanê ji bona dema sala 1908 de û "Şureşa Destûrî" bide bivegerandin, ya ku ew ji bal "Tevegera Turkîya Genc" de di nava destên Supahî de hate bikirin.

Di pêşgotinê de Danervan ji xwe dide bipirskirin: "Miletê Kurd ji çi Neteweyekî tête biderkevtin, çi bi ser ve hatîye bikirin?" Wî nikarîbû bersiveke baş ji bona vê pirsê bide bikirin. Bi neçarî ve wî ev pirsa hanê ji du Zanistvanên Kurd dane bikirin, yên ku ew Mamostên mêjûwê bûn. "Yekekî ji wan Koka Kurdan bi goyeke pir tevlihev ve bi ser Kerdê Kurê Emroyê Qehtanî ve date bibirdin, yêtir jî em bi Netewê Dêwekî -Casad- ve dane bikirin". Ew dibêje: "Ez bi rastî ve pir li ber hîç û pûçbûna van herdu bersivan hatim bikevtin û min ligel

bextê xwe de soz date bibirîn, ku ez bi xwe ve dê li vê veşartoka hanê de bêtim bigerandin".

Wî ji sala 1910 de li bajarê Istenbolê de dest bi lêgerandinên xwe ve date bikirin. Wî tevaya dema valabûna xwe ji bona serdana nivîstxanên giştî date bitirxankirin. Wî bi zimanê Turkî, Erebî, Farisî ve û herwehajî pêrejî wî bi zimanê dê jî dizanî bû. Pêrejî ew li ber zimanê Firensî, Ingilîzî û Elmanî jî de dihate bikevtin. Di sala 1912 de ew ligel Şandîyeke Supahîyî Turkî ji bona Ewropa hate binardin. Wî li wêderê de serdana nivîstxanan û xanîyên şopên kevnar li Elemanya û Firensa de date bikirin, da ku ew agehdarîyan û belgeyan bide bicivandin û nivîstên nuh ji xwe re bide bixwendin.

Wî ji sala 1930 de dest bi nivîsandina kurmancîya jêrîn ango soranî û bi tîpên Erebî ve -ligel hinek ji veguhertinên tîpên wê de bi u, i û e ve- date bidestpêkirin. Danervan ev nivîsandinên hanê ji bona Zarwên Miletê xwe û hemû bi zaravayê soranî ve dane bihiştin:

1. "Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê ji Destpêkirina Mêjûwê tani vê rojê" Ev nivîsta Bergê Yekeme ji mêjûwa wî ye, ya ku em niha di derbarê wê de didin binivîsandin. Ew li bajarê Begdagê de di sala 1931 de - di Çapxana Dar El Selam de- Cuma- di - 398 R. de- hate biçapkirin. Ew ji bal Mohamed Elî Ewnî ji bona zimanê Erebî -di sala 1936 de- Cuma- hate biwergerandin. Ew di sala 1939 de di 472 rûpelan de li bajarê Qahirê de li welatê Misrê de -di Çapxane El-Seade-Cuma- hate biçapkirin, piştî ku ew ji bal Wergervan ve bi rûnkirinên pir û fehrisên navên ciyografî û Mêjûyî ve hate bidewlemendkirin. Herwehajî Danervan bi xwe jî ve pir rûnkirinên nuh bi ser çapa Erebî ve dane bivekirin. Van tevan bi hev re nerxbûna wêna dane bibêtirkirin[1].

[1]Daneyek ji Çapa Kurdîyî herdu Bergan, ya ku ew careke din li bajarê Mehebadê de hatîye biçapkirin, ji bona min Şewket Berzanî di 23. 12. 1989 li bajarê Ormîyê de date bidiyarîkirin. Herwehaj Daneyek ji Çapa Kokî ji bergê Yekem bi zimanê Erebî niha li nik min de têtin bidîtin. Ev çapa han ji bal Îmad Salih Zekî Beg ji bona xwendinê di sala 1960 de li Elemanya de ji bona min hate bidan, belam min hêjî ew lê nedaye bivegerandin. Ez hêvîdarim ku ez vê sipartina wîna lê bidim bivegerandin; jiber ku

2. Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistan: "Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd di Pêla Musulmantîyê de". Evaya Bergê Duwem ji Mêjûwa wî bi xwe ve ye. Ew di sala 1937 de li bajarê Begdadê hate biçapkirin. Ew jî ji bal Mohamed Elî Ewnî hate bierebîkirin û wî bi rûnkirinan ve pir date bidewlemendkirin. Ew di sala 1948 de li bajarê Qahire de di 440 rûpelî de di bin nav û nîşana "Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd de di Pêla musulmantîyê de" hate biçapkirin.

3. "Mêjûwa Sulêmanîyê û Hêlên wê". Ev nivîsta hanê di sala 1939 de li bajarê Begdadê di 294 rûpelan de hate biçapkirin. Ew ji bal Mamosta Cemîl Bendî Rojbeyanî de di sala 1951 de li bajarê Begdadê de ligel rûnkirinan de ji bona zimanê erebî hate biwergerandin û biçapkirin.

4. Kurdên bi Nav û Bang ve. Ew komeke ji gotarên Danervanin, yên ku wî di kovara -Gelawêj- de dabûn bibelavkirin. Xanima wîna Sanihe ew datin bicivandin û wê ew ji bona zimanê Erebî date biwergerandin. Wê ew di du bergan de di sala 1945 de li bajarê Begdadê de

---

pêwendî di nava min û wî de hatin bibirîn. Hêjîbêtr ev daneya hanê Danervan bi destnivîsandina xwe ve di 9. 8. 1940 ji bona Salih Zekî Beg dayite biyadgarîkirin.

Burhan Dawid Eb-Dulah Bergê Duwem Kurtîya mêjûwa Kurd û Kiristanê - Ji mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd di pêla musulmantîyê de, ya ku ew ji bal Mohamed Elî Ewnî bi zimanê Erebî ve hatibû biwergerandin û ew ji bal wî jî di sala 1945 de hatibû biçapkirin, ji nuh ve li bajarê Berudê di sala 1986 de date biçapkirin. Wî daneyek ji vî Bergî ji bona min li bajarê Şamê de di 12. 3. 1986 de date bipêşkeşkirin. Divê li vir de bête bigotin, ku wî pêşgotina xweyî vî bergê hanê di 1. 3. 1986 de li bajarê Bêrudê dayite binivîsandin. Ez ji dil û can ji bona yarmetîya wan Merovên Hêja didim bisipaskirin; jiber ku Wergerandina kurmancî min li ser wan Danan de dayite bikirin. Cuma

datin biçapkirin. Herwehajî wî du bibîrxistin ji bona Serdarîya Iraqê di salên 1930 û 1931 de li ser pirsa Kurd de li Iraqê de datin binivîsandin. Belam wan tu encam nedane bikirin. Hêjîbêtir wî pir gotar di rojnamên û kovarên Kurdî de datin bibelavkirin.

Nivistên wî li ser Kurd û Kurdistanê de bi zimanê Kurdî û Erebî ve pir caran hatine biçapkirin. Dr. Kemal Fuad van çapên cudan di pêşgotina xwe de ji bona çapa Erebî ji bergê duwem ji mêjûwa Danervan -Mêjûwa Dewlet û Mîneşinîyên Kurd di Pêla Musulmantiyê de -wergerandina Mohamed Elî Ewnî- di çapa London de di sala 1986 de date binivîsandin. Dr. Kemal Fuad di vê pêşgotina xwe de bi hêjakirineke rexneyî ve ji bona vî bergê duwem pê tête birabûn. Herwehajî ew hinekan ji "Şaşbûnan" - ev peyva hanê ji bal Dr. Kemal Fuad de hatîye bikaranin- dide biçakkirin, yên ku Danervan dane bikirin. Herwehajî ew hinek runkirinên giştî dide biderxistin û ew pêlên mêjîyî dide bibîrxistin, yên ku ew li dûhev de li ser heremê de bi rengekî giştî ve hatine biderbasbûn. Ev jî xwendina vê nivistê dide bihêsankirin. Herwehajî di dawî de ew di rûnkirin û pernivîsandinên xwe de wan nivstên nuh dide biraxistin, yên ku ew li Iraqê de li ser nivîsta Danervan de derbarê bi Mîrneşînîyên Kurd, Şop û Zanîya Kurd ve bi rengekî gişti ve hatine biderkevtin. Ji vî karî bi xwe jî ve kar tête bigirawkirin.

## Hêjakirineke Dildarî ji bona Mêjûwa Mohamed Emîn Zekî

Ez bi Danervan û mêjûwa wî ve bi xwe ve di pêşî de bi pêwendîyên dildarî ve nala Şagirtekî bi Mamostê xwe ve têtim bigirêdan. Ew pêwendîyên hanê ji bona pêşîya xortanîya min, dawîya salên Cenga Cîhanî Duwem û li paş wan de têtin bivegerandin. Ez di taxa Kurdan de li bajarê Şamê de hatim birabûn. Di Şamê de ez sîpakî milî bûm û dilbirê mêjûwê bûm. Belam li ser mêjûa Kurdistanê de mîna piranîya Zaroyên Miletê xwe di wê çaxê de ez jî nezanbûm. Bes û bi tenha ve bi ser bilindî ve ji me re dihate bidîtin, ku me ji xwe re dida bizanîn, ku Kurd ji Nevîyên Mîdya têtin bidîtin û zimanî Kurd jî ji zimanên Hindi-Ewropî tête bidîtin. Herwehajî me hinek din jî ji agehdarîyên giştî ve didan bizanîn. Di wê demê de Bergê Yekem ji Mêjwûa Mohamed Emîn Zekî, ya ku em niha di derbarê wê de didin biaxivtin, bi wergerandina wîyî Erebî ve ji bal Mamosta Mohamed Elî Ewnî ji bona nava destên min hate bikevtin. Ew nala Qurana min ji min re dihate bidîtin. Ez wê çaxê heftdeh salî bûm û min ji wê pêle de ligel hinekan de ji Rêberên Rêxistina -Xweyîbûn- ji bona Serxwebûna Kurd û hinekan ji Wêjevanên Kurd dida bidan û bisitendin, ji wanên ku wan ji Kurdistana Turkî ji bona bajarê Şamê li paş kevtinên şûreşên Kurd de dabûn bibarkirin. Di rêya wan de min Danervan di serdana wîna de ji bona bajarê Şamê di sala 1945 de date binaskirin. Heger ku bîrxistina min bête birastderkevtin, careke din jî di serdana wîna de ji bona bajarê Şamê de di sala paş de min ew date bidîtin. Gava ku Bilindvan bi dilbirina min ve ji bona mêjûwa Kurdistan û bi taybetî ve ji bona nivîsandinên wî date bizanîn. Wî ji bona çûna li ser wê rêyê de nav di min de date bidan û wî date bigotin: Erk li ser xortên Kurd de tête bidîtin, ku ew wê bînin bidawîkirin, ya ku wî pê daye bidestpêkirin. Carekê min jê re ji bona Iraqê date binivîsandin û wî bi gotineke nazenîn ve bersiv ji min re date bivedan û wî pêrejî wêneyekî xwe ligel bersiva xwe de ji min re date bidiyarîkirin. Ew wêneyê hanê bi xwe ve ew wêne bû, yê ku ew li ser Bergê Yekem ji Mêjûwa wî de

hatîye biçapkirin. ji wê çaxê û pê de bi wî û nivîsandinên wî ve dildarîya min pê hate bibêtirkirin.

Gava ez ji Surî ji bona xwendina di Zanistgehên Siwêsrî de di dawîya sala 1948 de hatim biderkevtin, nivîsta "Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê ji Destpêka Mêjûwê tanî vê rojê" ji nivistên kêmbûn, yên ku min ew di bahola çûna xwe de ligel xwe de dabû bihilgirtin. Herwehajî gava ku ez bi Peydarvan ve di Zanistgeha Sorbonê de ji bona hînkirina danava "Şehristanîya Kurdistan" di sala 1959 de nivî..a Mohamed Emîn Zekî bi bingehê Peyvdarên min ve hate bidanîn.

Wehajî vajî careke din ez vekirina Bergê Yekem ji wê nivîstê bi xwe ve didim bivekirin, bi wê nivîsta ku min ew ligel xwe de di baholê çuna xwe de di dawîya sala 1948 de ji bona Siwêsra dabû bihilgirtin. Ez niha li nava rûpelên wê de didim bitemaşekirin. Ez li ser kenarên perên wê de rûnkirinên xwe didim bidîtin, yên ku min ew bi xama risas ve di nûhhatî û herwehajî di nava salên hatî de ji xwe re dabûn binivîsandin. Hîç pêwistî pê nayête bidîtin, ku li vêderê de bête bibîrxistin, bê kanî çend pêwendîyên minî dildarî ji wê çaxê de û di nava van salên dirêj de bi Danervanê Barkirvan ve bi wî û şopên wî ve têtin bigirêdan, yên ku demê ew nedane biveguhertin û nejî wê bi wan ve daye bikêrkirin. Hêjî ez navê wîna bi wê sîwana bilind mîna bîst salîyên xwe ve didim bidorhêlkirin, tevî ku bi serûstî jî ve agehdarî û serpêhatîyên min hatine bibêtirkirin û herwehajî serçavî û belavokên min jî hatine bipirkirin.

Hêjî ez didim bibawerkirin, Ku ji bona Miletê Kurd du Mêjûvanên "Mîlîyî" Gewre têtin bidîtin, yên ku hesta wanî welatî bi giringbûna nivîsandên wanî zanistî û mêjûyî ve nedaye bikêrkirin. -Bi mercekî ve derbarê bi Mêjûvanê Yekem ve divê reweşt û zîneta zanîstîya hayamê wîna li ber çavan de bêtin bidanîn-. Yê Yekem ji wan Mîr Şerefxan -rojkî- Xwedanê Bedlîsê û "Şerefname" di sedsalê şanzdehan de bû. Ez wî bi "Bavê Mêjûwa Kurd" ve jiber pêşîbûna wîna didim bidanîn. Yê Duwem Mohamed Emîn Zekî bû, yê ku wî ev mêjûwa hanê di nîvê pêşî de ji sedsalê bîstan de dayite binuhkirin. Dibe, ku Merov bikaribe van Mêjûvanan jiber kêra wan li ser zanîstîya mêjûwê de li bal Kurd de bi kêra Ehmedê Xanî ve di warê wêje,

xweşxuwanîyê û hesta Mîlî de bide biberamberkirin[1].

## Hêjabûneke rast û durust

Heger ku em bên û awireke rast, durust -û dûr ji dildarîyê- ji bona ser Bergê Yekem ji mêjûwa Mohamed Emîn Zekî bidin biavêtin, dê emê bikaribin van rûnkirên tên bidin bikirin û ligel jî de dê ezê beramberkirina wêna ligel Şerefnamê de bidim bipevekirin:

1. Ev nivîsta hanê bi yekene ve di warê xwe de hêjî tête bidîtin, ya ku têde Danervan jimareke pir ji agehdariyên cudan de girêdayî bi mêjûwa Kurd ve di Yek Bergî de dayite bicivandin, yên ew berî wîna li vir û dera hanê de di sedan nivîstan, serçavîyan û gotaran de dihatin bibelavkirin. Evaya bi karekî zexmî mezin û westayî ve tête biderkevtin. Bes û bi tenha ve palpêdana hesta welatî û bawerîya Danervan bi Yekitîya Gelê Kurd ve nala Neteweyekî, yê ku ew ji bal mêjûwê de li ser xakê Kurdistanê de hatîye bizayîn, ev karê hanê pê date bikirin.

---

[1]Di vî warî de Ismet Şerif Wanlî pir bi bilindî ve û hêjîbêtir bi rastî ve li ser van herdu Mêjûvanên Gewreyên Kurd de ji bona Nifşê Nûhatî dide biaxivtin. Nivistên wan ligel Pêşgotinên Mem û Zîn Nûbuhara Xanî de ji bona min di tevaya Xortanîya min de Avesta min bûn. Bi saya wan û kêra wan ve ez bêtir di mêjûwa Welat û Miletê xwe de û herwehajî pêrejî di tevaya Mêjû û felsefa rojhilat û Merovanîyê de bêtir hatim biliberkevtin.

Jiber vêjî Gotthold Ephraim Lessing (1729-1781 z. de) Şiyarvanê Elemanîyî Ciho dibêje: "Miletekî bê Mêjû mîna Menalekî bê Serpêhatî tête bidîtin". Vî Şîyarvanê Elmanîyê bi nav û bang ve gelek Nivîsandinên şiyarbûnê dane binivîsandin. Wî di sala 1779 "Nathan der Weise" -Natanê Şehreza- date binivîsandin, ya ku ew bi dûr û dirêj ve li ser pêla Selah El-Dînê Eyubî de dide biaxivtin û nîşanên wîyî Sincîyî Kurdîyî bilind dide biderxistin; jiber Natanê Şehreza Şêwirdarê Şehriyar Selah El-Dîn bû. Cuma

Belam Şerefxan dest bi nivîsta xwe ve bi pêşgotineke Ethnologie-Etnolocîyî giştî ve date bikirin, mîna ku ew ji bal Rojhilatnasê Firensî Francois Charmoy- Firanswa Şarmo de hatîye biwergerandin, yê ku wî "Şerefname" ji bona zimanê Firensî li bajarê San Petersburg[1]de -Leningirada paş Şûrûşa Oktober , Cuma- di sedsalê çûyîn de dayite biwergerandin. Şerefname di pêşgotiya xweyî Etnolocî de li ser reweşt, nîşan, rûçik, başî û bedbûnên Kurd de di sedsalê şanzdehan de dayite biaxivtin. Carcaran jî wî dest ji bona evsanan dayite bidirêjkirin, bêyî ku ew bi rastî ve bi wan ve bide bibawerkirin. Herwehajî wî rast û durust ciyografîya Kurdistanê di dema xwe de dayite binîşankirin. Her çilo jî bête bidîtin, bi rastî jî ve cihê sersurandinê tête bidîtin, bê ka çawan Şerefxan bi wan rabûnên Etnolocî ve di dema xwe de pê hatîye birabûn, di wê dema ku hêjî ev zanistîya hanê nehatibû bizayîn. Herwehajî gotinên "Ethnologie" û "Ethnographie"-Etnolocî û Etnogirafî- hêjî ew li Ewropa de jî nedihatin binasîn.

2. Mohamed Emîn Zekî di nivîsta xwe de ji bona ronahîkirina mêjûwa Kurdistanê dayite bikarkirin:

A. Wî mêjûwa Kurdistanê di tevaya deverên wêyî ciyografî û perçên wêyî parvekirî de, yên ku Gelê Kurd tanî vê roja hanê jî têde tête bijîyandin, date bironahîkirin.

[1]Wergerandina Firensîyî Şerefname li St-Petersburg di nava salên 1868 û 1875 de di Çar Bergan de hate biçapkirin. (Bergê Yekem 852 Rûpel bû. Bergê Duwem 502 Rûpel bû. Bergê Sêyem 705 Rûpel bû. Bergê Çarem 712 Rûpel bû). Wergervan F. Charmoy jimareke pir gewre ji Rûnkirinan û agehdarîyan bi destê xwe ve date biservekirin. Vî karê hanê nêzîka Sî Salî ji westandina kar jê date xwestin. Vî rojhilatnasê hanê ev Nav û Nîşana hanê bi vê nivîsta hanê "Şerefname yanjî Tomarên Netewê Kurd" date dan. Ew bi zimanê Firensî ve: (Le Cheraf-nameh ou Fastes de la nation kurde) hatîye binavkirin. Ismet Şerîf Wanlî

B. Wî ew ji "Kevintirîn Heyamên Mêjûwê tanî Niha" date bironahîlirin, mîna ku ew di nivîsta wî û navnîşana wê de hatîye binivîsandin.

Ev karê hanê jî pir bi dujwarî ve tête bidîtin û ew jê re nav û nîşanê dide biderxistin. Herwehajî ew hesta wîyî milîyî geşandî dide biderxistin. Pêrabûna Şerefxan bi"Panahî" ve, bi têgihiştina ku lêgerandina wîna hemû deverên Kurdistanêyî ciyografî bi ber xwe ve dane bixistin, di dawîya sedsalê şanzdehan de bi tiştekî sersurayî ve tête biderkevtin. Ev jî bi nîşaneke din ve li ser "Nuhbûna Remana wî" û têgihiştina wîyî Ethnologie-Etnolocî de ji bona milîbûnê nala Miletekî li ser xakê xwe de û bi reweştên xweyî taybetî ve û nala Neteweyekî bi xwedan taybetîyên xwe ve tête bidîtin, di dema ku Şahînşahîyên Osmanî û Farisî bi pir milî ve dihatin bidîtin. Ne li nik Serdarîyên wan Şahînşahîyan de û ne jî li nik Zanistvanên wan jî de hîç têgihiştineke milî bi liberkevtina xweyî nuh ve dihate bidîtin. Di nava wan de nav û nîşanên milîyên cudan di jêr têgihiştina oldarîya musulmanîtîyê û cîhankirina -universalite- namaya wêna de dihatin biwindakirin û binemankirin. Herwehajî li ser .bingehê Dewletêyî qanûnî de: Dilsozî û sertewandin ji bona Sultan yanjî Şah dihate bidîtin. Hêjîbêtir di wê demê de Kurdistan bi xwe jî ve mîna ferşekê ji Mîrneşînî û Derebegîyên Kurd dihate bipêkhatin, ku di nava wan de hîç yekitîyeke siyasî û yanjî civandineke din jî nedihate bidîtin. Belam wan yekitiyeke milî -ji xak û Merovan- di nava serê Danervan de dida bipêkanîn. -Wehajî bi vî rengê hanê jî ve ev remana hanê jî di nava mejîyên hinan ji Zenevan, Peyên oldariyê û Aristokratie-Eristokratîyên -Şahzadeyên, Xanedanên- Kurd de dihate bidîtin û di pêşîya van tevan de jî ev remana hanê di nava mejîyê Ehmedê Xanî de dihate bicîûwarkirin.

Belam ji alîyê poşandina demê de nivîsta -Şerefname- nêzkîa pêncsed salî ji mêjûwa Kurd dida bipoşandin. -Belê ev jî firehbûneke demîyî di wî zemanî de pir bi dirêjî ve tête bidîtin; jiber ku agehdariyên kevnar di rojhilat de li ser wê danava hanê de nedihatin bidîtin, ji bil yên ku ew di nava nivîsandinên Mêjûvan û ciyografîvanên pêla Musulmantîyî Kilasîkî de dihatin bidîtin. Bi dîyarî ve tête bidîtin, ku Şerefxan li ser wan agehdarîyan de ne agehdar bû.

Wî di pêşîya pêşî de pişta xwe li ser lêgerandinên xweyî taybetî de û li ser goyên Bavpîran de dabû bigirêdan. Bêyî vêna dê şopên wan rûdanan bihatina biwindakirin. Hêjîbêtir Şerefxan di lêgerandinan de nûjevan bû.

3. Mohamed Emîn Zekî agedarîyên li ser Dewletan, Sultanan û Şahan de li gora pêwistîyên Lêgernadinê de guh bi wan ve dayite bidan, lêbelê wî di mêjûwa xwe de tu agehdarîyên têrkirî li ser tara siyasîyî bilindî wan Dewlet û Şahînşahîyan de nedaye bidan, yên ku Miletê Kurd û Mîrneşînîyên wîna di nava wan de -pir caran jî bes bi nav ve- dihatin bijîyandin. Herwehajî wî ew pêl û lidûhevdûbûna demê bi diyarî ve mîna pêla Mîdî, Axmenî, Yunanî, Partîyî Îranî, Sasanî, Vegirtina Erebî, Îranîyî Kurdî, Deylemîyî Musulmantî, Sulcoqîyî Turkî, Eyubîyî Kurdî, Teterîyî Mengolî...ûhd. nedane binîşankirin. Bes û bi tenha ve wî li ser Miletê Kurd de bi giştî ve, li ser pehlewanîyên wî, li ser derd û destanên wî de û li ser liberxwedana wîna de ji bona welatê wî dayite bigirêdan.

Belam Şerefxan Mêjûvanê Eristokratîyên-Şahzadeyên- Kurdîyî Serdar bû. Wî tu guh bi rewşên Milet ve pê nedidan bidan; jiber ku ew bi xwe jî ve yek ji gewretirîn Şahzadeyên Kurdistanê bû. Belam bes û bi tenha ve nivîsandina wîna ji bona mêjûwa welatê wî û serfirazîya wîna bi "Keye û Şahzedeyên Gewreyên Kurdistanê û bi Gernas û Qehremanên wêna ve" nîşaneke têrkiriyî bi serê xwe ve tête biderkevtin, bê ka çend hesta milî li nik wî de bi berz û bala ve dihate biderkevtin. Pêvekirina wîyî çînîtî bi Eristokratîya Kurdîyî Derebekî ve date bihiştin, ku ew bi pêwistîya veguhertinên rewşên rakirî ve û ne jî bi pêwistîya rizgarkirin û yekkirina welêt ve bête bihestkirin. Ew bi Şahzedeyekî xurt ve û bi hêz û hiner ve dihate biderkevtin. Geh ew ligel Şah de bû û geh jî ew ligel Sultan de bû. Carekê ew di nava paytextê xwe de dihate bidîtin û carekê jî ew jê dûr û der bi der ve dihate bidîtin. Belam her tişt weha dihate bidîtin û ew li gora daxwaza memê û -vîna Xwedan de di Bendên wî de- tête bidîtin.

Ji vê dîtinê ji me re mezinbûna Ehmedê Xanî Xweşxwevanê

Gelê Kurdîyî Girîvan tête bidîtin. Ev Meleyê Dîndar, yê ku hîç gûman li bawermendîya wî de nayête bidîtin, belam hejkirina wîna ji bona Miletê wîyî jêrdestê sitema Turk û Firs de gûman ji bona nava dilê wî date bixistin, tanî ku ew gûmana hanê jî derbarê bi daxwaza Xwedê û mehrebanîya vîna wî ve hate bikevtin[1].

4. Mohamed Emîn Zekî di mêjûwa xwe dę xwe ji şêweyê

[1]Li ser deqa felsefa Ehmedê Xanî de di Pêşgotina Mem û Zîn û Nûbuhar de dê pir Zanevan û Hozan bidin binivîsandin; jiber ku ew bi Xizneyeke Zanebûnê ji bona tevaya Nêfşên Kurdî Nûhatî ve tête bidîtin. Di vî warê han de tanî niha Dr. Nur-El-Dîn Zaza di Pêşgotina Memê Alan de û Dr. Iz-El-Dîn Resul li ser Ehmedê Xanî de bi zimanê Erebî ve Nivisteke pir baş di bin Nav û Nîşana: Ehmedê Xanî de li Begdadê de di sala 1979 de di 511 Rûpelan de date biçapkirin. Ez hêvîdarim. ku Xwendevan li van herdu nivîstan bêtin bivegernadin.

Ez li vir de dixwazim bes û bi tenha ve ji Xwendevanên Giramî re bidim bizanîn, ku tevaya Kanîya felsefa Ehmedê Xanî ji felsefa Serdeştî û Yunanî û bi taybetî ve ji felsefa Aristo têtê biderkevtin. Rast û durust têtê bidîtin, ku ew bawermend dihate bidîtîn, lêbelê Bawermendîya wî ne bi Latê Ereb ve dihate bidîtin.

Xanî mîna piranîya Şiyarvanên Vejandina Ewropa di Qonaxa pêşî de weha didan bibawerkirin, ku ew wê vejanidinê ji tarîya sedsalên navînî di rêya Patîşahan û Şehzadan de dê bidin bikirin; jibervêjî daxwaza vejandinê ji Şehzedan û Gewreyên Kurd dida kirin. Wî di vî warî de tu gunehê Reben û Belengazan nedida bidîtin. Lê hêjîbêtir ji Şiyarvanên Pêşîyî Qonaxa Vejandina Ewropa Xanî guh bi giringtirîn Deqa Cewhera Vejandinê date bikirin. ya ku wî ew di Zanebûna Biçûkên Kurmancan dida bidîtin. Ev Deqa fêrbûn û perwerdekirinê Cewhara Vejandinê di Qonaxa Duwemî Vejandina Ewropa de dihate bidîtin û ew di biserkevtina Şureşa Firensî de di sala 1789 z. de hate bitacûxelatkirin. Xanî herdu Qonax bi yekcarê ve li gora pêwista Suwarkirina Civaka me de dida bipêşvexistin. Ev remana Xanî tanî vê roja me jî fêrkirin û perwerdekirina Biçûkên Kurmancan cewhera dema Vejandina Kurd di seranseri Kurdistanê de bi neçarî ve dide bipêkanîn. Pir ji Zanevanên Kurd yanjî ji Nivnezanayên wî ve ber rewrewkên dema Vejandina Ewropa hatibûn bikevtin, bêyî ku ew Qonaxên wê û Cewhera wêyî civakî û mêjûwa Welat û Miletê xwe bidin binaskirin; jibervêjî pir caran ev Nîvnezanên hanê bi Kurtêlxwerên Serdarên Dagîrkerên Kurdistanê ve dihatin bikirin. Wan her û her dijî berjewendîya Miletê Kurd û Kurdistanê di bin vav û nîanşana pêşveçûnê de didan bikirin û ew her û her li ser sifra Dujminên me didan bihestîkojîkirin. Cuma

nivîsandina mêjûwê de di pêşîya pêla musulmantîyê de date bidûrkirin. ya ku ew ji bal Mêjûvanên wê pêlê de - ji Muslmanan û Filan nala Siryanîyan- dihate bikirin. Ew şêweyê nivîsandina mêjûyî hanê bi van nîşanên jêrîn ve dihatin binîşankirin:

Mêjûvanên wê pêlê di bin kêra nivîstên ayînîyî perest de dihatin bidîtin. Wan dest bi afirandina hebûnê ve bi vîna Xwedê ve didan bigirêdan. Li paş de ew li ser Adem û Hewa de dihatin biaxivtin. Dûra ew ji bona ser lehîyê, Nuh û Zarokên wî dihatin bipeyivandin. Li paş de ew ji bona ser "Çînîyên" Şahînşahên Faris -ango Îran- û evsanên wê dihatin biçûyîn. Bi rastî ve wan bes û bi tenha ve di dawîya dema Cahilîyê -berî Musulmanîtiyê -Cuma- de di Cezîra Erebî de bi mêjûwê ve dane kbidestpêkirin. Wan agehdarîyên li ser Qurêş, zayîna Pêxember, destpêkirina musulmantîyê û vekirinên wêna de dane binivîsandin. Wan Mêjûvanên hanê evsan û dengdana kêrên wan didatin binivîsandin. Wan agehdariyên Bav û Kalan ji bîrwerîya mirovanîyî Merov li ser Merov de ji xwe re didan biwergirtin û binivîsandin. Ne Mohamed Emîn Zekî û ne jî Şerefxan jî ji bona nava van dehfan hatin bikevtin. Di Quranê de di bin kêra Tewrat û Incîlê de li ser pir evsan û navên Miletên windakirî de hatîye biaxivtin. Di derbarê wan hatinên di nivistên perest de ji bona Mêjûvanê niha de bi bê sûd ve nayêtin bidîtin. Hêjîbêtir xwendekarîya evsan û bawermendîyên kevnar ew bi serê xwe ve beşekî ji zanistîya mêjûyê tête bidîtin.

Hinan ji Pêşîvanên Mêjûvanên pêla musulmantîyê û remangîrên wê Mêjû nala "Encyclopedie"[1] didan

[1]Bi zimanê Elemanî Enzyklopädie-Insiklopêdî tête binivîsandin. Ev gotina hanê him gotineke Yunanî ye û him jî ew gotineke Latînî ye. Ew bi têgihiştina giştiyî Zanebûneyî bi hev ve tête biliberkevtin, yanjî ew bi têgihiştina giştîyî bi hev re ya Beşêkî ji Zanebûnê ve tête biliberkevtin. Cuma

binivîsandin. Wan têde li ser mêjûwê, bijişkê, zanistîya şînatiyê, zanîstîya sitêran, sitêrgîrî, ciyografî û hinên din û pêrejî li ser felsefê û zanîstîyên oldarîyê didan binivîsandin. Ev reweşta hanê li Ewropa jî de li ser de dihate biçûyîn. Pêwist pê nayête bikirin, ku li vêderê de bête bigotin, ku Mohamed Emîn Zekî ji vê reweştê pir dûr dihate bidîtin..

Mêjûvanên wê pêlê mêjûwa musulmantîyê -yanjî filetîyê ji bal Mêjûvanên Suryanî de- li gora lidûhatina rûdanên demê de didan binivîsandin, ango wan ew bi rêk û pêkkirina salan ve ji mêjûwa koçkirinê de -Ordre chronologie bi Firensî yaxud bi Elemanî Chronologieschesordnung -(Raxistina Saldarîyê-Cuma)- didan binivîsandin. Wan bi her saleke koçî ve nala derîyekî bi serê xwe ve û bi rêk û pêk ve didan bidestpêkirin. Wan di nava wê salê de rûdanên hemû welatên Musulmanan -carcaran jî di derveyî wan de jî-didatin bitomarkirin, bêyî ku ew di nava wan rûdanan de tu pêwendîyan yanjî lêvenerandinan bidin biderxistin. -Wan digot, filan sal hat û têde ev û evaya hatin birudan). Ev nivîsandina mêjûwê bi şêweyekî pirî sade ve tête bidîtin, tevî ku di nava wan de agehdarîyên pir jî têtin bidîtin. Ev li ser Mêjûvanê niha de lêgerandinek sal bi dû sal ve li ser wan agehdarîyan de dide bineçarkirin. Hêjîbêtir girêdana wan rûdanên bi hev ve li ser wî de têtin bineçarkirin, yên ku ew jê re bi giringî ve têtin bidîtin. -Evaya bi xwe jî ve bi karekî pirî dujwar ve tête bidîtin, -heger ku nivîst ji navroka navên Merovan, cihan û ji danavan bête bibêpişk û bibêparkirin-).

Ne Mohamed Emîn Zekî û ne jî Şerefxan li ser vê rêya hanê de hatin biçûyîn. Herwehajî Mêjûvanên pêla musulmantîyê bi xwe jî ve

dev ji vê rêya hanê dane biberdan. Wan ligora danavan de yanjî bi kêmanî ve ligora heyaman ve û ne ligora salan de derî di mêjûwa xwe de dane bivekirin. Herwehajî Kurê Xelekan,- yê ku ew Kurd bû û ji herema Hewlêrê bû, ew di sedsalê sêzdehemînî zayînê de hate bijîyandin-, rêya nivîsandina mêjûwê mîna rêzkirina mêjûwa jîyana Peyên Gewre -Jîyannama wan- ligora rêxistina tîpan de date bipeydakirin yanjî bi kêmanî ve wî ew date bigiştîkirin[1]. Eveya jî niha jî bi mêjûwa jîyannamê ve -bi Firensî ve histoire biographique û bi Elmanî ve Biographischesgeschichte- tête binavkirin. Belam hinekan ji Mêjûvanên Yunanî û Romanîyên kevnar li pêşîya wîna de di vî warî de dabûn bixistin. Ev rêya hanê di dema meyî niha de -tevî li hin başbûnên wêna jî de- ne ji baştirîn rêyên mêjûyî tête bidîtin. Lêbelê ew "nala şaxekî jêberdayî" ji bona nivîsandina mêjûwê tête bidîtin.

Mohamed Emîn Zekî li ser vê rêya nivîsandina mejûwê de di nivîsta xwe de li ser "Peyên Bi nav û Bangên Kurd û Kurdistanê ve di pêla Musulmantîyê de" hate biçûyîn. Belê tiştên ku wî li ser wan de date binivîsandin, ew pir kurt, di xwendina xwe de zuha û ji lêvenerandînê vala bû, -pêrejî piranîya wan "Bi nav û Bangên Kurd ve" tevaya zanistî, wêje, lêgerandin û bi destkevtinên xwe ve ji bona karê oldariyê yanjî ji bona karê zanyariyên Miletên hemsayên xwe û

[1]Jiber hoyên pirbûna Nav û Nîşanên Oldarîyê yanjî Serdariyê, yên ku ew di pêla musulmantîyê de (Rikin El-Dewle, Imad El-Dîn, Selah El-Dîn ...) ji bona Peyên Bi Nav û Bang ve dihatin bidan, yanjî jiber hoyên Reweştên rojhilatî ve, yên ku ew cihê Pêşî ji bona navê Binemalê nade bidan, yê ku Merov wî Bav bi Bav ve ji Kalan ji xwe re didebi wergirtin, (belê piranîya caran jî Navê Binemalê Nifş bi Nifş ve dihate biveguhertin), bi hêsanî ve "Jîyannama" Meroveki nîşankirî nayête bidîtin, gava ku Mêjûvanekî Niha ji xwe re li van rengan de ji mêjûwên musulmantîyê dide bitemaşekirin. Min pir ji dema xwe date biwindakirin, da ku ez Jîyannama Selah El-Dînê Eyubî di "Wefiyat El-Eyan" de bidim bipeydakirin, ya ku ew di Şeş Bergên xwe de ji bal Kurê Xelekan hatîye binivîsandin. Danervan ew ne di bin navê "Selah El-Dîn" de û nejî di bin navê Eyubî" de dayite binivîsandin. Lêbelê wî ew di bin Navê Yusif bi Tîpa Î ve dayite binivîsandin. Eveya dide biderxistin, ku ev rêxistina Tîpan bi başî ve nayête bidîtin. Hêjîbêtir Lama Nîsana Erebî û pêvekirin wêna û ne pêvekirina wêna ji bona navan kanîyeke dinî şaşbûn û tevlihevbûnê dide biderxistin. Ismet Şerîf Wanlî

ne ji bona zanyarîya Miletê xwe dane bikaranîn. Kurd di bikaranîna zimanê xwe de di nivîsandinê de hatin biderengkevtin. Wehajî pêrejî gelemperîya wan di şîyarbûna milî de jî hatin bipaşvekevtin. Herwehajî kêrdarîya oldarîyê pir bi xurtî ve di pêla musulmantîyê de dihate binasîn[1].

Ez nadim binayînîkirin, ku ez ne pir bi wan "Bi nav û Bangan ve" -ji bil hinekan ji wan- dildarim. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Danervan pir karên mezin di wergirtina agehdarîyên ser wan de ji serçavîyên cudan de dane bikirin. Ev jî bi xwe jî ve cihê pesin û hêjabûnê jî tête bidîtin. Hêjîbêtir divê ku hêjakirina wan bi nav û Bangan ve ligorá heyamê wan de bête bikirin, da ku di bîrxistina wan de bi kêmanî ve ji bona Zaroyên Kurd kêr û şopên wan mirovan di sedsalan de ji bona xwendekarî û pêşvekevtina zanistîyên parêzvanî di rojhilat de bête bibîrxistin û da ku bête biderkevtin, bê ka wan Merovan çend beşdarî ji bona pêkanîn û geşbûna zanyarîyên Miletên rojhlatîyî hemsayên xwe dane bipêşkeşkirin.

---

[1]Ev rastîya hanê di seranserîya mêjûwa merovanyê de û di pêlên wêyî cudan de hatîye bidîtin. Şîyarvanên Vejandina Ewropa di hemû Welatên wê de û di herdu pêlên wê de bi nemankirina kêrdariya Ol ve di serên Merovan de bi xurtî û li ser bingehê Zanstiyê de dane bikarkirin. Bi saya xebata wan di sedsalê nozdehan de bi remana nemankirina Xwedê ve di nava dibustan, zanistgehan, dam û destgehên dewletê de hate bitacûxelatkirin. Oldarî ji nava serê Dewletê û destgehên wê de hate bipengizandin û ew di Kuncên Kenîştan û dêran de ji bona şûştina laş û termên Merovan hate bihiştin. Tevaya têgihiştina jînê li ser hîşê Merov de hate bihîm û warkirin. Rê û Bahn ji bona zanebûn û zanistîyê hate bitextûrastkirin. Civaka Merovanîyê di Ewropa de ji koçeke bilind di veguhertinên xwe de di her warekî jînê de date bidestpêkirin. Weha bi vî rengî ve sedsalê nozdehan bi saya karê Şiyarvanan bi bingehê pêşveçûna Merovanîye ve di vî sedsalê meyî niha de hate bikirin. Rast û durust rojhilat û herweahjî Kurdistan jî di sedsalê nozdehan de hate bihejandin û livandin, belam ew nihatin biserkevtin. Hêjî di vî sedsalê hanê de jî karekî pirî sext û dujwar li ber Şiyarvanên rojhilat û Kurdistanê de jî tête dîtin. Tevlivejî û tevlivê denrengîya hanê jî dê karê van Sîyarvanan biserkevtinê bête bi tac û xelatkirin; jiber ku evaya bi Qanûna Pêşvekivtina Jinê ve tête bidîtin. Li Oldariyê de bes û bi tenha ve divê zor rêz û hêjabûn jê re di kuncên kenîştan, dêran, mizgeftan û di hemû malên Xwedê de bête bigirtin. Cuma

Palpêdana bingehî ji bona mêjûwê di pêla musulmantîyê de ayînîyî -êdyolocîyî- oldarî bû, ango berzkirina ala musulmatîyê, agehdarîyên Qencvanan û ji bona Xwedê dihate bixebatkirin. Herwehajî bi vî rengî jî ve li Ewropa jî de di wê demê de û di sedsalên navînî de dihate bikirin. Evaya jî pir bi diyarî jî ve di mêjûwa Xacperestan de tête biderkevtin, ya ku ew di wê demê de hatîye binivîsandin. Têde mêldarî ji bona alîyekî bê alîyê din bi diyarî ve tête bidîtin. -Di çavên Musulmanan de Fireng "Kafir"-Ji rastîyê derkevtî, Cuma- bûn û di çavên Firengan de Musulman "Kafir" bûn. Cengên Xacperestan bi xwe ve di rastîyê de bes û bi tenha ve destpêkirina vegirtvanîya rojava ji bona welatên rojhilat di bin poşandina oldarîyê de dihate bidîtin. Di wê demê de rojava ji rojhilat bi kêmtirî şehrestanîyê ve dihate bidîtin[1]. Ev bi xwe jî ve danaveke bi serê xwe ve tête bidîtin.

Mêjû di hin demên berê de di rojhalat û rojava de mîna "Zanîstîyeke Sivik" lêdihate bitemaşekirin û armanca wîna jê di wergirtina serpêhatîyan û hînbûnên sinicî de ji bona zanebûna Padîşahan û perwerdekirina Zaroyên wan dihate bidîtin, -yanjî ew ji bona bi bîrxistina sersûrandin û pehlewanîyên Bav û Kalan ve ji bona "bikêfanîna" Dundên wan dihate bidîtin.

[1]Rêstika Dondetîyê li Firensa (û herwehajî di piranîya Ewropa de jî) di pêla Derebegîyê de tevaya erdên çandinîyê û navnîşanên Malbata Şehzadetîyê ji bona Kurê pêşîyî malê dihate bidan. Wetov tevaya birayên biçûktir bigir bê erd û keleh diman; jibervêjî piranîya Şehzadeyên Firensîyî Biçûk di Cengên Xaçperestan de hatin bibeşdarîkirin. Mebesta wan nebes tenê ku ew "hestîyên Isa ji nava destên Kafiran bidin birizgarîkirin" lêbelêjî wan dida bixwestin, ku ew ji xwe re erdan di Rojhilat de bidin bigirtin û li ser wan de Mîrneşînîyan bidin vuavakirin. Ismet Şerîf Wanlî

Mohamed Emîn Zekî mêjûwa xwe ne ji bona bikêfanîna giştî ve, ne ji ji bona perwerdekirina Şehzadan û nejî ji bona berzkirina ala musulmantîyê date binivîsandin, lêbelê wî ew ji bona wê mebestê, ya ku ew li jor de hatîye bigotin, dayite binivîsandin. Ango li paş ku Turkan ji bona berzkirina ala musulmantîyê de dev jê dane biberdan û wan dest bi berzkirina ala Turkîtiyê, bibîrxistina qehremanîyên wê û mêldarîya wê ve dane bikirin. Danervan tûşî şaşbûna xwîngerbûna milî ne bû, lêbelê wî xwest, ku ew mêjûwa Kurd bide bironahîkirin, ya ku ew di nava tarîyan de dihate bipoşandin. Wî li vir û dera hanê de dida bikarkirin, da ku ew ji wergirtina serpêhatîyên ji mêj ji bona amojgarîya Zaroyên Miletê xwe bide bikirin. Evaya bi xwe jî ve bi tiştekî serûştî ve tête bidîtin.

> Jiber ku musulmantî bi berdestkirina Bendan ve ji bona vîna Xwedan dide bidîtin, hîç Mêjûvanên pêla musulmantîyê guh bi liberxistina rûdanan ve nedan bidan. Wan ew hemû bi dûr û dirêjî ve dane binivîsandin, bêyî ku ew li wan de hîç lêvenerandinekê bidin bikirin yanjî hoyên wan bidin biderxistin.

Di vî warê hanê de mêjûwa Mohamed Emîn Zekî xwe pir ji mêjûwên rojhilatîyî xweparêzkirî di bîrxistina rûdanan de bi bêyî derxistina hoyan de nade bicudakirin. Ez dê carekê din ji bona ser vê danava hanê bêtim bivegerandin.

> Di warê ziman û şêwe de em di nivîstên pêla musulmantîyê de -û herwehajî di pêla Osmanî, Sefewî û Qacarîyê Îranî de- pir peyvên hîc û pûç û xemilandî - bi pesindana Xwedê û nîşanên Peyamberan ve, yaxud bi şelafîya pesindana Padîşahan û Şahzadeyan ve- didin bidîtin. Ev hîç û pûçbûna hanê jî di Şerefname de tête bidîtin, -gava ku ew li ser xwêsxwevanan de dide biaxivtin-; jiber ku reweşt di dawîya sedsalê şazdehan de wisa dihate bidîtin.

5. Mîna ku li jor de hatîye bigotin, Danervan Zanevan bû.

Ew ji baştirîn zanistgehên supahîyî hatibû biderkevtin. Wî bi zimanê Turkî, Erebî, Farisî ve û ligeljî de bi zimanê xweyî Kurdî jî ve dida bizanîn. Wî bi başî ve, mîna ku tête bidiyarkirin, bi zimanê Firensî, Elemanî û Ingilîzî jî ve didate bizanîn. Wî nivîştên bi wan zimanan ve date bixwendin, yên ku ew li ser Kurd û tevaya deverê de hatibûn binivîsandin.

Weha bi vî rengî ve mêjûwa wî di nava xwe de serçavîyên rojhilat û rojava bi hev re dane bikomkirin, yên ku Zanistvanên wan welatan di dema wî de li dû xwe de dabûn bihiştin. Ew di anîna serçavîyan de zor hûr bû û ew li ser peyivandina wan de zor dilsoz bû. Herwehajî berî ku ew dest bi nivîsandina mêjûwê ve bide bikirin, wî jimareke ji nivîsandinan li ser cengên Osmanî de dabûn bibelavkirin, -bi taybetî ve yên ku wî di wan de dabû bibeşdarîkirin-. Wî ev karên hanê hemû dabûn bikirin, berî ku ew li ser gerdena xwe de ronahîkirina mêjûwa Netewê xwe bide bihilgirtin. Belê hin ji agehdarîyên giring li ser Kurd de di kanîyên musulmantîyî kevnar de di ser Danervan de hatin biderbaskirin. Herwehajî wî li wan de bi rengekî têrkirî ve neda biiêvenerandin, da ku ew ji wan dîtineke giştî li ser ciyografîya Kurdistanê û zîneta Gelê Kurdîyî civakî de bide biderxistin.

Divê ez bidim bigotin, ku mêjûwa Mohamed Emîn Zekî nivîsta pêşîyî zanistîyî giştî ye, ya ku ew li ser mêjûwa Kurd û Kurdistanê de hatîye binivîsandin. Evaya bi xwe jî ve bi tiştekî pir mezin ve tête bidîtin. Cudabûn di navbera hiştiyên Danervan û hiştîyên Mêjûvanên dinî nihayî li dû wî de pir bi diyarî ve tête biderkevtin; jiber yên li dû wî de ne ew serpêhatîya wî, nejî ew zanyarîya wîyî giştî û nejî ew zanebûna wîna di lêgerandinên mêjûyîyî zanistîyî Ewropî de di rojhilat û rojava de li nik wan de dihate bidîtin.

Danervan pir bi dilsozî ve bîr û bawerîyên Karnasên Ewropî derbarê heyamên kevnarî Kurdistan de datin binivîsandin. Ez bawermendim, ku bi saya Mohamed Emîn Zekî ve dozandina Kurdan di destpêka van sî salan de bes û bi tenha ve li ser navên Bav û Bavpirên wan de hate bikirin, yên ku ew ji wan Miletên kokî ve têtin bidîtin, yên ku ew li Kurdistanê de berî hatina Midi, Goti, Lullobi,

Kassi-Kasi, Elami-Êlamî, Hurri-Huri, Subartu-Nayri-Xildi-Orarto-Wanî = Urartu = Khaldi -Chaldi- = Nairi = Subartu hatibûn bineşînîkirin.

Şerefname di vî warê hanê de zor ligel Mohamed Emîn Zekî de tête bicudakirin. Agehdarîyên Şerefname, heger ku ew ji nivîsandinên rûnkirin û biservekirinên Rexnevan û Belavvanên niha de bête birûtkirin, dê bes û bi tenha ve ew li ser bihîstîyên û goyên Pîran û rûnkirinên taybetîyî Şerfxan de bêtin dbiîtin, bêyî ku ew li ser belgeyên nivîsandîyî rojhilatî jî de bêtin bidîtin. Belam tevlivêjî de di beramberkirineke dadwerî de divê bête bigotin, ku demeke nêzîka ji sê û nîv Sedsalî de di navbera herdu Mêjûvanan de tête bidîtin. Miletê Kurd beramberî Şerefxan di nivîsandina wîyî pêşî de li ser mêjûwa Kurdistanê de û li ser agehdarîyên têde beramberî Eşîrên, Mîrneşînên, Reweştên pêla wîyî Derebegîyê de û ligeljî de li ser agehdarîyên ciyografî de bi deyndarî ve tête biderkevtin.

Heger Mero bikaribe bide bigotin, ku Şerefxan bi "Bavê Mêjûvanên Kurd" ve jiber pêşîbûna wîna tête bidîtin. Bi rastî jî ve ev nav û nîşana hanê jî pê tête bikevtin. Mohamed Emîn Zekî bi xwe jî ve bi Nuhvanê mêjûwa Kurd ve tête bidîtin, yê ku wî ew li ser bingehên zanistî de ligora rêzanan de - û di nava sînorên wê demê de, yên ku li ser wan de di destpêka sedsalên bîstan de dihatin biçûyîn-, datin bidanîn.

Dibe, ku Merov bikaribe Şerefxan ligel Mêjûvanê Ermenî Musa Khoren-Xorên de bide biberamberkirin, yê ku ew li gora piranîya baweryê de di sedsalê pêncehemînî zayînê de hatîya bijîyandin[1], li paş ku Padîşahê Ermenî û Miletê wî oldarîya filetîyê[2] ji

[1]Li gora nivîsta bi zimanê Elmanî ve: Drei Jahrtausende Arminien -Erministan di nava sê hezar sal de, Burchatd Brentjes, Leipzig, bê sal, rûpelê 74 de hatîye binivîsandin, ku Koriun Metran bû û ew di pêşîya sedsalê pêncehemînî zayînê de hatîye bijiyandin. Cuma

[2]Bi giştî ve sala 301 z. de bi mêjûwa daazanîna mîrîtîyî feletîkirina dewletê ve tête bidanin. Tevî ku Merov bi pirbûn ve jî sala 314 z. de dide bidîtin. Weha tête biderkevtin, ku Erminstan bi kevintirîn dewleta mayînîyî filetîyê ve tête bidîtin. Kanîya pêşî, rûpelê 7o. Cuma

xwe re dane biwergirtin û ji xwe re tîpên Eremenîyî welatî dane bidanîn. Xorên nivîstek di bin nav û nîşana "Mêjûwa Erministanê" de li dû xwe de bi zimanê welatê xwe ve û bi tîpên wîyî nuh ve date bihiştin. Ev nivîsta hanê bi zimanê Firensî ve di yek nivîstê de di du bergan de di sedsalê çûyîn de hate biçapkirin[1]. Musa Xorên bi mîrîtî ve "Bi Bavê Mêjwûa Ermenî ve" tête bidanîn. Xanîyekî wîyî şopkevnarîyî mezin li Erîvanê de di paytexata Erministanê de tête bidîtin. Ew yê pêşî bû, yê ku wî li ser mêjûwa Erministanê de dabû binivîsandin. Di nava "Herdu Bavan" de Bavê Ermenî û Bavê Kurdî de wekhevbûnek tête bidîtin. Herdukan pişta xwe bi goyên Bavpîran ve dabûn bigirêdan. Herdukan şêweyekî nivîsandinêyî bi pesin ve ji bona Xwedê û bi şelafîyê ve ji bona Padîşahan û Şehzadan dabûn bidagirtin. Xorên mêjûwa xwe li ser daxwaza Padîşahê Ermenî de date binivîsandin. Belam Şerfxan li Mîrneşînîya Bedlîsê de Mîrekî Serdar bû. Wer bes û bi tenha ve wekhevbûna wan ji van sînoran û pê ve nayête biderkevtin. Belê Şerefxan tevî dagirtina wîna bi wan pesin û şelafîyan jî ve ew zor di anîna agehdarîyan de hûr bû û ew ji bona rastîya wanî mêjûyî jî dilsoz bû. Wî hîç tiştek nedida binivîsandin, piştî ku ji wan piştrast nehata biderkevtin. Wî agehdarî nedidan bidubarekirin, heger ku jê li ser wan de nehata bigazinkirin. Ew Mêjûvanekî bêpaye bû. Wî sinorê zanistîya xwe dizanî. Herwehajî wî dizanî, ku bêpayebûn, gûmankirin û pirsîn ji bona rastîya tiştan ji rûçikên Mêjûvanin. Belam mêjûwa Xorên tevlihevbûneke ji sersurandinên agehdarîyên Bav û Bavpîran, evsanan, çîrokan û çîvanokên pîravokan, amojgarîyên sincî, pojinandinan û pir ji mezinkirinên milî dihate bidîtin. Têde anachronisme-Serbardayî- ango tevlihevbûnek ji bona heyaman û rûdanan bi rengekî pir kirêt ve dihate bidîtin[2]. Tevlivêjî de dibe, ku evsan bi xwe jî ve dengdana rûdanên

---

[1] Ji xwe re li nivîsta wîyî çapkirî de li Italya de bide bitemaşekirin. - Moise de Khorén; "Histoire d' Arménie", Venezia 1841. Ew bi zimanê Ermenî û Firensî ve di du bergan de hate biçapkirin. (Bi zimanî Ingilîzî ve navê wî wetov tête bipeyevandin: Moses of Khoren. Ismet Şerîf Wamlî

[2] Ji nimûneyên pir li ser tevlihevbûna Musa Xorên de li ser heyaman, rûdanan û evsanan de kirina wînayî Astyag Padîşahê Mêdî di sedsalê şeşemî berî zayînê de û Tigranê Mezinî Duwem- Padîşahê Erministanê, yê ku ew di sedsalê yekemîn berî zayînê de hatîye bijîyandin, di yek Sedsalî de hişt bêtin bijîyandin. Hêjîbêtir wî ev

kevnar bêtin bidîtin. Ji nivîsta Xorên bi kêmanî ve sud jê li ser dema wî de û ji agehdarîyên ciyografî û navên wan hereman tête bidîtin, yên ku "Mîdî" li hin cihan de di nava dilê Erministanê de li jorî çemê Res - Aras, Cuma- de dihatin birûniştin. Wer bi vê têgihiştina hanê jî ve mêjûwa wî ji bona mêjûwa Kurd bi sûd ve tête bidîtin. Bi xwe jî ve navê "Mîdi" û Kurdî" di zimanê Ermenî de û herwehajî di dîroknivîsandina Ermenî jî de mîna hevin. Mînoriskî jî vê mînahevbûna hanê dide bidîtin[1]. Herwehajî Nivîsvanê van rêzan vê

herdu Padîşah di ceng û şerên mezin de bi hev re datin biberamberkirin, ku di nava wan ceng û şeran de Pîravok û Şeytan jî hatin bibeşdarîkirin. Ji van çeng û şeran Tigran bi serfirazî ve hate biserkevtin û wî bi hezaran ji Mîdyan (Kurdan) ve bi dîlîtî û bendîtî ve ligel xwe de date bianîn û ew li Erministanê de dane bineşînîkirin. Danervan wan hereman dide bijimartin. (Ew hemû jî li jorî çemê Res û li hêlên Araratê têtin bikevtin). Ev çîroka hanêyî nigaşî hin caran jî ji bal jimarekê ji Mêjûvanên Ermenîyî (niha jî) tête biderkevtin, da ku ew mêjûwa Erminstana kevnar bi pesindana mezinbûnê û gewrebûna Padîşahên xwe û xortbûna wan ve bidin bixemilandin. Belê di nav van Mêjûvanan de û Mêjûvanên Ermenîyî bêtir rastir û dirustir remandikin, dê ezê careke din li ser wan de bêtim bivegerandin. Ismet Şerîf Wanlî

(Ev çîroka hanê di rûpele 48 kanîya pêşî de wer hatîye binivîsandin: "Piştî şikenadina wînayî pêsî (ji bal Roma, Cuma) di sala 82 berî zayînê de lihevhatinek li ser dirêjîya sînor de bi çemê Firatê ve ligel Rom de wî date bigirêdan. Wê gavê wî berê xwe ji bona ser Partan ve date biveguhertin, yên ku ew di wê demê de ji bal Sakischen-Sakîyên Asyanavînî de bi sînorê herifandinê ve hatibûn bigihandin. Hêzên Supahîyî Ermenî Hewlêr û Nîneva dane bivegirtin û bajarê Akbatana-Hemedan- paytextê kevnar datin bisûtandin. Herwehajî wî Surî jî date bivegirtin. Wî di paytextê xweyî nuh Tigranokerta de (li nêzîka Mêrdînê de?) 300 000 ji duwazdeh bajarên vegirtî ve ji bona danîştina wan di nava wê de dane biveguhestin". Cuma).

[1]ji xwe re li nivîsta wî de: Vladimier Minorsky. "Studies in Caucasian History - xwendekarîyên li ser mêjûwa Qefqasya de-", Lodon 1953 de, di 127 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

mînahevbûna hanê jî li nik Mêjûvanên Ermenî dide bidîtin, yên ku ew li paş Xorên de hatine bipeydakirin[1]. Bi dadgerî ve beramber bi Musa Xorên ve divê neyête bijibîrakirin, ku ew bi bigir nêzîka hezar salî ve berî Şerefxan hatîye bijîyandin.

6. Mêjûwa Mohamed Emîn Zekî ew jî rengekî ji "Mêjûwa Rûdanî" ye, ango ew li ser bi bîrxistina bûyînan, rûdanên ceng û şeran, agehdarîyên Padîşahan, Şahzadan, hêrişan, destânan û birçîbûnan de ligora reweşta piranîya Mêjûvanên destpêka sedsalê bîstan de dihate bihîmkirin.

Bi vê têgihiştina hanê ve mêjûwa wîna nêzîkî rêya "Dubistana Başbûnê" -Dubistana Positivismus, Cuma- tête bidîtin, ya ku ew di Elmanya de di pêşî de di sedsalê nozdehan de hate biderkevtin û ew li paş de di welatên din de jî hate bigiştîkirin. -ji xwe re li dirêjbûna vêna de di beşê duwem de bide bitemaşekirin-; jiber ku Danervan pişta xwe bi wan kanî û belgeyên nivîsandî ve dayite bigirêdan û wî ligel wan de jî dayite bipeyivandin û wî ew kanîyên hanê jî dane bibîrxistin û di dema pêwist de jî rexne li wan de dane bigirtin. Bi kurtî ve mêjûwa wî mêjûyeke zanistî ye. Bi serdejî ve mêjûwa wîna ji "zuhabûn" û sarbûna bubistana başîtîyê tête bidûrkirin, bi têgihiştina ku Mohamed Emîn Zekî xwe ji bîrxistina bîr û bawerîyên xwe û dildarîyên xwe ve bi rengekî tirazûkirî ve nade bibêpişk û bibêparkirin. Kesîtîya Danervan di bin barandina belgeyan û ligel hevpeyivandinên sade de nayête bipoşandin. Li vêderê de pêwist niye bête bibîrxistin, ku Şerefxan ev rêya hanê nizanî bû; jiber ku ew tanî endazekî di lêgerandina mêjûwê de bi nuhî ve tête biderkevtin. Herwehajî mîna ku

[1] Ji xwe re li lêgerandina minî belavkiri de bi zimanê Firensî ve di Belgeyên Kongirê Bîst û Nehê Rojhilatnasên NavDewletan de, li Parîsê de di sala 1973 de bide bitemaşekirin, yê ku ew li ser "Veguhestina Welatê Kurd ber bi Rojava de... hatîye binivîsandin. Ez li ser vê lêgerandina hanê de di jor de û di jîyanname xwe de hatime biaxivtin. Ismet Şerîf Wanlî

li jor de hatîye bigotin, mêjûwa Şerefxan ji belgeyên nivîsandî hatîye bibêpişk û bibeparkirin.

7. Mohamed Emîn Zekî nedaye bikarkirin, da ku ew hoyên kûr ji çûyîna mêjûwa Kurdistanê bide biderxistin, çi yên ku ew ji nava civaka Kurd û suwarbûna wêyî çînî yanjî ji "Dorhêla Siyasîyî" Giştîyî ji bona devera rojhilat yaxudjî ji kêra dorhêla ciyografî dihatin biderkevtin; jiber ku dorhêla Kurdistanêyî ciyografî bi xwe ve kêrek wêyî pir diyar li ser civaka Kurd de tête bidîtin. Heger ku evayajî beramber bi heyamên kevnar ve bi dujwarî ve jiber kêmbûna kanîyan ve dihate bidîtin, wî evayajî -bes û bi tenha ve bi rengekî tengalkirî ve- nejî beramber bi heyamên musulmantîyê jî ve nedate bikirin; tevî ku tanî radeyekî jî kanî ji bona wan heyaman jî dihatin bidîtin. Ev berê hanê di bîrxistina rûdan û saldanên wan de bêyî lêvenerandina hoyên kêrkirîyî kûr û giştîyî wan rûdanan bi nîşana vê Dubistana Rûdanan yanjî Dubistana Başbûnê ve bi rengekî giştî ve dihate bidîtin.

Pir caran Danervan hoyên rûdanan ji bona dildarîyên mirovantîyê didane bivegerandin, yên ku ew di nava dilên Serdaran, Padîşahan û Şehzadan de mîna rûmetê, kînê, dilbijandinê û dilbijandina xweyîtî, tûrebûn, tolwergirtin û yanjî tirsîtîyê dihatin bikelandin. -Wehajî wî jî date bikirin, mîna ku ew ji bal Hêrodot - Herodot di sala 484 de hatîye bizayîn û ew di sala 425 b. z. -beri zayînê- de hatîye Mirin. Cuma- "Bavê mêjûwê" û mîna ku ew di Metyolocîya[1] Yunanîyê kevnar de, -ya ku têde Xwedan destdirêjîyê di nava jîyana Merovan de di bin kêra dildarîya mirovanyê de didan bikirin)-, dihate bikirin. Vê lênerîna hanê ji bona mêjûwê nedida bitêrkirin.

Bi gotineke din ve mêjûwa Mohamed Emîn Zekî jiher

---

[1]Mythologie gotineke Yunanî-Latînî ye. Ew bi têgihîştina xwendekarîya Yunanî li ser Xwedê, Xwşexuwanîyê û Lêgerandinê de têtebi liberkevtin. Cuma

felsefeyekê mêjûwê -Ji bil hin ji pojinandinan beramber bi destanan, yên ku li vir û dera han de bi ser serê Miletê Kurd ve hatibûn bikevtin û derxistina derdên xwe ve- tête bibêpişk û biparkirin. Divê li ser vêna de li Danervan de neyête bigazinkirin; jiber ku liberxistina mêjûwê li paş zanîna wêna de têté bidîtin. Mêjûwa Kurdistanêyî kevnar berî Danervan û lêgerandinên Mamostên Bêganan, yên ku navên wan li jor de hate binivîsandin, hêjî di bin tarîyê de dihate bipoşandin. Ji bona Danervan bi serbilindîyeke pir mezin ve têtê bidîtin, ku wîna dikarîbû jimareke pir gewre ji agehdarîyan bide bikomkirin, ji yên ku ew ji hev belawela dihatin bidîtin. Ew bi xwe jî ve nala "Metiryalên Xav" têtin bidîtin û hêjî ew dikarin bêtin bikaranîn.
Belam felsefa Şerefxan ji vegerandina rûdanan ji bona vîna Xwedê yanjî xwestîya Şehrîyarên Gewre pê ve nedihate bidîtin.

8. Heger ku armanca Danervan berzkirina şopên Gelê Kurd û serfirazîya mêja wî bû, wî ji bona xwendekarîya destik, pêwendî û çînîyên civaka Kurd û zînetên Kurdistanêyê aburî di nava bajar û gundên wî de û pêşveketina van rewşan di seranserî mêjûwê de nedaye bikarkirin. -Bes û bi tenha ve wî ligora karînê de hoyên wan dayite biliberxistin-. Evjî wî ew bi rengekî kurt ve û di nava xêzên wêyî bingehî de dayite bikirin.

Li vederêjî de bi mafe ve nayête bidîtin, ku Merov gazinan ji bona ser Mohamed Emîn Zekî bide biavêtin; jiber ku xwendekarîya mêjûwa aburî, destik û pêwendîyên berkirinê berî Markisîtîyê hêjî dest pê nehatibû bikirin. Hêjî ev berê hanê di mêjûwê de ji zanistîyên mirovanîyî giring tanî demeke nêzîk jî nehatibû bidîtin. Xwendekariya rewş û dîyarîyên civakî-aburî, yên ku serên wan ligel şûreşa Firensî de hatin biderkevtin, nehatin bipêşvekevtin û ew nala zanistîyêkê bes û bi tenha ve di bin kêra "Dubistana Analîyî" Firensî de yanjî "Dubiustana Mêjûwa Nuh" de hatin bidîtîn, ya ku ew di sala 1929 de hate bisazkirin. Ew li paş Cenga Cîhanîyî Duwem de zor hate bipêşvekevtin. -Di beşê duwem de careke din li ser wê de dê bête biaxivtin.

Hêjî ji vê jî bêtir mêjûwa civakî-aburî nikare bi zanistî ve bête

bikirin, heger ku ew ne li ser bingehê belge û nivîsandên morkî bête bihîmkirin. Belê ew li ser belge, nivîsandinên morkirî û amaran de û ligel lêvenerandina wan de dikare bi zaniştî ve bête bikirin. Belê ew bi zanîstîyeke dijwar ve tête biderkevtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku di nava welatên rojhilat de -beramber bi heyamên kevnar ve-dijwarî bi gelekî ve ji dijwarîyên li Ewropa de jiber kêmbûn yanjî nebûna belgan û belgexanan bêtir dihatin bidîtin[1]. Dibe, ku Merov nikaribe mêjûwa civakî-aburî beramber bi rojhilat û Kurdistanê ve ji bil xêzên wêyî bingehî pê ve li ser liberkevtina belgeyên nivîsandî û şopên dozandî de ji bal zanistiya şopên kevnar de bide binivîsandin. Dozandina tîştekî kêm jî ji nebûna wî baştir tête biditin. Dibe, ku ez hin bîr û bawerîyên xwe di vî warî de di beşê rûnkirinan... de bidim biderxistin.

9. Em di mêjûwa Mohamed Emîn Zekî de wêneyekî li ser hunerên Kurdistanê û pêşvekevtina wan de di derbasbûna zeman de û di veguhertinên wan de ligel hunerên welatên hemsa de nadin bidîtin.

Kolandinên şopên kevnar rola Kurdistanêyî pirî baş di hunerên cudan de datin bicîkirin. -Belam zanistvanên şopên kevnar pir caran ew dozandinên karên xwe di deverên Kurd de ji mayînên "Anedolê" yanjî "Iraqê" yanjî "Îranê" heger ne"Faris", û carcaran jî ew ji bona "Erministanê" yanjî "Surî" didin bidanîn. Jiber van reweştên dûr ji bext liberkevtinên dirêj jê re nayête bidîtin, ku ev jî tête bikirin; jiber ku Gelê Kurd niha tu giranbûneke sîyasî û hebûnek jê re nayête bidîtin û jiber vê jî Zanistvanên şopên kevnar pêwist bi destûrdan û alîkarîya

[1]Di vir de ez ne di bîr û bawerîya Ismet de me. ne jiber wan hoyên hanê ev dijwarîyên hanê di Welatên Rojhilat de têtin bidîtin. Bi kurtî ve ew jiber kêmanî û yanjî nebûna bi sedan sal ve lêgerandinên zanistî di vî warê hanê de têtin bidîtin. Piranîya Welatên Rojhilat bi sedan sal ve di bin tarîya demê û rawestandinê de têtin biposandin. Ev erkê tar û markirina vê tarîya demê û rawestandinê bi xwe ve li ser milên Şiyarvanên Zanistvanên Rojhilat de tête bikevtin. Wer jî berî bi sedan sal jî ve Şiyarvanên Zanistvanên Ewropa ew erkê hanê ji bona ser şanênên xwe bi xurtî û mêrxasî ve dabûn bihildan. Belê jiber vê jî Welatên Ewropa bi vê armanca pêşvekevtina niha ve hatine bigihaştin. Cuma

wan Dewletan ve têtin bikirin, yên ku wan di nava xwe de dane parvekirin, da ku ew kolandinên xwe di nava salan de bidin bikirin û da ku ew jî pir carên din jî ji bona deverê bêtin bivegerandin.

Hunera avaniyê û bi taybeti ve avanîkirina kelehên mezin di cihên çiyayîyî sitratîcî de û anîna avê ji wan re di rêya cihok û kehrîzan de ji bona avdana çandinîyê ev bi xwe ji kevnar ve di Kurdistanê de bi hunerek pir bi nav û bang ve dihate biderkevtin. Vî şêweyê avanîyê li Kurdistanê de ji bona avanîya kelehan di nava welatên hemsan de û herwehajî pêrejî di Yunana kevnar de kêreke wêyî pir giran dihate bidîtin.

Herwehajî gotinên li ser hunera avaniyê û bi taybeti ve avanîya kelehên mezin de Merov dikare derbarê hunerên din jî bi têgihiştina teknolocî ve mîna saskirina destekên pêwistî ji bona çandinîyê û karên nava malê de jî bide bigotin[1]. Bi serdejî ve hin ji hunerên sipehîbûnê mîna narînê jî li Kurdistanê de hatine bisaskirin.

10. Mêjûvan ji bona dana remanekê li ser jîyan û şehristanîya Miletên Kurdistanî kevnar de nedaye bikarkirin, yên ku ew li ser wan de hatîye biaxivtin û yên ku wî ew bi navê "Desteyên Miletên Zagros" ji Gotî[2], Kasî[3], Xildî[1]-Wanî û hinên din dane binavkirin;

---

[1]Di warê çandinîyê de gewretirîn şureşa çandînîyê di seranseri dunyayê de ew li Kurdistanê de bi sazkirina gîsnê hesin ve hatîye bidîtin. Hêjîbêtir çandinî di nava çiyayên Kurdistanê de cara pêşîn di mêjûwa merovanyê de hatîye bidîtin. Ew ne mîna ku berê dihate bigotin, ku çandinî di cara pêşîn de di nava deştan de hatîye bikirin. Hêjîbêtir cara pêşîn di mêjûwa merovanyê de cenawerên kovî di rêya bizinê de di Kurdistanê de hatine bikedîkirin. Dibe, ku jiber vêjî bizin bi durujmê Mîdî ve hatîye bidanîn. Cuma

[2]Ji xwe re li ser Gutäer û Gutium -Gotîyan û Gotî de li nivîsta W. I. Awdijew, Wergerandina Elmanî de: Geschichte des alten Orients, Volk und Wissen Volkseigener Verlag Berlin, sala 1953, R. 58-60, 80, 357, 385 bide bitemaşekirin. Cuma

[3]Ji xwe re li ser Kassiten-Kasî li kanîya pêşîn de di r. 80-82, 337 û pelên tên, 362 bidin bitemaşekirin. Cuma

jiber ku van Miletan jî destekî wanî berz û bala di afirandina şehristanîya Asya rojava de tête bidîtin. Wî bes û bi tenha ve bi anîna navê hinekan ji Padîşahan, heremên ciyografî û bi raxistina agehdarîyên cengan ve di navbera Padîşahên Babilistan û Aşûr de date bitêrkirin. Dibe, ku ev jî jiber kêmbûna agehdarîyan di vî warê hanê de yanjî jiber reweşta gelekan ji Mêjûvanên rojavayî karnas di mêjûwa kevnarî welatê Nava Herdu Çeman de ji bona pesindana şehristanîya Somer, Babilistan û Aşûr û kêmkirina giringbûna Miletên Çîyayî dihate bikirin, yên ku ew di rojhilat û jorîn de -di Kurdistanê de- ji bona wan hemsa bûn. Bi vî rengî ve wan mêldarîya Todeyên deştan di xebata wanî hergavî de beramber bi Todeyên çiyan ve datin bikirin[2].

---

[1]Ji xwe di vî babetê Caldi-Xaldî de li kanîya pêşîn de li r. 373 û pelên tên, 341, 343, 355-357, 378 de bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Pir nimûneyên wisa ji van mêldarîyan beramber bi berjewendîya Tudeyên Mêzopotamya Xuwarê ve li ser kîsê Tudeyên Çiyan jî de ji bal Gewretirîn ji Karnasên Ewropî jî de em dibînin. Weha bi vî rengî ve di Combridge Ancient History ji bal Godd de tête bidîtin.

Ji Karnasên Rojavayî, yên ku ew bêtir beramber bi Tudeyên Kurdistana Kevnar ve bi bexttir bûn, divê em navê Mêjûvanê (Firensî) Georges Roux bidin bianîn, yê ku wî nivîsta xwe bi zimanê Ingilîzî ve di bin nav û nîşana: "Ancient Iraq", çapa Niyoyork, sala 1964 de date binivîsandin. Ew pir carên din jî hate biçapkirin. (Herwehajî Danervanê wê jî ew ji bona zimanê Firensî di sala 1990 de li paş hin serpêvekirinan de date biwergerandin. G. Roux di koka xwe de ne di danavê de karnas bû û nejî ew Mêjûvan bû, lêbelê ew Bijîşkvan bû û wî li Iraqê de dida bikarkirin. Wî dev ji bijîşkîyê jiber guhpêdana wîna ji bona zanistîya şopên kevnar date biberdan û ew di vî warê hanê yekek ji gewretirîn Zanistvanan tête bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

11. Mêja her Miletekî bi xêzeke demîyî li dûhev de tête bidîtin. Dem valabûn têde nayête bidîtin. Ligora hebûna agehdarîyên mêjûyî yanjî nebûna wan de ronahîkirina "Xêza Demê", ya ku ez wê wisa didim binavkirin, ji Miletekî ligel Miletekî din de û ji heyamekî ji bona heyamekî din tête bicudakirin.

Hîç Miletek di dunyayê de nayête bidîtin, ku ronahî ji bona ser tevaya "Xêza Dema wî" ji berzbûnê ji bona jêrbûna wî hatîye biavêtin. -Bes û bi tenha ve Miletên Hişkatîya Emerîkî ji vê rêzê biderin, heger ku em pêla neşînîkirina Ewropîyî nuh bi ber çavên xwe ve bidin bixistin û bajartîyên Tudeyên pêşî ji Hunudên Sor di ser guhên xwe re bidin biavêtin. Ev jî bi xwe jî ve bi rast ve nayête biderkevtin.

Mîna ku ji navnîşana mêjûwa Mohamed Emîn Zekî "Ji Destpêka Mêjûwê tanî vê rojê" tête biderkevtin, ku Danervan pir li ser lidûhevbûna "Xêza Demê" de di mêjûwa Kurdistanê de bi wirya ve dihate biderkevtin. Wî xwest, ku ew tevaya wê bi carekê ve bide bironahîkirin. Belam ew jiber hoyên hebûna berên pir û fireh piçekî hate biserkevtin; jiber ku ew hêjî di nava perên "Tarîyê" de dihatin bipoşandin. Ew li ser hebûna wan tarîyan de agehdar bû. Merov dikare mêja Miletekî bi filmekî sinemayîyî dirêjî bê sînor ve û ew bi serhev ve pêçayî bide bimînakirin. Heger Mêjûvanekî hozan bikaribe wî filmî bide bivekirin û wî li ser perda sîpî de bide biavêtin, dê ew jê hin perçên "Reş" bide bidîtin, yên ku ew bi dêrên agehdarîyên hilanînan ve di bîrweryê de hatine bireşkirin. Herwehajî ew têde perçeyên dinî "Sipîyî" vala ji dêran dide bidîtin, yên ku agehdarîyên wan di bîrweriya mirovanîye de hatine biwindakirin. Karê Mêjûvan di "Venivîsandina" rûpelên sipîyî vala de tête bidîtin. Dibe, ku ew bes û bi tenha ve bikaribe çend dêran bide binivîsandin. Bi pirbûn ve karê "Dagirtina Rûpelên Sîpî" pêwist bi xebata kom û nifşan ve ji Mêjûvanan tête bikirin. Pir bi kêmî ve hatîye bidîtin, ku ew bi dagirtina tevaya wan valabûnan ve bi carekê ve hatine biserkevtin.

Derbarê Miletê kurd jî jimarek ji "Rûpelên Sipîyî Vala" têtin bidîtin. -Bi gotineke din ve jimareke din ji "Berên Tarî" di xêza mêja

wî de têtin bidîtin, yên ku ew li bal wî de bi gelekî ve bêtir têtin bidîtin, ji yên ku ew li nik piranîya Miletên dinî nasîn de têtin bidîtin. Vêna jî Zimannas û Mêjûvanê Gurcî N. Mar, yê ku ew di karnasiya xwe de di pêla Qeyserî û herwehajî di pêla Sovyatî de qert bû, hişt, ku ew li Ser Kurd de bide bigotin: "Ev Miletê hanê ji bal mêjûwê de hatîye bijibîrkirin"!

Bi rastî jî ve divabû ku wî bida bigotin: "Ev Miletê hanê ji bal piranîya Mêjûvanan de hatîye bijibîrkirin", yanjî "Ew ji bal dîroknivîsandina Mîrî de hatîye bijibîrkirin". Her Miletek xwedan mêjû tête biderkevtin. Xêza demê jî çilo jî bête bidîtin, ew her û her bi bê birîn ve têtе bidîtin. Belam "Xêza Dema" Kurd bi pirt pirtî ve tête bidîtin. Ev jî jiber pir hoyan hate bidîtin. Yekekî giring ji van hoyan jiber ku tevaya kurd -di tevaya welatên xwe de- di bin navê xweyî niha de nehatine binaskirin. Ew bes û bi tenha ve ji destpêkirina pêla musulmantîyê ve bi vî navê hanê hatine binaskirin. Belê ew berî musulmantîyê di bin navên pirî cudan de ligora heremên ciyografî de, yên ku wan Kurdistan didan bipêkanîn, dihatin binavkirin, yanjî ew bi navên Miletên wê û Eşîrên wê dihatin binavkirin. Di nava wan jî de navê Mîdya -Mezin- û Mêdî, Ezerbêcan, ya ku ew Mîdya Biçûk bû, dihatin bidîtin. Ezirbêcan berî musulmantîyê û li paş wê jî de bi çend Sedsalan ve bi pirbûna perçên xwe ve û herwehajî tevrîzê bi xwe jî ve bi heremên Kurd ve dihatin bidîtin. Herwehajî di nava wan de jî Padîşahîya Kurdoîn[1] di Kurdistana navînî de ango heremên Hekarê, Behdînan, Bohtan, Mêrdîn û Torabidîna niha jî dihatin bidîtin. Ji wan jî di nava wan de Erministan -bi taybetî ve neşîva gola Wanê û jorî wê- dihatin bidîtin. Navê Erministanê navekî ciyografî bû û ew berî musulmantîyê mîna kaşên rengîn ji heremên Kurd û Ermenî dihate bipêkhatin û Kurd têde bi gelekî ve ji Eremenîyan kevintir dihatin bidîtin. Herwehajî di nava wan de jî Padîşahîya Adiabene-Adyabîn di devera soranî niha de di Kurdistana jêrîn de, ya ku ew bi darê zorê ve

[1]Ev gotina Kurdoîn di serçavên Yonanî de ji bona Kurd hatîye bigotin û bitomarkirin. Tanî vê roja me jî di devera Bahdînan de Kurdînî ji dêlava Kurdayetîyê, ya ku ew di devera Soran de jê re têtе bigotin, dibêjin. Herwehaj hêjî tevaya Kurmancan ji banga Kurdan Kurdino dibêjin. Cuma

bi Iraqê ve hatîye bipêvekirin, dihate bidîtin. Di dawî de jî "Mêzopotamya Jorî" jê dihate bidîtin, ya ku ew navekî ciyografî bû û wê beşek ji Kurdoîn û pêrejî welatên Diyarbekir, Orfa û Roha jî di nava xwe de dida bigirtin. Magelo dê çawan mêjûwa Kurd bi van hemû navan ve bête biliberkevtin?

Ev hemû navên hanê "Tayên Şaxkirî" didan biwênerkirin - heger ku Merov bikaribe weha li ser werîsê Kurd de- yanjî li ser şaxên dara Kurdistanê de bide biaxivtin. Karê Mêjûvan di girêdana van şaxan de bi darê ve û girêdana wan "Tayên Şaxkirî" bi hev re tête bidîtin, da ku suwarkirina xêza demêyî Kurdistan di seranserîya heyaman de bide bivegerandin û wê bi ronahîya rojê ve bide bironahîkirin. Evaya bi karekî pir dijwar ve tête biderkevtin. Belam ew bi rengekî giştî ve dikare bête bikirin; Heger ku Mêjûvan hemû anîn li ser Kurd de li nik Mêjûvanên pêşîyên Musulmanan de û ligel wan jî de Mêjûvanên Ermen û Suryanan de û pêrejî anîna hemû nivîsandinên li ser Miletên rojhilat de ji bal Kevnarên Mêjûvanên Yunan û Roman de û pêrejî anîna hemû dozandinên nihayî zanistîya şopên kevnar bide bicivandin û heger ku Mêjûvan bi têrbûna serpêhatî -û vejandina- xwe ve wan hemû "Libatên ji hevbelavkirî ji nû ve jê Gewdeyê wîyî giştî bide bipêkanîn". Tevlivêjî de dê hinek ji "Heremên Tarî" di Mêja Kurd de bête bihiştîn, -mîna ku ew li nik pir Miletên din jî de hatine bihiştin.

Mohamed Emnîn Zekî li ser nivîsandinên li ser Kurd de ji bal Mêjûvan û Çiyografîvanên pêla musulmantîyê de agehdar bû. -Belam mîna ku ew li jor de hatîye binivîsandin, Wî ew hemû nedan binavkirin û ji wan tiştên giring di ser guhên xwe re datin biavêtin-. Herwehajî ew li ser nivîsandinên li ser Kurd de ji bal Mêjûvanên Ermenî û Suryanî de, -yên ku di nava wan de agehdarîyên giring jî dihatin bidîtin-, ne agehdar bû. Mîna ku li jor de hatîye bigotin, wî pişta xwe bi Karnasên rojavayî ve dida bigirêdan. Pir caran jî wî ji wan re gotin dida bihiştin. Wer wî dida bixwestin, ku ew di rêya wan re û bi taybetî ve di rêya V. Minorsky-Minoriskî de wan agehdarîyên pet petkirî li ser Kurdên kevnar de ji bal Romanan û Yunanîyan de bide bianîn. Herwehajî pêrejî ew li ser kanîyên Osmanî û Farinsî jî de agehdar bû. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Minorsky-Minoriskî Zanistvanekî Ewropî bû û bi mezinaya saya serê wî ve mêjûwa Kurd

hate bironahîkirin. Lêbelê wî hemû pet petkirîyên li ser Kurd de ji bal Mêjûvanên Romanîyan û Yunanîyan de nedan bianîn. Hin ji pêguhnedanên wîna mîna Cewhera Sêweyî pir bi nerxî giring ve ji bona ronahîkirina mêja Kurd dihatin bidîtîn û bi taybetî ve ew ji bona mêjûwa Kurdistana jorîn ango neşîvîya gola Wanê, bilindîyên serên çîyayên Aladaxê li jorî Gola wanê de, newala Çemê Murad Su - Rubarê Jêrîyî Çemê Firatêyî Bilind- û mêrgên Bingolê dihatin bidîtin. Minorsky-Minoriskî pir zor giringbûna Miletên kokîyî Kurd, yên ku wan berî hatina Mîdî Kurdistan didan bipoşandin, di hebûnkirina suwarkirina milîyî Gelê Kurdî niha de û di şopên wîyî şehristanîyê de didate bikêmkirin. Belam Mohamed Emîn Zekî li ser wê rêya wî de neçû. Ev bi xwe jî ve bi pirseke pir tevlihev ve tête bidîtin. Divê lê careke din bête bivegerandin.

12. Ez Danervan li ser Bergê Yekem de ji Mêjûwa wîna di sala 1931 de didim bipîrozkirin, ango berî ku ji me re dozandinên zanîstîya şopên kevnar di salên pêncî û şêstî de bi rengekî dawîkirî ve dane bixuyanîkirin, ku Padîşahîya "Orarto"[1], -ligora navkirina ku Dûminên wêyî Aşûrî di tomarên xwe de dane bianîn-, ji bal Mîdîyan û ji bal yên li jêr ala wan de ji "Çeteyên" û "Hovên Mîdya" -ligora gotina tomarên Aşûrî de[2]- ango

[1]Bi dûr û dirêjî ve di derîyekî taybeti de di kanîya pêşîn de li ser Urartu-Orarato de ji r. 375-386 de hatîye binivîsandin. Herwehajî ji xwe re li ser van Miletên Kevnar de bi neqşên welatên wan ve ji xwe re li nivîsta wergerandina Elemanî de: Der Bibel Altlas: die Geschichte des Heiligen Landes 3000 Jahre vor Christus bis 200 Jahr nach Christus- mêjûwa welatê perest ji sala 3000 b. z tanî 200 Salî p. z. de, ligel 264 neqşan û gotarên wan de, ji bal Yohanan Aharoni/ Michael Avi-Yonah, Ausburg, Hamborg, sala 1990 de. bide bitemaşekirin û bi taybeti ve li ser neqşa Orarto de di neqşa 11 de û di r. 18 de ji xwe re bide bitemaşekirin. Ev pir nivîseket bi nerx ve û bi taybetî ve di warên neqşên xwe de çi ji alî bazirganîyê de û çî jî ji alîyê livandinên supahî de di Rojhilata Kevnar de tête bidîtin. Cuma

[2]"Çete" yanjî "Hov" ew bi zimanê Firensî, Ingilîzî û Elmanî ve Hordes tête bidekevtin. Ew bi têgihiştina mîna Hovan ve tête biliberkevtin, yên ku ew ji bil gerokîyê û sergurandinê pêve tiştekî din nizanin. Ismet Şerif Wanlî

(Horde bi Latînî û Turkî ve Supahekî bêser û ber û xurî tête biderkevtin.

> Eşîrên zimanê Iranî û gerok hate binabûdkirin, yên ku ew di neşîvîya gola Urmiyê de dihatin bicivandin. Wan dest bi hêrîşên xwe ve li ser devera Wanê de berî hêrîşa Mêdîyî dawî di sala 590 berî zayînê de dane bikirin. Ev Eşîrên gerok ji Eşîrên Scythes-Sîtî, Eşîrên Mard û Eşiren Kurt bûn, yên ku wan kelehên Wanê paytexta Padîşahîyê dane bivegirtin. Evanan bi xwe jî ve Desteyê Duwem ji Bavpîrên Kurd didin bipêkanîn.

Belê evaya dijî nivîsandîna Minoriskî û di rêya wî jî de dijî Mohamed Emîn zekî hate bidîtin. Herwehajî ew dijî bawermendîyên teyava Mêjûvanên rojava -û Ermenîyan- tanî dozandinên wan şopan hatin biderkevtin; jiber ku ew ne Bavpîrên Ermenî bûn, yên ku wan Padîşahîya Orarto dane binabûdkirin, lêbelê ew ji Bavpîrên Kurd ji Mîdîyan, ji Eşîrên Sît -Sikît-, Mard û Kurt bûn. -Yên ku wan navê Kurd didan bihilgirtin. Navên van Eşîrên Kurdîyî nîvgerok di diyarên Kurdistana jorîn de li hêlên Wanê de, li ser serên Aladax yanjî Subhan, Sîpan û Tendurek de, li newala Çemê Murad Su de, yê ku ew li nik Yunanî û Romanîyên kevnar de bi Çemê Arsanias ve dihate binavkirin, li nêzîka kanîyên Çemê Arax-Araks de û li ser bilindîyên Bîngol de berî zayîna Isa û li paş wî de jî ji bal Mêjûvanên Yunan û Roma kevnar de hatine binivîsandin, gava ku Roma bi hêrîşên xweyî Supahî ve ji bona van deverên dûr dihate rabûn. Evaya jî min li jor de bi "Cewhera Sêwî" date binîşankirin, ya ku ew têtê bidiyarkirin, ku bext ji bona Minorsky-Minoriskî ji bona dozandina wêna neda biyarîkirin. Dibe, ku wî ew guhpêdana giring pê neda bidan; jibervêjî ew li ser wî de nehate biaxivtin. Belam Mêjûvanekî dinî rojavayî Firensîyî nuh li paş Minorsky-Minoriskî de bi navê Louis Dilleuann -Lois Dilowan- ve nivistek bi carekê ve dewlemend bi belgeyên xwe ve di bin nav û nîşana "Mêzopotamya Bilndîyî Rojhilat û Welatên Dorhêla wê[1]" de date binivîsandin. Wî xwe di nava wê de ji bona nava

---

Cuma).

[1]Ji xwe re li nivîsta wîyî Firensî de: Louis Dellemann. "Haute Mésopotamie

derya nivîstxanên Yunanî û Romanîyî kevnar de date biqûlkirin. Wî ji me re ji qûlbûnên wan de ji bona tava rojê cewherên vê xizna veşartî date biderxistin.

Ez dê careke din ji bona ser vê danava hanê û lêgerandinên din bêtim bivegerandin. Ez ditirsim, ku xame min ber bi dûr ve bide birakişandin. Bi baştir ve tête bidîtin, ku ez li vêderê de wê bînim bidawîkirin, da ku ez di dawî de mêjûwa Mamostê meyî çûyî bidim bihêjakirin.

13. Hinek ji Zanevanên Kurd li ser mêjûwa Mohamed Emîn Zekî de didin bigazinkirin, ku ji xwendina wê hatin bidawîkirin, bêyî ku mêja Kurdistan ji wan re bête birûnkirin yanjî ew ji wan re bi rengekî têrkirî ve bête birûnkirin. Bi rastî jî ve divê Merov hinekî bi tarîbûnê ve li ser wê mêja kevnar de di xwendina nivîstê de bête bihestkirin, heger ku li bal Xwendevan de zanebûneke mêjûyîyî têrkirî neyête bipeydakirin. Dibe, ku hoya vê jî bête bidîtin; jiber ku Danervan hemû bidestkevtîyên xwe ji agehdarîyên pir nedane bikaranîn, yanjî wî hin pêlên tarî dane biservekirin, yanjî wî dest ji bona beramberkirinê û lêvenerandina hişî ji bona ronahîkirina wan dayite biavêtin, heger ku hin kêmanî di agehdarîyan de derbarê wan de bihata bidîtin. Herwehajî hin ji agehdarîyan bi destên wî ve nehatin bikevtin, ji yên ku ew ji bal zanistîya şopên kevnar de hatin bidozandin.

---

orientale et pays adjecents, ji Belavokên "Destgeha Zansitîya Şopên Firnsîyi Kevnar de li Berudê de" bide bitemaşekirin.

Ew di sala 1962 de li Parîsê de hate biçapkirin. Di nava nivîstê de jimareke pir ji neqşan li ser cihên Kurdistanêyî mêjûyî û rêyên wê de têtin bidîtin,yên ku hêrîşên Supahîyî Romanî di ser wan rêyan re ji bona nava wan cihan hatibûn bikirin. (Danervan bi xwe jî ve Efser bû. Di nivîsandina wî de pir devavêtin ji bona ser Kurd hate bikirin û herwehajî têde hinek çavnerînek baş ji bona liberxwedana Bavpîrên Kurd beramber bi Leşkerên Roma ve têtе bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

Herwehajî Danervan gelek ji agehdarîyên boşîtî di nava nivîsta xwe de li ser hev de dane bikomkirin, pir caran jî bêyî ku pêwendî di nava wan de bête bidîtin û yanjî wî xwe car caran jî di nivîsandina dirêjbûna hin ji rûdanan de didate biêsandin. Dibe, ku nivîsandina dirêjbûnan tiştekî bi sûd ve bête biderkevtin. Dibe, ku bibîrxistina rûdaneke biçûk, gotineke gotî yanjî dêreke nivîsandî pir bi liberkevtineke mezin ve ligora dema xwe de bête bidîtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku pirbûna agehdarîyên hatî û hatina wan di pir caran de bi bê rêk û pêkî ve yanjî bi bê lêvenerandineke têrkirî ve li bal Xwendevan de, yê ku ew li ser mêjûwê de nade bizanîn, hinekî hestekê li ser tarîya mêjê de dide bipeydakirin.

14. Her çilo jî ku bête bidîtin, mêjûwa Mohamed Emîn Zekî bi gelekî ve diyartir ji nivîsandinên hin ji Mêjûvanên Kurd tête bidîtin, ji yên ku ew li dû wî de hatine bipeydakirin. Ev jî bi taybetî ve derbarê heyamên kevnar de tête bidîtin; -jiber ku Mêjûvanên Kurd li dû wî de pir ji bona danaserhev ji agehdarîyan, dirêjbûnan, navên Merovan û navên ciyografîyî kevnar bi bê rêk û pêkxistinê ve û bi bê hîç kurtîyekê ve ji xwe re didane biçirandin-.

Lêbelê Danervan pir bi diyarî ve date biderxistin, ku Miletê Kurd ji hevdugirtina "Qata Miletên Pêşî" -Qefqasî ji wan re tête bigotin-, yên ku wan welatê Kurdistanê didane bipoşandin, ligel "Qata Duwemî" Iranîyî Ziman de, ya ku ew ji "Mîdîyan û Besteyên wan" dihate bipêkhatin, ya ku ew li dû Qata Yekem de ji bona nava Kurdistanê hate bineşînîkirin û wê Miletên pêşî date mimijandin, hate bipêkhatin.

Di vir de jî Danervan li ser bîr û bawerîya V. Minorsky-Minoriskî de nehate biçûyîn, tevî ku ew pir bi dilê wî ve dihate bidîtin. Ew li ser Perçeyê Iranîyî Hindîyî-Ewropî de di bûna Miletê Kurd de -ango Qata Duwem de- bêyî Miletên Qata Yekem de nedihate bisorkirin. Di bîr û bawerîya min de wî di vê bîr û bawerîya hanê de başî date bikirin. Hîç gûman têde nayê bidîtin, ku Miletê Kurdî niha bi

Şûngirvanên Miletên Qata Yekem ve têtin bidîtin, yên ku ew di Kurdistanê de dihatin bidaniştin û zimanê wan ne Kurdîyî Hindîyî-Ewropî dihate bidîtin. Lêbelê zimanê wan jî -ligora zalbûna bîr û bawerîyên zanistîyî niha de- "Qefqasî" bû. Herwehajî pêrejî Miletê Kurd bi vî endazî jî ji Nevîyên Mîdyan[1] û "Besteyên" wan ji Miletên Hindîyî-Ewropî tête bidîtin, yên ku zimanê wan arî bû û ew di nav Kurdistanê de dihatin bidaniştin û yên ku wan ligel xwe de navê "Kurd" û bingehê zimanê Kurdî datin bianîn. Belam zimanê Kurdî ji bona Kurdistanê ji derve mîna niha "nehatiye biwergirtin". Lêbelê ew li ser zemîna Kurdistanê de hate bipêşvekevtin, bi têgihiştina ku zimanê Îranîyî kevnar, yê ku Mîdyan, Mard, Kurt û Saka -"Besteyên Wan"- ligel xwe de dabûn bianîn û yên ku ew li Kurdistanê de hatibûn bidaniştin û yên ku wan Miletên Qata Yekem bi derbasbûna demê ve datin bimijandin, gotinên wan Miletên pêşînî û bi serdejî ve hin ji rêzanên zimamên wan -Substratat: ango ya ku ew di bînê de tête bihiştin-, -Binkevtî, Cuma- ji xwe re date biwergirtin. Herwehajî ew ligora niyazmendîya serûştîya Kurdistanê û reweşta Tudeyên wê de di avanîyê, berkirina çandinyê, xwedîkirina cenawer, nêçîr û ravê de hate bipêşvekevtin. Ev bipêşkevtina hanê bipêşkevtineke mîna wêna jî di zimanê Farisî de hate bidîtin, ya ku ew di Malbata Zimanên Îranî de bi Xweha Zimanê Kurdî ve tête bidîtin.

Tevlivîjî de gava ku ez ji xwe re di nava nigaş de didim bipojinandin. Bê ka çawan Eşîrên -Mard- û -Kurtîyên- Mîdî dihatin bijîyandin, yên ku wan Padîşahîya Orarto[2] di welatê Wanê de di nêzîka sala 590 berî zayînê de datin binabûdkirin. Bê ka çawan wan gundên xwe di dana buhar û havînê de didan biberdan û ew ligel Terşên xwe de ji bona nava çêrgên zozanan li ser qotên çiyayên Tenderuk û Aladax de, ji bona hêl û berên Araratê û ji bona neşîva

[1] Ji xwe li ser Meder-Mêdî de li nivîsta: Drei Jahrtausende Armenien- sê hezar Sal Erministan- de, Burchard Brentjes, Keohhler& Verlag, Lepzig, sala 1984 (çapa duwem; jiber ku çapa yekem di sala 1975 de hatîye bikirin), r.19, 32, 35 û 47 bide bitemaşekirin. Cuma

[2] Ji xwe re li kanîya pêşîn de li ser Urartu-Orarto û Orartîyan de di r. 19, 20, 23, 30, 31, 32, 33, 35, 47, 201 û 205 de bide bitemaşekirin. Cuma

Furatê bilind -Murad Sû- didane bikoçkirin. Bê ka çawan Suwarên wanî çekdarî xemilandî bi tîr, kevan û riman ve li ber welat û terşên xwe de beramber bi Leşkerên Romayî Hêrîşvanî berî zayîna Îsa ve didan bidan, ku li hêl û berên wan de li ser bilindayên kaş û zinaran de wêranîyên kelehên mezin dihatin bidîtin, yên ku Padîşahîya Orarto di nava wan navan de li dû xwe de dabûn bihiştin. Herwehajî di rexên wan kelehan de cihok û kehrîzên avê hêjbêtir berbend û golên avêyî çêkirî Padîşahên Orartoyî -ango Wan- dane bidurustkirin. -Ew ji Tudeyên "Qata Yekem" bûn-. Hest -yajî vejandin, heger ku ez vê gotina hanê ji xwe re bikaribim bidim bikaranîn,- bi min ve dide bipalpêdan, ku Minorsky-Minoriskî li ser rastîyê bû, Ku Kurdên sedsalê bîstan di nava wan navan de di Kurdistana Turkî de bi kêmanî ve ji Nevîyên wan Eşîran têtin biderkevtin.

Bajartîya "Qata Yekem" û bi taybetî ve bajartîya Urartu-Orarto di welatê Wanê de, ya ku ew ji bona ser depê mêjûwê piştî bêtir ji hezar salî ji derkevtina Gotîyan û Lollolbîyan di çiyayê Zagrosê de hatîye biderkevtin, bi gelekî ve bilindtir û pêşvekevtîtir ji bajartîya "Qata Duwemê" Mîdî dihate bidîtin. Belê hêjîbêtir ew, -mîna ku min şopên wê di devera Wanê û hêlên wê de di sala 1991 date bidîtin, nimûneyeke bi serê xwe ve di bajartîyên mirovanîyê de dide pêkanîn û ew ligel şehristanîya Misrîyî kevnar de tête biberamberkirin.

Cihê sersurandinê tête bidîtin, gava ku Hozanvan bi hûrbûn ve li vekirina veşartokeke dijwar yanjî pêleke mêjûyî bi tarîyê ve poşandî didin bitemaşekirin. Ew bes û bi tenha ve rûwekî ji rastîyê didin biditin, lêbelê ew wî ji nişkêve û bi hêz û hiner ve didin bidîtin. Wisa ew rê ji bona vekirina veşartokê didin bidurustkirin. Bi vê têgihiştina hanê ve Minorsky-Minoriskî Hozanvan bû.

Bi vî rengê hanê ve Kurdên "Qata Duwem" şehristanî ji "Qata Yekem" ji xwe re datin biwergirtin û wan keleh û bajar di seranserîya Kurdistanê de dane biavakirin. Herwehajî şehristanîya "Padîşahîya Wana" kevnar ji bona Daryos û Padîşahên Binemala Achèmènide-Axmenî û li paş de jî ji bona Etina û Yunana kevnar de bi nala nimûneyekê ve ji bona çûna li ser wê de hate bikirin. Bi rastî jî ve Mêjû bêtir dijwartir tête biderkevtin, mîna ku hin Merov wê ji xwe re didin biwênekirin. Têde bihevgirêdana şehristanîyan, tevlihevbûna Miletan, pirbûna kêrdarên cihî û deverî na hêjîbêtir kêra vînên Neferan

yajî rûdanên jiberxwe ve têten bidîtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Mohamed Emîn Zekî evaya dida bizanîn; jibervêjî wî Zarwên "Qata Yekem" ligel Zarwên "Qata Duwem" de dane bitevlihevkirin, da ku ew Miletê Kurdî niha ji wê tevlihevbûna di Lûle de bide biderxistin. Ew li ser rastîyê de bû. Kurd Nevîyên Mîdya ne. Belam Mîdya jî bi xwe jî ve mîna Fars date bikirin. Fars hemû Miletên berî xwe û şehristanîya wan li ser zemîna Îranê de ji xwe re date biwergirtin. Herwehajî Kurd û Zaroyên wî jî di Kurdistana jêrîn de piştî vegirtina Nîneva di sala 612 berî zayînê de datin bikirin. Herwehajî wan ev di Kurdistana jorîn de piştî vegirtina wan ji bona Wanê û kelehên wê li paş bîst salan de ji vegirtina Nîneva dane bikirin.

15. Danervan li ser destpêkirina şehristanîyê de di heyamên "berî Mêjûyê" de di nava Kurdistanê de di warê çandinîya dan de, di avanîkirina gundan de, di kedîkirina hin cenaweran de ji bizinan û berxan, yên ku ew kovî bûn[1], di warê veçêkirina hin ji alavên destikî ji bona hêsanîkirina karê Merov û jîna wî de ji berî bi deh hezar sal ji zayîna Isa ve di "Heyamê Kevirî Kevnarî" pêşî de ango -Palaeelithic-Palyolitik- nedaye biaxivtin.

Karnasên zanistîya şopên kevnar mîna D. A. E. Garrod[2], R. J. Braidwoodê[3] Emerîk û hinên din jî li pir cihên li Kurdistanê de dane

[1]Di vî warê kedîkirina cenawer de Burchar Brentjes bi zimanê Elemanî ve nivîstek taybetîyî pir bi nexr û hêja ve di bin nannîşana: Die Erfindung des Haustieres - Dozandina Cenawerê Malê-, di 138 rûpelan de, Leipzig sala 1975 de dayita biçapkirin. Cuma

[2]Vî Zanistvanê hanê Garrod D. A. E. ev nivstên hanê bi zimanê Ingilizî ve dane binivisandin: The Ston Age of Mount Carmel I, Oxford. sala 1937.

The Natfian Culture: The Life and Economy of an Mesolithic People in the Near East. In: Proceedinds the British Academy, Vol. XIIII, London, sala 1957. Cuma

[3]Vî Zanistvanê hanê Braidwood, R. J. ev nivîstên hanê li ser Kurdidistanê de bi zimanê Ingilîzî dane binivîsandin: Excavations in Iraqi-Kurdistan. In: Sumer, Bd. VII, Begdad, 195,1 S. 99-104.

bidozandin, ku têde şehristanîyê dayite bidestpêkirin, berî ku ew li Misrê û Mêzopotamya Xwarîn -Iraqa Erebîyî Niha- de bête bidestpêkirin[1]. Ji cihên Kurdistanê, ji yên ku têde Merovan dest bi şehristanîya xwe ve dane bikirin, Şikevta Shanidar-Şanidar[2] -li Behdinan de- û gundên Balka-Barda û Jarmo-Çarmo -nêzîka Çemçemal- û cihê Mazar-Merd -nêzîka Sulêmanîyê- û herwehajî cihên din di çiyayên Zagrosî "Mêzopotamya Jorîn de têtein bidîtin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku ew Merovê di wan cihan de hatîyê bijîyandin û wî li wêdere de dest bi şehristanîyê ve dayite bikirin, wî bi zimanê Kurdî ve nedidate biaxivtin. Em tu tiştî ne li ser remana wî de, li ser zimanî wî de û nejî li ser koka wî de didin bizanîn.

Belê Mohamed Emîn Zekî bi "Heyamên Mêjûyî Kevnar" ve date bidestpêkirin. Belam wî bi heyamên mêjûyî kevnarî berî mêjûwê ve nedaye bidestpêkirin; jiber ku ev dozandinên şopên kevnar di pêla

Braidwood, R. J./ Howe, b. Prehistoric Investigations in Iraqi Kuristan, Chcago 1960.

Braidwood, R. J. Seeking the World's first Farmers in Persian Kurdistan: A Fullscale Investigation of prehistoric sites near Kermanshah. In: ILN vom 22. 10. S. 695 f., sala 1960.

Braidwood, R. J./ Howe, b. / Reed, C. A.: The Iranian Prehistoric Project. In: Science vom 23. 6. Vo. 133, S. 2008 ff., sala 1961

Braidwood, R. J.: Further Remarks on Radioactive Carbon Age Determinaton and the Chronology of the Late Prehistiric and Protohistoric Near East. sala 1964. (In: Vorderasyatische Archäologie (Festschrift Moortgat), Berlin, S. 57 ff.). Cuma

[1]Ji xwe re li: Die orientalische Welt -Cîhana Rojhilat, Burchard Brentjes, Berlin, sala 1972 de bide bitemaşekirin. Cuma

[2]Di vî warê hanê de nivîsteke pir hêja û bi nerx ve bi zimanê Elemanî ve di bin navnîşana: Vom Schanidar bis Akkad-ji Şanidar tanî Akad, Burchard Brentjes, Urania-Verlag, Leipzig, Jena, Berlin, sala 1968 hatîye biçapkirin. Cuma

wî de hêjî ew nihatibûn bidozandin û binasîn. -Ezê careke din ji bona ser vê danavê di beşê duwem de dê bêtim bivegerandin-.

16. Derbarê Bergê Duwem ji Mêjûwa Mohamed Emîn Zekî de ango "Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd di Pêla Musulmantîyê" de Danervan li ser Dewlet û Şahînşahîyan de hatîye biaxivtin, yên ku Binemalên Kurd ew li derveyî Kurdistanê de mîna Dewleta Eyubî li Surî û Misrê de û hinin din jî mîna Mîrneşînîya Malbata Can Polat di çiyayê Libnanê de dane bisazkirin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku ev Dewlet û Mîrneşînîyên dawî em nikarin wan bi navê Kurd ve bidin binavkirin; jiber ku bes û bi tenha ve Serdarên wan di koka xwe de Kurd bûn. -Dr. Kemal Fuad di rexnê xwe de li ser wî de jiber bi navkirina wan bi "Kurdî" ve rast û durust bû-. Tevlivêjî de bibîrxistina hin ji agehdarîyên wan Dewletan û Mîrneşînîyan, yên ku Kurd ew li derveyî welatê xwe de dane bisazkirin, têde sûdeke mêjûyî û rewanî beramber bi Kurdên sedsalê bîstan ve tête bidîtin. Dibe, ku bi baştir ve bihata bidîtin, heger ku ew bi rûnkirinan ve bihata bitêrkirin û wî bida biderxistin, bê ka Miletê Kurd çî ji Miletên hemsayên xwe re daye bianîn û bê ka çawan Şehzade, Padîşah, Zanistvan û Serbazên wî beşdarî di mêjûwa wan Miletan de û di mêjûwa tevaya deverê de dane bikirin.

Belam derbarê Dewlet û Mîrneşînîyan de, yên ku Kurd ew li ser xaka Kurdistanê de dane bidamezirandin, divê li wan de nala Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd bête bitemaşekirin û pêrejî ev ji daxwaza dadgerîyê û rastîya mêjûwê bête biderkevtin. Heger ku zimanê wanî nivîsandinê jî di dam, destgeh û dîwanên wan de bi zimanê Erebî ve di pêla musulmantîyî kilasîkîyî pêşî de jî dihate bidîtin. Mîrneşînîyên wan di vî warî de ligel Mîrneşînî û Dewletên Farsîyî pir de nedihatin bicudakirin, yên ku ew di Îranê de di pêla Abasî de hatin biderkevtin. Ji van Mîrneşînî û Dewletên Kurd jî Dewleta Binemala AL Boye têe

bidîtin, -ya ku Binemala wan di koka xwe Deylemî bûn-. Divê li vêderê de bête bigotin, ku zimanê Quranê mîna zimanê Latînî ji bona Dewlet û Mîrneşînîyên Ewropa di sedsalên navîn de dihate biderkevtin. Belam Tudeyên wan Dewlet û Mîrneşînîyên Musulman, yên ku ew li ser zemîna Kurdistanê de hatin biderkevtin, Kurd bûn û ew bi Zinamê Kurdî ve dihatin biaxivtin.

Mêjûwa Dewleta Firensîyî nuh jî wer ew di sedsalê pêncehemînî zayîne de dide bidestpêkirin, ango piştî ku Frank-Fireng hatin bidaniştin, yên ku ew ji Êlên Cermanî bûn û ew di welatê Galliya-Galîya de, -ya ku bi Latînîya kevnar ve jê re dihate bigotin- û ya ku jê re niha Firensa tête bigotin, hatin bidaniştin. Li paş hatina Êlên Germanî de ji bona vî welatê hanê de navê wêyî Germanî ango navê Firensa nuh jê re hate bidan.

Wisa jî karekî wetov di Kurdistanê jî de hate bikirin, bi têgihiştina ku yekek ji Miletên Mîdî bêyî yên din, yê ku ew Miletê -Kurt- bû, navê xwe bi derbasbûna zeman ve ji bona tevaya welat û deveran date bidan, yên ku ew bi Kurdistan ve hatin binavkirin, yên ku wan berê pir navên cudan didatin bihilgirtin.

Belê damezrandina Dewleta Firensîyî nuh di sedsalê pêncehemînî zayînê de berî bûna zimanê Firensîyî nuh bi çend sedsalan ve hate bidîtin. Wisa jî ev karê hanê jî di wan Mîrneşînîyan de nehate bicudakirin, yên ku ew li ser zemîna Elmanya de di sedsalên navîn de hatin biderkevtin. Zimanê Latînî zimanê wanî nivîsandinê bû, mîna ku ew di Dewleta Firensîyî bi navkirî ve dihate bidîtin. Derbarê remanê û bawermendîyê de wê Dewleta Firensîyî hanê xwe bi "Keça Kenişta Mezin" ve dida binavkirin. Armanca Padîşahên wê di berzkirina nav û nîşana oldarîya filetîyê de dihate bidîtin. -Wetov bi carekê jî ve ev li nik hemû Dewlet û Mîrneşînîyên rojhilat de û di nava wan de jî li nik yên Kurd de ji bona berzkirina nav û nîşana musulmantîyê dihate bidîtin. Jibervêjî divê ku em Miletê xweyî Kurd ji van paşhiştinan nedin bibêpişk û bibêparkirin, yên ku ew ji bal wan Dewlet Mîrneşînîyan têtin biwênerkirin, yên ku ew li ser xaka Kurdistanê de di pêla musulmantîyî kilasîkî de û bi taybetî ve di destpêka sedsalê dehemînî zayinê de hatine bipêkhatin. Ji van jî Dewleta Dostekî -yaxud Merwanî-; di Kurdistana Turkîyî niha de, Dewleta Binemala Hesnewî di Kurdistana Îranê de, li paş wê de

Dewleta Xorşîdî di Loristan de, Dewleta Fezlewî yanjî hezarsipîd di Loristana Mezin -Bextiyarî- de, yên ku Serdar û Tudeyên wê Kurdê Lorî bûn, dihatin bidîtin. Herwehajî ji wan jî Dewleta "Rewadî" di Ezerbêcanê de tête biderkevtin, ya ku ew jî di sedsalê dehemînî zayînê de hate bipêkhatin. Navê wêyê rast ne "Rewadî" mîna ku ew ji bal Minorsky-Minoriskî hatîye bitomarkirin, belam ew bi "Rawendî" tête binavkirin. Ev navê hanê jî navekî Kurdîyî Îranîyî kevnar tête biderkevtin û ew berî musulmantîyê hatîye bidîtin.

Ez li ser vê danava hanê de di lêgerandineke din de bi zimanê Firensî ve hatime biaxivtin; jibervejî kês niye, ku ez li ser de bêtim birawestandin[1]. Navê bajarê "Rewandiz" -ango bi Kurdîya kevnar ve "Keleha Rewand") ji bona berî derkevtina musulmantîyê bi demekê dirêj ve tête bivegerandin. Belam mêjûwa Dewleta Rewandî hêjî pir bi tarîbûnê ve tête bipoşandin û Tudeyên wê ji Kurdên Deylemîne.

Ji mafeyê Miletê Farisî di paşhiştinên Dewleta musulmantîyê de tête bidîtin, ya ku ew di Îranê de di pêla musulmantîyê de hatîye biderkevtin. Ev jî, mîna ku ew li jor de li ser Kurd de hatîye bigotin, tête bidîtin. Ji van Dewletên Farisî jî Dewleta Samanid û Saffarid ji sedsalê nehemîn de, li paş de Dewleta Xeznewî û pêrejî Dewleta Buwayh têtin bidîtin. Derkevtinên van Dewlet û Mîrneşînîyan li ser erdên Faris û Kurdistanê de bi xwe jî ve nala "beramberkirineke" Farisî û Kurdî dijî zalbûna Ereb li ser welatên musulmantîyê de dihate biderkevtin, di dema ku hêz û hinera Xilafeta Ebasîyî supahî û siyasî dihatin bikêmkirin û ew bes û bi tenha ve di devera Iraqa Ereb de dihatin bikunckirin.- Wer li Dewleta Xilafeta Ebasî de hate bikirin, mîna ku li Dewleta Papên Katulîkîyî Taybetîyî bi wan ve di kuncekê

[1]Ji xwe re li lêgerandina minî belavkiri de bi zimanê Firensî ve di Kovara Italî "Rivista degli Studi Orientali" de Bergê Jimar "L" (Ango Pêncî) bide bitemaşekirin, ya ku ew ji bal Zanistgeha Roma di sala 1976 hatîye derkevtin. Ew di bin nav û nîşana: "Veguhestina Welatê Kurd ber bi rojava ve di navbera sedsalê dehemîn û panzdehemînî zayînê de: xwendekarîyeke ciyografî, civakî û Mêjûyî". Di bin vê nav û nîşana hanê de bi xwe jî ve ew di Belgeyên Kongirê Bîst û Nehê Rojhilatnsên NavDewletan de, li Parîsê de di sala 1973 de hatîye bibelavkirin. Belam hin pêvekirin di vê belavkirinê de têtin bidîtin, ku ew di Belavkirina Çapa Parîs de nayêtin bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

de ji bajarê Roma di destpêka dema vejandinê -Renaissance- de li Ewropa de hate bikirin.

V. Minorsky-Minoriskî vê pêla hanê, ya ku têde Dewletên Farisî û Kurdî ji destpêka sedssalên nehemînî yanjî dehemînî zayînê de dayite bidestpêkirin, bi rast û durustî ve bi "Iranian intermezzo" ango bi "Dema Navexweyî Iranî" ve dayite binavkirin. Di vê de, di dema ku tanî endazekî kurt de bû, di nava sedsalekî û du sedsalekî de mebest bû, ya ku têde Miletên Îranî, yên ku ew di Deylemî de di Faris de û di Kurd de di Kurdisrtanê de dihatin biwênerkirin, Kursîya rêberîya siyasî û uupahî di rojhilata musulmantîyê de dane bigirtin. Ev bi "Navxweyî" ve tête bidîtin; jiber ku dema Serdarîkirina Kurd-Deylemî -Îranî- li ser rojhilata musulmantîyê de di navbera dema Serdarîkirina Erebîyî berî xwe de û di navbera dema Serdarîkirina Turkîyî li paş xwe de hatîye bidîtin. Li ser vê dema hanê de bi dirêjî û hûrbûneke zanistî ve di nivîsta Minorsky de: "Studies in Caucasian History" hatîye binivîsandin. Li jor de li ser vê de cardî hatîye biaxivtin.

17. Ez li nik "Heleyan" de nayêm birawestandin, yên ku Mohamed Emîn Zekî li vir û dera han de di nava wan de hatîye bikevtin. Ev gotina "Heleyan" ji bona Kemal Fuad tête bivegerandin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku wî bi başî ve date bikirin, gava ku wî di pêşgotina xwe de, ya ku ew li jor de hatîye bigotin, ji bona hinan ji wan Heleyan dayite binîşandan.

Dibe, ku bi min ve neyête bikirin, ku ez "Heleyên" din bidim bicîkirin, yanjî ku ez wan bidim birastkirin. Dibe, ku ez bikaribim pir kêm ji wan jî bidim bidîtin. Ew "Heleyên" hanê bi karekî bê rev ve dihatin bidîtin û ew ji bona tevaya nivîsandinên wîna gelekî bêkêr bûn. Wan hîç giringbûna liduxwehiştinên Mohamed Emîn Zekî ji bona Miletê Kurd di nivîsandinên wî de nikarîbûn bidana bikêmkirin.

18. Mîna ku li jor de hatîya bigotin, ku Mohamed Emîn Zekî di nîvisandina nivîstên xwe de li ser Kurdistanê de zimanê Kurdî bi zaravayê jêrî ve dayite bikaranîn. Wî li

Şerefxan de ji bona nivîsandina mêjûwa wî bi zimanê Farisî ve dayite bigazinkirin. Di vê gazina hanê de sitembarî tête bidîtin. Divê li vêderê de bête bigotin, ku zimanê Kurdî hêjî di sedsalê şanzdehan de bi zimanê nivîsandinê ji bona nivisandîna mêjûwê nehatibû bikirin. Bes û bitenha ve pê xweşxuwanî dihatin binivîsandin. Herwehajî Şerefxan di "Pêşgotina Xweyî Etnolocî" de hoyê nivîsandina xwe bi zimanê Farisî ve date biderxistin; jiber ku ew di wê çaxê de zimanê wêje bû, ne bes tenê ji bona Faris û Kurd -lêbelê jî ji bona hinekan ji Turkan jî- dihate bidîtin. Ew zimanekî ji zimanê Kurdî nasîntir bû û ku bi saya zimanê Farisî ve û bi saya nivîsandinên wî ve "Şopên Lidûxwehiştîyên Padîşah û Şehzadeyên Gewreyên Kuristanê di Kuncên jibîrkirinê de dê nema bêtin bihiştin".

19. Min di jor de pir war dane bixuyanîkirin, ku Mohamed Emîn Zekî li ser wan de nehatîye biaxivtin. Hoyê hinekan ji bona ser neçûna wan nebûna agehdarîyan bû, yên ku ew îro di nava detstên me de têtin bidîtin, belam ew di dema wî de hêjî ji bal zanistîya mêjûwê de nahtibûn bidozandin. Her çilo jî bête bidîtin, zanebûna her Miletekî li ser mêja xwe de, çi Elman, çi Firensî, yanjî Erebî, Farisî û yajî Çînî ew bi encamê xebata nifşan ji Mêjûvanan ve tête bidîtin, yên ku her nifşekî ji nivîsandên nifşê berî xwe dayite bikarkirin. "Mêjûweke bi carekê ve" nayête bidîtin, lêbelê ew her û her ligel her nifşekî de û di her demekê de ligel pêşvekevtina şêweyê "Zanistîyên Alîkar" de tête binuhkirin û bikatkirin.

Ez naxwazim careke din li vêderê de başbûnên Mohamed Emîn Zekî, kûrbûna zanîstî û hûrbûna wî, piştrastîya wî di anîna nivîsandên berê wî de, qençîya wî li ser Zaroyên Miletê wî de li ser lidûhiştinên wî de ji nivîsandinan, yên ku wan gelek tarîbûn dane bitarûmarkirin, ya ku wê li ser mêjûwa Kurdistanê de û bi taybetî ve

mêjûwa wêyî kevnar û di çavên Kurdan bi xwe de dida bipoşandin, bidim bidubarekirin.

Lêbelê bes û bi tenha ve ez careke din dixwazim ji bona sadebûna wîna bidim binîşandan, ya ku ew ji rûçikên Sincîvanan têtê bidîtin û ji yên ku ew di endazîya "Rastîyên" mirovanîyê û pirbûna rûwên wê de têtin biliberkevtin. Danervan di pêşgotina xwe de ji bona sînorên zanebûna xwe -mîna her zanebûnekê- date binîşandan û wî ji Gencên Zanevanan date bixwestin, ku ew xebatê bidin bikirin, da ku ew wî karê wîyî destpêkrî ber bi dawîkirinê ve bidin bianîn.

Jiber rewşên Miletê Kurdî siyasîyî dijwar em nikarin pir çavdêrîyê ji Zanistvanên Miletên din çi ji rojava yanjî çi jî ji rojhilat bidin bihêvîkirin. Ango ku bi dawîkirina lêgerandinên li ser mêjûwa Kurdistanê de ev bi xwe ve erkê li ser şanên Mêjûvanên Kurd de ji vî nifşê û pêrejî ji nifşên tên tête bidîtin.-Herwehajî ayinda Kurdistanê tevî bawerîya hinekan jî ew bes û bi tenha ve di nava destên Zaroyên wê de têtê bidîtin û ew li ser bînferehbûn û karînên wan de di wênekirina destikên xebatê de, yên ku niyazmendîya demê û pêşvekevtina rewşê didin bixwestin, têtê birawestandin[1].

20. Ez dixwazim vê hêjabûna xwe ji bona nivîsandinên Mohamed Emîn Zekî bi dubarekirina xwe ve li ser rûçikekî de bidim bidawikirin, ya ku ew di nava nivîsandina her rûpelekî wî de têtê bidîtin, ev jî bi xwe jî ve mirovanîya wî bi xwe ye. Wî dest bi lêgerandinên xwe ve li ser mêjuwa Kurdistanê date bikirin, gava ku wî date bidîtin, ku Turkan dev ji girêdana musulmantîyê datin biberdan û wan dest bi pesindana Turkîtîya xwe ve dane bikirin. Wî gotinek bi tenha xwe

[1]Min ev danava hanê di lêgerandina ".....''de date biderxistin. Ev lêgerandina hanê Dr. Cuma ji bona kurmancî dayite biwergerandin û ji bona belavkirinê dayite biamadekirin. Ev lêgerandina hanê di pêşî de bi zimane Erebî (sala 1984 -Cuma) û li paş de di sala 1985 de bi zimanê Turkî hate bibelavjkirin. Ez nizanim, magelo dê kês bi min ve careke din ji bona vegerandin ser hin ji deqên wê li ser ronahîya pêşveketinên nuh de -di nava koma van lêgerandinan bête bikevtin? Ismet Şerîf Wanlî

ve neda binivîsandin, ku jê bêhna devavêtinê ji bona ser Turk, Ereb, Faris, Ezerî û Ermen tête biderkevtin. Hemû nivîsandinên wî bi germbûna hesta mirovanîyê ve têtin binîşankirin. milîbûna Kurdîbûna Mohamed Emîn Zekî bi serê xwe ve di mirovanîyê de bi xwe ve dihate bidîtin. Herwehajî wî li ser bawermendîya xwe de bi Musulmantiyê ve date biparastin.

Pir bi dûrîtî ve di navbera mêjûwa wî de û di nava berkirina xwîngerbûna milîyî Turkî, Farisî, Iraqî û Surî de ji "Mêjûwên" wan têtê bidîtin, yên ku ew bi devavêtin ve ji bona ser Miletê Kurd yanjî tanî nayînkirina hebûna wî, jibîrkirina şopên lidûhiştîyên wî, rola wîyî mezin di vejandina şehristanîya Asya rojavayî kevnar de, beşdarbûna wîna di şehristanîya musulmatîyê, dewlemendbûna wê û parastina wêna de bi şûrên Zaroyên xwe ve têtin binîşankirin. Xwezî Zanistvanên Ereb, Faris û Turk ji xwe re bi ser şopa Mohamed Emîn Zekî ve bihatana bikevtin!.

# Perçê Duwem

## Dîtin li ser zanîstîya mêjûwê, felsefa wê, şêweyê wê û pêşkevtina wêna de li Ewropa de ji pêla Hêrodot tanî niha de.

### Pêdeçûn

Bîr û bawerî û jê jî bawermendîyên oldarî û Metaphysik[1]-Metafizikî sînoran nadin binaskirin. Ew berambèr bi çiyan û çeman ve nayêtin bivegerandin, lêbelê ew di ser deryan re têtin biderbaskirin. Em wan ji heyamên kevnar dibînin, ku ew di nava heremeke ciyografî û ya din de û di nava navînîyên şehristanîyê de têtin biveguhestin. Wehajî bi vî rengê hanê jî ve veguhertinên şêweyên hunerî, rêyên berkirinê û destikan jî pir ji hev nayêtin bicudakirin, Mîna ku ev di pêla kevirî de, di destpêka çandinyê û kedîkirina pir celeban ji cenawerênn kovî de, bikaranîna qafikan û lajwerdan û di vejandina çerxê de hatîye bikirin. Veguhertina di warê bajartîyê de bi "Dema Hêdî" ve têtê bipîvandin. -Ji xwe re li Dubistana Enalî de bide bitemaşekirin). Ango ew pêwistî bi heyamên dirêj ve têtê bikirin. Ew nikare nîşanên taybetîyî heremekê ji ya din bide binabûdkirin û ev jî bi taybetî ve di jîna gundîtîyê de têtê bidîtin; jiber ku ew bi kêrdarên heremî ve û bi giranî û liberxwedana bawermendîyên gelêrîyî cihî ve

[1]Metaphysik: gotineke Yunanî û Latînî ye. Ew zanebûna tiştên dawî ye, (yên ku ew di ser her serpêhatîyeke merovanîyê de têtin bikevtin). Cuma

tête bizalkirin.

Derya sipîyî navînî ji heyamên kevnar de di nava Miletên jîndarên ser kenar, pêş û paş wê de her û her ew bêtir ji cudakirina wan de girêka gihandina wan dihate bidîtin. Wetov wan Miletan li ser rûwê avê wê de xwedan, bawermendî û zanebûn ligel kişt û kal de bi hev re didane biveguhertin. Jiber vê jî şehristanîya vê hêlê bi têgihiştina wêyî giştî ve Braudel-Birodêl, yê ku ew yekeke ji Serekên Dubistana Enalî ye, di nivîsteke xweyî pir dewlemend de lê dayite bitemaşekirin. Emê careke din ji bona ser wî bêtin bivegerandin.

Dibe, ku ev pêdeçûna bi pele ve bête bitêrikirin, da ku bête biliberkevtin, bê kanî çend merovatî û cihok di navbera mêjûwê de di rojhilata musulmantîyê de û di navbera vê zanistîya hanê de li Ewropa de di warê têgihiştina felsefê de û di kêra oldarîyê de têtin bidîtin, gava ku rojhilat û rojava -herdu berên hêlên derya sîpî- di warên cengên xaçperestîyê de berengarî hevdû hatin bikeftin. Ew cihokên hanê pevçûnê nedan bigirtin. Belê herwehajî qadên ceng û şeran di dirêjbûna dused salî de warên hevdîtinan jî dihatin bidîtin. Pêrejî welatê musulmantîyê -û bi taybetî ve welatê rojavayî Endelosî de roleke di veguhestina remana Yunanîyî kevnar de ji bona Ewropa rojava de di dawîya sedsalên navînî de date bilîstin.

Herwehajî zanistîya mêjûyî li Çînî jî de têtе bidîtin û ew ji tevan jî kevintir têtе bidîtin. Belam Çîn mîna cîhaneke bi serê xwe ve û dûr ji kêrdaran, yên ku pê Asya rojava, Ewropa û cîhan -bê nêrîn li vî sedsalê me de- têtin bisitirandin, têtе bidîtin. zanistîya mêjûwê têde di nava qalikê xwe de hate bikevirkirin. Xwendekariya zanistîya mêjûyê têde bi dijwar ve têtе bidîtin. Merov bigir nikare sedsalên wîyî demê -ji bil Zanistvan û Karnasên Çîni pê ve- bide binîşankirin. Pîvandina demê têde bi pêlên Binemalên Padîşahîyên wê têtе bipîvandin. Ji bona her Padîşahekî pêleke taybetî bi navê wî ve têtе bidîtin. Di pîvandina wîyî demê de sînorekî wîyî cihêkirî nayête bidîtin, da ku ew remanekê li ser kevintirîna rûdanan de bide bidan, mîna ku em di koçkirina Peyamber de didin bidîtin, ya ku têde jê jimartina salan ber bi pêş ve têtе bikirin, yanjî mîna ku zayîna Isa di mêjûwa rojava de têtе bidîtin, ya ku têde jê jimartina salan ji paş û pêş wê zayinê de têtе bikirin.

Bi başî ve têtе bidîtin, ku bi bîrxistin ve bête bikirin, ku sal di

salnama heyvîyî musulmantîyî-Erebî de kurttir ji sala rojê vê tête biderkevtin, mîna ku ew di salnama filetîyê -Girêgorîyê[1] de tête bidîtin. Di salnama musulmantîyî Îranî de meh li ser demsalên serûştî -zivistan, buhar, havîn û payizê- de nayêtin bisuwarkirin; jibervejî piranîya welatên Musulmanan salnama zayînê di sedsalê nuh de ji xwe re dane biwergirtin.

Mêjû bi rengekî giştî ve tête binasîn, ku ew zanistîya zanebûna rûdanên civatên mirovanyê di mêjû de û çawabûna lêgerandina wan û li paş de jî bi rastî û piştrastî ve raxistina wan tête bidîtin. Belam rastîya mêjûwê hergav bi endazî ve tête bidîtin. Merov dikare careke din lêbide bitemaşekirin û li ser ronahîyên nuh de û bi şêweyên nuh ve lêbidin bivenerandin. Pir nasînên din ji bona mêjûwê têtin bidîtin. Belam ez bi pêwist ve nadim bidîtin, ku ez wan tevan li vêderê de bidim biraxistin. Bes û bi tenha ve dide bitêrkirin, ku Merov ji xwe re di vî warî de li Insiklopêdîyeke baş de bide bitemaşekirin. Belê têgihiştina mêjûwê pir di nava sedsalan de çi ji alîyê Danervanan de, çî ji alîyên berên lêgerandinan û şêweyên lêgerandina wan de, çi ji alîyê dûrbûna demê de û çi jî ji alîyê mebest û awata -Ango felsefa-mêjûwê de hatîye biveguhertin. Piranîya van veguhertinên giring di têgihiştîn û şêweyê wê de di sedsalên bîstan de di bingehî de bi saya dubistana "Mêjûwa Nuhî" Firensî yanjî "Dubistana Analî" ve hatine bidîtin. Em dê wan di nava rûpelên tên de bidin bidîtin. Merov nikare mêjûwê ji ciyografya bide bicudakirin, bi têgihiştina ku erd bi "Qadê" ve tête bidîtin, ya ku li ser wê de rûdanên civakên merovanîyê hatine bikirin û yên ku ew di pêşvekevtina wan civakên merovanyê de didin bikêrkirin. Herwehajî pêrejî pêşvekevtina civakên merovanîyê bi xwe jî ve li ser dorhêla ciyografî de dide bikêrkirin[2].

---

[1]Gregorê XIII di sala 1502-1585 z. de hatîye bijîyandin. Ew ji sala 1572 z. de Papa bû. Wî karên dijî Refomation-venuhkirina Oldarîyê datin bikirin. Herwehajî wî Salnama Girêgorî date bibikaranîn, ya ku ew li ser rêstika rojê de dihate bingehkirin. Ev rêstika rojê ji bal Misrîyên Kevar de bi hezaran sal ve berî zayînê hatîye bidozandin. Ins. Ele., R. 376. Cuma

[2]Du deqên giring di pêşvekevtina civakên merovanyê de divê li wan de bi hûrî û kûrî ve bête bitemaşekirin: 1. Dorhêla ciyografî û 2. Tîrbûna Xelkê-(kêmbûn yanjî pirbûna Merovan di cîhekî nîşankirî de)-. Pir bi derngî ve Mêjûvanan ev herdu deqên

Beramber bi serçavîyên rûdanên vî beşê hanê ve û herwehajî beramber bi serçavîyên dubistanên mêjûyîyî tên ve, mîna ku min ew li jor de di pêşgotinê de dayite bixuyanîkirin, dê ezê lîsteyekê ji nivîstên helbijartî di dawîya vî beşî de bidim bianîn, yajî dê ezê wan di nava rûnkirinan de di cihê pêwist de bidim bidanîn.

Belam lêvenerandinên felsefî, êdyolocî, siyasî û civakî bes û bi tenha ve bîr û bawerîyên min bi xwe ve didin biderxistin. Herwehajî wisajî ev jî di derbarê hêjakirina nivîstên Mêjûvanan û Feylesufan jî tête bidîtin, yên ku li ser wan de li jêr de dê bêtin biaxivtin.

Derbarê bi rêk û pêkxisina "Dubistanên Mêjûyî" de min bi rengekî giştî ve pişta xwe bi rêk û pêkxistina Mamoste Ch. -O. Carbonell dayite bigirêdan -Ji xwe re li lîsta nivîstan bide bitemaşekirin-; jiber ku min ew ji tevan baştir dayête bidîtin. Belam min hinek ji wê bi rêk û pêkxistinê ve bi azadî ve date biveguhertin. Herwehajî min ji bona wan Dubistana Markisî jî date biservekirin; jiber ku wî li ser wê de tîpek jî nedabû binivîsandin. Hêjîbêtir min kurtîyek li ser jîn û karên wan Mêjûvanan de date biservekirin.

## 1. Mêjû di Yunan û Roma Kevnar de

Bi nasîn ve tête bidîtin, Ku "Bavê mêjûwê" Hérodote -Herodot bi zimanê Elemanî ve -Cuma -Hêrodotê- Yunanî tête bidîtin, yê ku ew bigir ji sala 485-425 berî zayînê hatîye bijîyandin[1]. Wî nivîstek di bin

hanê guh bi wan ve dane bidan.

Têgihiştina van herdu deqan di mêjûwa Kurdistanê de ji me re pir tarîyan didin bironahîkirin. Herwehajî pêrejî bi têgihiştina van herdu deqan ve em dikarin Kurdistana xwe bi başî ve bidin birizgarîkirin û bipêşvexistin. Cuma

[1]Herodot-Hêrodot di Insiklopêdîya Elanîyî Biçuk de: Meyars Taschen Lexikon, Leipzig, sala 1963 de, R. 417 de hatîye nivîsandin, ku ew li dora sala 484-425 berî zayînê de haytîye bijîyandin. Ismet dibêje, ku ew bigir ji 485-425 hatîyebi jîyandin. Cuma

nav û nîşana "Hostoriè" ango "Mêjû" de -bi pirî ve- date binivîsandin. Belam ev gotina hanê di wê demê de bi zimanê Yunanî ve bi "lêgerandinê" ve -bi Firensî Enquêtè ve û bi zimanê Elemanî ve Untersuchung- dihate biliberkevtin. Ev navnîşana hanê jî îro bi rewşt ve ji bona nivîsta wîna têtе bidan. Nivîst bi serê xwe ve rûdanên cengan dide biraxistin, yên ku Yunanê ew bi "cengên Mîdî" ve didane binavkirin. Bi rastî ve divabûn ku ew bi "cengên Farisî" ve bêtin binavkirin. Divê li vêderê de bête bigotin, ku ew di sala 490 berî zayînê de -berî pênç salan ji bûyîna Danervan- datin bidestpêkirin û ew di sala 479 berî zayînê de hatin bidawîkirin, -gava ku temenê wî nêzîka şêst salî dihate biderkevtin-. Hêrîşên Şahînşahîya Farisîyî Axmenî li ser Yunanê de tanî Etina bi Leşkerên pir giran û mezin ve ji pir Miletên cudan -ji wan jî Mêdî û Mard Bavpîrên Kurd jî- dihatin nikirin. Li paş de cîhana Îranî beramber bi liberxwedana Yunanî ve di derbendê Thermophles û di ziyana Şahînşah Xerxès -Xeşyarşe bi Îranî ve- Axmenî de di şikestina keşteyên wîyî cengînî de di şerê salamine de di sala 480 berî zayînê de hate bidîtin.

Cîhana Yunanî di wê çaxê de ji Yunana niha, Makdonyen, Kenarê rojavayî Asya Bîçûk li ser Derya Îce û Tirakya de, Kenarê Misrî li ser Derya Sipîyî Navîtî de, Perçeyek ji Jêrî Îtalya û Giravên Biçûk û Mezin, yên ku ew di nîvê rojhilatî Derya Navîtîyî Sipî de têtin bikevtin, dihate bipêkhatin. Yunan di berzbûna lutkê şehristanîya xwe de di warên pêşvekevtina zanistîyê, huner, wêje, bazirganîyê û jîyana bajartîyê û siyasîya xwe de dihate bidîtin. Wan ji bil xwe pê ve hemû Miletên din bi Barbares-Babar[1] çi ji Ewropîyan, çi ji Rojhilatîyan, çi ji Asîyan û yanjî çi ji Afrîqîyan didatin bidîtin.

Heyamê Herodot-Hêrodot yanjî piçekî li paş wî de jimarek ji gewretirîn remangîrên Yunanî date bidîtin. Ji wan jî Feylesofên Socrate-bi Firensî û bi Elmanî Sokrates-Soqrat[2] -di sala 470-399 b. z.

---

[1]Ev gotina hanê di zimanê Kurdî zaravayê kurmancî de jî ji bona wan Merovan têtе bigotin, yên ku ew mîna Merovên hovên cengelan didin bidengkirin. Wisajî ev gotina hanê di têgihiştina xwe de di Yunanî û Kurdî de mîna hev têtе biderkevtin. Cuma

[2]Ji xwe re di vî warê hanê de bi zimanê Elemanî ve li ser Heraklit, Gorgias-

de[1]-, Platon-Pilaton-Eflaton -di sala 428-348 b. z. de[2]-, Bertaş Phidias-Fidyas -di nêzîka sala 490-430 b. z. de[3]-, Nîgarkês Polygnote-bi Elemanî Polygnot-Polîgnot -nêzîka 500-440 b. z. de-, Nivîsvanên Sophocle -bi Elmanî ve Sophokles-Sofoklês[4] û Hemsayê wî Euripide-Oyripidês[5] û Hipponate-Hippokrates-Hippokratês[6] "Bavê Pijîşkiyê" dihatin bidîtin. Hêrodot ji Pêşîvanên Yunanî tête bidîtin, yê ku wî zimanê Yunanî mîna zimanê pexşanê dayite bikaranîn -jiber ku ew bi xweşxuwanî ji pêla Homère-Homêr[7] xwedîyê Iliade-Ilyade û Odyssèe, yê ku ew di sedsalê nehemî berî zayînê de hatîye bijîyandin, dihate binivîsandin. Hêrodot ne Mêjûvanê Yunanîyî pêşî bû. Hecateè-Hêkatê -di nêzîka sala 540-480 b. z. de- berî wî bû. Belam nivîsandên wî hatin biwindakirin. Navê wî û hin ji bîr û bawerîyên wî li nik Hêrodot de hatine binivîsandin.

---

Gorgiyas, Demokrit, Xenophon-Xenefon, Platon-Pilato, Aristoteles-Aristo, Cicero-Sîsero, Lukrez, Horaz û Plotin-Pilotin de di "Ästhetik der Antike" -Sipehîbûn di Entîkê de, ji bal Joachim Kruger, Aufbau-Verlag, Berlin sala 1983 de bidin bitemaşekirin. Cuma

[1]Di Insiklopêdîya Elanîyî Biçûk de ew di sala 369-399 de b. z. de hatîye bijîyandin. R. 931. Cuma

[2]Plato(n) di sala 427-347 b. z. de hatîye bijîyandin. Kaniya pêşîn, r. 775. Cuma

[3]Phidias-Fidyas bigir di navbera sala 475-430 b. z. de hatîye bijîyandin. Kanîya pêşîn, r. 764. Cuma

[4]Sophokles-Sofoklês di sala 496-406 b. z. de hatîye bijîyandin, Kanîya pêşîn, r. 934. Cuma

[5]Euripides-Oyripidês di sala 480-406 b. z. de hatîya bijîyandin. Kanîya pêşîn, r. 278. Cuma

[6]Hippokrates di sala 460 b. z. de hatîyê bizayîn û ew di nêzîka sala 377 b. z. de hatîye bimirin. Kanîya pêşîn, R. 422. Cuma

[7]Homer-Hemores-Homêr wî Illias-Ilyas û Odysse-Odisê dane binivîsandin. Kanîya pêşîn, r. 431. Cuma

Cîhana Yunanî bê yekitîyeke sîyasî dihate bidîtin. Bes û bi tenha ve ew di rêya yekitîya ziman û şehristanîyê de dihate biyekkirin. Ew ji bona pir Dewletên Biçûk dihate biparvekirin û wan di nava xwe de ji bona zalbûnê li ser rêyên bazirganîyên deryayî û bejayî de didan bipevçûnkirin. Hin ji van Dewletên Biçûk li ser -Rêstika Demokrasyê-de diçûn, ya ku wê azadîya remanê û pirbûna sîyasî dida bigirawkirin, mîna ku ev li Etina de dihate bidîtin. Hin din ji wan Dewletên Biçûk ji bona -Rêstika Oligarchie-Oligarşî- -ango Serdarîya Binemalên Eristokratî- dihatin bijêrkirin, mîna ku ev li Sparta-Sparta de di perçeyekî ji nîv girava Péloponnèse-pêloponesê dihate bidîtin.

Gotina "Demokrasî" ew gotineke Yunanî ye û ew ji "Demos-cratos ango ji "Serdarîya Milet" tête bisuwarkirin. Belam azadîyên demokrasî bes û bi tenha ve ji bona Neşînvanan û ji bona hin ji Bîyanîyan, yên ku ew hergav di bajêr de dihatin birûniştin, dihatin bigirawkirin. Belam ew ji bona Bendan nedihatin bidîtin.

Gaya ku metirsîya Îranî ji rojhilat ji bona bajar û Dewletên Bîcûkî Yunanîyî li ser kenarên rojavayî Asya Bîçûk de hate biberzkirin, wan bajar û Dewletên Biçûk hewarên xwe ji bona Serdarîyên û bajarên Yunanîyî din dane bibirin. Wan hinekî di merivîtiya xwe de jiber pevçûnên di nava xwe de dane bidudilîkirin, lêbelê di dawî de wan demekê ji bona dûrkirina metirsîyê hevdû dane bigirtin.

Em pir kêm li ser jîyana Hêrodot de didin bizanîn. Ew di bajarê Halicarnasse-Helikarsos[1] de, ya ku ew li ser kenarê jêrî rojavayî Esya Biçûk de tête bikevtin -û ew niha bi bajarê Bodrum Turkî ve tête binavkirin-, hatîye bizayîn. Ew ji Malbeteke cihîyî bideshilatî bû û wê di bazirganîyê de dida bikarkirin. dibe, ku ew Malbata hanê jî ji Xanedanan bû. Wî pir ji Padîşaha Artemise-Artemis dida bihejkirin,

[1]Halikarnassos: Bajerekî Yunanîyî krvnare. Ew li ser kenarê jêrî rojavayî Asya Biçûk de tête bikevtin. Têde avanîya aramgeha Turan-Sitemkar- Mausolos-Mawsolos tête bidîtin, yê ku ew di sala 353 berî zayînê de hatîye bijîyandin. Aramgeha -Avanîya Goristana- Masolos Yekek ji hevft sersurandinên dunyayê tête biderkevtin, ji ya ku ew berî zayînê di dema kevnar de hatîye bidurustkirin. Li vî bajarê Halikanasos de Herodot-Herodot, Kalimachos-Kalmaxos û Dionysios-Diyonisiyos jî hatine bizayîn. Ins. El., R. 397. Cuma

ya ku wê bajar dida biserdarîkirin û ya ku wê di keçanîya xwe de di cengên dijî Îranîyan de dayite bibeşdarîkirin. Li paş de bajar ji bona nava lepên Diktator Lygdamos-Ligdamos hate bikevtin. Hêrodot ji bona nava Berberên wî hate bikevtin û wî di pişt re ji bona nava girava Samos date bibarkirin. Wî li wêderê de piranîya nivîstên xwe datin binivîsandin. Ew di nêzîka sala 455 berî zayînê de ji bona bajarê Etina hate biçûyîn, nav û banga wî berî gihiştina wî bi bajêr ve hatibû bigihaştin; jibervêjî Serdarê Demokaratîyî bajêr Perikles[1]-Pêriklês, -yê ku ew di 495-429 b. z. de hatîye bijîyandin-, pêşewazî lê date bikirin û ew ligel jimarekê ji Nivîsvanan û Hunervanan bi nêzîkvanên Pêriklês hatin bikirin. Ew salekî yanjî du salan li bajarê Etina de hate bijîyandin. mêjûwa wî di civatên giştî de dihate bixwendin û wê diyarîyeke diravî û wêjeyî ji xwe re date bigirtin. -Di wê demê de reweşt wisa bû, ku helbest û pexşan bi eşkere ve di nava civatên giştî de derî bi derî ve bêtin bixwendin. Di nêzika sala 443 b. z. de Yunanîya bajarekî nuh li jêrî Îtalya bi navê Thurium-Teyuryum datin biavakirin. Hêrodot ji bona vî bajarî hate biçûyîn û ew tanî mirina xwe têde hate bijîyandin. Gora wî nedîyare.

Hêrodot pir ji xwe re bi pirbûn ve di nîvê duwemî jîna xwe de di berî çûna xwe ji bona girava Samos de hatîye bigerandin. Wî ji bona piranîya giravên Yûnanî di derya Sipîyî navîtî de, bajar û Dewletên Yunanîyî rojavayî derya îce -herema wîyî kokî-, beşê rojava ji Asya Biçûk -welat û heremên Lydia-Lidya, Caria-Karya, Misyia-Misya û Phrygia-Firigya- dayite biserdanîkirin. Herwehajî wî ji bona hundurû jî hatîye biçûyîn, belam ew bi pirbûn ve ji Firatê jor nehatîye biderbasbûn. Herwehajî wî ji bona Aşûra kevnar, Babilistan, Suse-Suz -di Êlama jêrîyî kevnar de-, Misir û newala Nîl tanî Sudan, kenarên derya Sor, Terablosa rojava, kenarên derya Reş, welatê Cholchide-Kolşide, -ew heremema Encarya di Gurcistana niha de ye), Okrayîna û

[1]Perikles-Pêriklês: Di nêzîka 500-429 b. z. de hatîye bijîyandin. Ew ji gewretirîn Peyên Dewleta Etina Kevnar bû. Ew Rêberê Partîya Demokrat bû. Wî Etin bi navînîya siyasî, aburî û zanyarîyî Yunisatanê ve date bikirin; jiber vêjî ji sala 450 tanî 430 b. z. de bi pêla Perikles-Pêriklês ve tête bigotin, ya ku têde Etina geşbûna dema xwe dayite bidîtin. Ins. Ele. R. 755. Cuma

Belkan dayite biserdanîkirin.

Wî ji me re li dûxwe de di nivîsta xwe de hemû dîtinên bi çavên xwe ve û bihîstinên bi guhên xwe ve di cîhaneke ciyografî de datin bihiştin, ya ku ew ji Tengava Çiyayê Tariq tanî Newala Çemê Sind di hindistanê de û ji Okrayînê û Deştên Segthie-Sigtî û Ewropa û ji jorî Derya Sor û Welatê Ereb, Hebeşê û "Lîbya" -ango Efriqya- ji jêr de tête bidirêjkirin.

Yunana kevnar wê xwe bi navînîya ciyografî û şehristanîya dunyayê ve didate bidîtin. Hêrodot ev têgihiştina hanê neda biveguhertin, lêbelê wî pir asuwê xweyî ciyografî di rojhilat, rojava, jor û jêrî de date bifirehkirin. Wî navên bi sedan na hêjî bêtir bi hezaran ve ji Miletan, Gelan û Êlan datin bianîn, yên ku di van deverên fireh de ji erd dihatin bijîyandin. Herwehajî wî li ser reweştên wan, ayînên wan hêjîbêtir evsanên wan de date biaxivtin. Wî ligora karîna xwe de pesnê welatên wan, şarên wan, rubarên wan, şînîtîyên wan û cenawerên wan datin bidan. Ew Pêşîvan bû, yê ku wî navên welatên yanjî Miletên Karthago-Kartago, Etrusqnes-Etrusker, Korsika, Mersilya û Miletên Celte-Kelt-Kêlt, Espanya, Portugal, Berber, Tewarik, Sikêt û Teter datin bianîn. Herweha wî navên nasînên mîna Faris, Misir, Surî, Mîdya û welatê di navbera Herdu Çeman de datin bianîn.

Di nivîsta wî de navê "kurd" nehatîye bipeyivandin, lêbelê ew li ser hin Bavpîrên wan de mîna Mêdîyan, Mard û Shagart yanjî Sagart -yanjî Şhakert)-û kevtina Nîneva di pêla Padîşahê Mêdî Cyaxare-Kîxosro de[1] hatîye biaxivtin. Herwehajî ew li ser jîyana Astiag-Astiyag Dawîvanê Padîsahê Mêdî de û li paş de ew li ser Padîşahên Binemala Axmenî de: Cyrus[2]-Korş, Cambyse[1]-Kambîz, Darius[2]-Dara

[1]Ji xwe re li ser vî Padîşahê Kyaxares-Kîxosro de di "Ruhm und Untergang des Alten Îran"-Meznatî û Kevtina Îrana kevnar-, Otkar Klîma, VEB F. A. Brockhaus Verlag Leipzig, sala 1988 de, r. 29, 30 de bide bitemaşekirin.

Herwehajî li ser wî de di nivîsta: "Drei Jahrtausende Armenien"- sê hezar Sal Erministan, Burchard Brentjes, Leipzig 1984 de, r.35 de ji xwe re bide bitemaşekirin. Cuma

[2]Ji xwe re li ser Kyros-Korş li Meznatî û Kevtina Îrana Kevnar de, kanîya çûyî, r.

û Xerxès[3] dayite biaxivtin. Gava ku ew li ser Serdarîkirina Kembîz de hate biaxivtin, yê ku wî Misir di nêzîka sala 525 b. z. de dabû bivekirin, ew pêrejî li ser mêjûwa Misrê, şehristanî û şopên wê de û li ser Ehraman û Newala Nîl de hate biaxivtin. Tevî ku Yunan bi "Navînîya" Dunyayê ve hêjî dihate bidîtin, Hêrodot di nivîsandina xwe de bê alî bû. Wî pir pesnê şehristanîya Misrêyî kevnarî û pêşkevtina wêna di ser şehristanîya Yunanê de ji alîyê hunera avanîyê û gewdeyan de bi kêmanî ve date bikirin. Herwehajî wî bi bê hîç xwîngermbûnê ve ji bona Yunan li ser agehdarîyên Şahên Mîdî û Farisên Dujminên wan de bi rengekî rastî ve date binivîsandin.

Şahên Firs bêtir ji nîvê dunyaya naskirî ji Newala Çemê Sind tanî Derya Îce û ji Kafkasya û Asya Navînî tanî Misir û Terablosa rojava dabûn bivekirin. Wan welatên vegirtî -ji bil Korş pêvê- hemû û di nava Îranê de bi xwe jî ve bi devê şûr, qamçî û sebirînê ve didan biserdarîkirin. Ev Serdarîkirina hanê bi carekê ve ji Serdarîkirina Demokrasîyî Etina dihate bicudakirin. Belam Hêrodot hîç bi tu awayekî ve li ser danava rengê Serdarîyê yanjî beramberkirinekê de nehatîye biaxivtin.

Herwehajî nîşandana wî ji bona demê nêzîkî bû. Wî hergav dest bi anîna navên Xwedanan, Mêtolocîyan, Pehlewanên Evsanan ve, mîna ku ew di cengên Troie-Rureya de dihatin bidîtin, dida bikirin. Bi gotineke din ve ew ligel dema xwe de dihate bijîyandin û wî bi bawermendîyên wêyî Pûtî ve dida bibawerîkirin.

---

34, 40, 42, 44 û 49 bide bitemaşekirin. Cuma

[1]Ji xwe re li kanîya pêşî de li ser Kambyses-Kembis de di rûpên 40, 42 û 49 de bide bitemaşekirin. Cuma

[2]Ji xwe re li kanîya pêşî de li ser Dareios-Dara de di rûpelên 45, 46, 47, 48,68 û 70 de bide bitemaşekirin. Cuma

[3]Ji xwe re di kanîya pêşîn de li ser Xerxes-Xêrxês -Kisra-de di rûpelên 70 û 77 de bide bitemaşekirin. Cuma

Wî tu carî ji bona hoyên rûdanan û cengan ji civakî, aburî û siyasî jî li wan de nedida bigerandin. Lêbelê wî her tişt ji bona dildarîyên Merovan didate bivegerandin, yên ku wan dilên Padîşahan û Serleşkeran mîna dilbijandina xweyî, kînbûn, tolwergirtin yanjî şêtbûnê didan bilivandin û wan rijandina xwîna bi hezaran ji Merovan ve didan bikirin. Mîna ku di Pûtperestîyê de têde didan bidîtin, Wî Xwedan jî di livandina dildarîyên Merovan de didatin bibeşdarîkirin. Xwedan ji bona nava dildarîyên Merovan de di rêya xewnan de dihatin bikevtin. Wer Astiag-Astiyag di rêya xewnekê de hate biagehdarîkirin, ku divê ew xwe ji Kurê Keça xweyî Aviskirî bide bivegirtin, ya ku wê ligel Şahzadeyekî Farisîyî Axmenî de dabû bimêrkirin. Wî fermana kuştina wî Lawikî piştî zayîna wî date biderxistin û wî ew ji bona Şivanekî li çîyayên Hemedanê de ji bona kuştina wî date biberdestkirin. Lêbelê Şivan Biçûk neda bikuştin. Zarok mezin bû û ew bi Xort bû. Ew bi navê Korş[1] ve hate binavkirin. Di "Rûçikên wî de" nîşanên Padîşahîyê dihatin biderkevtin. Wî Serdarî ji Kalê xweyî Mîdî date biwergirtin. Herwehajî Xwedanên wî bi xwe jî ve bi dildarîyên mirovanîyê ve têtin bidîtin. Xerxes-Xêrxês[2] bi keştîyên xweyî cengînî ve hêrîşa Yunanê date bikirin. Wî bi qamçîyê xwe ve li ava deryê de date bixistin; jibervêjî Xwedan jê hatin bitefirandin û ev bi hoyê kevtina wî ve hate bikirin. Ji bona liberkevtinên Xewnan û "Nîşandanên Xwedanan" giringbûnek dihate bidîtin. Keşe çi Mêr çi jî Jin bi liberkevtina -Oracle- Perco ve dihatin birabûn û ew di nava çîyan û devîyan de dihatin bijîyandin. Hinên ji wan bi başbûna "Têgihiştina xweyî Xwedanî" û rastîya gotinên xwe ve hatin binavûbangkirin.

Hêrodot di hemû dîtin û bihîstinên xwe de dilsoz û rast bû. Lêbelê wî piranîya navên biyanî, yên ku wî ew di mêjûwa xwe de

---

[1]Ji xwe re li ser Kyros-Kurush-Cyros-Korş, Astyages-Astiyag û vê çîroka Hêrodot de di nivîsta "Ruhm und Untergang des Alten Iran", r. 33, 34 û 35 bide bixwendin. Hêrodot ev Ççroka xwe bi heştê salî ve piştî mirinna Kurş dayite binivîsandin. Cuma

[2]Xerxes-Xêrxês Lawê Dara bû, yê ku ew di meha çirya paşîn sala 486 b. z. de hate bimirin. Xêrxês di wê mehê de bi xwe ve ji bona ser Texê Bavê xwe hate bihilkişandin. Ruhm und Untergang des Alten Iran, R. 77. Cuma

dane binivîsandin, dane biveguherandin. Wî ew li gora peyivandina Yunanî de dane binivîsandin. Evaya jî li nik Mêjûvanên Yunanîyî paş wî jî de tête bidîtin.

Mêjûwa wî piştî nêzkîa heft sedsalan ji mirina wî bi nava destan ve hate bikevtin. Dibe, ku ew di koka xwe de ne bi vê rêk û pêkxistina xwe bû. Ew li ser kaxezên Papyros-Papîros de di neh girêdanan de hatibû binivîsandin. Her girêdanek "Nivîstek" bû, Ango ew derîyek bû û ew ji yek tanî neh jimarkirî bû. Her yekê ji wan navê Xwedanekî taybetî ji Xwedanên Yunanî ji xwe re didan bihilgirtin. nivîsta pêşî navê Kleo-Kilo ji xwe re dida bihilgirtin. Evaya bi xwe jî ve navê Xwedanê Mêjûvanan û Rênasa wan bû. Ev perçê hanê li ser jîyana Cyèsus-Kisos Padîşahê Lidya û Cyrus-Korş de hatîye binivîsandin. Ev navên Xwedanên hanê ne ji helbijartinên Danervan bûn. Ew ji bona perçeyên nivîsta wî ji bal Bihîstvanên Xwendina nivîsta wî ji Yunanîyan hatin bihelbijartin. Evaya jî ji bona nivîsta wî hate bireweştkirin. Jiber ku mêjû di civatên giştî de, bi dengekî bilind ve û bi pevikên kurt ve bi pêwistî ve dihate bixwendin, Hêrodot pir dubarekirin didate bivegerandin, da ku Bihîstvan bikaribin li dû rûdanan de bêtin biçûyîn.

Mîna ku em dibînin, mêjûwa Hêrodot ji têgihiştina zanistîya mêjûyî niha tanî radeyekî mezin tête bicudakirin û kêra wêjeya evsanîyî Homêr têde pir bi diyarî ve tête biderkevtin. Belam bi hergavbûna nav û banga wê ve û tanî vê roja me jî vegerandin ji bona wêna nala kanîyeke pêşîyî nivîsandî li ser heyamên kevanar de bi diyarî ve dide bixuyanîkirin, ku Kleo-kilo rêya wî dayite bironahîkirin û navê "Bavê mêjûwê" bi rast û durust ve pê tête bikevtin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Yunanê Thucydid-Thukydides-Tukididês[1] bi gelekî ve ew ji Hêrodot nêzîktirî têgihiştina

[1] "Thukydides-Tukididês: Ew Mêjûvanekî Yunanî bû. Di nêzîka sala 460-395 b. z. de hatîye bijîyandin. Wî mêjûwa cenga Peloponesischen-pêloponisişin date binivîsandin, ya ku ew têde di pêşîya wê de,nala Serleşkerê Keştîyên cengîyî Etina hate bibeşdarîkirin. Di rêya Rexnekirina hêjakirinên Kanîyên xwe de, di rêya bi rêk û pêkxistina raxistin û nîşandana Rûdanên Mêjûyî de ji Hoyên wanî Serûştî û bi taybetî ve ji Deshilatîya Sîyasî û Pêwendîyên aburî ew bi Bingehvanê nivîsandina zanistîya mêjûwê ve hate bidanin". "Den Sieben Weltwunder auf der Spur-Lidû Şopa Heft Sersurandiên Dunyayê de",Vojtèch Zamarovský, VEB F.A. Brockhaus Verlag Leiptiz, 1981, Wergerandina Elemanî ji Çikî, r. 230. Cuma

zanistîya mêjûyî niha çi ji alîyê hûrbûna lêvenerandinê û çi jî ji alîyê nîşankirina danavê dihate bidîtin. Wî mêjûwa xwe ji bona xwendekarîya "Guerre du Pèloponnése-Peloponnesischer Krieg-cenga pêloponnêsê date bitirxankirin, ya ku ew di devereke Yunanîyî nîşankirî de û di demeke nîşankirî de hate bilidarxistin. Wê 24 salan ji sala 431-404 b. z. de -tev li demên aşîtîyê jî de- date bidirêjkirin. Ew pevçûnek di navbera cîhana Yunanî de bi xwe de bû. Ew di navbera Komara Etina -û Şahînşahîya wê de- û Serdarîya Sparta Siparta û Hevalbendên wê ji Dewletên Biçûkî Yunanîyî din de dihate bidîtin.

Cudabûn di navbera mêjûwa Hêrodot û Tikididês de bê gûman ew ji alîkî ji bona kesîtîya Danervanan tête bivegerandin û ji alîyê din de ew ji bona pêşvekevtina rewşan di Yunanê de di demeke kurt de tête bivegerandin. Herdu Danervanan bigir di yek pêlê de hatin bijîyandin. Tikididês nêzîka deh panzdeh salan ji Hêrodot biçûktir bû. Di Xortanîya xwe de wî guhdarî lê didate bikirin, gava ku wî mêjûwa xwe li Etîna de dida bixwendin. Vedibêjin, ku ew ji pirbûna kêrkirin û dildarîya wî jê re dayite bigirînkirin. -Lêbelê ew li ser rêya wî de nehate biçûyîn-.

Mîna ku me date bidîtin, Hêrodot li perçeyê Asyayî ji cîhana Yunanî de hatîye bizayîn. Ew pir ji bona rojava û rojhilat hatîyê biçûyîn û bihatin. Tukididês di navbera salên 460 û 465 b. z. de li Etîna de hatîye bizayîn û ew di navbera salên 399 û 396 b. z. de têde hatîye bimirin. Ew bes û bi tenha ve di nava Yunanê de hatîye biçûn û bihatin.

Ji dema dawîkirina "Cengên Mîdî" tanî destpêkirinên cengên Yunanîyî navxweyî de di sala 431 b. z. de Etina demeke nîv sedsalî bi aşîtî û geşîtî ve hate bijîyandin. Ew bi lutkê bajartîya xweyî remanî û diravî ve hate bigihaştin. Tudeyên wê ducar bûn û dewlemendîya wê hate bibêtirkirin. Wê deshilatîya xwe û "Impiryaliya" xwe li ser jimarekê ji heremên Yunanî de bi saya keştîyên xwe ve date bivedan, yên ku Gewreyê wê Péricés-Pêriklês jê re dabû biavakirin û yên ku wan jê re zalbûna wêna li ser deryan û azadîya bazirganîyê de datin bigirawkirin. Vê rewşa hanê Siparta Xanedana Nîvgirava pêloponnês date bitirsandin, yê ku wê Zarowên xwe bi canê rebenîyê, belêbûna

supahî û canbazîyê ve didan biperwerdekirin.

Tukididês ji Malbateke Xanedanî dewlemend bû. Wî xwendina xwe li ser destên Mamosteyan de date bikirin, yên ku ji wan re Sophistes-Sofîtî[1] dihate bigotin. Ew di navbera bajarên Yunanî de diçûn û dihatin, da ku ew Gencan ji bona "Hunera Peyvdarîyê" bidin bihînkirin û wan ji bona wergirtina Serdarîkirina siyasî bidin bilikarxistin.

Wî ji pêşîya Xortanîya xwe date binaskirin, ku ceng jê rê nayête bidîtin; jibervejî wî xwe jê re xwe date bilikarxistin, da ku ew têde roleke siyasî û supahî bide bilîstin û li ser wê jî de bide binivîsandin. Li paş destpêkirina cengê de bi du salan ve Pirêklês di sala 429 b. z. de hate bimirin û Berberîya siyasî di nava Partîya wî de date bidestpêkirin. Tukididês hate bineçarîkirin, ku ew beramber bi remanên siyasîyî dijîhev ve bê layîn bête birawestandin. Di sala 424 b. z. ew bi Stratège-Strategos-Stratigos ve ji bal civatê ve bi Serleşker ve hate binîşankirin. Ew di şerê xweyî pêşî de ligel Siparta de hate bişikenandin. Ew ji cihê xwe hate bidaxistin û ew ji bajarê Etina hate bidûrkirin. Evaya bi jîyana wîyî siyasî ve hate bidawîkirin. Ew ji bona Thrace-Tirakya hate biçûyîn; jiber ku mencemek wî li wê derê de hebû. Ew nêzîka bîst salan li wê derê de hate bijîyandin û wî piranîya mêjûwa xwe têde date binivîsandin. Di sala 404 b. z. de ceng bi reva Etina ve hate bidawîkirin. Siparta -ji bona demekê- li ser Etîna de hate bizalkirin. Tukididês ji bona cihê serê xwe hate bivegerandin û ew bi bedbîn ve dihate biderkevtin.

Mêjûwa "Cengên pêloponnêsî" di pêşî de bi rastîyên agehdarî û rûdanên xwe ve tête binîşankirin. Danervan ew hemû li dûhevdû de datin bicivandin û wî ji wan baş û rastên wan date bihelbijartin. Duwem ew bi rastîya lidûhevdanîna demê -Chronologie-Kuronologî[2]-

---

[1]Feylesufên Gervanên Yunanîyî Kevnar bûn. Wan Şiyarbûn di nava Yunanîyan de didane bibelavkirin. Sofistik nala Zanebûna xav û bi gotinan ve yarîkirin tête bidîtin. Cuma

[2]Chronologie-Kuronologî Gotinek Yunînî-Latînî ye. Ew bi zanistîya yekitîyên demê, bi nasîna demê û bi jimartina demê ve tête biliberkevtin. Cuma

ve tête biderkevtin. Sêyem ew bi başîtîya suwarkirina xwe ve ango bi rêzkirina rûdanan ve li dûhev de û girêdana wan bi hev re tête bidîtin. Çarem ew bi lêvenerandina hoyan ve, yên ku ew rûdanan didin bikirin û bibîrxistina pêşbînîya encamên wan tête bidîtin. Ev hemû bi hev re têde beramber bi daneveke nîşankirîyî diyar ve di sînorên dem û dorhêla xwe de têtin bidîtin.

Belam hoyên ku Tukididês li wan de dida bilêvenerandin, hemû hoyên nihayîbûn û ew ne hoyên dûrbûn, yên ku ew li ser zînetên siyasî, civakî û aburîyî Yunanî û deverê de dihatin biavakirin. Belam Danervan baştirîn çarekirin ji bona zîneteke nîşankirî û demeke sînorkirî bi hûrbûn ve didate biderxistin. Ango mêjûwa wî nêzîkî rengê mêjûwa sedsalê nozdehan tête bidîtin, ya ku jê re "Mêjûwa Rûdanîyî" -Dubistana Elmanî- tête bigotin, ya ku ew ji dîtina giştîyî ciyografî û ji dîtina dûrbûna demê tête bibêpişk û bibêparkirin. Herwehajî ew ji her felsefeyeke mêjûyî tête bibêparkirin, ya ku ew ji bona paş rudanan tête biçûyîn, ya ku ew di çarenûsa Merov de li ser ronahîya rûdanên mêj, niha û hoyên wanî dûr de dide biramankirin.

Belam Tukididês rastgo bû. Wî bendîtiya Etina dijî Siparta yanjî serûvajî wê jî wî ew ji xwe re neda bigirtin; lêbelê wî peyvdarî ji bona liberxistina hoyên nihayî ji siyasî û supahî ji bona Pehlewanên mêjûwa xwe ji Rêberan date bidan, yên ku wan roleke mezin di vebirina cingê de datin bilîstin. Wî ji xwe re peyvên wan, gift û goyên wan di vînên giştî de datin binigaşkirin. Wî hişt, ku ew wan zînetan û hoyan bidin biliberxistin, yên ku li ser wan de datin bineçarîkirin, da ku ew wê biryariyê bêyî biryarîyeke din ji xwe re bidin bigirtin. Ev reweşta hanê di nigaşkirina peyv û gift û goyên Merovan de, yên ku wan mêjûwa Yunanê dabûn bidurustkirin, reweşteke Yunanîyî kevnar bû. Ew di wêjeya Homêrî de hatibû. Vê reweşta hanê mêjûwa wî bi paçekî zîvarî ve date bipoşandin.

Hoyên ku Pehlewanên mêjûwa wî ji herdu rexên Pevçûnvanan ve didatin biliberxistin, ew bi yek armancê ve dihatin bidîtin: da ku ew cengê bidin biqazanckirin. Evî tevjî bes û bi tenha ve û bi her nerxekî ve li ser berjewendî û bextiyarîya Merov de ji bona berjewendîya Dewletê dihate bidîtin. Bi vê têgihiştina hanê ve mêjûwa Tukididês li

ser vê Siyasetê de tête biavakirin, ya ku em niha jê re -Realpolitik- Siyasetarastê- dibêjin, ya ku ew ji felsefa nimûnetîyê û sincîtîyê dûr tête bidîtin. Belam nivîsta wî mîna nimûneyekê ji vî rengê mêjûwê tête biderkevtin. Ew ji heşt derîyan de tête bipêkhatin. Têtê bibawerkirin, ku Xenophon-Zinofon nivîsta Tukididês dayitê biparastin û wî ji agehdarîyên wêyî civandî dayîte bikarkirin.

- Mêjûvanê Yunanîyî sêyem Xenophon-Xenofon[1] bû, yê ku ew li Etîna de di sala 428 yanjî 427 b. z de hatîye bizayîn. Ew têde di sala 354 b. z. de piştî jîyaneke dagirtî di navbera gerandinê, ceng û nivîsandinê de hatîye bimirin. Ew di nava Malbateke Xanedan de hatîye birabûn. Li paş de ew bi Efserê Suwarî hate bikirin. Bê gûman wî di dawîya jîna xwe de kar ji bona Etîna dijî Siparta û Hevalbendên wê date bipêşkeşkirin. Ew di nava wan civatan de dihate bidîtin, yên ku di wan de Sokrat[2] dihate bipeyivandin. Sokrat bi serê wî ve dihate bikevtin.

Li paş şikestina Etîna di cengê de û bûyîna wergerandina

---

[1]Ew li nêzika sala 430 b. z. de hatîye bizayîn û ew li nêzika sala 354 b. z. de hatîye bimirin. Ew Mêjûvanekî, Xanedanekî û Siyasîvanekî Etîna bû û ew ligel Iskenderê Mezin de Şagrtê Aristo bû. Wî li ser vegerandin Serbazên Yunanî de ji şerên Iranî de di Anabasis de date biaxivtin. Ev nivîsta hanê di 401 b. z. de di bin "Nav û Nîşana Deh hezar Nefer" de hatîye binivîsandin. Wî di vê nivîsta hanê de li ser şerê xwe de ligel Kadoxan de di Kurdistanê de bi dûr û dirêjî ve dayite biaxivtin. Ev bi kanîyeke pir bi renx ve ji bona mêjûwa Kurd û Kurdistayê kevnar tête bidîtin. Insik- Elmanîyî Biçûk, r. 37, 1134. Cuma

[2]"Sokrates-Sokratês, Feylesufekî Yunanî ye. Ew di sala 469-399 b. z. de hatîye bijîyandin. Ew ji Gewretirîn Wênervanên Kevnarîyî Nimûnetiyê tête bidîtin. Rêça wî em bes û bi tenha ve di rêya nivîsandinên Suxteyên wî de û bi taybetî ve di rêya Platon-Pilaton de didin bizanîn. Wî bi xwe ve nedaye binivîsandin. Li ser bingehê gilîyekî de, ku ew Xwedanên nuh dide bianîn û ew Xortan dide bigenîkirin, ew bi mirinê ve hate bitawanbarkirin. Tevî ku rêya bazdanê jî jê re hate bilidarxistin, ew bibBiryara dadgehê ve hate bipêrûniştin û hişt, ku ew bi dana jehrê ve bête bimirin."Den Sieben Weltwunder..R. 229. Cuma

Oligarchisch-Olîgarşîş[1] de ew ji Etîna ji bona Asya Biçûk di sala 401 b. z. bi dijî amojgarîya Sokrat ve jî hate biçûyîn. Ew li Asya Biçûk de ligel likarxistina hêrîşekê ji deh hezar Serbazên Yunanîyî Kurtêlxwer de hate bibeşdarîkirin. Ew ji bona ser tuxûbên Mîdya li ser daxwaza Şahzedeyî Axmenîyî[2] Korş de hate biçûyîn, yê ku ew dijî Birayê Xwe Şahê Faris hatibû birabûn, da ku ew Text jê bide bisitendin. Wer tête bidiyarkirin, ku Yunanîyan mebesta Korş nedidan bizanîn; jibervêjî ev hêrîşa hanê hate bişikestin. Gava ku Leşker Xenofon ji xwe re bi Serleşker ve date bihelbijartin, da ku ew jê re rêya vegerandina welêt di nava deverên çiyayîyî sext de bide bivekirin. Xenofon bi Leşkerê xwe ve di ser çemê Zabê Bilind re ango di nava dilê Kurdistana navînî de hate biderbaskirin. Ew ji wêderê de ji bona bajarê "Sittakè"- ew bajarê Chetax-şitaxê ye- û ew ji wîr ji bona newala çemê Kentritès -ew çemê Botanê ye û ji rûbarên Dicle ye- çû. Ew li wêderê de ligel Miletê -Kardo- de bi şer ve hate bikevtin -navê vî Miletî bi Yunanî ve Kardukh-Kardox bû. Lêbelê "Kh" dawî ew Sulfixe-Sulfix nîşana tîpîyî ji bona pirbûne ye. Danervan bi dirêjî ve li ser nobûna liberxwedana Kardoxan û rengên çekên wan de dayite bipeyivandin, gava ku ew di nava welatê wan re hatîye biderbasbûn. Hîç gûman têde nayête dîtin, ku Xenofon Pêşîvanê Mêjûvanî rojava bû, yê ku ew di nava vê devera hanê de hatîye biderbasbûn û wî li ser wê de dayite binivîsandin. Li ser vêjî de hate biencamkirin, ku jimareke mezin ji Mêjûvanên rojavayî de koka Miletê Kurdîyî niha di dirêjbûna sedsalan de ji bona wan Kardoxan didan bivegerandin. -Evayajî bi xwe jî ve jiber hoyên ciyografî, êtnolocî û zimanî ve nadin bitêrkirin. Li vêderê de kês nayête bidîtin, ku Merov bêtir li ser de bide biaxivtin.

---

[1]Oligarchisch ji Oligarchie-Oligarşî hatîye biderkevtin û ew gotineke Yunanî-Latînî ye. Ew bi têgihiştina serdarîkirina guruhan ve tête biliberkevtin. Cuma

[2]"Achämeniden-Axmenidin Şahînşahîya Farisî ji sala 549-330 b. z. ye, ya ku Serdarîya wê Faris, Mêsopotamya, Anedol û Misir ji xwe re dida bigirtin. Danînvanê wê Kyros-Kurşê Mezin bû û Dawîvanê Şahînşahê wê Darios III-Darayê Sêyem bû, yê ku ew ji bal Alexander-Iskenderê Mezin de tac jê hate bisitendin". Den Sieben Weltwunder ...R.213. Cuma

Xenoxon di nava devera Ermînya de, -ji bona vê nava hanê nîşaneke ciyografî tête biderkevtin, bi têgihiştina ku ev devera hanê di nava wê de pir Milet dihatin bidîtin- ji wan jî Eşirên Kurd bûn, yên ku ew ji Eşîrên Ermenîyan kevintir bûn-, hate biderbasikirin. Ew ji bona Bendera Terabzûnê di sala 400 b. z. de hate bigihaştin û ew ji wêderê de ji bona Yunanê hate bivegerandin.

Li paş derxistina tawankarîkirina Sokrat bi mirinê ve bi vexwarina jehrê ve di sala 399 b. z. de Dost û Hevalên wîna bi dijwarîyên siyasî ve hatin birûbirûkirin[1]. Xenofon jî ji Etîna hate bidûrkirin û ew ji bona bajarê Siparta hate biçûyîn. Wî ji bona Padîşhê wê date bikarkirin û ew ji bona wî hate binêzîkkirin. Wî jê re erd li rojavayî çîyayê Olympe- Olimpiya de date bidan. Li paş rûniştina demekê têde di herema Corinth-Korint de ew di sala 366 b. z. de ji bona Etîna hate. bivegerandin û ew li wêderê de tanî mirina xwe hate bimayîn.

Xenofon ji hemû Nivîsvanên Yunanîyî kevnar bi berkirintir bû. Wî çardeh nivîst di danavên cudan de li dûxwe de date bihiştin, -di dema ku Hêrodot û Tukididês bes û bi tenha ve her yekî ji wan nivîstek li dûxwe de dane bihiştin. Ji lêgerandinên li ber dilê wîyî şêrîn de divê felsefe, mêjû, qanûn, ceng, perwedekirin û wêje bête bibîrxistin. Di kevnar de ew mîna feylesufekî bi pir dildarê Sokrat ve dihate binasîn. Di vê roja me de ew bêtir bi mêjûwa xwe ve û di perwerdekirînê de tête binavûbangkirin.

Ji nivîstên wî divê Hellenica, ya ku ew mêjûwa Yunanê ji sala 411-362 b. z. de di heft derîyan de dide biderxistin û ew bi serçavîyeke pir giring ve tête bidîtin, Anabasis, ya ku têde agehdarîyên "Vegera Deh hezaran" tête bidîtin, ango ya ku têde hêrîşa li ser Mîdya de û li paş de vegerandina di ser Kurdistana navînî û Ermînyan de tête

[1]Ji xwe re li nivîsta Pilaton de bi ziman Elemanê ve bergê I. 2, r.123 de "Des Skorates Verteidung" -Liberxwedana Sokratis, AKademie-Verlag, Berlin di sala 1985 de bidin bixwendin. Ez him hêvîdarîm û him jî binêtin, ku ez dê tevaya vê Liberxwedana hanê ji bona Xwendevanên Kurd bidim biwergerandin; jiber ku ew bi rastî jî ve liberxwedaneke pir bilind û amojgar him ji bona hemû Xebatvanên Gervanên ji bona rastî û him jî ji bona Serdarên bedkar tête bidîtin. Cuma

bidîtin, ya ku ew ji heft derîyan tête bipêkhatin, bêtin bibîrxistin. Ji nivîstên wîyî felsefî û siyasî divê "Apologie", "Hieron" û "Memorabilia", ya ku ew bi piranî ve li ser Sokrat de tête biaxivtin, bêtin bibîrxistin. Wî çîrokên vegotîyî mêjûyî dane binivîsandin, yên ku armanca wan perwerdekirin bû. Ji van jî "Cyropaedia" tête bidîtin, ya ku Pehlevanê wêna Şahê Korş bû, yê ku wî Dewleta Axmenî date bidamezirandin. Hewerhajî ji van jî "Symposium" bû, ya ku Pehlevanê wê Sokrat bû. Ji nivîstên wî, yên ku ew hêjî pê tête binavûbangkirin, yekek tête bidîtin, ya ku ew li ser "Hippisme" -suwarîtîyê-, xwedîkirinê, suwarbûnê û guhpêdana hespan de tête biaxivtin. Ew Merovê pêşî bû, yê ku wî li ser vê danava hanê de dayite binivîsandin. Ev nivîsta hanê hêjî ji kanîyên bingehîyî lêvegerandinê tête bidîtin. Herwehajî wî nivîstek li ser nêçîra pezkovîyan û hirçan de di bin navnîşana "Cynegeticus" date binivîsandin. Wî bi xwe jî ve nêçîr û suwaritî jî dida bikirin. Wî dida bibawerkirin, ku "hêşê sax li laşê sax de tête bidîtin". Wî ew herdu nivîstên hanê ji bona mebestên perwerdekirînê û canbazîyê datin binivîsandin, da ku Zarokên wî û Genc li ser van yarîyan de bêtin bihînkirin. Nivîstek wîyî din jî di bin navnîşana Hipparchiecus" de tête bidîtin. Têde ew çawbûna birêvebirina Serbazgelekê ji Suwaran û taktîka wêna dide biliberxistin. nivîstek wîyî din ji di bin navnîşana "Oeconomien" tête bidîtin. Ew têde çawabûna sermiyandarîkirina werzekî bi şêweyekî aburî ve dide bixuyanîkirin. Herwehajî ew têde amojgarî, serpêhatîyên sincî û perwerdekirinê ji bona berjewendîya malê dide bikirin. Ji nivîstên wê jî nivîstek li ser destûr û qanûna Siparta de tête bidîtin. Pexşana Xenofon ji alîyê şêweyê wêje de ji baştirîn nîvîsandên Yunanênn kevnar bi zaravayê Ettique-Etika têtę bidîtin, -ya ku ew ji melbendeke Etina tête bidîtin-.

-Polybe -Polybius -Polybios -polîbiyus[1] yekeke ji gewretirîn

[1]"Polybios-Polîbiyos: Ew him Siyasîvan bû û him jî Mêjûvan bû. (ew li nêzîka 200-120 b. z. de hatîye bijîyxandin). Wî mêjûwa Cihana Yunanî-Romanî ji destpêka Cenga Punisişin tanî destpêka salên pêşîyî bi jêrvexistina Yunanê ji bal Romanan de ji (264-144 b. z. de) di çil nivîstan de date binivîsandin û ji van nivîsandinan perçeyek hate bihiştin. "Den Sieben Weltwundern..., r. 226. Cuma

Mêjûvanên Yunanî tête bidîtin, yê ku ew di nêzîka 208 yanjî 200 tanî nêzîka 118 b. z. de hatîye bijîyandin. Di pêla wî de Roma dest bi sazkirina Imperatorîya xwe ve, -ya ku ew hêjî Komar bû-, date bikirin. Wê xwe ber bi rojava ve di Sipanya de û wê xwe ber bi jorî Efrika ve û ber bi rojhilat ve di Asya Biçuk de li ser kîsê Yunan, Dewletên Buçûkîyî cihî û Paşvanên Iskenderê Makdonî de date bifirehkirin.

Ew li Yunanê de hate bizayîn û ew li bajarê Roma de hate birûniştin. Ew ligel Sersupahê Romanîyî Scipio-Sikipiyo de di cengên wî de di Sipanyan de û herwehajî di cengên wî de di Carthage û Hannibal-Kartago û Hanîbal jî de hevrê bû. Wî serdanîya Misrê, Iskenderîyê û Sardê -Paytexta Lîdya kevnar di Asya Biçûk de- date bikirin. Ew di nava çîyayên Elp de ligel hêrîşa Hanîbal de di zivistanê de bi pîyan ve hate biderbaskirin. Wî ji me re nivîsteke dûr û dirêj di bin navnîşana "Histoire" Mêjû de -di nêzika 1500 rûpelî de- di nava çil "nivîstan" de ango derîyan yanjî perçan de date bihiştin. Herwehajî nivîstek wîyî din li ser "taktike" de dihate bidîtin. Belam ew hate biwindakirin.

Di wê demê de Surî, Asya Biçûk, Mîdya, Ermînistan û Îran li jêr Serdarîkirina Seleucides-Seleukiden[1] de bûn, yên ku ew ji bona Seleucos-Seleukos dihatin bivegerandin, yê ku ew yekek ji Serleşkerê

[1]"Seleukiden-Silcokî: Ew Padîşahîya Binemala Makdonî bû, yên ku wan ji sala 312-85 b. z. de li ser Surî û Mêzopotamya jorî de dane biserdarîkirin. Sazvanê vê Padîşahîyê Seleukos I. Nikator bû. Ew yekek ji Serleşkerê Iskenderê Mezin bû, yê ku wî li paş mirina Iskender de (di sala 323 de) gewretirîn perçê Şahînşahîya wî ji bona bin destên xwe date bixistin. Di koka xwe de desthilatîya vê Binemalê tanî çemê Indus dihate bigihaştin. Hêdî hêdî ev deshilatîya hanê bi serhev de hate biqermiçandin, tanî ku ew di sala 100 b. z. de bes û bi tenha ve li ser Surî de dihate bisînorkirin. Piştî mirina Dawîvanê vê Padîşahîya hanê Tigranê Padîşhê Ermenî mayîna vê Şahînşahîyê ji bona jêr destên xwe date bixistin, yê ku ew di sala 65 b. z. de ji bal Pompeius de- (ji xwe re li ser Pompeius û cenga wî bi dûr dirêjî ve û bi Neqiş ve li nivîsta der Bibel Atlas..., r. 134 bide bitemaşekirin. Cuma)- hate bişikenandin û Surî bi Ostandareke Romanî ve hate biveguhertin". Den Sieben Weltwundern..., R.228.
Herwehajî ji xwe re li ser şerên Iskenderê Mezin de bi neqiş ve di: Der Bibel Atlas..., r. 172 de û neqşa 174 de bide bitemaşekirin. Cuma

Iskenderê Mekdonî bû, -yên ku wan ji sala 305 tanî sala 64 b. z. de dane biserdarîkirin. Surî dawîya Padîşahîya wan bû, ku ew di sala 64 b. z. de bi destên Romanan ve hate bikevtin-.

Mîdya[1] û Faris ligora ciyografîya wî zemanî de bi "Asya Bilind"ve dihate binavkirin û li ser her yekê ji wan de Serdarekî bi navê Padîşahê Suliki-Suloqî dida biserdarîkirin.

Di perçê pêncan de ji mêjûwa Polibiyos saloxdanek ji bona welatê Mîdya, çiya, çem, dewlemendî û sînorên wê hatîyê binivîsandin, ku ew tanî radeyekî mezin li ser Kurdistana niha de bi giştî ve tête bisuwarkirin. Herwehajî di vî perçê hanê de bi xwe jî ve û di cara pêşîn de di mêjûwa nivîsandî de navê "Kurd" bigir bi rengê xweyî nuh ve ango Kyrt bi peyva Kurt hatîye binivîsandin. -Divê li vêderê de bête bigotin, ku tîpa Y Yunanî kevnar mîna tîpa U Firensî yanjî Elmanî dihate bipeyivandin-. Herwehajî carcaran jî nav bi rengê Cyrti dihate binivîsandin û ew bi Kurti dihate bipeyivandin, -mîna ku ev li nik Cyrus de dihate bidîtin û ew bi Korş ve dihate bipeyivandin-. Belam Kurt, yên ku ew li nik Polibiyos de hatine binivîsandin, ew ji Eşîrên Gerok yanjî Nîvgerok bûn û ew li çîyayên Mîdya dihatin bijîyandin. Hinan ji wan di nava Leşkerên Sulikîyan-Suloqîyan de didan biserbazîkirin. Wan bi fronde-catapultè-Schleuder-kanîyan ve didan bişerkirin. Navên wan Kurtan bi vêkevtina şûreşa Serdarê Mîdayî Sulokî Molon ve beramber bi Padîşahê xwe Antiochos-Antiyoxosê III[2] ve di nêzîka sala 220 b. z. de hatine bibîrxistin. Merov cudabûna navê wan ligel navê Kardoxan de dide bidîtin, yê ku ew ji bal Xenofon de hatîye bibîrxistin. Kurt di heremeke ciyografîyî bi gelekî ve firehtir ji herema Kardoxan dihatin birûniştin, -tevî ku herema Kardoxan jî ew bi ber xwe ve dida bixistin-.

Perçê sî û çaran ji mêjûwa wî di bin navnîşana "Geographica" dihate binavkirin û ew ji bona ciyografîyê dihate bidanîn. Ew hate

[1]Ji xwe re di vî warî de li "Der Bibel Atlas..., R. 21, neqşa 30 de bide bitemaşekirin. Cuma

[2]Ji xwe bi dûr û dirêjî ve li ser van ceng û şeran de di "Die orientaliche Welt" Burchard Brentjes, VEB Deutscher Verlag der Wissenschaften, Berlin sala 1972, r. 214-224 de bide bixwendin. Cuma

biwindakirin û jê bes û bi tenha ve perçe perçe di rêya ciyografîvanên li dûhatî de mîna Pilînê kevintir û Strabon-Srabo-Sitrabo[1] hatin bianîn. Danervan serdanîya Mersîlya, kenarên Ingiltera daye bikirin. Dibe, ku wî jî serdanîya Iskendinavîyan û derya Baltik jî dayite bikirin.

Mêjwûa wî bi raxistina rûdanên siyasî û supahî ve tête bidîtin, bi mebeste ku ew Peyên siyasetê û Serdaran bide bişiyarkirin. Wî ew li ser bingehê zanebûna xwe, Serdanên xwe de ji bona qadên rûdanan, pirskirina xwe ji Bînvanan, guhdarîkirina li goyên Kalan de û li ser bingehê nivîstên berî xwe de date binivîsandin. Herwehajî wî çûn û hatina nameyên xweyîtîyê jî nala kanîyekê ji kanîyên mêjûwê datin bikaranîn. Wî naskirina rastîyê dida biarmanckirin. Wî li hoyên nihan de mîna li nik Tukididês de dida bivenerandin. Belam mêjûwa wî bi cudabûna mêjûa Tukididês ve "Cîhanî" bû. Ew li ser Imperetorîya Romanîyî Nûhatî de dihate bimîlkirin.Wî salnama Olopy dida bikaranîn, jibervêjî mêjûwa wîyî demê pir bi kêm ve û bi nêzîkî ve tête bidîtin. Şêweyê wîyî zimanî bi dijwarî ve tête bidîtin û ew westandinê dide bikêrkirin.

- Julius Caesar-Yulyos Tisêzar[2] Kayzerê-Qeyserê Roma û Diktatorê wêyî helbijartî ji Mêjûvanên Romanîyî pêşîn tête bidîtin. Ew ji Peyê Dewletê, Serleşker û Destûrdanînvanekî pir hozan dihate bidîtin. Tevî ku Serdarîkirina wî li ser Imperatorîyê de biserêxwe bû, tanî ku Navê wîna bi têgihiştina "Imperatorîyê" -Qeyser- ve di piranîya zimanan de dihate biliberkevtin. Tevlivêjî de ew bihilgirtina vê navnîşanê de bi rengekî mîrîtî ve nehate birûniştin. Belam Serdarîkirina "Komarî" di pêla wî de bes û bi tenha ve bi nav ve dihate bidîtin.

Cesar-Tisêzar li şarê Roma de di 13 tîrmehê de di sala 101 -

---

[1] "Strabon-Strabo-Sirabo Gervan û Ciyografîvanekî Yunanî bû. (Ew ji sala 64 b. z. de tanî 19 z. de hatîye bijîyandin-. Ew ji Xelkê bajarê Amaseia-Amasîya ye, (yê ku ew îro li jorîrojhilatî bajarê Enqera de tête bikevtin-. Wî li ser gerên xwe de 17 nivîst di bin navnîşa civandî de "Geographa" de dane binivîsandin, yên ku wan navnîşana rûmeta "Bavê ciyografîyê" pê dane bidan. Hemû nivstên wî hatin bihiştin". "Den Sieben Weltwundern..." R. 229. Cuma

[2] ji xwe re li ser Julius Caesar de li "Der Bibel Atlas..." de li rûpelên 136, 137, 138 û 150 de bide bitemaşekirin. Cuma

yanjî di sala 100- b. z. de hate bizayîn. Ew di sala 62 b. z. de li Sipanya bi Serdar ve hate binîşankirin û ew di sala 59 b. z. de ji bona bajarê Roma hate bivegerandin. Wî ligel du Serleşkerên din de -Pompèe-Pombê û -Crassus-Kirasos- de Serdarîyeke -Triumvirat-Sêkesî- li ser Serê Dewletê de date bipêkanîn. Her yek ji wan bi navnîşana "Consul"-Kosul-Qunsul-Qunsil dihate binavkirin. Di sala 58 b. z. de ji bal Civata Pîrmerdan Serleşkerîya Leşkerekî gewre û Serdarîkirina heremekê li jorî Îtalya bi navê welatê -Galliya Cisalpine-Galîlîyê Pêş Elp ve hate bidan, -ya ku ew niha bi herema Torino û Mîlano tête binavkirin-. Di wê Salê de bi xwe jî ve wî bi Leşkerê xwe ve ji bona welatê Galî serokî date bihêrîşkirin, ya ku ew bi -Gallia Transalpine-Galîlîyî Paş Alp ve tête binavkirin. Ew Firensa niha ye û -ew bi zimanê Firensî Gaulé tête bigotin-. Wî ew piştî cengekê ji sala 58 tanî sala 49 b. z. de ligel Tudeyên wê de date bivekirin. Di wê navê de li paş mirina Crassus-Kirasos de Pompèe-Pompê biryarek ji Civata Pîremerdan bi derkirina Tisêzar-Qeyser ve date biderkirin. Li paş dawîkirina cengê de di welatê Galê de Cesar-Qeyser bi Leşkerê xwe ve ji bona Îtalya hate bivegerandin û wî ew date bivegerandin. Pompèe-Pompê ji bona Yunanê hate birevîn û Yulyos bi pey wî ve hate bikevtin. Wî ew li wêderê jî de date bibezandin. Ew ji bona Misrê hate birevîn û ew li wêderê de hate bikuştin. Belam Qeyser ji bona Misrê hate biçûyîn û wî ew kes li wêderê de dane bikuştin, yên ku wan dujminê wî dabûn bikuştin. Herwehajî wî li wir de Padîşahê Serdarê wêyî Yunanîyî dawî Ptolmèc-Petolmêsê sêzdehan date biderkirin, yê ku ew bi navê Serleşkerekî Iskenderê Mekdonî ve dihate binavnîşankirin. Wî Cloepatre-Kilopatra bi Padîşaha ser wê deverê ve date bihildan, ya ku ew yara wî bû. Ji Misrê Qeyser ji bona Asya Biçûk hate biçûyîn û li wêderê de wî şerê dujminên xwe date bikirin. Li paş vê de ew di sala 48 b. z. de ji bona paytextê hate bivegerandin. Civata Pîremerdan ew ji bona bîst salan bi "Diktator" ve date binîşankirin. Di sala 47 b. z. de wî ceng li Efrika de û li paş jî de li Sipanya de date bilidarxistin û wî şûreşa Binemala Pompî date bitemirandin. Li paş vegera wîna de ji bona bajarê Roma Civata Pîremerdan Padîşahîya Roma ji bona ser wî dane bipêşkeşkirin. Belam wî ew date binayînkirin. Lêbelê Civatê pûl bi navê wî ve datin bilêdan û pûtên wî li qadên giştî de datin bihildan. Di pêla wî de tevaya deşta

derya Sipî ji Purtugal tanî Misir, Surî û dola Firatêyî Bilind bi deşta Romanî ve hate bikirin. Qeyser li ser xwe bû û ew ji bal çînîyên gelîrî ve dildar bû. Wî veçakkirinên civakî û aburî dane bikirin. Herwehajî wî jimareke pir ji Romanan ji bona welatên cudan di Imperatorîyê de dane birêkirin û ew li wêderê de dane biwarkirin. Wî ji bona wan Romanan mafeyê neşînvanîyê di nava wan welatan de date bidan. Herwehajî wî ji bona bajar û heremên dinî Îtalî Mafeyê Xwedmoxtarîyê nala bajarê Roma date bidan. Ew di sala 44 b. z. de bi lêdana xencerekê ve bi bêbextî ve hate bikuştin. Wî li dûxwe de Lawek bi navê Oktavius -Oktavyus[1] date bihiştin. Di sala 42 b. z. de Civatê û Miletê Romanî Qeyser ji bona nava Xwedanan datin bihildan. Wer bi vî rengî ve Oktavius bi "Kurê Xwedan" ve hate bikirin.

Qeyser ji me re du nivîst di mêjûwê de dane bihiştin. Yek bi navê "Cenga Gal" -De Bello Gallico- di heft "Nivîstan" ango perçan de date binivîsandin, ya ku wî di wê cengê de ji sala 58 tanî 52 b. z. de -her perçeyek di salekê de- dabû bibeşdarîkirin. Salên dawîyî wê cengê Mêjûvanekî din li ser wan de date binivîsandin. Nivîsta duwem di bin navnîşana "Cenga Navxweyî" -De Bello Civili- de date binivîsandin. Herdu nivîst bi zimanê Latînî dane binivîsandin. Herdu nivîst û nemaze nivîsta yekem mîna nimûneyeke mêjûyî supahî û sitraticî tête bidîtin. Ew mîna kanîyeke kilasîkî hatîye bikirin û hêjî ew di zanistgehên supahî de tête bixwendin. Ji alîyê şêweyê mêjûyî de nivîstên wî di hûrbûna bibîrxistina rûdanan de, girêdanên wan ligel hevdû de, di lêvenerandina hoyên wan û encamên wan de, di jîrbûna têgihiştina rewştan û liberxistina wan de bê boşayî bi nimûnetî ve têtin biderkevtin.

Wî mêjûwa xwe nala "Raportên Supahîyî" kurt ji bona Civata Piremerdan didate binivîsandin. Wî têde li ser xwe de bi kesê sêyem ve didate biaxivtin. Armanca wî têde berzkirina pêrabûn û şopên xwe ji bona bîr û bawerîya giştîyî Romanî dihate bidîtin, da ku ew dujminên xweyî siyasî bide bilawazkirin. Wî li gora bawermendîya Mêjûvanên li paş wî de di bîrxistina rastîyan de nedabû biderewekirin.

---

[1]Ji xwe re li ser Oktavius û kuştina wî de li ser destên Partan de li: "Ruhm und Untergang des alten Iran" de, 103-107 bide bitemaşekirin. Cuma

Qeyser di nivîstên xwe de gotar li ser reweşta Merov de datin bianîn. Hin ji gotinên wî mîna nimûneyên sincîtîyê û perwerdekirinê têtin bidîtin. Herwehajî di "Cenga Gal" de rûnkirinên ciyografî û êtnogirafî li ser reweştên Galîyan, rabûn û rûniştinên wan û şêweyê rêya jîyana wan de hatine binivîsandin.

Galî di koka xwe de Miletekî Celte-Keltisch-Kiltî bû. Celte-Siltî-Kelt-Kiltî di nava Ewropa navînî de di pêşî de di pêşîya hezar salê duwemî berî zayîne de hate bidaniştin. Li paş de wî ji bona Firensa û hêl û berên wê ji pêşîya sedsalê pêncemînî berî zayînê de date bibarkir'.. Miletê Galî ji bona çend pîştan dihate bişaxkirin û ji bona her piştekê navekî wîyî taybetîyî pêve dihate bidîtin. Devera rûniştina Galî ji sînorên Firensayî nihayî, mîna ku me date bidîtin, dihate biderkevtin. Wê Îtalya jorî -Galia Cisalpine-, Belçîkya -Gallia Belgica- û Siwêsra -Confederatio Hevatica- jî bi ber xwe ve dida bixistin. Qeyser şerê hemû piştên Miletên Galî date bikirin û wî Miletê Helvêtî Galî ji bona nava welatê wîyî kokî de di nava dilê çiyayê Elp de date bivegernadin, yên ku wan xwe ji bona barkirina ber bi rojava de dabûn bilidarxistin[1].

Ji pêla Qeyser de welatê Gal bi deverekê ve ji Imperatorîya Romanî hate bikirin. Têde Barkirvanên ji bajarê Roma û Îtalya hatin bidaniştin. Miletê Galî wirde wirde bi bajartîya Romanî ve hate bireweştkirin. Wî dev ji zimanê xweyî kokî ve date biberdan û wî ji xwe re zimanekî din bi navê "Galî Romanî" -Gallo-Romaniu- ve date biwergirtin, yê ku wî ew bi zimanê Latînî ve li ser bingehê Kiltîyê kevnar de date bitevlihevkirin. Ev zimanê hanê bi bingehê zimanê Firensîyî niha ve tête biderkevtin.

Ji Mêjûvanên Latînîyî bi nav û bang ve divê em Casius Salluste-Kayus Salust bidin bibîrxistin, yê ku ew bigir ji sala 86-35 berî zayînê de hatîye bijîyandin. Ew li ser rêya şêweyê nivîsandina Qeyser dihate biçûyîn. Şêweyê nivîsandina wîna saloxdanî bû û ew li ser şêweyê rêya Yunanî de bû.

[1]Ji xwe re li agehdarîyên bêtir de li ser Kilt û Galîyan de di derîyê heftemî vî beşî de -Gerek ligel Birodol de di mêjûwa Firensa de- bide bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

- Titus Livius ji gewretirîn Mêjûvanên Latînî bû. Ew di herema Padova -nêzîka Vinêtsya- di sala 59 b. z. de hate bizayîn û ew li Badova de di sala 17 paş zayînê de hate bimirin. -Hinek didin bibawerkirin, ku ew ji sala 64 b. z. de tanî sala 12 paş zayîne de hatîya bijîyandin-[1]. Wî tevaya jîna xwe di navbera bajarê Roma û bajarê xwe de date birabuhurandin. Wî ji sala 29 b. z. de tanî mirina xwe ji bona nivîsandina mêjûwa Roma ji bidestpêkirina Evsana pêla herdu Birayên Cêwî Romulus û Remus date bikarkirin, -ya ku wê ji sedsalê heştemînî b. z. de dayite bidestpêkirin, di dema ku herdu Birayên Cêwî bi şîr ve li gora evsanê de bi şêrî gurekê ve dihatin bişîrvekirin, ya ku wê ew ji fetisandina ava çemê Tiberis datin birizgarin-. Danervan ji bona dawîkirina mêjûwa xwe sala 9 b. z. date bidanîn. Wî ji wê demê û pêve nema li ser rûdanên dema xwe de date binivîsandin. Wî nivîsandina mêjûwa xwe bi dawîbûna Serdarîya Imperator Augustus-Awgustos Kurê Qeyser ve date bidawîkirin. dema Serdarîya Augustus Kurê Qeyser berzbûna bajartîya Romanîyî Putperestî û Serdarîya Qanûnê dide bitackirin. Ew nivîsteke gewre ye û ew di 142 derî de bi zimanê Latînî ve di bin navnîşana "Ab Urbe Condita Libri" hatîye binivîsandin Jê bes û bi tenha ve 35 derîyê giştî ji bona me -ji wan deh derîyên pêşî û ji derîyê 21 tanî 45- û hin ji perçeyên derîyên din hatin bigihaştin. Derîyên wî ligora birêk û pêkxistina demê de hatine biparvekirin. Ew hin caran di nava wan de ji bona raxistina rûdanan tête birawestandin, da ku ew rê bi peyvdarîyan û perçeyên felsefê ve bide bidan.

Nivîst bi giştî ve felsefeyeke mêjûyî dide biwênerkirin û ew li ser bingehê welatperwerîya Romanî û lêgerandina hoyên mezinbûna Roma de tête biavakirin, yên ku ew ji bona sincîtîya Roma têtin bivegerandin. Danervan bi rûçikên Romanîyî Nimûnetî ve didan biberçavkirin, yên ku ew bi dîtina wî ve di pehlevanîyê, dildarîya biserkevtinê, pêgîrîya di kar de, bînferhbûn û hogirîya bîr û bawerîyên dadweryê de dihatin bidîtin. Nivîsta wî alîkarîya bi hîmkirina remana Yekitîya Imperatorîya Romanî ve di cudabûna deverên wê de date bikirin. Ev remana hanê hate bidiyarkirin, ji gava ku Serdarîya Komarî

[1]Insiklopêdîya Elmanîyi Biçûk "Meyers Taschen Lexikon", r. 599 de mêjûwa pêşî ji bona jîyana wî dide bitomarkirin. Cuma

ji bona Imperatorî hate biveguhertin; tevî ku Danervan jî di felsefa xweyî siyasî de Komarî bû.

Mîna ku di mêjûwa Polib de hatibû binivîsandin, wehajî Titus Livius-Livyus li ser Miletê "Kurt" de date biaxivtin, yê ku wî Serbazên Peye didan bipêşkeşkirin û wan beşdarî di nava cengên di navbera Imperatorîya Romanîyî Nûhati û Padîşahîya Silokîyî Yunanî de di pêla Padîşahê wêyî Antiochos-Antixosê III de, -yê ku wî bigir ji sala 223-189 b. z. de dayite biserdarîkirin-, didan bikirin. Ev Padîşahê Sulokî di şerê Magnesia-Magnêzya de di sala 189 b. z. de hate bibezandin. Herwehajî em Serbazên Peyên van "Kurtan" jî di nokerîya Padîşahê bajarê Pergam-Pergamon-Pêrgamonî[1]Yunanî de di Asya Biçûk de di sala 171 b. z. de didin bidîtin.

- Ji Mezinên Mêjûvanên Romanî divê Cornelius Tacitus-Kornêlyus Takitus bête bibîrxistin, -yê ku ew bigir ji sala 56-120 z. de hatîye bijîyandin-. Bi pirbûn ve ew ji Necadê Kiltî ye, belam ew bi Romanî ve hate bikirin. Wî nivîstên xwe bi zimanê Latînî ve dane binivîsandin. Wî cihê Serdarekî Serpereştîyê di Imperatorîyê de dayite bigirtin. Wî li paş de dev ji karmendîtîyê dayite biberdan û wî xwe bi Danînvanîyê ve dayite bikarwerdekirin.

Ji nivîstnên Takitus divê "Diyalog"-Hevaxivtin- -li ser hunera peyvdarîyê de-, "Histoires" -bi pirî ve--Mêjûyan, "Annales"-Saldanî -ango mêjûwa salanî- û nivîsta wîyî li ser Eşîrên Germanîyî rojhilatî

[1]"Pergamon-Pêrgamon bajarekî Yunanî ye û ew li rojavayî Asya Biçûk de tête bikevtin. Ew ji bal Aiolern de hatîye biavakirin. Ew Iro li Turkîyê de bi navê Bergama tête binavkirin. Li paş mirina Iskenderê Mezin de ew bi paytextê Impretorîya Yunanî ve hate bikirin. Ew di pêla Padîşahîya Binemala Attali de bi girintirîn Navînîya Şehristanîya Helênîyî-yunanî- ve hate bikirin. Li ser burcên wê de kavilên Perestgehekî fireh û Kahan hatine bihiştin. Li jêr pîyên wê de mayînên temaşegehekê û yarîgehekê têtin bidîtin. Herwehajî li wan nêzikan de kavilên Asklepieons jî têtin bidîtin, yê jê dergehê bi nav û bangê "Zeusaltar des Berliner Pergamonmuseums"-Tizoyisaltarê Şopxana Pêrgamon li Berlin têtê biditin. Vî bajarê hanê serxwebûna xwe di sala 133 b. z. de ji nava destên xwe date biwindakirin, gava ku Attalos di temînîya mirina xwe de ji bona Roman date bidiyarîkirin". "Den Sieben Weltwundern..., R. 225". Cuma

çemê Rayin û jorî çemê Danop de di bin navnîşana "De origine etsitu Germanorum" -Kok û Cihê German bête bibîrxistin. Ev nivîsta wîyî dawî ji rengê êtnografî tête bidîtin. Têde ew saloxdana reweşt û bawermendîyên Eşîrên Germanî dide bidan û ji bona vêna jî giringbûneke wêyî mêjûyî tête biderkevtin. Lêbelê wî agehdarîyên xwe ji serçavîyên dinî berî xwe dabûn biwergirtin, yên ku ew hatine biwindakirin. Wî ew agehdarîyên hanê bê rêk û pêkî dane bikomkirin. Herwehajî wî ew danava hanê bi rengekî zanistî ve bi têgihiştina êtnolocîyî niha ve nedaye bixwendekarîkirin, lêbelî wî dayite bikarkirin, ku ew bide bicîkirin: ku "Qencê Hovî" Germanî ji "Merovê bajarvanîyî genîyî" -Romanî- bi baştir ve tête bidîtin. Danervan di hemû nivîstên xwe de mêldarîya amojgarîyên sincîtîyê dide bigirtin. Ew rexne li genîbûnê de dide bikirin û ew pesnê qencîtîyê dide bikirin. Şêweyê wîyî nivîsandina mêjûwê ji rengê saloxdana Yunanî tête biderkevtin. Nivîstên wî hemû bi hev re bi me ve nehatine bigihaştin.

- Divê hin ciyografîvan bêtin bibîrxistin. Ji bi nav û bangtirîn van jî ve di pêla Romanî de Strabo-Strabon-Sitrabo[1] bû, yê ku ew di dema Îsa de -ji sala 64 yanjî 58 b. z. de tanî 21 yanjî 25 paş zayînê de- hatîye bijîyandin. Ew li bajarê Amasya de li Asya Biçûk de hatîye bizayîn. Bi pirbûn ve ew ji koka "Asyayî" bû, belam zimanê wî Yunanî bû. Ew demekê li bajarê Roma û Iskenderîyê de hate bijîyandin û li paş de ew ji bona cihê serê xwe hate bivegerandin. Nivîsteke wî di mêjûwê de mîna bi dawîkirina mêjûwa Polib tête bidîtin. Belam ew nivîsta hanê bi tevaya xwe ve hate biwindakirin. Belam nivîsta wî di Giographice-Giyografik de bigir hemû bi carekê ve bi me ve hate bigihaştin. Ew di nava xwe de saloxdanîyeke ciyografî ji bona gelek welatan û Miletên wan dide bihilgirtin. Ji van welatan jî Îtalya, Sipanya, welatê Gal,

[1]"Strabon Yunanîyekî Gervan û ciyografî bû. -Ew ji sala 64 b. z. de tanî 19 Paş zayînê de hatîye jîyandin-. Ew ji bajarê Amaseia-Amasya bû, -ya ku ew îro li jorîrojhilatî ji bajarê Enqera tête kevtin-. Wî li ser Gerên xwe de Heftdeh Nivist dane nivisandin û wî ew di bin Komkirinanavnîşana "Georaphika"-Giyografika de datin nivîsandin, yên ku wan jê re Navrûmeta "Bavê Giyografî" datin anîn. Ev hemû Nivistên hanê hatine hilanîn". "Den Sieben Weltwundern..., R. 299. Cuma

Ingilistan, roj û rojhilatî Ewropa, Balkan, Misir, Sikîlya-Siqilya, Yunan, Asya Biçûk, Erministan, Mîdya, Mêzopotamya, Faris, Hindistan Arabic-Erabya, Hebeşistan û jorî Efrika têten bidîtin.

Kevnaran tu guh bi ciyografîya wî ve nedane bidan. Ewropîyan di dema vejandinê de ew datin bidozandin. Wan ew date biçapkirin û li ser wê de datin binivîsandin. Ew ji nivîstên pir giranbuha di ciyografîya mirovanîyî kevnar de, di êtnolocî de û di pêwendîya di navbera Miletan û dorhêla serûştî de têten bidîtin. Têde letek li ser "Kurt", "Mard" û Kadussi" de hatîye binivîsandin û ew bi hev re mîna Eşîrên Nîvgerok hatine bibîrxistin, yên ku ew di nava çîyayên Ezerbêçanê, Zagrosê û Erministanê de têtin bijîyandin. Bi pekbûn ve têten bidîtin, ku rojhilatnasvanan pir guh bi vî letê hanê ve nedane bidan, tevî ku Danervan jî dide bigotin, ku ev Eşîrên çîyayîyî hanê, çi yên ku ew li Ezerbêcanê de, yanjî li Zagrosê de û yanjî li Erministanê de dijîn, tev bi hev re yek Miletî didin bipêkanîn; "heger ku Merov ji xwe re li rûçikên wan de bide bitemaşekirin". Halo Merov dikare bide bigotin, ku Strabo-Sitrabo di vî letê hanê de nasîna pêşîyî ciyografî ji bona dirêjbûna welatê Kurd di heyamê xwe de mîna yek Miletî dayite bidan, yê ku ew ji bona Eşîran dihate biparvekirin.

Ji ciyografîyê kevnarîyên bi nav û bang ve Claudius Ptolèmèe-Claudius Ptolemäus-Kilawdiyus Pitolêmoyisê Yunanî bû, -yê ku ew li nêzika sala 90-168 paş zayînê de hatîye bijîyandin-[1]. Wî piranîya jîna xwe li bajarê Iskenderîy de dayite birabuhurandin. Bi rastî ve ew di jimaryarîyê de, di nasîna çerx, sitêr û ronahîtîyê de Zanistvan bû. Wî li ser ciyografya û narînê dayite binivîsandin. Ji nivîstên "Guide gèographique-Rêbera ciyografî" têten bidîtin. Di vê nivîsta hanê de Mîdya û Eşîrên -Kurt- û -Mard- hatine bibîrxistin û li ser tevan de bi hev re têjî saloxdan hatîye bidan.

Li ser ronahîya hatinên derbarê Miletê -Kurt- de di wê nivîstê de jimarek ji Rojhilatnasên Elmanî pê hatin birabûn, ku wan koka Gelê Kurdî niha ji bona wan Kurtan datin bivegerandin, yê ku zimanê

[1]Di Insiklopêdîya Elmanîyî Biçûk de hatîye binivîsandin, ku Claudius Ptolemäus ji nêzîka sala 90-160 Paş zayînê de hatîye bijîyandin. "Meyers Taschen Lexikon"..., r. 803. Cuma

wan ji malbata zimanên Îranî -Hindo-Ewropî- bû. Ew bi cudabûna dîtina kevnarî ve dihate biderkevtin, ya ku wê koka Kurd ji bona Miletê Kardo didate bivegerandin, mîna ku Xenofon dabû bibîrxistin û nemaze ku zimanê kardoxan, -mîna ku piranîya Rojhilatnasan didan bibawerkirin, ku ew zimaneke ji malbata Kefkasî-Qefqasî bû. -Em tu tiştî li ser wî zimanî de nizanin-. Li ser wê dîtina wan de Mamostên Elmanî -Weissbach, A. J. Reinach, Hartmann û Lehmann - Haupt- û Zanistvanê Rusî V. Minorsky bi danîna dîtinekê ve li ser daketina koka Kurdan ji du Eşîrên Gewreyî zimanê Iranî: Kurt û Mard hatin birabûn. Ev herdu Eşîrên hanê di wê heremê de bi xwe ve jî dihatin bijîyandin. -Belê hinek bêtir têtin biçûyîn, ku navê "Mard" ew bi xwe ve ji bona Miletê Kutr-Kurd bes û bi tenha ve mîna bangekê bû, ya ku ew ji bal Miletên hemsayên wî ve pê dihate bigotin-. Minorsky di Kongirê Rojhilatnasên NavDewletan de, yê ku ew li Biroksêl de der sala 1938 de hate bigirtin, ev lêgerandina xwe date bipêşkeşkirin. Belgeyên vî Kongirê hanê bi zimanê Firensî ve hatin bibelavkirin. Wî lêgerandina xweyî berî vêna di bin navnîşana "Kurd" de di Insiklopêdîya musulmantîyê de dabû binivîsandin. Belam dîtina wî li ser koka Kurd de di vê lêgerandina wîyî pêşî de hêjî ew bi têrbûn ve nahatibû bitirşkirin. Lêbelê Minorsky li paş de lêgerandinên pir giring li ser Kurd de datin binivîsandin. Ez dê careke din ji bona ser vê danavê di beşê "dîtinanan..." de bêtim bivegerandin.
- Flavius Arrianus Mêjûvan û Feylesufekî hêja bû. Ew li herema Bithynic de -li jorî rojavayê Asya Biçûk de- û bi pirbûn ve ji kokeke Asyayî hatîye bizayîn û zanebûna wîna Yunanî bû. -Ew ji sala 95-175 z. de hatîye bijîyandin-. Ew Serdarekî Supahîyî Romanî ji melbenda Kappadoce-Kepadokya bû. Wî di pêla Imperator Hadrian-Hadriyan de di sala 134 z. de hêrîşa Miletê Alan ji Kafkasya de date bivegerandin.

Arrianus-Aryanus Xenofon mîna Rêberekî Supahî û Polîb mîna Mêjûvanekî bi numûnetî ve ji xwe re dane bigirtin. Wî mîna Polib dida bibawerkirin, ku divê Mêjûvan bi xwe ve ji bona tiradên rûdanan bête biçûyîn , da ku ew bi herdu çavên xwe ve Bînvanan bide bidîtin. Nivîstên wîyî felsefî têtin bidîtin, yên ku ez li ser wan de nadim biaxivtin. Nivîstek wîyî mêjûyî li ser "Mêjûwa Parthia-Partîya" -Îran- de hebû, ya ku ew bi carekê ve hatîye biwindakirin. Nivîstek wîyî din li ser mêjûwa "Indike-Hindistan" heye, ya ku ew li ser

nivîstên hinekan de ji berî wî bûn. Nivîsta wîyî sêyem li ser mêjûwa Şûngirên Iskenderê Makdoni de bû. Belam nivîsta wîyî serekî ew li ser jîn û vekirinên Iskender de di Asya de bû. Wî navê wê bi "Anabasis" ve -ango "Raserdan" yanjî "Pêgîrîkirin"- mîna Xenofon date binavkirin.

Mêjûwa wî li ser jîn û vegirtinên Iskenderê Makdonî de bi nivîstek baş ve tête bidîtin. Wî bi piştrastî ve têde gotinên Mêjûvanên berî xwe datin bianîn. Herwehajî wî têde bi hûrbûn ve cengên Vegirtvanê Yunanî di diyarên cudan de û navên Miletên kevnar, yên ku Iskender ligel wan de bi şer ve hate bikevtin, ligel saloxdana ciyografîya welatên wan de date bianîn. Di nivîsta wî de navê Kurt, Mard, Kadosî û Kosî, -yên ku ew Kassi-Kasîyê Loristan û Bextiyar bûn-, Mîdya, Suse-Suz--Paytexta Êlam. Cuma--,Faris û Padîşaha Korduene-Kordoîn hatine bibîrxistin. Di nava mêjûwa wî de şabaşî û pesindanî nayête bidîtin, mîna ku ew di hin mêjûwan de dihatin bidîtin, jî yên ku hin Nivîsvanan ew li ser Iskender de dabûn binivîsandin; -tevî ku wî jî dîtina Yunanî dida biderxistin-.

- Divê em Plutarque[1]-Plutarxos nedin bijibîrakirin. Ew Mêjûvanekî Jîndarînivîsvan û Feylesufekî mezin bû. Ew ji Arryanius him bi nav û bangtir bû û him jî ew jê kevintir bû. Hêjî ew tanî vê roja me jî bi nav û bang ve tête bidîtin. Ew li Yunanê de di nêzika sala 50 paş zayînê de hatîye bizayîn. Wî mîna Mamostakî di mêjû û felsefê de li bajarên Etina, Roma û Iskenderîyê de dida bipeyvdarîkirin. Li paş de ew ji bona welatê xwe hate bivegerandin û ew di Perestgeha Delphi-Delfî-de bi keşe ve hate bikirin. Ew di nêzîka sala 125 z. de hate bimirin.

Pilutarxos gelekî bi berkirvan bû. Wî ji me re pir nivîst di warên felsefê, mêjûwê û zanistîyên sincîyê, peyvdarîyê û perwerdekirinê de û li ser tevgera Mamostên Sofistan de datin bihiştin.

---

[1]"Plutarque-Plutarchos -bi Yunanî--Pilutarxos Nivîsvanekî Yunanî bû. -Ew di nêzîka sala 46-120 z. de hatîye bijîyandin. Ew Nivîstvanekî nivstên felsefîyî gelêrî bû. Bi taybetî ve nivîsta wî li ser jîndarîya 46 ji Gewreyên Yunanî, Romanî bi nav û bang ve tête bidîtin". "Den Sieben Weltwundern..., R. 226. Cuma.

Nivîstên wî di pişt re kêrek li ser kelandina dema vejandinê de dane bikirin. Ew di şêweyê xwe de hozan bû, ew di wêjûwa xwe de Firehvan bû û ew di peyivandina xwe de Zimanvan bû. Piranîya nivîstên wî bi me ve hatin bigihaştin. Ev jî nîşana guhdana Zanistvanên Pêhatîyên wî bi nivistên wî ve dide biderxistin.

Ji nivîstên wî nivîsta li ser "Vies Parallèles-Parallel Lives"-Parall biographien -Jindarîyên Beramberkirîyên Merovên Gewre- bi destên me ve hate bigihaştin. Pilutarxos di navbera mêjûwê û jîndarînivîsîn de dida bicudakirin, bi têgihiştina ku jîndarînivîsînê bi serdejî ve ji bil kara wêyî mejûyî ve wê hêjî bi bêtir ve liberkevtina amojgariyê, perwerdekirinê û sincîtîyê dide biarmanckirin. Di vê nivîsta wî de li ser jîndarînivîsandina 46 Merovên Gewre -yanjî 23 Cot- de hate binivîsandin. Nîvek ji wan ji Yunanîyan bû û nîvê din ji Romanan bû. Jibervêjî navnîşana wêna bi gotina "Beramberkirinê" ve hate binivîsandin. Merov dikare wî nala Bingehvanê rêya raxistina mêjûwê di rêya jîna Merovan de bide bidanîn; jibervêjî kêra wî li ser Shakespeare-Şêkêspîr[1], Rousseau[2]-Roso û Montaigne-Montêgnê[1] de

[1]Shakespeare William ji sala 1564-1616 z. de hatîye bijîyandin. Yekek ji gewretîrîn Helbestvanên temaşegehên Ingilzî tête bidîtin. Insiklopedîya Elmanîyi Biçûk Meyers Taschen Lexikon... R. 918. Cuma

[2]Ji xwe re li ser Jean Jacques Rousseau de bi kurti ve di nivîsta "Pholsophen/Lexikon -Insiklopêdîya Feylesufan-, Dietz Verlag Berlin 1984, R. 783-788 de bidin bitemaşekirin.
"Rosseau Jean Jacques di sala 1712-1778 z. de hate bijîyandin. Ew Nivîsvan û Feylesufekî Firensî ye û ew ji bajarê Genf-Gênfê ye. Ew ji giringtirîn remangîrê Sûreşgêrê bajarvanîtiya Firensiyî Biçûk berî Şureşa Firensî tête bidîtin. Wî nivîstên xwe li ser Rexnetîya Şehristanî, Perwerdekirinê û Zanebûna Mafeyê Dewletê datin binivîsandin, yên ku kêra wan ji bona tevaya Ewropa dihatin bidîtin. Wî Ev nivîsandinên hanê "Die Neue Hèloise"-Hiloyisa Nuh, "Emile"-Emil-, "Der Gesellschatvertrag"- Peyamana Civakî û "Bekentnisse"- Mukurhatin dane binivîsandin". Insiklopêdîya Elmanî "Meyer Taschen Lexikon", R. 854

Nivistên wî yek ji yan din li ser rewşa civakîyî hebû agirpijtir bû. Ez pir bi nivistên wî Emîl û Peymana Civakî ve hatime bidildarîkirin. Ez hêvîdarim, ku dê ez rojekê van herdu nivîstên wî ji bona Biçûkên Kurmancan bi Kurdî ve bidim biwergerandin û li ber destên wan de bi zimanê dê ve bidim bidanin, da ku belkî agirpijên remanên wî xişxaşa ayîna sedsalên navînî ji nava welatê meyî perest bidin bitarûmarkirin, mîna ku wan ew di nava Firensa Kevnar de di rêya Şureşa Firesî de di sala 1789 de datin binabûdkirin. Cuma

hate bidîtin. Dibe, ku wî hinekî jî li ser rûçikên başîyên Pehlevanên xwe de dayite biçirandin. Ew li ser rêya yunanî de di nigaşkirina gotin û pevdarîyên wan de hatîye biçûyîn, bêyî ku ew ji rastîya mêjûwê bête biderkevtin. Ji nava wan Merovên ku wî li ser çîroka jîyan wan de dayite binivîsandin, Lucullus -Lukullusê- Serleşker û Gewrevanê siyasîyî Kunsilê Romanî bû, yê ku wî Serokitîya serradaneke Romanî di rojhilate de di nava sedsalê yekemî berî zayînê de pê hatîye birabûn û wî di vê serradana hanê de Tigranê Duwemê Padîşahê Erministanê dayite bitarûmarkirin. Di vê pêla hanê de Padîşahîya Korduene-Kordoîn -kurdistana navînîyî niha- di wan cengegan de hevalbendîtiya Roma dida bikirin, -mîna ku ev di peyvdarîya Lukullus de ji bal Plotarchos-Piltarxos hatîye bianîn-.

- Herwehajî divê em Pline l'ancien-Pline der Alte-Plinius[2]-Pilinyus nedin bijibîrakirin. Ew ji sala 23 tanî 73 z. de hatîye bijîyandin. Ew Efserekî Romanîyî Suwarî bû. Li paş de ew bi Serleşekerekî derya ve hate bikirin. Ew bi gewretirîn Zanistvan û Feylesufê Roma ve hate bikirin. Ji şopên wêyî bi nav û bang ve "Naturalis Historian-Naturgeschichte" -mêjûwa Serûştîyê- tête bidîtin, ya ku ew di 37 perçan de di warên zanistîyên mirovanî, serûştî, cenawerî, şînatî, bijişkî, ciyografî û mêjûyî de hatîye binivîsandin. Herwehajî têde lêgerandinên li ser Rojhilat û Kurdistanê jî de têtin bidîtin. Ji şopên wî jî "Bella Germaniae" -cenga Germanî- tête bidîtin. Di vê nivîsta hanê de cengên Romanî dijî Eşîrên Germanî tête bibîrxistin, yên ku ew di

---

[1]Montaigne-Montêgnê Michel di sala 1533-1592 z. de hatîye bijîyandin. Ew Merovanîkî û Sincîvanekî Firensî bû. Wî di nivîsta xweyî "Essais" de ji bona dema xwe bîr û Bawerîyên Libuhurandinêyî pir mezin datin biderxistin. Insiklopêdîya Elmanîyî Biçûk "Meyer Taschen Lexikon, r. 663. Cuma

[2]Plinius-Pilinyus Nivîsdarekî Romanî bû. Ew di sala 23-79 hate bijîyandin. Wî Isiklopêdîya xweyî di 37 nivîstan de di bin Navnişana "mêjûwa Şerûştîyê de" date binivîsandin. Insiklo. Elmanî "Meyer Taschen Lexikon, r. 775. Cuma

çavên Roma "Dêya Bajartîyê" de bi Berber-Barbar- ve dihatin bidîtin. Ev nivîsta hanê di bîst perçan de dihate bidîtin.

- Ji Mêjûvanên di sedsalê sêyem de Dio Cassius-diyo Kasyus tête bidîtin. Wî mêjûwa Imperatorîya Romanî date binivîsandin. Têde ew li ser serradan û cengên Romanî de ligel Şahînşahîya Farisî de hate biaxivtin. Herwehajî ew li ser devera Kurdistanê jî de hate bipeyivandin û wî têde bi tengalkirî ve jî li ser hinekan ji Eşîr û welatên Kurd date bibîrxistin.

- Ammianius Marcellinus[1]-Ammyaniyus Marsilinus di sala 330-395 z. de hate bijîyandin. Ew Dawîvanê Mêjûvanê Gewreyî Romanî di heyamên kevnar de bû. Wî ligel Tacitus-Takitus de hevdû didan bigirtin. Ew di koka xwe de Yunanî bû û ew li bajarê Antakya[2] -Surî-de hate bizayîn. Ew di rewş û zînetên Rojhilat de Karnas dihate bidîtîn. Ew ji bona nava rêzên Supahî hate bikevtin û wî nala Efserekî di serradanên Romanî de ji bona deşta Furatî jorî dijî Şahînşahîya Sasanî[3] de dayite bibeşdarîkirin. Herwehajî wî li Ewropa jî de dayite

[1]"Ammianus Marcellinus Dawîvanê bi nav û bangê Mêjûvanê dema kevnar bû. -Ew li nêzîka 332-400 z. de hatîye bijîyandin-. Tevî ku ew Zayînvanekî Yunanî bû, wî 31 nivistên xwe li ser mêjûwa Imperatorîya Romanî de bi zimanê Latînî ve date binivîsandin". "Den Sieben Weltwundern...R.214". Cuma

[2]Antiochia-Antakya bajareke li Asya Biçûk de tête bikevtin. Ew di dema kevnar de ji bona demekê paytextê "Seleukdenreich" -Imperatiriya Silcokiyan bû. Di dema Qeyserê Romanî de ew bajerekî mezin bû û ew cihê çûn û hatina kerwan bû. Ji sala 1098-1268 z. de Mîrneşînîya Normanîyî Xaçperestan bû. Ew ji sala 1517-1919 de bajarê Şehrîyarîya Osmanî bû. Ji sala 1919-1939 ew li jêr serdarîya Firensî de bû û bi Surî ve dihate bigirêdan. Ji sala 1939 perçeyek ji dewleta Turkî tête bidîtin. "Meyers Taschen Lexikon" -Insiklopêdîya Elmanîyî Biçûk, r. 43. Cuma

[3]"Sasaniden-Sasanî. Desthilatîya Binemala Sasnîyî Farisî ji sala 226 berî zayînê de tanî 644 paş zayînê de dayite biserdarîkirin. Ew bi navê Sasan ve hatîye binavkirin, jiber ku navê Bavê Şahê Ardeschirs-Erdeşêrê pêşîyî vê Binemala hanê Sasan bû. Şahînşahîya Sasanîyan Ereban'di bin Rêberîya Xelife Omer de di sala 644 z. de datin

bişerkirin. Wî mêjwûa xwe bi zimanê Latînî ve di bin navnîaşna "Rerum gestarum Libri" -Nivîstên ji bona Gerandina Welêt- date binivîsandin. Di nava wê de dirêjkirinên li ser ciyografîya devera Kurdistanê, çûyînên Leşkeran, agehdarîyên cengan û hinek bibîrxistinên li ser welatên û Eşîrên Kurdan de têtin bidîtin.

binabûdkirin û wan Faris ji bona jêrdestên xwe datin bixistin". "Den Sieben Wetltwundern...R. 228. Cuma

## 2. Mêjû di Nava Sedsalên Navînî[1] û Bêzentî -Roma Rojhilat- de

Piştî jihevkevtina Imperatorîya Romanîyî rojava beramber bi hêrîşên Eşîrên Barbarî ve, wergirtina ayînîya fileteyî ji dêlva pûtperestîyê û sazkirina Kenişta Papayiyî Katolîkî di Roma de zanistîya mêjûwê bi hoyên zalbûna remanên ayînîyê û kenîştê ve hate biserjêrkirin. Mêjûvan bi giştî ve di nava Peyên kenîştê û karmendên wêna de dihatin bidîtin. Wan bêtir xwe ji mêjûwê bi kar û barên ayînyê û bibîrxistina perestên wê ve didan bimijûlkirin.

Imperator Constantin-Konstantinus[1] ev veguhertina hanê di nava siyaseta xwe de date bigewdekirin. Wî ayînîya filetîyê bi ayînîya mîrîtîyî Imperatorîyê ve date bidanin û wî paytextê xwe ji bajarê Roma ji bona bajarê Byzante-Bêzanta Yunanî date biveguheztin û wî navê wî bi navê xwe ve ango Konstantin di sala 330 z. de date biveguhertin. Wî ev jî jiber hoyên ciyografî, -bajarê Konstantin di nîvê Imperatoryê de dihate bikevtin- û sitratîcî date bikirin; jiber ku wî dixwest, ew sînorên Imperatorîya xwe ji hêrîşên Êlên Germanî ji jor de, ji hêrîşên Êlên Silavî ji jorîrojhilat de, ji hêrîşên Dewleta Şahînşahîya Sasanî û Êlên Îranî -Kurdî- ji rojhilat de bide biparastin.

Gava ku Imperator Theodus-Tiyodus di sala 395 de hate bimirin. Imperatorîya Romanî bi dunîv ve hate bikirin. Nîvek jê bi Roma rojava ve û bi paytextê bajarê Roma ve hate bikirin û nîvê din bi Roma rojhilat ve û bi paytextê Konstantinê ve hate bikirin. Pir pê nehate biçûyîn, bajarê Roma giringbûna xwe û jimarek pir ji Tudeyên xwe beramber bi hêrîşên Êlên Germanî û talanîyên wan ve ji bona dewlemendîya wê date biwindakirin. Ji van Hêrîvşanan jî ji bona ser Roma Miletê Wisigoth-Wisgot di sala 410 z. de û Miletê Vandals di

---

[1] "Konstantinê Mezin -ew Flavius Valerius Constantinus-bû. Ew ji sala 306-337 z. de Keyserê-Qeyserê Roma bû. Ew di sala 313 z. de bi azadîya bawerîya filetîyê ve hate bipêrûniştin. Wî di sala 324 z. de li ser herema Byzantion-Bêzanta Kolonîya Yunanî de paytexa nuh Konstantinpolis -Istenbola Îro- date biavakirin". "Den Sieben Weltwundern..., r. 221. Cuma

sala 455 z. de têtin bidîtin. -Hêjî navê Vandal di pir zimanên Ewropî de bi têgihiştina Talanvanan û wêrankerên avanîyên hunerên sipehî ve tête biliberkevtin. Di sala 472 z. de piranîya Tudeyên bajarê Roma jiber hêrîşa Milet yanjî Êlelek Germanî bi navê Suev-Suêv hatin biderkevtin.

Ev pêla hanê di zanistîya mêjûwa Ewropî de bi dawîkirina sedsalên kevnar ve û bi destpêkirina sedsalên navînî de tête bidanîn, yên ku ew li paş de di destpêka sedsalê vejandinê de bi "Sedsalên Tarîbûnê" ve hatin binavkirin.

Di sedsalê şeşemîn de Miletê Germanîyî Lombard date bikoçkirin û ew li Îtalya jorî de -li herema Mîlano de- hate biwarkirin. Ew ligel Tudeyên kevnarî Galîyî kokî de hatin bitevlêkirin. Wî ji xwe re Padîşahîyek date bidamezirandin, belam wî ji xwe re ziman û zanyarîya Latînî date biwergirtin.

Pir pê neçû, ku Îtalya yekitîya xwe, -heger ku ew hebû-, date biwindakirin. Her bajarekî bi sazkirina Serdarîyekê ve ji bona xwe di bin kêra Borcuwazîya Destkarî û Bazirganîyê de date bidestpêkirin. Divê li vê derê jî de bête bigotin, ku hemû deverên Cçyografîyî Îtalî jî ji heyamên kevnar de û tanî niha jî rûçikên xweyî taybetîyî bi xwe ve dane biparastin. Wetov Merov dikare bide bigotin, ku hesta cîhî li Îtalya de jiber hoyên cihîyî mêjûyî, zanyarî, şehristanî û zimanî hêjî di nava cerg û hinavên Tudeyên Îtalî de ji xwe re vihê singê -berî hesta welatîyî Îtalî- dide biwergirtin.

Lêbelê welatê "La Gaule romaniene-Romanisches Gallien"-Galîyî Romanî- -ango Firensa- ji xwe re Şehristanîya Latînîyî Romanî date biwergirtin. Miletekî Germanî, yê ku jêre bi zimanên rojhilatî ve Miletê "Fireng" -û bi zimanê Firensî ve Firanc û bi zimanê Elemanî ve Frank- tête bigotin, ji bona welatê Gal ji destpêka sedsalê pêncemînî zayînê de û lidûhevdû de date bibarkirin. Ew Miletê Germanîyî hanê di herema çemê Rhain-Rayin û herema Farnkfort A. M. -Firankfort em Mayinî Elmanîyî niha de dihate bineşînîkirin. Wî navê vî bajarê Elmanîyî niha li dûxwe de date bihiştin. Ev barkirina hanê bi rengekî hêrîşî yanjî serradeneke supahî ve nehatîye bikirin, -mîna ku carcaran ji bona hêsanîkirinê tête bigotin-. Lêbelê lek bi lek ve û kom bi kom ve ji Xelkê ve ji bona nava wî welatî dihatin bikevtin. jimarek gewre ji

Gewreyên wî ve ligel Peyên xwe de ji Serbazan nala Peyan di Serpereştîya Romanî de ji bona wî welatî ji dawîya sedsalê çaremînî zayînê de li paş wergirtina wanî filetîyê de dane bikarkirin. Ew Frankên hanê mîna Hevgirtinekê ji jimarekê ji Eşîr yanjî ji Miletên Germanî dihatin bidîtin. Ji wan jî Miletek bi navê Salien dihate bidîtin. Padîşahê vê Tira hanê bi navê Merovèc-Merowig ve mîna Generalekî di Leşkerê Romanîyî-Galî de di welatê Galî de li ser serên Hevalbendên xwe de ji Firengan de dida bikarkirin, da ku ew hêrîşên Tîrên Eşîrên dinê Germanî bidin bibergirtin. Ev Merowigê, yê ku ew di sala 458 z. de hate bimirin, bi Sazvanê Binemala Padîşahîya Firengîyî Mèroving`ens -Merowinger- Mirowinger ve hatîye bikirin, ya ku wê Dewleta Firensî -ango Firengî- di "welatê Galîyî" kevnar de dayite bidamezirandin. Wisa bi vî rengî ve ev welatê dawîyî hanê bi Firensa jiber wî Miletê Germanî ve hate binavkirin. Ji gewretirîn Gewreyê Padîşahên Firensîyan -Clovis-Klowis- dihate bidîtin, yê ku ew der sala 511 z. de hatîye bimirin.

Van -Firengan- û Padîşahên wan ji bona Firensa nuhatî başîtîya serpereştî û reweştên xweyî cengînî datin bianîn. Wan ew bi vî navî ve dane binavkirin, -mîna ku Kurt jî ji bona tevaya Kurdistanê navê xwe lê date bikirin-. Belam wan ji zimanê xweyî Germanîyî kevnar devjê dane biberdan. Ew bi zanyarî û zimanê "Galîyî-Romanî" ve hatin bireweştkirin. Wan ji bona vî zimanê hanê nuh ji bil çend gotinan û navan -ji bil rêzana zimanê Hindo-Ewropîyî hevbeşî ve- pê ve nedan bianîn. Wan ji bona oldarîya filetîyê pir dilsozî dane bikirin û Firensa bi "Keça Kenişta Gewre- ve li paş jihevkevtina Roma de hate binavkirin.

Firensa ji sala 715 z. de li Paş Xanedana Merowigerî ve Xanedaneke din ji Padîşahên Firengî bi navê -Carolingiens-Karolinger- ve dane serdarîkirin, yên ku ew bi navê mezintirîn Padîşahê vê Xanedana hanê ve hatîye binavkirin, yê ku ew bi navê -Charlemagne- Karlus Magnus- Karl der Grosse- -Karlê Gewre ve dihate binavkirin. Vî Padîşahê hanê cihê Bavê xwe Pepin li ser Textê Firensa de der sala 768 de date biwergirtin. Vî Padîşahê hanê ji bona jêr Serdarîya xwe welatê Firensa, Germania-Germanya, -jiber pereçeyek ji Miletê Frank mabûn, yên ku ew hêjî bi zimanê xweyî

Germanî dihatin bipeyivandin-, welatê Nemsa û Lombardya -Ango jorî Îtalya- datin bianîn, da ku ew ala oldarîya filetîyê û kenîşta katolikî bide biberzkirin. Wî paytextê xwe di nava dilê vê Şahînşahîya pir Miletan de di bajarê -Aachen--Axin de date bidanîn, yê ku ew li Elemanya de li nêzîka sînorê zimanîyî Elmanî-Firensî tête bikevtin. -Navê vî bajarî bi Firensî ve Aix-la chapelle ango "Axina Kenîştê" têtê bikirin-. zimanê nivîsandînê û wêjê di vê pêlê de -herwehajî li paş jî de- bi zimanê Latînîya kevnar ve dihate bikirin, da ku rêz li kenîştê û reweştên Romanî de bêtin bigirtin. Karl rêz li Papê Serokê kenişta katolîkî de dida bigirtin û wî ew her sal bi malekî ve dida bixelatkirin, da ku ew çavdêrîyê li "Mêcewrên" xwe de bide bigirtin.

Bibîrxistina Karlê Gewre û Şahînşahîya wînayî filetîyî pir Miletan bi min ve dide bipalpêdan, ku ez di Şahînşahîya Selah El-Dînê Eyubî de bidim biremankirin, ya ku wî ew di sedsalê duwanzdehemînî zayînê de date bidamezirandin. Wê pir ji Miletên rojhilatîyî cuda ji Ereb, Kurd -nîvê wanî rojava-, Turkuman û bi serdejî ve Fileyên rojhilat hemû bi hev re di bin ala musulmantîyê de didan bikomkirin, da ku ew Xilafeta Ebasî bide bidilkirin. -Rewşa Xilafeta Ebasî di wê gavê de mîna rewşa Papa li Ewropa de dihate bidîtin: Ew di rewan û oldarîyê de pir xwedan cih bû, belam ew di giranbûna xweyî siyasî û supahî de pir lawaz bû. Dibe, ku rabûn û rûnişta van herdu Padîşahan ligel hêjakirinên sincî de, yên ku oldarî li ser wan de dide bihînkirin, bêtin bidijkirin-. Mîna ku Erebî -zimanê nivîsta perest- zimanê wêjê û nivîsandinê di nava Dewleta Eyubî de -û li paş wê jî de-dihate bidîtin, wisajî zimanê Latînî di Ewropa de dihate bidîtin.

Weha bi vî rengî ve em dibînin, ku Miletê Firensî ji alîyê bûyîna xweyî êtnolocî de ew bi tevlihevbûnekê ji Miletên Hindo-Ewropî[1] ve têtê biderkevtin. Ji van jî ji giringtirîyên wan di jimara xwe

[1]Bi zimanê Elmanîyî nuh ve bi şaşî-yanjî bi mêldarîya milî ve-"Indo-Germanisch" - Hindî-Germanî ji dêlva "Hindî-Ewropî" têtê bigotin. Divê li vêderê de bête bigotin, ku Miletên Germanî di Ewropa de tîrekê ji tîrên Miletên wê li tenişta Miletên Silavî, Latînî de, -ku ev herdu jî ji Germanan bêtir têtin biderkevtin-, Miletên Siltî, Îrlendî, Sikotlandîyên niha, herwehajî Galîyên Birîtanî de, yên ku ew ji koka Siltî bûn û wan

de -Celte-Kelt- Kêltî bûn. Ligel van de beşek ji Romanan û beşekî ji Germanan hatin bitevlêkirin. Belam di vê tevlihevbûna hanê de berî wêna li ser vê zemîna hanê de Miletek dihate bijîyandin, ku zimanê wî ne Hindî-Ewropî bû û ew di nava heyamên kevnar de li paş barkirinên Eşîrên Seltîyî Galî de hate binemanîkirin[1]. Ev jî tevjî bi bê desteyên pir cudan ve ji wan Miletan tête bidîtin, yên ku wan ji bona Firensa dane bibarkirin û ew ligel Miletê wî de di pêlên hatî de -ji Normands-Normandîyên jorîn, yên ku ew ji Nerwêg-Nerwêc û Danimark di sedsalên nehemîn û dehemînî zayînê de ji bona Firensa hatine bibarkirin, tanî Silavîyan, Ereban, Cuhuyan, Italîyan Sipanîyan, yên ku ew niha ji bona Firensa hatine bibarkirin, hatine bitevlêkirin. Ne Îtalya, nejî welatên din -û nejî Kurdistan jî- ligel Firensa de ji alîyên tevlihevbûna Miletan ligel hevdû de li ser yek erdî de têtin bicudakirin, ku ji vê tevlihevbûna hanê de Miletekî nuh ligel rûçik û nîşanên xweyî taybetî de tête biderkevtin. Herwehajî li Elmanya bi xwe jî ve berî barkirina Eşîrên Germanî ji bona wêna de Miletên Siltî di nava wê de dihatin biwarkirin.

Nivîsvan û Mêjûvanên Firensî di sedsalên navînî de didan bibawerkirin, ku hemû Firensî ji koka "Franc-Frank" -Firangî dihatin bidîtin. Herwehajî wan pêrejî koka wan Firengan ji bona resenê Germanî nedixwestin bidin bivegerandin; lêbelê wan koka wan ji bona kokeke nigaşî didan bivegerandin, ya ku ew ji koka Padîşahên Troie -Troja- Tiroya- Tirwade dihate bivegerandin. Ev Troie-Troja-Tiroya hanê ji bal Yunanên kevnar de li Asya Biçûk de li ser kenarê derya Îcê de hate biavakirin. -Hêjî kavilên wê tanî niha jî têtin bidîtin-.

zimanê xweyî kokî date biwindakirin, mîna ku Bretons li Firensa de dane bikirin, yên ku tanî destpêka sedsalê çûyî jî gundiyên wan bi zimanê xweyî Siltî ve dihatin biaxivtin, didin biwênerkirin. Ismet Şerîf Wanlî

[1]Em pir kêm lî ser vî Miletê namnkirî de didin bizanîn. Perçeyên wî li tevaya Ewropa Jêrî de ber Barkirinên Miletên Hindî-Ewropê dihatin biwarkirin. Ji wan jî Miletê Iberîyê kevnar li Sipanya de û Miletê Baskîyî niha li Sipanya û Firensa de têtin bidîtin. Hin têtin bidîtin, ku ew zimanê Ibrîyên kevnar û zimanê Baskî bi Malbata zimanên Kefkasî-Qefqasî ve di Rojhilat de didin bigirêdan. Ismet Şerîf Wanlî

Arostokratîya -Xanedanên- Firensî bawermendîya Roma kevnar li ser "Barbarîya" her tiştê Germanî de ji xwe re date biwergirtin; jibervejî bi "lêhatî" ve nedihate bidîtin, ku Padîşahên Firensa û hinên ji Şahzedeyên wêna ji koka Germanî bêtin bidîtin.

Dibe, ku hinek mînabûn di nava remana "Barbarîya" Eşîrên Germanî de û remana "Barbariya" Eşîrên Kurd de bête bidîtin, ya ku ew -tanî niha jî hêjî- li nik çînîyên Serdarî de ji Miletên hemsa de tête bidîtin. Mînabûneke din jî di navbera welatên Gerministanê û Kurdistanê d. tête bidîtin. Welatê Gerministanê bi daristanên xweyî tîr ve mîna welatê Kurd bi çîyan, daristan, devî û dehlên xwe ve tête bidîtin. -Kurdistan di kevnar de pir bi dar û devî bû-. Ew mîna welatekî nigaş, welatekî çûn û nehatê, pir saw û lerz di nava cerg û hinavên Miletên hemsayên wê de dihate bidîtin û her deverek jê nala "Embareke ciyografîyî" gewre dihate bidîtin, ku têde Eşîr dihatin bipirkirin û ew li paş de jê ji bona nava erdên Miletên hemsayên xwe çi bi ceng ve û çi jî bi aşitî ve di nava derbasbûna heyaman de dihatin biherikandin.

Imperatorîya Romayî Rojhilatî ango Bizantî hêdî hêdî ew ji bona Dewleteke Rojhilatîyî bi pir Mîlî ve hate biveguhestin. Ew mîna Dewleta Farisîyî Sasanî bi çînîyên xweyî civakîyî rawestandî ve, bi bîrokratîya xweyî supahî ve, bi xemilandina Şahîneşînîya xwe ve û bi xizneyên xweyî darayî û hunerî ve dihate bidîtin. Wê tanî nîvê sedsalê heştemînî zayînê de dida bikarkirin, da ku ew beşê rojavayî ji Imperatorîyê ji nû ve bide bisazkirin. Belam ew di vî karê xwe de nehate biserkevtin. Serdarîya wê li ser Cîhana Yunanî, Tevaya Balkanê, Îtalya jorî, Surî, Misir û Beşek ji Afrika-Efriqya jorî de dihate bizalkirin. Bi giştî ve deşta Furata bilind bi sînorê wê ve ligel cîhana Îranî de dihate bipêkhatin. Wê li ber vekirina Erebîyî musulmantîyê de di Asya Biçûk de li paş windakirina Surî de didate bidan. Ew beramber bi Osmanîyan ve berûpaş dihate bivekişandin, tanî ku paytexta wêna li ser destê Şehrîyar Mohamedê Vekirvan de di sala 1453 z. de hate bikevtin. Ev mêjûwa rûdana hanêyî dawî di Ewropa de nala destpêkirina dema vejandinê û sedsalên nuh de tête bidanîn.

Li paş Vekirina Erebî ji bona Surî, Misrê û Afrika jorî de

"Imperatorîya Romanî" -Rojhilat- di rastê de nala Imperatorîyeke Yunanî dihate bidîtin. Belam parastinên wê ji erdên di nava Asya Biçûkî navînî de bi tevlihevbûna Tudan ve dihate bidîtin[1].

Ji Mejûvanên pêla Bêzentî divê li ser Themestius-Têmistyusê Yunanê de -317-388 z. de- bête biaxivtin, yê ku wî bi taybetî ve li sêf rûdanên rojhilatê de dayite binivîsandin. Ew di Civata Pîremerdan de Endam bû û ew ji Nêzîkvanê Imperatorên Konstantînîyê dihate bidîtin. Wî ji me re li dûxwe de ji giringtirîn nivîstên xwe nivîsta "Orationes" ango "Peydarîkirin" beramber bi mêjûwa Rojhilat û Yunanî de date bihiştin.

Herwehajî Stephan de Byzance- Sitêfan Bêzantê Yunanî yek ji Mêjûvanê vê pêlê bû. Em li ser jîna wîna de tiştekî nadin bizanîn, ji bil ku ew Mamostayek bû. Piranîya nivîstên wî hatinê biwindakirin. Bes û bi tenha ve hin ji perçeyên wan bi navê "De Urbiilus" hatine bimayîn.

Procupius-Pirokopyusê Yonanî li Felestînê de li nêzîka sala 500 z. de hate bizayîn. Li paş de ew bi Şêwirdar û Sikretêrê General Belisarus ve hate bikirin, yê ku ew Serleşkerê Supahê Bêzentî di pêla Imperator Justinian-Justinyans de bû. Ew ligel vî Serleşkerê hanê de di serradana wîyî dirêjî dijî Şahînşahîya Farisîyî Sasanî de di sala 527-531 z. de bû. Li paş de ew ji bona rojava hate çûyîn û ew bi Parêzvanê bajarê Konstantînê ve hate bidanîn. Wî ji me re nivîstek bi nav û bang ve di bin navnîşana "Mêjûwa Cengên Yustinyan" date bihiştin.

Ev Mêjûvanên hanê û hinên mîna wanî din wênerîya nivîsandina dîrokî ango mêjûwa mîrîtîyî Dewleta Bêzentî û çînîya wênayî Serdarî didin bikirin. Ew li ser bibîrxistina Imperartoran, Serleşkeran, qanûnên mîrîtî û agehdarîyên cengan de didin bigirêdan. Pir kêmbûn ew bi rewş û zînetên civakî û Miletan ve didin

---

[1]Min têgihiştina "asi miroure" -Asya Biçûkî ciyografîyî kevin date bikaranîn, -ya ku ew li ser erdê dewleta Turkîyî niha de tête bisuwarkirin-; jiber ku ew ji her navrokeke siyasî yanjî milî tête biboşkirin. Min evaya di ser navê "Anadolê" de dayite bigirtin. Ev navê hanê jî ji navê Yunanîyî kevin "Anatolie" -ango Rojhilat- hatiye biderkevtin. Yunanîyan bi vî navê hanê ve welatê kevtîyî rojhilatî derya Îce ango beşê rojavayî û navînîyî Turkîya niha didan binavkirin. Li paş bizava Kemalî de Turkan navê "Anadolê" bi taybeti ve ji bona Ostandarên rojhilatî ango Kurdistana jorî dane bikirin, ku ev jî bi xwe jî ve dijî têgihiştina navê kokî tête biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

biguhpêdan. Tevlivêjî de di nava nivîsandinên wan de pir ji agehdarîyên mêjûyî û ciyografîyî qenc têtin bidîtin, ku ew bi cihê bêtirbûnê ve ji lêgernadinê û pirskirinê têtin bidîtin. Ji van jî pir bi devera Kurdistanê ve têtin bigirêdan.

Ji bona pêla Bêzentî pir mêjûwên Danervanên Fileyên Rojhilatî ji Suryanan û Ermenîyan têtin bivegerandin. Ji Pêşîyên van jî di nivîsandina mêjûwê de Ermenî bûn. Li vêderê de rê bi me ve nayête bikevtin, ku em nivîstên wan bidin biraxistin. Piranîya wan nivîstan li paş vekirina musulmantîyî Erebî de û bi taybetî ve nivistên Ermenî hatine biderkevtin. Şêweyê nivîsandina wan di mêjûwê de ew nala şêweyê wêyî di sedsalê navînî de di Rojhilat û Rojava de dihate biderkevtin. Xwendevan nivîsandinên wanî li paş musulmantiyê de didin bidanîn, ku ew bi poşandineke dilşikestî ve têtin bidiyarkirin û ew bi serhatîyên demê ve bi gûmankirin ve lêdidin bitemaşekirin. Tê bêje, ku ew di nava Tragedie- Tragêdyê de têtin bijîyandin. Piranîya wan di nava Miletên Musulman de yanjî ew di tenişta wanî nêzîk de, na ew li jêr Serdarîkirina Şehzadeyên musulmantîyê de dihatin bijîyandin. Belam cerg û bawerîya wanî filetîyê ew ber bi Konstantînê ve didan bihogirîkirin û hêjîbêtir li paş wê jî de ew ji bona ber sîya Romayî Rojava dihatin birakişandin; tevî ku sitêra wêna jî hatibû bikizkirin, di gava ku jîyana wan li ser zemîna Rojhilat de dihate birabuhurandin, ya ku ew bi mala wan ve dihate bidîtin û ya ku wan jê xurakîya reman û hêjabûnên sîncîyê mîna Musulmanan didan biwergirtin.

Nivîsandina mêjûwê di sedsalên navînî de -di navbera kevtina Roma de di sedsalê pêncemînî de beramber bi hêrîşên Milet û Eşîrên Germanî ve tanî dema vejandinê de di sedsalê panzdehemînî de- di Rojhilat û Rojava de bi giştî ve -ji bil dîroknivîsandina Imperatorîya Bêzentîyî Mîrî de tevî bi rengkirina wêyî ayînî ve- mina hev dihate bidîtin.

Oldarî li ser mêjûwê de zal bû, mîna ku me ev di beşê yekem de dayite bibîrxistin. Filetî di Rojava de û Musulmantî li paş serhildana wêna de di Rojhilat de li ser mêjûwê de herdu zal bûn. Vê hişt, ku mêjû bi xwingerbûna oldarî ve bête binivîsandin, mîna ku evaya di dema nivîsandina -Cengên Xaçperestan- de hate bidîtin. Musulman di çavên Firengan de "Jirêderkevtîbûn" û ew di çavên

Musulmanan de "jirêderkevtîbûn".

Nivîsvanê "Mêjûwê" dest bi nivîsandina afirandina erdê û hebûna wê ve dida bikirin, li paş de wî ji bona ser Adem û Hewa didate binivîsandin. Li dûvêjî de ew li ser Nuh û Zarokên wî de li paş rabûna avê de dihate biaxivtin û wî evsan didan raxistin. Gava ku wî dest bi zanebûna xwe ve li ser mêjûwê de dida bikirin, wî rûdanên wê sal bi sal ve didan biraxistin. wî her derîyek bi salekê ve dida birêkûpêkxistin û wî rudanên wê salê hemû bi cudabûna wan ve û bi nebûna hîç pêwendiyekê ve di nava wan de li gora dema rûdana wan de dida birêkûpkêxistin. Herwehajî wî hîç hoyên rûdanan û encamên wanî pêşbînî nedidan bibîrxistin û ew bi tu lêvenerandinê ve ji bona zînetan û pêlan nedihate birabûn.

Cudabûna di navbera mêjûyên sedsalên navînî de di Rojhilat û Rojava de tête bidîtin, ku Nivîsvanên mêjûwê bi giştî ve di Rojava de ji Peyên keniştê dihatin bidîtin. -Di musulmantiyê de kenîşte nayê bidîtin; lêbelê têde Rêç û Dîtinvanîn- têtin bidîtin. Ev jî dide biderxistin, bê kanî çima di wê pêla hanê de Mêjûvanên bi nav û bag ve di Rojava de nehatine biderkevtin, mîna ku ew di diyarên Musulmatîyê de hatine biderkevtin û ji bona her yekî ji wan jî xweyîtiyeke bi taybetî ve tête bidîtin.

Belê mêjû di Rojava de ji bal Keşan de hatîye binivîsandin, yên ku xweyîtîya wan nehatîye biberzkirin; belam wan ji me re mêjûwek bi dûr û dirêjî ve li ser kenîştê de li dûxwe de dane bihiştin, ya ku ew nala Destgehekî Bilind dihate bidîtîn. Herwehajî wan li ser Zîncîrên Qanûnên wêna, Kar û barên Papên wêyî li dûhevdû de û dam û Destgehên wêyî Ayînî de dane binivîsandin. Herwehajî wan li ser mêjûwa pir ji dêran de datin binivîsandin. Wisajî wan pir berge, belge û nivîstxane datin bicivandin û wan ew datin biparastin. Wetovjî wan bibîrxîstina sersûrandin û jîyana Perestan datin bipirkirin.

Ji wekhevbûna di navbera mêjûwên sedsalên navînî de di Rojhilat û Rojava de tête bidîtin, ku Mêjûvanên muslmantîyê mêjûwên xwe bi zimanê Erebî ve dane binivîsandin û Mêjûvanên filetîyê mêjûwên xwe bi zimanê Latînê ve bi bê koka xweyî milî ve dane binivîsandin. -Bes û bi tenha ve piranîya Mêjûvanên Ermenî û Suryanî mêjûwên xwe bi zimanê xweyî milî ve dane binivîsandin.

## 3. Mêjû di Dema Vejandinê

Di dema vejandinê de li Ewropa de di sedsalên panzdeh û şanzdehan de asûwê Merov hate bifirehkirin[1]. Ev jî di pêşî de bi têgihiştina ciyografî ve di dozandina Hişkatîya Emerîka û Giravên Zerîyan ve hate bidîtin[2]. Ev jî bi têgihiştina rizgarîkirina Merovê

[1]Ji xwe re di vî warê hanê li hermann Ley "Geschichte der Aufklärung und des Athismus" -mêjûwa Şiyarkirinê û Bêxwedanîyê, bergê 1 û 2, VEB Deutscher Verlag der Wissenschaften, bergê 1, Berlin di sala 1966 de û bergê 2 Berlin di sala 1971 de bi zinamê Elemanî ve bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Di sala 1492 Hişkatîya Emerîka ji bal Colombo-Kolombos hate bidîtin. Di sala 1498 rêya deryayî ji bona Hindistanê hate bidozandin. Van herdu dozandinê hanê roleke mezin di jîna merovanyê de datin bilîstin. Pê Rojhilat dûr yanjî nêzîk hate bipaşvekevtin û Rojava pê bi xurtî ve hate bipêşvekevtin. ji bona nimûne rêyên bazirganîyê ji Çînê, Hindistanê, Îranê, Kurdistanê, Turkî, Îtalya û Elmanya ji hezaran sal de hatin biveguhertin. Ji vê demê û pêve tevaya Rojhilata Navîn dûr yanjî nêzîk roj bi roj ve hate bipaşvekevtin. Bi van herdu dozandinan ve Kurdistan jî pê hate bikêrkirin û bi xurtî ve hate bipaşvekevtin.

Divê li vêderê de bête bigotin, ku destpêkirina sermiyandarîyê di sedsalê çardehan de di bajarên Italî û di bajarên kenarên derya Sîpîyî Surî de hate bidestpêkirin. Herwehajî tevaya welat û bajarên Rojhilata Navîn pê hatin bikêrkirin û bipêşvekevtin. Wehajî Kurdistan û bajarên xwe di vê pêlê de di xweşîyê de û pêşkevtinê de dihatin bidîtîn; jiber vêjî em geşbûn û berzbûna wêjeyî û bêtirbûna şiyarbûna milî di nava welatê xwe de didin bidîtin.

Divê li ser Zanevanên Kurd de vê pêla hanê di nava Kurdistana me de lêbidin bitemaşekirin û kêra van herdu dozandinan li ser paşvekevtina Kurdistanê de bi dûr û dirêj ve lê bidin bivenerandin. Bi vî rengî ve em dikarin bêtir li ber mêjûwa welatê xwe de bêtin bikevtin.

Dr Nur El-Dîn Zaza di pêşgotina Memê Alan de li ser deqa dewlemenbûna Kurdistanê, xweşîtî û xweşîya bajarên wêna de li ser vê pêlê de tête birawestandin û ew wê di rêya pesindana wêyî wêjeyî de di Mem û Zînê de rast û durust li ber dest û çavên Xwendevanan dide bidanîn.

lêgerandina mêjûwa vê pêlê di Kurdistana me de dûr yanjî nêzîk ji Mêjûvanên aburî tête bixwestin. Cuma

Zanevan ve tête bidîtin, yê ku wî remana xwe ji nava lepên kenîştê date biazadkirin. -Copernic-Kopernikî Polonî Kada Zemînê di sedsalê panzdehan de date bicîkirin û herwehajî Galilee-Kalilê Italî jî di dawî sedsalê hatîyî li paş wî de ji nûve date bicîkirin. Ew herdu ji bal dadgeha Keşan de bi jirêderkevtinê ve hatin bitawanbarkirin.

Di nava van herdu sedsalên hanê de destpêka zanistîyên nuh hatin biderkevtin, yên ku ew "Mîna zanistîyên alîkar ji bona zanistîya mêjûwê" têtin bidîtin. Ji van jî zanistîya philologie-filologî ango xwendekarîya zimanan û nivîsandinên wêjeyî û mêjûyî, ji wan jî xwendina zimanên Latînî, Yunanî û Ibrîya kevnar têtin bidîtin. -Di warê zanistîya Archèologie -Arşîyologî-Şopênkevnar û zanistîya xwendekarîya Numismatique-Numismatik-Pûlên Kevnar de G. Budè-Budêyê Firensî nivîstek li ser wan de di sala 1514 z. de date binivîsandin. Li ser zanistîya Archivistique- bi rêk û pêkxistina belgeyên kevnar û parastina wan ve J. von Rammingerê Elmanî nivîstek di sala 1517 de date binivîsandin-. Ligel van jî de nivîstên dinî pir li ser welatên pirî dûr de yanjî di Rojava de berê ne pir nas hatin binivîsandin. Di wan de agehdariyên ciyografî yanjî li ser wan Miletên cudan de hatin binivîsandin. Vê jî date bihiştin, ku zanistîyeke nuh bête biderkevtin, ku ew jî zanistîya Ethnographiê-Êtnogirafî bû.

Ji pêşvekevtinên gewherî di dana dema vejandinê de derkevtina mekîna çapkirinê têtê bidîtin, ya ku ew ji bal Gutenberg-Gutinbêrgê Elmanî di sala 1443 z. de li şarê Strasburg-Şitrasburg hate binûvejandin. -Ev bajarê hanê Elmanî bû û ew di sala 1681 z. de bi ser Firensa ve hate biberdan-. Ji encamê vê nûvejandina hanê nivîstên çapkirî û demokratîkirina zanyarîyê wirde wirde hatin bibelavkirin. Herwehajî pêrejî wergerandina nivîstên Latînî ji bona zimanên milîyî cudan hatin bikirin, -yên ku pê piranîyek pir dihatin biliberkevtin-. Van zimanên hanê di dawî de şûna zimanê Latînî ji xwe re dane biwergirtin, -yê ku zanebûna wîna bes û bi tenha ve li ser jimareke kêm de ji Zanistvanan dihate bidîtin-.

Bi sêr û lihevrasthatî ve têtê vidîtin? ku ev pêşvekevtina hanê bi xwe jî ve di Rojhilat de ji destpêka sedsalê çardemîn de hate bidîtin; jiber ku nivîsandina Erebî ji bona nivîsandina Farîsî di Îran û

Kurdistanê de hate biveguhertin[1].

Herwehajî nivîsandina bi zimanê Latînî ve li Ewropa de bi xwe jî ve veguhertinek yanjî hêjî rastir vegerandinek ji bona mêjê hate bidîtin; jiber ku kenîştê zimanê Latînîyî peyivandinê yanjî gelerî dida bikaranîn. Nivîsvanan û remangîran bi vegerandina ser zimanê Latînîyî kevnar ve dane bidestpêkirin, da ku ew nivîsandinên nivîstên dema pûtperestîyê ji xwe re bidin bixwendekarinkirin. Herwehajî Mêjûvanan ji xwe re ji bona ser Mêjûvanên berî xwe ji Yunanîyan û Romanîyan dane bivegerandin. Wan dest bi xwendekarîya mêjûwên Herodut-Hêrodot, Thucydid-Tukidid, Polybe-Polib, Xenophon-Xenefon, Tacitus-Takitus, Titus-Livius-Livyus, Salluste-Salust, Caesar-Sêzar-Keyser-Qeyser, Plutarch- Pilutarxos û hinên din ji wan ve dane bikirin. Ev bizava hanê ji bona vegerandina li ser mêja Etina û Roma kevnar de bi "Bizava Zanyarîyî Merovantîyê" -Humanisme- -Humanismus- Merovantîyê ve tête binavkirin.

Nivîskaran -li Îtalya de- pêlen mêjûyî ji bona sê beşan[2] dest bi

---

[1]Xwendevanên Giramî! ku Ismet Şerîf wanlî vê,: "Bi sêr ûlLihevrasthatî ve têtê bidîtin? ku ev pêşvekevtina hanê bi xwe jî ve di Rojhilat de ji destpêka sedsalê çardemîn de hate bidîtin; jiber ku nivîsandina Erebî ji bona nivîsandina Farîsî di Îran û Kurdistanê de hate biveguhertin", dide bidîtin. Veşartoka vê sêrbûn û lihevrastina hanê di destpêkirina sermiyandarîyê de di sedsalê çardehemîn de di nava bajarên Italî de û di nava bajarên Sûrîyî li ser kenarên derya Sîpî de têtin bidîtin. Vê destpêka sermiyandarîyê tîrêjên xweyî xurt ji bona nava tevaya Rojhilata Navîn date bivedan û biavêtin. Herwehajî pê Kurdistan û Iranê jî hatîn bironahîkirin. Min ev rastîya hanê di rûnîkirina berî vê de date biderxistin û herwehaj min hoyê bidawîkirina vê ronahîyê bi dozandina Hişkaya Emerîka ve di sala 1492 de û bi dozandina rêya derya ve ji bona Hindistanê di sala 1498 date biderxistin; jiber ku rê û banên bazirganîyê ji pêla kevnarî Somerî de ji çînê, Hindistanê, Iranê, Kurdistanê, Asya Biçûk ... û Ewropa hatin bibirîn. Ji wê demê de û pêve lipaşvekevtina Rojhilata Navînî hate bidestpêkirin. Ji nû ve di sala 1869 z. de di rêya vekirina Kenala Siwês de û li paş de di rêya vekirina şiva Begdadeyî hesinî de piçekî rê û banên bazirganîyê ji bona ser Rojhilata Navînî hatin bivegerandin, lêbelê hêjî Rojhilata Navînî cihe xweyî windakiriyî bazirganîyêyî kevnar ji xwe re nedaye bivegerandin. Cuma

[2]Li ser pêlkirina mêjûwê de:

I. Berbijorbûnapêlkirinê de. Mêjû di vir de nala pêlên li dûhevdû de têtê bidîtin

parvekirina wan ve dane bikirin: "Antiquitè-Altertum" "Hayamên Kevnar", "Mittelalter" "Heyamên Navînî" -Ev têgihiştina "Mittelalter" "Heyamên Navînî" ji bona Mamosteyên Zanistgehên Elmanî tête bivegerandin- û "Dema Vejandinê- Frensîyan ew bi "Renaissance" ve ango "Verabûn" dane binavkirin-, ya ku ew bi berbeyana "Demên Nuh" ve- tête biderkevtin. "Heyamên Kevnar" û bi taybetî ve Etina û Roma ji xwe re di nava cerg û hinavên Mêjûvanan de cihên lêgerandinan, dilpêvebûnan û dillêdanan di nivîsandina mêjûwê de hatin bikirin.

Di vê demê de "Zanistîyên Merovantîyê" yanjî "Civakî ji "Zanistîyên Serûştîyê" hatin biparvekirin. Di sala 1566 z. de Feylesufê Firensî J. Bodin zanistîya mêjûwê "nala zanistîyeke civakî date binasîn, ku danava wêna rûdanên mêjê bi rast û durustî ve bide bibîrxistin û kar û barên Merovan di nava civakê de bide bixwendekarîkirin". Herwehajî wî date bikarkirin, da ku ew mêjê "Bi Qanûneke Mêjûyî ve" bide biliberxistin, ya ku wî pê bipêşvexistina Civakên Merovanîyê ji bona Av û Bayê û Serûştîya Ciyografîyî heremê date bivegerandin. Wî xwendekarîya mêjû ji navînîya wêyî Ewropî date biderxistin. Wî awireke giştî ji bona ser şehristanîya deşta derya Sîpî date biavêtin. Wî date bidîtin, ku bipêşvekevtina bajartîyê

---

û ew bi vî rengê hanê ve tete bipêlkirin:

A. Kevnarî, Nîvkevnarî û Demanuh,

b. Benditî, Derebegî û Sermiyandarî.

II. Hilat û Dahatîyên pêlkirina mêjûwê. Mêjû mîna Şehristanîyên li kêleka hevdû de tête bidîtin.

III. Diyaliktîkirina pêlkirina mêjûwê. Mêjû mîna karkirinên ligel hevdû kêrkirî de tête bidîtin.

Ji xwe re di vî warê hanê de temaşeyî "Die Periodisierung der Geschichte und das historische Weltbild des Menschen" -pêlikirina mêjûwê û Wêneyê Cîhanîyî Mêjûwî Merov, Arno Peters, Akadimische Verlagsanstalt, 40 R., bidinbi kirin. Ev Namilka hanê Pevdarîya Nîvîsvan bû, ya ku wî di 2. 11. 1978 de di "Akadimei der Wissenschaften der DDR in Berlin" de date bigotin û herwehajî wî ew di Zanistgeha Bremen jî de date bigotin. Cuma

di vê deşta hanê de ji rexê xweyî jêrîyî-rojhilatî -ji Misrê- dayite bidestpêkirin û ew hêdî hêdî ber bi berê jorîyî-rojava -Îtalya, Firensa ve û li paş de Tevaya Ewropa- de hatîye biveguhestin. J. Bodin ev remanên xwe û rêya xwe di lêgerandina mêjûyî de di nivîsteke de di bin navnîşana "Şêweyê Hêsanîkirina Zanebûna Mêjûwê" de date biliberxistin.

Maciavel-Machialli-Mikavilîyê Îtalî, -yê ku ew ji sala 1469-1527 Z, de li bajarê Filorensî hunerî de hatîye bijîyandin-, Xwedanê nivîsta "IL Principe" "Der Fürst"[1] -Şahzadeyê- bi nav û bang ve bi rexnegirtina rêya bibîrxistina rudanên mêjuwê sal bi sal ve hate birabûn. Wî ew ligora danavan de di perçan de yanjî di derîyan de datin biparvekirin. Bi vî rengê hanê ve wî nivîstek li ser "Mêjûwa Filorensê" de nala bidawîkirinekê ji bona Mêjûvanê Îtalîyekî din bi navê L. Bruni, yê ku ew Danervanê nivîsta "Mêjûwa Miletê Filorensî"[2] di sala 1444 z. de bû, date binivîsandin[3]. Îtalîyekî sêyem

---

[1]Ev nivîsata hanê min di sala 1996 de ji bona zimanê me date biwergerandin. Cuma

[2]Navê bajarê Filorens bi Îtalî "Firenze" tête bigotin. Belam bi zimane Firensî ve jêre Florence têre bigotin; jibervêjî piranîya zimanên din navê Florence jê ji xwe re dane biwergirtin. Ismet Şerif Wanlî

[3]"Machiavelli Nicolo ji sala 1469-1527 z. de hate bijîyandin. Ew Îtalîyekî Dewletvan û himjî Nivîsvan bû. Ew bi remangîrê pêşîyî ve di şêweyê dewleta biserêxwe de têse bidîtin. Ji nivîsandinên wîyî pêşî "Der Fürts" -Şahzade têse bidîtin". Insiklopêdîya Elmanîyi Biçuk "Meyers Taschen Lexikon", r. 614.

Wî nivîsta Il Principe-Şahzade di sala 1513 de nala diyarîyekê ji bona Serdarê De' Medici Filorensî bi hêvîya Yekkirina Îtalya ve date binivîsandin. Ew di sala 1532 de hate biçapkirin. Bigir hemû Serdarên ewropa çi ji Padîşahan û çi jî ji Serkomaran xwe bi vê nivîsta hanê ve dane bikarwerdekirin. Hemûyan xwe ji remanên wîyî siyasî dûr yanjî nêzîk di nivîsandinên xwe de dane bidûrkirin. Belam hemûyan dûr yajî nêzîk di karên xwe de bigir bi carekê ve wan bîr û bawerîyên wî di siyasetên xwe de didan bikaranîn. Kêm nivist wer bi diyarî ve û hêjîbêtir bi rast û durust ve li ser cewhera siyasetê de bi rengekî zanisti ve hatîye binivîsandin.

Min ev nista hanê di 4. 5. 193 de bi zimanê Elmanî ve li bajarê Monixê date bixwendin. Herwehajî di wê salê de nivîsta Aristo Politik date bixwendin. Min di nava dilê xwe date bisozkirin, ku ez dê van herdu nivîstan ji bona Bicûkên Kurmanacan bi zimanê Kurdî vu bidim biwergerandin; jiber ku ew pir bi dilê min bûn û wan tevaya lênerîna minî siyasî dane bipoşandin. Li paş wergerandina vê nivîsta di nava destên min de dê ezê Şerefname bidim biwergerandin û li paş Şerefnamê de dê ezê Şahzade û

Biondo-Biyondo bi belavkirina rêzekî ji nivîstan ve li ser "Salên Berjêrbûna Imperatorîya Romanî" de di navbera sala 1439 û sala 1453 de hate birabûn. Nivîsta Guichardin-Gîşardinê Firensî li ser "Mêjûwa Îtalya" de di sala 1561 de li paş mirina wî de hate bibelavkirin.

Ev nivîstên hanê mîna nimûnan têtin bidîtin, ji yên ku ew bi şêweyê piçekî bi rengê -Ecle Positivviste Positivistischeschüle- "Dubistana Başîtîyê" ve di nivîsandina mêjûwê de hatine bidîtin. Rêya nivîsandina van nivîstan li ser xwendekarîya belgeyan û hûrbûna wan de tête dîtin, -tevî ku jî zimanê van nivîstên nimûneyên hanê jî bi pevekên peydarîyê ve jî dihatin bitijekirin, yên ku wan mîna awayê ji hin Kevnarên Mêjûvanên Romanî û ji wan jî Pilotarxos didan bikirin.

Di vê pêlê de di nava welatên Padîşahîyî Serpereştîyî Navînî de mîna Firensa, Ingilistanê û Sipanya Nivîstxanên Giştîyî Padîşahî - bi têgihiştina welatî ve- di nava paytextan û navînîyên ostandaran de hatin bipeydakirin, yên ku ew ji bal Dewletê ve dihatin bisermiyandarîkirin û ji bona wan nivîst dihatin bikomkirin û belge dihatin birêkûpêkxistin û di nava wan de dihatin bihilanîn. Herwehajî ew Dewlet bi nîşankirina "Mêjûvanan" ve hatin birabûn. Hêjî rastir ew bi nîşankirina "Nivîsdaran ji bona Mêjûwê" -Historiographi- -dîroknivîsînê- ve mîna karmendan ji bona nivîsandina mêjûwa mîrîtîyî qanûnî, siyasî, supahî, dadwerî û daravî hatin birabûn.

Di nava welatên neyekgirtî de mîna Îtalya û Elemanya Mîrneşînîyan yanjî Komarên cihî -mîna Îtalya-, şehrebanîyan û zanistgehan bi vekirina wan nivîstxanan ve di ostandaran û bajaran de dane bikirin. dam û destgehên wan nivîstxanan serxwebûna wanî taybetî hebû. "Nivîsvanê Mêjûwê" ji bona Xanedanan li Îtalya de dihatin bidîtin û Machiavellî-Mikyavilî bi xwe jî ve yek ji wan Nivîstvanên mêjûwê dihate bidîtin.

Perçebûnek di nava kenişta katolîkî de di wê pêlê de hate

---

nivîsta Politik bidim biwergerandin. Ji mêj de min ji bona Mesud Berzanî dabû bisozkirin, ku ez Şahzade bidim biwergerandin û wê ji bona wî jî bidim bidiyarîkirin. Ez hêvîdarim, ku dê ez bi karibim bi van herdu karan ve bêtim birabûn. Cuma

bidîtin. Keşê Elemanî Martin Luther[1], -yê ku ew der salên 1481-1556 z. de hate bijîyandin-, bi rexnegirtina siyaseta Papa, Keşan, rabûn û rûniştên wanî xweyî, çavbirçîbûna wan ji bona malê dunyayê û nehişya wan ji bona xerckirinê li ser kîsê Milet hate birabûn. Ev tevgera hanê bi -Protestantisme- Protestantismus- "Tevgera Civakî" hate binavkirin. Ew li paş de bi -Rèforme-Reform- -Veçakkirinê- ve hate binavkirin, ango ew bi derkevtina kenişta Protistantînîyî cihê ve ji zalbûna kenişta Papa hate bidîtin[2]. Bi sedan ji bergan ve di beramberî

---

[1]"Martin Luther der 10.11. 1483 z. de Hate bizayîn û ew der 18. 2. 1546 z. de -Li vêderê de cudabûna deh salan ligel Ismet Şerîf Wanlî de tête bibidîtin. Hîç guman têde niye, ku evaya şaşbûneke ivîsandinê ye. Cuma--, li bajarê Eisleben de hatîye bimirin. Ew Bingehvanê rêça Elmanîyî Protestantismus-Pirotistantîyê ye. Ew der sala 1505 de ji bona nava dêra Augostinerkoloster-Awgostiner hate bikevtin. Ew di Zanistgeha Wittenberg-Berg de bi Pirofisorê Felsefê û Oldarîtîyê ve hate bikirin.

Der 31. 10. 1517 de Martin Luhter bi 95 bîr û bawerîyên xwe ve bi eşkere ve dijî Ablaßhandel-Bazirganîya Gunehan ji bal Keniştê xwe de date biderxistin. Bi vî rengê hanê ve wî tevaya Berberên bajarvanên Elmaniyî Nûhatî di Elmanya de beramberî Papa dane biyekkirin. Di sala 1919 wî bi eşkere ve pêwendîyên xwe ligel Kênişta Katolîkî de date biderxistin û wî di sala 1521 de di Reichstag-Parlemana li Worms de lêpoşmanîya rêça xwe date binayînkirin. Di cenga Cotkaran de -di sala 1525 Cuma- wî şêwê şûreşgirîya Cotkaran date bitawankirin, tevî ku wî di pêşî de ji bona daxwazên wan date bipiştgirtin. Wî alîyê piştgirtina Derebegan ji xwe re date bigirtin. Wergerandina wîyî Incîlê ji bona pêşvexistina yekgirtîn û nivîsandina zimanê Elemanî rolek pir giring ji xwe re date bigirtin". "Meyers Taschen Lexon-Insiklopêdîya Elmanîy Biçûk, r. 611.

Merov dikare bide bigotin, Ku rêça Loter bi filekirina Elmanî ve têtê bidîtin. Ev şêweyê milîkirina oldarîyê di bin nîşana rêçan de em wê bigir di tevaya oldarîyan de di seranserî cîhanê de û di tevaya mêjûwa merovanyê de didin bidîtin.

Hemû Xwedan û Oldarî ji bona pêşvekevtina civatên merovanyê û xurtbûn û mayîna dewletan hatine bidozandin û bipeydakirin. Çi gava ku ew ji vê rêzana hanê bêtin biderkevtin, ew bi xişxaşa Miletan ve têtin biveguhertin û bi nemana wan ve didin bidawîkirin, heger ku ew xwe ji wan nedin birizgarîkirin. Cuma

[2]Ji xwe re di vi warê hanê de li Wilhelm Zimmermann: "Der Gorsse Deutsche Bauern Kriêg" -cenga Cotkarên Elmanîyi Mezin, Dietz Verlag, Berlin, di sala 1953 de, di 796 rûpelan de bidin bitemasêkirin. Ev cenga mezimî Cotkarên Elmanî der sala 1525 de hate bigûrkirin. Bi hezaran sedhezaran Merov ve hatin bikuştîn. Bajar u gund hatin biherifandin. Yek ji sêsyan ji Miletê ve hate bikuştin. Çal û lod bi serên Merovan ve hatin bidagirtin. Di dawîya dawî de di encamê vê cenga wêranîyê de Qeralî li

hevdû de herdu bendan dane binivîsandin.

Herwehajî ji bona vê pêla hanê jî mêldarîyên milî hatin bipeydakirin. Der sala 1573 z. de Mêjûvanê Elemanî F. Hotmann di nivîsta xwe de "Franco Gallia" de, ango Firensa de date bicîkirin, ku koka Padîşahên Firensa ne ji bona Hector-Hêktorê Qehremanê bajarê Troie-Tureyayî evsanî tête bivegerandin, belam ew ji bona tuxmê -Frenagîyî- Elemanî têtin bivegerandin. Wê gavê Nivîsvanên Firensî bi rûmetkirina Bavpîrên xweyî Galîyên kevnar ji tuxmê Siltî ve dane bidestpêkirin. Wan bi çavekî mezin ve li wan nivîsandinên hatî de li ser Galîyan de di nivîsta Keyser Serleşkerê Romanî de dane bitemaşekirin, yê ku wî welatê Galî di sedsalê yekemî berî zayînê de li paş cengekê de ligel Gewreyên Miletê Galî de di nava daristan û çiyan de date bivekirin. Weha Individualisme-Individualismus- Xweyîtî û bi lezbûna bîntengîyê ve bi nîşana Miletê Galî ve hate bikirin --ev nîşanên hanê jî li ser reweştên Kurdan jî de têtin bigotin--, yên ku Keyser di nivîsta xwe de li ser Galîyan de dayite binivîsandin, Ev bi xwe jî ve nîşanên evindarîya azadîyê û mêrxasîyê didin biderxistin[1].

Herwehajî hinekan ji Nivîsvanên Elmanan di nivîsta Tacitus-Takitus de li ser Germania-Germanya de rêya rûmetkirina Bavpîrên xweyî Germanîyî kevnar datin bidîtin; -jiber ku Takitus evnsanek dayite bianîn, ku ew jî ji tuxmên "Kurê Nuhê Mezin" têtin biderkevtin-. Di sedsalên navînî de hesta ayînî Miletên Ewropa bi serhev ve dida bikomkirin, jiber ku hêjî hesta remana milî nehatibû bipeydakirin. -Ev jî di sedsalên pêşî de li nik musulmantîyê de di

---

Elmanya de hate bilawazkirin û Mîrîtî û Xanedanî hatin bixurtkirin û Elmana ji bona 2000 heremên gomrikî û 360 Mîrneşînîyan hate biparvekirin. Ev nivîsta hanê ji me re tevaya destana Elmanya di vê pêlê û pêlên tên de dide biderxistin û liberkevtina mêjûwa Elmanya ji me re piçekî dide bihesankirin. Cuma

[1]Miletê Galîyî kevnar mîna ku navê wî li jor de hatîye binivîsandin, -navê wî bi Firensîya nuh ve Gaulios û welatê wî bi Latînî ve Gallia têtê bigotin-, ew bi yekitîyeke siyasî bû û welatê wî ji sînorên Firensayî nihayî dûrtir -tanî Îtalya jorî, Siwêsra û Belgiyen- dihatin bidîtin. Piranîya wî ji Cotkaran bûn, yên ku ew li gundan de li ser çandiyê, nêçîr û ravê de dihatin bijîyandin. Hinek ji wan jî li bajar û bakarokên sengîn de li ser destkarîyan û bazirganîyê de li jêr destên Malbatên Desthilat de dihatin bijîyandin. Ew Miletekî pûtperest bû. Wî perestîya daran û daristanan dida bikirin û ew ji bona sê qatan dihatin biparvekirin: 1. Qata Xanedanan û Şervanan, 2. Qata Gelemperîya Gel û 3. Qata Peyên Ayînî. Ismet Şerîf Wanlî

Rojhilat de dihate bidîtin[1].

Di vî letê hanê de ez ji bona ser peyivandina pêşveçûna huner û wêjeyên sipehîbûnê di pêla vejandinê de nehatime biçûyîn; jiber bes û bi tenha ve ez ji bona pêşveçûna remanê û bi taybetî ve di warê mêjûwê û nivîsandina wê de hatime bidûkevtin. Bes û bi tenha ve nîşadana herdu Îtalîyan Michel Anglo -di sala 1475-1564 de- û Raphael-Refaêl -di sala 1480-1520 de- ji bona hêjakirina rola mezinî wê pêlê dide bitêrkirin, ya ku wê di warê vejandina hunerê de dayite bihiştin. Herwehajî divê li vêderê de ji bona Dante-Dantê xwedîyê "Komêdîya Xwedanî[2]" mîna Xweşxwevanekî hozan û Wêjevanekî jîrvan bête binîşandan, yê ku ew jî Îtalî bû û ew di dawîya sedsalên navînî de -di sala 1265-1321 de- hate bijîyandin[3].

Hêjî dema vejandinê di Ewropa de bi rast û durustî ve di dîroknivîsandina Rojavayî nuh de mîna destpêka "Dema Ronahiyê" tête bidîtin, ya ku li dû wê de sedsalên heftdehan û heştdehan hatin bidîtin. Beramber vê sedsalên navînî bi "Sedsalên Tarîbnûnê" ve dihatin binavkirin. Heger ku ev bi rêk û pêkxistina demê ji bona

[1]Di vê bîr û bawerîya hanê de û bi taybetî ve li ser hesta milî de û beramberkirina wêna di Rojava û Rojhilat de divê em zor wirya bin; jiber ku hesta milî di Rojhilat de ji hesta milîyî di Rojava de bi kevnartir ve tête bidîtin. Hêjîbêtir em pir şaşbûnê didin bikirin, gava ku em hesta milî li Ewropa de bi dawîkirina sedsalên navînî û destpêkirina sedsalên vejandinê ve didin bigirêdan. Ji bona nimûne hesta milî di Rojhilat de li nik Somerîyan de di Pêkanîna Dewletên bajaran de dayite bidestpêkirin û di Rojava de li nik Yunanîya jî de ji destpêkirina Dewletên bajaran de tête bidîtin. Cuma

[2]Divê li vêderê de bête bigotin, ku Ebu Ela El-Meerî nivîsta xwedîyê bi navê Risalet El-Xufran- Nameya Lêbûhurandîne ve di sedsalê nehemî zayînê de berî Dantê dayite binivîsandin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Dantê bi remanên Ebu El-Ela El-Meerî ve hatîye bikêrkirin. Kêra Nameya Lêbûhurandina El-Meerî di civaka Rojhilat de mîna kêra Komêdîya Xwedanîyî Dantê di civaka Rojava de beramber bi ayînyê ve nehatîye bikirin. Belam tevlivêjî de Meerî ji gewretirîn remangîrên Rojhilat tête bidîtin. Cuma

[3]berî Komêdîya Dantêyî xwedanî Ebu Ela-Elmeerî di nivîsta xweyî Risalet El-Xufran -Nameya Lêbuhurandinê- de ew danava hanê dayite binivîsandin û ew herdu nivîst nala hevdû têtin biderkevtin. Ebu Ela Elmeerî bi gewretirîn Hozan û Feylesufê Rojhilat ve tête biderkevtin. Vî hozanî û herwehajî Taha Husên di zarotîya min de gelekî di warê oldarîyê de bi min ve dane bikêrkirin. Cuma

Ewropa ve beramber bi liduhevhatina "Tarîbnûnê" û "Ronahîyê" ve bi rastî ve bête bidîtin, ev bi rengekî giştî ve ji bona çûna mêjûwê û bajartîyê di Rojhilat de bi rastî ve nayête bidîtin.

Pêla Ebasî -ji sala 750 tanî sala 1258 z. de- bêgûman ew ji pêla zêrînî di warên cûdan de ji pêşvekevtina zanistîyan û huneran di nava welatên musulmntîyê de tête bidîtin, di gava ku dema vejandinê di Ewropa de bigir li ser dema sarkirina remanî, zanistî û civakî de di nava welatên Rojhilat de tête bisuwarkirin. Wan zanistîyan, yên ku ew di pêla Ebasî de ji zanistîya metematik, zanistîya rojbendîyê, zanistîya şînatîyê, zanistîya fizijk, zanistîya felsefê, zanistîya ciyografîyê û mêjûwê hatibûn bigeşkirin û ji wan jî ji yên ku ew di pêşîya wan zanistîyan de di Etîna û Roma de hatibûn bipêşvekevtin û ew ji bona zimanê Erebî hatibûn biwergerandin, kêreke giran di pêşvexistina zanistîyên serûştî û mirovanîyê de di Ewropa de di dema vejandinê û di pêlên lidûhatî de dane bikirin.

Belam -dema sarkirinê- di Rojhilat de tanî herifandina Dewleta Osmanî date bidirêjkirin. Lêbelê hêjî hin ji diyarîyên wê tanî vê rojê jî di nava civakên rojhilatî de di warên remanî de, di hîşmendîyê de û di qada hunerî ango teknolocî de têtin bidîtin[1]. Ji karxanên çêkirinê û

[1]Ji xwe re li nivîsta Denis Diderot de: "Zur Interpretation der Natur" -Li ser vepeyivandina Serûştîyê de, Reclam, Verlag Philipp Reclam Jun. Leipzig, sala 1976 de, di 99 Rûpelan de bidin bitemaşekirin. Ev namilka bicûkî hanê bi remanên xwe ve di zanistîyên şerûstîyê de di sedsalê nozdehan de bi surûdê wê ve hate bikirin. Remanên wê tevaya avanîya kevnarîyî remanên Metiryalistîya Mêşanîkî datin bipeqandin.

Herwehajî ji xwe re li Didero/Lessing di "Das Teater des Herrn Diderot" - Temaşgeha Mîrzayê Diderot de, Reclam, Verlag Philipp JUn. Leipzig, sala 1981 di 420 Rûpelan de bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Ji xwe re di vî derîyê hanê li Abbé De Condillac: "Essai über den Ursprung der menschlichen Erkenntnisse" -Lênerînek li ser Koka Zanebûna Merovanîyê de-, Reclam, Verlag Philipp Reclam Jun. Leipzig, sala 1977 de di 336 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Cuma

[3]Niebuhr-Nîbhur li herema Elmanîyî Holstein-Holşitayin de hatiye bizayîn, ya ku ew di wê pêlê de li jêr serdarîkirina Padîşahê Denîmarkî bû. Ismet Şerîf Wanlî

Feylesûfên civakî û mêjûyîyî berî şûreşa Firensî bi hindikî ve nala Montiskiyu, Voltêr, Roso û herwehajî çûna şûreşê jî kêreke xweyî pir sengîn li ser jimarekê ji Nivîsarên, Feylesufên û Mêjûvanên Elemanî de dane bikirin. Di nava Elmanya de di wê pêlê de komek ji Mîrneşînîyan û Dewletên Biçûk dihatin bidîtin. -Herwehajî li rexê rojhilatî Elmanya de "Mîrneşînîya Varşowa Mezin" dihate bidîtin, ya ku Napolyon ji nûve pêkanîna wêna date bianîn, da ku ew nala Nafka Dewleta Polonîyî nuh di nava dilê Imperatorîya Napolyonî de bête bidîtin. Napolyon bi xwe jî ve pir dildarê Nivîsvanê Elmanî Göthe bû, -yê ku ew der sala 1762-1814 hatîye bijîyandin- û Göthe -Gotê jî pir dildarê şrûeşa Firensî bû.

Piranîya Feylesuf û Wêjevanên Elemanî di vê demê de ji Piştgirtvan û Bingehvanên "Dubistana Romantîkî" bûn[1]. Wan ji serûştîyê didan bihezkirin û bi nimûnetîyê ve meqam didan bigotin. Ji van jî Feylesufê Elemanî Fichte-Fiştê bû, -yê ku ew der salên 1762-1814 de hatîye bijîyandin-. Ew pir dildarê Feylesufê Elemanîyî berî xwe Kant di xweyîtîya wî de û di têgihiştina wî de debarê "Erk" de

[1]Ji xwe re li Friedrich Schiller:"Über Kunst und Wirklichkeit" -li ser Huner û Lirastîyê de, Reclam, Verlag Philipp Reclam Jun. Leipzig, sala 1975 de, di 557 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Friedrich Schiller, yê ku ew der salên 1759-1805 de hatiye bijîyandin, ji gewretirîn Xweşxuwanê Elamî li paş Göthe de di seranserî mêjûwa Elmanî de tête biditin. Ew pir dostê Göhte bû û ew herdu li bajarê Weimer de bi hev re pir bi dostanî ve dihatin bijîyandin. Ew di tevaya xweşxuwanî û wêjeya xwe de xwîngerm û şûreşgêr bû. Göhte Mîrê Mîrên Xweşxuwanî pir bînfireh û ew li serxwe bû. wi wêjeya Elemanî ligel Schiller de di lutkê berzbûna xwe de date bitacûxelatkirin.

Ev nivîsta Schiller li ser huner û lirastîyê de hemû ji nivîsandin û nameyên wî de li ser sipehîbûnê de hatin bihelbijartin. Di vir de Xwendevan tevaya dîtin û remanên nimûnetî û veguhestina wan ji bona lirastê de dide bidîtin. Di nava van rupelên vê nivîsta hanê de tevaya remanên Şîyarvanên Elmemanî bi kûrbûn û qolîtî ve, bi germî û tînî ve, bî vîn û evîn ve û bi dildarî û axînî ve têtin biherikandin. Veguhertinên demên wer gen û genî Merovên pir mezin û Zanevan jê re têtin bipêwistkirin. Ji bona, veguhertina vê dema gen û genî di Elmanya de Merovên pir gewre û mezin di asûwê esmanê Elmanya de hatin bipeydakirin û ji wan jî Göhte û Schiller du sitêrê çurûsandî di esmanê şiyarbûna Elmanya de dihatin bidîtin. Wan Merovên gewre û mezin li ser bingehê zanitîyê de tevaya gemara sedsalên navînî ji ser zimîna Elmanya bi xurtî û bingehî ve datin bimalandin.

Ez bi hêvî û bawerim, ku dê Kurdistana meyî perest jî bi saya Zanistvanên Kurdistanê ve ji vê tarî û gemara buhuşta evsana Ereb bête bimalandin. Cuma

dihate bidîtin. Wî ji me re nivîstek li ser "Nimûnîtîya Biserêxwe ve" date bihiştin. Herwehajî wî ji bona Yykitîya welatê xwe di "Peyvdarîyên xwe" de date bibangkirin[1].

Ji van jî Friedrich Hölderlin, -yê ku ew der salên 1770-1843 de hatîye bijîyandin, Xweşxuwanî Romantîkî-Xweşikirinê û Wêjevanê dildarê şûreşa Firensî bû. Ew evîndarê zemîn û rojê bû, na hêjîbêtir ew pûtperest[2] bû. Wî xewin bi Yekîtîya Elmanya ve didan bidîtin, da ku Rûmeta Etîna Kevnar bête bivegerandin.

Ji wan jî Feylesuf Friedrich Schelling -Firidriş Şilimg, -yê ku ew der salên 1775-1854 de hatîye bijîyandin-, ew bi Fichte-Fiştê û şûreşa Firensî ve dildar bû. Ew Romantîkî bû û wî Spinoza - Sipinotzayê Holendî bi Bingehvanê vê dîtina lênerîna jînê ve didate bidanîn. Wî jî li dûxwe de nivîstek li ser "Felsefa Serûştîyê" de date bihiştin.

Dibe, ku ji giringtirîn Feylesufên Elmanî, yê ku wî li ser remanên sedsalên nozdeh û bîstan de dayite bikêrinkirin, Georg Hegel bête bidîtin[3], yê ku ew der salên 1770-1831 de hatîye bijîyandin.

---

[1]Ji xwe re li Ludwig Feuerbach: "Geschichte der neuen Philosophie von Bacon bis Spinoza" -mêjûwa felsefa nuh ji Bakon tanî şipinotza, Reclkam, Verlag Philipp Jun. Leipzig, sala 1976 de, di 595 rûpelan bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Pûtperestî li nik Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Erebî ve li ser felsefa Yunanî de hergav bi têgihiştina Xwedênenasîyê ve tête biliberkevtin. Xwedênenasî yanjî Bêxwedanî dûr yajî nêzîk tevaya felsefa Ewropî di pêla vejandinê de dide bipoşandin.

Herwehajî ji bona bêtirkirina liberkevtina vê jî ji xwe re li: "Griechische Atomisten" -Yunanîyên Etomistan, Reclam, Verlag Philipp Jun. Leipzig, di sala 1977 de, di 621 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Cuma

[3]Dr. Nur-Eldin Zaza li ser felsefa Hêgil de Nameya xweyî Doktora dayite binivîsandin. Ew yekek ji gewretirîn Kurdnasên felsefa Hêgilî bû û ew ji Gencên Dibusta Hêgilî dihate bidîtin. Wî felsefa Xanî û dozanda qanûnên diyaliktikîyî mêjûyî di nava wê de cara pêşî di mêjûwa Rojhilat de hate biderkevtin. Hêjîbêtir wî tevaya felsefa Xanî bi felsefa Aristo ve date bigirêdan û li ser felsefa Yunanî de date bikanîkirin. Vî hozanê zanayî berz di nava welatê xwe de û herwehajî di nava Miltê xwe de guhpêdaneke mîna pêwist hêjî ji xwe re nedaye biwergirtin. Divê li ser Zanevanên Kurdistanê de û bi taybetî ve li ser Şiyarvanên wêna de ku ew pir guh bi jîn

Felsefa wîna bingehekî dîtinî ji bona felsefa Markisî tête bidîtin. Hegel -Hêgil bi xurtî ve rexne li "Bêhişmendîya Romantîkî" û Nimûnetîyê de, ya ku ew li ser -Subjektivismus- hesta Neferî dihate biavakirin, date bigirtin. Wî di vî warî de rexne li Kant[1], Fichte û Schiller date bikirin. Wî "Diyalêktîka Mêjûyî" -ango "Pevçûna" yanjî "Xebata" Mêjûyî date biderxistin. Dîtina Diyalêktîkî dide bigotin: ku civak mîna serûştîyê ji bona "Qanûnmendîyan" têtin bizalkirin, -yên ku ew tu pêwendiyan ligel dildarîyan de nadin bipeydakirin-. Ew têtin bipêşkevtin yanjî ew têtin biveguhertin, bes û bi tenha ve ev bi "Çengbûnên Rengînî ve" di encamên "Dijbûnan" de ango di Pevçûnên Hêzên Servajîhevdû de tête bidîtin. Ev "Çengbûna" hanêyî yanjî ev "Rabûna" hanêyî Rengînî dide bihiştin, ku ew wê Xêza Çêndîyî "ji çêndbûnê" li dûhev de dide bişikenandin û ew di dawîya dawî de "Dijbûnan ji xwe re dide biwergirtin". Bi gotineke din ve bêtirbûna çêndbûnê di encamê dawî de ji bona veguhertineke rengînî dide bikirin. Di vir de qanûna pêşvekevtinê tête bidîtin.

Dibe, ku bête bidîtin, ku ev "Dîtina" mêjûyîyî hanê ango avanîkirina remana bi serê xwe ve bêyî lênerîna li rastê de tête bidîtin û ew bi liberkevtineke din ve bi "Qanûneke Nimûnîtî" ve tête biderkevtin. Ango ku Hegel -Hêgil bi xwe ve jî ji bona "Nimûnetîyê" tête bivegerandin, ya ku wî li nik Kant de li ser berzbûneke din lêdate birexnegirtin. Wer tête biderkevtin, ku Diyalêtîka Mêjûyî ew bi xwe

---

û dûhiştîyên Dr. Nur-Eldin Zaza ve bidin bidan, da ku ew vî Karşinasê Mezinî Kurd di felsefa Hêgîlî de ji bona Tûdeyên Kurdistanê bêtir bidin binasîn, da ku ew ji kanîyên serpehatîyên Zenevanên xwe ji xwe re sûd bidin biwergirtin. Cuma

[1]Li ser jîndarî û karên Immanuel Kant -Immanuêl Kant ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li nivîsta Manfred Buch "Immanuel Kant" de, Reclam, Verlag Philipp Reclam Jun. Leipzig, di sala 1981 de, di 158 Rûpelan de bidin bitemaşekirin.

Ji Giringtirîn û bingehtirîn nivîsandinên Kant nivîsta "Kiritik der reinen Vernunft" -Rexnegitina li ser Hişê bi serê xwe ve" tête bidîtin. Herwehajî di warê desturên tevaya dewletên komarî de ji bona bi aşitî ve jîyana ligel hev de bête bidîtin, nivîsta wîyî di bin nav û nîşana "Zum ewigen Firieden" -Aşîtîya Hergavî- de tête bidîtin. Cuma

ve bi "Nimûnetîya Mêjûyî" ve tête biderkevtin.

Hegel -Hêgil pir bi berkir bû[1]. Ji nivîstên wî "Zanistîya

---

[1]Ji xwe re li Jîndarî û Karên Hegel di nivîsta: "Georg Wilhelm Friedrich Hegel" de ji bal Arsen Gulyga, Verlag Philipp Reclam Jun., Leipzig, di sala 1974 de, di 380 Rûpelan de bidin bitemaşekirin.
Hin ji nivîstên Hegel -Hegilî giring:

1. "Ästhetik" -Sipehîbûn, Bergê I, Aufbau- Verlag, Berlin und Weimer, sala 1976 de, di 590 Rûpelan de.

2. "Ästhetik -Sipehîbûn, Bergê II, Aufbau- Verlag, Berlin und Weimer, di sala 1976, di 666 Rûpelan de.

3. "Vorlesungen über die Phlosophie der Weletgeschichte" -Peyvdariyên li ser felsefa mêjûwa cîhanê de-. Hegel ev Peyvdariyên xwe li ser felsefa mêjûwa cîhanê de di Sêmestera Zivistana sala 1822/23 di Zanistgeha Berlîn de datin bigotin:

A. Band -Bergê I "Die Vernuft in der Geschichte" -Hîşbûn di mêjûwê de,
Band -Bergê II "Die Orientalische Welt" -Cîhana Rojhilatî-

b. Banda -Bergê III "Die Griechische und die Römische Welt" -Cîhana Yunanî û Romanî-
Band -Bergê IV "Die Germanischê Welt" -Cîhana Germanî- Akadimie - Verlag; Berlin, sala 1970, di 938 Rûpelan de.

4. "Politische Schriften" -Nivîsandinên siyasî-
Akadimie Verlag, Berlin, di sala 1970, di 373 Rûpelan de.

5. "Phänomenologie des Geistes" -Diyariyên Canî- Akadime Verlag, Berlin di sala 1971 de, di 598 Rûpelan de.

6. "Grundlinien der Philosophie des Rechts oder Naturrecht und Staatswissenschaften im Grundrisse" -Xêzên bingehîyî Feylesufîyî Mafitîyê, yanjî Mafeyê Seruştîyî û zanistîyên Dewletê di Kurtbûnên xwe de
Akadimie Verlag, Berlin, di sala 1981 de, di 645 Rûpelan de.

... Herwehajî hêjî nivîsandinên wî têtin biditin. Cuma

Hişmendîyê" û belavokên wîyî "Insiklopedîya Zanistîyên Felsefî" têtin bidîtin. Li paş mirina wîna de Xwendevanên wî di Zanistgeha Berlin de Peyvdarîyên wî di "Felsefa Qanûnê", "Felsefa Mêjûwê", "Felsefa Ayînan" û "Mêjûwa Felsefê" de dane bibelavkirin.

Hegel -Hêgil pir dilbirê şûreşa Firensî bû, ya ku ew ji dûr ve, li Elmanya de û di Xortanîya xwe de ligel de dihate bijîyandin û li paş de di pêla vekirinên Napolyonî de wî ji nêzîk ve lê dida bimeyzekirin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku wê Numûneyeke pir bilindî ji rê derkevtî jê re di "Çengbûnên Rengînî" de date bipêşkeşkirin. Na hêjîbêtir wê jê re bi Navka Dîtina wîna ve pê date biagehdarîkirin.

Herwehajî ji Zanistvanên sedsalê heştdehan de divê navê Feylesuf û Nivîsvanê Firensî F. Volney bête bibîrxistin, -yê ku ew der salên 1757-1820 de hatîye bijîyandin-. Li paş xwendina wîyî bijişkîyê û qanûnê de lêgerandinên wî ber bi mêjûwê û zanistîyên civakî û zimanan ve hate bipêşvekevtin. Ew ji bona Rojhilatê hate biçûyîn û ew li Misrê û Surî de hate bijîyandin. Der sal 1787 de wî nivîstek di bin navnîşana "Çûnek ji bona Misrê û Surî" date bibelavkirin. Ew ji bona çûna wî neraxistinek bû. Belam ew ji bona wan welatan di warên ciyografî, heremî û çandinyê de pesindanek bû û herwehajî wê li ser mêjûwê, civakîyê û reweştan de rûnkirin didan bikirin. Wer di vî warê hanê de Merov dikare Volney bi Destpêkirvanê lêgerandinên Rohilatîyê ve yanjî wî ji Pêşîvanên Rojhilatnasan bidin bidanin. Ew li ser Kurd de di nivîsta xwe de li ser Surî de hatîye biaxivtin. Wî dayite bigotin, ku welatê wanî Kurdistan ew di nava heremên Iraqa Ecemî û Deşta Zab û Diclê Jorî de tête bikevtin. Belam ew bi hoyên Pevçûnan ve hinên ji wan ji bona nava welatên hemsayên xwe hatin bikoçkirin. Wî peyvên Mêjûvanê Xonofon, Carsten Niebuhr-Karstin Niburê Elmanî datin bianîn û herwehajî ew li ser nivîsta Rêzimana Kurdî de hate biaxivitin, ya ku ew ji bal Gerzoni Keşê Îtalî hatibû bibelavkirin. Wisajî ew li ser "Derebegîya Kurd" de û li ser Kurdên Ostandara Heleb û Şamê jî de hate biaxivtin. Wî date bihêvîkrin, ku dê Serdarîya Firensî li lêgerandinên Rojhilatî de bide bipiştgirtin û bipêşvexistin. Kont Volney ji Maleke Arostokratî -Xanedan bû, ew di nava şûreşa Firensî de hate bibeşdarîkirin û ew bi yek ji Rêberên wê ve hate bikirin. Hindik mabû, ku pêla Tirsê Serê wî jî ji bona ber Megenê bide biavêtin.

## 5. Mêjû ligora "Dubistana Başîtîyê" -Bûyînîyî- Elemanî de

Debera em di pêşî de bi dîtina nasîn ve di sedsalê nozdehan de di bin navê "Dîtîna Başîtîyê" de bidin bidestpêkirin, ya ku ew ji bona Bingehvanê zanistîya civakîyî nuh ve Mêjûvanê Firensî Auguste Conte -Ewgost Kont tête bivegerandin, -yê ku ew der salên 1792-1857 hatîye bijîyandin-. Wî ev dîtina xwe di Zanistgeha Sorbon de li bajarê Parisê de dayite bipeyivandin. Wî gotina Sociologie -zanistîya civakî-li ser rengê géographie dayite bidozandin. Conte -Kon .Şagirtê Feylesufê Sosyalistîyê- Civakîyê Sain Simon bû[1]. Li paş de wî dev ji Mamostê xwe date biberdan û wî di dawîya pêla şureşa Firensî û serpêhatîyên wê de date bixwestin, ku ew "Siyasetê" bi zanistîyekê ve û xwedan qanûn ve mîna zanistîyên serûştîyê ve bide biderxistin, da ku civak bête birêkxistin. Ev jî wî xwest, ku ew wê li ser bingehê "Positivisme-Posivitismus -Başîtîyê" de mîna rêzanekê bide bikirin, da ku pê Pêşvekevtinên Civaka Merovanîyê bêtin biliberkevtin. Ligora vê dîtina hanê de mêjûwa remanên civakî ji bona sê pêlên bingehîyî lidûhev de tête biparvekirin. pêla pêşî bi "Pêlên Ayînî" ve -bi têgihiştina fireh ve- dihate binavkirin. Ev pêla hanê bi liberkevtina rûdanan û diyarîyan di rêya hêzên nigaşî de yanjî di rêya hêzên ji ser serûştîyê de dihate binasîn. pêla duwem bi "Pêlên Qanûnî" ve dihate binavkirin. -Ew mîna pêla yekem dihate biderkevtin. Belam liberkevtina rûdanan û diyarîyan bi saya kêra "Remana bi serê xwe ve" ji dêlva kêrdarên ji ser serûştîyê dihatin biliberkevtin-. Pêla sêyemê dawî ew bi pêla "Remana Baştî" ve di dema çêkirinê de hate binavkirin. Di vê pêla hanê de Merov di rêya lêvenerînên dîtinî û

[1]Ji bingehtirîn nivîsandinên J. C. L. Simonde 'dé Sismondi nivîsta wîyî "Neue Grundsätze der politischen Ökonomie" Band I, -Bingehên nuhî aburîya siyasî, begrê I, Akadimie Verlag, Berlin di Wanlî 1971 de, di 378 Rûpelan de tête bidîtin,-ya ku ew der Wanlî 1818 de hatîye binivîsandin. Wî tevaya bingehên bîr û bawerîyên aburîya sîyasîyî dema xwe ji bona bin çavên rexenegîrîyê date xistin. Têgihiştina vê nivîsta wîyî bingehî liberkevtina zanebûna Abûriyî siyasî dide bimerckirin. Cuma

Felsefî de qanûnan didin bidozandin, yên ku ew rûdanan û diyarîyan di rêya lêmeyzekirina zanistî de didin biliberxistin.

Conte -Kont zanistîyên cuda li ser pêpelûkan de date biparvekirin. Ew ji Giştîyên Sade didin bidestpêkirin û ew bi Taybetîyên Dijwar ve têtin bidawîkirin, ango ku zanistî bêtir û bêtir ligel karşinasîyê de tête bidijwarkirin. Ji hêsantirîn û giringtirîn zanistîyan zanistîya jimarnigarî tête bidîtin, -ya ku ew bi bingehê hemû zanistîyên serûştîyê ve tête biderkevtin-. Li paş wê de zanistîyên sitêran, fîzya, kêmya û li paş jî de di dawîya rêzê de zanistîya "Sociologie ango Fizya Civakî" têtin bidîtin.

Merov dikare bide bidîtin, ku ev parvekirina hanê ew bi xwe ve bi vegiştîkirina remanê û bi -abstracktion-Abstraktion- serê xwekirina wêna ve tête bidîtin. Di vir de Cont -Kont ligel Hegel -Hêgil de di warê jêhatîbûna wan de di liberxistina pêşvekevtina "Merovanîyê" de bi "Qanûnên" Civakî ve pir nayêtin bicudakirin, yên ku wan Nafka wan nedane bibîrxistin. Belam divê di navbera "Başîtîya" Cont -Kont de, ya ku ew bi serê xwe ve bi felsefî ve tête bidîtin, û di "Dubistana Baştîîyê" de di zanistîya mêjûwê de bête bicudakirin, ya ku ew ji bal Mamostên Zanistgehên Elemanî de nala Rêyekê û Rêçkê ji bona xwendekarîya vê zanistîya hanê û nivîsandina wêna hatiyê bipêkanîn.

Ev "Dubistana Başîtîyê" di mêjûwê de bi başî ve tête bidîtin, ku ew bi "Dubistana Rûdanîyê" ve bête binavkirin. Ev Dubistana hanê di sedsalê nozdehan de di pêşî de li Elmanya de di Zanistgehên Geothingen, Heidelberg, Berlin, Bonn, Jena, Leipzig û hinên din de hate bipeydakirin. Li paş de wê rêya xwe di lêgerandina mêjûyî de li Firensa û welatên din de date bigirtin û ew hate bigiştîkirin. -Tevî ku hin ji nimûneyên wê jî ji berê ve minîna destpêkirinê di welatên cudan de hatin biderkevtin, mîna ku me ev li Italya de li nik Mêjûvanên dema vejandinê de datin bidîtin. Ew bi Dubistana "Mêjûyîyî Zanistî" -Sachkundig, sehr bewandert, gelehrtgeschichte- ve û bi Civatên Akadimî ve tête bidîtin. Herger ku em jê re Bavpîrekî bidin bidîtin, hîç gûman tête nayête bidîtin, ku Keşê Firensî Jean Marbillon bi Bavpîrê vê Dubistanê ve tête bidîtin, yê ku ew -1632-1707- der sedsalê heftdehan de hatîye bijîyandin. Wî tevaya jîna xwe li lêgerandinê de ji bona destnivîsan ji bona lêvenerîna wan, ji bona

rexnegirtina wan û ji bona derxistina "Rûdanên Rastîyî" ji wan date birabuhurandin, da ku ew ji wan nivîstên xwe bide binivîsandin. Ew nala Bingehvanê zanistîya "Diplomatik" tête bidîtin.

Belam Bingehvanên Dubistana Paşîtîyî nuh ew bi Mamostên Elmanî ve têtin biderkevtin. Di pêşîya van Mamostan de Leopold von Ranke -1795-1886- di Zanistgeha Berlin de tête biderkevtin. Li paş wî de Droysen, Momnsen, Von Sybel, Treitschke, Lamprecht û Cortius têtin bidîtin. Ev hemû bi nimûne ve hatin bikirin û li ser rêya wan de hate biçûyîn[1]. Dibe, ku derkevtina vê Dubistana hanê di wê gavê de û li Elmanya de nala vegerandina kirdarekî bête bidîtin, da ku ew mêjûwê ji payebûna Mîlî û zalbûna Dewletê li ser de bide biderxistin, mîna ku ev li Firensa de li paş şûreşa Firensî de dihate bidîtin; jiber ku piranîya Mêjûvanên Mamostên Zanistgehan nala Karmendan dihatin bidîtin. Wer bi vî rengê hanê ve Mêjûvanê Firensî di wê gavê de nala "Dadyarê Komarê", Dewletê û Netewe dihate bidîtin.

Di sedsalê nozdehan de têgihiştinên Milî, Netewî û Dewletê li Elmanya de ji her welatekî din bêtir hatin bigeşkirin; jiber ku têgihiştina suwarbûna "Netewe" ligel têgihiştina "Dewletê" de têde nedihate bikirin; jiber ku ew ji bona Mîrneşînîyan dihate biparvekirin, tanî ku Preußen -Prosya- Yekitîya Elemanî di bin Rêberîya Bismarck[2]

[1]Ji xwe li ser vê Dubistana Elmanî de li: Ch. - O. Carbonell: "L'historiegraphie"- nivîsandina mêjûwê, Paris 1981 de bidin bitemaşekirin. Ew bi mamilkeyeke pir baş ve tête bidîtin û têde agehdarî li ser Dubustanên din jî de têtin bidîtin. Ew pir kêm li ser felsefa mêjûwê dide biaxivtin û ew ligel Idyolicîyê de nade biaxivtin. Ismet Şerif Wanlî

[2]Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li ser jîyana Bismarck û dema wî de, li ser kar û kêrên wî de di mêjûwa Elmanya û ewropa de di: Ernst Engelberg: "Bismarck -Urpreuße und Reichsgründer-" -Bismark, Proysîyê Kevnar û Bingehvanê Şahînşahîyê, Akadimie Verlag, Berlin, di sala 1985 de, di 839 Rûpelan de bi zimanê Elmanî bidin temaşekirin. Kêm Nivstên Jîngarîyê wetov bi xweşî ve mîna vê nivîsta Bismarck têtin bixwendin û kêrên xweyî kûr û qol di nava remana mejîyên Merovan de didin bihiştin. Jîyana Bismark tevî dijbûnên di nava wê jî de ne dûr û ne jî nêzîk li belê bes û bi tenha ve ew nala mêjûwa Elmanya di xebatê wê de ji bona Yekbûna wê û Pêkanîna Dewleta wêyi milî dihate bidîtin. Armanca Bismarck di Yekbûna Elmanya, xurtbûn, pêşkevtin, geşbûn û xweşbûna civaka wê de dihate bidîtin. Cuma

de û li jêr Desthilatîya Qeralyê wê de date bipêkanîn. Halojî Italya jî bizaveke nala Elmanya di wî sedsalî de ji xwe re di nava xwe de date bidîtin, ya ku wê jî yekitîya wêyî siyasî date biciânîn. Hîç gûman jî têde nayête bidîtin, ku Dubistana Baştîtîyê bi xwe jî ve nala kirdarekî vegerandî li ser "Hîçîya" "Romantikî" û Nimûnetîya Elmanî de hate bidîtin.

Der sala 1867 de J. G. Dryosen nivîsta xwe "Grundrisse der Hostorie" -Kurtiyên Bingehîyî Mêjûwê nala Ranke date binivîsandin. Der sala 1889 de E. Bernheim -Bernhaym nivîsta xwe li ser "Lehrbuch der historieschen Methode" -nivîstafêrbûnê li ser Rêya Mêjûyî" de li bajarê Leipzig de date bibelavkirin. -Herwehajî ev nivîsta hanê jî fêrî Rêzanên ziman jî ... dide bikirin-.

Zanistgehên Firensî pir çavdêrîya vê rêyanivîsandina mêjûwê nedane bikirin. Der sala 1889 de Seignobos ligel Langlois de nivîstek di bin navnîşana "Intraduction et études historieques" -pêdeçûnek li ser xwendekarîyên mêjûwê de date bibelavkirin. Li ser vê nivîsta hanê de hate bigotin: "ku ew bi baştirîn nivîst ve tête biderkevtin, ya ku ew ji bona fêrbûna nivîsandina mêjûwa deha qenctirîn tête biditin". Magelo Merov dikare rêyên nivîsandina mêjûwa mina rêzanên zimên - yanjî hunera pêjîn bête bifêrkirin? Magelojî mêjûweke "deha Qenctirîn" yanjî "Qenctirîn" tête bidîtin? -Evaya Merov bi "El-Kamil fi El- Tarîx" ve li nik Kurê Esîr de dide bibîrxistin-.

Di gava ku Cont -Kont "Başîtîya Civakî", Hegel -Hêgil "Nimûnetîya Mêjûyîyî bi serêxwe ve" û Karl Marx -Marks "Metiryalîya Mêjûyî" datin biderxistin, Ranke date bicîkirin, ku tiştê giringî bi tenha xwe ve di nivîsandina mêjûwê de derxistina "Bûyînê" yanjî "Rûdanê", yaxud -Faktum, Wahrheit- -"Rastî" tête bidîtin û wê di nava zînetên wêyî wê gavê de -bi bê felsefe ve û bi bê lêvenerîna wêna ve di dûrbûnê de- bidin bipalpêdan-.

Li ser Mêjûvan de tête bidîtin, ku ew rûdanan ji "Kanîyên wanî Kokî" li paş lêrexnegirtin û lêvenerandin de bidin biderxistin, da ku ew ji rastîyên wan di rêya -Erundition - Gelehrsamkeit- xwedina pir de bête bipiştraskirin. Li paş de divê ku ew wan rûdanan ligel hevdû de bide bikomkirin û wan di nava zînetên wanî dorhêlîyî xweser de bi bê felsefe û bawerîyên xwe ve bide biliberxistin. Li ser Mêjûvan de têtê bidîtin, ku ew hîç tiştekî nede binivîsandin, heger ku ew jê piştrast

neyête bidîtin. Divê ew mêjûwê bi zimanekî rûn ve ligel bi bîrxistina kanîyan de bi hûrbûn ve bide binivîsandin.

Ligora Seignobos û Langlois de divê nivîsandina "Mêjûwa Başîtîyê" di nava van qonaxên tên de bête biderbaskirin:

- Yekem civandina belgeyan û kanîyên kokî. Belam çawan ew divên bêtin bicivandin û binaskirin. Ev bi xwe jî ve û bi serê xwe ve berekî taybetî di zanistîya mêjûwê de dide bipêkanîn. Hinanan ev bi zanistîya Heuristique- Hoyristik ve dane binavkirin.

- Duwem lêvenerandina belgeyan bi karkirinên cudan ve ji -critique- -rexnekirinê têtin bidîtin, da ku bête bizanîn, magelo ew kokî ne yanjî -authrenticité- qelpin? Divê ew ji şaşbûnên çapê yanjî ji şaşbûnên nivîsandînê yanî ji şaşbûnên din jî bêtin birastkirin û ev şaşbûnên hanê bêtin biliberxistin. Herwehajî divê kanîya belge û mêjûwa wîna bête bibîrxistin û magelo Merov dikare -crédibilité- pişta xwe bi wan belgeyan ve bide girêdan yanjî Merov nikare pişta xwe bi wan ve bide bigirêdan?

- Derxistina -Faktum- Rûdanan ji nava wan belgeyan bi hûr lêvenerînkirin ve tête bidîtin. -Ev bi xwe jî ve bi karkirineke "Analayse" -Lêvenerandinê ve tête bidîtin-.

- Li paş vê de Mêjûvan bi gihandina "wan Rastîyên Derxistî" ve bi hevdû ve tête birabûn. Ev karkirina hanê bi karkirina "Suwarkirina Mejûyî" ve -ji dêlva gotina Synthése ve têtе bigotin.

- Li ser Mêjûvan de divê ku ew pêwendîyên suwarkirî bide bironîkirin, bêyî ku ew hîç kêsekê bi hestîyên xweyîtî bide bidan yanjî bêyî ku ew dest ji bona Romantîkîyê -Xweşikirinê bide biavêtin, da ku lêgerandina wîna "bi rastê ve" bête bigirêdan û rola Mêjûvan bes û bi tenha ve divê bi pêşkeşkirina pêşgotineke ronahîkirinê û rûnkirinan ve di jêrî perê per de bête bidîtin.

  Ji bîr û bawerîyên "Ecole positiviste Positivischeschüle" -Dubistana Başîtîyê- bingehî -çi li Elmanya yanjî li Firensa de yaxud li welatên din de tête bidîtin.

- Ew bi serxwebûna xweyî remanî ve ji bawermendîya siyasî yanjî oldarî û bi rastgoya xweyî remanî ve -bi bîrxistina rastîyê ve- tête binîşankirin

- Ew bi hûrbûna xwe ve û dûrbûna xwe ve ji giştîyên valayî, ji şêweyê peyvdarîyê, ji hestên romantîkî û ji meyzekirinên felsefî tête binîşankirin.

- Bi serûştî ve têse bidîtin, ku Mêjûvan jî mina her Merovekî bi xwedan mêldarîya taybetî ve li ser rûdanên mêje ve yanjî ligel wan Merovan de, yên ku wan rolek di mêjûwê de dane biyarikirin, tête bidîtin.

Belam bi erkê wî ve têse bidîtin, ku ew wan rûdanan di nava zînetên wanî mêjûyî de bide bidanîn û wan ligora li rastê de derbarê bi pêla wan ve bide bironkirin; jiber ku ji bona her pêlekê hîşmendîyeke wêyî taybetî pêve têse bidîtin. Divê ku ew li rûdanên mêjê de bi hişîtîya Serdar yanjî Amojgar ve nede bitemaşekirin. Ji karê Mêjûvan

nayête bidîtin, ku ew bîr û bawerîyên xwe li ser mêjûwê de bide biderxistin, yanjî ku ew xwe nala Amojgarvan di reweşta çûna Merovan de bide biderxistin.

Gûman têde nayête bidîtin, ku biserkevtina "Dubistana Başîtîyê" yanjî "Dubistana li Rasta" Elmanî de li Firensa de nala kirdarekî vegerandinê li ser mêjûwê de hate bidîtin, ya ku ew di pêla şûreşa Firensî de yanjî xweser li paş wê de hatibû binivîsandin; jiber ku piranîya wêna mêjûweke "engageé-Verpflichtet" -Erkî[1] bû û armancên wêna sîyasî û bawermendî bûn û ew ji bona mizgînîkirina bawerîyên şûreşê -di Azadîyê, Dadgerîyê, Wekhevbûnê û Biratîyê de- dihatin bidîtin û wan bi Zanistîyê û Komarê ve didan bişabaşkirin. Wan hemû rûdanên pêla Qeralî didan bireşkirin. Bi rastî jî ve nehemû pêla Qeralî bi reşîtî ve dihate biderkevtin û nejî ew tevde bi sipî ve dihate bidîtin. Ev jî bi xwe jî ve derbarê Komarê de tête biderkevtin[2].

Bîr û bawerîya Nivîsvanê van dêran tête bidîtin, ku li rastê de dide bineçarîkirin, ku rûwê pirsiyarekê yanjî dujwariyekê divê di hemû rex û berên xwe de di lêgerandina xwe de bêtin bironahîkirin. Herger ku Mêjûvan evaya date bikirin, wê çaxê ji mafeyê wî, na hêjîbêtir ji erkê wî tête bidîtin, ku ew rûyekî di ser rûwê din de bide bigirtin, bi mercekî ve ku ew ji bona rûwên din de mafeyê wan di ronîkirinê de bide bidan û ew hoyê di sergirtina rûyekî de di ser yê din de -yajî devjêberdana bêlayîna xwe- bide bironîkirin. Ji aliyekî din de helbijartina danava lêgerandinê bi serê xwe ve ew ji bona Nivîsvanê mêjûwê tête bivegerandin. Ev bi xwe jî ve bi destdirêjî ve ji bal Nivîsvan tête bidîtin, bê ka ew çawan mêjê dide bidîtin û ew li ser tiştekî ji yê din de dide bipiştgirtin. Bi bê nerîna li ser Dubistanên

---

[1]Yekekî dayite bigotin: li paş ku min "mêjûwa Şûreşa Firensî" ji bal Thiers -Tîrz "Mêjûvanê Komarî" de dayite xwendin: "Bi rastî ve ew nala dam û destgehekî cengînî ve ji bona raskirina remanên Şûreşê ve tête bidîtin". Ismet Şerif Wanlî

[2]Yekekî dayite bigotin: "ku Mêjûweke Mîrîyî derewker tête bidîtin, ya ku ew di Dubistanan de tête biferkirin. Herwehajî Mêjûweke veşartî tête bidîtin, ya ku jê Mero tête bişermezarîkirin". Ismet Şerif Wanlî

Mêjûyî de sedsalê nozdehan di seranserî Ewropa de bi sedsalê mêjûwê ve dihate bidîtin. Têde bi hezaran ve nivîstên ji mêjûwa siyasî, supahî û herwehajî pêrejî mêjûwên li ser huneran, zanistîyan û bajartîyên li dûhev de hatin biderkevtin.

Li Firensa de Dewlet, Ostandaran û Zinîstgehan ji dawîkirina cengên Napolyonî -ji pêla Padîşahîya Restauration-Destûrî, ji pêla Napolyonê Sêyem û ji pêla Komara Sêyem- bi karên pir sengîn ve hatin birabûn, da ku ew tiştan bidin biçakkirin, yên ku bahoza şûreşê ew dabûn bikavilkirin. Ew di pêşî de bi amarkirina tevaya belegeyan, kanîyan, piştpêgirtinan û belavkirinan li ser berê welatî û cihî de yanjî ew ligora danavan de pê hatin birabûn. Wan ew di Bibliographie - Bibliyografî -Fehrestên nivîstan de datin bibelavkirin.

Dubistana "Ecole des Chartes -Şaritê li Sorbon de û li paş de Dubistana "Ecole paratique des Hautes Etudes - Bicîanînê di Xwendekarîyên bilind" de, ya ku ew ji Dewletê azad bû, di sala 1873 de hate biderkevtin. Herwehajî "Dubistana Ferensî di Etîna de ji bona Xwendekarîya Şehristanîya Yunanî û -Pêwendîyên Firensîyî yûnanî- di sala 1846 de hate bidamezirandin. Li paş jî de "Dubistana Firensî li Roma de di sala 1873 de hate bisazkirin. Herwehajî Dubistana Firensî û Çînî jî hate bisazkirin. Firensa mafeyê bi tenha xwe ve ji bona Lêkolandin û Xwendekarîya Şopên Kevnarî di Iranê de ji xwe re date wbiergirtin. Di Firensa de xwendekarîya şehristanîyên, fêrbûna zimanên rojhilatî, musulmantî, asyayî û efrikayî mîna Ingilistanê hatin bipêşvekevtin. -Di vê pêla hanê de Rojhilatnasê Firensî Champollion-Şampolyon hate bidîtin, yê ku wî veşartoka nivîsandina Misrîyî Kevnar bi Nîşanên Hêroglîfî de date bivekirin-. Herwehajî di Paris de Kovara "Revue historique -Mêjûyî" der sala 1876 de hate bidamezirandin, ya ku li dor û berên wê de Karşinasên "Dubistana Başîtîyê" hatin bikomkirin.

Pir bi seyr ve tête bidîtin, ku şûreşa Firensî bi kavil û wêrankirinên ve bi dam û destgehên mêjûyî û serçavîyên wêna ve kêrdarîyek li nik çînîyên gelêrî de ji bona evîndarîya xwendina nivîstên mêjûyî de û bi taybetî ve "Mêjûya Nihayî" date bigûrkirin. Herwehajî wan li paş de nivîstên "Çîrokên Mêjûyî- jî ji xwe re dane bixwendin, yên ku ew ji rengên ji bal Alexander Dumas hatine binivîsandin, -yên ku di nava wan de rastîya mêjûyî ligel nigaş de tête

bitevlihevkirin-.

Pir pê neçû, ku li ser nivîsandina mêjûwê de bi şêweyê "Dubistana Başîtîyê" ve li Firensa de û bi taybetî ve li paş belavbûna remanên Sosyalistî û Markisî de rexne hatin bigûrkirin; çûnke, mêjûwa "Başîtî" yanjî mêjûwa li rastê de, -heger Merov bikaribe bide bigotin, ew bi "Mêjûwa Zuha" ve tête biderkevtin, ya ku ew li ser rûdanên siyasî û agehdarîyên cengan de dide bigirêdan, bêyî ku ew hîç hoyên wanî dûr bide bironkirin. Ew jiher felsefeyeke mêjûyî û ew jiher jêhatbûneke xweyîtî tête biboşkirin. Xwendina wêna pir bêzarbûnê û sergêjîyê di sarbûna wênayî "Zanistîyê" de û pirbûna rûnkirinên wêyî perî û bibliyoragafîyên wê de dide bigûrkirin. Di nava wêna de kesîtîya Mêjûvan bi hoyê neçarbûna "Rebenîyê" û "Bêlayîbûnê" ve tête biwindakirin. Herwehajî ew bes û bi tenha xwe ve ji bona Xwendevanên helbijartî ji Mamostên û Xwendevanên Zanistgehan û hin ji Evîndaran hatîyebi nivîsandin.

## 6. Sosyalistî, Markisî û Mêjû[1]

Markisistî bi taybetî ve giringbûneke wêyî mezin di mêjûwa cîhanê de tête dîtin; jiber:

- ku ew liberkevtinekê ji bona mêjûwê û qanûnekê ji bona tevaya pêşvekevtina civakên mirovanîyê di her cihekî û demê de dide biraxistin -û ew lê dide bipiştgirtin, ku wê ew liberkevtin û ew qanûna hanê dane bidozandin-.

- Wê ji bona bicîanîna siyasî date bikirin, ango wê ji bona pêkanîna Dewletên Sosyalistî di beşekî mezin de di cîhanê de date bikirin.

---

[1]Bi başî ve têtê bidîtin, ku Xwendevan ji xwe re li tevaya nivîstên Marx, Engels, Lenin de û herwehajî li nivîstên din de di vî warê hanê de bidin bitemaşekirin; jiber vê jî ez wan kanîyan dûr yanjî nêzîk li vê derê de nadim bitomarkirin. Cuma:

- Kêrek wêyî mezin li ser pêşvexistina jîyana Karkeran û Çînîyên Gelêrî de di nava welatên sermiyandarî de û di nava piranîya welatên cîhana sêyem de hate bidîtin.

- Kêrek wê li remanan de bi şêweyekî giştî ve hate bidîtin. Herwehajî wê li ser remangîrên gewreyî Nesosyalistî jî de date bikirin.

- Di dawî jî de hin ji kêrên wê li ser derkevtina "Dubistana Mêjûyî Nuh" de li Firensa de di -Dubistana Salan" de û bi belavkirina wê ve di nava welatên cîhanêyî din de hatin bidîtin

- Wê ji bona rengekî ji zanistîya mêjûwê ango "Mêjûwên Sosyalistî" date bikirin, yên ku ew bi mêjûwên "Şûreşgêrîyî Firensîyî Xebatkêş" ve têtin binavkirin, ango ku Nivîsvanê mêjûwê bi xwe jî ve ew mîna "Çêkirvanê Mêjûwê" tête bidîtin[1].

- Heger ku em xwe li ser serdema nuh de bidin bihiştin, em dikarin Feylesufê Firensî J. C. L. Simonde de Sismondi, -yê ku ew der salên 1760-1825- de hatîye bijîyandin-, mîna Destpêkvanê di pêkanîna Dîtinên Sosyalistî de bidin bidanin[2].

---

[1]Ev remana Ismet Şerîf Wanlî li ser wê remana Marx -Marks tête bigotin, ya ku ew dibêje: ku "Merov mêjûwa xwe bi destên xwe ve dide hûnandin".

Li gora bîr û bawerîya min û hêjîbêtir li gora tevaya têgihiştina min ji bona mêjûwa merovanyê de bawerîya Marx bi rastî ve tête bidîtin. Li vêderê de hêjîbêtir divê bête bigotin, ku ez bi piranîya bîr û bawerîyên Hegel û Marx ji dil û can ve bi rastîya wan ve didim bibawerkirin; jibervêjî di vî warê hanê de pir caran bîr û bawerîyên min û Ismet Şerif Valî li bin guhên hevdû de têtin bikevtin. Cuma

[2]bîr û bawerîyên Sosyalistîyê -Civakîyê- di tevaya mêjûwa merovanîyê de ji dema

Sismondi ji kokeke Xanedanî dihate bidîtin û ew di pêşîya sedsalê çêkirinê û pêşkevtina zanistîyî nuh de hate bijîyandin. Remanên wî bi "Başîtî" ve dihatin bidîtin, ango ew li jêr kêra pêşvekevtina zanistîyê de dihatin bidîtin. Herwehajî dilê wî li ser Rewşa Çînîyên Karker dihate bişewitandin. Wî ji xwe re Civakeke Sosyalistîyî "Qertkirî"[1] ji bona ayînde date binigaşîkirin, ku di nava wêna de Pêyên Çêkirina Sermiyandarîyê û Karkerên di kar de bi "Harmonie" -lihevhatî û bi hev re ji bona berjewendîya tevaya pêşvekevtina civakî di bin Serpereştiya Keniştê de dê bêtin bijîyandin.

Karl Marx û yên li dû wî de remanên Sosyalistîya Sismondî bi nigaşî ve datin bidanîn.

Li paş de remangîrê Firensî Proudon -Pirodon hat bidîtin, -yê ku ew der salên 1809-1865- hatîye bijîyandin. Ew di koka xwe de Karker bû. Li paş de ew bi Xebatvanekî Sundikatî û Rojnamevan hate bikirin. Wî daxwaza hilanîna xwedîtîya Neferî date bikirin. Hêdî hêdî wî daxwazên xwe dane bisivikkirin û wî daxwaza qanûnan date

---

pêkahtina çîniyan de têtin bidîtin. Merov dikare van bîr û bawerîyên hanê di bin pir navên cundan de çi li vê dunya me de yajî li dunya din de di nava hemû ayînên merovanîyê de û di seranserî şehrisrtaniyê wê de bidin bidîtin. Hemû çakvanên cîhanê di nava xewna Soyaslistîyê de têtin bidîtin. Merovanî û dadwerîya civakî di her zemanekî de ew ligel-hevdû de bi cêwî ve têtin bidîtin. Jiber vêyekê jî bi başî ve nayête biditin, ku Merov vî Merovî yanjî yê din bi Bingehvanê remanên Sosyalistîyê ve bide bidanin. Cuma

[1]Ji xwe re di warê Sosyalistîya Otopî -Nigaşî- de li: Tomas Morus "Utopia" -Nigaşî, Reclam, Verlag Philipp Reclam Yun. Leipzig, sala 1985 de di 173 Rûpelan de bidin bitemaşekirin. Vî Merovanîyê Ingilîzîyî dema vejandinê -1478-1535- tevaya bedbûna remana Xwedîtîya Neferî û kêrên wê di nava Civaka Merovanîyê de date biderxistin. Ev nivîsta hanê nivîsteke bi nav û bangî Sosyalistîya Nigaşî ve tête biderkevtin.

Tomas Morus ji ber remanên xweyî Merovanîyî dadgerîyî şûreşgêrîyî civakîyî bilind ji bal Padîşahê Ingilistanê de der sala 1535 de hate bidarvekirin. Belam bîr û bawerîyên wî dûr yanjî nêzîk di şûreşa Ingilîzî de û di pêkanîna Komara wî de der sala 1640 de careke din ji nûve di nava Ingilistanê de hatin bigeşkirin. Cuma

bikirin, yên ku ew jîna Karkeran didin bixweşkirin û şopên bed, yên ku xwedîtîya Neferî li dûxwe de di nava civakê de û di nava pêwendîyên kar de dide bihiştin, didin bisivikkirin. Ango Sosyalistîya No ji bona "Sosyalistîya Réformiste -Veçakkirinê" hate bipêşvexistin. Markisistan bi xurtî ve rexne û şerê wê datin bikirin; jiber ku ew "lihevhatinê di navbera Pirolitarya û Borcuwazîyê de" dide biwênerkirin. Bi rastî jî ve Proudhon -Pirodon roleke mezin di rewaca bîr û bawerîyên Sosyalistyê de date bilîstin. Ew jî Binvanên tevgera Sundikatîyî Karkerî li Firensa de tête bidîtin. Belam wî di dawîya jîyana xwe de ji bona tevgera "anarchisme" -Serberdayê date bibangkirin, ya ku pê Bakounine -Bakonin date biamojgarîkirin.

Herwehajî remangîr û siyasîyê Elmanî Lassalle -Lasal, -yê ku ew der salên 1825-1864 de hatîye bijîyandin-, bi Wênerê "Sosyalistîya Veçakkirinê" ve li Elmanya de tête bidanîn, Wî Marx -Marks û Proudohn -Pirodon didan binaskirin. Wî tevgera Sundikatîyî Kargerî li Elmanya de date bisazkirin. Marx wî li ser remanên wîyî milî de û pêrejî li ser mêldarîya wîyî veçakkirinê de dide birexnekirin.

Me dît, ku Hegel -Hêgil di Felesfa Diyaliktîkîyî Mêjûyîyî Nimûnetî de "Mêkanîka" Qanûnên "Pêşvekevtina Merovanyê bi Çengbûnên Rengînî ve" date biraxistin. Ev jî bi hoyê giranbûna "Çendî" ve ji yekekekî ji hêza civakîyî pevçûnkar di nava "Dijbûnên" xwe de hate bidîtin. Ango ku wî pesindana "Mêkanîkîyî Alavê" dayite bidan. -Heger Merov bikaribe vê bide bigotin.- Wî ev date bigotin, bêyî ku ew Nafka "Hêza Livandinê" yanjî "Motor" bide bironkirin, ya ku ew wî destgehî dide bilivandin.

Felsefa Karl Marx, -yê ku ew der salên 1818-1883 de hatîye bijîyandin-[1] û Dost û Hevalê wî Friedrich Engels, -yê ku ew der salên 1820-1895 de hatîye bijîyandin-[2], li ser Metiryalîya Mêjûyî de nala bersivekê ji bona runkirina nafka wan hêzên livandî hate bidîtin û ew nala bi dûr û dirêjbûneke Mêkanîkîyî "Destgehê Civakî" û Pêşveçûna

---

[1]Ji xwe li kurtîya jîn û karên Marx di "Philosophen/Lexikon" de, Dietz Verlag, Berlin sala 1984, R.628-643 bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Ji xwe re li ser Kurtîya jîn û karên Engels de di "Philosophen/Lexikon, Dietz Verlag, Berlin sala 1984 de, R. 236-250 bidin bitemaşekirin. Cuma

Civaka Merovanîyê ve hate bidîtin.

Ne Marx û ne jî Engels bi têgihiştina Akadimî ve ji Mêjûvanan dihatin bidîtin. Belam ew bi Feylesufên mêjûwê ve dihatin biderkevtin. Marx di nava maleke Elmanîyî Burcuwazî de hate birabûn. Wî qanûn, mêjû û felsefe date bixwendin. Ew pir di nava Ewropa de hate bigerandin, berî ku ew ji xwe re bajarê Lodon bi bingeh ve bide bidanîn. Li paş de Engels jî pê hate bigihaştin. Engels ji maleke Elmanîyî Çikirvanîyî Dewlemend bû. Karxaneyeke wanî caw li Manşêter -Ingilstanê- de hebû. Engels demekê di wê karxanê de date bikirin. Wî têde bi herdû çavên xwe ve perîşanîya Karkeran date bidîtin. Wî li ser vê de nivîstek di bin navnîşana "zîneta Çînîya Karker li Ingilistanê de" der sala 1845 date bibelavkirin. Der sala 1844 de Hevalê wî berî wî nivîsta xwe "Rexneyekî Giştî li ser Aburîya Siyasî de" dabû bibelavkirin. Engels di nivîsta xwe de bi xurtî ve rexne li Civaka Sermeyedarîyê de date bigirtin, mîna ku wî ew didate bidîtin. Wî têde daxwaza rizgarîkirina Karkeran didate bikirin. Di vî warê hanê de ew û Karl Marx bi hev re dihatin bigihaştin. Wan bi hev re dane bikarkirin û herwehajî wan bi hev re nivîstên "Mala Perest" der sala 1845 de, "Idyolicîya Elmanî" der sala1846 de, "Manifêsta Partîya Komonist[1]" der sala1848 de, "Koka Malê, Xwedîtîya Neferî û Dewlet" der sala 1884[2] dane bibelavkirin. Di vê felsefa hanê de rexne li Sosyalistîya Utopî, Sosyalitîya Proudohnîyî "Burcuwazîyî Biçûk" û "Metiryalistîya Mêkanîkîyî" Hegel -Hêgilî tête bikirin. Herwehajî têde runkirinek ji bona "Metiryalîya Mêjûyî" û bangek ji bona Karkerên cîhanê tête bikirin, da ku ew şûreşa Pirolîtarî bidin bivêxistin.

Marx di nivîsta xwe de "Perîşanîya Felsefê" de, ya ku wî ew

[1]Min der sala 1975 de "Manifsta Partîya Komunist" ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmancî di bin navê Soro de date biwergerandin. Ew ji bal Hevra de di nava Wêşanên Ronahî de der sala 1976 de hate biçapkirin. Ez hêvîdarim, ku dê ez wê careke din bidim bibaşkirin û ji nûve wê bidim biçapkirin. Cuma

[2]Wer tête bidiyarkirin, ku danîna mêjûwa sala 1884 ji bal Ismet Şerif Wanlî de ji bona nivîsandina "Die heilige Familie oder der Kritik der kritischen Kritin"- Mala Perest, yanjî Rexne li ser Rexnegîrîya Rexnekirinê de bi şaşî ve hatîye binivîsandin; jiber ku ew der sala 1844 hatîye bibelavkirin. Philosopfen/Lexikion, Dietz Verlag, Berlin, sala 1984, r. 629. Cuma

der sala 1847 de date bibelavkirin, hêrîş ji bona metirsîya Proudohn date bibirin. Ew pêlekê li bajarê Parisê de hate birûniştin û wî der sala 1859 de nivîsta xwe "Zur Kiritik der Politischen Ökonomie" -Ji bona Rexnegirtinê li ser Aburîya Siyasî de- date binivîsandin. Li paş de wî nivîsta xweyî bingehî "Das Kapital" -Sermiyan -Bergê Yekem, Cuma- ji sala 1867 date bibelavkirin.

Marx û Engels têgihiştina "Pevçûna Çînîya" ji Mêjûvanên şûreşa Firensî Thierry û Guizot ji xwe re dane biwergirtin. Herwehajî Marx mîna "Mêjûvanekî" ji bona xwendekarîya hin ji pêşkevtinên şûreşa Firensî hate birabûn. Wî derbarê "Pevçûna Çînîyan li Firensa de der salên 1849-1850 de" û "Roja 18 Brumaire[1] û Liwis Bonapart" û li paş de "Cenga Navxweyî li Firensa de der sala 1871 de" date bibelavkirin. -ango Cenga Navxweyî di navbera Şehrebanîya Paris yanjî "Commune"[2] Sosyalistî, ya ku ew ji bal Karkeran û Çînîyên Karkerî ve dihate bilêpiştgirtin û hêzên Supahîyî xweparastî, yên ku ew ligel Napolyonê Sêyem de beramber bi Pirosya Elmanî ve hatibûn bişikenandin, hatibû bivêkevtin.

Herwehajî Engels der sala 1853 de "Şûreş û Şureşa dijî li Elmanya de" date bibelavkirin. Wî ji sala 1850 tanî sala 1869 de di karxanên Bavê xwe de dida bikarkirin, da ku ew yarmetîya Marx û tevgera wî bi diravî ve bide bikirin. Wî li ser "Cenga Navxweyî di nava Dewletên Yekgirtîyî Emerîkî de" date binivîsandin.

---

[1]Li paş şûreşa Firensî de Serdarîya Firensî dest bi veguhertina navên mehan date bikirin. Wê ji bona wan navên nûh datin bidan, yên ku ew demsalan didin biderxistin. Wer bi vî rengê hanê ve meha Brume bi gotina Mijê ve bi zimanê Firensî ve tête biderkevtin. Ew bi xwe ve meha November -çirya paşîn bû, ya ku navê wêna bi "meha mijê" ve hate bikirin. Wehajî meha cotan bi meha "Floral" ango bi -meha gulan" ve hate biveguhertin. Belam vê veguhertina hanê pir neda bidirêjkirin û navên mehan careke din mîna navên Kevnar hatin bivegerandin. Ismet Şerif Wanlî

[2]Ji xwe re careke din li "Tagebuch der Pariser Kommune" -jorgarîyên Komona Paris de ji bal Karl Marx, Friedrich Engels, Dietz Verlag de, Berlin sala 1971 de bidin bitemaşekirin. Cuma

Gava ku Marx li bajarê London de der sala 1883 de hate bimirin, Engels li ser Goristana wî de hate bipeyivandin û wî date bigotin: "Marx Qanûna Pêşkevtinê di Mêjwûwa Merov de date bidozandin, mîna ku Darwin Qanûna Pêşkevtinê di Serûştîya bi Can de dayîte bidozandin"[1]. Magelo "Qanûna" ji bona Pêşvekevtina Civaka Merovanîyê ji bona hemû heyaman û ji bona tevaya Kadê ve mîna Dîtina Darwin di Pêşvekevtina Rengên Canawerî û Şînatîyê de li gora Qanûna Dorhêle de tête birastderkevtin? Magelo Sosyalistîya Marx û Engels bi rastî ve bi "Sosyalistîya Zanistîyê" ve li jêr Qanûneke rawestyayî û Cîhanî ve tête biderkevtin[2]?

Tête biderkevtin, ku ligora vê dîtina hanê de divê Merov di her civakeke mirovanîyê de di navbera bingehên aburî-civakî de di bingeh de, yên ku ew bi "Pêwendîyên Berkirinê" ve têtin biderkevtin û di navbera "Superstructures" -Qatên jorî de ji siyasî, qanûnî û remanî de

---

[1]Divê li vêderê de bête bigotin, ku Zanistvanê Ingilîzi Charls Darwin, yê ku ew sala 1809-1882 de hatîye bijîyandin, li ser "Die Entstehung der Arten durch natürliche Zuchtwahl" -Pêkhatina nifşan di rêya Helbijartîna Beranîna Serûstî de- di veguhertinên di laşên Cenaweran û Şînîyan de di bin kêra Dorhêle de, li ser "koka Merov" de - li gora Pêşvekevtina Merov ji Meymûn de - û li ser "Pevçûna Jîyanê" de di warê Serûştîyê de dayite binivîsandin. Ismet Şerif Wanlî

Ji xwe re di vî warê hanê de li Charls Darwin "Die Entstehung der Arten durch natürliche Zuchtwahl" -Pêkhatina nifşan di rêya Helbijartina Beranîna Serûştî de, Reclam, Verlag Philipp Reclam Jun. Leipzig, sala 1984 de di 566 rûpelan de bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin. Herwehajî ji xwe re li Charles Darwin de bidin bitemasekirin: Erinnerung an die Entwicklung meines Geistes -Autobiographie- 1876-1881. Tagebuch des Lebens und Schaffens 1838-1881. Francis Darwin. Eninnerungen aus meines Vaters täglichen Leben 1887" -bîrwerîyên min li ser pêşvekevtina hîş û rûçikên min de. -Jîngarîya min- ji sala 1876-1881. Rojgarîyên li ser jîn û afirandinên min de ji sala 1836-1881. Francis Darwin: ji jîna rojgarîya Bavê min sala 1887, Urania Verlag, Leizig, Jena, Berlin 1982 de di 293 rûpelan de. Cuma

[2]Emê bersiva vê pirsê ji bona Maurice Dobb di "On Economic Theori and Socialism" -Li ser dîtina aburî û sosyalistîyê de, Second impression 1956, London, Reutledge & Kegan Paul LTD. di 293 Rupelan de bi zimanê Ingilîzî ve bidin bihiştin. Cûma

bide bicudakirin[1]. Ya pêşî ya duwem -ji Qanûnê, Dewletê, Serdarîyê, Oldarîyê û Felsefê- dide binîşankirin. Belam ya duwem jî ji alîyê xwe, ve li ser bingehê -Diyaliktikî- de li ser ya yekem dide bikêrkirin. Wer em di civaka sermeyedarîyê de di bingeha civakê de pêwendîyên berkirinê didin bidîtin, ango em "Parvekirina Kar" li ser bingehê çînîtî de didin bidîtin, ya ku ew têde ligel hêza berkirinê de, ya ku ew di Karkerên Çewisandî de tête biwênerkirin, tête biberamberkirin. Xwedîyên Sermiyanan xebata destên karkerî ji bona berjewendîya xwe û bêtirkirina sermiyanên xwe didin biçewisandin. Gava ku karxanên çêkirinê têtin bibêtirkirin, werjî di wê gavê de bi xwe jî ve hêza berkirinêyî karkerî tête bimezintirkirin û pêrejî Pevçûna çînîtî bêtir tête binokirin, ya ku ew "Dijbûneke" bingehî di sermeyedarîyê de dide bipêkanîn. Ev dijbûna hanê bes û bi tenha ve bi "Çêngbûneke Rengînî" ve tête biçarekirin. Ango ew bi Şûreşeke Pirolitarîyî Sosyalistî ve tête biçarekirin, gava ku Xebatkêş bi darêzorê ve Serdarîkirinê û Xwedîbûna "Destêyên Berkirinê" -ji karxanan, destikan, erd û hêzên livandinê- ji bona berjewendîya çînîya karî ji bona nava destên xwe didin bixistin û Burcuwazîyê nala çînîyeke civakî didin biderkirin û binabûdkirin. da ku çînîya karkerî bikaribe van armancan bide bicîkirin û li ser Serdarîkirinê de li paş Şûreşa Sosyalistî de bide biparastin, divê ku ew "Diktatorîya Pirolitarya" ji bona pêla veguhestinê bide bineçarîkirin; -ya ku dîtin dirêjbûna wêna nade binîşankirin-, da ku ew Burcuwazîyê, tevaya hêzan û remanên dujminatîya çînîya karkerî bide bitarûmarkirin. Ev qonaxa hanê bi "Avanîkirina Sosyalistîyê" ve dihate binavkirin û ew bi gihandina "Civaka Komonistîyê" ve tête bidawîkirin. Di vê qonaxa dawî de çînîyên civakî û tevaya dijbûnanan têtin bihilanîn. Merov di bextiyarîyê û wekhevbûnê de li ser bingehê "Her Kesek li gora karîna

[1]Ji xwe re di vî warê hanê de li Von Edgar Salin de di "Geschichte der Volkswirtschafslehre" -mêjûwa Berê aburîyî milî, A. Francke AG. Verlag J. C. b. Mohr -Paul Siebeck-, Bern, Tübingen, sala 1951 de bi zimanê Elmanî ve di 205 Rûpelan de bidin bitemaşekirin.

Herwehajî ji xwe re li "Geschichte der Volkswirtschaftslehe" -mêjûwa Berê aburîya milî ji bal Günter Schmölders, Rowolt Taschenbuch, Verlag GmbH, Reinbek bei Hamburg, 1962, di 360 rupelan de bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin. Cuma

xwe de û her Kesek li gora Niyazmendîya xwe de" tête bijîyandin. Di dawîya qonaxa Komonistîyê de Dewlet bi rengî ve têten bihilanîn. - Niyazmendî ji bona wêna û nejî ji bona Polîsan têt bidîtin, da ku ew rêstikê û qanûnê bidin bidanîn. Divê li vêderê de bêtebi gotin, ku Serûştîya Merovê Komonist ji Kesîtîya xweyîtî çavnebarî ji bona evîndarîya Berjewendîya Giştî û karkirina wêna hatîye biveguhertin. Jiber ku Şûreşa Sosyalistîyî Pirolitarî dê bi Sûreşeke Cîhanî ve bête bidîtin, jibervêjî dê sînorên siyasî bêtin bihilanîn, Milet û ziman dê ew di nava hev de bêtin bitevlihevkirin, Civakeke Merovanîyî Lihevhatî dê bête bizayîn, ku ew bi yek zimanî ve dê bête bipeyivandin û dê ew di bilintirîn xweşîtîyê de li seranserî kadê de bête bijîyandin.

Marx û Engels di "Manifêst" de dibêjin, ku: "Mêjûwa hemû Civakên tanî niha bi xwe ve bi Mêjûwa Xebata di nava Çînîyan de têt bidîtin. Serbest û Bende, Xanedan û Gede, Hoste û Şagirt, bi kurtî ve Zorker û Zorkêş beramberî hev hatine birawestandin. Her û her ew dijî hev didin bixebatkirin.[1]"

Ligora vê dîtina hanê de, mîna ku Marx di Nimûnetîya Sermeyedarîyê de dayite biderxistin, -kirdara aburî- ango berjewendiyên çînîyî servajî hevdu ew bi livandina mêjûwê ve têt bidîtin û ew bi kirdarê ve bi tenha xwe ve têt bidîtin, yê ku ew bi wergerandinan û şûreşan ve di "Taqên Jorîn" de di nava civakê de derbarê qanûnê, Dewletê, siyasetê, remanan û oldarîyan de dide bikirin.

- Lenin -1870-1924- ne Feylesuf di mêjûwê de û nejî ew Mêjûvan bû. Belam ew Rêberê bizaveke siyasîyî kakerî bû. Wî tevaya jîna xwe ji bona runkirina taktîkê siyasîyî pêwist ji bona bicîanîna Markisitîyê

[1]Tevaya vê bendê wisa hatîye binivîsandin:"Mêjûwa hemû civakên tanî niha bi xwe ve bi mêjûwa xebata di nava çînîyan de têt bidîtin. Serbest û Kole, Xanedan û Gede, Hoste û Şagirt, bi kurtî ve Zorker û Zorkêş beramberî hev hatine birawestandin. Her û her ew dijî hev didin bixebatkirin. Xebata wan li dûhev de geh bi dizî ve û geh jî bi eşkere ve têt bikirin. Xebat hercar bi veguhertineke Sûreşvanî ve ji bona tevaya civakê dihate bidawîkirin, yanjî ew bi windabûna bi hev re ji wan çînîyên hanêyî dijî hev dihate bidawîkirin" Manifêsta Partîya Komunist, Zorix, Siwisra, sala 1976 de, R. 28. bi zimanê Kurdî zaravayê kurmancî ve. Cuma

date bitirxankirin. Ango wî tevaya jîna xwe ji bona neqişandina baştirîn rêyê ji bona palpêdana bizava xwe ji bona gihaştina Serdarikinê li ser ronahîya zînetên veguhertî de date bitirxankirin. Wî di pêşî de rexne li Mixaîlofiskî date bikirin; jiber ku wî bi sazkirina pertekî Karker-Cotkarî ve date bipêşneyarkirin; -jiber ku Pirolitarya bi serêxwe ve ew pêşrewa şûreşgîrîyê dide bipêkanîn-. Li paş de wî kovara "Iskara"[1] -Birûsk- li bajarê Cinêfê de der sala 1900 de date bidamezirandin. Wî têde rexne li Sosyalistîya Veçakkirinê de date bikirin. Der sala 1902 de wî li ser "Çi Kar?" de date binivîsandin. Bersiva wî li ser vê pirsa hanê de bi damezirandina Partîyeke Markisîyî xebatgêş ve ji bona Şûreşa Pirolitarya hate bidan. Der sala 1905 de di şikenandina Rusya de beramber bi Çapan ve ew bêhnekê ji bona Rusya hate bivegerandin û wî "Du Rê ji bona Demokrasîya Civakî" date binivîsandin. Wî têde bi xurtî ve -bi servajî Kêmîtîya Menşevekî ve- date biderxistin, ku divê Pirolitarya Rêberîya bizava Burcuwazîyî Demokrasî ji xwe re bide bigirtin. Wî di sala 1912 rojnama "Piravda" -Rastî- date bisazkirin. Wî têde rexne li diyalitika Hegel-Hêgil date bigirtin û wî Partîya Komunist date bidamezirandin. Wî der sala 1915 de di çaxa Cenga Cîhanîyî Yekem de "Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de[2]" mîna sitraticiyetekê date binivîsandin, da ku ew welatên Kolonîkirî li ser Dewletên Sermeyedarî de bide binokirin û bi taybeti ve da ku ew Dostanîya pir Miletan ji xwe re bide biwergirtin, ji yên ku ew ji bal Qeralan ve ji bona Serdarîkirina Rusî hatin bijêrdarîkirin. Wî di sala 1916 de nivîsta "Impiryalî Bilindtirîn Qonaxa Sermeyedarîyê" date

[1]Ji xwe re li "Die Leninische "Iskra" 1900-1902", VEB Fachbuchverlag, Leipzig, sala 1981 de, di 375 Rûpelan de bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin. Cuma

[2]Min ev nivîsta hanê li bajarê Berlinê de di 25. 2. 1989 de bi zimanê Kurdî zaravayê kurmancî ji bona çapkirinê date bidan. Belam di nava rûdanên vê Salê de ev destnivîsa hanê hate biwindakirin; jiber yê ku min ew ji bona çapkirinê dabûyê, ew hate bimirin. Li paş lêgerandineke dûr û dirêj de ew careke din di nava hilanîna kompiyutera min de hate bidîtin û ew careke din di payîza sala 1993 de ji bona çapkirinê hate bilidarxistin. Cuma

binivîsandin. Wî bi remana Bûyîna Şûreşa Pirolitarî di Welatekî de bi tenha xwe ve date bibawerkirin, bi çavdêrîya ku ew dikare li seranserî dunyayê de bête biciânin. Wî cudabûnên di pêşvekevtina çêkirinê de û pêrejî pêşvekevtina hêza Pirolitarya jî ji bona ber çavên xwe date bidan. Sitratîcîya wîna didate biarmanckirin, ku ew "Cenga Impiryalî" -ango cenga di navbera Rusya û Elmanya de di pêşî de- ji bona "Cenga Navxweyî" di Rusya de bide biveguhertin, da ku ew Serdarîkirinê ji xwe re bide biwergirtin. Der reşemeha[1] sala 1917 de şûreşê di nava Rusya de date bidestpêkirin, di gava ku hêjî Lenin li derve -Siwêsra- de bû. Ew ji Siwêsra ji bona welatê xwe hate bivegerandin.

Divê em bêhnekê ji xwe re li vêderê de bêtin birawestandin, da ku em zînet û hoyên şûreşê û pêşvekevtina wêna bidin biraxistin. Rusya der sala 1914 de mîna Firensa di sala 1789 de ji alîyê Rengê Serdarîkirinê de dihate bidîtin: Têde Padîşahîyeke bi serêxwe ve dihate bidîtin, ya ku wê pişta xwe bi Xanedanan û Serokên Kenişţê ve dida bigirtin û ew pir ji hêvîya Milet dûr dihate bidîtin; tevî ku zînetên wêyî taybetî pêve ji civakî, remanî û milî ve ji yên Firensa dihatin bicudakirin. Hêjîbêtir ew ji Firensa sedsalê heştdehan de di warê pêşvekevtina çêkirinê û katbûna Burcuwazîyê de pir bi paşvekevtî bû. Gava Cenga Cîhanîyî Yekem û dijwarîyên wê hatin bidîtin, Serdarîkirina Qeyserî nala mêweyekî gihaştîyî di nava xwe de komxwarî hate biherifandin.

Ligora amara serjimara sala 1897 de, -ev ya pêşî di rengê xwe de bû; jiber ku ew li ser amara zimanên bi karhatî - ango Miletan ve hate bikirin-, serjimara Imperatorîya Rusî 123 milyon Nefer bûn. Ji wan: 44,3 % Rusên Mezin bûn. 17,8 % Okranî bûn. 4,7 % Rusên Sipî bûn. 6,7 % Lihistanî -Polonî- bûn. -Ango 73 % Silavî bûn- û yên mayî ji Miletên cudan bûn. -Bi derbasbûna demê ve endazîya van Miletên

[1]Ji bona pir gotin û têgihiştinên Kurdîyî kurmancî ez tevaya sipasîya xwe ji bona birayê xweyî. şêrîn Aziz. R. Akravî didim bipêşkeşkirin. Bi rastî jî ve min zor ji ferhenga wîyî "Rêbera Sêzimanî", çapa yekem, di sala 1980 de sûd ji xwe di nivîsandina xwe de dayête biwergirtin. Cuma

cudan di pêla Sovyîtî de hate bibêtirkirin-[1]. Ligora amara sala 1913 de serjimara Rusya 159 milyon Kes bûn. serjimara Kurd "Li paş Kafkasya de" di wê amara Rusî de bi sed hezar Kes ve dihate biderkevtin. -Ev jî bêyî bi bîrxistina Kurdan ve li Turkistanê de hate bidîtin-.

Ji alîyê civakî de Cotkaran 80 % ji piranîya wê didan bipêkanîn. Nêzîka nîvê wan ji erdan bê par dihatin bidîtin. Belê ew ji Karkerên Çandinîyê bûn. Li paş hilanîna Rêstika "Servage" der sala 1861 de -ango Pêwendîya Cotkar ligel Erd de û firotina wî ligel erd de, ya ku Merov dikare wê bi "Kolê Gundîtîyê" ve bide binavkirin, wirde wirde jimareke gewre ji Cotkaran dikarîbûn xwe ji rêstika "Berkirina Gundîtîyî Tevayî" bidin biderxsitin, -ya ku ew bi zimanê Rusî ve bi Mir ve dihate binavkirin- û ji xwe re Xwedîtîya Neferîyî erd bi destên xwe ve bidin bixistin. Belam zîneta piranîya van Cotkaran ji zîneta Karkerên Çandînîyê bi baştir ve nedihate bidîtin; jiber ku erdên wan biçûk bûn û pir caran jî ew ji hevdû belawelabûn û wan têra girawkirina jîna wan nedida bikirin. Endazîya Cotkarên dewlemend pir kêm bû. Herwehajî perçeyekî giring ji erdên çandinyê bi malên Xanedanan ve dihate bidîtin, yên ku ew di nava bajaran de dihatin bijîyandin. Jiber ku topraxa erdê çandinîyê bi kêmbûn ve jiber hoyên sarbûna ba û avê û pirbûna daristanan dihate bidîtin, "Pirsiyarîya Erd" li Rusya de ji pirsên bingehî dihate bidîtin; jiber ku bi milyonan ji Cotkaran ve di perîşanîyeke belengaz de dihatin bijîyandin û wan bes û bi tenha ve yek xewin ji xwe re didane bidîtin, ku ew bi xwedan perçeyekî erd ve bêtin bikirin û ew ji bin rêstika

[1]Endazîya Miletên din di amara sala 1897 de wer dihate biderkevtin: 10,8 % ji peyvadarên zimanê Turkî bûn û bi taybeti ve di Asya Navînî de dihatin bidîtin. -zimanê wan ji zimanê Turkiyî li Tûrkîyê de têde bicudakirin-. 4 % Cuhû bûn. 2,8 % Fêlendî bûn. 2,5 % Lêtwanî û Letê -Baltik- bûn. 1,4 % Elman -di herema Volga de-bûn. 1,4 % Ji "çîyayîyên Kafkasê" bûn -û ji wan Çerkes û Miletên din dihatin bidîtin-. 1 % Gurcî bûn. 0,9 % -nehsed hezar- Ermenî bûn. 0,6 % -şesed hezar- peyvdarên zimanên Îranî bûn. -ji van jî 100 hezar Kurd li Transcausiu -Li paşkafkasê de dihatin bidîtin û navê wan jî di vê amara serjimarê de hate binivîsandin. Belam di vê amarê de Kurdên Turkistanê nedane binivîsandin û ew nala Turkumanan hatin bidanîn-. 0,3 % Mengol bûn. 0,7 % ji Miletên din dihatin bidîtin. Ismet Şerifg Wanlî

"Mir" bêtin biderkevtin. Divê Merov bêtir bi ser "Perîşanîya Metiryalî" ve "Perîşanîya Remanî" jî bide biservexistin; jiber ku Cotkarên Rusya di warê remanê jî de bipaşvekevtî bûn û Oldarî û Peyên Keniştê li ser wan de zal bûn. Wan tucaran bi avêtina Serdarîkirinê ve nedidan biremankirin. Ew pir bi Binemala Padîşahî ve bi nala Oldarîyê ve dihatin bigirêdan. Tevlivêjî de di pêla Qeyserî de çend raperînê Cotkarî jî hatin bikirin.

Çêkirina nuh pir bi kêmî ve dihate bidîtin û ew bi rengekî diyar ve bes û bi tenha xwe ve di nava salên berî Cenga Cîhanîyî Yekem de û bi taybetî ve di berê berkirina Serdarîyê de hate bipêşvekevtin; jiber ku Deynên Diravîyî Serdarîya Ferensî ji bona Serdarîya Rusî dihatin bidan, -80 der Sed ji Sermiyanê Bêgane Firensî bû û 20 der Sed jê ji bal Serdarîyên Ingilistanê, Gerministanê û Belçîka ji bona Serdarîya Rusya hate bidan-. Herwehajî çêkirina nuh di berê berkirina taybetî jî de -li vêderê jî de bi alîkarîya Sermiyanê Bêgane- tanî radeyeki kêm jî hate bipêşvexistin. Tevlivêjî de Pirolitarîya Rusî tanî endazekî bi kêm ve dihate bidîtin: Ew bi sê milyonan ve dihate biderkevtin. Ligeljî de sê milyonên din jî bi ser ve ji Karkerên "Demsalî" dihatin biservekirin, yên ku ew di koka xwe de Cotkar bûn û wan di danekî salê de mîna Cotkaran û di danekî din de ji salê mîna Karkeran di karxanan de didan bikarkirin. Belam hêza Pirolitarya Rusî di karxanên mezin de -çêkirina pola, hesin û komera kevirî de- dihatin bicivandin û bigewrekirin. Hêjîbêtir wê bi remanên Şûreşgêrîyî Sosyalistî ve dida bibawerkirin. Vê jî date bihiştin, ku rêxistina wêna bête bihêsanîkirin. Herwehajî ew di bajarên mezin de û bi taybetî ve di paytext de dihatin bikomkirin. Vê jî date bikirin, ku giranbûna wênayî siyasî û civakî bête biçendcarîkirin. Vê tevgera çêkirinêyî bi navkirî ve date bikirin, ku Tudeyên bajarên mezin bêtin bibêtirkirin. Wer bi vî rengê hanê ve Tudeyên bajarên Bêtersburg û Mosko her yek bi du milyon Nefer ve dihate biderkevtin. Tudeyên bajarê Kiyêv bi nîv milyon Nefer ve dihate biderkevtin û bajarê Bako bi 300 hezar Ten ve dihate biderkevtin; -jiber ku çêkirina nevftê têde dihate binavînîkirin-.

Çînîya Borcuwazîyî Rusî -ji Bazirganan, Çêkirvanan, Xwedanên karên azad û Destkaran- pir bi kêmî ve hatibûn bikatkirin; jibervêjî wê nikarîbû bi wê rolê ve bête birabûn, ya ku Borcuwazîya Firensî di şûreşa Firensî de der sala 1789 de û li paş wê jî de date

bilîstin. Wê bi rengekî bi kêr ve di çûna şûreşê de date bibeşdarîkirin û wê li paş de çinîna berên mêwên wê jî ji bona berjewendîya xwe date bikirin. Belam Aristokratîya -Xanedana Serdar bi serûştî ve û di nasîna xwe de kêm jimartir bû û wê bi givaştî ve bi serhevgirtinên xwe ve dida bigirtin.

Divê li vêderê de bêtir jî li ser rola Çînîya Zanistavanî de bête bigirêdan, ya ku ew der Rusya de di bin navê "Intelligentsia" - Zanistvan hate binaskirin. -Ev gotina hanê di qurmê xwe de Latînî ye û ew wisajî di zimanê Rusî de hate bikaranîn-. Di nava van Zanevanên hanê de Arostokratîyên -Xanedanên Biçûk mîna -Lenin bi xwe ve-yanjî Borcuwazî nala -Nivîskaran û Dadyaran- dihatin bidîtin, yên ku wan roleke mezin di jîyana remangîrîyî Rusî de di dirêjîya sedsalên nozdehan û destpêka sedsalên Bîstan de datin biyarîkirin. Ji van Zanevanan jî -jimarekê ji Efserên Bicûkî Supah datin bilîstin-, yên ku wan remanên şûreşa Firensî didan bihilgirtin û li paş jî de di nava wan de tevgerê hatin biderkevtin, yên ku wan "Serûştîya xweyî Silavî" - yajî Rusîyî- taybetî pêve û pêrejî bi şûreşgêrîtîya xwe ve didan bipêgirtin. Tevan bi hev re xwe ji rêstika rabûyî û kêjabûnên borcuwazîya rojavayî didan bidûrkirin. Di pêşîya wan de tevgera Nihilisme-Nihilismus-Nayînkirin dihate bidîtin. Merov dikare gotina Nihilisme bi "Nemankirinê" -ji Neman-[1] ve bide biwergerandin, ya ku ew bes û bi tenha ve bi rastîya rêzanên zanistîyên serûştî ve tête birûniştin. Vê tegvgera hanê karên metirsiyê dane bikirin. Li paş sala 1861 de tevgera "Populisme" -Gelêrî- hate biderkevtin. Bangkirvanên wêna ji Zanevanên Xwedênenas bûn, ji yên ku wan Sermeyadarî didan bikînkirin. Wan ne bi pêwistî ve "Qonaxa Borcuwazîyê" li Rusya de didatin bidîtin. Belam wan rizgarîkirina Moujiks-Mociks -Cotkarên-

---

[1]Ismet Şerif Wanlî vê gotina Nehilisme- Nehilismus bi gotina Nemana Kurdî dide biwergerandin. Belam li gora têgihiştina min de ew bi başî ve gotina Nayînkirinê dide biderxistin; jibervêjî min Nehilisme-Nehilismus bi gotina Nayînikirinê ve dayite biwergerandin. Wer ev gotina hanê di ferhenga peyvên bêgane de hatîye binasîn: "Nehilismus, bi temaşekirina nayînkirina bi carekê ve ji bona hemû hêjabûnan ve tête bidîtin; ew her pêşkevtinekê yanjî hebûnekê dide binayînîkirin", Kleines Fremdwörterbuch, VEB Bibliographisches Institut, Leipzig 1973, R. 248. Cuma

Rusî didan bixwestin. Ew ji bona "Pêrgîbûna Gel" hatin biçûyîn. Belam ew ligel rastîya "Moujiks-Mociks" de hatin bikevtin, yên wan ew bi dar û beran ve dane bipêşîwazîkirin. Herwehajî tevgera "Anarchisme-Anarchismus" -Serberdayetîyê- jî hate bipeydakirin, ya ku Pîrê wê Bakounin-Bakonin bû. Bangkirvanên wê bi tu rêstikeke Serdarîyê ve nedihatin birûniştin û wan ji bona wêrankirina wêna didan bixebatkirin. Li paş de di dawîya sedsalê dawî de şapekî şûreşgêrîyî bi rêxistî ve hate biderkevtin. Tkatschev-Tikatşêv ji bona vî şapê hanê didate bibangkirin. Ew ji yên pêşî bû, yê ku ew li ser Dîtina Markisî li Rusya de hate biaxivtin. Bangkirvanên vî şapê hanê didane bixwestin, ku ew Milet bidin birizgarîkirin. Belam wan didan bibawerkirin, ku Milet nikare xwe bi xwe ve bide birêxistin; jibervêjî divê hebûna kêmîyeke şûreşgêrîyî remangîr ji Zanevanan bête bipeydakirin, da ku ew xwe mîna Pêşrewekî bide birêxistin û ew xwe ji bona Serdarîkirînê bidin bigihandin, da ku ew Cemawerên Gelêrî bidin birizgarîkirin û dadwerîya civakî bidin bicîkirin. Wer tête bidîtin, ku armanca bingehiyî vî şapê hanê, ya ku ew divê bi her awayekî ve bête bicîkirin, di "Dadwerîya Civakî" de dihate bidîtin û ew ne di "Azadîyên Demokrasîyî" Neferî de mîna ku ew di şûreşa Firensî û şûreşa Ingilîzî de dihatin bidîtin.

Herdu armanc bi nêzîkî hevdû ve têtin bidîtin, tevî ku bicîanîna yekê ji wan bêyî ya din nayête bikirin. Belam Rewanîya Silavî "Dadgerîyê" di ser "Azadîyê" re dide bigirtin, heger -ji bona nimûne-bête bipêwistkirin, ku Silavî dev ji yekê ji bona berjewendîya ya din bidin biberdan. Ev dîtina hanê bi serûştî ve tête biderkevtin; jiber ku Rusya bi carekê ve Reweştên Demokrasîyî Rojavayî dide binezanîkirin. Wer bi rengê hanê ve ji bona remangîrên wêyî şûreşgêr peydakirina "Nan" ji bona Milet berî "Xuwarina Canî" bi giringî ve dihate biderkevtin.

Ev dîtina hanê jî bi Dîtina Markisistên Rusî ve dihate bidîtin[1],

---

[1]remana azadîyê û aadgerîya civakî bi hev re her û her ew bi ciwîtî ve têtin bidîtin. Cudakirina di navbera van herdu remanan de di dîtina Markisî de bi şaşbûneke pir mezin ve tête biderkevtin. Herwehajî divê li vêderê de bête bigotin, ku danina dîtîna Makisistiyê ne li Rusya û ji bal Miletên Silavî de hatîye bidanîn. Ew li Elmanya û ji bal Feylesûfên Elmanî de hatîye bidanîn.

Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî warê hanê de li: Lenin: "Sê kanî û sê

yên ku remangirên wan jiber zordarîya Polîsan ji bona Rojava hatin bipenakirin. Wan Siwêsra ji xwe bi wargeh ve datin bikirin. Wer Plekhanov -Pilixanov[1] der sala 1883 de û li paş jî de Lenin der sala 1900 Cinif ji xwe re bi wargeh dane bikirin. Vê bi destkevtina wanî bi xwe ve jî ji bona Azadîyên Demokrasîyî Rojavayî di Diyarên Derkevtinê jî de ew dîtina wan neda biveguhertin. Lêbelê wê Siyaseta Polîsîyî Zordarîyî Hov di Rusya de hişt, ku ew ji bona Avakirina Partîyeke Markisistîyî Veşartîyî bi rêxistî ve bidin bipilankirin, ya ku ew bi van armancên berzî ve tête bixemilandin: Wergerandina civakê ji bingehê wê de, alîkarîya mêjûwê di çûna wê de, gerjî ku ew bi darêzorê ve jî bête bikirin, mîna ku Karl Marx dida bidîtin.

Li paş şikestina Rusya de berambar Çapan der sala 1905 de, -evaya rûdaneke seyr bû û wê alîkarîya şîyarbûna Miletên Asyayî di Imperatoriya Rusî de date bikirin-, şûreşke gelêrîyî ji ber xwe ve di Rusya de bi bê bernamekirina wêyî berê ve hate birûdan. Partîyên Siyasîyî Beramber û herwehajî di nava wan jî de Partiyên Sosyalistî jî nikarîbûn di vê şûreşa hanê de tu roleke mezin ji xwe re bidin biyarîkirin. Belam Serdarîya Rusî li paş temirandina şûreşê de bi veçakkirinên tenik ve hate birabûn. Ji van jî pêkanîna Civata Parlemanîyî Kêm Wênerîya Gel -Douma- date bikirin. Herwehajî wê rê ji bona Desteyên nuhî Cotkaran date bidan, ku ew xwe ji bin rêstika "Mir" bidin biderxistin û xwedîtîya erd bi destên xwe ve bidin

pêkhatinên Markisistiyê", bi zimanê Kurdî zaravayê Kurmanci ve, Werger Soro--wê Çaxê min Nivîsandinên xwe hemû di bin Navê Sore de didan bibelavkirin- Cuma-, Berlin sala 1977 de bidin bitemaşekirin. Cuma

[1]Ji xwe re li ser Georgi Plechanov -Pilixanov de li:" Georgi Plechanov: Kunst und gesellschaftliches Leben" -Giyorgi Pilixanov: huner û jîna civakî, Alexander Uschakov û Pjotr Nikolajev, Dietz Verlag, Berlin sala 1975 de, di 462 rûpelan de bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin.

Herwehjî ji xwe re li:"Georgi Plechanov, Eine Biograhpie" -Giyorgi Pilixanov, Jîndarîyek, Michail Jowtschuk û Irine Kurbatowa, Dietz Verlag, Berlin di sala 1983 de di 331 rûpelan bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin. Cuma

bixistin.

Cenga Cîhanîyî Yekem hate bivêkevtin. Hindik mabû, ku têde der sala 1917 de rûdana sala 1905 de dê bihata bivegerandin, heger ku ne di bêhna dawî de vîna Lenin bihata bidîtin. Rusya der sala 1914 de mîna Dewleteke mizin ji bona alîyê Firensa û Ingilstanê dijî Elmanya û Imperatorîya Nemsawî-Mecerî ji bona nava cengê hate bikevtin. Li paş sê salan de di cengeke giran buha de Rusya xwe li ser devê kevtinê de date bidîtin. Bes û bi tenha ve der sala 1915 de Supahê Rusî di anîya şer de 150,000 Kuştî, 700,000 Birindar û 900,000 Dîlvan ji Serbazan û E.'seran date bidan[1].

Rêberîya Supahê Rusî Siyaseta "Şewitandina Erdê" date birêvebirin, mîna ku Rêberîya Supahê Rusî ew der cenga Napolyonî de -der sala 1812 de -Cuma- date bikirin. Gund û Werz beramber bi pêşkevtina Leşkerên Dujmin ve hatin binabûdkirin. Ji vê hate biencamkirin, ku bi hezaran ji Tudeyên bajar û gundan ve xwe bê cî û war û xwe bi bê nan û zad ve datin bidîtin. Wan ber bi rojhilat ve ji bona bajarên Rusî dane bibazdan. Belam ew bê Kes û Kus hatin bidîtin.

Herwehajî çêkirina Rusî rêxistina wêna ji bona berkirina cengînî hatibû binavînîkirin û wê berkirina keşt û kalên xwarin û vexwarinê di ser guhên xwe re dabûn biavêtin. Wer bi vî rengê hanê ve buhayên keşt û kalên xwarin û vexwarinê û bi taybetî ve ew di nava bajaran de pir hatin bigirankirin. Wisa birçibûnê Çînîyên Gelêrî û Navînî ber bi tirsa xwe ve dane bixistin. Beramberî li vê rasta hanê de Serdarî û dam û destgehên wêna tawî û destbend hatin bidîtin. Xaçsora Rusî xwe li gora karîna xwe de date bilivandin. Wê Encûmen û Komelên Tude ji bona dermankirina Birîndaran û yarmetîya Penehindan datin bipêkanîn, ango Milet xwe bi xwe ve beramber bi tawîbûna Serdarîyê ve yanjî hêjî rastir beramber bi nebûna Serdarîyê ve bi rabûna Desthilatîya Cihî ve date bidestpêkirin.

Herwehajî Serdarîya Elmanî Supahekî Filendî ji Penehindan û Derketîvanan date bipêkanîn, da ku ew şerê Rusya bidin bikirin, di

[1] Ji xwe re li nivîsta Hélène Carrére d`Encausse: "Lénine: la rèvolution et le pouvior" -Lenin: Şûreş û Serdarîkirin-, Paris, sala 1972 de bi zimanê Firensî ve bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

gava ku Filenda perçeyêkî -gagîrkirî- ji Imperatorîya Rusî dida bipêkanîn. Herwehajî Elmanya bi serxwebûna perçê rojhilatî ji Lehistanê-Polonya ve pê hate birûniştin, yê ku ew bi ser Pirosya ve dihate bipêvekirin, -bi bêyî perçeyên wêyî din ve yên ku ew bi Elmanya û Nemsa ve dihatin biservekirin-. Weha bi vî rengê hanê ve Pirsiyarîya Çarekirina Çarenûsa Miletan bi çarenûsa vê cengê ve hate bigirêdan.

Di 21 reşmeha sala 1917 de Şûreşke Gelerîyî ji ber xwe ve dijî Serdarîkirinê di Petersburg de -navê wê di wê çaxê de Petrogard bû- di pêşî de hate bidestpêkirin. Rikgirtineke giştî di karxanan û dam û destgehan de hate bikirin. Bi hezaran ji Tudeyên bajêr ji bona xwepêşandaniyê ji bona nava şeqaman hatin bidakevtin û wan daxwaza Nan didan bikirin. Piştî vedudulîyekê Serdariyê fermana vetemirandina şûreşê date biderkirin. Leşker vedudulîya bikaranîna hêzê date bikirin û li paş de letên wî yek li dû yê din de xwe di 27 reşmehê de ji bona nava Rêzên Xwepêşandanvanan dane biavêtin. Herwehajî Karkeran zindan dane bivekirin. Qayser fermana jihevxistina Parleman -Doma- date biderxistin. Wê gavê Cemawer ji bona Baregeha Parleman -Tauride-Kax- hatin biçûyîn û wan jê datin bixwestin, ku ew Serdarîyeke nuh bide bipêkanîn. Biservajî Fermana Qeyser jî ve Civata Doma bi pêkanîna "Encûmeneke Mîlî" ve hate birabûn, ya ku ew nala Serdarîyeke şûregêrî di bin Serokitîya Mîr Lvov-Livov dihate bidîtin. Ji Endamên wê jî Dadyar Kerensky-Kirenskî û Wênerên hemû Berên Siyasî ji bil Berê Rast ve dihatin bidîtin. Di wê gavê de bi xwe jî ve Wênerên Şûreşvanan di paytext de bi damezirandina civateke taybetîyî bi xwe ve ango Civata "Sovyêt" hatin birabûn[1]. Ew ji berên Sosyalistî û Demokrasîyên cuda ligel Pirbûneke Veçakkirinê û Liserxwe de dihatin bipêkhatin. Herwehajî di nava wan de Wênerên Markisîyan dihatin bidîtin, yên ku piranîya wan ji berê Menşevîkî bûn. Kerensky-Kirênskî bi xwe jî ve di Sovyêt de Endam bû û herwehajî pêrejî ew di Serdarîya Katî de Wezîr bû.

"Encûmena Katîyî" Civata Doma daxwaza xwekişandina Qeyser Nikolayê Duwem ji bona kara Kurê wî yanjî ji bona kara

[1]Gotina "Sovyêt" di koka xwe de bi zimanê Rusî ve bi bê hîç rengekî siyasî yanjî çînîtî ve gotina "Civatê" dide biderxistin. Ismet Şerif Wanlî

Birayê wî date bikirin. Belam wî di pêşî de ev daxwaza xwekişandina xwe date binayînîkirin. Li paş de wî di 3 avdarê de ji bona Kara Birayê xwe wî xwe date bikişandin. Belam Birayê wîna Cîgirtina xwe di Serdarîkirinê de date binayînîkirin, ku Birayê wî Şûngirekî ji bona cihê xwe bide binîşankirin. Gava ku ev xebera hanê hate biderkevtin, şûreş di sernaserî welêt de hate bivêkevtin. Encûmenên Tudeyî ji bona Serpereştîyê hatin bipêkhatin. Wer bi vî rengê hanê ve Serdarîkirina Padîşahîya biserêxwe ve beramberî Şûreşa Gelêrî hate biherifandin û wê li dûxwe de "Serdarîyake Katî" di bin Serokitîyeke Arostokratîyî Liserxwe de xwedan mêldarîyên Demokrasîyî Borcuwazî date bihiştin[1].

Beramberî vê Serdarîya Katî û "Nîv Şûreşgêrî" de sê pirsên bingehî dihatin bidîtin, yên ku ew divabûn ji bal wê bi lez û bez ve bihatana biçarekirin: 1. Pirsa ceng û aşîtîyê, 2. Pirsa erd û Cotkaran û 3. Pirsa milîbûnan. Li ser çarekirina van pirsan de asayiş, ewletî, hilanîna bêserîbûnê û vegerandina ji bona karkirinê û berkirinê dihatin birawestandin.

Piranîya Serbazan û beşekî ji Efseran aşîtî û bidawîanîna cengê di bin her mercekî û buhayekî de didan bixwestin. Evaya pirsek bû, ya ku çarekirina wêna ji Serdarîyê dihate bixwestin. Belam Rusya bi Peymanên Navdewletî ve bi Hevalbendên xweyî Firensî, Ingilîzî û herwehajî bi wan Emerîkanan ve, yên ku ew li paş de ji bona nava cengê hatin bikevtin, dihate bigirêdan; jibervêjî bi başî ve jê re nedihate bidîtin, ku ew bi serê xwe ve ligel Elmanya de lihevhatinekê bide bigirêdan, ku di encamê wê de Elmanya bête bixurtkirin.

Cotkaran ji xwe re erd didan bixwestin. Milîbûnên Rojavayî - Finlenda, Miletên Paltik û Lehistanê- mîna Gorcan û Ermenîyan di Kafkasya de ji xwe re serxwebûn didan bixwestin. Piranîya milîbûnên Musulman di Asaya Navînî de di pêşî de mayîna xwe ligel Rusya de didan binayînîkirin û wan mayîna xwe ligel Rusya de bes û bi tenha ve di bin mercê wekhevbûna wan de ligel Rusya de didane bidîtin.

Serdarîya Borcuwazîyî Katî di helbijartina çarekirinan de pir

[1]Ji xwe re li ser şûreşê de li nivîsta Marc Ferro: "La révolution russe de 1917 de" - Şûreşa Rusî der sala 1917 de, Paris sala 1967 de û çapa nuh der 1990 de bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

date bidudulîkirin, na hêjîbêtir wê xwe her û her ji bona Serdarîkirinê bê tuwan didate bidîtin; jiber hoyê çotbûna wêyî bêtir bi derbasbûna demê ve ji bona Serdarîkirinê ligel Desthilatîya Civata Sovyêtê de dihate bidîtin. Ev bi taybetî ve hate bidîtin, gava ku Lenin der mêjûwa 3 cotana sala 1917 de ji Sîwêsra hate bivegerandin û gava ku wî di gihandina xwe de date bigotin: "ku Serdarîyê divê tevaya Desthilatîyên xwe ji bona Civatên Sovyêtan bide biberdestkirin". Lenin bi van peyvên xwe ve Partîyên Çep, yên ku ew di beramberyê de bûn û herwehajî bi xwe jî ve wî Hevalên xwe di Partîya Bolchevik - Bolşevîkî jî de dane biveciqandin, yên ku ew di nava welêt de bûn û ew di bin Serokitîya Kamenev de bûn, yê ku wî rojnama "Piravda" dida biderxistin

Partîyên Beşdarîyên di Şûreşê de ev bûn:

- Partîya KD, ya ku wê Wênerîya Borcuwazîya Azadixwaz dida bikirin, ew li ser "Serdarîya Katî" de zal bû. Wê dev ji Qeyser date biberdan, na hêjîbêtir wê ji bona xwekişandina wî ji Padîaşhîyê date bibangkirin. Endamên wê li paş rûxandina Padîşahîyê de bi hatina piran ji Xanedanan, Karnasên Supahî, Karmendên Gewre û Zimîndaran ve hatin bipirkirin. Vê date bihiştin, ku ew xwe di nava "Navîna Rastan" de di derbarê siyasetê de bide bidîtin. Wê dixwest, ku ceng bête birêvebirin û wî li ber xwedîtîya Neferî de -dijî Cotkaran- dida bikirin. Wê siyaseta xwe beramber bi pirsîyarîyên milî ve bi diyarî ve nedida biderxistn. Tevî ku Partîya KD li ser serê Serdarîyê jî de bû, Borcuwazîya Rusî nedikarîbû Rêberîya Şûreşa Gelêrî ber bi Rêstikeke Borcuwazîyî Demokrasî ve bide bibirin. Ev jî lawazîya vê Borcuwazîya mêjûyî dide bidersxitin.

- Partîya SR Civakîyî-Şûreşgêrî. Merov dikare bide bigotin, ku wê di Serdarîyê de Piranîya pir ji Miletê Rusî ve ango Cotkar didan biwênerîkirin. Wê di bernameya xwe de pirsiyarîya erd û veçakkirina çandinîyê dabûn bidanîn. Wê parvekirina xwedîtîya erd ji bona ser malên Cotkaran dida biarmanckirin. Di nava wê de çend şap dihatin bidîtin û ji wan jî şapê li jêr Serokitîya Kerensky-Kirenski jî de dihate

bidîtin. Di pirsîyarîya welatî de wê Rêstika Fêderalî-Hevgirtî dida biarmanckirin.. Hegerjî ku wê kêmîyek di Serdarîya Katî de dida biwênerîkirin, belam wê palpiştî ji piranîyê di Civata Sovyêtan de ji xwe re dida biwergirtin. Li paş hevalbendîtîya wêna de ligel Perê Menchevik -Menşevikî Markisî de vê hevalbendîtîyê bigir tevaya dengan di vê Civata hanê de ji xwe re didan biwergirtin. Herwehajî bingehê Leşker û Serbazan jî bi piranîya xweyî mezin ve pişta vê Partîya civakîyî şûreşgêr didan bigirtin. Tevlivêjî de Partîya SR nedida bikarkirin, ku ew bi tenha xwe ve Serdarîkirinê ji bona nava destên xwe ve bide bixistin; jiber ku Serokên wê û herwehajî pêrejî Menşevikan jî didan bibawerkirin, ku Rusya di pêşî de pêwistîya wê bi derbasbûna qonaxa "Şureşa Borcuwazî" ve tête bidîtin û rola wan divê di Beramberbûna Demokrasî de bête bidîtin. Partîya SR aşîtî dida bixwestin, bi mercekî ve ku ew ne bi lihevhatineke bi tenha xwe ve di navbera Rusya û Elmanya de bête bidîtin.

Kerensky di Partîya SR de Şapê Rastê dida biwênerîkirin. Hevkarîya wî ligel Partîya Azadîxwaz de date bihiştin, ku Partîya wî wirde wirde bawerîya cemaweran ji xwe bide biwindakirin, ya ku wê berê di şûreşa reşmehê de dilbijandinên cemaweran dida biwênerîkirin.

- Partîya -Menşevikî-. Menşevikî Markisistî bû. dibe, ku ew hêjîbêtir di Markisistîyê de ji Bolşevikan "Ortodoksîtir" -notir bûn. Wan bi hev re di kokê de yek Partî bi navê "Social Democrate" -Sosyalistîya Demokrat yanjî Civakîyî Demokrat- didan bipêkanîn. Li paş de di Rêberîya Partî de di navbera Bolşevikan de di bin Rêberîya Lenin de, yên ku wan "Piranî" di wê çaxê de di Rêberîyê de didan bipêkanîn, -jivirjî navê "Bolşevik" ango Piranî di zimanê Rusî de dide biderxistin-û "Menşevîkan" -ango Kêmitîyê de bi zimanê Rusî ve- di bin Serokitiya Pilêxanov de cêhêbûn hate bikirin. Perê Leninî navê "Menşevik" bi wan ve date bişêrêzkirin, da ku ew şerê wan bidin bikirin; tev ku wan bi xwe jî ve di nava Destên Karkerîyên Rusî jî de pir caran jî piranî didan biwênerîkirin. Di gava şûreşa reşmeha sala 1917 de piranîya Wênerên Pirolitarya Rusî di Civata Sovyêtan de ji hevalbendên berê Menşevikî bûn.

Di meha cotan de -piştî vegerandina Lenin- hêjî Menşevikan

piranîya Karkerî di Civata Sovyêtan de didan biwênerîkirin. Cemawerên Gelêrî, ku evaya jî bi giringî ve tête bidîtin, di wan de ji bona bi serkevtina şûreşê ve hêvîyên xwe didane bidanîn. Menşevikan Yekitîya Pirolitarya Rusî didan biarmanckirin û wan ev ji bona pêlekê ji demê -berî hatina Lenin- bi lihevhatina wan ve ligel Bolşevikan de di hundur de di bin Rêberîya Stalin û Kamenev de dikarîbûn bidana biciânîn. Di wê gava ku belkî wan dikarîbû Serdarî li ser daxwaza cemawerên şrûreşgêranî de ji bona nava destên xwe bidana bixistin, wan ev nedan bikirin; jiber ku ew Markisistên Kilasîkî bûn. Wan bi divabûna derbasbûna qonaxa "Şûreşa Borcuwazîyî Demokrasî" berî Şûreşa Pirolitarî ve didan bibawerkirin. Jiber vî hoyê hanê jî ew der destpêka meha gulana sala 1917 de ligel Partîya KDyî Borcuwazî û Partîya SR ya Civakîyî Şûreşgêrî -krensky- de ji bona nava Serdarîya Ligelhevîyî nuh de hate bikevtin, ya ku ew ji bal Mîr Livov hate bipêkhatin. Merov dikare bide bigotin, ku beşdarîkirina wan di Serdarîya Ligelhevî de di bin Rêberîya Borcuwaziyê de ew ji Milet hatin bidûrkirin.

- Lenin ji Siwêsra hate biderkevtin û ew ji bona Rusya di nava Elmanya re bi tirêneke taybetî ve, ya ku ew jê re Serdarîya Elmanî dabû bidanîn, hate bivegerandin[1]. Gava ku Lenin ji bona bajarê San Pêtersburg di pêşîya cotanê de hate bigihaştin, Partîya "Bolşevikî"

---

[1]Mîna ku hatîye bizanîn, Lenin ligel Hevalên xweyî Derkevtî de dev ji Siwêsra dane biberdan û ew di tirênekê de di rêya Elmanya de ji bona Rusya hatin bivegerandin. Ev tirêna hanê ji wan re ji bal serdarîya Elmanî de ji bona vegerandina wan hate bidanîn, ya ku ew hêjî ligel welatê wan de di nava cengê de dihate bidîtin. Hîc gûman têde nayête bidîtin, ku serdarîya Elmanî li ser Pilanên Lenin de bi dawîkirina cengê ve bi her buhayekî ve agehdar bû. Di nivîsta xwe de Mark Fero "Li ser Şûreşa Rusî de der sala 1917 de", ya ku ew li jor de hatîye bibîrxistin -û yê ku ew Mêjûvaneke û ew ji rexê çepê Partîya Sosyalistîyî Firensî tête bidîtin-. Wî "Hêsanîkirinên" Elmanî dayite bibîrxistin, yên ku wan ji bona vegerandina Lenin û Hevalên wî dane bipêşkeşkirin. Herwehajî ew yarmetîya diravîyî serdarîya Elmanî ji bona rojnamên Markisî-Leninî dide bibîrxistin, -ya ku ew di rêya Kompanîyeke "Bazirganî" de di bajarê Sitokholmê de dihate bipêşkeşkirin-. Ismet Şerif Wanlî

Kêmîyeke Karkerîyî Biçkûk dida biwênerîkirin, ya ku ew ligel Piranîya Karkerî de ji "Menşevik" hatibû bihevalbendîkirin. Menşevik bi xwe jî ve ew di wê çaxê de ligel Borcuwaziyê de hatibûn bihevalbendîkirin û wan berê xwe ber bi Rastî ve didan bivekirin, di gava ku têde cemawerên gelêrî berê xwe ber bi Çepitîyê ve didan bivekirin.

Wer Lenin hate biliberkevtin û wî hevalên xweyî Bolşevikî dane biliberxistin, ku şûreşa "Borcuwazî" bes û bi tenha ve ew di nava remanên Menşivikî û Partîya -SR- Kerensky de tête bidîtin û ev şûreşa hanê bi serê xwe ve bi şûreşeke Pirolitarî ve tête bidîtin û bingehên Leşker ligel Milet de têtin bidîtin. Karê Leninî pêşî jihevxistina hevalbendîtîya di navbera Bolşevik û Menşevik de bû. Wî dî pêşîya pêşî de şer ligel wan de date bilidarxistin. Pêrejî wî ji bona bi dawîkirina cengê ve date bibangkirin, ya ku hêjî Serdarîya Ligehevî de ew vêxistî dabû bihiştin. Armanca wî di dawîkirina cengê de, hegerjî bi rengekî Lihevhatîyî bi tenha xwe ve jî bihata bidîtin, cihekî wêyî mezin di nava Desteyên Gelêrî de û bi taybeti ve di nava Desteyên Kakerî û Bingeha Leşker de dihate bidîtin.

Di nava çend mehên kêm de Bolşevik ji Partiyeke kêm giringî ji bona Partîyekê hate biveguhertin, ya ku wê hêvîyên cemawerên gelêrîyî şûreşgêrîvanî didate bigewdekirin. Bingehên Leşker aşîtî didan bixwestin; jiber ku ceng ne di nava Xakên Rusî de dihate bigerandin, mîna ku ew di dema cengên Napolyonî de dihate biditin. Ew li ser diyarên sînor de dihate bigerandin. Ango ew li Lehistanê û Galisya dihate bigerandin, yên ku ew bi Rusya ve hatibûn bipêvekirin. Herwehajî jiber ku reftara Efserên Rus bi xwe jî ve ligel Serbazên xwe ve mîna reftra Xanedanan ligel Nokerên xwe de dihate bidîtin.

Di Kongirê Yekemî Civatên Sovyêtan de, yê ku ew der meha axlêve de hate bigirêdan, Bolşevikan pirîtî ji xwe re nedane biwergirtin. Belam durujmê wan "Nan, Aşîtî û Erd" bangek bû, ya ku ew bi xwe jî ve û pêrejî bi dengvegerandinekê ji bona daxwazên Karkeran, Serbazan û Cotkaran ve dihate biderkevtin. Lek bi lek ve ji wan koman ji bona ser şeqaman ji bona xwepêşdanînê dihatin bidakevtin, yên ku ew ji bal Bolşevikan dihatin birêxistin. Di 7 tîrmehê de Krensky -Kirinski Serokwezîrtîya Serdarîyê date bigirtin û

wî bi vemirandina xwepêşdanînan ve date bidestpêkirin. Lenin xwe ji bona demekê li Finlenda de date biveşartin. Der meha gelavêjê de General Kornilov li ser serê Leşkerekî de bi karekî ve ji bona Wergêrandineke Supahê hate birabûn, da ku ew Serdarîya Katîyî lawaz bide binabûdkirin û da ku ew asayişê û rêstikê bide bivegerandin. Ew di vî karê xwe de nehate biserkevtin. Belam vî karê hanê hemû tevgerên Karkerîyî Sosyalistî û Cotkarî di bin Rêberîya Bolşevikî de dane biyekkirin. Wan tevgeran Piranî di pirbûna Civatên Sovyêtan de di cara pêşin de ji xwe re dane bigirtin û Tirotiski bi Serokê Sovyêtên Pêtrogirad ve hate bikirin. Ev guhertinên hanê jiber van hoyan hatin kirin; jiber ku Lenin dest bi vebêja "Welatperweryê" ve date bikirin û wî Serdarîya Krensky -Kirenski bi gift û gokirinê ve ligel Elmanan de ji bona berdestkirina paytext ji bona wan date bigunehbarkirin û wî Navînîya Serdarîyê ji bona Mosko date biveguhestin. -Ango wî rol bi hevdû ve dane biveguhertin-.

Di destpêka çirya pêşî de Lenin date dazanîn, ku dê Şûreşa Kumonistîyî giştî di navbera 20 û 25 çirya pêşî de -bi bê nîsankirineke diyar ve- bi piştgirtina Tirotiskî û Sitalin ve û bi cudabûna bawerîyên Kaminiv û Zinovif ve bête bikirin. Di 25 çirya pêşîn de Kongirê Duwemî Tevaya Civatên Sovyêtan di seranser Rusya de hate bikomkirin û şûreşê jî dabû bidestpêkirin. Piranîya Serbazan û Deryavanan xwe ji bona alîyê ser şûreşê dane biavêtin. Krensky - Kirenski date bibazdan û Serdarîya wî hate binemankirin. Tevaya jimara Endamên Kongirê Sovyêtan 673 Kes bûn. Ji wan 390 Bolşevikî bûn, 160 ji Partîya SR bûn û 90 ji Menşevik bûn. Kongire "Encûmena Bicîkirinê" date bihelbijartin, ya ku ew ji 25 Endaman dihate bipêkhatin û ji wan 14 Endam ji Bolşevikan bûn. Wer bi vî rengê hanê ve şûreşa çirya pêşîn hate biserkevtin.

Şûreş di 25 çiriya pêşîn de li gora salnameya Rusiyî -Julien-de, ya ku ew di wê demê de dihate bikaranîn, hate bikirin[1]. Belam ew

---

[1]Ji xwe re bi zimanê Elmanî ve li: John Reed "10 Tage, die die Welt erschüterten" - Deh rojên, yên ku wan Cihan dane bilerizandin, Dietz Verlag, Berlin, di sala 1961 de, di 516 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Vî Rojnemevanê Emerikî Bînvanê van rûdanan ji dil û can bi dûr û dirêjî ve di nava van rojên mêjûyî cîhanî de tevaya kûrbûn, dûrbûn û kêra giranî vê Şureşa mezin date biderxistin. Rast û durust Şûreşa Oktpbera Mezin tevaya dunyayê li paş de bêtir ji heftê salî date bihejandin. Herwehajî wê kêreke mezin

li gora salnameya -Grégprien- de der roja 7 çiriya paşîn de hate bikirin, ya ku ew der Rojava de tête bikaranîn û ya ku Rusya ew -der reşmeha sala 1918 de- ji xwe re jî date niwergirtin.

Di roja paş de di 26 çiriya pêşîn de Kongirê Sovyêtan "Serdarîya Karker û Cotkaran" di bin Serokitîya Lenin de date bihelbijartin, ku tevaya Endamên wê jî ji Bolşevikan bûn. Ev karê hanê jî bi dijî wê peymana girêdayî ve ligel Partîya SR û Menşevikan de ji bona bi rêvebirina şûreşê ve hate bikirin, ya ku Bolşevikan ew ligel wan Partîyan de dabûn bigirêdan. Di vê rojê de bi xwe jî ve Lenin fermanek date biderkirin, ku têde ew divabûna "Erdê ji bona Cotkaran" dide biderxistin. Cotkaran berî vê erdên Zemîndaran li ser banga wî de dabûn bidestkirtin. Ev fermana hanê bi dijî dîtina Markisistîyê ve di tevayîkirina destikên berkirinê de tête biderkevtin. Belam ew li ser rastîya rastîyî Rusyayî civakî de tête bilihevhatin. Herwehajî pir bi seyr jî ve tête bidîtin, Ku Serdarîkirina nuh çêkirin di nava destên Xwediyên wê de date bihiştin, da ku ew berkirinê bide bigirawkirin û destdirêjîya derve bide biberamberkirin. Ev karê hanê jî bi dijî awatên Karkeran ve dihate bidîtin. Belam Serdarîkirina nuh çêkirina giran der 28 axlêva sala 1918 de date bimilîkirin.

Di gava biserkevtina şûreşê de Rusya di kar de tevaya desthilatîya xwe li ser hemû Miletên Nerusî de date biwindakirin, yên ku ew li jêr Serdarîkirina Tisaran-Qeyseran de dihatin bidîtin. Di roja 2 çiriya paşîn de der sala 1917 de fermana "Dazanîna Mafeyên Miletên Rusya" bi morkirina Lenin û Sitalin ve hate biderkirin, yê ku ew "Wekhevbûn û Desthilatîya Hemû Miletên li Rusya de" dide bidivakirin û ew ji alîyê din jî de "Mafeyê Hemû Miletên li Rusya de di Çarenûsa wan de û pêrejî di Serxwebûna wan jî de" dide bidivakirin. Di vê fermanan hanê de di navbera benda yek û duwem de hinek dijayetî têtę bidîtin. Herwehajî ferman di tevaya xwe jî de ligel "Navnetewîtîya Pirolitarî" de tête bidijkirin; jiber ku li gora dîtina Markisî de "Navnetewîtîya Pirolitarî" tevlihevkirina Miletan dide bidivakirin. Belam pir pê neçû, ku Partîya Kumonist bi destên xwe ve

jî li dûxwe de li ser xebata Kurdistanê date bihiştin. Cuma

Mafeyê Çarenûsa Miletan ji nafka wî date biboşkirin.

Derbarê pirsa cengê de Lenin bi xwe ve di roja 26 çiriya pêşîn de di Kongirê Civatên Sovyêtan de fermana "Aşitî bi bê pêvekirina erdê û bi bê jidêlvedanan ve" date bixwendin, ya ku wê di nava xwe de hilanîna Dewletên pir Milîbûn, Imperatorîyên Kolîdarî û Avanîkirina Rêstikeke Nuhî Cîhanî li ser bingehê Mafeyê Miletan di Çarenûsa wan de didate bidivakirin. Di vê fermana hanê de Lenin berê xwe ji bona Miletan berî Dewletan dida bivedan, da ku ew belkî bi şûreşên Pirolitarî ve ji bona bicîanîna şûreşa Cîhanî bêtin birabûn. Belam wî dizanîbû, ku Hevalbendên Rusya ji Dewletên Rojavayî bi vê yeka hanê ve nala Imperatorîya Nemsawî-Mecerîyî pir Milîbûn dê neyêtin birûniştin. Elmanîya Dewleta bi tenha xwe bû, ya ku wê ji banga wî date bikarkirin.

Di 7 çiriya paşîn de Rusya devjêberdana xwe ji bona hemû erdên Osmanî date bidazanîn, yên ku ew li gora Peymanên Veşartîyî Hevalbendan de bi dana wan ve jê re hatibûn bisozdanîkirin[1]. Herwehajî wê bangek ji bona Miletên Rojhilat date biderxistin, da ku ew şûreşê li ser Serdarîyên Ingilistan û Firensiyî Kolîdar de bidin bikirin. Pêrejî wê gift û go ligel Elmanîya de li Brest-Litovsk de ji çileyê pêşîn de ji sala 1917 tanî avdara sala 1918 de date bidestpêkirin. Di vê navê de peyvînkirinên pir no di nava Rêstika Sovyêtî de hatin bikirin.

Sovyêt beramber bi jimarekê ji Dujminanan ve li hundur û derve de dihate birûbirûkirin. Wisa li ser rêstikê de dihate bidivakirin, ku ew divabû di navbera şerê derve û hundurû de bide bihelbijartin û bi taybetî ve Leşkerê Rusî bi carekê ve di navbera mehên şûreşê de ji hebûnê hate bihilanîn. Lenin didate bidîtin, ku divabûn ji bona rizgarîkirina şûreşa Sovyêtî ji Dujminên hundurû de pêwistîya girêdana hajbûnekê bi tenha xwe ve ligel Elmanya de û di bin mercên Elmanî de, yên ku ew daxwaza hiştina hemû heremên vegirtî ve di

[1]Ev di Peymana Saks-Piko de li bajarê Beyrudê de der 16 gulana sala 1916 parvekirina erdên Dewleta Osmanî di nava Dewletên Hevalbendan de hate bigirêdan. Bedbextîya parvekirina Kurdistanê jî li ser bingehê vê peymana hanê jî de hêjî tanî vê roja niha jî hêjî bi hemû tirş û talîyên xwe ve jî dide bidirêjkirin. Cuma

dema cengê de didin bikirin, dida bineçarîkirin. Boukharin-Boxarin beramberî dijwarîyên zînetan ne dijî Lenin bû, belam wî bi xurtî ve dida biderxistin, ku hajbûneke bi tenha xwe ve ligel Elmanya de dê Impiryalîyê bide bihêzkirin û dê ew hêvîyên şûreşa Pirolitarî bide binabûdkirin; jibervêjî wî li ser çûna cenga derveyî de bi baştir ve dida bidîtin, heger jî ew bi şewêyê cenga Pêşmergetî jî bête bikirin.

Di 5 reşmeha sala 1918 de Leşkerê Elmanî di nava Rusya de bi pêşkevtina xwe ve date bidestpêkirin, bi bêyî ku ew hîc liberxwedanekê beramberî xwe bide bidîtin. Di 3 avdara sala 1918 de di navbera Rusa Sovyêtî û Elmanya de Peymana Brest-Litovsk hate bigirêdan. Li gora vê peymana hanê de Rusya Sovyêtî Finlenda, welatên Paltik û Lehistan datin biwindakirin û herwehajî bigir jî hindik mabû, ku ew Okrayîna jî bide biwindakirin. Herwehajî pêrejî karîna vêkevtina Şûreşa Cîhanî hate bitemiramdin, ya ku Lenîn û herwehajî Boxarin pêdidan bixewinkirin.

Mark Ferro dide birûnkirin, ku "Şûreşvanan ji xwe re didan binigaşkirin, ku Demokrasîya Civatên Soyêtan bi saya Oktober ve dê Sosyalistiyê bidin bicîanîn, di gava ku Lenin Diktatorîya Partîya xwe û diktatorîya xwe di bin perda Civatên Sovyêtî de dabû bidanîn"[1].

Bi rastî ve derbarê pêwendîyên di navbera Bolşevikan û Partîyên din de, yên ku wan di nava şûreşê de dabûn bibeşdarîkirin, li paş biserkevtina şûreşê de Lenin bi qedexekirina rojnametîya van Partiyan ve bi dijbûna hemû sozên xwe ve hate birabûn. Zinoviev - Zinovyêv û Kamenev -Kaminiv û hinên din ji Encûmena Navwendî xwe dane bikişandin. Lenin hate neçarîkirin, da ku ew ji bona nava Encûmena Navwendî careke din bêtin bivegerandin, ku ew bi helbijartinan ji bona "Assemblie constituante"-Konstitionell-.Civata Destûrî ve bête birûniştin. Serdarîyên Katîyî lidûhev de çarekirina pirên cuda ji bona Civata Desturî dane bihiştin; jiber ku ew bi wênerê Tevaya Çînîyên Gel ve dihate biderkevtin û ew bêtir ji bal wî ve ji Kongirên Civatên Sovyêtan de dihate biwênerîkirin. Ev remana hanê ji bal hemû Partîynê Sosyalistî de dihate bihilgirtin. Helbijartin ji bona Civata Destûrî di meha çilê pêşîn de di sala 1917 de hate bikirin. Tevî

[1]Ji xwe re li nivîsta Mark Fero, çapa 1990, rûpel 110 bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

ku Bolşevik jî li ser jimareke mezin ji Civatên Sovyêtan de di nava bajaran de zalbûn, Helbijartin bi servajî hêvîyên Lenin ve hatin biderkevtin. Partiya -SR- Civakîyî Şureşgêrî, -ya ku wê li ber Cotkaran de dida bikirin-, 410 cih ji koka 707 cihan date biwergirtin, ya ku wê piranîya pir di Civata Desturî de ji xwe re date bidestxistin. Bolşevikan 175 cih ji xwe re dane biwergirtin. Menşevikan ji xwe re 16 cih dane biwergirtin. Partîya -KD- yî Borcuwazî -û Partîyên din- 17 cih ji xwe re dane bigirtin. Piranîya pir ji Wênervanên Civata Destûrî dijî Bolşevikan dihatin biderkevtin[1]. Di nava Wênerên Partîya SR de çil Wênerên Berê Çepî dihatin bidîtin, -yên ku ew dijî Berê Kirenski bûn-. Lenin ligel wan de hevalbendîtîyek date bigirêdan û wî date bigotin: ku "Berjewendîya Şûreşê li ser Berjewendîya Civata Destûrî de tête bidîtin".

Di civîna Civata Destûrî de di mêjûwa 5.1.1918 de Wênerên Bolşevikî Pirojeyekî Qanûna li ser Rengê Dewletê datin bipêşkeşkirin, belam ew ji bal Civatê bi piranîya 237 dengan ve hate binayînkirin. jimarekê ji Wênerên Menşevikan hêrîşî Partîya Leninî dane bikirin; "jiber ku ew li ser desthilatîyan de ji bona nava Partîyê didin bigirêdan" û wan date bidubarekirin, ku Rusya hêjî ji bona Qonaxa Sosyalistîyê nehatîye bilikarxistin. Di vê gavê de Wênerên Bolşevikî û ligel wan jî de Wênerên Çepî Partîya SR ji holê hatin biderkevtin. Di roja paş de gava ku Wênerên mayî ji bona civînê hatin bivegerandin, Pasevanên Bolşevikî ew ji bona nava avanîyê nehiştin bêtin bikevtin. Wisa bi vî rengê hanê ve serpêhatîya pêşîyî demokrasî li paş Şûreşa Oktober de bi hoyên pênerûniştina Partîya Leninî ve bi encamên hilbijartinan ve hate bikevtin.

Partîya Leninî xebata veşartî dida bikirin, belam ew ji bona Serdarîkirinê nehatibû bilikarxistin. Lenin di vî babetî de pir kêm dabû binivîsandin. Piştî gorkirina Civata Desturî Partî xwe beramberî dujwarîyekê na hêjîbêtir xwe beramberî pir dujwarîyan date bidîtin, yên ku ew pêwistî bi çarekirinê ve dihatin bidîtin. Magelo divê

[1] Ji xwe re li nivîsta *H. Carrén li Ser Lenin de*, ya ku ew berê li jor de hatîye binivîsandin, bidin bitemaşekirin, r. 96. Ismet Şerîf Wanlî

Dewletek bête bidamezirandin, yanjî magelo divê Milet xwe bi xwe ve bide biserdarîkirin? Li gora bîr û bawerîya Lenin de Dewlet dihate bidivakirin û ew divabû pir xurt bête bipeydakirin, da ku ew Diktatorîya Pirolitarya bide bicîanin. Magelo divabû ku desthilatîya Dewletê di nava destên Partî de yanjî di nava destên Civatên Sovyêtan de bête bidîtin? Bersiv li ser van pirsan de bi dujwarî ve dihatin bidîtin; jiber ku Partî di nava gundan de bi rengekî pir kêm ve dihate biwênerîkirin. Gundî li ser Civatên Sovyêtîyî Cihî de zal bibûn û berjewendîyên wanî taybetî bi wan ve dihatin bidîtin. Hêjîbêtir di nava bajaran de pir caran dihate bidîtin, ku Kadirên Partî û Kadirên Sovyêtan ji wan kesan bi xwe ve dahtin bipêkhatin, yên ku wan mêldarîya diservegirtina Sovyêtan di ser Partî re didan bikirin; jiber ku Sovyêtan bêtir didan biwênerîkirin. Belam hiştina deshilatîyan ji bona Civatên Sovyêtan dê wan ji bona Nenavînîtîyê û Jihevxistin Deshilatîya Navînîtîyê bida bibirin. Di dawîya dawî de "dê Gorîkirina Berjewendîya Dewletêyî Bilind Beramber bi Berjewendîya Cihî ve bihata bikirin". Di Kongirê Sêyemî Sovyêtan de Encumenek ji bona danîna Destûra Sovyêtî hate bipêkhatin. Di Kongirê Pêncemînî Civatên Sovyêtan de Kongire li ser Destûra Pêşîyî Dewleta Sovyêtî de di mêjûwa 10 tîrmeha Sal 1918 de pêhate birûniştin. Benda nehem bi divabûna "damezirandina Dewletek xurt ve" dide bigotin, "da ku ew Borcuwazîyê bi carekê ve bide binabûdkirin, çewisandina Merov di rêya Merov de bide bidawîkirin û Sosyalistîyê bide biavanîkirin, da ku çînî bêtin hilanîn û desthilatîya Dewletê bête bimirin". Magelo çawan divê ku ev Dewleta "Xurt" û "Katî" bide biserdarîkirin? Destûrê Desthilatiyên kêm ji bona nava destên Civatên Sovyêtan date bixistin, yên ku ew di nava tara Desthilatîya Navînîtîyê de dikarin pêbêtin birabûn. Herwehajî Desthilatîya Navînîtî jî di nava destên Parti de dihate bidîtin. Belam Partî bi xwe jî ve, mîna ku Lenin ew dabû binasîn û dabû bixwestin, bes û bi tenha ve ji Komekê Karsiyasîvanan dihate bipêkhatin.

Divê em piçekî li vêderê de li ser rola Leninîyî pêgîrî de di durustkirina mêjûwê de bêtin birawestandin. Ji bona wîna nala Merovekî û Rêberê Tevgerekê bi jîrîtî, hozanîya wêyî siratîcî û taktikî, kesperestîya wîyî bêsînor ji bona bicîanîna nimûneyên wîyî bilind, peyvdarîya wîyî jîrîtî, rastîya levenerandinên wî ji bona zînetan,

mêrxasî û liberkevtina wîna ji bona wergirtina biryara rast di dema pêwsit de ji bona birêvebirina cemaweran biserxistina şureşê tête bivegerandin. Cemawer bi dildarîyê ve têtin birêvexistin. dibe, ku bîr û bawerîya wan di nava rojekê û ya din de bêtin biveguhertin. Herwehajî Merov dikare wan bi sozan ve bide dilbijandîkirin û mêldarîyên wan bi destikên ragiyandinê ve bide biberkirin. Belam Lenin di liberkevtina hêvîyên Şureşvanan de hozan bû. Wî durujmên Partî datin bihelbijartin, da ku ew dildariya cemaweran ji bona dorhêla wan bide birakişandin.

berî rola Rêberên Siyasîvanan di çûna rûdanan de divê Merov rola Rêberên remanê ji Nivîsaran û Feylesufan di rexnegirtina civakê, likarxistina remanan û neqişkirina rêyê de bide biberzkirin. Na hêjîbêtir di pir caran jî de wê rolê di çûna rûdanan de divê Merov ji xwe re bide biwênekirin. Magelo rola Lenin bi pîvana beramberî rola Karl Marx û Friedrich Engels ve di neqişkirina rêyê de çî bû? Marx ligel hevalê xwe Engels de mîna Andazvanekî avanîkirinê di danîna avanîyê de bûn û Lenin li ser serê Partîya xwe de nala Serkarekî guruha karkeran bû, ya ku wê danîna li ser pel de ji bona ser avanîya erdê date biveguhertin.

Magelo çawan Merov dê bikaribe Danton û Robispir di Rêberiya Şûreşa Firensî de ji xwe re bêyî Montiskiyu, Voltêr û Can Cak Roso di afirandina remanên şûreşgêrî de bide biwênekirin?

Heger jî bête bigotin, ku civakê ew Nivîsarên hanê dane biafirandin, ez bi servajî vêna ve didim bixeberdan. Ango ku ew ligel dema xwe de û di nava civaka xwe de hatine bijîyandin. Wan date bihestkirin, bê ka çi ji bona civaka wan bi bed ve tête bidîtin û ew jî pê hatin biazarkirin. Jîritî û liberkevtina wan bi rexnegirtina zînetê ve ji wan re didate binîşandan û bi ber guhê wan ve didate bixistin, na hêjîbêtir ji wan didate bixwestin, ku ew daxwaza deha baştirbûnê bidin bikirin.

Divê em giringbûna dîwanxanên remanî di likarxistina Şûreşa Firensî de nedin bikêmkirin. Herwehajî divê em rola Partîyên Siyasî û ji giringtiriyên wan jî Partîya Lenin -û bi saya Lenin ve- di ajotina Şûreşa Oktober de nedin bijibîrkirin. Di pêla Padîşahîyî Firensî de di berî şûreşê de partîyên siyasî nedihatin bidîtin, mîna ku em niha di vê roja xwe de li ber wan de têtin bikevtin. Belam civat, dîwanxane,

holên cuda dihatin bidîtin, ku di nava wan de Mêr -û Jinên- remangîrî û wêje dihatin bicivandin, da ku ew li ser kar û barên civakê de ji hev re bidin biaxivtin. Wan bes û bi tenha xwe ve desteyekî helbijartîyî Zanevan ji Keç û Kurên dema xwe didane bipêkanîn. Ew nala bazinekî pêwendîyê di navbera Montiskiyu, Voltêr, Roso, -Ingilîzîyê Lok- û Peyên din de dihatin bidîtin, yên ku ji wan re hate bilihevrasthatin, ku ew şûreşê nala Danton, Robispir û Mirabeau-Mirabo bidin birêvebirin. Evê dawî Xanedan bû; belam ew ligel Gel de bû. Ew Peyvdarekî hozan bû û yê ku wî dayite bigotin: "Em li vêderê de li ser Vîna Milet de têtin bidîtin, derkevtina me bes û bi tenha ve dê li ser devê Riman de bête bidîtin"[1].

Beramber bi vê jî ve divê rola Partîya Komunist[2] ligel Lenin de -yanjî hêjî rastir li paş wî de- di çûna Şûreşa Sovyêtî de bête bidiyarkirin. Belam em dizanin, ku Rêberên Partî, Endamên wê û Dostên wê Kêmîyeke pir biçûk di nava civaka Rusî de dida biwênerîkirin. Belê ew Kêmîyeke biçûk bû, belam ew bi rêxistîbû û wê bi bawermendîtiya xwe ve dida bibawerkirin û wê bi Vîneke Polayî ve ji bona wan dida bikarkirin.

Dibe, ku li vêderê de kar û bar pir di nava Tevgerên Azadîxwazî Welatîyî pir de di nava pir welatên Kolonyalî de neyêtin bicudakirin. Belê Peyên remangîr û Rêberên siyasî li ser serên Partîyên bi rêxistî ve têtin bidîtin û li pişt wan de yanjî li dor û berên

[1]Ev peyvên ateşpijî wî di nava Parlemana Firensî de date bigotin û ew di encamê dawî de bi çirûska vêkevtina Şûreşê ve hatin bikirin. Xwezî di nava bajar û gundên Kurdistana me jî de ji bona mafeyê Merov, demokrasîyê, azadîyê û serxwebûnê Merovên ateşpijîn mina Mirabo bihatana bidîtin. Wê çaxê rast û durust ji tevaya dunyayê re serxwebûna Kurdistana meyî perest dê bihata bimujdekirin û dê buhuşta evsana Ereb di nava mejîyê serên me de bihata bihilanîn. Ev roja dubarekirina nuroja me bi neçari ve jiber merovanîya me dê bête bidîtin. Cuma

[2]Ji xwe re di vî warê hanê de bi dûr û dirêjî ve li ser Partîya Komunist û birêvebirina tevaya Dewleta Sovyêtî de: "History of the Communist Party of the Soviet Union" -mêjûwa Partîya Komunistî Sovyêtî, Forien Languages Publishing Hause, Moscow 1960, bi zimanê Ingilizî ve, 765 rûpelan de bidin bitemaşekirin. Cuma

wan de Cemawerên Gelêrîyî bînkêş têtin bidîtin. Heger nameya remanê rast bête bidîtin û di Rêberîya Partîyan jî jîrîtî û serpêhatî bêtin bidîtin, wê çaxê dê Milet bangê bide bibihîstin, ew dê xwe ji bona ser rêya xebatê bide biçengkirin û ew dê dijwarîyan li paş Rêberên xwe de bide bihilgirtin. Tevlivêjî de gava ku tête bigotin: ku "Miletek mîna yek Peyî ji bona xebata xwe hatiye birabûn", ev bi xwe ve bi wêneyekî nêzîktir ji wêjeya nimûnetî ve ji lirastîya civakî de tête biderkevtin. Belê bi rastî ve tête bidîtin, ku hinek ji bona poşandinê bi xamê ve yanjî bi çek ve xwe didin bipêşkeşkirin. Belê jî hinek têtin bidîtin, ku ew xwe di nava malên xwe de xwe di nava paxilên Pîrekên xwe de xwe didin biveşartin. Herwehajî hinek têtin bidîtin, ku ew nala Kurtêlxweran di Nokerîya Dujminên xwe de têtin bidîtin. -Pir ji Cezaîrvanan di Nokerîya Firensa de di dema Cenga Serxwebûna Cezaîrê de didane bikarkirin. Herwehajî pir ji Kurdên "Caş" di Kurdistana Iraqê de Nokerîya Besîyan û di Kurdistana jorî de Nokerîya Kolonyalîya Turkî didan bikarkirin-.

Derbarê li jor de, yê ku ew li ser Şureşa Oktober de hatîye bigotin, jê hîç nayête biderkevtin, ku ew devavêtinê ji bona cihê Marx û Engels mîna Feylesufan dide biderxistin, yên ku wan Rêstikek dane binigaşîkirin, ku têde tevaya mirovanîyê bi bextiyarî ve bête bijîyandin. Herwehajî pêrejî giranbûneke wanî mezin jî di rêvebirina Şûreşa Oktober de her û her dihate bidîtin. Belam daxistina Lenin ji endazîya Pûtan, da ku rastî di dûrbûna xwe de bête biderkevtin, bi karekî bê rev ve di bîna Mêjûvan de tête beneçarîkirin. Tevlivêjî de cudabûn di navbera Lenin û li Paşvanên wî de li ser "Text" de di navbera hozanîtîya taktîk û mêrkujîtiyê de tête biderkevtin.

Li paş mirina Lenin de der sala 1924 de Stalin serdarîkirin ji bona nava destên xwe date bixistin; jiber ku ew Sikretêrê Partîya Komunist bû. Wî bi nabûdkirina dujminên xwe ve ji gupgupên Partîyê date bidestpêkirin. Herwehajî wî bi "Duruskirina Sosyalistîye ve li Sovyêtê de" date bidestpêkirin. Wî namilkeyek di bin navnîşana "Metiryalîya Diyaliktîkî û Metiryalîya Mêjûyî" de date bibelavkirin. Ew bi kurtîyekê ve ji bona remanên Markisistîyê, nokirina wêna û bicîkirina "qanûna wêna" ve tête biderkevtin. Di vê namilka hanê de

hîç destkarî nedibû têde êtir bihata bikirin. Peyvên wîna bi "Dogma[1]" ve hatin bikirin, tê bigota, ku ew ji esmanan hatine bidakevtin. -Di gava ku Merov ligel Lenin de li ser wan remanan de dikarîbû bida biaxivtin û ew li gora wan zînetan de bi nermî ve dihate biderkevtin.

Stalin di namilka xwe de date bidubarekirin, ku Merovantî li gora qanûna dozandî de ji bal Marx-Markis de di nava pênç pêlên lidûhev de ji pêşkevtinê tête biderbaskirin: Komunistîya Kevnarî di nava gund û taxan de, -Benditî, -Rêstika Derebegîyê, -Rêstika Sermeyedarîyê, -Rêstika Sosyalistîyê. Herwehajî ku pêşkevtin her û her ber bi pê ve tête bikevtin û veger ber bi paş ve jê re nayête bidîtin. Ev hemû jî li gora "Qanûnmendiyên Aburîyî Zanistî de" têtin bikirin.

Derbarê Markisistîyê û Serpêhatîyên wênayî wirgirtî em dikarin van rûnkirinên tên bidin biderxistin:

- Remanên Sosyalistiyê -Civakîyê- û ji wan jî Markisîtî û Bizavên Sundikatîyî Karkerî, yên ku ew ji bal wan remanan de hatin bizayîn, ji bona başkirina jîyana Karkeran û mercên kar li welatên Sermeyadarî jî de kêreke mezin dane bikirin. Herwehajî wan remanan guhdan bi aliyê civakî ve di jîna Merov de dane bikirin. -Ev jî di warê girawkirina guhpêdana tendurustîyê, betalbûna piştî Kar, kêmkirina demjimarên karkirinê, bilindkirina kirîyên kar, nehiştina karkirina Zarokan, parastina Pîrekan di gava kar de, girawkirin pêwistîyên pîrbûnê û hd..têtin bidîtin-.

Belam "Sosyalistîya Zanistî" ew bi xwe jî ve bes û bi tenha ve bi dîtinekê ve di felsefa mêjûwê de tête biderkevtin û jê re cihek di mêjûwa remanên siyasî de mîna azadîxwazîyê û mîna wan jî dîtinan tête bidîtin. Lêbelê pesindana wêna bi "Zanistiyê" ve nala qanûnmendîyekê, ya ku jê re pêşkevtina civakên mirovanîyê têtin bizalkirin, li ser li rasta Mêjûyî de nayête bisuwarkirin û ne jî ew li ser zanebûna meyî niha de tête bilihevkirin, ya ku em li ser serpêhatîyên welatan de didin bizanîn, yên ku ew Sosyalistî bûn û yên ku wan li paş

[1]Dogma bi bawerîyeke sert ve bi bêbingehkirineke zanistî ve tête biderkevtin. Dogma bingehê ayînê dide bipêkanîn. Cuma

de mîna Yekitîya Sovyêtî û Deverên Ewropa Rojhilatî xwe ji ser dane bidagerandin. Wer bi rastî ve nayête biderkevtin, ku Kirdarê Metiryalîyî Aburî ew Kirdarê bi serê xwe ye, yê ku ew Hesta Merov dide bilivandin[1]. Çendan ji nifşan ji Mêr û Pîrekan, yên ku hîç pêwendîyeke wanî bi naskirî ve ligel berjewendîyên wanî çînîtî yanjî neferî de nedihate bidîtin, bi merdayetî ve can û malên xwe ji bona nimûneyên bilind dane bigorîkirin, da ku ew li ber welat û Miletê xwe, mal û Eşîra xwe de, ji bona bawermendîya xwe, ji bona ayînîya xwe yanjî ji bona avrûwa xwe û rêzanên sincîtîyê bide bidan. Belam aburî bi xwe ve qanûnmendî jê re nayêtin bidîtinn û ew bi xwe jî ve ji bil beran û hejandina pêve -mîna hêjabûna karê cuda beramber bi dolar ve; ya ku ew di navbera roj û şevekê de tête biveguhertin. Dibe, ku hoyê vê hejandina hanê jî dendanegê yanjî rûdaneke ji ber xwe ve be-, tu tiştekî din nade binasîn.

Herwehajî pêşkevtina mirovanîyê di nava pênç qonaxên li dûhevdû de di rêstikeke qeşeng de ev bi xwe jî ve bi rengegî nigaşiyî remanî ve tête biderkevtin. Pêşkevtinên civakan di nava deverên cudan de ne bi mîna hevdû ve têtin bidîtin û ew bi divabûn ve ne li gora wê rêk û pêkxistinê de hatine bikirin. Belê hin ji civakan di wê gavê de bi xwe jî ve hate bidîtin, ku wan her pênc rêstik yanjî hinên ji wan dane binaskirin: Hinek ji Komunistîya "Kevnar", mîna ku ew di nava mêrgên çêrandina gund û daristanan de têtin bidîtin, Hinek ji Bendîtîyê, Rengekî ji Derebegîyê û Destpêka Borcuwazîyî Sermeyedarî.

Dibe, ku kirdarê pêşvekevtina mirovanîyê di dozandinên vedîtinên teknolocî û di bicîanînên zanistîyê de têtê bidîtin. Rûdanên di cîhanê de ji nîvê sedsalê nozdehan de tanî vê rojê jî bi hoyên bicîanîn hunerî de ew bi xwe ve nala şûreşeke mezin têtê biderkevtin,

[1] Ji xwe re di vî warê pir giring de li ser livandina hesta Merov de di mêjûwê de li: Helmut Schmidt: "Menschen und Mächte" -Merov û Dewletên Hêzdar, Siedler Verlag, Berlin, sala 1987 de, di 474 rûpelan de bide bitemaşekirin. Di vê nivîsta pir giring de, ya ku ew ji bal yekekî ji gewretirîn Serekwezîrê Elmanî de li paş Bismark û Birand de hatiye binivîsandin, hesta milî bi bingehê livandina mêjûwê ve têtê bidanîn. Cuma

ya ku mirovanîyê mîna wêna berê nedabû bizanîn û ya ku hîç pêwendiyeke wê ligel qanûnên maldarîyê û destikên berkirinê de nedihate bidîtin. Lêbelê ev şûreşa hanê bi teknîkkirina destikên wêyî berkirinê ve dihate bigirêdan. Ji bona nimûne emê telifonê û kêra wêna li ser veguhertina jînê de bidin bianîn: Bi giringî ve tête bidîtin, ma dê ev destgeha hanê çi erk û karan bide bikirin û nema kes xwedîyê wê karxanê tête bidîtin, ya ku ew vî destgehî dide biçêkirin[1].

- Derbarê serpêhatîya welêt di pêla derbasbûna "Avanîkirina Sosyalistîyê" de li Rusya de û li paş jî de devjêbarda wêna jî hîc gûman tête nayête bidîtin, ku Endamên Partîya Kominîstîyî Leninî li paş gihandina Partîya wan ji bona serdarîkirinê ji Jin û Mêran nimûneyên bilind û bawerîyek xurt ji bona Avanîkirina Civaka Soyaslistîyê di warê çêkirinê û zanyarîya pêşvekevtî de didan bihilgirtin, ya ku wan di nava wê de zalbûna wekhevbûnê didan bixwestin.

Belam Rêstika Partîya bi serê xwe ve, ya ku wê "Diktatorîya Pirolitarîyê" dida biwênerîkirin, pir pê neçû, ku ew bi divabûn ve ji bona Diktatorîya Partîyatîyê ve hate biveguhertin. Herwehajî pêrejî Kadirên Partîya Komunist ji bona Birokratîya Serpereştîya Partîyatîyê hatin biveguhestin, yên ku wan Yekitîya Sovyêtê ji lûtkê de bi destekî hesinî ve li ser bingehê navînîyeke pirî xurt de didatin biserdarîkirin, -tevî ku ew jî bi nav jî ve Fêderalî bû-. Ev jî li ser bingehê vebêjî "Nawendîya Demokrasî" de dihate bidîtin. Ev bingehê hanê jî dide bidivakirin, ku Partî bes û bi tenha ve bi yek dengî ve û bi hev re ji jêrî û lûtke de dide biaxivtin. Ango ku ew bingehê hanê azadîya bîr û bawerîyê û şapên di nava Partî de bi xwe jî ve dide binabûdkirin. Evaya bi xwe jî ve dijî bingehê di pêla Lenin de dihate bidîtin. Bi rastî jî ve Stalin-Sitalin Partî bi xwe ve -ji bil Milet jî ve- li jêr Metirsîya Polîsên Partîyî Nehênî de date bidanîn. Wî Dujminên xwe, na hêjîbêtir wî her Kadirekî Partî, yê ku jê belkî hinekî hemberî bihata

[1]Di vî warê hanê de û bi taybetî ve li ser Sosyalistîya zanistî de bir û bawerîyên min û Ismet Şerîf Wanlî li binguhên hevdû de bi xurtî ve têtin bikevtin. Di hin deqan de em bi hevdû ve têtin bigihandin. Belam di piranîya wan de em ji hevdû têtin bicudakirin. Cuma

bipêşbînîkirin, datin bikuştin[1]. Li paş de wî dergehê Partî bi firehbûn ve ji bona Kûs û Kadirên Noker date bivekirin, yên ku wan jê re çepik didan bikutan û yên ku ew pêrejî jê dihatin bitirsandin. Wî ji bona wan pir diserhevgirtinên metiryalî û rûmetdarîyên cudan datin bidan. Ji van encaman bi neçarî ve lezbûn di pêşvekevtina Partî de hate bikirin. Evaya bi xwe jî ve ji destpêka pêla Leninî de hatibû "binivîsandin"; bes û bi tenha ve jî jiber ku Rêstika Partîya bi serê xwe ve hatibû bidanîn. Bi lez û bez ve "Nomenklatura" Birokratîya Partîyîtîyê hate biderkevtin û bigewrekirin, ya ku wê li ser kîsê Kargeran de di nava rijandina xweşîyê de didate bijîyandin û bi navê wan bi derew û boxtan ve wê dida biserdarîkirin. Ew bi jana nexweşîbûna genîbûnê û genîbûna remangirîyê ve hate bikevtin. Jiber ku Kadirên Partîya serdarîkirî bi jîrbûnên xweyî divayî ve nedihatin bixemilandin û herwehajî jiber serûştîya Serdarîkirina Navînî û bawermendiya wêna, -hegerjî bi derew jî ve bête bidîtin-, ku ew "pêşvekevtinê" û bextiyarîya Merov dide biwênerîkirin. Serdarîkirin ji bona "hêzeke zordarî" li ser gerdena Neşînvanan de hate bipêkirin û wê "saweke remanîyî" bê nimûnetî di mêjûwê de date bizalkirin, ku di bin zalbûna zordarîya wê de azadî û mafeyên neferî hatin bihilanîn. Herwehajî pêrejî berkirinên hunerî û wêjeyî jî ji bona pîstirîn binarê jêrbûnê hatin bijêrkirin; -ev jî bi hoyên zalbûna Birokratîya Partî ve li ser wan de hate bidîtin-. Wisajî pêrejî berkirina aburî û çêkirinê li ser kîsên çînîyên Kargerî û endazîya jîyana wan de hate biberjêrkirin; jiber ku Serdarîkirinê li ser berkirina çêkirina supahîyê giran de date bigivaştin, -da ku ew beramberî Impiryalîya Cîhanî bête birawestandin- û wê çêkirinên niyazmendîyên cihî di ser guhên xwe re date biavêtin. Ev jî pir caran jî li ser kêsên serûştîyê, pakbûna ba, erd û avê de dihate bikirin. Wer bi vî rengê hanê ve jehrên çêkirina kimyawî û hesteyî ji bona nava serûşîyê hatin bikevtin û hin ji deverên dewlemendî berê ji bona biyabanan hatin biveguhertin. -mîna ku ev di devera derya Aral, hin cihên pirî din û Elmanya Rojhilat de hatin bikirin û nexweşîyên giran di nava Tudeyên wan deveran de hatin bibelavkirin, mîna ku ev jî li deverên Ezerbêcanê de hatin bikirin-.

[1]Ji xwe re li nivîsta: Héléne Carrére d'Encausse: "Stalin: lórdre par la terreur" - Stalin: Rêstika Metirsîyê, Paris, sala 1979 de bidin bitemaşekirin. Ismet Şerif Wanlî

Jiber ku Rêstika Partîya Komunistîyî Navxwe Qupkujî bû, Sikretêrê Partîyî Giştî bi xwedanê welêtî bi serê xwe ve û bi "Bavê Milet" ve hate bikirin. Stalin bi "Bavê Milet" ve hate binavkirin û "Kesperestî" bi ayîndarîyeke nuh ve hate bikirin, ya ku ew bi xwedan perestî û reweştên ve mîna ayîndarîya Hitlerî û Mosolinî dihate bidîtin[1]. Ev reweşteke kirêt bû û ew ji bona remana mirovanîyê riswayî bû. Kesîtîya Stalin nehoyê vê derketina hanê bû. Wer jî "Bavên Miletan" di tevaya wan welatan de hatin biderkevtin, yên ku di nava wan de Partîyên Komunistî didan biserdarîkirin û ew li ser Serdarîkirinê de zal bûn, mîna ku ev li Romanya, Yogsilavya, Bulgaristan, Elmanya Rojhilat, Elbanya, Çîn, Korya Jorîn, Kuba û hinên din de dihate bidîtin. Herwehajî tanî piştî mirina Stalin jî reweştên kesperestîyê li Yekitîya Sovyêtê de dihatin bidomkirin, mîna ku ev di pêla Xuroşof de bi xwe ve jî û Birêjnef jî de dihate bidîtin. -Birêjnef gewdeyekî kêm jîr bû û ew bîr genî bû. Wî Meriv Merivatî û Dizîtî di nava Komarên cudan de date bigiştîkirin-. Ev Rêstika Qupkujîyî Zordarî rê bi "Régjm totalitaire" -Bi Rêstika Giştî- ve bi têgihiştina siyasî ve û ne bi têgihioştina diyaliktikî ve dide bidan.

Li ser vêna de hate biencamkirin, ku çînîyên Kargerî bi carekê ve xwe ji siyasetê dane bivegirtin û wan xwe ji bona vîna -Nomenklatura- -Birokratîya Serdarîkirî dane berdestkirin. Wan canê

[1]Belê mînabûneke mezin di nava Reweştperestên "Rêber" yanjî "Bavê Serdar" de di navbera Rusya Stalinî û Elmanya Nazî de tête bidîtin. Wer Wêneyên wan û li her cihekî de dihatin bibelavkirin. Pevdarîyên wan li ber "Berdevkan" de bi gotinên wanî şabaşî bi bextîyarîya Gel û mezinbûna welêt ve mîna hevdû dihatin bidîtin. Herwehajî pêrabûnên mîrîtî bi cejnên giştî ve û têde bi rêveçûna lek bi lekê supahîyî rêxistî ve ligel hildana bi sedan al û destgulan û lêdana,dahol û zurnan ve dihatin bidîtin, yên ku wan hesta cemawerên gelêrîyî sade didan bigurkirin. Herwehajî di navbera rêstika Komsomol û Gencên Hitlerî jî de mînahevbûnî dihate bidîtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Nazîtîyê ji vê serpêhatîya Stalinî sûd ji xwe re dayîte biwergirtin. Li vêderê jî de divê bête bigotin, ku Hitler li paş Stalin de ji bona ser serdarîkirinê hatîya bigihaştin. Belam wî xwe mîna Stalin di "Gerebûnê" de neda bikirin. Wî pûtên xwe mîna Stalin ji xwe re di her qadekê de, di her bajar û gundekî de nedan birakirin. -Stalin ji xwe re û herwehajî ji -Lenin- re pûtên xwe li her der û cî de datin bihildan-. Ismet Şerif Wanlî

jêhatbûnê û karkirinê dane biwindakirin. Ew bi canê turalîyê ve di berkirinê de û bêguhdan ji bona berjewndîya giştî hatin bisertewandin. Vanan date bihiştin, ku pirbûna vexwarina meyê bêtir bête bibelavkirin û hatîyên bi ser ve di rêya bazirganîyên bazarên reş de bêtin bipeydakirin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Stalin ji gewretirîn Ajdehak bû, ji yên ku mêjûwa mirovanîyê ew dabûn binaskirin. Hîç Kesekî ji Hitlerê Elmanya Nazî pêve di xwînrijandinê de mîna wî nehatîye bidîtin. Wî bi mehna avanîkirina werzeşên Serdarîyê ve nêzîka bîst milyon ji Cotkarên pir ji wan Rus bi "Çînîya Gulak" ve date binavkirin û herwehajî wî bi milyonan ji Tudeyên bajaran jî ji bona Sebîrya dane biawarîkirin. Wisajî wî bi hezaran ji Zanevanan û Merovên Sade ve bi mehna ku ew serê xwe ji bona rêzanên rêstikê yanjî bi mehna şêtbûnê ve nadin bitewandin, wî zanistîya -Psychiarie- Bijîşkîya Rewanî û maristanên wêría li ser wan de date bikaranîn, da ku ew bi derew û boxtanan ve bide bicîkirin, ku ew hêl û gêlin. Herwehajî wî ji bona Komarên Asya Navînî û hêlên dûrî Sêbîrya Milêtên bi carekê ve yanjî jimareke mezin ji wan bi darê ço ve dane bikoçkirin. Ji van Miletan jî Miletê Elman di herema çemê Vogla de, Çerkes û Kurd[1] di Kafkasya de, Tatar di Nîvgirava "Crimée" -Kirim de li ser derya Reş de têtin bidîtin. Herwehajî Stalin ligel Hitler de berî Cenga Cîhanîyê Duwem de peymanek -der sala 1939 de -Cuma- ji bona parvekirina Lehistan û kolekirina Miletê wê date bigirêdan.

Herwehajî Rêstikê date bikirin, ku Rus -û Miletên dinî Silavî

[1]Ji xwe re li wî derîyî de bidin bitemaşekirin, yê ku min ew li ser zîneta Kurd de li Yekîtiya Sovyêt de di nivîsta Ligelhevdû de bi zimanê Imgilîzî ve di bin navnîşana "The Kurd: Acontemporery Overview" - Kurd: Dîteneke Giştî li ser Zineta Niha de, dayite binivîsandin. Ew ji bal p. Kreyenbrock, S. Sperl de, li London, Niyoyork der sala 1992 de hatîye bibelavklirin. Ismet Şerif Wanlî

Herwehajî ji xwe re li Kandal de bi zimanê Elmanî ve "Die Kurden in der Sovyetunion" Kurd li Sovyête de, di nivîsta: "Kurdistan und die Kurden" Kurdistan û Kurd, Band 1, Gesellschaft für bedrohte Völker, Göttingen sala 1984 de, R. 413-426 bidin bitemaşekirin. Cuma

bi giştî ve- bi milyonan ji bona Komarên Miletên din di bin navê "Navnetewîtîya Pirolitarî" de bêtin bibarkirin. Evaya werjî li welatên Asya Navînî, welatên derya Paltik, heremên jorî Kafkasya de û ligel jî de ji bona Sêbîrya jî hate bikirin. Vê daţe bikirin, -ev bi xwe jî ve rengeke ji Kolonyalîyê û Impiryalîyê dide biderxistin, ku perçê Rusîyî Silavî nîşanên jimarekê ji Komarên milî bide biveguhertin. -Evaya di nava Kazaxistan de hate bikirin, ku serjimara Rusî bigir mîna serjimara Miletê Kazaxîyî Turkumanî yanjî piçekî jê kêmtir dihate biderkevtin-.

Li paş hilweşandina Rêstika Sovyatî de ew Rusên hanê, -serjimara wan nêzîka çil milyon têtin biderkevtin-, mîna kêmanîyên milîyî xurt û pir caran jî ne jêhezkirî di nava Komaran de û heremên Xwedmoxtarî de têtin bidîtin. Ji alîyê din de Stalin bi danîna sînorên hundurû ve di navbera wan Komaran û heremên Xwedmoxtarî de hate birabûn, bi rengekî ve ku ew di nava hevdû de têtin bidîtin, da ku ew her û her pevçûnanan di navbera wan milîyan de bide bidurustkirin. bi vî awayî ve gava ku Rêstika Sovyêtî hate biherifandin, ew pevçûnên hanê hatin biberzkirin û cengên milî di navbera Komarên Kafkasya de -li Erministanê, Ezerbêcanê, Gurcistanê, Komarên Xwedmoxtarî, Asya Navînî û cihên din de- hatin bivêkevtin. Li vêderê de pêwistî bi bîrxistinê ve nayête bikirin, ku milîbûnan xwe di nava hevdû de mîna Dîtina Markîsî nedan bihilandin. Her yekê ji wan li ser reweştên xwe, zimanên xwe û di pêşîya wan jî de milîya Rusî zalkirî xwe date biparastin. Hêjîbêtir li ser temaşegehê de milîbûnên nuh hatin biderkevtin, yên ku ew li jêr zordarîya Rusan de di pêla Qeyserî de dihatin bidîtin. ji van jî Netewê Okranî hate biderkevtin, yê ku wî serxwebûna xwe li paş herifandina Rêstikê de mîna Miletên Paltik, Kafkasî û Asyayî date bidazîn. Ew tevgerên milî hatin biderkevtin, gava ku Gorbaçov der sala 1985 de ji bona azadîyên remanî date bidestûrkirin.

Li Çîn de Partîya Komunist bi saya Yekitîya Cotkaran û kargeran di tevgera şûreşî de bi serdarîkirinê ve hate bigihaştin. Ev bi dijî hatinên di Dîtina Markisî û dubarekirinên de hate bikirin. Herwehajî têjî de "Diktatorîya Pirolitarya" mîna li Yekîtîya Sovyêtê de hate bidestpêkirin. berî çend salên kêm Partîya Komunistîyî Çînî

hêdî hêdî ji xistina Rêstika Sermeyedarî ji bona nava Welêt jiber hoyên aburî û berkirinê date bidestpêkirin.

Belam Rêberîya wî û Biyokratîya wîna hêjî siyasî û supahî li ser Welêt de li gora "Rêstika Partîya Biserêxwe" ve têtê bizalkirin û ew ji bona fetisandina azadîyên remanî, berkirina hunerî û wêjeyî dida bikarkirin. Bi bêtirbûn ve têtê bidîtin, ku xisitina berkirina sermeyedarîyê ji bona nava Çînê dê bêtir bête bikirin, gava ku Hong - Kong ji bona nava paxila wê bête bivegerandin; jiber ku Hong-Kong bi nimûnetîya "Sermeyadarîya Hov" ve bi têgihiştina Lêberalîyî bi serêxwe ve têtê bidîtin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku dê Zalbûna Partîya Komunistî Çînî li ser Dewlet û Civakê de wirde û wirde bête bihilanîn; - jiber ku bendîtîkirina remanê jî bi xwe jî ve şûreşê dide biafirandin. Hîç ji bona Kesekî jî nayête biveşartin, ku Partîya Komunistî Çînî ji bal çend Binemalên Kevnar ji Komunistan têtê bizalkirin, yên ku kmuonistîya wan mîna Pûtên Keviran têtin bidîtin. Ango ku ew bi Rêstikeke Oligarşî ve hatine biveguhertin.

Rêstika Sovyêtî Putên Stalin datin biherifandin û termê wî date bişewitandin. Partîya Komunistî Çînî jî hêdî hêdi wêne û Pûtên -Mau-jî datin bihilanîn. Belam hêjî Pût û wênên Lenin di nava Komarên Sovyêtiyî cudayî berê de di nava gorepanên giştî de, beramberî avanîyên Serdarîyê de û di nava baxên seyranên tevayî de têtin bidîtin. - Tê bêjê, ku ew "Hozanê Gund" de yanjî "Canbazê Eşîrê" ye-. Ev jî pêlekê dide bibîrxistin, ku têde Partîya Komunistîyî Sovyêtî ji Lenin nala durujmekî û Lêvegervanekî ji bona Miletan, Peyamberekî û Rêrastekî ji bona mirovanîyê date bikirin.

Lenin bi xwe jî ve ji wan Kesan nedihate bidîtin, ji yên ku wan ji bona kesperestiyê didan bibangkirin. Belam Lidûvanên wîna ji Bedkaran weha datin bidîtin, ku bi berzkirina Lenin ve ji bona cîhê Peyamberan ji bona wan bi kar ve têtê bidîtin, da ku ew serdarîkirina xwe bidin bihîmkirin û ev nala nîşanekê dihate biderkevtin, da ku dîtineke felsefî ji bona ayîneke zanistî bête biveguhertin.

Divê li vêderê de bête birûnkirin, ku kevtina Rêstikên Koministîyê di Yekitîya Sovyêtê û welatên din de ne ji "Çêkirina Impiryalîya Cîhanî" ango Rojavayî bû, belam ew kevtina hanê di nava hundur de jiber hoyên vekirina "Perda Hesîni" di nava demekê û

demekê de hate bikirin, ya ku ew li ser pêwendîyê diplomasî, yajî dîtinên zanistî û hunerî de dihatin bikirin. Vê rê ji bona Karnasan di pêşî de û ji bona Remangîran û li paş de herwehajî ji bona bawerîya giştî date bivekirin, ku ew di navbera paşvekevtina welatên Komunistî û pêşvekevtina welatên Rojavayî de di warên çêkirinê, teknolocya, mafeyên Merov û endazîya jînê de bidin biberamberkirin. Herwehajî hatina Gorbaçov û berdana azadiya bîr û bawerîyê û rexnegirtinê date bihiştin, ku Rêstik jiber xwe ve bête bihilweşandin.

- Li jorhatîyên li ser veguhestina Diktatorîya Pirolitarya ji bona Diktatorîya Partîyî Bedkarîyî Totalitarî -giştî ji bona zalbûna wêna li ser civakê de di bin Rêberîya Sikreterê Partî de nebes tenê ew li bal "Sosyalistîya Zanistî" de tête bidîtin, lêbelêjî ew di nava her Rêstikeke Siyasî de tête bidîtin, ya ku ew li ser bingehê Partîya bi serxwe ve di serdarîkirînê de û xwedan dîtinek yanjî êdyolocîyeke taybetî bi xwe ve tête birabûn. Ev yeka hanê ji bona diktatorîyeke wisa û peydabûn "Serdarekî Yekta" dide biajotin. Ew dest bi xebatê ve ji bona "Xweşîya Gel" yanjî ji bona "Rizgarîkirina wîna" yanjî ji bona "Mezinkirina wîna" dide bikirin. Ev xebata hanê bi wî û hevalbendên wî ve ji bona zeftkirina gerdena Zarwên Miletê xwe, talankirina azadîyên wan, yanjî palpêdana Miletên xwe bi canbazîya ragiyandinê ve ji bona windakirina mirovanîya wan dide bidawîkirin û ew wan di bin berzkirina alan û lêdanên dahol û zurnan de ji bona kar û barên leşkerîyî hovtî dide biajotin.

Di mêjûwa kevnar û niha de pir nimûne di vî warê hanê de têtin bidîtin. Bi navtirîn ji van nimûnan nimûna pêrabûna Hitler û Partîya Nazî li Elmanya de tête bidîtin, ya ku pê Hitler Miletê Elmanî di bin kêra Dîtina Regezperestîyî Germanî de ji bona vegurandinên Cenga Cîhanîyî Duwem û tawankarîyên wê datin biajotin. Herwehajî ji van nimûneyan jî Mosolînî û Partîya wîyî Faşî jî tête bidîtin, yê ku wî Italya ji bona Cengeke Kolonyalî di Afrika de û li paş jî de ji bona Cenga Cîhanîyî Duwem date biajotin. Elmanya û herwehajî Italya ji welatên pêşkevtî di warên çêkirinê û remanê de dihatin bidîtin.

Herwehajî nimûneyên pir bi rengekî din ve di nava welatên lipaşvekevtî de di warên aburî û remanî de û bi taybetî ve di nava Kolonyalîyan de têtin bidîtin, yên ew di Qonaxa Tevgera Welatî de

hêjî têtin biderbaskirin, mîna ku ev di Hişkatîya Afrika de, di nava hin ji Deverên Asya û Emerîka Latînî de têtin bidîtin. Di nava wan de Tevgerên Rizgarîyî Gelêrî hatin biderkevtin. Pir pê neçû, ku yekekê ji partîyên wanî têkoşer partîyên din dane binabûdkirin. Wisa "Partîya Yekane" di bin Rêberîya "Serdarê Yekane" de ji bona serdarîkirinê li paş rizgarî û serbestîkirinê de hate bigihaştin. Bi lez û pele ve partî û Serdarê wê serdarîkirina Diktatorîya xwe ji bona ser Miletê "Rizgarkirî" date biçesipandin. Wan ew ji rizgarîkirin û pêşvekevtina rastî dane bibêpişkûparkirin, yanjî wan malên xwe li ser kîsê wî de dane bitijekirin. -dibe, ku zînet bêtin biguhertin, belam bi gemkirina devên Milet ve û bi dizîkirina berên welêt herdu bi rengekî giştî ve bi du ber ve ji bona diyarîyeke Civakî têtê biderkevtin. Nimûne li ser vêna de û bi taybetî ve di nava welatên Ereb de pirin. Bi navtirîn ji wan ve nimûna ku Sedam pê têtê bigewderkirin û karên ku ew bi navê "Sosyalistiya Efleqîyi Basî" ve pê têtê birabûn.

Herwehajî pêrejî divê "Berê Rizgariya Cezairî" jî neyête bijibîrkirin. Li paş bidawîhatina Cenga Serxwebûnê de ji bona Partîyeke serdarîkirîyî bi tenha xwe ve hate biveguhertin. Gupgupên wêna dest bi gerandina li dûhevdû de û bi kuştina hevdû ve dane bidestpêkirin, da ku ew Serdarînkirinê ji bona nava destên xwe bidin bixistin û bidin biparastin. Weha Partîya Serdarîkirî ji bona Diktatorîya Supahîyî Biyokratî hate biveguhertin, ya ku ew li ser kîsê Milet de û bi navê "Sosyalistîya Erebîyî" pêşvekevtî ve dihate bijîyandin. aburîya Welêt hate bihilweşandin. Azadî hatin biwindakirin. Bertîl di Serpereştîyê de hatin bigeşkirin. Bêkarî di nava Çinîyên Gelêrî de û bi taybetî ve di nava Gencan de hate bitevayîkirin. Gava ku van Çinîyên hanê serên xwe datin biberzkirin, bi sedan ve Serdarîkirinê ji wan dane bikuştin. Herwehajî vê Serdarîya bedkar Miletê Berber û jê jî "El-Qebîl" ji mafeyên wîyî zimanî û zanyarî date bibêpişkûparkirin, yê ku ew berî musulmantiyê xwedîyê Cezair bû û zimanê wi jî ne Erebî ye. Herwehajî ew bi kesîtîya wîyî rewanî ve û hebûna wîyî milî ve nehate biperûniştin; tevî ku Berber Miletekî Musulman jî têtê bidîtin û ew ji pêşîyan bûn, yên ku ew dijî Kolonyalîya Firensî hatin birabûn[1].

[1]Weke niha bi bîra min ve têtê bikevtin, gava ku der salên pêncî û şêstî de Miletê Cezair ji bona rizgarkirin û serxwebûna xwe ji jêr serdarîkirina Kolonyalîya Firensî

Bibîrxistina van nimûneyên hanê ji Cîhana Erebî de bi hîç corekî ve Serdarîkirina Padîşahîyan û Mîrneşînîyên Erebîyî Neftî mîna Padîşahîya Suudî yanjî Mîrneşînîya Kuwêtî di ser wan re nayêtin bigirtin, yên ku ew hêjî di sedsalên navînî de tevî hin diyarîyên pêşkevtîyî tenik jî têtin bijîyandin.

---

dida bixebatkirin, bê ka çawan tevaya Netewê Kurdî perçekirî li seranserî Kurdistanê de bi dil û can ve pişgirtina wî dida bigirtin û azadî û rizgarîkirina xwe di serxwebûna Miletê Cezarî de dida bidîtin.

Baştirîn nimûne li ser vê de ji xwe re li: "Agirê Sinema Amûdê" de, M. Ahmedê Namî, Wêşanên Jîna Nû, Uppsala, sala 1987 de bidin bitemaşekirin.

Belê herwehajî wek nihajî bi bîra min jî ve têtê biderkevtin, bê ka çawan piştî serxwebûna Cezair li seranserî Ewropa û Derve de Wênerên wêyî Ereb; -jiber ku Berberên wê her û her ew ligel Birayên xweyî Kurd de dihatin bidîtin-, mîna Segên Efleqîyên har di hemû Civînên Welatî, Navnetewî û Dewletî de xwe ji bona hevka Kurdan û dijî daxwazên wanî rewa didan biavêtin. Pir caran Wênerên bêşerm û pir erzan hêrîşî xebata azadîxwazî Kurdistanê ji hemû Wênerên Erebên din bêtir didan bikirin.

Hêjîbêtir di 6 avdara sala 1975 de li bajarê Cezair de Abu Midyen Serokê Komara wê Sedam û Şahê Iranê bi hev ve dane bihembêzkirin û di nava wan de li ser kîsê rûxandina Şûreşa Kurd de Peymana Cezair di nava wan de date bigirêdan. Weha vî Zirkurê Ereb dida bibawerkirin, ku Kurd nema careke din serê xwe ji bona serxwebûna welatê xwe dê bidin biberzkirin û bihildan. Belam dem bi vê lihevhatina Cezair de der sala 1975 de bi cenga Iraqîyî Iranî ve der sala 22. 9. 1980 hate biavîskirin, ku ew hêjî bi zîyaneke bê hempa ve di seranserî mêjûwa Ereb de nehatîya bidawîkirin. Wê cenga Gendava Farîsî û dazanina Dewleta Fêderalîyî Kurdistanê bi neçarî ve date biencamkirin.

Belê ez li vêderê de naxwazim gotinê Şîrazî û Şehrezatîya Turkan piştî serdarîkirina bêtir ji pêncsed salî de li ser Ereban de bidim bigotin û bivegerandin; belam ez bes û bi tenha xwe ve gotinên Dêya xwe ji me re didim bivegerandin, ku wê timê ji me re dida bigotin: "Nan û Xuya Ereban, li ser Kabokên wan de têtin biditin". Miletekî wetov bêbext nikare bête biazadîkirin û nejî ew dikare bi rast û durustî ve bête bipêşvekevtin. Başitirîn nimûne ji me re destana Ereb di seranserî welatên wî de têtê bidîtin. Pêrejî ji me re bi xurtî ve ew di nava Iraqê de têtê bidîtin. Herwehajî destana Cezairî jî ji me re têtê bidîtin, ku ew dê bi neçarî ve bi perçebûna xwe ve di nava Ereb û Berberan de bête bidawîkirin.

Mîrê Xweşxuvanên Ereb Şewqî dibêje: "Milet ji ser ruwê vê zemîna hanê têtin biwindakirin, gava ku ew Sincîyên xwe ji navdestên xwe bidin b windakirin".

Herwehajî Karl Marx dibêje: "Miletêkî azad Miletekî din bi jêrdestên xwe ve nade bixistin". Cuma

- Lijorhatîyên li ser bisernekevtina biciânînên siyasî ji bona dîtina Markisîyî-Leninî de li Yekitîya Sovyêtî û Ewropa Rojhilat de,- nihajî li çîn de, sibeynê li Kuba, Viyetnamê û Korya Jorî de- bêgûman divê nede tevlihevkirin, ku remanên Sosyalistîyî bi hiş ve hêjî kêreke wanî diyar di guhpêdana rexên civakî de der jîna Merov û başkirina jîyana Kargeran de tête bidîtin, mîna ku ew li jor de hatîye bibîrxistin. Herwehajî divê jê neyête bibawermendîkirin, ku "Sermeyedarîya Azadîxwazîya bi serê xwe ve" ew bi çarevekirineke nimûnetî ve ji bona pirsên civakê tête bidîtin.- heGerjî ku civaka sermeyedarî jî pir jî ber bi dadwerîya civakî û xweşîtîya giştî ve beramber bi pêla Karl Marx ve hatîye biveguhertin. Ev jî hatîye bikirin; jiber ku hin ji Partîyên Sosyalistîyî li ser xwe de ji bona ser serdarîkirinê hatine bigihaştin; yanjî jiber ku hin ji Partiyên Borcuwazîyî Demokrasî bi xwe jî ve bi çakkirinên civakî ji bona berjewendîya çînîyên gelêrî ve û pêrejî ji bona berjewendîya giştî ve hatine birabûn; jiber ku hesta welatperwerîyê û mirovanîyê û karkirin ji bona berjewendîya giştî û yên din nebes tenê ew ji başbûnên siyasî û sincîyî Partîyên Sosyalistî ve têtin biderkevtin û nejî ew bes tenê bi "Malên" Partîyên Sosyalistî ve têtin biderkevtin, -mîna ku pir ji Sosyalistvanan vê didin bibawermendîkirin-. Nimûneyên pir di rabûna Partîyên Borcuwazîyî Demokrasî ji bona çakkirinên civakî ji bona berjewendîya Kargeran û Cotkaran têtin bidîtin, yên ku ew ji yên Partîyên Sosyalistî di hin dirêjbûnên biciânînên xwe de têtin bicudakirin. Na hêjîbêtir pir caran jî têtin bidîtin, ku çakkirinên Partîyên Borcuwazîyî Demokrasî jî di warê civakî de bêtir hûrtir bi kêrtir ve têtin biderkevtin, ji yên ku pê Partîyên Sosyalistî dikarin bidin bikirin. Ew bêtir di nava xwe de bi rengekî giştî ve pirsiyarîyên aburî didin bigirtin; - ku zînet jî di nava welatekî ji bona yê din têtin biveguhertin. Herwehajî başîkirina hêza kirîna çînîyên gelêrî ji bona bêtirkirina vekirînê ji bona berjewendîya pîşsazîyê û bazirganîyê dide bikirin. Di encam de ev ji bona bêtirkirina berkirinê de dide bikirin. Ev karê hanê jî bi xwe jî ve di aburîya sedsalên bîstan de bi sadetî ve tête biderkevtin.

Belam bêtirkirina komkirina sermeyedar di nava destên kêmtir de roj bi roj ve, mîna ku Marx û Engels ji xwe re di sedsalên

nozdehan de didan binigaşîkirin, ev nehate bicîhatin[1]; - jiber ku sermiyan bi cîhanî ve hatîye bikirin û jê re sînorên Dewletan nema dêtin bidîtin. Hemû çînî dikarin di kirîna navan de di Kompanîyên Bazirganî û Pêşîsazîyê de bêtin bibeşdarîkirin.

Siyaseta beşdarîkirina Wênerên Kargeran ligel Xwedankaran - yanjî hêjî rastir ligel Serpereştîvanên Kar û Kadirên bilind de di serpereştîkirina hevbeşîyên berkirinê de û di qazancên wêyî diravî de li gora rêxistinan de, yên ku ew ji bal qanûnê de têtin biparastin, ji dêlva mangirtan û xwepêşandanan têtin bikirin Di vê siyaseta hanê de hin ji bicîanînan têde bikirin, ku ew bi başî ve têtin bidîtin, da ku ew bêtir bêtin bitevayîkirin. Di jimarekê de ji welatên sermeyedarîyî pêşîsazîyî bi pêşvekevtî ve nobûna pevçûna çînî hate bisivikkirin û "Pevçûn" bi gift û goyê ve di navbera Sundikatên Kargeran û Sundikatên Xwedankaran de hate biveguhestin, mîna ku ev bi carekê ve li Siwêsra[2] de, tanî radeyekî jî li Elmanya de, tanî radeyekî kêm jî li

---

[1]Xwezî li vêderê de Ismet ji xwe re "Sermiyana" Karl Marx bi hemû bergên xwe ve bida bixwendin. Yanjî wî Karl Kautisky û Lenin di vî babetî jî de bide bixwendekarîkirin. Hêjî bêtir xwezî wî bi xişkayî û xweşkayî ve berî derxistina vê remana hanê ji xwe re li amara welatekî pêşvekevtî de, -ji bona nimûne-, li Elmanîya de derbarê parvekirina hatina milî de û pişka her malekê ji Endamên çînîyên civakî de di hatina milî de bida bitemaşekirin; ji ku ber ev tomarên amarên hanê tevaya rastîya qanûnmendîya parvekirina hatina milî li ser Endamên Ççnîyên civakî de û pişkên wan nebes tenê di sedsalên nozdehan de didin biderxistin, mîna ku ew Marx û Engels dane biderxistin, herwehajî pêrejî bi eşkere ve vê di sedsalên bîstan jî de didin biderxsitin. Em bivên yajî nevên, divê em di navbera bîr û bawerîyên Stalin û Lidûhatîyên wî de û bîr û bawerîyên Karl Marx û Engels de bidin bicudakirin, gava ku em bi dadwerî ve li mêjûwê de ji xwe re bixwazin bidin bitemaşekirin. Mîla navînîya dadgerîya civakê hergav di şeweyê parvekirina hatina milî de di çînîyên civakê de têtê bidîtin. Evaya tevaya Peymana cCvakî di nava civakê de dide biparastin. Cuma

[2]Siwêsrî van lihevhatinên giştî di navbera Sundikatên Karkeran û Sundikatên Xwedankaran bi "Lihevhatinên Aşîtîya Civakî" didin binavkirin. Ew bê mangirtin û bê xwepêşandan têtin bicîanîn û ew li gora niyazmendiyê de têtê binuhkirin. Endazîya jîyana Karkeran li Siwêsra de ji endazîya jîyana Karkerên din de di nava welatên pêşîsazîyî pêşvekevtîyî mayînî din de bilindtir têtê bidîtin. Tevlivêjî de hêjî di nava

Firensa de û tanî radeyekî kêmtir jî li Ingilistanê û li Dewletên Yekgirtîyî Emerîkî de tête bikirin. Tevlivêjî de ev dijbûnên civakî, yên ku ew hêjî têtin bidîtin, bi carekê ve ew bi "Şûreşa Pirolitarîyî Cîhanî" ve û ne jî bi şûreşa welatî ve dikarin bêtin biçarekirin, mîna ku dîtina Markisîtîyê ji xwe re ew dayite biwênekirin.

bi vê têgihiştina hanê ve Sosyalistîya Veçakkirinê, ya ku pê Proudhon -Pirodon û Lasalle -Lasal didan bibangkirin, ew bêtir di cihê xwe de dihate bidîtin û ew bêtir jî ji "Sosyalistîya Nigaşyîyî" Karl Marx nuhtir bû. Bi gotineke din ve "Sosyalistîya Zanistî" ew bi "Sosyalistîya Nigaşî" ve tête biderkevtin û ew bi gelekî ve ji Sosyalistîya St. Simon bi nigaşîtir ve tête biderkevtin[1].

Heger jî ku "Pevçûna Çînîtî" pir jî û nemaze jî di nava welatên pêşvekevtîyî pêşîsazî de hatîye bisivikkirin, hebûna çînîyan bi xwe ve bi rastîyeke civakî ve di nava hemû civakan de û di nava hemû pêlan de tête bidîtin; tevî ku "Pevçûna wêna" ji bona liberxistina mêjûwê nade bitêrkirin. Meger jî ku Mêjûvanên Firensî yên pêşîbûn, yên ku wan têgihiştina "Pevçûna Çînîtî" ji xwe re dabûn biderxistin, belam wan ew ji xwe re bi "Qanûnmendîyeke Zanistî" û Cîhanî ve mîna Markisitiyê nedan bidanîn.

Wer bi vê liberkevtina hanê jî ve Partîyên -Sosyalistîyî - Demokrasî- -mîna li Elmanya de- ew bi gelekî ve nuhtir ji Partîyên Sosyalistîyî Xweparastî têtin bidîtin, mîna ku ev li nik Partîya Sosyalistîya Firensî de dihate bidîtin, gava ku wê ligel Partîya Komunist de di sala 1981 de li paş helbijartina Serok Mitterand de serdarîkirin ji bona nava destên xwe date biwergirtin. Ew ji bona serdarîkirinê li ser bingehê bernameyeke Çepî de hate bigihaştin, ya ku wê pê "Xewin" ji bona Miletê Firensî didate bifiroştin û wê pê "jîn

civaka Siwêsrî de berên pir têtin bidîtin, ku ew pêwistî bi veçakkirinê ve têtin bidîtin. Ismet Şerif Wanlî

[1]Wer bi vî rengê hanê ve bi sadebûn, xişkayî û xweşkayê ve pîvandin bi servajîhevdû ve hatin bikirin. Sosyalistîya zanistîyî rastîyî Karl Marx bi Sosyalistîya nigaşiyî Prodon û Lasal ve hate biveguhrtin. Xwezî jî Ismet Şerîf Wanlî ev bawerîya hanê li vêderê de neda binivîsandin. Cuma

didate biveguhertin".

Der meha avdara sala 1993 de Partîya Sosyalistîyî Firensî di helbijartinê de pir bi pîsî ve hate bibezandin û wê bes û bi tenha ve 19 % ji dengan ji xwe re date bianîn. Tawîbûna diravîya Dewletê di pêla serdarîkirina wêna de her û her dihate bibêtirkirin, jimara Bêkaran ji kar hate ducarîkirin û bêewletî hate bibêtirkirin; jiber ku sînor beramberî Daxwazvanên kar ji Cîhana Sêyem hatin bivekirin û pêrejî bedbûna serpereştîkirina aburî hate bidîtin. Herwehajî biserdejî ve hin ji hetikandinên diravî hatin bidîtin.

Li Italya de hemû Partîyên Xweparastî û ji wan jî Partîya Sosyalistî hatin biherifandin; jiber ku pêwendîyên wan ligel "Maffia" - Mafya de dihate bidîtin û herwehajî pêrejî pêwendîya Partîya Sosyalistî bi rengekî taybetî ve ligel Mafya de dihate bidîtin.

Pir ji Partîyên Komunistîyî Xweparastî di Ewropa Rojava de dev ji dîtina Markisîtîyê dane biberdan. Hinekan ji wan jî navên xwe bi avêtina gotina "Komunstîyê" ve dane biveguhertin, -mîna ku Partîya Italî date bikirin-. Partîya Komunistîyî Firensî navê xwe date biparastin; belam wê dev ji dîtina "Diktatorîya Pirolîtarî" date biberdan. Karîna wêyî helbijartinê di nava bîst salên çûyînî cudan de ji heştdeh der sedî de ji bona deh der sedî de hate bixwarîn. Partîyên Komunist ne li Emerîka, Elmanya û Ingilistanê de bi têgihiştina siyasî û parlemanî ve têtin bidîtin; tevî ku jî azadîya remanî û karkirina siyasî jî ji bona her Merovekî têtin biditin, gava ku ew bixwaze bide bikarkirin[1].

[1]Di helbijartên Elmaya de der 12. çîriya pêşîn de der sala 1994 de Partîya PDS - Partîya Demokratî Sosyalistî- nêzîka 20 der sed ji dengên Hilbajartinvanên Elmanî di rojhilatî Elmanya de date bigirtin û ew niha bi sî Endamî ve di nava Perlemana Elmanîyî Fêderalî de tête biwênerkirin, tevî ku hemû şapên siyasîyî Elmanî dijî wê ji dil û can didan bikarkirin. Iro li Elmanya Fêderalî de reşikê vê Partîya hanê di nava serên Partîyên Borcuwazî de û li ber çavên wan de mîna Reşikê Komunistîyê di sedsalê nozdehan de tête bigerandin. Ev Reşîkê Dadgerîya Civakî dê gelekî serêşiyê û sergêjîyê ji bona Borcuwazîya gen û genî bide bipeydakirin. Dadgerîya Civakî dê hergav xwe bi neçarî ve di nava hemû civakên vê dunya me de bide biberzûbalakirin. Cuma

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku tengavîyek di tevaya welatên pêşvekevtî de di warên pêşesazîyê û civakîyê de ji bona hebûna Partîyên Markisî, rola wan û cihên wan tête bidîtin. Ew bêtir û bêtir hêzên perîbûnê didin biwênerîkirin. Ew nema dikarin ji bona ser hebûna xwe bidin biparastin, heger ku ew bi carekê ve dev ji xewnên "Şûreşa Pirolitarîyî" Cîhanî yanjî Welatî nedin biberdan. Herwehajî divê ew dev ji bawermendîya xweyî xav bidin biberdan, ya ku ew "Rastîya Zanistîyê" di pêşvexistina civakên mirovantîyê de ji xwe re bi pişk û par ve dide bidanîn.

Lenin li ser "Manîfêsta Partîya Komunist" de ji bal Marx û Engels dayite bigotin: "Ev nivîsta hanê bi eşkere û hozanbûneke mezin ve têgihiştina cîhana nuh dide xuyanîkirin. Ew metiryalîya bi hevgirtî ve dide bixuyanîkirin, ya ku ew qada jîna civakî bi ber xwe ve dide bixistin. Ew diyaliktîkî dide bixuyanikirin, ya ku ew zanistîya fireh û kûrî pêşveçûnê di nava xwe de dide bidîtin, ya ku ew dîtîna xebata çînî û rola şûreşîyî Pirolitarya di mêjûwa cîhanê de û di afirandina civaka nuh de, civaka komunistiyê de dide biderxistin".

Magelo ev ne bi gotinên hogeran ve têtin bidîtin, mîna ku ew di ayînên esmanî de têtin bigotin? Magelo civaka komunistîyê ne bi buhuşta jîyana dunya din ve li paş derd û azarên jîyana vê dunya me de têtin biderkevtin[1]? Magelo Karl Marx û Engels Peyamber bûn û Lenin jî Hogerê wan bû, yê ku wî ji bona ser milên xwe bicîanîna nameya wanî esmanî dabû bihilgirtin? Bi sêr ve têtin bidîtin, ku ev ayîna hanê li ser metiryalîyê û pevçûnê de têtin biavakirin. Ango ew li ser zikreşîya Mrov de ji bona Merov û xwîngermbûna kor têtin bidîtin û herwehajî ew li ser bawermendîtîyê de têtin birabûn, ku ew ji bil yên din bes û bi tenha ve rastîya bisrêxwe ve ji xwe re dide bimaldarîkirin.

[1]Di nava vê pirsa hanê de Ismet Şerif rast û durust tevaya cewhera reman, xewin û nigaşên Merovan di seranseri mêjûwa merovanyê de ji bona dadgerîya civakîyî bi carekê ve dide biderxistin. Vê remana dadgerîya civakîyî bi carekê ve tevaya ayinên serûştî û şehristanî, rêç û dubistanên felsefî di hemû heyam û pêlên mêjûyî de û li her der û cihî de di vê dunya me de tim didan bitengalkirin. Têgihiştina vê remanê ji bona Keç û Lawên Kurdistanê ji bona serxwebuna Kurdistanê û xweşbûna jîna civakî û pêşvekevtina wêna di her kat û zemanekî de pir bi giringî ve têtin bidîtin. Xwedan, ol, ayîn û reman tevde divên ji bona serxwebûna welêt, azadîya Merovan û xweşbûna jîna wanî civakî di dadweriyê de bêtin bidîtin. Cuma

Herwehajî ew dide bibawerkirin, ku bawermendîtîya wîna bi komunistîya pêlên ayindinî geşî ve ji bona wî mafe û erk têtin bidan, ku ew wan Kesên ji rêya rastiyê derkevtî bide binabûdkirin, ji yên ku ew pê nadin bibawerkirin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku hêjî ji bona Partîyên Sosyalistîyî Demokrasî di Ewropa de û ji bona avanîkirina ayinda wêna roleke giring tête bidîtin; hegerjî ew di serdarîkirinê de yanjî ew di derveyî wê jî de bêtin bidîtin; bi mercekî ve ku ew dev ji Otopîya - Nigaşîya Markisîtîyê û tatika gihandina serdarîkirinê û parastina wêna bi darêço v.. bidin biberdan û ew bi pirbûna partîyan û bingehê demokrasî ve di hevguhestinê de ji bona ser destê serdarîkirinê ligel Partîyên Borcuwazîyî Demokrasî de yanjî ligel wan jî de bi hev re ji bona serdarîkirinê li gora encamên helbijartinê de bêtin birûniştin. Hîç Merov nikare bes û bi tenha ve ji bona bêtirkirina pêşesazî bê nimûneyên bilind bête bijîyandin. Sosyalistîya -Civakîya Demokrasî ew êdyolocîya -remana biserêxwe ye, ya ku ew dikare nimûneyên bilind bide bipêşkeşkirin, ku Merov dikare ji bona wan bête binêzîkîkirin; -belam bêyî ku Merov bikaribe ji bona wan bête bigihaştin-. Ev jî bi dadwerîya civakî, rêzlêgirtina ji bona mafeyên Merov û azadîya remankirinê û piştgirtina Miletên jêrdest ve, yên ku ew hêjî ji mafeyê çarenûsa xwe bê pişk û par têtin biderkevtin, têtin bigirêdan.

Metirsîya nigaşîyê di karê siyasî de di civaka pêşesazî de û herwehajî di civaka li paş pêşîsazî jî de têtê bidîtin, ku Bangkirvanên wêna xwe ji civakê didin bidûrkirin û ew ji bona binê rêtundbûnê û şêtbûnê têtin bikevtin. Ew nala serdarîyekê yanjî gemareke mêjûyî di nava çavên civakê de yanjî ew nala taqimekî perîyî serberdayî, -gerjî ku ew ne nala çeteyan bêtin biderkevtin, yên ku ew bi mêrkujîyî ve têtin birabûn[1], têtin biderkevtin.

- Rêstikên, yên ku wan cihê Rêstika Komunistîyê di Rusya û Welatên Sosyalistîyî berê de ji xwe re dane biwergirtin, bi hemû cudabûnên xwe ve ew bi gelekî ve ji wan rêstikan bedtir têtin bidîtinn, ji yên ku

---

[1]Ji van jî Koma "Die Fraktion der roten Armee" -Berê Leşkerê Sor li Elmanya de û Koma "Brigadé Rossû" -tîpên Sor li Italya de têtin bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

wan welatan bi yekcarî ve ji xwe re dabûn bidîtin. Berkirina pîşesazî bi hoyê hor û hera, dizîyê û kevinbûna amrazan ve hate bihilweşandin. Piranîya Kadirên Komunistîyî berê amrazên berkirinê ji bona kîsê xwe dane bimaldarîkirin. "Rêstika Sermeyedarîyî Hovîtî"[1] hate biderkevtin, ya ku Ewropa Rojava der nîvê sedsalê nozdehan dida binaskirin. Buhabûn di ser hev re ber bi roj ve dihatin biwergerandin, Girawkirên civakî bi serhev ve hatin birakişandin, yên ku ew ji bal Rêstika Sosyalistî ji bona tevaya Tude hatibûn bipeydakirin. Ev bi taybetî ve beramber bi Pîrkarvan ve tête biderkevtin, yên ku ew di perîşantirîn rewşê de têtin bijîyandin. Herwehajî hêjabûnên sincî jî hatin bihilweşandin û li şûna wan de perstîya dolar hate bidanîn. Her tiştekî xavî tenîkî ji "Nimûneya Emerîkî" bi koranî ve hate biawakirin. -Pêrejî ya ku jê re "Fast Food" tête bigotin, ew jî hate biawakirin. Wisajî rengekî ji Ingilistana xavî bi kelk ve tête bikaranîn, ya ku em noke wê didin bidîtin, ku ew hêdî hêdî di nava piranîya wan welatan de li ser kîsê ziman û zanyarîyên wan de tête bizalkirin. Ligel wan welatan de peymanên bazirganîyê di bazara jinan de, di firotina dermanên jiserxweçûnê û çekan de têtin bigirêdan. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku ev danê hanê bi danekî veguhestinêyî dijwar ve tête biderkevtin. Em nizanin, magelo dê ji kilandina wîna çi bête biserkevtin?

- Di nava welatên aburîyî paşvekevtî de, ango cîhana sêyem û bi taybetî ve di devera Rojhilata nêzîk û navînî de, -mîna ku ew li jor de hatîye bigotin, bi rê ve çûna mêjûwê hatîye bicudakirin û têde hişitî û rewanî beramber bi Rojava ve bi giştî ve têde bicudakirin-, ji alîkî de têde lawazîya Çînîya Pirolitarîyî Kargerî tête bidîtin û ji rexekî din de têde hebûna Bawermendîyên Servajîyî yanjî Berberî têtin bidîtin. - Mîna bizavên milî, rizgarîkirinê, -ji wan jî bizava Felestînî, Kurdî,

[1]Ev Rêstika Sermeyedarîyê di pêla Şûreşa Pîşesazîyê de di sedsalê heştdehan de li Ingilistanê de jiber hovîtî û dirbûna wêna di nava mêjûwa aburî de di bin nav û nîşana "Sermeyedarîya Manşêtir" de hate binavkirin. Merov têde nala duvikê mekinê dihatin biderkevtin. Cuma

Baskî, Turkî, Farisî û Erebî yajî Surî, Misrî û yên din- û bizavên ayînîyî-siyasî -nala Birayên Musulman û bizava "Welayet El-Feqih" di Iranê de- têtin bidîtin-. Ev hemû bi hev re dikin bikirin, ku berekî teng ji bona katbûna reman û Bizavên Pirolitarîyî Markisî didin bihiştin, ku ew bikaribin ji xwe re ji bona gihaştina serdarîkirinê gerjî li paş demekê jî de bidin bihêvîkirin. Ev berê hanê bêtir hate bitengkirin û karîna gihandina ji bona ser serdarîkirinê li paş rûxandina Rêstikên Komunistîyê de li Rusya û Ewropa Rojhilat de bêtir hate bikêmkirin. Em noke li deverê de bes û bi tenha ve Partîyên Komunistîyî Bicûk ji xwe re didin bidîtin, yên ku ew di nava xwe de ji bona çend destên Pevçûnvan bi hev re bê giranbûneke siyasî û bi perî ve hatine bipertpertkirin, -mîna ku ev li Turkiyê, Iranê û Cihana Erebî bi xwe jî ve têtin bidîtin-. Hêjî hin ji wan Stalînî têtin bidîtin. Hin jî ji wan hêjî Çînî -li ser rêça Maw de- têtin bidîtin, yên ku ew bi "Şûreşa Cîhanî" ve didin bibawermendîkirin. Hin jî ji wan hêjî Tirotiskî têtin bidîtin, yên ku ew bi "Şûreşa Hergavî" ve didin bixewinkirin. Hin ji wan jî hêjî têtin bidîtin, yên ku ew li dû Borcuwazîyên Serdarîkirî -mîna li Turkîyê de- têtin bicûyîn yanjî ew ji bona Serberdayetiyê -mina li Turkiyê jî de- têtin bişemitandin. Herwehajî ji wan hinekî dinî hejhejokî jî têtin bidîtin, yên ku wan rêya xwe -mîna Partîya Komunistî Iraqî, ya ku ew berî çend dehsalan xwedan giranî bû-; dane biwindakirin.

Em niha di nava tevgera rizgarîxwazî Kurdî de -nemaze di Kurdistana Turkî de- û Felestînî de berên cuda didin bidîtin. Hin ji wan hêjî bi "Şureşa Pirolitarîyî Cîhanî" ve didin bigotin. Belam ev Partî û Komên hanê ew bi tevgerên Markisî ve bi têgihiştina xweyî kokî de nayêtin biderkevtin. Lêbelê ew bi "Qertbûn" ve têtin biderkevtin, bi têgihiştina ku ew hemû bi yekcarî ve di pêşîya pêşî de ji bona rizgarîkirina welatîyî -Kurdî û Felestînî- didin bikarkirin. Herwehajî pêrejî ew ji bona veçakkirinên civakî ji bona berjewendîyên çînîyên gelêrî didin biarmanckirin. Ev bi xwe jî ve bi tiştekî başî ve têtin bidîtin. Bivê yanjî nevê divê ev karê hanê bête bikirin.

Hebûna hin ji Kadirên Markisî di nava wan herdu tevgeran de ji nîşanên wanî bingehî ji bona rizgarîkirina welatî nade bikêmkirin. Belê dibe, hebûna wan di nava wan tevgeran de bi rastî ve têtin bidîtin. Ji rexekî din de Kadirên, yên ku ew hêjî bi remankirina Markisî ve di

nava tevgera Kurdî yanjî Felestinî de têtin bidîtin, bi pêwistî hinekî ji demê ve têtin vukirin, da ku ew li ber rûdanên Ewropa Rojhilat de bêtin biliberkevtin û da ku ew di cîhana nuh de bêtin bigihaştin. Mêjû bi lez û bezeke sersurayî ve têtê biderbaskirin.

Nîşanên cuda didin biderxistin, ku belê Partîyên Kurdistanîyî Welatperwer bi berên xweyî cudan ve di cîhana nuh de têtin bitêgihaştin û ew bi rengekî giştî ve ligel serdema xwe de têtin bijîyandin. Di nava van Partîyan de Partîya Karkerên Kurdistan PKK jî têtê bidîtin, ya ku wê şûreşa welatperwerîyê di nava Kurdistana jorîn de dayite bilidarxistin û wê ji bona vê şûreşa hanê dûrbûneke cîhanîyî bê nimûne di mêjûwa tevgera Kurdîyî nuh de dayite bidan.

Mexabin, ku Partîyên Kurdistanî tanî noke jî nikarîbûn berekî neştîmanî di nava xwe de bidin bipeydakirin. Nejî wan dikarîbûn xebata xwe bidin biyekkirin, yanjî bi kêmanî ve hevkarîyê û şêwirdarîyê ligel hevdû de bidin bikirin.

Wer têtê buderkevtin, Ku Berê Neştimanîyî Kurdistana Iraqê li dû sîyaseta Emerikî de têtê biçûyîn. Emerika jî hêjî piştgirtina Turkiyê di cenga wêyî kolonyalî de dijî Miletê Kurd dide bigirtin. Van dijbûnên hanê ji bona lihevdanên pir dilşekestî datin bikirin, yên ku ew der payiza sala 1992 de hatin bibikirin[1]. Belam di ayinde de divê Merov bi her buhayekî ve xwe ji wan lihevdanan bide bivegirtin. Vegereke minî din ji bona ser van danavan di lêkolandinên din de têtê bidîtin.

Di Rojhilata Nêzîk de û bi taybetî ve di nava Turkyê de bi hezran ji Xortên Kurd û Turkan têtin bidîtin, ji yên ku ew hêjî xwe bi "Sosyalistîya Zanistî" ve didin bibestandin. Ew xewnan didin bidîtin, nahêjî bêtir ew ji bona "Şûreşa Pirolitarîya Cîhanî", ji bona "Civaka Komunistî" û ayinda wêyî geşkirî didin bikarkirin.

Remanên min di vê nivîsta hanê de di nava van dêr û rêzan de ji bona wan Xortan têtê biraserkirin; jiber ku ew dê bi hêsanî ve

[1]Divê li vêderê de careke din ji nûve ji bona Xwendevanan bête bidubarekirin, ku bîr û bawerîyên min û Ismet Şerîf Wanlî derbarê Lênerînên li ser Kurdistana jêrîn û jorîn de û herwehajî pêrejî derbarê PKK û Markisistîyê de li bin guhênhevdû de bi xurtî û dijatî ve têtin bikevtin. Cuma

rûnkirinên rexnegîrî ji xwe re bidin biwergirtin, ji yên ku min ew derbarê Markisîyê-Leninyê û kevtina biciânînên wênayî siyasî de dane bianîn, nala ku ew li Sovyêtê de hatine birûdan, yên ku wan nimûneyên bilind dane binabûdkirin, mîna yên ku wan ji xwe re didan bihilgirtin. Pir bi giringî ve tête bidîtin, ku ew bikaribin di navbera Markisîtîyê-Leninîtîyê de û di navbera nimûneyên bilind de mîna dadgerîyê, wekhevbûnê û divabûna xebatê ji bona rizgarîkirin û pêşvexistina Milet bidin bicudakirin; jiber ku evanan nimûneyên sincîyî bi serê xwe ne û bêyî wan jîn bê armanc tête bidîtin. Markisitî-Leninitî bi serê xwe ve jî ew jî nala dîtinekê tête bidîtin û Merov dikare lê bide birexnekirin û serpêhatiyê jî nerastîya wê bide biderxistin.

Pir bi rebenî ve temaşeya bi milyonan ji Rusan, Okranîyan, Polonîyan, Romanîyan, Bulgarîyan, Kafkasîyan û hemû Miletên din têtin bidîtin ji yên ku ew di nava dujeha "Serpêhatîya Markisîtîyê-Leninitîya" Totalirîtî de hatine bijîyandin. Wan bawermendîya xwe bi her tiştekî ve dane biwindakirin û wan ji xwe re perestîya Marx - Marks, Lenin û Stalin bi dolar ve dane biveguhertin. Destana van milyonan di serpêhatiya Sovyêtî de tête bidîtin, ku wan, -hegerjî ji bona demekê jî be; hêjabunên xweyî sincî ji nava destên xwe dane biwindakirin, ji yên ku ew di nava civakên wanî milî û mayînên xiznên wanî mêjûyî de dihatin bidîtin.

Debara em Kurd li ser nimûneyên xweyî bilindî sincî de bidin biparastin. Debera em nimûneyên xweyî bilind ji rasta civaka Kurdî û mêjûwa wî bidin biwergirtin, da ku em bi rewana xurtî pêwist ve ji bona birêvebrina xebatê ji bona Kurdistanê û azadîkirina Miletê Kurd û pêşvexistina wîna nala Miletên din xwe bidin biçekdarîkirin[1].

---

[1]Ez didim bibawerkirin, ku lênereke weha sade û xav li mêjûwa bawermendîyên Markisitiyê-Leninistî de di nava xebata kurdistanê de ji bona serxwebûnê, rizgarîkirinê û geşbûna civakî pir bi ne rastî ve têtin biderkevtin. Wan kêreke mezin û giran di nava xebata meyî milî de datin bihiştin. Ji bona nimûne wan Çarekirina Pirsiyarîya Welatiyî Kurd di Çarekirina pirsiyarîya civakî û milî de datin bidîtin. Hîç gûman têde nayête biderkevtin, ku evaya bingehê xebata Serxwebûna Kurdistanê û pêşvekevtina wêna tête bidîtin.

Ez hêvîdarim, ku dê ezê rojekê bikaribim bi dûr û dirêjî ve li ser kêra van remanên Markisî-Leninî de di xebata serxwebûna Kurdistanê de ne nala remaneke Ayînîyî Rawestyayî Genî, mîna ku Ismet wê ji xwe re dide biwênekirin, lêbelê mîna

- Vî perçê hanê di lêkolandina ser Sosyalistîyê, Markisistîyê û Bicîanînên wêna û Hêjakirinên wêna de ez ber bi lênerîneke giştî ve ji bona zînetên Rojhilata Navînî de datim birakişandin. Dibe, ku ez ji ser danavê hatim biderkevtin, yanjî min tirazûwa lêkolandî date bitêkdan. Mebesta min di darêjtina "Dibustanên Mêjûyî" de û şêweyê wan de bi bêyî di serguhan re avêtina remanên wan dihate bidîtin. Ev herdu berên hanê di nava hevdû de têtin bikevtin û ew ji hevdû nayêtin bicudakirin. Debera em careke din bi kurtî ve ji bona ser çawabûna nivîsandina mêjûwê û mêldarîyên wêna di bin kêra felsefa Markisî de bêtin bivegerandin:

- Mêjûvanên Markisî -û Sosyalistî bi giştî ve- bi xwendekarîyên civakî ve di mêjûwa mirovanyê de guh pê dane bidan. Bi taybetî ve wan derbarê zînetên Çînîyên Rencî ve û ji wan jî jîna Karkeran û Tevgerên Sundikatî, Mangirtin, Xwepêşandan û Şûreşên Gelêrî Cotkarî guh pê datin bidan. -Ew bi danavên bingehî ve têtin bidîtin û kêm bi wan ve ji bal "Dibustana Başîtîyî" ve guh dihate bidan.

- Mêjûvanên Markisî ji yên pêşîn bûn, ji yên ku wan der payîna sedsalê çûyî û destpêka sedsalê bîstan de guh bi mêjûwa aburî ve datin bidan. Wan ew bi kûrbûn û hûrbûn ve datin bixwendekarîkirin, nemaze wan ev derbarê

---

remaneke zindîyî livandî û hêjîbêtir vejandî ji bona demeke nîşankirî ji bona dagirtina bi hezaran sedhezaran ve ji Keç û Xortên Welatperwerên Perestên Kurdistanê di gorepana xebata serxwebûna Kurdistanê de bidim binivîsandin. Ez li vê remana hanê de bes û bi tenha ve di veguhertin û li gorakirina wêna de ji bona pêwistî, pêşvexistina civakê, xweşbûn, geşbûn û azadîya Merov têtim biliberkevtin. Ew bes bi tenha ve mebest têtе biditin, belam serxwebûna kurdistana perest bi armanc ve têtе bidîtin.

Magelo piranîya pir ji partîyên sosyalistî di ewropa de ne ji koka xweyî Markisî hatine biderkevtin û ew bi derbasbûna demê ré wer niha têtin bidîtin? Cuma

Berkirinê, Emraz, Teknîk, Pêwendîyên wê û Tengavîyên Aburîyî "liduhevhatî" di Sermeyedarîyê de datin bikirin. Vêna date bikirin, ku Berên Zanîstgehan û Akadimîyên taybetî di "Mêjûwa Zanyarîyî Metiryalî" de di hin welatên Sosyalistî de mîna li Rusya de bêtin bidurustkirin. Dibustanên Mêjûyîyî din û bi taybetî ve di nava welatên azadîxwaz de di vî warî de ji bona ser rêya Markisistan bi guhdana vî berê hanê ve hatin biçûyîn. Wisa mêjûwa aburî bi berekî bingehî ve jiberên zanistîya mêjûyî hate bikirin.

- Mêjûvanên Markisî nema guh ji bona mêjûwa Dewletan,cengan, mêjûwa diplomasî û supahî, mêjûwa qanûnê, mêjûwa oldaran, mêjûwa wêjeyan û mêjûwa hunerên sipehîbûnê datin bidan, -tevî ku ev jî hemû berên bingehî di zanistîya mêjûyîyî reweştî de têtin bidîtin.

- Mêjûvanên Markisî nema guh bi berê zanistîya mejûyîyî taybetî ve bi jîna Peyên gewre û Neferan ve bi rengekî giştî ve - ji bil jîna Feylesufên Markisî û hin ji Rêberên wê pê ve-datin bidan. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku ev kêmanîya hanê jî hate biderkevtin; jiber ku Markisîtîyê didate bidubarekirin, ku jîna miletan û civakan di pêşkevtina xwe de ji bal "Qanûnmendîyên Matiryalîyî Mêjûyî" û Pêwendîyên Berkirinê de têtê bizalkirin û hîç vîna Merovan û kirdarên din di nava jîna miletan û civakan de di pêşvexistina wan de nadin pêwendîkirin. Evaya bi -de'terminisme historique, Historische Ausschlagebend- - Danîna Mêjûyî ve têtê binavkirin. Merov dikare wê bi "Neçarbûna Xêza Pêşvekevtina

Merovanyê" ve bide binavkirin. Evaya Merov bi Qeda û Qeder ve di Musulmantiyê de dide bibîrxistin, -ya ku ew bi vê têgihiştinê ve tête biliberkevtin, ku her tişt jiberê de li ser textikê anîya Merov de "hatîye binivîsandin". Belam Nivîsvanên Markisî li paş Marx -Marks de dane bixwestin, ku ew vê dîtina hanê di vî warê hanê de bidin bibaşkirin, na hêjîbêtir bigir wan date bixwestin, ku ew dev ji dana rola pêşî ji bona kirdarê metiryalî -aburî- bidin biberdan. Ji rexê din de li gora Rêstika Sovyêtî -û Rêstikên din, yên ku ew nala wî hatin bicihanîn-, jîna Merov û remanên wî divên ew ji bona jîna civakê û berjewendîyên giştî bêtin bizalkirin û hîç giringbûneke ji bona Ten Merov beramber bi berjewendîyên civakê ve, -ango Dewletê û Dewlet jî ew Partî ye-, nayête bidîtin. Weha berpirsiyarê remanê -êdyolocî- di Biroya Siyasîyî Sovyatî de, -mîna ku Sousolov - Sosolov di navbera çend dehan sal de, roleke mezin dida biyarîkirin, bê ka çi baş û nebaş bû û bê ka çawan divabû ku Nefer di civakê de bidin reftarîkirin. Di vê de riswakirina remana Merov û azadîya Merov tête bikirin. Magelo milyonên ji Neferan ji Kargeran û Zanevanan, ji yên ku ji wan milet tête bipêkhatin, ji zimanbestan têtin biderkevtin? Çima divê li ser wan de ku ew di jîna xwe de bidin bireftarkirin, mîna ku Karmendê Partî dide bigotin?

Belavkirina li ser jîna Merovan de di nava Welatên Sosyalistî de wan "Perwerdekirina" cemaweran û dana bi rengekî giştî ve wê ji bona "Berjewendîya Cîhana Sosyalistî" dida biarmanckirin. Ango wê metiryalistîya mêjûyî dida bicîanîn. Bi vî rengî ve wê nokerîya Dewletê dida bikirin. Vê jî nivîsandina mêjûwa şûreşa Firensî di dema bûyîn û li paş wê de ji bona me dide bibîrxistin, da ku ew remanên

Komarîyê û zanistîyê bide birêkûpêkxistin; -Tevî cudanbûnan jî di navbera li dû hatinên Şûreşa Firensî û Şûreşa Oktober de têtin bidîtin. Şûreşa Firensî bi mafeyên Merovan, mafeyê Neferan, Koman û Neşînvanan ve date bianîn. Şûreşa Oktober Dewletek date bianîn, ya ku ew ji bal Partîyeke bi serê xwe ve, Partîya Komunistî Leninî ji serî ta pê dihate bizalkirin. Merovê Nefer têde biva yanjî neva ew ji bona nokerîya Dewletê û Partîyê dihate bikirin. Herwehajî pêrejî Mêjûvanên Şûreşa Firensî azad bûn. Wan li gora bext, zanebûn, bawermendî û romantîkî -sipehîkirina xweyî xurt didan binivîsandin. Em vê romantîkîya -sipehîkirina hanê bi xwe jî ve li nik nivîsandina Mêjûvanên pêşîyî Şûreşa Oktober jî didin bidîtin. Belam pir pê neçû, tanî ku Mêjûvan ji bona "Mamostên Karmend" di nokerîya Dewletê û Partî de hatin biveguhertin. Belê bi rastî jî ve jimareke mezin ji Mêjûvanên gewre di pêla Sovyêtî jî de li şûn xwe de lêkolandinên zanistîyî pir helbijartî di warê mêjûwê û warên zanistîyî din de dane bihiştin. Tevlivêjî de Xwendevan dide bihestkirin, ku Mêjûvanên Markisî -yan jî ji wan Mêjûvanên Sovyêtî, yên ku li ser wan de bibîrxistina Markisistîyê-Leninîstîyê hatiyê bineçarîkirin- bi giştî ve wan ji têgihiştina mêjûyî li ser bingehê mêjûwa metiryalî di pêşî de di nava serên wan de didan bidestpêkirin. Wan dixwestin, ku ew rûdanên civakîyî mêjûyî di pêşî de li ser wê têgihiştina hanê bidin biliberxistin, ji dêlva ku ew wan rûdanan bidin biderxistin û bi azadî ve ew li wan de bidin bilêvenerandin. Bi gotinek din ve "Dîtin" di nava sewdayên wan de li pêş rûdanan de dihate bidîtin; di dema ku divê dîtin yanjî dîtinan ji temaşekirina rûdanên mêjûyî bête yanjî bêtin biderxistin; mîna ku ew heye yanjî ew hene û bi azadî ve divê bêtin biderkirin. Herwehajî Xwendevanê bêlayî dide bihestkirin, ku hinên ji Mêjvûanên Sovyêtî li paş temaşekirina rûdanên mêjûyî civakî de dihatin bineçarîkirin, ku ew wan rudanan bi perdeyekê ji metiryalîya mêjûyî ve bidin bipoşandin; -mîna ku Merov xuwê û dermanê germ bi ser xuwarinê ve dide bidakirin, da ku ew bête bixweşkirin; yanjî mîna ku Merov bêtir ji şekir bi ser kulîçeyeke şêranîyê dide bidakirin, da ku ew bêtir bête bimizekirin.

Mêjûvanên Markisî-Leninî guh bi nivîsandina mêjûwên Partîyên Komunistîyî Mîrî dane bikirin. Pir caran jî em didin

bidîtin, ku "vegerandina" nivîsandina vê mêjûwa hanê ji nû ve tête bikirin, hergava ku Sikretêrekî nuhî Partî tête bidîtin. Hin ji rastîyên berê bi derew ve têtin biderkevtin, yanjî ew bi careké ve nema têtin bibîrxistin.

Herwehajî piranîya Nivîsvanên mêjûwa Sovyêtî berjewendîyên Dewleta Sovyêtî û pêwendîyên wêyî derve bi ber çavên xwe ve didan bixistin. Ji vê hate biencamkirin, ku hin ji rastîyan di ser guhan re hatin biavêtin, yanjî di nava wan de hate bidestkarîkirin. Pêwendîyên derve ligel Dewletên din de ew li gora nîrên Navdewletî de têtin biveguhertin. Dujminê donê dibe, ku ew bi Dostê îro yanjî sibênê bête bikirin. Ji bona nimûne li ser hatinên di nivîstên Sovyêtî de li ser mêjûwa Rojhilatîyî nuh de derbarên şûreş û Mîrneşînîyên Kurdîyî dawî de dijî Serdarîkirina Osmanî mîna Şûreşên Bedirxanîyan, Mohamed Paşayê Kor, Şûreşa Ubeydulahê Şemdînanî em ji xwe re didin bitemaşekirin. Wan Rêberên wan Şûreşan bi "Rêbiran" û "Serbiran" ve didan bipesinandin[1]. Herwehajî Şureşa Şêx Seid û Seyid Riza bi "Derebegîyî" û "Kevneperesetîyî" ve û Şûreşa Agrî-Dax - Ararat- jî bi "Nokerîya Impiryalîyê" ve hatin binavkirin. Sersûrayetî di vir de nayête bidîtin, jiber ku Yekitîya Sovyêtî bi Dostê Turkiya Kemalî ve dihate bidîtin, ya ku wê ew bi mal û çek ve ji bona temirandina şûreşên Kurdî dida biyarmetîkirin, bi mehna ku ew bi "beramberîya Impiryalîya Cîhanî" ve tête birabûn[2]. Der tîrmeha sala

[1]Ji xwe re li Nameya Doktorayî Ezîz Şemdînî de li ser "Tevgera Miletê Kurdîyî Azadîxwaz" de -pêşkeşkirî- bi zimanê Rusî ve bidin bitemaşekirin, ya ku pê Danervanê wêna Doktora ji Zanîstgeha Leningiradê der sala 1958 de ji xwe re date biwergirtin. Ew bi zimanê Rusî ve nehate biçapkirin; belam ew li paş de bi perçên xwe ve li dûhevdû de di Organa Rojnama Xebatî Partiya Demokratî Kurdistanî de bi zimane Erebî ve li Begdadê de der sala 1958 de hate bibelavkirin. Ismet Şerif Wanlî

[2]Ji xwe re li bîrwerîyên Ihsan Nurî Paşa de bidin bitemaşekirin, ya ku ew bi zimanê Firensi ve di bin navnîşana "La révolte de l'Agri-Dagh-Ararat" -Şûreşa Agrî Dax-Ararat, Cinêf sala 1986 de hate biçapkirin. -Ev nivîsta hanê ligel pêşgotinekê de ji bal Nivîsvanê van dêran de û pêdeçûnekê ji bal Pîreş de bi wergerandin zimanê Firensî ve hate bibelavkirin-. Di dawîya vê nivîsta hanê de belgeyên serdarîya Biritanî li ser

1963 de rojnama Izvesta -bi rastî ve- "Felsefa Basî" di Iraqê de bi "Felsefa Regezperestîyî Nazî" ve date binavkirin[1]. Hoyê vî nivisandina hanê jî jiber ku "Efserên Azadîxwaz" piranîya wan ji Erebên Basî bûn, yên ku wan serdarîkirin li paş ruxandina Ebdul-Kerim Qasim de ji bona nava destên xwe dane bixistin û wan bi gurandina Komunistên Iraqî ve bi destpêkirina serdarîkirina xwe ve dane bidestpêkirin. Hin ji Komunistên Iraqê bi gewreyên xwe ve ji bona nava Kurdistana Iraqê hatin bipenakirin. Şûreşa Kurdî ji wan re jîyana wan date bigirawkirin. Na hêjîbêtir Mustefa Berzanî destûr ji bona wan date bidan, ku ew ji xwe re çek di şûreşa Kurdî de beramber Serdarîya Begdadê bidin bihilgirtin. Der meha axlêva sala 1963 de Serdarîyê bi supahê xwe ve ji bona ser rakişandina Kurdistana Iraqê date bidestpêkirin. Rojnametîya Sovyêtî dest bi liberxwedanê ve ji bona Kurd date bikirin. Rojnama -Piravda- "Gewreyên Iraqê bi rabûna kuştina giştî ve beramber bi Kurd ve ligel wergirtina wanayî alîkarîyên gewre ji Impiryalîya Ingilîzî de nav bi dû wan ve date bixistin". Herwehajî wê date bidazanîn, ku "Yekitîya Sovyêtî nikare destgirtî beramber bi wan rûdanan ve bête birawistandin, yên ku ew aşitîyê li nêzîka sînorên Sovyêtê de bi bertirsê ve didin bixistin"[2]. Der tîrmeha wê salê de Serdarîya Sovyêtî û herwehajî Serdarîya Mengolîyî Gelêrî datin bidaxwazkirin, ku divê Pirsiyarîya Kurd û "Kuştina Tevayî beramber bi Kurd ve" ji bal Serdarîya Iraqîyî Katî de di lîsta kar û barên di Civata "Conseil èconomique el social" -Civata Aburî û Civakîyî Yekgirtina Netewan de bêtin bitomarkirin. Gava ku li ser vê deqa hanê de di lidarxistina Civatê de der Meha keçirînkê wê salê de hate bigiftûgokirin, piranîya Civatê tomarkirina vê deqa hanê di lidarxistina lista kar û baran de datin nbiayînîkirin. Ango ew jî hate binayînîkirin,

---

Şûreşa Araratê de hatine bibelavkirin, yên ku ew yarmetîyên Supahîyî Sovyêtî ji bona Enqera dijî Şûreşê didin binîşandan. Ismet Şerîf Wanlî

[1]Ji xwe re li rojnama Le Monde Firensî jimara 14 tîrmeha sala 1963 de bidin bitemaşekirin, ya ku di nava wê de hin ji nivîsandina Izvestayî berî du rojan li ser rûdanên Kurdistana Iraqê de hatine biwergirtin, ya ku ew Organa Serdarîya Sovyêtî ye. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Rojnama Pravda, Mosko, jimara 11 tîrmeha sala 1963 de. Ismet Şerîf Wanlî

ku Civat li ser vê danava hanê de neyête biaxivtin. Ev pirbûna hanê ji Endamên Civatê ji Rojavîyan, Ereb û hin ji Serdarîyên Emerîka Latînî û Asyayî dihatin bipêkhatin. Wê çaxê Sovyêtê dev ji giftûgokirina vê pirsê date biberdan[1]. Ev pêrabûna hanêyî Navdewletîyî pêşî bû, ya ku têde li ser pirsa Kurd de di Yekitîya Netewan de hate bixwestin, ku li ser wê de bête bipeyivandin. Mexabin, ku ew bi ser ve nehate bikevtin. Dê baştir bihata bidîtin, heger ku Serdarîya Sovyêtî tomarkirina vê deqa hanê di nava lîsta kar û barên Civata Parastinê de û ne di Civata Aburî û Civakî de bida bixwestin; jiber ku pirsiyarîya Kurd pirsiyarîyeke welatî û siyasî ye, berî ku ew "Pirsiyarîyeke Merovanî" be. Belam bisernekevtina Sovyêtê di wê hingavê de di pêrabûna Navdewletîkirina pirsa Kurd hoyê wê ji bona beramberbûna Emerîka û Dewletên Erebî jê re tête bidîtin.

Der sala 1972 de veguhertineke nuh hate birûdan. Serdarîya Sovyêtî "Peymana Dostaniyê û Hevkariyê" ligel Serdarîya Iraqîyî Basî de date bigirêdan û wê bi mal û çek ve yarmetîya Serdarîya Iraqî date bikirin. Vê date bihiştin, ku Rêberîya Kurdistana Iraqê yarmetîyên Emerîkî û Şah ji xwe re bidin biwergirtin.

Der avdara sala 1975 de li paş Peymana Cezair de di navbera Şah û Sedam Husên de Emerîka û Şah dev ji Kurd datin biberdan. Evaya jî bi destpêka destanê ve hate bidîtin, ya ku ew bi Kurdistana jêrîn ve hate bikevtin[2].

Derbarê Turkî de ji kevtina wêna ji bona nava Peymana Nato der sala 1952 de ew ji bona Emerika hate bidostkirin û ew bi "Hevalbendê weyî Şêrîn" ve hate bikirin û nemaze ev jî ji dema Cenga Kuwêt beramber bi Sedam Husên ve tête bidîtin. Wer tête bidiyarkirin, ku Dewletên Gewre gerjî Rêstika wan jî çi jî bête bidîtin, ew di

---

[1]Ji xwe re li ser dirêjîya van rûdanan de di nivîsta minî bi navkirîyî çûyî de: I. Ch. Vanly "Le Kurdistan irakien entitè nationiale" R. 195-217 bidinbi temaşekirin. Ismet Şerif Wanlî

[2]Ji xwe re li ser van rûdanan de li wî derîyî de bide bitemaşekirin, yê ku min ew di nivîsta ligelhev de li ser Kurdistana Iraqê de: "Les Kurdes et le Kurdistan", Paris sala 1978. Herwehajî ew bi Ingilîzî û Elmanî jî ve hatîye biçapkirin.--Kurdistan und Kurden, Band 1, Güttingen und Wien, März 1984--. Ismet Şerif Wanlî

kêsperestîya xwe de nala hevdû jî têtin biderkevtin. Mafeyê Çarenûsa Netewan ji bona wan bes û bi tenha xwe ve reş li ser sipî de têtе bidîtin.

Vegurandina Katyn -Katun, ya ku ew di destpêka Cenga Cîhanîyî Duwem de hatîye bikirin, ew bi xwe jî ve nimûneyeke destanîyî ji derewên mêjûyîyî Mîrî têtе bidîtin. Polîsê Nehînîyî Sovyêtî bi fermana Stalin ve nêzîka 14 hezar Efserên Polonî dane bikuştin, yên ku ew bi dîlî ve ji bona nava lepên Leşkerê Sor hatibûn bikevtin. Ew bi cil û bergên xweyî Supahî ve di nava daristana Katun de li nêzîka Minsk de di Rusya Sipî de hatibûn biveşartin. Gava ku Leşkerên Elmanî di pêşkevtina xwe de di wê heremê de termên wan datin bidozandin, Serdarîya Sovyêtî Elman bi wê tawankarîyê ve datin bigunehkarîkirin. Ew li ser vê tawankarîya hanê de dihatin biçûyîn, tanî ku Yelsin li paş rûxandina Rêstika Sovyêti de ji bona ser serdarîkirinê hate bidanîn, wî daxwaza lêbuhurandinê bi Mîrî ve û bi navê Serdarîya Rusî ve ji Bolonya date bixwestin. Ew Efserên Kuştîyên hanê hemû bi bişkivên gulên Netewê Polonî ve dihatin biderkevtin, yên ku ew bi dijbûna hemû qanûnên NavDewletan û rêzanên sincîtî û mirovanê ve hatin bivegurandin[1].

---

[1]Der tîrmeha sala 1975 de Ez, Barbar û Ciwan ligel gurûhekî Elmaniyî gervanîyê de bi serdanîyê ve ji bona du hevtan ji bona gerandina nava Rusya, Okrayîna, Rusya Sipî, Gurcistan û Erministanê hatin biçûyîn. Belam em ji bona Erminstan nikaribûn bihatana biçûyîn; jiber ku balafiran nikarîbûn ji xwe re li Erîvanê de bidin bidanîn.

Di vê gera xwe de welatê Sovyêtê û rêstika wêna ji me re bêtir kûrtir hate binasîn û hêjîbêtir em li ser rewşa Kurdan de bi rast û durustî ve û dastana wanî barkirina sala 1942 de bi fermana Stalin ve hatin biagehdarîkirin. Herwehajî dam û destgehên gerêyî Sovyêtî em ji bona nava vê Goristana Mezin li Katun de ji bona derxistina tawankarîya Nazîyên Elmanî derbarê gurandina bi hezaran ve ji Efserên Polonî datin bibirin. Li dawî de rastî hate biderkevtin û Peymana Stalin ligel Hitler der sala 1939 de ji bona parvekirina Polonya di nava xwe de hate bieşkerekirin û ew gurandina hanê jî ji bal Stalin de hatibû bikirin. Tevlivêjî de Stalin ji agirê Hitler nehate biparastin û wî li ser vê bêbextiya xwe de ligel Polonya de bêtir ji bîst melyonan ji Merovên Sovyêtî li ber Hitler de dane bigorîkirin. Di encamê dawî jî de li ser van derew, boxtan, bêbextî û tawankarîyan dewleta Sovyêtî li paş betir ji hevftê Salî de hate biruxandin. Cuma

Capa Firensî ji bona nivîsta Engels li ser "Cenga Cotkaran[1]" de di sala 1930 de hate biderkevtin. Lucien Febvre, yê ku ew yekeke ji Danîvanên Dibustana Mêjûyîyî nuh li Firensa de tête bidîtin, di rexnê xwe de li ser vê nivîsta hanê de date bigotin: "Ji bona zanebûna Engels Merov dikare belê bide bigotin, belam ji bona zanebûna wîna li ser Cenga Cotkaran de bi gem ve tête bidîtin"[2]. Dibe, ku ev rexneyê hanê hinekî bêtir ji pêwesit bi notî ve bête biderkevtin, belam ew rawestandina Mejûvanên rast û durust ji nivîstên "mêjûyî" dide biderxistin, yên ku ew divên li rastê de ji bona daxwazên êdyolocî bêtin "biligorkirin".

[1]Ji xwe re li ser vê danava hanê jî de li: Wilhelm Zimmermann "Der Grosse Deutsche Bauern Krieg" -cenga Cotkarên Elmanîyî Mezin, Dietz Verlag, Berlin, sala 1953 de, di 796 rûpelan de bide bitemaşekirin.

Ev rudanên hanê der salên 1525 de di şerên Cotkaran de beramberî bi Kenişte ve hatine bikirin, yên ku Merov ji wan re bi Şûreşa Borcuwaziyî pêşîyî ve dide bigotin. Cuma

[2]Ji xwe re li kovara "les Annales", Paris sala 1930, r. 437 bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

7. Dubistana "Mêjûyî Nuh" -Dubistana Anali -Salanîyî-

Me date bidîtin, ku Voltaire -Voltêr Feylesufê Şûreşa Firensî der sedsalên heştdehan de bi germ ve dide bigotin: "ku wî rûdanên sê yanjî çar hezaran ji şer û pevçûnên cengînî di nava çend sedan de ji nivîstên mêjûwê dane bixwendin; belam xwendina wan ew tiştekî ji mêjûwê nedane bifêrkirin".

Dibe, ku ev rûnkirina tûj hinekî ji bona têgihiştina "Mêjûwa Nuh" bide bialîkarîkirin, ya ku Dibustana wêna li Firensa de der sala 1929 de hate biderkevtin. Li paş de şêweyê wê di lêkolandina mêjûwê de hate bibelavkirin û danavên wê ji bona berên pir di nava welatên pêşvekevtî de hatin birengînîkirin. Na hêjîbêtir wê rêya xwe ji bona nava cîhana sêyem jî bi kêmanî jî ve di rêya wergerandinê de, -hegerjî ne di rêya nivîsandina xweser jî de, heger ku jê re destikên hunerî bêtin bipeydakirin-, date bivekirin. Em bigir ji çîl salî ve di nava welatên cudan de fêrî ser xwendina nivîstên mêjûyî hatine bikirin, yên ku ew li gora têgihiştina "Mêjûwa Nuh" de hatine binivîsandin; bêyî ku Xwendevan jî navê Dibustana "Analî" -Salî ji xwe re dabe bihîstin.

Bi vê liberkevtina hanê ve gotina "Firensî" nala nîşanê ji bona Dubistana mêjûyîyî nuh tête biderkevtin. Ev bi xwe jî ve bi rastî ve tête biderkevtin û ew di heman çax jî de "xwe bi çilmisandî" ve dide biderxistin. Ew bi vê liberkevtinê ve bi rastî ve tête bidîtin; jiber ku ev Dibustana hanê li Parisê de hate bipêkhatin û bipêşkevtin. Ew xwe bi çilmisandî ve tête biliberkevtin; jiber ku ew di rê "Reweştê" yanjî "Nardinê" de bi cîhanî ve hate bikirin; -gerjî ku Merov bikarbe van gotinan bide bigotin-, yanjî jiber ku Dubistanên din li pê Dibustana Firensî de mîna li Italya, Gerministan, Emerîka, Ingilistan û hinên din de kêm yanjî bêtir li gora zînetan de hatin bicûyîn. Belam "Mêjûwa Nuh" hêjî ew di bilintirîn rengên xwe, vejandinên xwe û desthilatîya xwe de di nava Firensa de tête bidîtin; jiber ku ew li wêderê de hatîye bixwedîkirin.

Me date bidîtin, ku wergirtina rêya Dubistana "Başîtîyê" -rûdanîyî Elmanî li Firensa de di payîna sedsalê nozdehan de date bihiştin, ku pir Mêjûvanên Firensî jiber teskbûna asûwê wan, kêmbûna

danavên wan û girêdana wan bes li ser "Rexnegirtina tiştê Nivîsandî" de rexnegirtinên wan li ser vê Dibustanê de hatin bigûrkirin; jiber ku berkirina vê Dibustanê ji bona jimareke kêm ji Mamostên Zanistgehan û Şagirtên wan û desteyekî Xwendevanên helbijartî xwedan zanyarîyeke cîhanî dihate bibervekirin.

Dibustana "Mêjûwa Nuh" jiber daxwazên niyazên civaka serdemî hate bidîtin, da ku ew zanistîya wêna di berên cudan de li ser encamê bilindbûna endazîya zanyarîya wê û dilbijandina jimareke pir ji Xwendevanên wêna de û di nava wan jî de çînîyên gelêrî jî bidebitêrkirin.

Mêjûvanê Italî A. Momigliano -Momigliyano der sala 1961 date bidîtin, ku "Dibustana Analî ew cih ji xwe re dayite bigirtin, yê ku Dubistana Elemanî -ango Başîtîyê- ji xwe re ew dabû biwergirtin". Ev dîtineke rast û durust tête biderkevtin, lêbelê ew nayête bitêrkirin; jiber ku Dibustana Analî pir berên din dane bivekirin, ji yên ku ew ji bal Dibustana rûdanan nedihatin binasîn. Bi liberkevtineke din ve wê çînîyên civakîyî nuh ji bona xwendina mêjûwê dane bianîn. Hêjîbiserdejî ve wê rêyên ji bona lêgerandina mêjûyî di Dibustana nuh de datin bipirkirin.

Dibustana Analî danavên lêkolandinên xwe ji bona berên cudan di zanistîyên civakî de û di payînî jî de ji bona hemû diyarîyên jîyana Merov di civakê de û di kêrkirinên wan de ligel serûştîyê û dorhêlê de datin bifirehkirin. Herwehajî jiber pirbûna kanîyên -mêjûwa nuh- şêweyên wêyî hunerî ji bona lêkolandinê û lêgerandînê hatin bipirkirin, tanî ku wan bi karanîna amaran jimargerî, kêmya, fîzik û "computer" -hişê Eelektironî- ve dane bikirin. Ev kanîyên pirî Dibustana nuh ew bi xwe jî ve ji lênêrina civakê di niha û mêja wê de kok û kanîyên din ji xwe re didin biafirandin. Ev pêşvekevtina hanê bi rastî jî ve "Mêjûwek Nuh" dide bipêkanîn, ya ku ew bi carekê ve xwe ji Dibustanên mêjûyîyî berî xwe dide dûrkirin. Navê Dibustana "Ecole Annales" ji navê Kovara wênayî "Annales" hatîye biderkevtin, ya ku ew der Zanistgeha Sorbonê de di sala 1929 de hatîya bipeydakirin û li dor û berên wêna de Bingehvanên "Mêjûwa Nuh" hatin bicivandin. Dibe, ku ev navê hanê bi başî ve neyête bidîtin; jiber ku gotina "Annales" bi zimanê Firensî ve -ew ji "An" ango "Sal" tête biderkevtin- û ya ku ew di gotina xwe de "Mêjûwa Salanî" dide

biderxistin; tevî ku Dibustana Nuh jî bi xwe jî ve ew dijî têgihiştina salanîya mêjûwê jî tête biderkevtin.

Lucien Febvre -Lusyen Fibver kovara "Annales" date biderkirin; -yê ku ew der salên 1878-1956 hatîye bijîyandin-. Ew ligel Marc Bloch -Mark Blox -1886-1944- de Mamostê mêjûwa nuh di Zanistgeha Sorbonê de bû. Ew der mêjûwa sedsalên navînî de karnas bû. Li jor de navê nivîsta wî li ser "Civaka Derebegîyê" de û hinekî jî li ser şêweyê wî de hate bibîrxistin. Lusyen Fibver der sala 1922 de nameya xwevî doktora di bin navnîşana "Zemîn û Pêşveketina Merov"[1] de date bibelavkirin. Wî têde kêra serûştîyê li ser Mrov de û kêra Merov li ser dorhêlê û Serûştîyê de date diyarîkirin. Herwehajî wî kurtîya têgihiştina xwe ji Mêjûwa Nuh û danavên wêna di nivîsta xweyî di bin navnîşana "Xebat ji bona Mêjûwê" de der sala 1953 de date bidarêjtin[2]. Der sala 1952 de nivîsteke mîna vê ji bal Mark Blox hatibû binivîsandin û ew li paş mirina wî de di bin navnîşana "Liberxwedana Mêjûwê"[3] de hate bibelavkirin. Mark Blox di dema cengê de der sala 1944 de bi rengekî destanî ve hate bimirin[4]. Herdu ji bona giştîkirina têgihiştina nuh ji bona zanistîya mêjûyî û bicîanîna şêweyên wê ve "Xebatvan" bûn..

Wan li lawazîya şêweyên fêrkirina zanistîya mêjûwê û sînorên wêyî tesk, serûştîya wêyî xweparêz û nekarîna wêna ji bona çûna nava kûrbûna tiştan de datin birexnegirtin. Herwehajî wan li guhpênedana Mêjûvanên Xweparezî de ji bona zanistîyên civakî nuh nala zanistîya aburî, zanistîya -Socialogie- -civakşinasî, zanistîya -Démographie- -

---

[1]Ew bi zimanê Firensî ve "La terre et l'évelutien humaine" tête binavûnîşankirin. Ismet Şerîf Vanli

[2]Ew bi zimanê Firensî ve "Combats pour l'histoire" tête nivîsandin. -Ew di gotina xwe de bi "Şêr û pevçûn ji bona mêjûwê" ve tête biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

[3]Ew bi zimanê Firensî ve di bin navnîşana "Apologie pour l'histoire" hate bibelavkirin. Ismet Şerîf Wanlî

[4]Mark Blox Firensiyekî Cuhû bû. Li paş vegirtina Nazîyan de ji Firensa di gava cengê de wî demekê ji bona Kovarê di bin navekî veşartî de dida binivîsandin. Li paş de wî xwe ji bona Liberxwedana Firensî date bigihandin û wî di nava rêzên wê de dida bişerkirin. Der sala 1994 de ew ligel hin ji Hevalên xwe de ji bona nava destên Gestapo hatin bikevtin. Nazîyan ew ligel jimarekê ji Hevalên wîna de nala tolgirtinê ji pêşvekevtina Hevalbedan dane bikuştin. Ismet Şerîf Wanlî

tudeyî, zanistîya -Psychologie- -rewanşinasî û şêweyên wanî taybetî dane birexnekirin. Hevalbendên wan qerfên xwe ji bona mêjwûa "Başîtîyê" didan bikirin û wan ew bi "Mêjûwê - Cengê" ve yanjî bi "Mêjûwa Rûdanan" ve didan bibanvkirin. Wan bi pozbilindî ve ji xwe re li berên wê de ji "Mêjûwa Siyasî, "Mêjûwa Supahî", "Mêjuwa Diplomasî" û "Mêjûwa Oldarîyan" didan binêrîn. wan ew hemû bi tenha xwe ve di nava kuncên Zanistgehan de û dûr ji jîyana Merov di civakê de, di hêvî, xebat, xewin û dorhêlên wî de didan bidîtin. Herwehajî Bangvanên Dibustana Analî di destpêkê de mêjûwa biyografî -Jîndarîya Neferan- bi çavekî nizim ve lê didan bitemaşekirin.

Ji gava ku Dibustana Bicîanînê ji bona xwendekarîyên Bilind li Parisê de der sala 1947 de mîna dam û destgehekî azad ji Dewletê hate bipêkhatin, ew pişta xwe bi rêyên taze û dîtina xweser ve dide bigirêdan. Berê şeşem ji vê dam û destgeha hanê bi Navînîya "Dibustana Mêjûwa Nuh" ve hate bikirin. Di nava wê de jimareke pir ji lêkolandinvanên alîkar û dam û destgehên rêxistinê têtin bidîtin.

Li paş mêrina Bingehvanê Dubistana nuh de Mêjûvan Fernand Braudel -Birodêl "bi Pîrê wê ve" hate bikirin, -yê ku ew der sala 1902 de hatîye bizayîn- û ew tanî pîrbûna xweyî karî di sala 1972 hate bimayîn. Wî li ser mêjûwa "Dûrbûna Dûr", "Cîhanîya wê" û "Dema Hêdî" de date bidubarekirin. Li paş wî de Dubistan ji bona beran û mêldarîyan hate bişaxkirin. ya ku ew niha ji bal Jacques Le Goff -Cak logof de, -yê ku ew ji bona dîtina "Mêjûwa Xelekî" yanjî zincîrî dide bibangkirin-, ji bal Pierre Nora de, yê ku wî "Li Jihevperçebûna Mêjûwê de" dayite bitemaşekirin, ji bal Français -Françîs Furt de,-yê ku wî dayite bigotin: "Şûreşa Firensî hatîye bipayînkirin"-, ji bal E. Le Ray Ladurie -Ladûrî de, -yê ku ew bi xwedanê dîtina "Zemanê Rawestiyayî" ve di pêşveketinê de û karnasê sedsalên navînî tête bidîtin-, ji bal Friedmann -Firîdman, Ferro, George Duby -Corc Dubi de, -Yê ku ew di "Mêjûwa Rewanşinasîyan" de bi karnasî ve têtê biderkevtin-, ji bal p. Chauno -Şono de, -yê ku wî" Veguhertinên Şûreşî" dane bijimartin-, ji bal M. Foucault -Fokolt de, -yê ku ew bi xwedanê dîtina "Xelekan" di zincîrên mêjûwê de têtê biderkevtin- û Hevalên wî mîna K. Pomyan, J. Revel têtê biwênerîkirin.

Herwehajî mîna ku ji bona "Dubistana Başîtîyî" Elmanî hin ji

Pêşvanên berî wê di nava welatên din de dihatin bidîtin, yên ku ew li ser rêyên nala Bingehvanê wê de dihatin biçûyîn, wer jî ji bona "Dubistana Nuh" jî hin ji Pêşîvanan dihatin bidîtin û ji wan jî Belcikîyê H. Pirenne -Pirên -der sala 1919 de-, Holendîyê Huizinga -Huyzinga, -yê ku wî bi berê "Rewanşinasîyan" ve date bidestpêkirin-û Elmanîyê Wieber der "Mêjûwa Buhayan" de dihatin bidîtin. Herwehajî Mêjûvanên Markisî jî di nava wan de dihatin bidîtin, yên ku wan bi mêjûwa aburî ve dane bidestpêkirin. Belam mîna ku me date bidîtin, ew ji rê jiber zalbûna Dewletê hatin biderkevtin û ji alîyê din jî de ji bona wan destikên rêxistinêyî pêwist ji bona lidûçûna lêkolandinan dihatin bidîtin. Bingehvanên Dubistana "Mêjûwa Nuh" li Firensa de bi giştî ve ji Çepan dihatin bidîtin û nemaze Birodol, -yê ku ew ji bona Partîya Sosyalistîyî Firensî nêzik dihate bidîtin- û hinên din ji wan jî ji Partîya Komunistîyî Firensî nêzîk bidihatin, yên ku wan xwe li paş de jê datin bidûrkirin.

Dibe, ku bi başî ve ji bona liberkevtina "Mêjûwa Nuh" bête bidîtin, ku Merov rexnegirtina Lucien Febvre -Lusyen Febver bide binîşandan, ya ku ew di nava gotarekê de der sala 1934 de di nivîsteké de di bin navnîşana "Mêjûwa Rusya" de hate bibelavkirin, ya ku ew ji bal Seignobos -Signobos û Miliokov -Milyokov de di hezarûçarsed rûpelan de li ser şêweyê Dubistana Başîtîyê de hatîye binivîsandin. Febvre -Febver dibêje: "Gava min nivîsta "Mêjûwa Rusya" ji xwe re date bivekirin, min têde ji bil Reşkên Qeralan, Destanên Şahneşînêyî, Wezîrên Bertîlxwer û Biyokratî û Berdevkên Şahneşînîyê pêve nedan biditin. Ma kanî li kûderê jî dena Rusyayî dagirtîyî kûr tête bidîtin? Ma kanî li kûderê jî dena daristanan û mêrgan tête bidîtin? Ma kanî li kûderê de pêlên Tudeyên livandî di nava Oral de ber bi Rojhilata Dûr ve têtin bidîtin? Ma kanî li kûderê de çem û rûbarên Mezin û jîyana Masîvan û Dartaşên qeyikan têtin bidîtin? Ma kanî li kûderê de çandinî û Cotkar û şêweyên çandinîya wan û emrazên wan têtin bidîtin? Ma kanî li kûderê de çêrgeh û hilanîn û danîna daristanan di jîna Rusî de têtin bidîtin? Belê ma kanî li kûderê de gund û Zemîndarîyên Xanedan têtin bidîtin? Ma ka çawan bajar hatin biavakirin, bipêşvexistin û birêxistin? Ma kanî li kûderê de bazarên gelêrî têtin bidîtîn? Ma ka li kûderê de Borcuwazî tête bidîtin? -Magelo bi rastî jî ve Rusya hîç Borcuwazîyek ji xwe re dayite

bidîtin?- Magelo kanî li kûderê de ew hemû û cîhana wan têtin bidîtin, yên ku wan Rusya dane bipêkanîn? Ma kanî li kûderê de siyaset û pêwendîyên êtnolocî, zemînî û pirsên zimanî têtin bidîtin? Ma kanî li kûderê de rola Kenişta Ortodoksî di pêkananîna jîna tevayîyî Rûsî de û yên din de têtin bidîtin? Di van tevan de nivîst bigir têtin bivalakirin".

Li paş vê pêşgotina hanê de Merov dikara "Mêjûwa Nuh" û rêyên wê bi vî rengî ve bide bikurtkirin û bê ka wê çî ji bona zanistîya mêjûwê dayite bianîn:

- Di pêşî de derbarê danavan de Bingehvan û Karnasên wêna lêkolandinên xwe di warê zanistîya aburî de -mêjûwa pûlan, buhan, veguhertinên bazirganîyê û berkirinê, şêwe û destikên berkirinê, lezbûna vegerandinên wêna ûhd.--, tanî zanistîya civakî dane bifirehkirin. Belam wan lênerînên xwe ne bes tenê ji bona xebata çînîtî mîna Markisistan dane bigirêdan, lêbelê ew jê dûrtir hatin biçûyîn. Wan li sadetirîn diyarîyên civakî -xwendekarîya malê û mêjûwa wê, pêwendîyên wê, mêjûwên komên gundîtîyê û bajartîyê û "Jîyana Civakî" de dane bilêvenerandin, mîna ku Merov dikare bide bikirin. Li ser van kar û barên hanê de Akadiminyan, Holan, Çayxanan û Baregehên Werzeşan jî didan bipeyivandin û herwehajî li "Kêmanîyan" Nefer û komên perî yajî Zindanvan jî de dihate bilênerîn. -Herwehajî li "Mêjûwa Ciyografî" ango mêjûwa deverê û pêwendîya diyaliktîkîyî bihevkêrkirîyî de di navbera Merov û Dorhêla wîyî serûştî de di dûrbûna xwe de dihate bitemaşekirin-. Herwehajî li Démographie -Demografî -zanistîya Tude de û xwendekarîya wîyî mêjûyî de dihate bitemaşekirin û pêrejî xwendekarîya diyarîyên wîyî çendî nala endazên jimara miryan, yanjî zayînan ji bona tevaya Tude û pêşkevtina pêwendîyên wan ligel demê de dihate bikirin. Li paş de ew ji xwendekarîya çendî-demî ji bona xwendekarîya "Başbûna" wan de hatin biveguhestin. Wan li ser "Mirinê" de û hoyên wê de datin bilêkolandin. Ji bona nimûne wan mêjûwa Mirina Reş, yanjî Janazirav dane biderxistin. Herwehajî wan mêjûwa "Tirsa Mirinê" datin biderxistin. Ew li ser "Zayînê", "Dê" û "Zarotîyê" de hatin biaxivtin. Herwehajî ew li ser mêjûwa "Evîndarîyê", "Xewnan" û mêjûwa "Mythologie" -evsanên gelêrî de hatin bipeyivandin û di payînê jî de

ew li ser "Mêjûwa Laş" û "Xwarin û Vexwarinê" jî de hatin biaxivtin-. Van hemû berên hanê, -yên ku ew bê sînortêtin bidîtin-, dane bihiştin, ku "Mêjûwa Rewanîyan" yanjî hîşbûnan û reweştan bêtin biderkevtin. "Mêjûwa Rewanîyan" bi "Histoire des mentalités" ve tête binavkirin. Ew bi "Zanistîya Rewanîyî Tevayî" ve têté biderkevtin. Merov dikare vê zanistîya hanê li gora heyam û cihên cudan de bide bixwendekarîkirin.

Têgihiştinek nuh ji bona "culture" -zanyariyê hate biderkevtin, ne ku ew bes û bi tenha xwe ve nala nîşanekê ji bona desteyekî helbijartîyî berz di civakê de tête bidîtin; lêbelê ew nala komekê ji reweştan, remanan, bawermendîyan û rengên jînê têle bidîtin, ya ku ew pê tevaya civakekê ji civakeke din dide bicudakirin. Bi peyveke din ve xwendekarîya "Jîndarîya Rojaneyî" Neferan di civakê de mîna zanistîyeke bi serê xwe ve di dîtina Dubistana Nuh de hate biderkevtin û ew bi gelekî ve giringtir ji "Rûdanên Gewreyî Mêjûwê" nala cengan hate biderkevtin.

Rojgarîya Merov dikarê wê di heyam û deverên cudan de bide bixwendekarîkirin. Wilo -Mêjûwa Nuh- date bikirin, ku nivîst li ser jîndarîya rojanî de li Roma kevnar de, li Babila kevnar de yanjî li ser "Jinê de di Cengên Xaçperestan de" bêtin bibelavkirin.

- Bi ser van jimarên danavan jî ve "Mêjûwa Nuh" berên xweyî zemînî û demî di nava kûrîtîyan de datin bifirehkirin. Halo li ser şehristanîya deverên fireh nala derya Sipî û çolên wê û ligeljî Ewropa û Afrika Bakur jî de, belê hêjîbêtir li ser Bîyabana Mezin jî de xwendekarî hatin biderkevtin.

Derbarê demê de divê di navbera "dema Kurt" de û pîvana wêna de bi demjimarê, rojê, salê yanjî cendsalan ve bête bicudakirin, ya ku têde "Rûdan", yanjî ya ku têde bûyîna mêjûyî ji Supahî yanjî Diplomasî tête bikirin. Ev jî li ser pêvana Merov nala Nefer tête biderkevtin. Herwehajî derbarê demê divê di navbera "Dema Hêdî" de, ya ku ew nifşan û heyaman di nava xwe de dide bipoşandin û "Dema Dûrî" de, ya ku ew lidûhevhatinên şehristanîyan dide bidîtin, bidin bicudakirin.

Belê "Zeximbûna" rasta mêjûyî û "Tîrbûna" pêşvekevtin û nîran de bi liberkevtina pirbûna kirdaran, tevlihevbûn û hevkêrkirina

wan ligel hev de tête bidîtin. Herwehajî ew bi dîtina jihevkevtina tiştan û pirt pirtkirina wan ji hev û jîrbûna ji nû ve suwarkirina wan têtê bidîtin. Ji bona nimûne mêjûwa "Xwarin û Vexwarinê" divê ew di navbera xwarin û vexwarina bajêr û dêyan, Genc û Pîran, Zengîn û Perîşanan bide bicudakirin. Divê ew destên xwe ji bona hunera xwarinan û reweştên xwarinan û li paş jî de ew destên xwe ji bona berkirinê û veguhertinên berkiran, birçîbûnan û hoyên wan bide bidirêjkirin. Li ser Mêjûvan de têtê bidîtin, ku ew diserhevgirtina kirdarekî di ser yê din de nede bigirtin, lêbelê divê ku ew tevlihevbûn û bihevkêrkirina kirdaran ligel hev de ji nava hev bide biderxistin.

Derbarê kanîyên "Mêjûwa Nuh" de "Belge" ango "Dêrên Nivîsandî" nema ew mîna di Dubistana Başîtîyê de bi kanîya giring ve têtê bidîtin. Wer li ser Mêjûvan de têtê bidîtin, ku ew kanîyan ji xwe re li her cihî de bide bidîtin. Herwehajî divê li ser wî jî de ku ew wan kanîyan li wêderê jî de bide bidîtin, li cihên ku ew ji xwe re jî nade biwênekirin. Hergav li ser wî de têtê bidîtin, ku ew xwe bi temaşekirinê ve bide biêşandin. Dibe, ku siyek li ser rûwê zemînê de di wênekî de, yê ku ew ji esmanan hatîye bigirtin, ji bona hebûna komekê ji avanîyan bide biderxistin, ji yên ku Merov di nava wan de ji berî mêjûwê de dihatin bijîyandin, yanjî ku ew rêyên Şahînşahîya Romanî ji bona bihevgirêdana Ostandarên dûr bidin biderxistin. Wisajî mîna ku Merovekî li ser tehta şikevtekê dabe binigarîkirin, yanjî wî li ser dîwarekî -mîna dîwarê bajarê Pompî- dabe nivîsandin, dibe, ku ev jî bi gelekî ve bêtir ji nivîsandina nivîstekê bi peyvdarî ve bête bidîtin.

Ji alîyê din de xanîyên şopênkevnar di nava xwe de û di cihên taybetî de pûtan û tiştan didin hilanîn, mîna ku kompanî û karxane belgeyên xweyî bazirganîyê yanjî berkirinê -ji kaxezan, wêneyan, lîstan, Ffilman û belgeyên dengînîyî tomarkirî- didin hilanîn. Ew ji vê mîna nivîstxanan didin bikirin. Divê ku em nedin jibîrkirin, bê ka çi wizaretên serdariyê, şehredarî, ostandarî, sazmendîyên navDewletî, dam û destgeh, bank, sundikatên kargeran, baregehên werzeşî û hunerî jî pirbûneke mezin ji -archives- belgehên xwe didin bihilanin.

wetov bi vî rengê hanê ve di her dehsalekî de çendbûnên mezin ji agehdarîyên pêşî ve têtin bicîvandin, ku ew bi gelekî ve bêtir ji tevaya lidûhiştîyên Merov di seranserî hezaran sal de têtin biderkevtin.

Li ser Mêjûvan de tête bidîtin, ku ew ji van agehdarîyên pir bide bikarkirin û divê ku ew xwe di vî warî de bide biêşandin. Ew nikare bi vî karê hanê ve bête birabûn, heger ku ew ji xwe re "Hişê Elektironikî" nede bikaranîn û heger ku ew li gora wî de karê xwe jî ji xwe re nede birêxistin.

Belê "Mêjûvanê Nuh" dikare "careke din xwendina" belgeyên kevnar û lêvenerîna wan bi şêweyên nû ve û bi alîkarîya dezgehên teknîkî ve bide bikirin û ew dikare ji wan bide biderxistin, ji yên ku ew li ser tuwana Merovên hatîyên berî wî de dihatin bidîtin. "Zanistîyên Alîkar" ji bona Mêjûa Nuh têtin bidîtin û ji wan jî "Mythologie" -Mitologî têtin bidîtin, yê ku ew xwe bi çawabûna xwendekarîya çrokan, çîvanokan û evsanên gelêrîyî kevnar ve dide bikarkirin. Herwehajî ji wan jî "Mêjûwa Rewanî" û şêweyên nuh di "Linguistque" -Lingiwistik -zanistîya zimanan de têtin bidîtin.

- Belê destdirêjîya jimargarîyê û amaran di nava zanistîya mêjûyî de têtin bidîtin. Evaya xewnek bû, ya ku Bangvanên Dubistana Nuh dane bianîn. Wê di nava hin beran de date bidestpêkirin. Wetov em didin bidîtin, ku "Kleo" -Kilêw, ya ku ew bi "Xwedana Mêjûwê" ve têtin bidîtin, xwe bi Yara Mêjûvanan û Peyvanên wan ve li gora Mitologîya Yunanîyî kevnarî de dide bidanîn. -Mêjûwê xwe ji temenê sîpîtîyê ji bona gihandina xwe li paş nifşên zarotîyê û heyamên ji xortanîya xwe de date bigavkirin. Ew bi xatûnî ve hate biderkevtin, ya ku ew ji nehîşîya xwe nayête bivalakirin. Wê destdarîya xwe li ser aburî û tevaya zanistîyên civakî de date bizalkirin. Herwehajî pêrejî nihajî ew va dest bikaranîna destikên zanistiyên serûştî jî dide bikirin. Li paş ku wê jimargarî di mêjûwên aburî, zanistîya civakî û zanistiya Tudeyî de dayite bikaranîn, va wê ew jî ji bona zanistiyên zimanan jî dide bikaranîn. Wê ji xwe re zanistîya zimanan jî bi "Zanistiyek Alîkar" ve dayite bidanîn. Weha -Kleo- -Kiloy Pevdarîyan bi yarmetîya jimargariyê dide bijimartin, têgihiştinên wan dide bicudakirin û mejûwên wan dide bitomarkirin. Herwehajî jimargariyê "Bankên Zanistîyê" dane bivekirin, yên ku di nava wan de agehdarî têtin bihilanîn û di rêya "Hişê Elektronîkî" de ew têtin bikaranîn. Bi vî rengî ve mîna hinek didin bigotin, "Histoire sérielle" --Mêjûa Xelekî- -yanjî Zincîrî- hate bidozandin, ya ku têde zincîrên li dûhevdû de û

xelek têtin bidîtin.

Herwehajî hêjî bêtir "Xwėdana Mêjûwê" kimya û fizya di rêyên xweyî lêgerandinê de dide bikaranîn, mîna ku wê di archéologie -arşêlogî -zanistîya şopên kevnar de date bikirin, ya ku wê ew ji xwe re nala zanistiyeke alîkar date bikirin, da ku ew pê temenê tiştên dozandî bide binîşankirin. Wisa bûjenên bêcanî ji kevir, derext, lajwerd û gewdên hestî ji nişkê ve li ser mêja xwe didin biaxivtin. -Ji xwe re li jêr de di perçê jimar 13 de li ser van şêweyên nuh de di lêgerandinê de bidin bitemaşekirin-.

Herwehajî Pîrên "Dubistana Analîyî" Parisî, ya ku jê re tête bigotin, mêjûwa Anthropologie" -Antropologî yanjî "Anthiropologie Historiqe" -Antripologîya mêjûyî li paş Cenga Cîhanîyî Duwem de û di pêla Rizgarikirina Kolonyalîyan de dane biafirandin. Wer bi vî rengê hanê ve wan xwe ji "Navînîya Mêjûyîyî Ewropî" ji bona guhpêdana bi mêjûwan û şaristanîyên Miletên dûr ve û Miletên nuh ve dane bivegirtin, yên ku ew ji bin nîrên Kolonyalizmê û nemaze di Afrika Jorî û Reş de hatin birizgarîkirin. Herwehajî wan "Dîtina Structuralisme" -Binîtîyî dane biafirandin. Evaya bi "Dîtina Tirazûkirina Binîtîyê" tête biderkevtin. -Ji xwe ew li jêr de bidin bitemaşekirin-.

Herwehajî "Dubustana Analî" li ser berên mêjûyîyî xweparastî jî de mîna mêjûwa diplomasî û mêjûwa siyasî date bikêrkirin. Herwehajî û pêrejî wê li ser mêjûwa ayînan jî de date bikêrkirin û wê ew date bineçarîkirin, da ku ew ji nû ve careke din ji xwe re pir yanjî kêm li têgihiştina xweyî mêj û rêyên wê bide bitemaşekirin û da ku ew tanî radeyekî jî bi berên nuh ve ji sala 1950 de bêtin bireweştkirin.

Belam Kleo -Kiloy di dilbijandina xweyî Impiryalî de li ser zanistiyên hemsa de û xwestîya wêyî serberdayî ji bona nemankirina her tiştî çi biçûk û çi mezin di nava cerg û hinavên Merov de, di nava reman û şêweyê jîna wî de date bikirin, ku ew mêjûwê, ya ku ew şêrina berdilê wê bû, ji bona ber tirsa man û nemanê bide bixistin. Magelo wê bibîrxistina xwe di rûsarîkirina rûdanên "mMjûwa Baştîyê" de ji siyasî û supahî de û di sergirtina wê de ji bona Kurê Xweyî Bicûk -Mêjûwa Nuh- di nivîsandinên wîyî hebûnê de li ser "Qonaxa Dûr" de û di nava deryan de neda biwindakirin?

8. "Impiryalîya Mêjûwa Nuh": Magelo ew ji bona Mêjûwê Zengînbûne, yanjî ew Tengavî ye?

Magelo di nava zanistîya mêjûyî de "Tengavîyek" tête bidîtin? Ev pirsa hanê bi xwe ye, ya ku divê Merov bi kêmanî ve wê li Firensa de ji xwe re bide bikirin? -Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku di jimareke mezin jî de ji welatan û li ser serên wan jî de Sovyêta berê, "Orduwa Sosyalistî" û ji wan jî di nava piranîya welatên -Cîhana Sêyem jî de divê Merov wê pirsê jî ji xwe re bide bikirin.

- Darêjtina vê pirsa hanê li Firensa de ne jiber encamê hîç wergêrekê bi têgihiştina siyasî-civakî têde bidîtin, mîna ku ew li Yekitîya Sovyêtê hatîye bikirin; lêbelê jiber biserkevtina "Dubistana Analî" û gewrebûn û zalbûna wêna li ser berkirina mêjûyî têde bidîtin û herwehajî jiber parvebûna wêna ji bona beş û berên cudan di liberkevtina mêjûwê de têtin bidîtin. Di nava van beş û beran de hîç bestîyek ji bil daxwaza wan tevan bi "Yekitîya Kokê" ve -Fibver, Mark Bilox-, Ango bi "Resenbûna Kokê" ve nayête bidîtin. Ev jî bi corekî Aristokratî - Xanedanî û yekîtîya "Berjewendîyan" ve têde biderkevtin. Ev bi têgihiştina zanistî ve nayête biderkevtin; belam ew bi têgihiştina bazirganî ve têde biderkevtin; jiber ku Mamostên "Analî" nala Metranan li ser berkirina mêjûyî de hatine bizalkirin. Ev jî bi têgihiştina "Sazîkirina nivîstên mêjûwê" ve û li paş de bi firoştina wan ve di nava "Bazara Bazirganîyê" de têde biliberkevtin. Evaya bi Xanedanên sedsalên Navînî ve derbarê berkirina çandinyê de dide bibîrxistin. Bi sersûrayî ve têde bidîtin, ku ev rewşa "Monopole"-Monopolî di berekî zanistîyê de bête bizayîn, yê ku di nava wî de çurûskekî ji "Pêşkevtinê û Sosyalistîya" sorgulî dihate biçurusandin.

Tevî bi rengînbûna berên "Dubistana Analî" ve jî wê li ser rûçikên xweyî hevbeşî -ji van jî xwevegirtina wêna ji siyasetê - date biparastin. Wê zanistîyên civakî ji bona warên lêvenerandina xwe û guhpêdana xwe bi her tiştekî nuh ve date bianîn. -Ji van jî wê rêyeke Ssyem yanjî dagirtina her valabûnekê di navbera Dubistana Mêjûyîyî Xweparastîyî "Rûdanî" de û di navbera "Markisîya Kevirî" de ji xwe

re date bivekirin. Vêna date bihiştin, ku ew nala kelemekî ji bona vê Markisitîya hanê bête bidîtin û ew xwe ji dêlva wêna bide biderxistin. Wê êdyologî bi "Rewanîyê" û "Hişîtîyê" ve date biveguhertin û wê "Metiryalî" -Bûjenî ji bona lêvenerandina "Bûjenên" mêjûyî date bihiştin.,-Wê xwe bi "Serdemê" û "Cîhanîyê" ve date biserûştîkirin û wê li ser pêşkevtina Cîhana Nuh de "Bi xwendina aburî" ve date bilêvenerandin-. Herwehajî ew bi karîna xwe ve ji bona pêşkevtinê û xwe ligorkirinê li gora canê pevdarîya sîyasîyi zalî civakî de tête bidîtin. Herwehajî ew bi karîneke pir mezin ve ji bona bikaranîna dam û destgehên ragiyandinan nala rojnametîyê, radyo û telivizyonan tête biderkevtin[1].

"Dubistana Analî" ji dema pêkhatina xwe ji sala 1929 de dikarîbû xwe bi bê perçekirinê ve tanî niha jî tevî li binguhênhevkevtina şapên wêyî hundurû jî de bide biparstin. Vê jî jiber vekirina remanî û civakîya wêna û herwehajî karîbûna wêna ji bona liberkevtina her tiştekî hêja ji bona peşkevtinê jê re date biyarîkirin. Wer bi vî rengê hanê ve "Dubistana Mêjûwa Nuh" bi xwedanîya mêjûwa xweyî taybetî ve hate bikirin. Merov dikare têde çend pêlan bi rengekî nêzîkî û tevayî ve -jiber tevlihevbûna beran de-bide bidîtin.

- Pêla Pêşî nala pêla Danînvanan yanjî Bavan -Losyen Febver û Mark Blox- tête bidîtin. Ji bona van danînvanan dîtineke wanî giştî û tevayî ji bona mêjûwê dihate bidîtin. Wan ev zanistîya hanê nala kirdarekî "Fêderalî" -Hevgirtî dane bikirin, ku ew di bin ala wê de zanistîyên civakîyî din mîna ciyografîya merovanî û bihevkêrkirina wê ligel serûstîyê û zanistîya civakî de bidin bicivandin, mîna ku evaya ji bal E. Durkheim -Durhayim -1858-1917, Cñarls Blondel -Çarls Blondil û L. Lovy-Bruhl de, -yê ku ew ji Dostên Febver dihate biderkevtin-hatîye bihiştin. Wisa di vê pêla hanê de "Histoire des mentaliés" -zanistîya rewanşinasîyê di nava warên zanistîyên dinî hemsayî de mîna zanistîya êtnologî û nemaze Psychologie hate biderkevtin û

[1]Ji xwe re li nivîsta François Dosse: L'histoire en miettes" -Mêjû di Pirtbûna xwe de, bi zimanê Firensî ve, Paris sala 1987 de, ji r. 249 û Paş de bidin bitemaşekirin. Isme Şerîf Wanlî

bipêşvekevtin. yên ku berê tu girêdana wan ligel zanistîya mêjûwê de nidihatin bidîtin.

- Pêla duwem ji sala 1950 tanî sala 1972 de têtê bidirêjkirin. Ev bi pêla "Pîrîtîya" Braudol -Brodol ve li ser Dubistanê de têtê biderkevtin. Ew bêtir bi vejandî ve ji bona têgihiştinên bi serên xwe ve ji bona mêjûwê têtê biderkevtin û ew xwe bi bêtir jî ve di nava hundurên "Demê" de û di lêvenerandina têgihiştin û rengên wî de dide bifirandin. Ew xwe bêtir bi mêja Merov ve ligel rîş û rîçalên zemînî û jîyana çeman ve dide bigirêdan. Pêrejî di heman katî jî de ew xwe bêtir bi "Cîhanî" ve dide bidanîn. Wî ji warên "Dubistana Analî" Imperatorîyeke Cîhanî date bidurustkirin. Ji bona Braudol -Brodol têgihiştina "Dema Hêdî" û "Dema Dûr" têtin bivegerandin. Herwehajî ji bona pêla wî girêdana li ser "Mêjûwa Aburî" û pêwendîyên "Rojhilat ligel Rojava" de û "Jor ligel Jêr de" têtê bidîtin. Herwehajî di vê pêlê jî de zanistîya "Statistiques" -Amarî û zanistîya "Démographie" -Tudeyî û rêyên wê di hejmar û jimargaryê de ji bona bin perê zanistîya mêjûyî hate bikevtin. Wisajî ji bona vê pêla hanê jî vejandina zanistîya "Anthropologie histoirique" enterpologîyî mêjûyî ligel zayîna Netewe û Dewletên nuh de di nava Kolonîyan de têtê bivegerandin. Belam cîhanîkirina wêna û derkevtina wêna ew ji bona hoyên Navdewletî, jiber dana piştî "Yalta", "Potsdam" û "Marşalpilana" Emerîkî ji bona derxistina Ewropa Rojavayî ji wêranîyên cengê û jiber dana Cenga Sar di navbera Yekitîya Sovyêtî û Yekîtîya Dewletên Emerikî de û jiber destpêkirina zalbûna aburîyî Emerîkî li seranser cîhanê de têtê bivegerandin.

- Pêla sêyem ne bi rûwên diyarî ve têtê biderkevtin; jiber ku rû û mêldarîyên wê pirî pir têtin bidîtin. Dibe, ku ji giringtirîn rûwê wê rûwê E. Le Roy Ladurie bête bidîtin. Wî di peyivandina xweyî vekirinê de di mêjûwa 30. 11. 1973 de di "Collige de France" - Kolicê Firensî de di ja wergirtina wîyî cihê Brodol de, -yên ku ew cihên zanistîyê û avrùbûnê ne û ew ji bal Dewletê de ji bona Zanistvanên xweyî gewre didin bidiyarîkirin-, bi dirêjî ve li ser "Mêjûwa Rawestyayî" -Histoire immobile -Mêjûwa Nelivandî- de date biaxivtin. Ev ne nuh bû; jiber ku ew bi "Pîrê" Dîtina "Binîtîyê di

Mêjûwê de" -Structralisme- û Hîmvanê "Dîtina Tirazûkirina Binîtîyê di Mêjûwê de" di pêşvekevtina civakîyî hêdîyî jiber xwe ve -idéologie de l' équilibre- tête bidîtin. Ew vî bi liberkevtina Tirazûkirinê -équilibre- ve tête biliberkevtin, heger jî ku ew ji ber xwe jî -Tirazûkirina Livandanan- bête bikirin. Ev bi xwe jî ve dide biderxistin, ku -Immobililisme- -rawestayîbûn ango nelivandî bes û bi tenha ve hêdî hêdî û bi dûrbûna demê ve tête biderkevtin. Em dizanin, ku Merov bi lihevhatî ve ligel serûştîyê de û bi "Tirazûkirineke hêdîyî livandî ve", ya ku ew bi heyaman ve tête bipîvandin, tête bijîyandin. Ji bona nimûne "Mêjûwa Genim" çandinîya wîna û şêweyên berkirin û firoştina wîna. Nimûneyeke din ji nava sedên din mîna mêjûwa "Avdanîyê", mêjûwa "Hişkbûnê", mêjûwa çûn û hatinên deryayî. Ev mêjûwên hanê mêjûwên "Qatên Binîtî" ne, yên ku ew bi heyaman ve û ne bi jîna Merov û salan ve tête bipîvandin. Ev dîtina hanê, -Feylesuf Ogost Kont li ser endaziya zansitîya civakî de di pêşî de date bidestpêkirin -bi dijî diyaliktikê ve tête biderkevtin, ya ku ew pêşkevtina merovanîyê di "Şûreşên" Baştîîyî bi lez ve dide biliberxistin, -mîna ku ev li nik Hegel -Hêgil- û bi taybetî ve ev di "Matiryalîya" Markisîyê de tête bidîtin.

Ew dide bidubarekirin, ku "Pêşvekevtina hêdî ji bona Binîtîya Civakî" ji ber xwe ve û bi rengekî serûştî ve tête bikirin. Civak xwe bi xwe ve di bin kêra bijartîvanên siyasî û remanî de dide bibaşkirin, yên ku ew di nava wê de têtin biberzkirin; jiber vê jî hîç bangkirin ji bona "Şûreşên Civakî" pêwistî pê nayête bikirin û ji wan re jî ne cih û nejî divabûn tête bidîtin; lêbelê ew bes û bi tenha xwe ve vegêrkirinên "ne Serûştî" didin bipeydakirin, yên ku ew ber bi Diktatorîyî û Totalitariyê ve didin birakişandin.

E. Le Roy Ladurie di "Mêjûwa Jîyana Mala Cotkarî de di Sedsalên Navînî de" Karnas bû. Dibe, ku parastina vê mala hanê bi rabûn û rûniştinên xweyî civakî ve date bihiştin, ku ew vê dîtina hanê bide bipeydakirin. Ev rabûn û rûniştinên hanê nayêtin biguhertin û ew li ser wan de di şêweyên berkirina çandinyê de didin biçûyîn û nifş li dû nifşekî din de û ji heyamekî ji bona heyamên din ji xwe re didin biwergirtin, -mîna ku ev li welatên din de nala li Çîn û Rojhilata Navînî de- ligel dorhêla ciyografî de têtin bilihevkirin û dem têde bi

heyamên ciyologî ve têtin bipîvandin. Di vê dîtina hanê de timbûna Dubistana Analî têtе bidîtin; jiber ku Mêjvûanê binavkirî dîtina xwe li ser têgihiştina "Dema Hêdî" de date biavakirin, ya ku Brodol ew ji lênerîna xwe derbarê şehristanîya derya Sipîyî Navînî de, ji mêjûwa Firensa bi xwe jî ve, ji herem û deştên wêyî cuda û jîyana Tûde li ser kenarên cemên wê de date biderxistin.

Di vê lênerîna ji bona mêjûwê de "li ser Dema Dûr de" "Rûdan", ceng û vîlikên Şahneşînîyê û "Rûdanên salan" giringbûna xwe didin biwindakirin û ew bi hîc û pûç ve têtin biderkevtin. Wisa "Tîrbûna" demê bi hersê dûrbûnên xwe ve têtin bidîtin, mîna ku Brodol ji xwe re li: "Dema Kurt", "Dema Hêdî" û "Li ser Dema Dûr de" lê dida bitemaşekirin. Ladurie-Laduri bi ser van ve têgihiştina "Dema Rawestyayî" ...-yanjî Bigir- datebi vekirin.

- Ji Bangvanên "Dîtina Tirazûkirina Binîtîyê" û Hevalekî Ladurî di -Structuralisme- de divê Mero F. Furet bide bibîrxistin, yê ku wî dayite bigotin: "ku Şûreşa Firensî hate bipayînîkirin"[1]. Ji bona çî?

F. Furet di nava Şûreş Firensî de du pêlan ji hev dide biderxistin. Ew pêla yekem ji sala 1789 tanî payîza sala 1791 de dide bidîtin, ya ku ew wê bi aanê "Avanîkirina başî ve" dide bidanîn; jiber ku têde di nava civatê de çînîya Xanedanan, wênerên Kenişte, wênerên tevaya Milet -ji Borcuwazîya û Çînîyên Gelêrî- dihatin bidîtin[2]. Ew hemû bi hev re li ser yek armancê de dihatin bigihaştin. Ew jî ev bû, ku ew Padîşahîya Biserêxwe ve bi aşîtî ve bi Padîşahîyeke Desturî ve li ser şêweyê Ingilizî de bidin biveguhertin.

[1]Ji xwe re li nivîsta bi zimanê Firensî ve: F. Furet "Penser la evorution française" - remankirina derbarê Şûreşa Firensî de, Paris 1978 de bidin bitemaşekirin. Herwehajî vî Danervanê hanê jî nivîsteke din li ser Şûreşê de bi hevkarîya D. Richet -Rişet ve di bin navnîşana. "Şûreşa Firensî de, Paris 1973 de date binivîsandin. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ev parvekirina hanêyî sê qolî wer bi carekê ve li ser Civata Welatî de ligel wan çînîyan de nayête bisuwarkirin; jiber ku hinek ji Xanedanan bi remanên xwe ve ligel "Tevaya Milet" dihatin bidîtin û ew ligel rêzên wan de di Civatê de dihatin birûniştin û wan nala Borcuwazîyê jiber hoyên remannî ve ligel wan de didan bidengdan. Hevalbendên "Tevaya Milet" bi rastî ve bes û bi tenha ve -bi bê karan ve- ji Borcuwazîyê dihatin bipêkhatin. Ismet Şerîf Wanlî

Li paş de pevçûnê di navbera "Les Girodins[1]", yên ku ew "ji Xortên Çakkirvanan bûn" û li ser serên wan de Danton dihate bidîtin û "Les Montagnards"[2] -Çiyayîyan de, yên ku ew ji "Çepên Tûndrê" de dihatin bidîtin û yên ku li ser serên wan de Robespierre -Robespîr dihate dîtin, hate bidestpêkirin. -peyvên "Çep" û "Rast" ji Şûreşa Firensî hatin biderkevtin-[3].

di 2 axlêva sala 1793 de Girodins pevçûn dane biwindakirin; jiber ku Les Montagnards -Çiyayîyan kêşa nava civatê ji bona nava çarçiyên giştî dane biavêtin. Wan "Şîvan û Gavanên Lewçedar" ji nava "Taxên Gelêrî" dane bianîn, da ku ew pê li ser civatê de bidin bigivaştîkirin. Bi saya serên vanan ve Robispîr "Pêla Sawê" date bidazanîn. Ev bi xwe jî ve bi "Hêla Hovîtîyê" û "Totalîrîtîyê" ve tête biderkevtin û ew di kar û barên xwe de "ji kar û barên Stalin û Hitler nayête bicudakirin".

Li paş şûreşê de Mêjûvanên pêla Komarîyî pêşî hatin bidîtin, ji yên ku ew ji xwedanvanên "Hişîtîya Yakobînî" -"Les Jacobins" bûn[4]. Wan rudanên şûreşê di pêla sawê de dane bixemilandin û "wan Mêtêlogîya Şûreşê dane buafirandin". Di vî warê hanê de F. Furet ji

[1]Ew bi Gronde -Girondînî ve hatin binavkirin, ya ku ew heremeke ciyografîyî Serpereştî Firensî di pêla Padîşahîyê de li ser kenarê Zerya Etlesî de tête kevtin û navînîya wêna bajarê Bordo bû. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ew bi çiyayî ve di nava Civata Welatî de hatin binavkirin, jiber ku ew têde li ser depên jorî de dihatin birûniştin. Ismet Şerîf Wanlî

[3]Peyvên "Çep", Navîn" û "Rast" bi têgihiştina siyasî ve di vê serdema me de di nava welatên cudan de ji şûreşa Firensî hatine bigihandin; jiber ku tûndrêyên Wênervanên. Civata Welatî li rexê Çepî holê de dihatin birûniştin, Xanedanên Xweparêzvan li rexê Rastî holê de dihatin birûniştin û Peyên Kenîştê li Navîna holê de dihatin birûniştin. Ismet Şerîf Wanlî

[4]"Yagobî" di Şûreşa Firensî de Endamên Baregeha Remangirên Tûndrêyî bûn. Di nava wan jî de Robispîr dihate bidîtin. Ew di nava Hola Perest Jacob -Yagob- de ji bona giftûgokirinê dihatin bikomkirin; jiber vêjî di payînê de gotina "Yagobî" di zimanê Firensî de tanî nihajî ji bona "Remana Komarîyî Çepîyî Zanistî" tête biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

bîr û bawerîya Mêjûvanê Ingilizî A. Cobban -Koban nayête bicudakirin, yê ku der sala 1955 de nivîstek li ser "Mêtêlogîya" Şûreşa Firensî de date binivîsandin. -Mêtêlogî bi liberkevtina çîrok û çîvanokên pir çirandî ve tête biliberkevtin, yên ku ew di nava xwe de bi nigaşên çînîyên gelêrî ve didin biçirandin û ew rûdanên nava xwe nala evsanan didin biderxistin-.

Herwehajî Furet di rexnegirtina xwe de ji bona şûreşa 1789 de hêjabûna xwe ji bona "Şûreşa Aşîtî" dide biderxsitin, ya ku ew der Firensa de di "Pêla Şiyarvanan" de di nîvî sedsalê heştdehan de hate bikirin. Wê wirde wirde nimûneyên -osamose- di navbera "Xanedanên Jîr" û "Bircuwazîyên Zenevan" de date bidîtin, yên ku wan ji bona pêşkevtinên civakî "bêpevçûn" dane bikirin; di gava ku sermeyedarî "bêpevçûnên Çînyîtî" de dihate bipêşveketvtin û bêyî ku "Cemawerên Gelêrî di çûna wê de bidin bidestdirêjkirin; jiber ku bi diyarî ve dihate biderkevtin, heger ku ew destdirêjîyê di nava wê de bidin bikirin, dê ew ji bona kevneperestîyê bide bibirin". Wisa bi vî rengê hanê ve beramber bi zînetên sala 1789 de dikarîbûn bihata bikirin "ku bûyîna şûreşa 1789 jî de ji bona berjewendîya Firensa dikarîbû bihata neyête bikirin". Belam em dizanin, "ku Destdirêjîya Çînîyên Gelêrî ji bona nava Şûreşa" sala 1879 de date bikirin, ku "Firensa ji bona wî binî bête bişemitandin, yê ku wî di payînî de ew ji bona cengên parzemîna Ewropî di bin Serdarîkirina Imperatorîya Napolyon de li ser kîsê aburîya wê de date birakişandin".

Herwehajî "Zalkirina Sawa Remanî û Diktatorî jî ew bi xwe jî ve ji Serûştîya Sernixûnkirên Şûreşî têtin biderkevtin". Di vir de P. Chaonu -Çonu ji Hevalê xweyî Furet nayête bicudakirin.

Remanên Furet di vê danava hanê de bi rastî ve ne nuhin; jiber ku azadîxwazîyê ji berê de û niha jî de pir caran wê dujminatîya xwe beramber bi remanên şûreşgêrîyî Yagobînî ve daye biderxistin.

Heger hêjabûnên Şûreşa Firensîyî Bilind bes û bi tenha ve "Mêtêlogî bin û ew ji hûnandinên Nigaşîyî Gelêrî bin", magelo emê dê çawan bikaribin van hêjabûnan bidin biliberxistin, yên ku şûreşê ew ji bona tevaya Ewropa û Dunyayê dane binîşankirin? Magelo Peyan û Jinan, yên ku wan Şûreşa Firensî dane bidurustkirin, ji Mezin û Biçûkan, ji Feylsufan, ji Serdarên Supah û Siyasîmedaran, ji Karkeran û Bazirganan bi Pêyvên "Azadîyê, Wekhevbûnê",

"Dadwerîyê" û "Nêşînvanîyê" ve di Civatan, Baregehan û Çarçîyan de û li ser Qadên Şer de nedidan bibangkirin?

Hegerjî ev gotinên hanê jî di van rojên me jî de di tevaya destûran de têtin bitomarkirin; belam pir kêm jî ji bona wan rêz têtin bigirtin, magelo evaya dide biderxistin, ku ew bê kêr di afirandina tevgeran û çûna mirovanîyê de hatine bimayîn? Franso Doss -Dos rexne li remanê Furet û Chaunu -Çonu de dide bigirtin û ew dide bigotin: "Na, Şûreşa Firensî nehatîye bimirin".

- Di pêla Mark Blox, Lusyen, Febver Fernan Brodol de -Dubistana Analî- li ser vê dîtîna gîştî de ji bona liberkevtina pêşvekevtina merovanyê de date biparastin. Li paş de -Mmjû- ji bona "Mêjûwan" -di berhevbûn û tîpên biçûk de- hate bipeqandin. Hoyên vê peqandina hanê ji bona "part û pirtan" ji bona mêldarîya Dubistaneyî firehbûnê û xweavêtina wêna ji bona nava tevaya berên zanistîyên merovanîyê û girêdana wan beran bi hev re tête bivegerandin. Vêna ji bona "Endazîya" têgihiştina zeman, windakirina xêza wîna û guhpêdana bi diyarî û rûdanên merovanîyê ji rewanî, civakî û aburî ve bi rengekî bi serê xwe ve û bi tenha xwe ve û bi bê hîç dîtineke giştî ve date bikirin.

Wetov Mêjûvan dev ji pêrabûna liberxistina mêjê date biberdan. Herwehajî "Mêjûvanê Analî" bi xwe jî ve dev ji rola xwe nala Liberxwedanvanekî ji bona hêjabûnên nimûnetî û remanî date biberdan, yên ku ew ji bal pêşvekevtinên civakîyên Ewropîyî Rojava de hatibûn bizayîn. -Ji wan jî têgihiştinên "Azadîyê", "Wekhebûnê" û "Biratîyê" têtin bidîtin-. Beramberî "pertbûna" tîştan û "bisrêxwebûna" danavan ji bona Mêjûvanê Analî, yên ku ew ji bal wî de dihatin bixwendekarîkirin, ligel vekirina remana wêna ji bona warên nuh û şehristanîyên din de, yên ku tanî radeyekî di hêjabûnên xwe de ji hêjabûnên şehristanîyî Ewropî têtîn bicudakirin, wî dev ji liberxwedanîya hêjabûnên wanî nimûnetî date biberdan.

Ev bi pêşkevtina hanê ve di -Dubistana Analî- de bi "Rupture" -Şikenandinê ve di xêza Mark Blox û Febver de tête bidîtin, ya ku wan ji bona "Dîtina Tevayî" ji bona mêja mêjûwê dabûn bidan

- Warê ku Mêjûvan têtê dida bikarin, ew bi warê "Dubistana Demîyî Yekî" ve têtê biderkevtin, ango bê ka çend dem di mêjûwa

merovanîyê de hatîye biderbasbûn. Nifşê duwem ji "Analîyan" dest bi parvekirina mêjê ve bi yekitîya wîyî demî ve dane bikirin, ne ku wan ew bes ji bona demên cuda di dirêjbûn û tîrbûna wî de dane biparvekirin, lêbelê ji wan ew ji bona "Başbûnên Demî" dane biparvekirin, yên ku ew di jimartina xwe de di pêşveçûnê de ligel hevdû de têtin bidîtin. Bingehvanê vê dîtina hanê di Dubistana Analî de ew Mêjvûvanê Michel Foucault -Mişêl Focolt tête bidîtin, yê ku wî ew dîtina hanê di nivîsta xwe de di bin navnîşana "Arkiyologîya Zanebûnê" de -bi têgihiştina avanîya zanebûnê ve- date biliberxistin. Ew der sala 1969 de hate biderkevtin[1]. Herwehajî ew dîtina hanê di nava nivîstên wîyî din jî de û ji wan jî "Gotinan û Tîştan[2]", "Mêjû û Mêjûwan[3]" tête bidîtin.

Dibe, ku bi baştir ve bête bidîn, ku em bi nivîsta "Gotinan û Tiştan" ve bidin bidestpêkirin; jiber ku ew berî "Avanîya Zanebûnê" hatîye biderkevtin û têde Foucault -Fokolt têgihiştina yekitîya demê "dide biwêrankirin" û ew wê ji bona "Deman" beramber bi danavên nîşankirî ve dide biveguhertin, ku gotin ji wan re didin binîşandan, bi liberkevtina ku ew têde "Deman" ango mêjûwên tiştên nîşankirî dide bixwendekarîkirin, yên ku ew hîç pêwendîyan ligel hevdû de nadin biderxistin. Ji van jî "Mêjûwa Nexweşxanan", "Mêjûwa Dînîtîyê", "Mêjûwa Zindanîtîyê" û "Mêjûwa Ganê" -Pêwendîyên Ganê- têtin bidîtin. Wisa bi vî rengê hanê ve têgihiştineke nuh ji bona mejûwê tête biderkevtin, ya ku ew bi "Histoire sérielle" -mêjûwa zincîrî ve û ne bi

---

[1]JI xwe re li nivîsta wî bi zimanê Firensî ve Michel Foucault: "L'Archéologie du savoirr" Paris 1969 bidin bitemaşekirin. -Navê Danervan bi zimanê Firensî ve Foucault -Fokolt tête binivîsandin, belam ew bi Fokd tête bixwendin-.Ismet Şerîf Wanlî

[2]Nivîsta wî bi zimanê Firensî ve: "Les mots et les choses", Paris, 1966 hatîye biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

[3]Nivîsta wî di Zanistgehê de di 17 tîrmeha sala 1969 de bi zimanê Firensi ve di bin navnîşana: "Histoire et histoirie" hatîye bipeyvdarîkirin. Ismet Şerif Wanlî

bereberevebûna heyamên merovanîyê ve bi yekitîya wêyî demê ve tête binavkirin. Ew bi liberkevtina parvekirina mêjûwê ve ji bona beşên wêyî Baştî û Zincîrên wêyî Şaqolî ji bona her Zincîrekê, ya ku ew bi daneveke taybetî ve û bi gotina "Zincîrî" ve ji "série-Folge-Baureihe" - zincîrê tête bigirêdan, tête biderkevtin. Belam ez bi başî ve vê têgihiştina "série- Folge- Baureihe" didim bidîtin, ku ez vê gotinê bi "Mêjûwa Başîtîyê" ve ji dêlva "Mêjûwa Zincîrî" ve bidim biwergerandin; jiber ku ew bi nêzîktir ve ji liberkevtina mebestkirî di zimanên din de tête biderkevtin.

Di pêşgotina "Avanîya Zanebûnê" de Fokolt rexne li "Mêjûbûna" Mêjûvanê xweparêzî û mêldarîya wîyî "Tevayî" ji bona mejûwê bi "Totalité" -bi carekê ve dide bigirtin. Evaya bi xwe jî ve ji bona "lêkolandinê li ser lidûhevdûbûna demê de dide bibirin, ya ku jê re ew ne cih û nejî destpêkirinê ji bona remana bi rêk û pêkxistina tiştan li gora dema wan de berî ezmonkirina wan dide bihiştin". Wer bi vî rngê hanê ve "Mêjû ne mîna liduhevdûbûna pêşkevtina merovanîyê tête bidîtin. Pêşvekevtin bi têgihiştinekê ve tête biderkevtin, ya ku ew ji zanistîya Biologie -jînê ve hatîye biwergirtin û ew ne bi liduhevbûna pêkşevtinê ve, ya ku ew bi têgihiştina sincî û c··ȧkî ve tête biderkevtin. Lêbelê mêjû bi xwe ve ew bi lêvenerandina veguhertinên pir ve ji bona tiştan tête biderkevtin".

Ne ji kar û barên Mêjûvan têtin biderkevtin, ku ew ji bona "Hoyên" pêşkevtinê û veguhertinên tevaya dema mêj bide bilêgerandin. Merov dide bizanîn, ku ji bona veguhertina her tiştekî û her danevekî hoyên wî taybetî têtin bidîtin; herwehajî "Merov ne ji bona hoyekî zalkiriyî bi serêxwe ve têbe bikirin û li ser Mêjûvan de nayête bidivakirin, ku ew ji bona wî lê bête bigerandin". Wer bi vî rengê hanê ve remana Foucaolt -Fokolt ji bona xwendekarîya mêjûwê ji bona parvekirina rastîya merovanîyê ji bona "Beşên" pirî ji hev azad, ango ew ji bona "Séris" -zincîran li gora tiştan de têtin parevekirin, yên ku ew danava lêkolandinê didin dbierxistin û ji boma her yekê ji wan hoyên wanî taybetî di vegûhertinê de têtin bidîtin û ew ne ji bona tevayê ango navînîyekî têtin bivegerandin, yên ku ew pê têtin birêxistin. Lêbelê -tevayî ji zincîrên "Schicten -strates" -Klassen - Çînîyên nala qatên ciyologî têtin bipêkhatin. Ji vê tête biencamkirin, ku "Mêjû" ango "Başîtî-Corî-" nala mêjûwa "Pesindanîyê" têt

biderkevtin, ya ku ew tiştan -her tiştekî biserêxwe ve dide bipesindan, bêyî ku di navbera wan de bestîyek bête bidîtin yanjî tevayîyek ji bona liberxistina wan tête bidîtin. Evaya bi xwejî ve nala vegerandinekê ber bi paş ve tête bidîtin; tevî ku wî jî ji xwe re peyvên jimargarîyê û zanistîyên serûştî jî dane biwergirtin, da ku ew bi wan ve dîtina xwe bide bidiyarîkirin. Ji van peyvan jî "Zincîrî", "strates" -Çînî, "Werz", "Gewde", "Tevayek", "Bestî" û "Veguhertin" têtin bidîn. - Wî ev bûjenên hanê ji bona "Avanîkirina" "Avanîya Zanebûnê" dane bikaranîn[1].

Boyaxeke zanistî bi ser van têgihiştinên hanê ve hate bivedan; jiber ku Foucaolt -Fokolt û Peyên xwe û ji wan jî K. Pomyan, J. Revel û Michel de Certeau -Mişêl dê Sêrto ev têgihiştinên hanê bi jimartîyê ve ji rexê girngbûna wêyî çendbûnê û bûyînên wan di danaveke nîşankirî de dane bipîvandin û wan ev jî li ser zanistîya "Mêjûwa Aburî", "Mêjûwa Rewanîyan", "Mêjûwa Rewanîya Civakî" û "Dildarîyê" de date bicîanîn. Wan ew hemû agehdarîyên civandî di nava "Hişîtîya Elektronikî" de, -ya ku ew bi zimanê Firensî ve ordinateur û bi zimanê Ingilîzî ve Computer tête bigotin-, hatin bihilanîn. Wan ev destgehê hanê ji dêlva Hişê Merovanî dane bikirin; jiber ku ew dikare ji bona nava qolbûna tiştan bête biçûyîn û wan li ser bingehê sewda de bi hev re bide bigirêdan. Wisa bi vî rengê hanê ve zanistîya "Mêjûwa Çendbûnê", -ji çendbûnekê ya ku ew dikare bête bijimartin-, hate bizayîn.

Li paş de Le Roy Ladurie mîna hevalbendekî ji bona vê Dubistana "Zincîrî" hate biderkevtin; jiber ku wî ew li ser şêweyê Emerîkî de di lêgerandina mêjûwê de date bigirtin. Ev şêweyê hanê bi rengekî giştî ve dide bikirin, "ku Mêjûvan nala Karkerên Menceman ji bona nava binê erdê -nava binê tiştan- têtin bidakevtin, da ku ew bûjenên xam -agehdarîyên perçeyî- jê bidin biderxistin û ew wan ji bona Karnasên zanistîya aburî yanjî zanistîya avûba bidin

[1]Min gotina "struckturalisme" -Strukturalismus- bi gotina "Binîtîyê" ji "Binêbûnê" û ne ji gotina "Çînîtîyê" ve dayite biwergerandin, da ku ji mînabûna çînîyên civakî bête bivegirtin; tevî ku em dizanin, ku "Binîtîya" mebestkirî di vê dîtina hanê de bi gelekî ve ew bi tevayîtirî ve ji "Çînîtîyê" bi liberkevtina wêyî nasînîyî civakî ve tête biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

bipêşkeşkirin, da ku ew Karnasên hanê wan derxistinên pêşkeşkirinên wan ji bona lêkolandinên xwe bidin bikaranîn. Tibabên genim bi giranîyê yanjî bi qewarê ve têtin bipîvandin. Wehajî hatina gotinekê di komekê de ji nivîsan yanjî di nivîstekê de Merov dikare bide biamarkirin. Ev jî dide bihiştin, ku Mêjûvan yanjî Karnas -di zanistîya aburî yanjî Mêtêlogî de yanjî di zanistîya Rewanşinasîyê de yanjî di zanistîya civakî de- dikarin "Hişê Elektronî" di raxistina tîştan û diyaran de di tebabîyên wan de bidin bikaranîn.

Bikaranîn "Hişê Elektronî" di tomarkirina dubarebûna "Diyarên Başîtî" de di warekî de ew pişta xwe bi pêleke dirêj ve dide bigirêdan,-ya ku ew ligel dîtina Le Roy Ladurie di "Mêjûa Binitîyê" de tête bilihevkirin. Belam dibe, ku ev piştgirêdana hanê li ser vî destgehî de ji bona encamên ne li serx we de bide bibirin, ku hîç pêwendîyên wan ligel rastîyên mêjûyîyî tevlihev de neyên bidîtin. Li gora bawerîya G. Duby mêjûwa tibabî di rêya destgehê Elektronîkî de bes û bi tenha ve di diyarîya xwe de bi "Zanistî" ve tête bidîtin.

Hinan vegerandina hinên Analîyan ji bona "Dubistana Pesinandinê" ji bona tiştên "bi serên xwe ve" û nayînkirina wan ji bona liberxistina hoyên pêşkevtina tiştan bi "néopositivisme" - Dubistana Başbûnêyî Nuh ve- dane binavkirin. Belam ne tim nav navrokê didin biderxistin. G. Duby û Le roy Ladurie nivîstek li ser "Mêjûwa Firensa" de dane bibelavkirin. Wan têde li ser pirsiyarên siyasî de dane bigirêdan. Evaya dide binîşandan, ku li nik Analîyan de dudilî ji bona helbijartina vê rêya hanê di niha de tête biderkevtin.

- Dibe, ku bi seyr ve bête bidîtin, ku peyvîn li ser "Tengavîya" zanistîya mêjûwê de li Firensa de bête bikirin, di gava ku "berkirin" di vî warê hanê de bi berzbûna xwe ve hatîye bigihaştin û gelemperîya Xelkê û Zanevanên wê di nava Xwendevanên wê de têtin bidîtin. Ji diyarên vê tengavîya hanê, ya ku ew ji destpêkirina şêstan dayite budestpkirin, -yên ku ew ne bi neçarî ve ji encamên gewrebûna "Dubistana Analî" û dîtinên wê ve têtin bidîtin-. Dibe, ku bi başî ve bête bidîtin, ku Merov li vanên jîrîyên tên ji xwe re bide bitemaşekirin:

Tengavîyek di fêrkirina mêjûwê de di nava Dubistanan de û li

ser tevaya berzbûnan de tête bidîtin. Magelo çi divê di armanca fêrkirina mêjûwê de bête bidîtin? Magel divê ku ew ji bona şînkirinna xurtkirina karîna rexnekirinê bête bidîtin yanjî divê ku ew ji bona pêkanîna bîr û awerîya giştî bête bidîtin?. Da ku ew hestê beramber bi Netewe ve bide bişînkirin yanjî da ku ew erkê beramber bi Dewletê û civakê ve bide bişînkirin? Li tevaya Ewropa Rojava de hesta welatî li nik Xortan de bi çilmisandina xwe ve dayite bidestpêkirin.

Neqişkirina bernameyên fêrkirinê di Firensa de ji bona Sindikatên Mamostên Zanistgehan û Mamostan hatine bihiştin, yên ku ew di piranîya xwe de di berên xwe de Sosyalistî û Zanistvanî têtin bidîtin, -hegerjî ku ew ne Yakobînî jî bêtin bidîtin-. Wer hate dîtin, ku nifşê nuhî Xortan li Firensa de bigir mêjûwa welatê xwe nema dide binaskirin; jiber ku nivîstên mêjûyîyî reweştî bi mêjûwên xwe ve û bi parvekirina xwe ve ji bona pêlên li dûhevdûyî diyar de -bi hoyên Gewrebûnên "Rûdanên" mêjûyî de- bi nivîstên din ve hatin biveguhertin, yên ku ew ji her Chronologie -ango ji her nîşankirin û hatina demê- di bîrxistina rûdanan de hatine biboşkirin, yên ku jiberkirina wan nayête bikirin. Ev jî di bin kêra Dubistana Analî de di "Cenga" wê de hate bidîtin, ya ku pêla wêna ji sîyan de -dijî Dibusta Başitîyî rûdanîyî hate bidawîkirin. Ji nava bernameyên fêrkirinê lêkolandina cengan û ji wan jî Cenga Cîhanîyî Duwem jî hate bihilanîn!! Ji dêlva wan ve bi nivîstan ve hatin biveguhertin, ji yên ku ew li ser bingehên danavan de têtin birabûn, -yê ku her danevek bi ser xwe ve û di cîhana xwe de azad tête bidîtin-. Ev jî Merov dikara wî bi navê "histoire thématique" -ji théme, Thma-Mêjûwa Başitîyê- ve bide binavkirin, yanjî ew li ser bingehên "Şapên Cîhanî" de têtin birabûn, ji yên ku ew ji bal Brodol ji rengê "Avakirina Cîhana Nuh", "pêwendîyên Rojhilat ligel Rojava de, Jorîn ligel Jêrîn de", "Pêşvekevtina Aburîya Cîhanî", "Civatên Azadîxwazên Rojavayî", Cîhana Sosyalistîyê, " Welatên Cihana Sêyem", "Pêwendîyên Rê û Banan", "Zannistiyê", "Oldarî", "Rêxistinên Navdewletî" û

"Firensa li paş Cengê de" hate bidîtin. Belam mêjûwên herdu Cengên Cîhanî, Mêjûwa Napolyon û Mêjûwa Şureşa Firensî di nava binê nivîstxanan de têtin bihiştin.

Rûdanên jêrbûnê di berzbûna zanebûna mêjûyî de li nik nifşê Firensîyî nûhatî de bi serhatiyên wî di warê zanebûna wî de der zimanê welatê wî de dide bibîrxistin. Ji gava ku Sundikatên Mamostan nivîstên rêzimanên firensîyî reweştî, yên ku Merov divabû wan jiber ve bide bikirin, bi emrazên Bihistinê-Dîtinê ve dane biveguhertin, -ji yên ku ew bi Guh ve yanjî bi Çav ve li ser perdê audio - visuel têtin bihîstin yanjî têtin bidîtin-. Di encambûna vê de Xortên Firensî bi giştî ve nema nivîsandina zimanê xwe didatin bizanîn û ew tûşî heleyên rêzimanîyî şermezarî dibûn.

Li gora mêldarîya Dubistana Analîyî "Impiryalî" de fêrkirina "Mêjûwa Wêje" bi mêjû ve hate bivegirêdan, ya ku ew berê ligel fêrkirina ziman de dihate bifêrkirin. Wehajî ev jî ligel "Mêjûwa Hunerên Sipehîbûnê" jî de hate bikirin, ya ku wê berê pirtek ji hînkirina huneran didate bipêkanîn. Jiber ku Analîyan guh bi jîna Peyên huner û wêje ve pê nedida bidan û herwehajî wan guh bi hemû vegirêdanên -biographie- jîna Peyan ve nedidan bidan; tevaya wan herdu beran di Dibustanên Debîrstanî de hatin biherifandin.

Metirsî hate bidîtin, ku hînkirina mêjûwê berebere di Dubustanan de bête biwindakirin û ev jî bi serê wê ve bête bikirin, mîna ku ev bi serê zanistîya ciyografî ve hate bikirin; - jiber berên wê di navbera zanistiyên serûştî û aburîya siyasî de hatin biparvekirin.

Tiştên lijorhatî bi taybetî ve ew bi bernameyên fêrkirina Debîristanê ve têtin bigirêdan; jiber ku fêrkirina bilind tanî radeyekî li ser binavbûna xwe de dayite biparastin. Belam Zanistgehên Firensî hêjî ew di nava lepên Dewletê û Serpereştîya wêyî Navînî de têtin bidîtin ew li jêr dûrbîna wêyî "Komarîyî Yakobî" û Hîşmendîya Descart -Dêkartîyî "Endazî" de têtin bidîtin. Wetov bi vî rengê hanê ve em li Parisê "Zanistgeha Parisî Jimar 1", "Jimar 2", "Jimar 3", "Jimar 4"... dibînin, yên ku ew bi jimaran ve û tanî radeyekî jî bi bernameyan ve li gora vîna Dewletê de têtin bicudakirin. Ev jî bi cudabûna Zanistgehên Emerîkîyî serbixwe ve têtin bidîtin, yên ku ji bona her yekê ji wan jî reweştên wêyî taybetî û -nerxên wêyî buha- têtin bidîtin.

Fêrkirina bilind li Firensa de bigir ew li gora bingehên demokrasîyê û dadgerîya civakî de -ji bil hin zînetên taybetî belaş tête bidîtin-. Tevlivêjî de Merov dikare vê pirsa hanê ji xwe bide bikirin: Magelo bi rastî ve dê demokratîkirina fêrkirina bilind bi vekirina wêna ve li ser jimareke pir bi hoyê kêmbûna buhayê wêna, wekhevbûna zanistgehan û dam û destgehên bilind û jêrbûna wan ji bona Navînîya Komarî de; -jiber ku Mamostên wan bi Karmendên Dewletê ve têtin bidîtin- û nebûna berberîya azad di nava wan de ji bona berzkirina endazê fêrkirinê û lêkolandina zanistî bide bibirin[1]?

Mêldarîyên bîr û baweriya giştî ji bona berkirina mêjûyî li Firensa de û herwehajî li welatên din jî de date bibirin, ji yên ku ew bi Dubistana Analî ve hatin bikêrkirin. Dibe, ku qanûna darajtinê û daxwazê xwezîya jimareke gewre ji Xwendevanan bide bitêrkirin.

Li kêleka komên nivîstên giran buha, yên ku wêne têde cihê xweyî pêşî didin biwergirtin û di nava nivîsandinên wan de rûnkirên kurt û kêm hêjabûna zanistî têtin bidîtin, -mîna ku ev di nava hin komên mêjûwa ferhengî û mêjûwa hunerî de têtin bidîtin-, hinek ji nivîstên bîrîkan di komên pir de, biçûk di qewarên xwe de, arzan di buhabûna xwe de û li ser girêdayî di nivîsta xwe de hatin biderkevtin. Ew roleke mezin di demokratîkirina zanyarîyê de bi rengekî giştî ve û di mêjûwê de bi rengekî taybetî ve di pir warên cudan de didin biderxistin, ji yên ku ew ji bal Dubistana Analî û hevalbendên wê hatin bipeydakirin[2].

---

[1]Bi nav û bangtirîn Zanîstgehên Emerîkî û bilindtirînên wan di endazîya zanistî -û buhatirînên wan- de ew bi xwe ve Zanistgehên bi serên xwe ve -mîna Haward, Kolombiya, Yale -Yêl û Kaliforniya- têtin bidîtin. Wehajî li Ingilstanê jî de -Exfort -Eksfort û Kambiric- têtin bidîtin. Zaniîtgehên Serdarîkinêyî Emerikî û Ingilîzî bi wê nav û bangbûna hanê ve nayên bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ez li vê derê de navnîşana nivîstan didim birêzkirin, ji yên ku min ew ji Komekê -yanjî Zincîrekê- ji nivîstên bîrîkên Firensî dane biderxistin. Merov dikare piranîya wan, hegerjî ne tevaya wan jî be, mîna nimûneyan ji nivîstan bide bidanin: "Mêjûwa Firensayî Gundîtî", "Mêjûwa Jîna Taybetî" -Binemalî-, "Mêjûwa Firensayî Bajartî", "Mêjûwa Kehreba", Mêjûwa Şîvên Hesinî", mêjûwa Bengan", Mêjûwa Zanistîya Hejmartîyê", Mêjûwa Siyasîya Aburî", Mêjûwa Rê û Banan", "Mêjûwa Pêşvekevtina Zarotîyê", "Mêjûwa Herifandina damaran", "Mêjûwa Zanîstîya Rewanşinasîyê li Firensa de", "Siyaset", "Mêjûwa Bikaranîna Pijişkîyê", "Mêjûwa Zayînê li Firensa de", "Mêjûwa Şêtbûnê li Firensa de", "Mêjûwa Bizavên Dijî Samîtîyê", "Qanûna Katolîkî",

"Oldarîya Yunanî", "Mêjûwa Ereb", "Quran", "Sofitî", "Remagîrîya Erebî", "Jîyana Gankirinê", "Evîndarî", "Zanîstîya Rewanşînasîyê di Canbazîyê de", "Rewanşinasî di Sincîyê de", "Xewin", "Hestakêmbûnê", "Dildarî", "Zanisîtîya Rewanşinasîyî Civakî", "Mêjûwa Şêtbûnê", "Reş li Yekîtîya Dewlewtên Emerîkî de", "Zanîstîya Civakî û Şûreşan", "Jîyana Gerministanan", "Jîyan di nava Çînê de", "Jîyan di nava Hindistanê de", "Jîyan di nava Çapan de" -werjî li Yekîtîya Sovyêt û Hinên din jî de-, "Mêrkujî", "Ciyografiya Tudeyî", "Mêjûwa Êtnologî", "Ferhengên berî Kiristov Kolombos", Ferhengên Baltîkî", "Maya", "Şêweyên Êtnologî", "Vikings", "Ferhenga Derya Navînîyî Sipî", "Fêrkirina Canbazîyê", "Mêjûwa Fêrkirinê li Firensa de", "Mêjûwa Fêrkirinê", Şêweyên zanistîya Perwedekirinê", "Qanûna Germanî", "Qanûna Çînî", "Qanûna Kenişteyê", Mêjûwa dîtina di Qanûnên Tawankarîyê de", "Mafeyên Merov", "Mêjûwa Girawkirina civakî", "Mêjûwa Beşgehên Girawkirinê", "Mafeyên Penabûnê li Firensa de", Remangîriya Siyasî di Çapan de", "Bizavên Rizgarîyî Welatî", Ciyopolitîka Kêmanîyan", "Firankofonî", "Mêjuwa Regezperestîyê", "Dam û Destgehên Siyasî li Gerministana Rojavayî de", "Marx -Marks", "Serdarîkirina bi serêxwe ve", "Serberdayetî", "Siyeseta Ragiyandinê di Bajarvanîyan de", "Dewleta Israil", "Mêjûwa Qanûnê di Firensa de ji sala 1789 de", "Tevgera Digolî" -beramber bi General Digol ve-, "Mêjûwa Navdewletî ji sala 1815 tanî sala 1989 de", "Mêjûwa Çepgerîyî Firensî ji pêla Şûreşê de", "Mêjûwa Rastgerîyî Firensî ji pêla Şûreşê de", "Mêjûwa Dûrtirînî Rastgerî", "Mêjûwa Partîya Komunistî Firensî", "Mêjûwa Komunistî Navnetewî ji sala 1945 de", "Partîyên Siyasî", "Hevgirtina Netewan", "Barkirvan û Penehindan", "Siyaseta aburîyî Firensî", "Aburî di Heyamên Kevnar de", "Dewlemendbûn li nik Firensiyan de", "Siyaseta Kar","Çima em didin karkirin?", "Bazirganî di navbera Rojhilat û Rojava de", "Veguhertina Bazirganîya Navdewletan de", "Aburîya Emerika Latînî", "Aburîya Spanî", "Aburîya Cîhanî", "Bingehê Aburîyî Firensî", "Bazara Çandîya Hevbeşî", "Aburîya Dewletên Sosyalistî", "Epargue, Spar - Girêdana Peran", "Bazirganî di Civaka Xwarin û Vexwarinê de", "Zanîstîya Hejmartîya Lêvenerandinê", "Ragiyandin û Bazirganî", "Hebûna Bangan di nava Cihanê. de", "Mêjûwa Vexwarinên Kuhulî", "Mêjûwa Fizîya Hesteyî", "Mêjûwa Kimya", "Zerîyan", "Mêjûwa Neftê", "Mêjûwa Tutinê", Mêjûwa Mey û Şampanya", "Pêşkevtina Biyologîyî Merovanî", "Xwarin", "Hêvîya Jînê", "dîtina Lîsinko", "Mêjûwa Biçîbûnê", "Mêjûwa Nexweşîya Şekir", "Nexweşxane li Firensa de", "Mêjûwa Pijişkî", "Nexweşîyên Zarotîyê", "Gênêtik û Pêşvekevtin", "Nexweşîyên Gankirinê", "Hunera Wênegirtinê", "Hişê Elektronîkî", "Mêvanxanê", "Beşgehên Gerandinê", "Gerandina civakî", "Baxên Giştî", "mêjûwa Yarikirinên Canbazîyê", "Yarîya Topê", "Mêjûwa Şetrencê", "Yarîkirinên Canbazîyê di sedsalên Sêzdehan de", "Hesp", "Bezandina Hespan", "Rugby", "Alpinisme -Biserkevtina Çîyan", "Tenis", "Çek", "Akadimîya Firensî", "Firensîya Kevnar", " Zimanê Esperanto", "Bîbliyografî", "Zimanê Firensîyî Gelêrî", "Mêjûwa Xweşxuwanîya Firensî", "Mêjûwa Temaşegeh", "Mêjûwa Wêjeyî", "Wêjûwa Beramberkirinê", "Mêjûwên Gewre di Wêjeya Firensî de", "Wêjeya Nîşanî", "Wêjeya Qelaştî di nava Serûştiyê de", "Lêvenerandina

Rewanşinasî û Wêjeyî", "Çîroka Polîsî", "zanistîya Nigaşi", "Hindo-Ewropî", "Wêjeya Misrîyî Kevnar", "Wêjeya Yunanî ji Homêr tanî Aristo", "Wêjeya Yunanî ji Iskenderê Makdonî tanî Costinyan", "Wêjeya Firensî di nava sedsalên Navînî de", "Wêjeya Firensî di nava pêla Şûreşê de", "Wêjeya Latînîyî Kevnar", "Temaşegeha kilasikî", Emil Zola û Mêldarîya Serûştî", "Romantîkîya Firensî", "Wêjeya Gerministanî" -û herwehajî Wêjeya Emerîkî, Ingilîzî, Erebî, Belçîkî, Berazîlî, Çînî, Espanî, Emerîkî-Latînî, Êbrî, Italî, Hindî, Çapanî, Rusî û Efrikîyi Nuh-, "Wêjeya Siltîyî Kevnar", "Zimanê Firensî di pêla Vejandinê de", "mêjûwa Zinmanê Firensî" -û herwehajî zimanê Germanî, Ingilîzî, Latînî ûhd.-, "zanistîya zimanan", "Destpêkirina zimanê Firensî", "Renagîrî û Bejin", "pêla Bironzî", "mêjûwa zanistîya Binemalan", "mêjûwa Kolonyalîya Firensî", "mêjûwa Bizantî", "mêjûwa Dîtinên siyasî di Roma Kevnar de", "mêjûwa Galiyan", "Şêwe di mêjûwê de", "Gemasî", "mêjûwa Iskotlenda", "mêjûwa Indunosya", "mêjûwa Tinêsya", "mêjûwa Senigal", "mêjûwa Viyetnam", "mêjûwa Gerministanîyî Fêderalî", "mêjûwa Gerministan", "mêjûwa Filorens", "mêjûwa Yekitîya Sovyêtî", "mêjûwa Katelonî", "mêjûwa Gurcistanê", -hd.-, "zanistîya Şopên Yunanî-Romanî", "Kuptî", "Hunera Misrîyî Kevnar", "Huner di sedsalên Navînî de", "Hunera Cuhûtîyê", "Huner di rojhilata Dûr de", "Çayxana Temaşegehî", "Hunera Barokî", "Sitirana Firensî di pêla Vejandinê de", "Rexnegirtina Hunerî", "Musika Gerministanî" -û yên din-, "Neqş", "ciyografîya Ferhengan", "Destikên Veguhestinê di nava Bajêr de", "Urbanisme, Ştädtebau" -Avanîkirina bajaran-, "Mêjûwa Telifonê", "Mêjûwa Çapê", "Şêweyê Civanda belgeyan", "Mêjûwa Sinemê", "mêjûwa Kaxezan", "Mejûwa Rojnamayetiyê", "Rojnametîya Jinan", "Media -Ragiyandin di nava Dewletên Hevgirtîyî Emerîkî de", "Metiryalî", "Felsefên Gewre", "Diyalektik", "Başîtîya"-mêjûyî-, "Felsefa Firensî", -Gerministanî û yên din-, "Êdyologî", "Structurealisme" -Bingehî di Felsefê de, "Felsefa Hişîtîyê", "Felsefa Qanûne", "Piragmatizm" -Kêşperestî, "fFelsefa sedsalên Navînî", felsefa Cuhûtî di sedsalên Navînî de", "Kant", "Neitsche" -Nîtşê, "Spinoza", "Schoppenhauer" -şopênhawer, "Xwedênenasîn", "Pêşbînîya Ayînde di pêlên Kevnar de", "mêjûwa Firensayî Oldarî", Mayinka" -Kevnarî-, "Serdeştî", "remangîrîya Cuhûtî", "Mêjûwa Miletê Ebrî", "Kenîşt", "Dadwerîkirina Îşa", "Oldarîya Pirotistantî", "Pap", "inquisition" -Çavdêrîya Kilîsê, "Descartes" -Dêskart, "Darwin û Dawrwênî", Aristi di Debîristanan de", "Xwedanên Misra Kevnar", "Borcuwazî", Tevegera Jinan", "Mêjûwa Zanistîya civakî" û hd..

Min ev navnîşanên çûyî -ji bil şeşên pêşî de- ji koma "Que sais-je" --Ma ez çî dizanîm-? ji xwe re dayite biwergirtin, ya ku wê der sala 1941 de bi belavkirinê ve dayite bidestpêkirin. Ew nêzîka çar hezar navnîşan têtin biderkevtin -û ew ji bona bîst zimanan bi nêzîka heftê melyon dane hatine biderkevtin-. Danervanên vê Koma hanê hemû ji Karnasan û Mamostên Zanîstgehan têtin bidîtin. Ew nivîstên zanistîne; belam ew bi kurtî ve hatine binivîsandin û ew piçekî bi kêmî endazîya zanîstgehî ve tête biderkevtin. Ismet şerîf Wanlî

- Hegerjî "Tengavîyek" jî di zanistîya mêjûyî de li Firensa jî de bête bidîtin, bêgûman hoyê wêyî pêşî, mîna ku me date bidîtin, ji bona biserveketina "Dubistana Analî" li ser endazîya zanistî, gelêrî û di navbera wan de tête bivegerandin. Herwehajî jiber peqandina zanistîya mêjûyî ji bona "mêjûwê di pirtkirinê de" tête bivegerandin, mîna ku F. Dosse dayite bigotin; jiber ku "Impiryalîya" Analîyan berên din ji bona pêrabûnên lêkolandin û lêgenadinên xwe dane bikaranîn.

Mîna ku em dizanin, Analîyan xwe bi firehkirina berê zanistîya mêjûyî ve bi rengekî "Impiryalî" ve û nejî bi parvekirina têgihiştina demê ve bi şaqûlî ve ji bona her çar dûrbûnên demê di dema kurt de, di dema hêdî de, di dema dûrî dûr de û di dema rawestyayî de dane bitêrkirin, belam wan dem ji bona panbûna wî ango asûyî ji bona deman dane bibeşkirin û wan ew ne bi liberkevtina ciyografî ve lêbelê wan ew bi liberkevtina Başîtî ve dane biparvekirin. Wer ji bona her lêkolandinekê û her danevekê demekê wîyî taybetiyî pê ve hate bidanîn. -Mina ku ji bona her hebûneke jîndar di lêdaneke wîyî taybetî pê ve tête bidîtin-. Vê di encamê payînî de têgihiştina demê bi wîndakirinê ve date bibirin, mîna ku Merov wê bi hatina salan, sedsalan û pêlan ve li dûhevdû de di xêzeke demîyî yek de ji roja destpêkirinê tanî vê rojê têde tête biliberkevtin.

Hêjîjivêjîbêtir nifşê sêyem ji Analîyan derbarê nayînkirina wan ji bona têgihiştina dema sade û jiber regînbûna danavên panayî di berên pir de wan di dawîya dawî de dev ji her pêrabûnekê ji bona liberxisitina mêjûwê û nasîna hoyên rûdanan û pêşvekevtina kar û baran û berzbûna diyaran datin biberdan.

Merov ji bona Mêjê bi zikmakî û serûştîya xwe ve lê dide bitemaşekirin. Ew ji bona dozandinê bi evîndarî tête bidîtin. Ew xwe nade bitêrkirin, bê ka çavên wî di vê dunyayê de çi didin bidîtin, ya ku ew di nava wê de tête bujîyandin û yanjî bê ka hestên wîyî din mîna çêj -çêjîtîya xwarinê-, bînê -bînkirinan-, bihistinê -bihîstina dengan-, hest -hestkirina tiştan- û kehreba laş çi jê re din bianîn. -Ev hemû hestên hanê cenawer ligel wî de pê têtin bibeşdarîkirin-. Herwehajî seruştîya wîna pê dide bipalpêdan, ku ew li paş cîhana hestpêkirî -mîtafîzîkî- de bide binaskirin û ew mêja xwe jî bide naskirin û bê ka Bavpîrên wî berî hatina wîna ji bona jînê -mêjûwê- çi dane bikirin. Di van herdu serûştîyên hanê de -berî peyvê yajî bêtir ji peyvê- -lênerîn ji

bona paş serûştîyê û ji bona mêja mêjûyî de- Merov ji cenawer dide bicudakirin. Dibe, ku lênerina Merov ji bona mêjê ji bona çavnebarîya wî û bawermendîya wî tête bivegerandin, ku navînîya hebûnê dide bipêkanîn. Bi hoyê lênerîna Merov ji bona nasîna mêja xwe li ser zemînê de û ji bona nasîna kirên berên xwe li nik wî de bîrxistinek têtе bizayîn, ya ku ez wê bi bîrxisteke şiyarî û Neferî ve didim binavkirin, ya ku ew li ser jîrbûnê de têtе birabûn. Belê li nik cenawerjî de bîrxistinek têtе bidîtin; belam ew ne bi bîrxistineke şîyarî û Neferî ve têtе bidîtin. Lêbelê ew bi komelî ve têtе bidîtin; jiber ku ew ji bal biçûk jiberxweyî ji komela xwe û ji dêya xwe dide biwergirtin, ya ku wê ew bi şîr ve dida bikirin.

- Bîrwerîya Merov di nava derbasbûna heyaman de hate dagirtin û hêjî ew bi taybetî ve li paş dozandina nivîstê û çapê de ji bona tomarkirina rûdanan têtе bifirehkirin. Li paş hatina radyo û telefizyonê de agehdarîyên heyî deha hatin bigewrekirin, tanî radeyekî wisa ku nema Merov dikare wan di nava bîrweriya xweyî Neferî de bide bihilgirtin; lêbelê divê ew di nava nivîstxanan û bankên zanebûnê de bêtin bihilanîn.

Belam jiber ku Merov bi jîrbûnê û evîndarîya lêgerandinê ve têtе bipesinandin, wî ji heyamên pirî dûr dest bi temaşekirina rûdanên mêjê ve date bikirin, da ku ew li ber hoyên wan û naskirina veşartîyên pêşkevtinan de bête bikevtin. Bi pirbûna çendbûna zanebûna Merov di mêjê de û di rûdan û veguhertinên wê de mêldarîya wî ji bona liberxistina wan de hate bibêtirkirin.

Bi hatina pêla nuh ve û bi anînên wê ve ji şûreşên hunerî, civakî û aburî û afirandinên wan ji dijwarîyan û pirsiyarên nuh Merov hate bineçarîkirin, ku ew ji nuh dest bi temaşekirina mêjê bide kirin, da ku belkî ew amojgariyekê têde ji bona ayinde bide bidîtin û da ku belkî jî ew jê "Qanûnmendîyekê" ji bona pêşvekevtina civakan bide bidîtin.

Di vê pêla meyî niha de û di anînên wê de ji pirsiyarîyên cudan ew pêwist bi çarekirinan ve têtin bidîtin. Dibe, ku li ser çarekirina wan de Çarenûsa Merov li ser rûwê zemînê de bête birawestandin; jiber ku pirsiyarî bi cîhanî ve -pirbûna serjimara Tude, dewlemendbûna zemînê û zîneta dorhêla serûştîyê- têtin bidîtin. Ev jî bi hoyê tevlihevbûna

berjewendîyan, pêşkevtina emrazên ragiyandinê û biserhevhatina dûrbûnan ve di rêya emrazên veguhestinê de hatine bidîtin. Bi serûştî ve tête bidîtin, ku Mêjûman di pêrabûna xwe de ji bona liberxistina mêjê û hoyên wê bête biçûyîn; jiber ku niha zayîna mêjê ye û ayinde ji kêrdarên niha tête bizayîn.

- Bi peyveke din ve felsefa mêjûwê ew pirteke ji mêjûwê ye û ew jê nayête bipirtkirin. Hîç jî mêjûwa rast û durust bê felsefê nayête bipeydakirin. Heger ji daxwaza nifşê sêyemî Dubistana Analî bête bidîtin, ku ew ji bona liberkevtina mêjê û hoyên wê dixwazin xwe bidin biveguhertin. Ji vê tête derkevtin, ku mêjûwa wan xwe - bi hoyê pirbûna Bûjenên xwe- di nava tengavîyekê de dide bidîtin.

Pir bi sêr ve tête bidîtin, ku Dubistana Başîtîyê jî wê jî dev ji felsefa mêjûwê jiber hoyên servajî ve: jiber perîşanîya mêjûwa xwe, jiber tengbûna asûwê xwe û jiber têrkirina wêna "ji bona rexnegirtina nivîsandina nivîsandî" dayite biberdan.

Belam Dubistana Markisî ji me re "bi liberxistina bi carekê ve" ji bona mêjûwê ji Tîpa A tanî B date bianîn. Bi hîç awayekî jî ve nabe dest lêbête bixistin; jiber ku ew bi "Qanûnmendiyekê" ve têtê bidîtin, ya ku bicîanîna wê bi berên Kumonistîyî geşkirî ve dide bimujdekirin.

Li vêderê de bi pêwist ve nayête bidîtin, ku hemû gotinên gotîyî berê bêtin bivegerandin; jiber ku ew berên geşkirî bi tarîbûnê ve hatin biveguhertin û "Qanûnmendîyê" ji bona nezanîya me date bibirin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku firehkirina lêkolandinên mêjûyî ji bona warên cudan û deryakê ji danavan ev bi xwe jî ve bi pêşvekevtineke gewre ve ji bona remanê têtê bidîtin. Dê ev lêkolandinên hanê jî hertim jî bêtin bikirin. Veger ji bona bi pêşvexistina zanebûnê ve nayête bidîtin. Hîç gûman jî têde nayête bidîtin, ku her danevek jî, gerjî çi jî be, dê jê re Xwendevan bêtin bidîtin. Hegerjî Nivîsdaran qanûna darêştinê û daxwazê jî ji xwe re dane bijibîrkirin, dê xanîyên belavkirinê vê qanûnê nedin bijibîrkirin.

Belam gava ku ez bixwazim ji xwe re mêjûwa welatekî bi rengekî diyar û hîşmendî ve bidim bizanîn, magelo pêwistîya min ji bona "Mêjûwa Nexweşîya Halê", "Mêjûwa Kehrebê", "Mêjûwa Evîndarîyê" û yanjî ji bona "Mêjûwa Zanistîya Hejmarîyê" çi jê re tête

bidîtin?

Dibe, ku rojekê ji bona serê min bête bikevtin, ku ez ligel Danervanekî de ji bona nava esmanên deryan û hîşkitîyan di navbera jor û Jêr de yanjî di navbera Rojhilat û Rojava de di ser şivên rê û banan de di çûneyeke dûr û dûrêj de bêtim biperwazkirin. Belam di çûneyeke mîna vê de ezê dê nikaribim ji xwe re welatan, bajaran, gundan û deveran di rûçikên wanî nîşankirî de û Merov di "dirêjbûna" karên wî de bidim bidîtin. Gava ku tu ji xwe re li zemînî de ji dûrbûneke bilind dide bitemaşekirin, wê gavê dûrîtî û dûrbûn ligel hevdû de têtin bitevlihevkirin. Herwehajî pêrejî pîvana demê tête biwindakirin û sal û dehsalî jî têtin bihilanîn, na hêjîbêtir pêl têde ligelhevdû de têtin bitevlihevkirin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Dubistana Rudanî -Başitî-, mîna ku ew ji bal Mamostên Zanistgehên Gerministanî de di nîvê duwemî sedsalê nozdehan de hate bisazkirin û ew ji bal Mamostên welatên din de ji wan hate biwergirtin, wê jî xwe bere bere date biveguhertin. Wer bi vî rengê hanê ve Mêjûvanên sedsalên bîstan, yên ku wan Mêjû di Dubistanên Bavên xweyî "Başîtîyê" de dane xbiwendin, wan jî bere bere dev ji rêyên Bavên xwe di bin kêra Dubistana Analî de, dewlemenbûna bûjeyên wê de û nûvejandinên wê de dane biberdan; jiber ku Mêjûvanê rastteqîne bi serûştîya mêldariyên xwe ve nikare xwe demeke dirêj ji temaşekirina rûdanên mejê û liberkevtina mêjûwê û ne jî ji lêvenerandina dujwarîyên serdema xwe bide bibêpişkûparkirin.

Bi rastî jî ve em pêweistî bi corên cudan ve ji mêjûyê têtin bidîtin. Nivîsandinên bi pîvana "Dema Hêdî" ve ango sedsalan ve me ji Nivîsandinên "Dema Kurt" ve mîna mêjûwa Supahî yanjî Diplomasî nadin binayînkirin, jiber ku ji bona vê "Dema kurt" jî girinbûneke wêyî taybetîyî bi serê xwe ve tête bidîtin.

Gava dadgehek li tawankarîyekê de dide bigerandin, divê ew berî derxistina dadkarîya xwe dema suwarkirina rûdanan ligel hevdû de demjimar bi demjimar ve bide bivegerandin û pêwendîyên wan ligel hevdû de bide biderxistin. Evaya hoyên tawankarîyê dide bidiyarkirin. Bi vî rengî ve rengek ji mêjûwê tête binivîsandin, da ku rastîya rûdanê bête bizanîn.

mêjûwa Merov bi rojan ve, bi salan ve û herwehajî bi sedsalan

û heyaman ve tête bipîvandin. Belam dema kurt ji bona mêjûwa Merov nade binayînkirin; jibervêjî divê li ser Merov de ji bona têgihiştina mêjûwa Merov dîtinek dûrî dûr tête bipêwistkirin.

Herwehajî ji bona xwendekarîya mêjûwa devereke fireh ji zemînê, -bi neçarî ve ew bi pîvana dema hêdî ve tête bipîvandin-, ji bona xwendekarîya mêjûwa welatên cuda di nava vê devera hanê de nade bitêrkirin. Mêjûwa derya Sipîyî Navînî ji bona xwendekarîya mêjûwa Italya, Firensa, Tunis û Merakiş nade binayînkirin. Mêjûwa van welatan jî bi xwe jî ve Merov dikare wê bi pîvana dema hêdî yanjî dema kurt ve bide bixwendekarîkirin. Dibe, ku başîbûna wêna di komkirina herdu lênerînan de di lênerîna dema dûr û kurt de bête biderkevtin, bi rengekî ve ku têde mêj ji bona heyamên cudakirî tête bibeşvekirin, ku di nava wê de -chronologie- -dema rûdanên giring cihekî ji xwe re didin bidîtin. Belam evaya li ser danava lêkolandinê de nayête birawestandin; jiber ku ji bona nimûne, mêjûwa siyasî, -ya ku ew bi rojan û salan ve tête bipîvandin-, Merov nikare wê ligel mêjûwa çandinîyê, -ya ku ew bi sedsalan ve tête bipîvandin- yanjî mêjûwa huneryê di nivîstekê de bide bikomkirin, ya ku ew li ser bingehê demeke yekkirî de tête biavakirin. -Belê Merov dikare wan mêjûwan di yek nivîstê de di nava derîyên cudan de bide bidanîn, yên ku ew ji hevdû têtin bicudakirin û hîç pêwendîyên demî di nava wan de nayêtin bidîtin.

Bi rastî jî ve "Rêyek" bi cîkirî û divakirî ve ji bona nivîsandina mêjûwê nayête bidîtin. Mêjûvan jî nala Hunervan tête biderkevtin, ku berkirina wîna li ser kesîtîya wî û li ser bûjenên -agehdarîyên- wî de, yên ku wî ew dane civandin û li ser "Hunera" wî de, yên ku wî ew dane bihelbijartin û bê ka ew çawan wan ligel hev de dide bitêkelkirin û wan bi hev re dide bigirêdan, da ku ew ji bona berkirina armanca xweyî daxwaz bête bigihaştin, têté birawestandin.

Hegerjî xwendekarîya pevçûn û şapên cîhanî ji bona şaxekî bingehî di mêjûwê de hatine bikirin, -mîna ku ev di mêjûwa aburî û pêwendîyên Jor bi Jêr ve û Rojhilat bi Rojava ve têtin bidîtin-, Ev bi xwe jî ve ji bona mêjûwa "Welatî" ji bona her dewleteké yanjî deverekê nade binayînkirin.

Belam vegerandina mêjûwa welatî ji bona li dûhevhatina serdarîyan, cengan yanjî destûran -mêjûwa siyasî, supahî, destûrî ûhd-

nade bitêrkirin; jiber ku ew ji bona temaşekirina "Qatên Bilind" di avanîyê de têtе bivegerandin, -mîna ku Marx -Marks dayite gotin-, bêyî ku ew li "Qatên Payîn" de bidin bitemaşekirin, yên ku ew zînetên aburî, civakî, rê û pêwendîyên berkirinê didin biwênerîkirin. Beramberî vê jî xwendekarîya Qatên Payîn bi bêyî xwendakrîya Qatên Bilind ve nayête bitêrkirin.

Werjî gerjî ku dewlet pir milî û pir ziman bête bidîtin, mêjûwa "Welatî" bi tenha xwe ve ne têrkirî û ne jî rast têtе biderkevtin, heger ku rê ji bona xwendekarîya "Mêjûwa Antropologique" -Entropologîyî bi navkirî ve neyête bidan. -Ez bi baştir ve didim bidîtin, ku ez wê bi mêjûwa "Ethnologique" bidim binavkirin, da ku Merov bikaribe milîbûnan, ji yên ku ew dewleta hanê ji wan têtе bipêkhatin û zînetên wan û pêwendîyên wan ligel hevdû de û ligel dewletê de li ser berzîya zanyarî, civakî, aburî, siyasî û destûrî de bide biezmonkirin. Magelo çawan dê Merov bikaribe mêjûwa Yektîya Sovyêtî, Yogsilavî yanî Spanî bêyî mêjûwa milîbûnan bide bixwendekarîkirin? Wehajî derbarê Dewleta Turkî û Iraqî jî de têtе biderkevtin; jiber ku Kurd di nava wan de nêzîka çaryek ji serjimara Xelkê -li Iraqê de bêtir- têtin biderkevtin. Werjî li Iranê de têtе biderkevtin, ku mîlîbûnên Nefarisî bêtir ji nîvê serjimara tevaya Xelkê wê didin biderxistin.

Mêjûwa Miletekî nala Kurd bi serjimara xwe ve bi nêzîka sî milyon Nefer ve, bi taybetîyên xweyî milîyî bi xwe ve, bi tevgereke xweyî welatî ve ango bi zemînekê ve, ya ku ew li ser wê de piranîya pir dide biderxistin, ew bi rengekî ji mêjûwa Entropologî ve têtе biderkevtin, ango ew bi cîanîna vî şaxê zanistîya mêjûyî ve têtе biderkevtin, yê ku xwendekarîya wî bi rengekî têrkirî ve divê ji bona zanistiyên "Alîkarîyî" dinî pir bête bivegerandin. -Dibe, ku ev ji bona hinekan ji wan şaxên zanistîyî alîkar nikaribe bête bikirin; jiber ku belgeyên û amarên pêwist nayêtin bipeydakirin-.

Herwehajî bi serdejî ve dibe, ku ev nikaribe bête bikirin; jiber ku divê zanebûn di nava wan ferhengan de bête bidîtin, yên ku ew di nava wê deverê de li dûhevdû de hatine bipeydakirin û herwehajî divê zanebûn li ser mêjûwa wan dewletan jî de bête bidîtin, yên ku wan Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin.

Belam Lênerînên "Felsefî" li ser liberkevtina rûdanên mêjûyî, hoyên wanî kûr û pêşkevtinên cudan de di nava civakê de bi başî ve

tête bidîtin, ku Merov wan li ser temaşekirina rastîya mêjûyî de û bi bîrxistinên wan ve bide biavakirin, heger jê re cihek di dema peyivandina kolandinê de bête bidîtin -û nejî jê re nivîsteke taybetî bête bitirxankirin, mîna ku hinan ji Mêjûvanan danebi kirin.

Di nava van Mêjûvanan jî de Arnold Toynbee jî têtê bidîtin. Vî Danervanê Ingilîzîyê hanê, -yê ku ew der sala 1889 de hatîye bizayîn û ew der sala 1976 de hatîye bimirin-, di navbera salên 1943 û 1961 de zincîreke di bin navnîşana "The Study of History" -xwendekarîya mêjûwê de di duwanzdeh bergan de date bibelavkirin, yên ku ew li ser lênerînên mêjûyî û felsefî de li ser berzbûna cîhanî de û di hoyên peydabûn û kevtina bajartîyan de dihate birakirin. Bi cîanîna vî karê hanê bi mêrxasî û dilbijandineke dujwar ve dihate bigirêdan. Xwendina duwanzdeh bergan, yên ku ew ne mêjûwekê didin bipêkanîn, belam yên ku ew lêvenerîneke dîtînî ji bona lidûhevhatina bajartîyan didin biderxistin, ev bi xwe ve bi karekî bêzarî ve têtê biderkevtin.

Herwehajî Danervan dayite bikarkirin, ku ew qanûnmendîyan yanjî rêzanan ji bona derkevtina bajartîyan -û ne ji bona dewletan- û herwehajî ji bona kevtina wan bide biderxistin. Vî şêweyê wî pir ji rexnan date bigûrkirin. Biserdejî wî bajartîya Yunanîyî kevnar mîna "Nûmûnetîyê" date bidanîn. Wî bîstûyek "Bajartîyên" cudan di mêja merovanîyê de datin bijimartin. Ev nîşankirina hanê jî têtê binayînîkirin.

Em bajartîya "Urarto" ji bona nimûne di nava lîsta wî de tevî li giringbûn û kêra wê jî de ligel bajartîya Yunanî de nadin bidîtin.

Arnold Toynbee vegerandina peydabûna bajartîyan ji bona nîşanên "Race" -Regezyê- -bi rast û durust ve jî- date binayînîkirin. Belam wî cudabûnên di navbera "Regezîyê" û "Milet" de nedate bidiyarîkirin. Herwehajî wî her kêreke ciyografî û av û bayî di peydakirina wan de date binayînîkirin; tevî ku jî kirdarê ciyografî li ser wan civakan jî de dide bikêrkirin; belam ew bi kirdarê bi tenha xwe ve nayête bidîtin. Danervan hoyê peydabûna bajartîyan di nava çawabûna bersiva li ser "dáfî", "Herausforderung" -liberrabûnê de di navbera "Neferan" de dide bidîtin. -Ev dîtina hanê Merov nikare wê bi têrkirî ve bide bidanîn. Dibe, ku Merov bikaribe bes û bi tenha ve rola pêşî ji bona "Neferan" yanjî ji bona "Kêmanîyekê" ji bona Rêberîya

Civakê di çûna bajartîyan de bide bidan, mîna ku Danervan ev dayite bikirin. Belam Merov nikare liberxistina herifandina bajartîyan bi wergirtina biryarên şaş ve ji bal Neferên Rêberan de bide bikirin; mîna ku Danervan dide bigotin. Herifandina bajartîya Urarto ji bona pelemarên Êlên Iranî têtê bivegerandin. Hilweşandina bajartîyên Hindîyên Sor li Emerîka Jêr de ji bona layînkirina wêna ji bal Sipanyan de têtê bivegerandin. Herwehajî bajartîya Iranîyî Sasanî jî bi layînkirina Iranê ve bi Vekirina Erebîyî Musulman ve hate kbievtin. Di payîna payînî de Arnold Toynbee di piş vîna Neferan de hêzeke mîtafîzîkî dide bidîtin, ya ku "Oldarîyên Bilind" wê didin wênerkirin. -Ev Dîtineke Xweyî ye. Arnold Toynbee di liberxistina çûna mêjûwê de bi "Qanûnmendiyeke" hîmkirî ve nehate biserkevtin. Ev jî bi sernekevtina Marx dide bibîrxistin. Ji bona çûna mêjûwê gelek kirdar têtin bidîtin û ew bi sadebûnê ve nayête birûniştin; herwehajî ew ji heremekê ji bona ya din û ji heyamekî ji bona yê din têtê bicûdakirin

Funkuyamayê Emerîkî -di koka xwe de Çapanî- nivîstek di bin navnîşana "Dawîya Mêjûwê" de date bibelavkirin. Heger ev nivîsta wî tiştekî bide biderxistin, ew bes û bi tenha ve berebûna mêjûwê dide biderxistin.

## 9. Gerek ligel Braudel -Brodel de di Mêjûwa Firensa de

F. Braudel, mîna ku li ser wî de hatiyê bigotin, qurmê nifşê duwem ji Dubista Analî bû. Ew pir di cîhanê de jiber pirbûna berkirina wî û kûrbûna dîtina wî hate binavûbangkirin. Ji nivîsandinên wîyî bi nerx ve "Derya Sipîyî Navînî û Cîhana wê der pêla Filipê Duwem de[1]" di çend bergan[2] de tête bidîtin, ya ku ew bi danava nameya doktora wî ve dihate bidîtin. Vê nivîsta hanê ji xwe re nav û bangeke cîhanî date biwergirtin û ew çend carî hate biçapkirin yanjî jê çend xelekên pir û di bin nav û nîşanên cudan de hatin çbiapkirin[3]. Herwehajî nivîsandinên wîna mina zincîrekê di telefizyonê de li ser ferhenga deşta vê deryê de û herwehajî ew ji bona pir bernameyên radyoyî zanyarî bûn. Ji nivîsandinên wî "Ferhenga Metiryalî, Aburî û Sermeyedarî" tête bidîtin, ya ku ew der sala 1976 de di sê bergan de hatîye bibelavkirin[4].

Praudel nala Danînvanên Dubista Analî Mark Blox û Lusyan Fibver wan dixwestin, ku ew -Synthése- suwarkirina mêjûwê li paş lêvenerandinê de pê bêtiin birabûn, ango ku ew lênerîneke tevayî yanjî bi carekê ve ji bona mejê bidin biderxistin, piştî ku ew wê bi şaqûlî ve ji bona deman û bi panayî ve ji bona waran û hereman bidin bipirtpirtkirin. -Ev jî bi cudabûna nifşê sêyemî ve dihate bikirin, yê ku

---

[1]Filipê Duwem ji sala 1180 tanî sala 1223 bi Padîşahê Firensa ve dihate bidîtin. Ew bi navê Ph. Auguste dihate binasîn. Wî serradana Xaçperestîya Sêyem ligel Richard Coeur de Lion -Rişardê -Dilêşêr- date biserdarîkirin. Ew ligel Selah El-Dînê Eyubî de bi şer ve hatin bikevtin. Ismet Şerif Wanlî

[2]Ew bi zimanê Firensî ve "La Mèditerranée et la monde méditerranén á l'époque de Philippe II", Paris 1949. Ismet Şerîf Wanlî

[3]"La Méditerranée: Espace et histoire, Paris 1985" -Derya Sipî: Cih û Mêjû. Jê jî "La Méditerranée: Les Hommes e'héritge, Paris 1986" -Derya Sipî: Merov û Lidûmayinên wî. Ismet Şerîf Wanlî

[4]Bi zimanê Firensî ve:"Civilasation inaténielle, e'conomice et capitalisme" Ismet Şerîf Wanlî

wî xwe bi xwendekariya tengalkirinan ve bi rengekî bi serê xwe ve û bi bê gupêhdan ve bi lênerîneke giştî ve dida bikirin. Wer bi vî rengê hanê ve mêjûwa nala mêjûwan û pirtpirtkiana dihate biderkevtin.

Li paş ku ew ji bona esmanên derya Sipîyî Naverast de hate biperwazkirin û wî bi dûrbîneke "Dema Dûr" ve li ferhengên wê de date bitemaşekirin, Praudel li bereveçûna jîyana aburîyî cîhanî û lidûhevhatina şapên wêyî navdewletî de û li rê û bahnên deryayî de di nava pêleke dirêj de date bitemaşekirin.

Der sala 1986 de, gava ku ew di temenê xweyî heştêûçar salî de û ew di berzbûna karnasîya xwe de dihate bidîtin, ew careke din ji bona lênerîna mêjûwa welatê xwe hate bivegerandin. Wî bergê yekem ji zîncîrekê di bin navnîşana giştî de "L'identité de la France" -Nasîna Firensa -Nexweyîtîya Wêna" date bibelavkirin. Wî ev bergê hanê ji bona xwendekarîya "Cih û Mêjûwê" date bitirxankirin.[1]

Cîh bi wê têgihiştina ciyografî û pêwendîyên wêyî tevlihevî ve ligel mêja dûr û nêzîk de tête biderkevtin. Wî bi pêşgotineke giştî ve ji bona her çar bergên zincîrê ve date bidestpêkirin. Wî têde remana xwe di çawabûna nivîsandina wêna de date bidiyarkirin û wî date bibîrxistin, ku bergê duwem di bin navnîşana: "Nasîna Firensa: Merov û Tişt" -li ser tûde, aburîya siyasî û çawabûna neşnîvanîya Merov de li ser zemîna wêna de û bê ka wan çilo û çawan ew didan çbiewisandin-. Bergê sêyem wî di bin navnîşana: "Nasîna Firensa de: Dewlet, Zanyarî û Civakê" date binivîsandin. Bergê çarem wî di bin navnîşana: "Nasîna Ferensa de: Ferensa li derî Firensa de" date binivîsandin. -Wî ew bi têgihiştina pêwendîyên Firensa ligel mayînên dinî Ewropa û Cîhane de, lê ne bi têgihiştina diplomasî ve belam bi têgihiştina jîyanî ve date binivîsandin-.

Mêjûwa Firensa di vê zincîra hanê de, mîna ku wî navroka wêna di pêşgotina xwe de dayite biderxistin, ji tevaya nivîsandinên wî

[1]Fernand Braudel: "L 'identité de la France: Espace et histoire" - Nasîna Firensa: Cih û Mêjû, Paris 1986 de, -bergê yekem di 386 rûpelan de-. Ismet Şerîf Wanlî

di vê danava hanê de, -yên ku ew pirî pirbûn-, tête bicudakirin. Merov dikare vî karê hanê bi "Gerekê ve di kûrbûnan de" û bi lênerînekê ve ji bona mêjî "ji nava cerk û hinavan" bide bipesinandin, ya ku têde heyamên dûr û nêzîk û herwehajî pêrejî dema nihajî têtin bitevlihevkirin û ji wan mêjû di nava jîna her heremekê de, her gundekî de, her bajarekî de, li ser rê û banan de, di nava daristanan û kenarên çeman de heyamekî li dû heyamekî de di hilat û dahatîya timî de di navbera mejê û niha de tête bipêkhatin.

Hevrêya ligel Braudel -Brodel de di vê gera wî de ji bona nava cerg û hinavên welatê wî ji bona derxistina mêjûwa wî ji dîtina rûwê wêyî cudan di heremên wê de, di demên wê de û di şêweyên jîyana wê de ev bi xwe jî ve hînbûneke bi çîanînî ve di "Mêjûwa Nuh" de dide biderxistin û bê ka çawan Merov dikare Yekitîya Netewe bide biderxistin. -Evaya danava lêkolandinê bû, ya ku ew ji gewdeyên wêyî pirtpirtkirinê di nava warên demê û cih de dihate bipêkhatin û ya ku ew di kirina xwe de ligel Ewropa mayî de di berveçûn û vekişandina xwe de û di kirina hişkatîyê de ligel cîhanê de dihate bidîtin.

Dê ev hînbûna hanê pir bi zengînî ve bête bidîtin. Ez dê peyvê ji bona Danervanê nivîstê bidim bihiştin, mîna ku wî xêzên xwe di pêşgotina xwe de dane bidiyarkirin. Ez dê kurtbûnê bidim bikirtin, heger ew hate bipêwistîkirin û ez dê hinekî bidim bidarêjtin, heger min date bidîtin, ku evaya ji bona Xwendevanê rojhilatî û bi taybetî ve ji bona Xwendevanê Kurdî dide bidivakirin.

Debera em bi vê gera xwe ve ligel wî Merovî de bêtin birabûn, yê ku wî gewretirîn têgihiştin ji bona "Mêjûwa Nuh" û ji bona mêjûwa şêrîntirîn welat ji bona berdilê wî: ji bona welatê xwe dayite bidan.

Braudel dide bigotin, ku ew dê mêjûwa Firensa wer bide biezmonkirin, ku ew nemîna welatê wî bête bidîtin. Ew dê bes û bi tenha ve xwe bi rola "Çavdêrê" bêlayî ve li gora karînê de bide bitêrkirin. Firensa jê re ji dûr ve di nivîstên wîyî berê de li serDerya Sipîyî Naverast de yanjî li ser sermiyandarîyê de hatibûn bidîtin. Ew jê re nala rastîyekê di nava rastiyên din de dihate bidîtin. Ew bi bextiyar ve dida bidîtin, ku ew careke din ji bona xala xwe -welatê xwe- hate bivegerandin. Rola Çavdêr dide bidivakirin, ku ew xwe ji her mêldarîyekê û dildarîyekê bide birûtûqûtkirin. Rût û qûtkirina Merov ji dildarîya beramberî welêt bi karekî pir dujwar ve tête bidîtin.

H.Taine -Tên[1] mêjûvanê berî wî xwe ji vê dildarîyê nikarîbû bida birizgarkirin, tevî ku bawerîya wî jî bi servajîya vê jî dihate bidîtin. Belam Ch. Tocqueville -Tokvili dikarîbû xwe di nivîsta xwe de li ser "pêla Padîşahî û Şûreşa Firensî de" jî wê dildarîyê bide birizgarîkirin[2]. Herwehajî ew navên Mêjûvanên din dide bijimartin, ji yên ku wan li ser mêjûwa Firensî de ji sedsalê şanzdehan de dane binivîsandin. Di nava van Mêjûvanan de G. Corrozet, R. Gaoguin, J. Michelet[3] têtin bidîtin. J. Michlet ji Mêjûvanê sedsalê nozdehan de tête bidîtin, ji yê ku hêjî tanî niha jî nivîstên wî têtin bixwendin. Ew ji bona remanên Şûreşa Ferensî û bîr û bawerîyên Komarî Berxwedanvanekî pirî zana bû. Wî her û her dida bidubarekirin, ku Tudeyên heremên Ilzas û Lorîn -herema Strasburg- "ew bi vîna xwe ve Firensî têtin bidîtin", di gava ku Mêjûvanê Elmanî Treitschke -Tratşkê dida bidubarekirin "ku ew tevî vîna xwe jî bi Elmanî ve têtin bidîtin". -Divê li vêderê de bête bizanîn, ku Tudeyên wan hereman di jîyana xweyî rojî de bi zimanê Elmanî ve dihatin biaxivtin û wan di dubistanan de zimanê Firensî ji xwe re didan bixwendin-. Ji wan Mêjûvanan jî Lavisse, Curties, -yê ku ew Elman bû-, Covaiguac û hinên din jî dihatin bidîtin. Magelo çima Braudel xwest, ku ew navê xwe jî bi ser vê lîsta dirêjî Mêjûvanan de bide bivekirin? Bersiva wî li ser vê pirsê de wer dihate bidîtin, "da ku ew mêjûwa Firensa ji nava wan dîwaran bide biderxistin, ji yên ku ew li dor û berên wê de hatine bihildan", ango ku dê mêjûwa wî ji mêjûwên berî xwe bête bicudakirin.

Dê ew dîwaran bide bivekirin û dê ew ronahîyên nuh ji bona ser mêjûwa Firensî bi xistina zanistiyên nuh û şêweyên wan ve ji bona ser danavên lêkolandinê bidebi avêtin. Ev zanistîyên nuh di van beran de têtin bidîtin: ciyografya, aburîya siyasî, zanistîya Demografî -tudeyî, zanistîya Anthropologie -Merovanî, Etnologî, zanistîya civakî,

[1]H. Taine der sala 1893 hatîye bijîyandin. Wî nivîsta "Zinetên Firensa di Serdema Nuh" de date binivîsandin. Braudel ji bona vê nivîstê dide binîşandan. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ch. Tocqueville ji sala 1805 tanî sala 1859 de hatîye bijîyandin. Ew tanî niha jî ji Gewretirîn Feylesufên mêjûwê û Karnasên di zanistîya siyasî de tête bidîtin. Isme Şerîf Wanlî

[3]J. Michelet ji sala 1798 tanî sala 1874 de hatîye bijîyandin. Ismet Şerîf Wanlî

zanistîya rewanşinasîyî tevayî û xwendekarîyên zanyarî.

Heger Mêjûvan ji xwe re date bixwestin, ku ew mêjûwê li ser ronahîya van hemû zanistîyan de ji xwe re bide bixwendekarîkirin, dê ew xwe di nava kûrbûnan de bide bidîtin, ku ew tevan bi başî ve nade binaskirin. Dibe, ku ronahîya van zanistîyan encaman bidin biderxistin, ku dil pê têtin binexweşkirin. Dê ew bidin bidîtin, ku Yekitîya Firensa ne ji pêla Jeanne D'Ark -Can Dark[1] dayite bidestpêkirin, nejî ew sed der sed ligel Şûreşa Firensî de hatîye bidestpêkirin; belam ew bi vekirina şivên hesînî û dubistanan ve hatîye bipêkhatin. Hegerjî Şûreşa Firensî peqandina pêşîyî Netewê Firensî bû, belam gotina "nationalisme"- Nationalismus- milîbûn bes û bi tenha ve di nava nivîstên Balzac -Bakzak[2] de -ango di sedsalê nozdehan de hate bipeydakirin. Netewe ne nala "Kesekî" tête bidîtin, mîna ku Michelet jê re dide bibangkirin. Belam ew "Komeke ji Rastîyan û ji Kesan tête bidîtin, yên ku ew bi rastî ve hatine bijîyandin û ew li ser temaşegeha mêjûwa dema kurt de sal bi sal ve, în bi în ve û roj bi roj ve nehatine bipeydakirin. Ev mêjûwa ku em li ser depên xwendinê de pê têtin biferkirin". "mêjûwa Firensa di dema dûrî dûr de hatîye bineqişandin û ew ji kombûna tîştan di derbasbûna heyaman de hatîye bipêkhatin".

Tiştê ku Merov dikare lê rexne li nik Mêjûvanan de bide

---

[1]Jeanne D'Ark -Can Dark- Keçeke gundî bû. Ew ji sala 1412 tanî 1431 hatîye bijîyandin. Dî vê pêlê de Ingilistanê bi yarmetîya Mîrê herema Bourgogue -Burgug- ve beşek ji xakê Firensa dabû bilayandin.

Can Dark "Dengek" date bibihîstin, ku ji bona wê dide bibangkirin, da ku ew Firensa ji layandinê bide birizgarîkirin. Wê ji Padîşahê Firensa Şarlê Heftemîn date bixwestin, ku ew Supahekî ji bona wê bide bidan, da ku ew pê şerê Ingilîzan bide bikirin. Şarlê Heftemîn Supahek ji bona wê date bipêşkeşkirin û wê şerê Ingilîzan date bikirin. Ew bi dîlî ve ji bona nava destên Ingilizan hate bikevtin. Inglîzan ew ji bona ber dadgehê datin bipêşkeşkirin û wan ew bi mirina sûtandinê ve bi twankarîya canbazîyê ve dane bidadgehkirin. Ew di nava pêtên agir de hate bimirin. Ew ji pêla Şûreşa Firensî de nala Nimûneya Welatperweryê û Evsanê têtê biderkevtin. -belgeyên dadkirina wêna û giftûgoyên civînên wan hemû tanî vê roja hanê jî têtin biparastin-. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Balzac -Balzak Nivîsvanekî di sedsalê nozedehan de pir bi nav û bang bû. Ismet Şerîf Wanlî

bigirtin, ji yên ku navên wan hatine bigotin, "di bawerîyan wan de tête bidîtin; jiber ku ew didin bibawerikirin, ku mêjûwa Firensa ji sedsalê heştdehan de di pêla Şiyarvanan de yanjî ligel nobûna Şûreşa Firensî de ....hatîye bidestpêkirin. Wan ev şureşa hanê bi Incîlekê ve datin bidanîn û wan ew bi kanîyeke êdyologî ve ji bona lêvegerandinê datin bidanin. Me bi wê Incîlê ve dida bibawerkirin, gava ku em hêjî menal bûn. Ez dijî vê bawermendîyê hanê tûrebûna xwe didim biderxistin. Ez pê nayêm birûniştin, ku Merov tiştan bi sîwanekê ve ji mezinbûna êdyologî li paş bûyîna wan de bide bidorhêlkirin. Herwehajî ez bi parvekirina demî ve nayêtim birûniştin, ya ku ew vê mezinbûna hanê: bi dema kevnar -ango Padîşahîyê- û dema Şûreşê ve pê didin bigirêdan".

Braudel pêde diçe: "tiştê ku divê pesendana wîna li ser ferşê lêkolandinê de ew bi xwe ve buhayê mêja Firensa bi carakê ve jiberî vekirina Romanî ji bona welatê Galî de û tanî vê roja me jî bête bidîtin û bê ka çi van heyamên hanê jî di kirinên ligelhevdû de dane bikirin. Di pêla Liwîsê Şazdehemîn de, -yê ku ew ji bal şûreşê de hate bidarvekirin-, Firensa "Xatûneke Perixî" bû. Divê bête bigotin, "ku mêjû û berî mêjûwê du alîyan ji yek çûnê didin bipêkanîn û gundên gundîtîya Firensî li ser zemîna me de ji sê hezar salên berî zayînê de hatine bineqişandin. Welatê Galî ew war bû, yê ku li ser wî de hate bilihevhatin, ku Firensa li ser wî de li paş heyaman de bête bimezinkirin. Derbasbûna hinekan ji Eşirên Germanî di ser çemê Rayin de di sedsalê pêncemînî zayînê de hêjî nala bûyînekê tête biderkevtin, ku em di nava dûvikên wê de hêjî tanî vê rojê jî têtin bijîyandin. Evayajî di parvekirina Belcîka de ji bona du heremên zimaniyî cudan tête biderkevtin". Na hêjîbêtir "Xwîna me Bînvanîyê li ser bûyîna "Pelemarên berî" de li ser zemîna me de ji kevnar de dide bidan".

Ji alîyê vepanbûna zemînê de "divê "Şeşparsûwê" Firensî -ango zemîna Firensîyî niha-[1] ne mîna pîvana bi tenha xwe ve ji bona

[1] "Şeşparsû" bi zimanê Firensî ve Hexagone tête bigotin. Ew bi rengê endaziyî vepanîyî şeşparsûwî ve tête biderkevtin. Neqşa Firensîyi niha nala "şeşparsû" tête biderkevtin û bi vê têgihiştina hanê jî "şêşparsû" jê re tête bigotin, ya ku ew bi nîşana Firensa ve tête biderkevtin, -mîna ku Merov ji "potînê" re bi nîşana Italya ve dide bigotin-. Ismet Şerîf Wanlî

warê lêkolandinê bête bidîtin". Merov dizane, "ku di bin endazê şeşparsûwê Firensî de hin ji hereman û melbendan têtin bidîtin, ku her Yek ji wan bi jîneke xweyî ewtonomîyî taybetî ve tête bijîyandin. Herwehajî di ser şeşparsûwê zemîna Firensî de Ewropa tête bidîtin û Cîhan jî di ser Ewropa de tête bidîtin".

Bi rastî jî ve Merov nikare "mêjûwa Ewropa û çîhanê jî ji mêjûwa Firensa bide bicudakirin. Dibe, ku mêjûwa Eropa û Cîhanê rê li me de dabe bitengkirin, dibe, ku ew jî rojekê ji rojan jî me bide binabûdkirin. Belam magelo em hertim beramberî mêjûwa wan bê guneh bûn?". Yekekî dayîte bigotin: "ku serbilindaya Miletên nuhî bajarvanî di wir de tête bidîtin, ku wan mêjwûa cîhanî dane biderxistin".

Belam "peyivandina divayî di navbera her Neteweyekî û Cihanê de wergirtin yanjî hilanîna mêjûwa wî nade biliberxistin. Belê têkelbûn di wê peyivandina divayî de û ne tevlihevbûn û hevgirtîbûn têtin bidîtin".

Wisa "li ser dema dirêj de ji bona Firensa, Ewropa û Cîhanê de, ya ku ew bi dûrbûna xweyî demî û esmanî ve tête biderkevtin, dê lêkolandin li ser wê de bête bikirin. Çûn û hatina min di nava beramberkirinan, serpêhatiyan û nivîstan de dê min ji bona nava demê û cîh de bide biajotin. Mebesta min ji van serpêhatiyan "bi derxistina beran û mêldarîyan û ne derxistina "Qanûnmendiyê" ve tête bidîtin, yên ku ew ji vê mêjûwa hanê xwendekarîya mêjûwa civakê didin bikirin".

"Ji derîyekî ji bona derîyekî din ez dê bidim bikarkirin, ku ez dê li tevaya mêjûwa Firensa de li ser ronahîyên lidûhevdûyî de ji zanistîyên civakîyî cudan de ji Ciyografya, Intropologî, Demografî, Aburîya Sîyasî, Zanistîyên Siyasî ango Politologie -Politologî, Xwendekarîyên Zanyarîyan û Rewanşinasîyan bidim bitemaşekirin, yên ku em dikarin ji wan re Culturologie -Kuturologî, Zanistîya Civakî û herwehajî Pêwendîyên Navdewletî, jiber ku dê Firensa li derveyî mala xwe de bête bidîtin, bidin binavkirin. -Dê erkê min giring û sengîn bête bidîtin... Zanistîya mêjûyî bi serêxwe ve beramber mejê tête bidîtin. Belam pir zanistîyên civakîyî din ji bona

ezmonkirina niha têtin bidîtin... Ez dê xwe ji bona dubarekirinê bi neçar ve bidim bidîtin; jiber ku Merov nikare mêjûwê di nava pilaneke nîşankirî de ji serî ve bide bixistin. Di her derîyekî mêjûwa Firensî de bi tevaya xwe ve lê tête bitemaşekirin. Herger ku ez li ser heremeke ciyografî de bihatama biaxivtin, magelo dê ez çawan xwe ji ezmonkirina vê herema hanê li ser ronahîya aburî, siyasî, zanistîya civakî, intropologî ûhd. bidim birizgarîkirin? Bi vî rengê hanê vê dê ev herema hanê, ya ku Merov divê mêjûwa wê bide bronahîkirin, nala yekitiyeke heyî bi serêxwe ve bête bikirin".

"Herwehajî dujwarîyeke din jî û nemaze ji bona Xwendevan têtê bidîtin; jibervêjî ez xwe neçar didim bidîtin, ku ez divê xwe di her gavekê de di nava heyaman de, di nava mêja dûrî dûr de, di nava dema dûr û nêzîk de û di nava serdema niha de bidin biveguhestin. Heger ku mêj jî ji niha bi bergiran ve, bi caran ve, bi çîyan ve, bi tiraş û newalan ve bête bicudakirin, belam ew dikare bi me ve di rê, newal û cuhukên xwe de bête bigihaştin. Mêj di dorhêla me de di nava ba de têtê bidîtin. Em ligel wê de dijîn, bêyî ku em wê bidin bihestkirin... Ez dê bidim bikarkirin, da ku ez livandinên dûrbûna kûrbûna mêja Firensî û lidûhevhatinên wêna bidim bidozandin, da ku ez wê bidim bidîtin, bê ka ew çawan ji bona nava niha têtê bikevtin, mîna ku çem ji bona nav derya têtin biherikandin".

"Magelo ez di helbijartina navnîşana nivîstê de "Nasîna Firensî" biserkevtî bûm? Belê ev navê hanê bi dilê min bû, belam têde çend salan berî biryara xwe ez dudilî bûm. Ev navê hanê bi xwe jî ve tevaya pirsan dide biderxistin, ji yên ku li ser wan de hatîye biaxivtin û ew pirsên din jî û remanên din jî bi ser de dide bivexistin".

"Magelo Nasîna Firensa kanî çi ye?, heger ku ew bi pirsiyarîyeke bingehî û navînî ve neyête biderkevtin û Firensa pişta xwe bi xwe ve nede bigirêdan? Ev hebûna jîndarî ji anîna mêja bêsînor bi bînferehbûneke dirêj ve ji qatên lidûhev de hatîye bipêkhatin, ji yên ku ew li ser hev de hatine bikomkirin, mîna ku ji kevtinên deryayî pêçên qaşilê zemînê di derbasbûna heyaman de têtin biafirandin. Nasîn ew mayîn bi xwe ye. Ew ji kevtinên kirinên kombûnê, tevlihevbûnê û têkdanê têtê biderkevtin. Ew bi pevçûna Merov bi dijî xwe ve têtê biderkevtin, da ku ew bête bihiştin. Heger ku pevçûn hate birawestandin, dê her tişt bête biherifandin. Netewek nala Neteweyekî

nayête bidîtin, heger ku ew bi bê birîn ve lidûxwe de nede bigirîn...û heger ku ew di rê de bi hezaran ji bawermendîyan, mêtologîyan, çem û rûbaran û nigaşan ve xwe bi xwe ve nede binasîn. Herwehajî nasîna welatperwerîyê sînorekî kêm ji Yekitîya Welatî nala wênekirina wêna dide bidivakirin".

"Pir bi dujwarî ve dê bête bidîtin, heger ku Merov nasînê ji bona wekhevbûneke sade yanjî ji bona wêneyekî bi tenha xwe ve yanjî ji bona bawermendiyekê bide bivegerandin".

Li paş de nivîsvan hin rojgarîyên bi derd ve dide bibîrxistin: 1815 -Waterlo-[1], 1871 -Sêdan-[2] û sala 1940, ya ku ew têde di Cenga Cîhanî Duwem de bi Dîlvan ve ji bona nava destên Elmanan ve hate bikevtin û wî çend sal di Dîlbûna xwe de li Elmanya de date bivebuhurandin. Wî li ser vê dîlbûna xwe de date binivîsandin: "Em Firensa windaker bûn, belam li dû me de Firensa Kûr dihate bidîtin".

Di derîyê bergê yekemî "Nasîna Fernsa: Cih û Mêjû de" Braudel dide bixuyanîkirin, ku çend rengên bikaranîna ciyografî têtin bidîtin. Hinek têtin bidîtin, ku ew ciyografya mîna zanistiyeke bi serê xwe ve û ligel pêwendîyên wê ligel zanistîyên serûştîyî din de didin

---

[1]Di şerê Waterlo de Napolyon hate bişikenadin û bidîlkirin. Cuma.

[2]Di şerê Sadan de Padîşahê Firensî ji bal Serdarê Leşkerê Elmanî Von Moltke de hate bidîlkirin û tevaya Firensa ji bal Elmanan de hate bilayînkirin. Di sala 1871 de li Kaha Feresay de Yekitîya Tevaya Elmanya di bin Rêberîya Serekwezirê Elmanî Bismark de hate bidazîn.

Ev Von Moltkê der sala 1835-1839 de nala Efserekî Elmanî ji bona bi rêk û pêkxistina Supahê Turkî ji bona nava Dewleta Osmanî hatibû birêkirin. Wî 64 name li ser rewş u zînetên Turkî de ji bona Hevalê xwe li Elmanya de date birêkirin.
Ev di bin navnîşana : "Name ji Turkî" de hatin binavkirin û ew di bin navnîşana nivîsta: "Li jêr Nîvheyvê de" hate biçapkirin. Ji xwe re bi zimanê Elmanî ve li çapa: Verlag NEUES Leben Berlin, sala 1984 de, di 407 rûpelan de, bidin bitemaşekirin.

Ji van nameyan sê name jî bes u bi tebnha ve li ser Kurdan de dayite binivîsandin. Ew pir bi nerx û buha ve têtin bidîtin; jiber ku ew li tevaya Kurdistana Osmanî de hatîye bigerandin û wî ew bi çavên Merovekî dûrbîn û zana dayite binivîsandin. Ez hêvîdarim, ku ez dê rojekê wê nivîsta bi nerx ve ji bona Xwendevanên giramî bi zimanî Kurdî ve bidim biwergerandin. Cuma

binivîsandin. Evaya bi xwe jî ve ciyografî didin bikirin. Belam ciyografya ji bona me dê bi rengekî taybetî ve nala rêyekê bête bidîtin, da ku em mêja Firnsî di wî warî de bidin bixwendin, ezmonkirin û liberxistin, di yê ku ew ji bona me Mêjûvanan de bi giringî ve tête budîtin. Ciyografya jî bi vê ve tête birûniştin. Esman, firehbûn, herem û dîdar nebes bi tenê ve ew bi rastîyên niha ve têtin bijîyandin, belam ew nala rengan jî têtin bijîyandin, yên ku ew ji bal mejê ve ... ji bal zemînê ve hatin bihiştin, mîna ku Merov piştê bi şopên birînên kevnar ve dide biparastin".

"Debihêlin, ku em bêhnekê xwe bidin jibîrakirin, ku çemên Rayin û Ron nebes tenê ew çemên bêdengin, yên ku ew bi vîna Merov ve hatine bibaqilkirin û bikedîkirin, mîna ku em wan di vê roja hanê de didin bidîtin. Debihêlin, ku em wan çemên hov bidin bidîtin, mîna ku ew hebûn, yên ku di nava wan de gemîkirin bi dujwarî ve dihate bidîtin. Tevlivêjî de bazirganî bi mêrxasî ve bi dujwarîya şepolên wan çeman ve li ser wan jî de hate bidîtin. Heger me weha date bikirin, dê emê niha ji bona mejê bidin bihiştin".

"Hêjabûna dîtina ciyografî ew di sitûrbûna ciyografîya de li ser dema dirêj û pirbûna rastîyan de tête bidîtin, yên ku ew li ser hevdû de hatine bikomkirin. Ji erkê me tête bidîtin, ku em wan ji hev bidin bicudakirin û careke din em wan ji nû ve bidin bibiyekkirin".

Braudel bergê yekem ji bona sê derîyan dide biparvekirin. Derîyê yekem ew wî ji bona "Dîtina Bînvanîya Mêjê li ser pirbûna Firensî" de dide bitirxankirin. Pirbûna wêna bi pirbûnê ve û hebûna "Welatên" cudan têde di warên cihî de û ji bona her yekê xwemoxtarîya wêna dayite bitirxankirin, bi têgihiştina ku Firensa bes û bi tenha ve komekê ji "Welatên" cudan bi rengên xwe ve û bi kaşîyên xwe ve di waran de dide bipêkanîn, yên ku ew dê wan di derîyekî de bide biezmonkirin, yê ku wî ew bi "Firensa di Cudabûna xwe de" -cudabûn bi -diversité- ve- dayite bibinavkirin.

Belam "Warên cudabûyî ligelhevdû de têtin biperçîmkirin, heger ku ji wan re pêwistî û divabûn di navbera warekî û yê din de bête bipeydakirin û hegerjî di navbera wan de nîşan û cudabûnên bi carekê ve û bi veguhestinê ve bêtin bipeydakirin yanjî bi wan rêyan ve têtin bidîtin, yên ku ew her û her bi serhişkî ve "Welatê" cihî bi heremê ve, gundan bi bajarên biçûk ve, van jî bi bajarên mezin û

melbendan ve bi laşê Netewe ve didin bidirûtin". Jibervêjî ew derîyê duwem bi: "Rêzanên Neşînvanîya Tûde: gund, bajarvanî û bajar" ve dide binavkirin. Ev yekitîyên hanê dikarin di nava hevdû de di "Komên Fireh" -bi têgihiştina heremên ciyografî ve- û hevgirtî de bidin bikomkirin, ji yên ku ji bona her yekê ji wan taybetîyên wê di nava Netewe de têtin bidîtin.

Wisa netewe ligel hebûna van "Komên Fireh" de di nava xwe jî de "dikarîbû ji bona xwe yekbûneke komkirî bide bidurustkirin û ew xwe di mayînê de bide bihiştin. Belê serûştîya banîya wêyî zemînî - Espou, Raum- ji bona hebûnkirina wêna date bialîkarîkirin. Ev Firensa hanê di nava mala xwe de di beşekî Ewropî de di nava cîhanê de hate bipêkhatin". Jibervêjî wî derîyê sêyem dayite binavkirin: "Magelo ciyografya Firensa dayite biafirandin?".

Danervan di derîyê yekem de dide bigotin: "Heger ku me bi tûjî ve lê bidin bitemaşekirin, dê emê bidin bidîtin, ku Ingilistan[1], Gerministan, Italya û Sipanya jî ji pir rengan têtin bipêkhatin, belam rengbûnên heremên wan dibe, ku ew di jimar û perçîmbûnên xwe de ji yên Firensî kêmtir bêtin bidîtin".

Ez nivîstê didim bigirtin û ez wê bê helbijartineke berê careke din didim bivekirin. Çavên min li ser rûpelê 83 ji derîyê yekem têtin bikevtin û ez têde navnîşanekê mîna tê ez dibînim: "zaravayên cihî û navên ciyografî di nokerîya ciyografîya berî mêjûwê de"[2]. Ez têde "zaravayên cihî û navên ciyografî didim bixwendin, tevî ku ew jî ji me re ji mêjê ligel veguhertinên peyvdarîya xwe de hatine bigihaştin. Hemû bi xwe jî ve ji bona sînorên demên lidûhevdû de didin binîşandan. Dibe, ku bi hêsanî ve rêk û pêkxistina wanî demî neyête bidîtin; belam ew bi xwe ve bi rastî ve li ser rastîya xweyî niha tête bisuwarkirin, ku zimanê Firensî bes û bi tenha ve di Firensa de taze hatîye belavkirin. Herwehajî veguhertinên peyvdarîyê di van navan de

---

[1]Firensî gotina "Ingilistanê" ne bes bi tenê ve bi têgihiştina "Ingilistanê" ve ango England didin bikaranîn, lêbelê ew bi têgihiştina "Britain" jî didin bikaranîn, - ya ku ew ji ya pêşî bi firehtir ve tête biderkevtin-. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Bi zimanê Firensî ve: "La dialectologie et la toponymie au service d'une géographie préhistorique". Ismet Şerif Wanlî

ew dikarin bêtin bixwedekarîkirin; belam ew jî bi xwe jî ve wî tiştî bi xwe jî ve didin biderxistin"[1]

Di vir de "xizneke giranbuha ji bona nasîna mêja dûr tête bidîtin, ya ku hêjî kûrbûna wêna ji bal Karnasên zanistîya zimanan nehatîye bidiyarkirin".

Ez rûpelê 111 ji vê nivîstê -ji bergê duwem li ser Tude dedidim bivekirin û ez têde didim bixwendin: "Neşînvanîya Tude di nava gundan de bingehê jînêyî hîmî dide bipêkanîn û li ser dubarekirina rêzanê de tevaya avanîyê tête birawestandin". Komkirina gundan nimûneyekî dide biderxistin, ku ew hîç bi carekê ve ji heremekê ji bona ya din nayête biveguhertin û ew bê dawîbun tête bidubarekirin. gund xwe di nava bazinan de li dora bajarokî de didin bikomkirin, yê ku ew ji wan re bazarekê dide bipêkanîn, mîna ku sitêr xwe li dora sitêrkokê de didin bikomkirin. Komkirina "gundan li dora bajarokî de" malikekê dide bipêkanîn, ya ku ew tête bidubarekirin. Herwehajî ew malikên hanê -yanjî navçe: Ismet Şerîf Wanlî- bi xwe jî ve xwe li dora bajarokî de didin bikomkirin. Ev malikên hanê ligel malikên dor û berên xwe de wê didin bipêkanîn, ya ku em wê "bi welatê cihî ve" didin binavkirin. Ev jî bi xwe jî ve xwe li dora bajaran didin bikomkirin, yên ku ew ji wan re bazarên wanî bazirganîyê didin bipêkanîn. Bajar û dor û berên xwe bi rê û banan ve ligel hevdû de têtin bigirêdan, da ku ew heremekê bidin bidurustkirin û ji bona her heremekê bazara wêyî ciyografî tête bidîtin. Belam dan û sitendina

[1]Nêzîka nîvê Tudeyên Firensî hêjî bi zaravayên cudayîyî ne Firensîya nuh tanî destpêka sedsalê nozdehan de dihatin biaxivtin. Ji van jî °Langue d'Oc" -zimanê Ok li Jêr de û "Franco - Provencak" -fronko-Provensak li Jêrî rojhilat -û li jorî Italya de û nemaze li herema Torîno û Osta de û li hin heremên Siwêsra Firensî de- têtin bidîtin. Ev herdu ziman jî ji bona Binemala "Romanîyî Galî" mîna Firensîya Nuh, -ya ku ew li herema Parîsê de hate bipêşvekevtin-, têtin bigihaştin. Herwehajî jê zimanê Breton têtê bidîtin, yê ku ew ji bona Binemala "Seltîyî" Galîyî kevnar têtê bigihaştin. Herwejî ji van zimanan jî Baskî li nêzîka çiyayên Prinêni de, Filamendî li nêzîka sînorên Belçîkiyî rojava de û Gerministanî di heremên Ilzas û Lorîn de têtin bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

hereman ligel hevdû de ji bona afirandina "Bazara Welatî" bes û bi tenha ve di demeke dereng de hate bikirin.

Li alîyekî din jî de di -rûpelê 121- tête bigotin: "ku her gundek û bi cihê xwe ve nala malikeke biyologî tête biderkevtin, ya ku ew rê bi neşînvanîyê û berkirinê ve dide bidan".

Ez rûpelê 127 ji xwe re didim bivekirin û ez ji xwe re di nava wî de vê navnîşana hanê didim bidîtin: "Daristan: Kulîlka Bêran". Ez têde didim bixwendin: "Me tanî vê roja meyî niha jî nedida bizanîn, bê ka daristan çi hêjabûneke aburî dide biwênerîkirin. Min di jor de rola wêna ji bona xwedîkirina terş date bidiyarkirin. Pelên darên berûwan û dirdaran ji bona êmê cenaweran dihatin bicivandin, gava ku gîya ji bona wan dihatin bikêmkirin. Pelên narewan ji bona dagirtina livînan û sergokirina erdên çandinîyê didan bikaranîn. Herwehajî daristanê darên sûtandinê ji bona pijîna xwarinê, germkirina xanîyan, hîtkirina lajwerdan, çêkirina hesingerîyê, avceh, elkuhul û caman dida bipêşkeşkirin. Herewehajî wê kel û pelên xav ji bona çêkirina depan, haletan, ereban, qapqapkan û destikên cudan û ji bona avakirina xanîyan, gemîyan û qeyikan û herwehajî ji bona pir aletên din jî mîna givaştinan, tirumpe, qerasan û çerxên bi diranên di nava hevdû de dida bipêşkeşkirin".

Belam daristan bi xwe jî ve "Cîhaneke Servaje". -Ev navnîşana rûpelê 128 bû-. Ango: "Ku ew nala Buhuşta Rêbiran û Keleşan dihate bidîtin". Pir ji daristan jiber vî hoyê hanê hêjî cihê metirsîyê têtin bidîtin.

Di derîyê sêyem de tête bidîtin, -magelo ciyografya Firensa dayite biafirandin?- Danervan bersiveke bi carekê ve li ser vê pirsa hanê de nade bidan, belam ew cihê wêna di alîyê rojavayî hişkîya Ewropî de di navbera ziryanê Atlesî û derya Sipî, derya Jorî û çemê Rayin de dide biberzkirin. -Ew dide bipirskirin: Magelo bi rastî jî ve Ewropa nala hişkayetîyekê ve tête biderkevtin, yanjî ku ew nala dirêjbûnekê ji perçeyê hişkatîya Asyayî tête biderkevtin? Ew giringbûna -isthme, Isthmus, ew tengavîyeke zemenî ye, ya ku ew di navbera du deryan de tête ^bidîtin- Banê di navbera Atlantik û derya Sipî de dide biberzkirin û herwehajî ew giringbûna deşta çemê Ron jî û pêwendîya wêna bi cihokekê ve ligel çemê Rayin jî dide biberzkirin. Ew ji xwe jî dide bipirskirin: Magelo çima deşta Parisê bi navînîya

Firensa ve û ma çima jî Paris bi navînîya Firensa ve hate bikirin?". Herwehajî ew pirsa sînorê rojhilatî ligel Germinstanê -çemê Rayin- de dide bikirin. Herwehajî ew dide bipirsîn: Magelo "Sînorên Serûştî jî têtin bidîtin"?

Braudel di beşê duwemî vê zincîra hanê "Nasîna Frensa: Merov û Tişt" di sala 1968 de di bergan de date bibelavkirin[1]. Wî beşê yekem jê "Merov" ango Neşînvanî li ser zemîna Firensî de ji heyamên berî mêjûyê de ji heremekê ji bona herema din de û herwehajî derkevtina çandinyê, gundan û xwedîkirina terş û barkirinên cudan, yên ku ew ji bona ser zemîna wê di heyamên cudan de hatin bidîtin, date bitirxankirin. Herwehajî wî têde pêşvekevtina Tudeyan û bêtirbûna wan -jiber hoyên derveyî mîna barkirinan yanjî hoyên hundurû mîna pêşkevtin û bêtirbûna destikên berkirinê- date biderxistin. Herwehajî wî kêmbûna Tude -jiber hoyên cengan, yanjî nexweşî û halan- date biderxistin. Wî bergê duwem jê "Tişt" ango aburî û berkirin û bi taybetî ve ji bona aburîya çandinyê date bitirxankirin.

Heger ku bergê yekem jê, yê ku me ew nala "Nasîna Firensa: cih û mêjû" date bidîtin, ew ji me re "Pirbûna" welêt di warê mêjûyî û ciyografî de tanî vê serdema me dide biderxistin, xwendina bergê yekem ji beşê duwem ji bona ber çavên Xwendevan rengên cudan ji Tudan dide bidanîn, yên ku ew di nava derbasbûna heyaman de li dûhevdû de ji bona nava welêt hatine bikevtin, yanjî mîna ku ew dide bigotin: "Pir Firensa li dûhevdû de" cuda û mîna hev di hergav de hatine bidîtin û ji vê tevlihevbûna wê de ji kevnar û niha de Miletê Firensîyî niha hatîye biderkevtin. Dibe, ku bi başî ve piçekî jî bête bidîtin, ku Merov bêhnekê xwe li bal vî bergê hanê de bide birawestandin.

Braudel bi agehdarîya Xwendevan ve dide bidestpêkirin: "Me date bigotin, ku Préhistoire -berî mêjûwê ne ji mêjûwê tête bidîtin". "Welatê Galî dihate bidîtin, berî ku ew bi welatê Galî ve bête

[1]F. Braudel: "L'identité de la france: les houmes et les chose", Paris 1986. Bergê yekem jê di 243 rûpelan de û bergê duwem jê di 536 rûpelan de têtin bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

binavkirin", -yê ku ew ji bal Qeyser Serdarê Romanî hate bivekirin, mîna ku me ew di sedsalê yekemî pêş zayînê de date bidîtin-. "Firensa jî berî Firensa dihate bidîtin". Bi serdejî ve wergirtinên Firensa ji mayînên welatê Galî Merov nikare li ber mêjûwa wê de bête bikevtin, "heger Merov li mejê de bi çavekî rast û durust nede bitemaşekirin, ya ku ew li pêşîya vekirina Romanî de bi jimara hezaran sal ve tête biderkevtin". Ev jîber "ku komikên mezinî ji dema mêj de, yên ku Merov di nava wan de hatîye bijîyandin, ji bona me têtin bigihaştin, ku Merov nikare mêjû ji berî mêjûwê bide bicudakirin".

Danervan li ser nuhbûna "zanistîya berî mêjûwê" de pir tête biliberkevtin û ew di payînê de bes û bi tenha ve dikare tanî niha mêja kevnarî kûr bi rengekî nêzîkî ve bide bironahîkirin. Li gora agehdarîyên meyî niha de Bavpîrên Merovê Pêşî "Momo habilis" bû, yê ku ew di pêşî de li Afrika de hatîye biderkevtin. Wî dikarîbû xwe li ser lingên xwe de bide bigirtin, destên xwe bide bikaranîn û jê re bîrwerî û hestî dihate bidîtin. Li paş de "Homo erectus" -Merovê Rabûyî şûna wî date bigirtin, yê ku ew li ser lingên xwe de dihate birêkevtin û ew dihate biaxivtin. Şopên wî di Rojhilata Navînî û Ewropa de û jêjî di Firensa de têtin bidîtin. Şopên wî di Ferensa de ji bona nêzîka yek melyon û heştsed hezar sal têtin bivegerandin. Bi rastî ve şopên ji bona nêzîka nehsedûpêncî hezar sal têtin bivegerandin, mîna ku wan şopên xwe di şikevta jorî bajarê Nice -Nisê- de di herema çiyayên Alpî deryayî de dane bihiştin. Di nêzîka sed hezar sal de di berî zayînê de "Homos Sapiens" cihê "Merovê Rabûyî" ji xwe re date bigirtin. Ew herwehajî bi "Merovê Neader thal" jî ve dihate binavkirin. Wî mirîyên xwe didan biveşartin. Merovê niha "Homo Sapiens" di deverên cudan de û di Ewropa de di nêzîka Sêsedûpêncî hezar sal berî zayînê de hatîye bidîtin. Wî nigarî û neqişkirina ser beran dida bizanîn, Hesteke wîyî oldarî dihate bidîtin. Wî ji me re nigar li Firensa de di şikevta Lascause, Cro-Magnon -Lasko û kro-Mangon û yên din de li dû xwe de dane bihiştin, yên ku ew ji bona navbera sî û deh hezar sal berî zayînê têtin bivegerandin. Xwedîkirina terş û destpêkirna çandinîyê di nava Firensa û perçeyên dinî Ewropa de bihatina ji Rojhilat di nava du rêyan de hatine bipeydakirin: Di Jêrî Firensa de ew di rêya derya Sipî de ji destpêka hezar salê pêncehemînî berî zayînê de bi alîkarîya bazirganîyê ve hatine bipeydakirin. Li jorî

wê de ew li paş nêzîka pênc sedsalan jê bi alîkarîya deşta çemê Danop û barkirinê ve hatine bipeydakirin. Bi destpêkirina çandinîyê ve emrazên çandinîyê û çêkirina qafikan dayite bidestpêkjirin. Merov dest bi rûniştinê ve dayite bikirin. -Çandinîyê û ywedîkirina terş di Kurdistanê de ji nêzîka deh hezarê berî zayînê de dayite bidestpêkirin. Li paş de gemîkirinê di derya Ice de dayite bidestpêkirin-.

Danervan dide bidîtin, ku Ewropa bes û bi tenha ve nala dirêjbûneke biçûk ji bona perçeyê Asyayî mezin tête biderkevtin û ew her bêtir ber bi rojava ve tête bitengkirin. Firensa tevî bi firehbûna xwe ve bes û bi tenha ve ew nala payîna tengbûna Ewropa beramber bi ziryana Atlesî ve tête biderkevtin û ew bi pesinandina xweyî ciyografî ve her û her nala hêvîbûnê dihate biderkevtin, ya ku di nava wê de barkirin û hêrîşên derbasbûyî di nava Ewropa Rojhilatî û Navînî de dihatin bipayînkirin. Herwehajî Firensa bi saya kenarê xwe ve li ser derya Sipî de her û her ew ligel deşta vê derya hanê de dihate bipêwendîkirin. Ji vê hate biencamkirin, ku Firensa ji kevnar de bi xwedan Tudeyên tevlihev ve dihate biderkevtin. Em têde rengên Interpologîyî Ewropiyî sê qolî didin bidîtin: -Nordique - Jorîyî Serdirêj, Alpîyî - Sergundor û Jêrî, mîna ku ew di deşta derya Sipî de tête bidîtin-. Herwehajî pesinandina wênayî ciyografî û başbûna av û bayê wêna jê re mercên pêwist ji bona pêşvexistina çandinîyê û bêtirkirina serjimara Tude datin biamadekirin.

Ji bona Ewropa û herwehajî ji bona Firensa çêkirina lajwerdan ji Asya Rojava bi wan ve hate bigihaştin: pêla misê di navbera salên 2500 û 1800 berî zayînê de hatîye bidîtin, pêla tûncê di navbera salên 1800 û 700 berî zayînê de hatîye bidîtin û pêla hesinî û pêrejî hesp ji vê mêjûwê de ji sala 700 berî zayînê de tête bidîtin. Çêkirina tûncê û anîna lajwerdan perçekî ji Ingilistanê date bipêwistkirin.

Gund li ser kenarên çeman de hatin bibelavkirin. Bi birîna darên daristanan ve di navbera destpêkirina sê hezar salî û sala 1800 berî zayînê de Karnas serjimara Firensa di vê mêjûwa hanê de, -Danervan bi wan ve dide bînvanîkirin-, di navbera 2,5 tanî 5 -pênc-milyon Kes didin bidanîn.

Di pêla sala 1200 tanî 100 berî zayînê de barkirinên nuh ji bona Firensa di rêya çemê Rayin de hatin bikirin. Hatinvan, -em tu tiştî li ser wan de nadin binasîn-, ji Tudeyên kevnar dihatin

bicudakirin; jiber ku wan termên mirîyên xwe didatin bisûtandin. Ew ligel pêşîyan de hatin bitevlihevkirin. Ji vê pêşvekevtina çandinîyê hate biencamkirin.

Di nava sedsalên heft û şeşemînî berî zayînê de bazirganî di navbera Firensa Jêrî û welatê derya Sipî de hate bifirehkirin. Di nava welatê derya Sipî de bajarên xwedan bedenên sengîn hatin biderkevtin. Ji van jî Massalia -Mersilya- hate biderkevtin, ya ku ew ji bal Bazirganên Yunanî ve di nêzîka 600 salên berî zayînê de hatîye biavakirin. Herwehajî koman ji Etrusqus -ji Italya- di nava çiyayên Alp re ji bona Firensan di vê pêlê de bi destpêkirina barkirina xwe ve dane bikirin.

Pêlên berî mêjûwê li Firensa de li gora bîr û bawerîya Danervan de ligel koçkirinên Miletê Galî de ji bona wê bi jimarên gewre ve di sedsalê pêncemînî berî zayînê de[1] di derbasbûna çemê Rayin de hatine bidawîkirin. Ew ji bona wê ji Ewropa Navînî û nemaze ji Bavarya li Gerministanê de û ji Bohêmya -li Çikoslovakya de- hatin. Galî bi zimanê Yunanîyî kevnar ve bi "Kaltoi" ve dihatin binavkirin. Ew bi zimanekî Hindo-Ewropî ve didan biaxivtin. Miltên Hindo-Ewropî di wê gavê de ji Firensa tanî deşta çemê Gang li Hindê de dihatin bibelavkirin. Hegerjî Ev Miletên hanê jî "bi zimanên nêzîkî hev ve jî dihatin biaxivtin, mîna ku Danervan dide bidîtin; belam ew Miletanan di warê resenî û Interpologî de bi cudabûn ve dihatin biderkevtin.

Belam Galî bi xwe ve "di warê rehîtîya xwe de Miletekî tevlihev ligora dîtinên Iteropologîyan dihatin biderkevtin. Hinek ji wan Dolichocéphles -Serdirêj- û hinên din ji wan Brachycéphles -Serdestarî- dihatin bidîtin.

Germanî di wê gavê de li ser rexên derya Baltik -ango Jorî welatê Siltîyên pêşî- de dihatin bijîyandin, di dema ku Slaves -Silavî di Rojhilat de dihatin bijîyandin. Siltî ji Germanan û Silavîyan bêtir bi

[1]Wer tête bidîtin, ku payînbûna "berî mêjûwê" û destpêkirina pêlên mêjûyî, -yên ku ew beramber bi yên berî xwe ve têtin binîşankirin, ku em wan bi rengekî hûrtir ve didin binasîn; ev jî bi saya destpêkirina nivîsandinê tête bidîtin-. Nivîsandinê li Mizopotamya de di pêşîya hezar salê sêyemê berî zayînê de diyite bidestpêkirin, ango wê berî Ewropa bi nêzîka bîstûpênc sedsalan ve dayite bidestpêkirin. Ismet Şerîf Wanlî

bajarvanî ve dihatin bidîtin, jiber ku ew ji navînîya bajartîyê bi nêzîktir ve dihatin bidîtin.

Em tu li ser hoyên barkirinên yanjî hêrîşên wan Siltîyan de nizanin. Barkirinên wan ji dawîya sedsalê şeşemînî berî zayînê de ji jor de dayite bidestpêkirin. Di payîna sedsalê lidûhatî de ew bi xwedanê welêt ve hatin bikirin. Wan piranîya Tudeyên pêşîyî welêt di nava xwe de datin bimijandin û zimanê Siltî bi zimanê Firensa ve hate bikirin[1].

Hinek ji Siltîyan li ser rêya xwe de ji bona Sipanya hatin biçûyîn. Beşekî din ji wan ji bona welatê Galî Birîtanî, Sikotlanda û Irlanda hatin biçûyîn. Herwehajî beşekî din ji wan ji Bavarya ji bona jorî Italya di rêya gelîyê Brenner de hatin biçûyîn û ew li herema çemê Po -devera Milano- hatin bineşînîkirin. Belam wan Roma di sala 386 berî zayînê de dane bilayînkirin. Der sala 230 berî zayînê de beşekî din ji Galîyan ji bona nava Ewropa Navînî û Asya Biçûk -Turkî- dane bibarkirin. Wan li wêderê de Padîşahîya Galate -Galatî . dane bidamezirandin. Hinek ji wan jî di Belkan de hatin bidaniştin. -Herwehajî em dizanin, ku welatê Galîyî -nuh- Siwêsra û Belçîka jî dida biwergirtin-. Wan ev welatên hanê hemû bi darên ço ve dabûn bivekirin.

Heger ku Galîyan jî dikarîbûn Firensa di warên ziman û zanyarîyê de bidin biyekkirin, -bêgûman ku ev jî di cara pêşîn de hatîye bikirin-, wan nedikaribû wê di warê siyasetê de bi Dewleteke Yekgirtî ve bidin biveguhertin. Hêjîbêtir ew bi vî karê hanê ve nehatin birabûn; jiber perçebûna Xanedanên wêna di nava Malbatên bi hev re berberî de ji bona ku her yek ji wan perçeyekî ji welêt bi bin destên xwe ve bide bixistin. Belam pêşvekevtina Firensîyî aburî û şehrestanî rêya xwe di pêla Galî de didate bigirtin û wê çarsed salî date bidirêjkirin, ango wê tanî vekirina Romanî date bidirêjkirin. Ev jî mêjûwên Qeyser -Caesar- û Pline yê kevnar didin biderxistin.

Gava Qeyser bi Leşkerê xwe ve di nava gundên Galî re hate

[1]Bi pirbûn ve ji bona Firensa tu yekitîyeke zimanî berî barkirinên Siltîyan nedihate bidîtin. Dibe, ku piranîya Tudeyên wêna bi zimanekî ji Malbata "ibérique" -Ibirî -mîna li Sipanya û Ingilistanê de- dihatin biaxivtin. Hêjî tanî vê rojê jî ji bona vî zimanê hanê zimanê Bask tête bigihaştin. Ismet Şerîf Wanlî

biderbaskirin, ew gundên hanê pir geşbûn û ew bi aşên avê û bi enbarên dan ve mişebûn. Cotkarên wê xwedanên emrazên çandinîyî ji dar û hesin bûn û ew pir ji emrazên Cotkarên Îtalî pêşkevtirîbûn. Ji van emrazan jî "Mekîna Paleyê" dihate bidîtin, ya ku ew bi taran ve dihate bidîtin û ew bi diranên hesinî ve ji bona paleyê hatibûn bipêvekirin û ew bi bargîran ve dihate bikişandin. Pesnê vê mekînê li nik Plinê kevnar hatiye bidan. Herwehajî li nik wan de denên çêkirî ji darên berû dihatin bidîtin, yên ku wan di nava wan de mey û zeyt didane bihilanîn û Romanîyan ev denên hanê nedidan binasîn. Caesar -Qeyser- dide bigotin, ku Galîyên Transalpine -Li paş Alp- -ango Firensa niha- bi gelekî ve bêtir bi pêşkevtî ve dihatin bidîtin, belam ew di warê cengê de ji Galîyên Hevites -di Siwêsra de- û ji Galîyên Belçîka kêmtir hunerbazbûn; jiber ku Galîyên wan welatan her û her ligel Germanan de xwe di nava ceng û şeran de didatin bidîtin. Galîyên Firensa ji Germanan bi robarê Rayin ve dihatin bisinorkirin. Herwehajî Caesar -Qeyser- dibêje, ku Ginêf nala bajarekî Helvites tête bidîtin. Galî pir di hesingirîyê, dartaşîyê, çêkirina çerman, xişran û çekan de bi nav û bangbûn. Wan hesin, zîv û zêr ji bin zemînê ji çîyayên Cevernnes didan biderxistin. Ew ji yên pêşîbûn, ji yên ku wan sabûn li Ewropa de dane biçêkirin. Ew pir di çêkirina pertal de ji kitanê û hirîyê û di rengkirina çerman jî binasbûn. Serokên wan xwedan erebane bûn, yên ku ew bi hespan ve dihatin bikişandin. Ew pir ji bona cengê sivik û bilezbûn yanjî ew giranbûn û bi çar çerxbûn û ew ji bona barkirinê û veguhestinê dihatin bikaranîn. Herwehajî ew xwedan kelatên mezin bûn, yên ku ew nala bajaran bi bend û burcên xweyî kevirî ve dihatin bidîtin. Ew li ser berzîyên bilind de ji bona liberxwedanê dihatin biavakirin. Pir caran jî dora wan bi cihokên avê ve dihatin bidagirtin. Ji van kelatên bi nav û bangtirîn kelat û bajarî Alesia baregeha gewreyê Galî Vercingitrix -ersincitorirks- dihate bidîtin, yê ku wî li ber welatê xwe de pir salan date bidan; belam ew der sala 52 berî zayînê de piştî çardorlêgirtineke dirêj li ser paytextê wî de bi berdestbûnê ve hate bineçarîkirin[1]. Karnas serjimara Tûdeyên welatê Galîyî Firensîyî di wê çaxê de bi nêzîka neh melyon Ten didin

[1]Alesia di nava heremeke çiyayî de di dilê Firensa de li nêzîka çemê loire de dihate bikevtin û ew bi derbasbûna demê ve hate biwindakirin. Ismet Şerîf Wanlî

bitexmînkirin, di dema ku serjimara tevaya Tûdeyên Imperetorîya Romanî bi nêzîka pêncîûçar milyon Ten dihatin biderkevtin.

Braudel ji xwe dide bipirsîn, çima welatê Galî beramber bi Romanan ve bi vê lezê ve hate bikevtin, Piştî cengekê ku wê heşt salan date bidirêjkirin; tevî ku jî pirbûna Xelkên Galî, mêrxasîya wan, pirbûna mal, çek, zad û terş li nik wan de dihate bidîtin; di dema ku Roma nêzîka dused salî de li Sipanya de date bişerkirin? Hîç gûman lênayête bikirin, ku hoyê vê kevtinê perçebûna Xanedanîya Galî di nava hev de dihate bidîtin û herwehajî gihandina hinekan ji Mîrên Galî ji bona Leşkerê Qeyser dijî Mîrên din tête bidîtin. -Mîna ku hinekan ji Begên Kurdan beramber bi Leşkerên Şehrîyaran û Şahînşahan ve dane bikirin-. Herwehajî jiber ku Miletê Galî ji çend şaxên cudan li gora hereman de dihatê bipêkhatin. Ji van şaxan jî Arvorne, Aedui, Allobrog, Bituric, Lignon, Senon, Troveri û Venétes dihatin bidîtin. Romanan şerên van şaxan dane bikirin û wan ew yek li dû yê din dane bibezandin, bêyî ku ew xwe bi yek ve bidin bikirin. -Hêjîbêtir şaxê Allobrog di pêşîya pêşî de di kara Romanan de dida bişerkirin. Herwehajî tête bidîtin, ku Venétes li ser kenarê Atlantî de bûn û ew pir di çêkirina gemîyan jî derbûn; jibervêjî Qeyser ew ji bona avanîkirina geştîyan ji bona xwe dane bikaranîn. Ji rexekî din de li paş mirina Qeyser de bi demeke kurt ve serdarîkirin li Roma de bi Imperetorîyê ve hate bikirin û Imperatorên wê siyaseteke şarezayî beramber bi welatê Galî ve dane bikirin. Wan gewre û Mîrên wê ji bona serpereştîkirina xweyî bajarî û supahî dane biwergirtin. Vêna date bikirin, ku zimanê wanî kokî ji wan re bête bihiştin. Herwehajî Roma di dawîya sedsalê duwemî berî zayînê de piranîya kenarê Galî -Firensî- li ser derya Sipî de date bivekirin û ev herema hanê bi navê "Province" -Deverê- ve hate binavkirin û paytextê wê bi bajarê Narbonne ve dihate bidîtin. Ew nala "rûyekî" Romanî ji bona welatê Galîyî mayî dihate bidîtin; bê ka çiqas Imperatoran li ser wî paytextî de dabûn bixerckirin û bê ka wan çend têde ji temaşegehan, yarîgehên werzeşî û avgerman dane biavanîkirin, ji yên ku ew tanî niha jî hêjî têtin bidîtin.

Herwehajî divê hozanîya Ceasarî -Qeyserî- Supahî neyête bijibîrkirin, yê ku ew der sala 55 berî zayînê de dihate bidîtin, ku hêjî tenûra cengê di nava welatê Galî de vêketîbû, ku ew bi hêrîşeke ji

nişkê ve ji bona ser Ingilstanê hate birabûn û wî ew date bivegirtin.. Belam Ingilistan giraveke perîşan bû, kêm Tûde bû û hêjî çandinîyê ji berî nêzîka sedsalekî pêve têde nedabû bidestpêkirin. Roma bi hiştina parêzgeheke supahî ve li ser kenarên çemê Rein -Rayin- xwest, ku ew welatê Galî ji hêrîsên Germanî bide biparastin.

Miletê Galî bi vegirtina Romanî ve zimanê xweyî Siltî û herwehajî li paş de ayîna xweyî pûtî jî date biwindakirin. Ayîna filetîyê di rêya Romanî de di sedsalê sêzdehan de ji bona Galîyan hate bigihaştin. Beramberî ayîna filetîyê wirde wirde bawermendîyên gelêrîyî Siltîyî kevnar dihatin biwindakirin.

Herwehajî Romanîyan di nava welatê Galî de rêyên dûr mîna di nava Imperatorîyê de dane bivekirin. Bi vî rengî ve jîyana bajartî hate bipêşkevtin. Lêbelêjî Romanîyan ji bona nava gundên Galî de rêstika bendîtîyê dane bixistin, mîna ku ew li Italya û Yunanê de dihate bidîtin, Wisa bi vî rengî ve nêzîka nîvên Cotkarên Galî bi Werzevanên xurde ve û nîvên din bi Bendan ve hatin biveguhertin, yên ku wan li nik xwedîyên erdên mezin de -Rêstika Latufundia li Italya de- û di werzên mezin de didan bikarkirin, yên ku ji wan re Villa dihate bigotin. -Ji vê gotinê jî peyva Villa nuh bi têgihiştineke din ve hatîye biderkevtin-. Ji vê çewisandina hanê serhildan û şûreşên cotkarî hatin biencamkirin û bi hezaran Rêbirên rêyan ve .hatin biderkevtin, yên ku ew di nava daristanan de bi rengekî çeteyî veşartî ve dihatin bijîyandin. Her yekî xwe li wan de didate bigirtin, yê ku ew ji karê serbazîyê dihate bibazdan.

Ez pir bi dirêjî ve ligel Danervan de nayêm birawestandin, da ku hêrîşên Germanîyî Firengî li ser welatê Galî de di sedsalê pêncemînî zayînê de bidim bibîrxistin.. Min berî vê di raxistina peyivandinê de li ser payîna heyamên kevnar de û di despêkirina sedsalên navînî de ligel rûxandina Imperatorîya Romanîyî Roava de beramber bi hêrîşên Germanî de dayite bibîrxistin. Divê li ser giringbûna vê rastîyê de derbarê mêjûya Firensî de bête bidubarekirin. Gerjî tevaya Germanan, yên ku ew wê çaxê di welatê Galîyî Romanî de hatibûn bineşînkirin, kêmanîyek didan bipêkanîn. -Ew nêzîka milyonekê jî ne neh yanjî deh milyonê Galî ve li gora texmîna Braudel de dihatin biderkevtin-. Gerjî wan Germanîyên Firengî zimanê Galîyî-Romanî û ayîna wêyî filetî jî ji xwe re dane biwergirtin, divê neyête

bijibîrkirin, ku wan Firengan navê Firensayî nuh pê dane bidan û wan serdarîya wê bi Padîşahîyê ve dane biveguhertin. Herwehajî wan ji bona nava wêna zikmakîya xwe di rêxistinê û başîtîya serpereştîyê de di pêla Binemala Mérovingieus de û li paş de di pêla Binemala Carolingieus de dane bianîn, yên ku navên wan hatine bibîrxistin. Herwehajî Bourgogue, yê ku ew jî Miletekî Germanîyî din bû, ji bona Firensa date bibarkirin û wî navê Mîrzadeya xwe Bourgogue li rojhilatî Firensa de date bihiştin. Vê Mîrneşînîya hanê serê xwe beramber Padîşahên Firengî date bihildan, gava ku wan didatin bixwestin, ku ew Padîşahê bidin bifirehkirin. Der sala 732 zayînê de Charle Martel Bavpîrê Binemala Carolinggieus li nêzîka bajarê Poitiers -Puwatye- hêrîşa musulmantîyê date bişikenandin, ya ku ew ji Endelos ji bona nava dilê Firensa hatibû bidestpêkirin. Ev hêrîşa hanê nema hate bidubarekirin. Belam Padîşahên Firengî nikarîbûn li hêrîşên Normandîyî ji nişkê ve ji bona ser kenarên Firensîyî jorî rê li ber wan de bidin bigirtin. Wisa ew Jorîvanên hanê di sedsalê dehemîn de li herema Normandie de hatin birûniştin û wan navê xwe lê dane bikirin, ya ku ew li nêzîka devê gihandina çemê Seine de ji bona derya tête bikevtin[1]. Ji Miletên Germanî, yên ku ew di wê pêlê de hatin bibarkirin, divê navê Miletê Alamans bête bibîrxistin, yê ku ew der Siwêsra hate bineşînîkirin. Lêbelê vî Miletê hanê zimanê xwe neda biwindakirin, mîna ku li Firensa û Italya de hate bidîtin. Wan piranîya

[1]Min di nivîsandina xwe de nala Elemanan nav û piranîya gotinan bi tîpên mezin ve didan nivîsandin. Ciwan di vî warî hanê de pir rexnên tund û giran li şêweyê vê nivîsandina min de date bikirin û wî date bigotin: Elman niha pir dixwazin ew xwe ji vê reweşta bed bidin birizgarîkirin. Ma çima tu dixwazî zimanê Kurd bi vê şêweyê nivîsandinêyî bed ve bide bixemilandin? Divê tu xwe û zimanê xwe ji vî karî bed bide bidûrkirin.

Min ev gotin û rexneyên Ciwan pir di nava serê xwe de datin bianîn û bibirin û di encamê dawî de bi neçarî ve ez bi rastî û dûrbînîya bawerîya wîna ve hatim bibawerkirin. Jibervêjî min dev ji şêweyê nivîsandina xweyî Elamnî date biberdan. Merov divê ji Zarokên xwe jî bête biferkirin; tevî ku pir caran jî peyvên wan tirş û tal jî têtin bidîtin. Ez ji xwendevanan hêvîya lêbuhurandinê li ser bikaranîna min de şêweyî Elmanî di nivîsandinê de tanî niha didim bixwestin. Cuma

Tudeyên wêyî Siltîyî kevnar Helvétes -ji bil Tudeyên herema Siwêsrîyî Firensî- dane bimijandin. Bi sersûrî ve tête bidîtin, ku wan "Elemanan" navê xwe ji bona Elemanya û ne ji bona Siwêsra dane bidan, ya ku wê ji xwe re navê Helvétes date biparastin. Belam beşek ji Elemanan li Elemanya jêrîn de hatin bicîkirin, -herwehajî Eleman xwe bi navê Deutsch[1] ve didin binavkirin; belam ew bi navê "Eleman" li nik piranîya Miletên din de têtin binaskirin.

Em dizanin, ku rêstika derebegîyê di Firensa de ji pêla Carlongieus dayite bidestpêkirin; lêbelê Braudel têde çakîyekê beramber bi serhatinên çînîyên Cotkaran ve di pêla Romanî de dide bidîtin. Li gora vê rêstika hanê de Cotkarên Bende "di bingehîya xwe de bi Cotkarên azad û bi erdê ve girêdayî ve hatin biveguhertin" -Leibeigene -Serfs- Noker-. Ew beramber bi Xanedan ve xwedan erk bûn; jiber ku wan li ser erdên wî de didan bikarkirin û wan ji bona wî beşek ji berkirina erd jê re didan bipêşkeşkirin. Herwehajî ji mafeyên wan dihate bidîtin, ku ew xwedanê xanî û cengelên xwe bin.

Di pêla Carolingieus de fermanên Padîşahî bi xwedanîya erdan li ser belgên lihevpêçayî "Diplom" de hatin biderkevtin. Ev belgeyên hanê bêgûman bi kanîya bingehî ve ji bona mêjûwa sedsalên navînî têtin biderkevtin.

Der sala 800 zayînê de Charlemagne bi Padîşahê Firensîyî Carolingies "Imperator rojava" -Occcident- ve hate bikirin. Wî di bin serdarîkirina xwe de welatê Firensa, Gerministan, Siwêsra, Otriş, Italya tanî Roma date bikomkirin. Li gora texmînên Braudel serjimara vê Imperatorîya fileyî hanê di navbera 15 û 18 milyon Ten de dihate biderkevtin û nêzîka nîvê vê serjimarê li Firensa de dihate bidîtin. Ev pêrabûna hanê karê pêşî bû, da ku Dewleteke Ewropîyî Hevgirtî bête biafirandin.

Der sala 987 zayînê de serdarîyê Padîşahîya ji Binemala Carolingieus ji bona Binemala Hugues Capet Danînvanê Binemala Padîşahîyî Firensîyi Sêyem hate biveguhestin, ya ku ew di serdarîkirinê de tanî Şûreşa Firensî hate bimayîn. -Ew careke din ji bona pêlekê piştî Napolyonê Yekem bi alîkarîya Peymana Perest ve

---

[1]Ev gotina Deutsch cara pêşî di nêzîka 750 yî zayînê de di belgeyên mêjûyî de tête bidozandin. Cuma

hate bivegerandin-[1]. Binemala Capetiens di rastî de wê Firensa nuh date bidamezirandin; nemaze Firensa xwe ji Imperatorîyê date bicihêkirin. Wisa bi vî rengî ve navînîya vê rêstika hanê ji bona Gerministanê bi navê "Heiliges Römisches Reich Deutscher Nation" - Imperatorîya Romanîyî Germanîyî Perest° hate biveguhestin, ya ku ew ji bal Imperator Othonê Yekem der sala 962 hate bisazkirin. Wê Elemanya û Italya di nava xwe de didan bikomkirin û ew bi rengekî çêkirinê ve tanî hilanîna wê ji bal Napolyon der sala 1806 de date bidirêjkirin[2]. Ew bes û bi tenha ve bi nav ve hatibû bihiştin.

Bi rengekî giştî ve dema di navbera sala 950 û 1350 de pêleke pêşkevtinê di Firensa û tevaya Ewropa de di warên aburî, pirbûna şerjimara Tûde û hunertîya keniştî de dide biwênerkirin. Di pêşîya wê pêlê de di nava Firensa de hunera Gotik- gothigue- di avanîya keniştên gewre de hate biderkevtin û ew ji wêderê ji bona nava Germinstan û Ingilistanê hate bibelavkirin. Herwehajî jîyana bajartî û pîşe, na hêjîbêtir sermeyedarî di vê pêlê de hate bipêşkevtin û berkirina çandinîyê hate bibaşkirin, -piştî ku ew di pêlên berê de bi hoyên ceng û şeran de hatibûn binizimkirin-.

Herwehajî pêwendîyên bazirganîyê di navbera Ewropa û Rojhilat de hatin bibitewkirin. Geştîyên bajarên Italî û nemaze geştîyên Vanize -Venêtsya- û Geneva roleke baş di van pêwendîyên bazirganîyê de di navbera Ewropa û Rojhilat de dane bilîstin. Wisajî

---

[1]Mebest li vir de der sala 1815 de piştî kongirê Viyena ye. Cuma

[2]Di vê sala 1806 de Napolyon ji bona ser Elemanya xwe date birakişandin. Wî tevaya Leşkerê Elmanî li nik bajarê Jena -Yêna date bitarûmarkirin û wî tevaya Elemanya bi jêr destên xwe ve date bixistin.
Vê vegirtina Napolyonî ji bona Elmanya tevaya jîna civaka wê bi şureşa veguhertina çakkirina qanûna çandinyê ve der sala 1807 de date biveguhertin. Ji wê rojê şûreşa vejandina pîşsazîyê li Elmanya de date bidestpêkirin û ew bi gewretirîn şureşa pîşsaziyê ve hate xelatkirin û tevaya bingehê pêşvekevtina Elmana li ser wê şûreşe de tête bihîmkirin.

Miletên li paşkevtîyî niha di cîhana sêyem de û herwehaji pêrejî Kurdistana me dikarin pir bi başî ve ji vê mêjûwa aburîyî Elmanî sûd ji xwe re bidin biwergirtin. Cuma

Cengên Xaçperestan di vê pêlê de dane bidestpêkirin. -Ew nala destpêkirina Impiryalîyê têtin biderkevtin, mîna ku me ew li jor de hatine bibîrxistin-[1].

Destikên zanebûna serjimara Tude di wê pêlê de bi rengekî hurtir ve ji berî xwe bi saya tomarên nameşinasîyê ve di keniştan de hatin bipêşkevtin.

Di sala 1086 de serjimara Ingilistanê bi 1,3 milyon Ten ve hate bigihaştin û serjimara Firensa bes û bi tena ve di navbera 6,2 û 6,6 milyon Ten ve dihate bidîtin, -ango ew pênc caran bi Tudeyên xwe ve ji Ingilstanê bêtir dihate biderkevtin-. Der sala 1346 de serjimara Tude li Ingilistanê de bi 3,7 Ten ve dihate bivegihaştin û serjimara Tude di Firensa de der sala 1328 de bi nêzîka 21 milyon Ten ve dihate bivegihaştin, -ango ku serjimara Tude di nava van herdu welatan de bi sê caran ve di vê pêlê de hate bibêtirkirin-[2]. Di wê pêlê de Firensa ji Gerministan, Ingilistan û welatên neşîv bi Tudeyên xwe ve bêtir dihate bidîtin.

Di vê pêlê de jimara Cotkarên girêdayê bi erd ve li gora rêstika Servage -Nokerî- de û herwehajî pêrejî jimara Cotkarên azad jî hatin bibêtirkirin. Wisajî topraxa erdên zevîkirî bi zuhakirina golgenîyan ve û bi jêkirina daran ve bigir bi nîvê daristan ve hate bibêtirkirin. Wilojî destkarî û emrazên berkirina çandinyê hatin bipêşvexistin. Jimara aşên avê di Firensa de bi nêzîka bîst hezar aş ve di destpêka sedsalên sêzdehan de hate bigihaştin. Ew di dawîya sedsalên sêzdehan de bi çil hezar aş ve hatin bigihaştin û ew di dawîya sedsalên panzdehan de bi nêzîka heftê hezar aş ve hatin bigihaştin. Ligel vanjî de aşên bayî di

---

[1]Ev bîr û bawerîya Ismest Şerîf pir bi rast û durustî ve têtê bibidîtin. Belam xwezî wî ji dêlva Impiryalistîyê têgihiştina Kolonyalîyê bida binivîsandin. Cuma

[2]Ji xwe re li lêkolandina "Late ancient and Medieval population" bi xama J. C. Russel di "Transaction of the American philosophical Society" 1958, rûpel 95 û yên tên bidin bitemaşekirin. Herwehajî ji xwe re li nivîsta "Criese agreirs en Erope" ji bal Wiélhelm Abel çapa sala 1973 de bidin bitemaşekirin, ya ku ew ji bal Braudel hatîye bibîrxistin. Ismet Şerîf Wanlî

dawîya vî sedsalên panzdehan de bi nêzîka bîst hezar aş ve hatin bigihaştin. Aşên bayî bikaranîna wan tanî endazekî bi derengî ve di nava Firensa de hatin bikevtin. -Hîç gûman tête nayête bidîtin, ku ew hatine biderkevtin-[1]. Broadel dide bixuyanîkirin, ku aşên avê nîşanên berkirina çandinîya Derebegîyê didin biderxistin; belam ew dibêje, ku Merov dikare bide bigotin, ku aşên bayî nîşanên berkirina "Sermeyedarîyê" didin biderxistin. Herwehajî bazar û pêşîdanên çandinîyê hatin bipirkirin. Ji pêşîdanên bi nav û bangtirîn ve pêşîdana Champagne dihate bidîtin[2] Di nava vê pêşîdanê de firotinên pir ji bona berkirina çandinîyê, cengelî û kel û pelên rojhilatî dihatin bidîtin. Ji van kel û pelên rojhilatî buharat û hin ji celebên pertel û hevirmêş jî dihatin bidîtin. Ev firotên hanê bi pirbûn ve di rêya Wênerên bankên bajarên Italî ve dihatin bidîtin, ango ew di rêya Credit -Kirêdit- û deyn dihatin bidîtin.

Vê bi xwe jî ve pêşvekevtina Borcuwazîyê - û Borcuwazîya diravî di Italya de- jiber hebûna bazereke Ewropîyî fireh bi pêwêndîyên xweyî bazirganî ve ligel hişkatîyên dinê de date bikirin. Herwehajî pêşîdanîya Frankfort li Elmanya de navînîyeke girngekî din

---

[1]Bikaranîna aşên bayî di nava Germinstanê de pir ber li ber wan de ji bal keniştê de hatin bidanîn; jibervêjî ew di nava wê de pir kêm hatin bidîtin. Keniştê bêşên pir li ser aşên avê de ji xwe re datin bidanîn; jiber ku ba malê Xwedê ye û kenişte jî li ser rûwê zemînê de wênerîya wî dide bikirin; jibervêjî Xwedîyên aşên ba divên pir bêşan ji bona keniştê bide bipêşkeşkirin. Bi vî rengî ve aşên bayî di nava Germinstanê de nehatin bipirkirin. Ew azadîya aburî, ya ku ew li Holenda û Firensa de dihate bidîtin, ew li Gerministanê de nedihate bidîtin; jibervêjî şureşên Cotkran di Germinstanê de di destpêka sedsalên şazdehan de dijî keniştê datin bidestpêkirin. Gewretirîn şûreşa Cotkaran li Gerministanê de dijî keniştê der sala 1525 de hate bivêkevtin; lêbelê ev şûreşa hanê bi kevtina Cotkran ve û bi serkevtina keniştê û Zemîndaran ve hate biserkevtin. Bi vî rengî ve şûresên Borcuwazîyî Gerministanîyî pêşî nehatin biserkevtin û Germinstan jiber van hoyan ve pir di Ewropa de bi paşkevtî ve hate bimayîn û rêstika derebegyê di nava wê de pir date bidirêjkirin. Der sala 1807 de rstîka derbegyê di nava Germinstan de bi saya veguhertinên çandinîyi pirozî ve hate biherivandin. Ev jî bi neçarî ve jiber hoyê vegirtina Napolyon ji bona Germinstan hate bikirin. Cuma

[2]Champagne -Şampanya- ew heremeke di jorî rojhilatî Firensa de tête bidîtin. -Di vê heremê de vexwarina Şampanyayî bi nav û bang ve tête biçêkirin-. Ismet Şerîf Wanlî

ji bona bazirganîya Ewropa dide biderxistin.

Di nêzîka nîvê sedsalê çardehan de -bi hurtir ve di salên 1347-1350 de- Ewropa Rojava û Navînî de bi destaneke Tudeyî ve bi hoyê hala nexweşîya Mirina Reş ve hate bikevtin, ya ku ew di rêya welatên asyayî de pê hate bigihaştin. Wê têde Tude bi milyonan ve dane bipalekirin. Firensa xwe di nava salên 1315-1320 de di nava zivistanên seqemî de date bidîtin. Pir Kes jiber van serman û birçîbûnan têde hatin bimirin; -jiber pirbûna jimara Tude bi rengekî leztir ve ji berkirinê û jiber hebûna Çînîyên Perîşan pir Kes hatin bimirin-. Hêjîbêtir ji van jî bi serdejî ve ji bona Firensa °Cenga Sedsalî" di navebera Firensa û Ingilistanê de dihate bidîtin, ya ku ew li ser xakê Firensî de der salên 1337-1453 de dihate bigerandin. -Lêbelê ew bes û bi tenha ve her salek li ser pênc salan de bi cengeke rast û durust dihate bidîtin-. Di navbera salên 1337 û 1453 de serjimara Tude di Firensa de ji 21 milyon Ten ji bona 10 milyon Ten hate dakevtin. -Ango ew bi serjimara Tude ve di pêla Qeyser de di berî panzdeh sedsalan de hate bivegerandin-.

Di nêzîka 1400 de ango di destpêka dema vejandinê de Italya bi pêşkevtirîn welat ve di Ewropa de jiber hoyê jêhatbûna Çînîyên Borcuwazî di berên bazirganîyê de dihate bidîtin. Pêrejî Italya xwe di berkirina remanî û hunerî jî de didate bidîtin. Bajarên Italî di rêya deryayî de ligel hemû welatên derya Sipî, Rojhilat, Asya, Jêrî Rusya û Ingilistanê de bazirganî didan bikirin û wan di rêya çiyayên Alp de baziraganî ligel Elmanya, Utrîş-Nemsa- didan bikirin. Wer bi vî rengê hanê ve Firensa xwe bigir nîv tenê dida bidîtin.

Ji nîvê sedsalê panzdehan tanî Şûreşa Firensî de serjimara Tude di Firensa de ji 10-12 milyon Ten ji bona 20 milyon Ten der sala 1700 û bi 26,3 milyon Ten ve der sala 1789 hate bigihaştin. Ew berî şureşê bi Dewleteke mezinî zalkirî ve li ser Ewropa de di warên aburî û supahî de hate bikirin. Herwehajî Paris bi navînîya remanê û hunerê ve hate bikirin û pêrejî zimanê Firensî bi zimanê navDewletî ve -tanî destpêka Cenga Cîhanîyî Duwem- hate bikirin û ew bi zimanê Xanedanên Ewropî ve hate bikirin, mîna ku ew li jor de hatîye bigotin.

di piştî şureşê de bêtirbûna pêşkevtina Tude di Firensa de hate bidirêjkirin; lêbelê ew bi rengekî hêdîtir ve ji endazîya ewropî dihate bidîtin; ev jî jiber hoyê paşkevtina wêna ji yên din di şûreşa çêkirina

nuh de dihate bidîtin, ya ku ew di pêşî de di Ingilistanê de ji dawîya sedsalê hetşdehan de date bidestpêkirin. Li paş Ingilistanê de şûreşa çêkirinê li Holanda û.Elemanya de date bidestpêkirin û di dawî jî de li Firensa jî de date bidestpêkirin. Bi serdejî ve Çînîyên Zengîn û Nîvzengîn di Firensa de berî welatên din di Ewropa de bêtirbûna zarokan dane bisînorkirin. Serjimara Tude di Firenasa de der sala 1801 bi 27,3 milyon Ten, der sala 1806 de serjimara Tude di Firensa de bi 29,1 milyon ve, der sala 1821 de bi 30,5 milyon Ten ve, der sala 1826 de bi 31,9 milyon Ten ve, der sala 1831 de bi 32,6 milyon Ten ve, der sala 1841 de bi 34,2 milyon Ten ve, der sala 1846 bi 35,4 milyon Ten ve û der sala 1851 de bi 35,8 milyon Ten ve hate bigihaştin. Ango bêtirbûna Tude bi endazîya 30% di navbera salên 1801 û 1851 de hate biderkevtin, di gava ku endazîya bêtirbûna Tude di tevaya Ewropa de 50% û 100% di Ingilistanê de di wê pêlê de dihate biderkevtin. Di gava ku serjima Tude di Firensa de der sala 1801 de 27,3 milyon Ten dihate biderkevtin, serjimara tude di Ingilistanê de di vê salê de bi 18 milyon Ten ve û serjimara Tujî de di Germinstanê de bi 24,8 milyon Ten ve dihatin biderkevtin[1].

---

[1]Ev pirbûna Tude jiber hoyên pakijîyê û xweşbûna jînê hatîye bidîtin. Zayîn di vê pêlê de mîna berê hatibû bimayîn, lêbelê mirina zarokan pir hatibû bikêmkirin. Sal bi sal ve zayîn deha ji mirinê bi bêtirbûb ve dihate biderkevtin. Bi vî rengî ve Tude her û her dihate bibêtirkirin. Ji bona nimûne Tude di nava welatê Elmanya de ji sal 1871 tanî sala 1914 de 25 melyon Ten hate bibêtirkirin.

Qeşê Ingilîzî Malthus Thomas Robert -1766-1834- bi dûr û dirêjî ve li ser vê xuyanîya Tude de dayite biaxivtin. wî date biderxistin, ku pirbûna Tude bi endazekî hendesî ve 1, 2, 4, 8, 16 tête biderkevtin. Belam pirbûna berkirina xwarinê bi rengekî jimnarî ve 1, 2. 3, 4 tête bibêtirkirin.

Mallthus ev qanûna pêrbûna Tude ji lêvenerandina amarên Tudeyî Hindîyî dûr û dirêj dayite biderxistin. Li ser van bawerîyên wî de pir dij û ligel wî de hatine binivîsandin. Di vî babetî de Karl Marx pir bi başî û rastî ve li ser vê qanûna Malthus de di pirbûna Tude de dayite binivîsandin.

Ev pirbûna Merovan li Ewropa de di wan pêlan de niha em wê di nava tevaya cîhana Sêyem de didin bidîtin û herwehajî di nava Kurdistana xwe jî de wê didin bidîtin. Di nava Kurdistanê de zayîn mîna xwe hatîye bimayîn û mirin hatîye bikêmkirin. Ji 3 tanî 3,5 der sedî sal bi sal ve Tude di nava Kurdistanê de têtin bipirkirin. Wer bi vî hawayî ve her nêzîka bîst salan Gelê Kurd di serjimara xwe de têtê biducarîkirin. Bi kurtî ve tanî bîst salên din serjimara Kurdan di nava Kurdistanê de bi nêzîka şêst melyon Ten ve dê bête biderkevtin. Ev pirbûn û tîrbûna Tudeyî di

Braudel rûpelên dawî jibergê yekem ji perçê duwem ji zincîra xwe -ango "Navnasîna Firensa: Merov û Tişt"- li ser Tude -Merov- û veguhertinên wêyî Tudeyî de der sedsalên bîstan de û barkirinên nuh jê re jiber hoyên aburî û siyasî date bitirxankirin. Ez bi pey wî ve nadim, herwehajî ez di bergê duwem de ji perçê duwem de bi dû wî ve nadim, ya ku wî ew ji bona "Tiştan" ango aburî dayite bitirxankirin. Wî têde "aburîya cotkarî" ji heyamên kevnar tanî vê roja hanê bi têgihiştina fireh ve - çandinî, xwedîkirina cenawer ligeljî de çêkirinên reweştî, emraz û destikên berkirinê, bazirganî, bazarên hundurû, pêwendîyên bazirganîya derveyî dayite bixwendekarînkirin û hêjî biserdejî wî li ser daxwazîyên lêkolandina lêvenerandinên civakî de dayite bixwendekarîkirin. Ev bi xwe jî ve xwendekarîyeke teknîkî û civakî-aburî ye û ew bi jimar û neqşan tête bidagirtin. Bi dujwarî ve raxistina wêna bi kurtî ve û di pêşkevtina wêyî mêjûyî de ji pêlekê ji bona pêleke din tête biderkevtin.

Fernand Braudel ji bedbextîya Xwendevanên xwe bergê sêyem û çarem ji zincîra xwe di "Zincîra Navnasîna Firensa" de, ango "Dewlet, Ferheng û Civak" û "Firensa di derveyî Firensa de" neda bibelavkirin, mîna ku wî di pêşgotina zincîrê de dabû bizanîn. -Dibe, ku ev jî jiber hoyên tendurustî hatibe bidîtin[1]. Ev danavên hanê Merov dikare li ser wan de bi pîvana dema dirêj yanjî kin ve bide bilêkolandin. Belam bi rengekî taybetî ve û bi başî ve tête bidîtin, ku em bizanibin, bê ka çawan Serpereştî Dibustana Analî mêjûwa welatê xweyî siyasî -ango mêjûwa Dewletê- dayite bixwendekarîkirin.

Merov dikare bide bigotin, ku Braudel bi taca "mêjûwa Nûh"

---

nava Kurdistanê de pir yarmetîya serxwebûn û xweşbûna jîna Miletê Kurd dê bide bikirin.

Herwehajî dê ew bi kêreke pir mezin ve ji bona serxwebûn û pêkanîna dewleta milîyî Kurdistanê ve bi neçarî ve bête biderkevtin. Ev kirdar û kêra hanê tevaya taya mirinê bi canê Dagîrkerên Kurdistanê ji Rom: Ereb û Eceman ve dide bixistin. Cuma

[1] F. Braudel niha -der sala 1993 de- bi temenê 91 sal ve hatîye bigihaştin. Ismet Şerîf Wanlî

ve di wan bazinan de hate bigihaştin, yên ku wî ew di zincîra "Navnasîna Ferensa" de datin bibelavkirin. Ev belavokên hanê ne bes tenê li ser dîtina "Giştî" de di "Dûrbîna Dûr" de tête bidîtin. Tevaya qada lêgerandina wîna di dorhêla ciyografîyî -Feransa de li Ewropa de û ew jî di Cîhanê de- di tevaya mêjûwa wê de tête bidîtin. Ew lê bi pîvana "Dema Hêdî" ve dide bitemaşekirin, ya ku ew bi daketî ve ji jortirîn heyaman tanî dema niha û bi berzbûn ve ji jêr tanî topê ve di hatin û çûnê de bi girêdana niha ve bi mêjê ve û bi liberkevtina rastê ve tête bidîtin, ya ku em têde têtin bijîyandin û ya ku em wê bi dakevtinên demê ve bi serhev ve didin bidîtin. Pêrejî Braudel bi hûrî ve li dîtina xwe de di Cîhana niha de bi perçên wê ve di qadên wêyî asûyî -ciyografîyî- cuda de û ev jî bi perçeyên wê ve û ev perçên hanê jî ji bona biçûkên jê di derbasbûna navbera giştî û perçan de û perçan û giştî de dide binêrîn. Hêjîbêtir ew biçûktirîn malika jîndar de ji bona bin mikroskopê dide bixistin. Ew di kûrbûna avanîya wê de dakevtinên demê bi serhev ve ango şopên mêjî dide bidîtin û bê ka çawan malik di kêrkirina xweyî hergav de ligel dora xwe de û di dorhêla xwe de di nava tavayê -gund, navçe, melbend, herem, dever, netewe, hişkayî û cîhanê- de dijbûn didane biderxistin, mîna ku malika libatî di laşê Merov de xwe dide bikêrkirin. Wisajî "Navnasîna Firensî" nala avanîyekê tête bidîtin, ya ku yekitîya wêna li ser pirbûnê de têtê bihîmkirin, ya ku pêkhatinên wêna bi derbasbûna dem û cih ve hatine bitevlihevkirin.

Wer Merov dikare pesnê vî rengî di nivîsandina "Mêjûwê" de "bi hêsanbûna nikarîn ve" bide bikirin. Wetov ji Xwendevanê Nîvînî re û ji yê Nekarnas re têtê biderkevtin, ku ev nivîsta Braudel bêtir nêzîktir ji gereke "Wêjeyî" di warên mêjû de têtê bidîtin, di dema ku Danervan ev nivîsta hanê piştî lê temaşekirinê, hûrkirinê û karnasînê di nava cewhera tiştan de dayite binivîsandin. Hêjî bi serdejî ve teva zanebûnên wîna li ser nivîsandinên berê jî de di vê nivîsta hanê de têtin bidîtin. Lêbelê ev nivîsta wî bê nimûne di rengê xwe de hatîye biderkevtin; tê bêje, ku ew "Mêjûweke Biyologî" ji bona welatê wî ligel awireke kesitîyê û hozanîyê de têtê bidîtin.

Tevlivêjî de heger ku em ligel Braudel de li ser "Navnasîna Firensa" de bi dîtineke "Giştî" ve û herwehajî pêrejî "Mikroskopî" ve di yek demê de li ser rewşên wêyî civakî û maldarî de bi pîvana dema

hêdî ve hatine biagehdarkirin, magelo dê em li ser nasîna mêjûwa Firensa bêtin bitêrkirin, heger ku evjî ne bi rengekî rewşetî ve û bi pîvana "Dema Kurt" ve bête bidîtin, bi kêmanî ve divê em bi rêxistineke demî ji bona heyamên wê bi komkirina di navbera mêjûwa siyasî, sipahî, remanî û hunerî de û pêrejî li ser rewşên siyasî, civakî û hoyên wan bêtin biliberkevtin[1]? Magelo Şagirt yanjî Xwendevanê Nêvîzanevan -herwehajî Nîvî bibîrvan- dikare mêjûwa Firensa -yanjî her welatekî din- bêyî zanebûna Binemalên Padîşah yanjî Serdarên wê, hoyên şureşên wêyî civakî û rûdanên wan, vêketinên cengên wêyî cuda ji Xacperestan, Napolyonî û Cîhanî bête biliberkevtin? Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku em bi pêwistî mêjûwên cudan ve û ji bona dîtina mêjê ji koşên cudan têtin bidîtin.

Herwehajî xwendekarîya deverekê li ser dûrbûn dûr de û di dema dirêj de ev nade bitêrkirin, ku xwendekarîya rexekî demîyî nîşankirî jê bi giringeyeke taybetî ve neyête biderkevtin. -Ji bona nimûne "Komara Weimar -Vaymer- di Elmanya de" yanjî "Ingilistan di rojgarîya Vêktorya de"-. Evanan pîvana dema kurt beramber bi salan û rojan ve didin bineçarîkirin; lêbelê ev nade binayînîkirin, ku ev rexê hanê di nava pêleke demîyî bêtir dirêjtir de bête bidanîn, ya ku ew dema berî xwe û ya li dû xwe de ji bona nasîna hoyan û encaman di nava xwe de bide bihilgirtin.

Herwehajî mêjûwa deverekê xwenedekarîya heremeke nîşankirî jê yanjî bajerekî bi tenha xwe ve jê nade binayînîkirin; lêbelê ev rengê hanê ji xwendekarîya mêjûwê dide bineçarîkirin, ku divê danîna mêjûwa bajêr yanjî melbendê di nava bazinê tevaya deverê de bête bidanîn û herwehajî divê danîna deverê di bazinê welêt de û ev jî -li gora pêwistîyê de- di nava hişkayê de û şapên cîhanî de bête bidanîn. -Ev rêya hanê bû, ya ku Braudel li ser de diçû-.

[1]Dibe, ku Danervan ji bona çarekirina van rûwan ji mêjûwa welatê xwe di herdu bergên dawî de ji zincîra xwe dabû bibernamekirin. Ismet Şerîf Wanlî

10. Pêdeçûnek ji bona nivîsandina "Mêjûwê û Şêweyê wê" ligel nasîn, lêgerandin û bibliyografî de.

Ezê hinekî kêm di payîna vî perçî de li ser nivîsta ligelhevî de bêtim birawestandin, ya ku ew bi zimanê firensî ve li Parisê der sala 1961 de di bin navnîşana " L'histoire et ses méthodes" -Mêjû û Şêweyên wê-de nala Insiklopêdiyekê[1] bi 1771 rûpelî de û di yek bergî de hatîye bibelavkirin. Di nivîsandina wê de pênc hezar Mêjûvan ji Mamostên zanistgehên firensîyî karnas di berên cudayî zanistîya mêjûwê, zanistîyên "alîkar" û rêyên lêgerandinên mêjûwê de di bin çavdêrîya Mamosta Charles Samaran -Şarl Samaran de hatine bibeşdarîkirin. Herwehajî Belavanên wêna didin binîşandan, ku ev nivîsta hanê di rengê xwe de bê nimûne tête bidîtin û mîna wêna di zimanên ewropî -yanjî rojhilatîyî- din de -bi kêmanî ve tanî mêjuwa belavkirina wêna ve- nayête bidîtin; ev jî jiber ku ew berên cudan di nava yek nivîstê de, nuhtirîn pêşkevtinên zanistî di her warekî de û hêjîbêtir pêrejî ew Bibliyografîya "Navdewletî" ji bona giringtirîn wan belavbûnan hatine bibelavkirin, ji yên ku ew li ser her berekî de bi serê xwe ve bi zimanên rojavayî ve -ji Ingilîzî, Elmanî, Italî û pêrejî bi Firensî ve hatine biderkevitin. Nivîst ew ji rengê pesindanê tête bidîtin û têde pesin û nasînên pirî zanistî ji bona danavên cudan û pêşkevtinên rêyên lêkolandinan têtin bidîtin. Lêbelê ew ji felsefa mêjûwê û ji bîrxistina dîtinên civakî-aburî, siyasî yanjî felsefî nala nimûnitîyê û metiryalîyê, demokrasîyê, sosyalistîyê, markisîyê û başîtîyê tête bivalakirin.

Herwehajî di payîna xwe de ew ji her hêjakirineke mêjû ji bona felsefa mêjûwê û herwehajî di pêşîya pêşî de ew jî bi cîanînên wêyî siyasî ve tête bivalakirin. Tevî ku ev nivîsta hanê jî ji felsefa mêjûwê û bibîrxistina Mêjûvanan bi carekê ve, bê ka wan çi dane binivîsandin, tête bivalakirin, belê ev nivîsta hanê di berên "Teknîkî" û şêweyên lêkolandinên mêjûyî de bi civandî ve tête bidîtin. Belê têde hinek tiştên dubarekirî hatin bidupatkirin; ev jiber pirbûna Beşdaran di

---

[1] nivîst di nava koma "Encyclopédie de la Pleiode" de hatîye biderkevtin, ya ku ew ji bal Xanîyê Belavbûna Collimard de têtin biderxistin. Ismet Şerîf Wanlî

nivîsandina wê de û nêzîkbûna berên lêkolandinên wan hatine bidîtin. Li vê derê de rê bi raxistina wêyî bi rengekî têrkirî ve nayête bidîtin[1]; lêbelê ez dê ji bona bicîanîna karê, yanjî jiber kurtbûna xameya min û yanjî jiber hoyê demê û cih, ku min ew li jor de nedan bibîrxistin, bi kurtî ve hatinên nava wê bidin bianîn, yên ku ew li ser "Şêweyê" nivîsandina mêjûwê de têde hatine binivîsandin. Ez dê wan ^têgihiştinan bidim bianîn, yên ku Danervanên derîyên wê ji bona vê zanistîyê û zanistîyên "Alîkar" û pêşkevtina wan di welatên Rojava de dane bidan. Li gora karinê jî de dê ez vê derî bi derî ve -hincaran jî ligel pêvekirinan de- bidim bikirin. Wisajî dê ezê helbijartinekê ji Biblografîyên wan bidim bidaxistin, ji yên ku wan ew dabûn bianîn:
Di sereta de ezê bi nasîneke pêşî ve ji bona mêjûwê û pesinadên, yên ku divên ew li nik Mêjûvan de bêtin bidîtin, mîna ku Charles Samaran di pêdeçûna nivîstê de dayitê binivîsandin, dê bidim bidestpêkirin:

1. Mêjû: ango nasîna mêja Merov li ser bingehê li dû xwe hiştina şûnwaran[2] de têtê bidîtin. Ew bi madeyeke zanistîyî dewlemend ve ji bona heyamên pir di serpêhatîyê de têtê bidîtin. Nala zanistîyên din jî zanistîya mêjûyî jî dikare bête bipêşvexistin û biberzkirin.

2. Armanca mêjûwê û hoyê hebûna wêna ew di lêgerandina rastîyê de têtin bidîtin, ya ku mêjû di seretaya xwe de dide bizanîn, ke ew rastîya hanê bi rastîyeke endazî ve têtê bidîtin. Nekarîna gihaştina berzbûna "Imperfection" destikan, yên ku

[1]Ez li lênerînên xwe de li ser zanistîya mêjûwê û pêşkvevtina wêna de di Ewropa li ser wê nivîstê de neçûm, ya ku em niha li ser didin biaxivtin. -Min ew dîtinên xwe bi azadî ve datin biavêtin, mîna ku min ew dane bibîrxistin-. Lêbelê ez li ser wê nivîstê de agehdarbûm, berî ku ez dest bi lêkolandina xwe ve bidim bikirin. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Gotina ku Samaran dayite bikaranîn, ew "Teinoignoge" ye -û têgihiştina wênayî tîpî bi "Mukirhatî" ve têtê derkevtin. Ew bi zimanê ingilîzî ve bi "testimony" ve têtê biderkevtin-. Min bi başî ve date bidîtin, ku ez wê bi "Şopan" ve bidim biwergerandin; jiber ku ew bi vê têgihistinê ve hatîye binivîsandin. Ismet Şerîf Wanlî

Mêjûvan wan dikare bide bikaranîn, da ku ew ji bona rastîyê bête bigihaştin, divê ew ne nala kirdarekî bedbînî ji bona Mêjûvan bêtin bidîtin; lêbelê bi servajî vê jî ve divên ew destikên hanê bêtir nav têde bidin bidan, da ku ew ji bona nêzîkbûna wê rastîyê bêtir û bêtir bide bihewildan.

3. Mêjû ew bi zanistîyeke civakî ve tête bidîtin, ya ku ew bi tu rengekî ve ji zanistîyên mirovanyê din nayête bicudakirin û ew bi wan ve tête bigirêdan. Ew divê ligel wan de bi rengekî herdemî û biratî bide bihevkarîkirin.

4. Mêjû ew bi giştî -total- ve tête bidîtin; bi têgihiştina ku hemû pêgirêdayên bi rojgarîya Merov ve ew nikarin jê bêtin birînkirin. Hemû çûyîn ew bi danava mêjûwê ve têtin bidîtin. Hîç ji rûdanan nayên bidîtin, ku ew bi "Mêjûyî" ve têtin bidîtin û hinên din ji wan ew bi "Nemêjûyî" ve têtin bidîtin.

5. Hîç mêjûwek bê "Belge" -Document- bi têgihiştina giştî ve nayête bidîtin: belgeyên nivîsandî, belgeyên rengînî -figure-[1] yanjî belgeyên dengînî yanjî wêneyî -images, yên ku merov dikare wan bide bidîtin- yanjî ji her metiryalekî din.

6. Hîç mêjûwek bê "Jêhatbûneke Rexnegîrî" -Erudition- ango bê lêrîneke rexnegîrîyî pêşî ji bona şûnwaran û belgeyan çi ji bal Mêjûvan de bi xwe ve yanjî ji bal Karnasan de nayête bidîtin. Bi her awayekî jî ve her Merovek nikare xwe bi Mêjûvan ve bide bidîtin. Ji bil mêldarîya serûştî de divê ji Mêjûvan re ferbûneke giştîyî bi carekê jî ve bête bidîtin.

7. Merov dikare "Şêweyê Mêjûyî" bi tevaya rêyên teknîkî "techniques" ve bide binasîn, yên ku ew ji bal "Jêhatbûna

[1] "Rengînî" ji reng -fugure- ew bi têgihiştina tiştên nenivîsandî ve tête biliberkevtin, yên ku Merov dikare wan mîna nigaran, pûtan yanjî avanîyan, destikan ûhd. bide bidîtin. Ismet Şerîf Wanlî

Rexnegîrî" de ji bona destkarînkirina Mêjûvan têtin bixistin. Ev rêyên hanê dikarin bêtin bibaşkirin û biberzkirin.

8. Du pesnên cewherî ji bona Mêjûvan divên bêtin bidîtin: Yek divê di "Rastîya Remana" wî de û du di "Mêrxasîya Wêjeya" wî de bêtin bidîtin. Ciceron -Sisronê Romanî dayite bigotin: "Qanûna pêşîyî ku divê mêjûvan wê ji xwe re bide bigirtin: yek divê ku ew tu tiştî nede bigotin, ya ku ew dizane, ku ew ne bi rast ve tête biderkevtin; du divê ku ew wê mêrxasîyê di xwe de bide bidîtin; wê rastîyê bide bigotin, ya ku ew bi rastîya wê ve dide bibawerkirin".

9. Rastîya remanî divakirina remana rexnegîrî dide bikirin. Divê li ser Mêjûvan de ku ew bi agehdarîya metirsîyên dorhêla xwe ve bête biderkevtin, yên ku ew di pêşî de ji tevlihevbûna dem û zemanan -anachronisme- têtin biderkevtin. Herwehajî ji erkê wî tête bidîtin, "ku ew li ser wan bawermendîyên bereyî de di nava mejîyê -Préjugés -Vorurteil- wî de, yanjî yên ku ew berê di nava mejîyên Xwendevanên wî de dihatin bidîtin, neyête biçûyîn. Divê ku ew libexwedana evsanan -illusions- bide bikirin, yên ku ew ji bal Hemdemên wî bi wan ve têtin bibawerkirin", mîna ku -Michelet- Mişlêt dayite bigotin.

10. Rastîya remanî nade biderxistin, ku Mêjûvan divê bê guhpêdanî bête biderkevtin; "jiber ku mêjû bi xwe jî ve ew nala mêrxasîyeke remanî û rewanî tête biderekevtin, ya ku di nava wê de kesîtîya Mêjûvan tête biherikandin", mîna ku H. I. Marrou -Marru dayite bigotin.

11. Di dawîya dawî jî de divê Mêjûvan bide bixebatkirin, da ku ew nala Wêjevanekî, Hunervanekî û Zanistvanekî di wê gavê de bi xwe jî ve bête biderkevtin. Heger na dê ew di gihandina armanca mêjûwê de neyête biserkevtin; jiber ku armanca mêjû di vegernadina jînê de ji bona tiştên mirî tête bidîtin. Evjî tevjî bi saya hesteyên ku ew di nava cerg û hinavên Mêjûvan de têtin bidadan û yên ku ew bi saya hozanîya veşartî ve li nik

Mêjûvan de têtin biderkevtin".

- "Mêjû çiye?" evbi navnîşana derîyekî ve tête biderkevtin, yê ku ew ji bal H. I. Marrou hatîye binivîsandin û di nava vî derîyê hanê de têgihiştina zanistîya mêjûwê û pêşkevtina wêna dide bibîrxistin. Ez vî derîyê hanê jiber anînên wîna li ser danavê de nadim bikurtkirin. Bes û bi tenha ve dê ezê hin ji wan kanîyan bidim bianîn, ji yên ku ew ji bal Marrou de hatine bibîrxistin[1].

- A. Cordoliani -Kordoliyani- derîyekî kurt li ser têgihiştinên "Demên Kurt", "Demên Dirêj", têgihiştina Chronologi - Demênlipeyhevde-, Salnameyên Ayînîyî cuda mîna di Zerdeştîyê û Filetîyê de û li ser heyaman de dayite binivîsandin[2].

---

[1]Vane hinek ji kanîyan tên, yên ku ew ji bal Marrou bi rengekî giştî ve li ser zanistîya mêjûwê de hatine bibîrxistin:
- K. Keuck: "Historia, Geschichte des Wortes und seiner Bedeutung in der Antike und der romanischen Sprache" Münster 1934
- K. Brandi: "Geschichte der Geschichtswissenschaft" Bonn 1952
- H. Butterfield: "Man on his past: The study of the History of Historical Scholarship", Cambrige, 1955
- L. Febvre: " Combat pour e'histoire", Paris 1953. -Ew hatîye bibîrxistin-
- A. Momigliano: "Contributo alla storia degli studicalassici", Roma 1955.-Ew hatîye bibîrxistin-. Ismet şerîf Wanlî

[2]Ji kanîyên, ku Cordolianî ew dane bianîn, Merov dikare vanan bidin bibîrxistin:

. E. Anchelis: "The Calender of Everybody", New York, 1943.
. G. Bilfingen: "Die mittalternichen Horen und die modernen Stunden", Stuttgart, 1892.
. E. Cavaignac: "Chronologie de e'histoire mondial", Paris, 1935.
. p. Couderc: "Le canlendier", Paris, 1946.
. Ph. W. Wilson: "The Romanu of the Calenar", New York, 1937. Ismet Şerif Vanli

- G. Beaujouen -Bociwan- derîyekî kurtkirî li ser "Demên Mêjûyî" û lidûçûn û lezbûna wan de, li ser -Cycles- -"Zîvirandinên Deman" de, li ser veguhertinên av û bayê de û li ser vepeqandinên li ser rûwê gewdeyê rojê de dayite binivîsandin[1].

- Ch. Higounet-Hêgonet derîyek li ser "Géohistoire" -mêjûwa ciyografî yanjî ciyografîya mêjuyî- de, kêra av û bayê li ser Merov de, li ser Merov û dorhêlê de û li ser neqşên ciyografî de dayite binivîsandin[2].

- Yves Renouar-Renoard derîyek li ser agehdarîkirinê û agehdarîyê -information- û veguhestina nûçeyan de di rêya berîdê de di Rojhilata kevnar de û li paş de di Rojava de di rêya bi karanîna hesp de ji bal desthilatîya Dewletê de di pêşî de û di pişt re di rêya hevbeşîyên tudeyî de û herwehajî di dawî jî de li ser vejandinên nuh de ji bona veguhestina nûçeyan de û derkevtina rojnametîyê dayite binivîsandin[3].

---

[1]Ji kanîyên, yên ku Beaujouen dane bianîn, evin:
. Ph. ariés: "Le temps et l'histoire" Monaco, 1954.
. C. E. p. Brooks: "Climate through the Ages: A study of Climatic Factors and thier Variations", London, 1950. Ismet Şerîf Vanli

[2]Higounet ji bil nivista Broudel li ser derya sipî de, ya ku li ser de hatîye biaxivtin, ev kanîyên hanê jî dane bianîn:
. L. Febvre: "La Terre et liévolution humaine", Paris, 1922.
. A. Lognon: "Géogrhpie de la Gaula an VI "siele", Paris, 1878.
. L. Mirot: "Manuel de Géographie histoique de la France", Paris 1951.
. H. C. Darby -ligel hinên din-: "Historical Geography of England", Cambrige, 1951.
. Ch. Higounet: "La Méthode carto logigues on histire", in A study Xe Congrés international des scienes historique..." Roma, 1955. Isemet Şerîf Wanlî

[3]Ji kanîyên, yên ku Renouard dane bianîn, evin:
- L. Baudin: "L'empire socialiste des Inka", Paris 1928.
- b. Delphine: "Histoire de la poste internationale en Belgique...",Bruxalles 1952.
- A. S. Khurshid: "News Letters in the Orient", Assen 1956.
- J. Sauvaget : "La poste anse chevause dans l'Empire des Mamelouks", Paris 1941.
- A. Shcaube: "Der Kurierdienst zwischen Italien und den Messen von Champagne", in Archiv für Post und Telegraph, b. XXIV, 1896. Ismet Şerîf Vanli

- Jean Bottéro -Botiro derîyek di nivîsta "Ji bona lêgerandina mêjûyî" de di rêya zanistîya zimanên -Lingustique- kevnarî beramberkirî û pêrejî. zanistîya şûnwarî -Archéologie- de ji sertaya "Heyamên mêjûyî de ligel destpêka nivîsandinê de ji berî pênc hezar sal de" dayite bitirxankirin. Ew bi kurtî ve li ser dozandinên şûnwaran de di Roma, Yunan. Misir, Rojhilata Navîn, beşên dinî Asya û Emerika de dayite biaxivtin. Herwehajî wî li ser nivîsandina "Ideagraphique" -Nîşankirinê-, -ya ku ew remanê bi nigarîyê dide biderxistin-, Mîxî û Hêroglêfî jî date biaxivtin. Wî date bibîrxistin, ku "berî mêjûwê ew bi beşekî ji mêjûwê ve tête bidîtin"; belam heyamên wê bi belgeyên nivîsandî ve têtin biperîşanîkirin. Merov nikare wêna bêyî dozandinên şopênkevnar bide bixwendekarîkirin[1].

- Raymond Bloch -Bilox li ser nuhbûna "Zanistîya Kevnarî" û rêyên wê de dide biaxivtin. Ev derîyê wîyî hanê derîyê pêşî ji beşê yekem "Zanistîyên Alîkarîyî Parêzkirî: Şopênkevnarî Rengînî -ango Nenivîsandî- dide bipêkanîn. Ew di wir de rêyên nuh, çawabûna kolandinan, mêjûwa tiştên dozandî -ango nîşankirina temenên wan- û çawabûna hilanîna wan û ew van jî bi rengekî kurtkirî ve dide bijimartin[2].

- André Leroi- Gourhan -Gurhan ji me re di vê derîyê tê de li ser "Mêjûwa bê Belge" de dide biaxivtin. Ew rast û drust li ser Ethnologie et Préhistoire" -Etnologîya berîmêjûwê- de dide

---

[1]Ji kanîyên, yên ku Bottéro dane bianîn, evin:
- E. Dobehofer: "Le déchiffrment des e´critures", Paris 1959.
- J. G. Février: "Hiistoire de l´écriture", Paris. Merov dikare "Mêjûwa Nivîsandinê" jî bide biservekirin. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ji kanîyên, yên kù Bloch ew dane bianîn, evin:
- O. G. S. Crawford: "Archeology in the Field", London 1954.
- A. Laming: "La découverte du passe...", Paris 1952.
- L. Woolley. "Digging up the Past", London 1954. Ismet Şerîf Wanlî

biaxivtin. Ango ku lêkolandina wîna xwendekarîya komên Merovan û paşhiştinên wan ji şopênkevnar ji berîmêjûwê de dide bigirtin. Belam Etnilogîya nuh ji xwendekarîya tiştan ji xwendekarîya hiştinên Miletên kevnar ji destik û şêweyên çandinîyê nayêtin bicudakirin. zanistîya xwendekarîya Miletên kevnar di bingehîya xwe de pişta xwe bi derxistinên zanistîya şopênkevnar ve dide bigirêdan. Ew dide bigotin: "ku Etnologî çi mêjûyî be yanjî berîmêjûwê be, ew wê nasînê dide biarmanckirin, bê ka çilo û çima Merov di civakê de tête bijîyandin? Çima Merovatî gewdeyên koman dide bipêkanîn, ku ew ethnis -Miletan- didin bigewdekirin, yên ku ji wan re tirazûkirineke libatî di nava cih û demê de tête bidîtin". Merov dikare xwendekarîya van koman li ser berzîya teknîkî -vejandinên destikan-, aburî, civakî, ayînî, zimanî, -Anthropologie raciele- -regezîyî antropologî- û herwehajî di warên hunerên sipehîbûnê û veguhestinên remanî de bide bikirin: Di van hemû waran de dibe, ku Miletek ji yê din bête bicudakirin[1].

- P.- M. Duval careke din ji bona ser lêkolandina zanistîya Archéologie antique -şopenkevnar, nasîna wîna û kara wîna "nala zanistîyeke alîkarî bingehî" ji bona mêjûwê hate bivegerand. Ew wê nala zanistîyekê ji bona xwendekarîya tiştên metiryalî dide binasîn, yên ku Merovên kevnar ew dabûn bidurustkirin û yên ku pêwendîya wanî xweser bi jîyana wan Merovan ve çi bi giringbûna xweyî hunerî ve -nala perestgehekî sipehî- yanjî mîna tiştên sade dihate bigirêdan.

---

[1]Ji kanîyên, yên ku Gourhan ew dane bianîn, evin:
- R. J. C. Atkinson: "Field Archuology", London 1953.
- R. Bastide: "Sociologie of Psychanlyse", Paris 1950.
- E. Evans- Pritchard: "Social Anthropology", London 1951.
- A. G. Haudricourt + Brunhes - Delamre: "L'homme et le charrue á Travers le monde", Paris 1955.
- A. G. Haudricourt + L. Hedin: "L'homme et les plantes cultivées", Paris 1945.
- A. Leroi - Gourhan + J. Poirier: "Ethnologie de le'union française" 2 vol., Paris 1952.
Ismet Şerîf Wanlî

Lêbelê şînîtîya kevirkirî ew bi zanistîya şopênkevnar ve nedihate bigirêdan; lêbelê ew bi giyologya ve dihate bigirêdan. Herwehajî hestîyên kevirkirîyê cenawer -yajî Merovan- ew bi zanistîya Paléontologie ve tête bigirêdan. Belam goristan, yên ku ew li jêr zemînê de têtin bidozandin, mayînên agir, herwehajî şûna pîyên Merovan li ser herya zuhakirî de yanjî nigarên li ser dîwarên şikevtan de ji bona berî zanistîya şopênkevnar têtin bivegerandin.

Zanistîya şopênkevnar bi xwe jî ve ew bi pêwistî zanistîyên dinî ve nala giyologya ji bona naskirina qatên zemînê, giyografîya serûştî û mirovanî û zanistîya Topgrahpie -topgrafî tête bikirin. Herwehajî pêrejî ew bi pêwistî mêjûwê, mêjûwa hunerî û zanistîya Philologie -zimanan- ve tête bikirin. Herwehajî xwendekarîya tiştên, yên ku ew ji bal kolandinên şopênkevnar de têtin biderkevtin, dibe, ku ew ji bona zanistîyên din mîna hunera avanîyan, Urbanisme -pilankirina bajaran-, hunera kolandin û Epigrahpie -neqişkirina- ser beran, Paléograhpie -zanistîya nivîsandina kevnar- û zanistîya Palyrologie bête bipêwistkirin. Evaya tevlihevbûna berên zanistîya şopênkevnar ligel berên zanistî û hunerên pirî din de dide biderxistin. Hîç Zanistvanek bi tenha xwe ve nikare di van hemûyan de bête biliberkevtin; jibervêjî tête bipêwistîkirin, ku Karnas ji bona liberkevtina wan tiştan destdirêjîyê bidin bikirin, da ku ew ji wan encamên mêjûyî bidin biwergirtin.

Dozandinên zanistîya şopênkevnar ji avanîyan, pûtan, nigaran, Masaique -kaşîyan çêkirina Céramique -qafikan û Orfévrerie -xişir hemû li ser mêjûwê de didin biaxivtin û ew wê didin binîşandan.

Beşdarbûna zanistîya şopênkevnar ji bona ronahîkirina "mêjûwa pêşî" yanjî mêjûwa destpêkê -Protohistoire- ev di reweştê de bi Protohistoire -destpêka mêjûwa heremekê ve tête binavkirin, ya ku em hinekî li ser de didin bizanîn, jiber ku hinek li ser wê de di belgeyên nivîsandî de di heremeke dirawse de têtin bidîtin. -Ji bona nimûne agehdarîyên mêjûyî, yên ku ew di belgeyên nivîsandîyî Babilî û Aşurîyî kevnar de li ser Miletên Zagrosî Niha de hatine binivîsandin, dikarin ew bi Protohistoire ve beramber bi Kurdistanê ve bêtin binavkirin-. Herwehajî "mêjûwa pêşî" -ango Proto- ya welatê Gal

ango Firensa jî tête bidîtin, ya ku ew li ser wê de di belgeyên kevnarî nivîsandîyî Yunanî de di dema damezrandina bajarê Marsala - Mersîlya de ji bal Bazirganên Yunanîyî Derkevtî ve di nêzîka 600 b. z. de hatine binivîsandin û di nava wan jî de hin ji agehdarîyan li ser Miletê Kelt de hatine binivîsandin. "Mêjûwa Pêşîyî" welatê Gal têtе bidawîkirin, gava ku belgeyê pêşîyî nivîsandî di welatê Kelt de bi xwe ve hate bidozandin. -Ew nala neqşan li ser beran de hatin bidîtin, yên ku mêjûwa wan ji bona 200 salê b. z. tên bivegerandin-. Ango pêla Protohistoire -Mêjûwa Pêşîyî- welatê Gal ji 600 tanî 200 b. z. de dayite bidirêjkirin.

Bi têgihiştineke giştî ve "Mêjûwa Pêşîyî" welatekî yanjî deverekê bi çêkirina pêwistîyên hunerî ve yanjî ji bona bikaranîna rojî ve -ji qafikan yanjî ji lajwerdîyan dide bidestpêkirin. Ev çêkirinên hanê ji bona hebûna bajartîyeke metiryalî û veguhertinên bazirganî di nava wî welatî de didin binîşankirin. Wer bi vê têgihiştina hanê ve "Mêjûwa pêşîyî" welatê Gal bi destpêka heyamê hesînî ve ango di nêzîka 1000 salên b. z. de dide bidestpêkirin. Dozandina van pêwistîyên hanê ji bona hebûna bajarn, gundan, rê û banên bejayî û deryayî, çandinîyê, pîşe û veguhertinên bazirganîyê didin binîşandan. Veguhertinên bazirganîyê bi dozana tiştan ve didin bicîkirin, ku ew li welatekî din de hatine biçêkirin[1].

Di nava lista bibliyogirafyê de P.- M. Duval serçavîyên têr ji bona dozandinên şopênkevnarîyî herema Rojhilata navîn nehatîye bidan. Jiber giringbûna vê heremê di mêjûwa şehristanyê de li ser min de têtе bihilgirtin, ku ez hin ji serçavîyên din ji bona wê lîstê bidin bipêvekirin[2].

---

[1]Ji kanîyên, yên ku P.- M. Duval ew dane bianîn, evin:
- G. E. Danial: "A Hundert Years of Archeology", London 1950.
- G. Daux: "Les dapes de l'Archéologie", Paris 1942.
- S. J. De Laet: "L'Archéologie et ses probléms" Bruxelles 1954.
- K. Schfeld: "Orient, Hellas und Rom in der archäologischen Forschung seit 1939", Bern 1949.
- C. W. Ceraun: "L'Aventure de l'archéologie" Paris 1958. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ez ji bona biservekirina serçavîyên, yên ku ew ji bal Duval hatibûn bidan, van serçavîyên tên jî didim biservekirin, yên ku ew li ser dozandinên şopênkevnarî

rojhilata navînîyî kevnar de têtin bidîtin. Ew hemû guh bi şehristanîya herema Kurdistanê ve bi rengekî xweser yanjî nexweser ve ango "Préhistoire" -berîmêjûwê û "Protohistoire,Protogeschichte" -mêjûwapêşî- ji bona Kurdistan pêdidin:-Ew helbijartîne-:


- R. Braidwood + b. Howe: "Prohistoric investigationsin Iraqi Kurdistan", Chicago 1960. -nivîsteke başe.
- G. Contenau: "Manuel d'archéologie orientale", Paris 1949. -ev li ser kolandîn û Intropologiya rojhilatê de bi nivîsteke bingehî ve têtе bidîtin.
- G. Contenau: "La civilisation d'Assur et de Babylonie", Paris 1951.
- J. Deshayes: "Les civilisation du Proche-Orient ancien", Paris 1969. -Danervan li ser Kurdistanê de dide axivtin. Ismet-.
- R. Ghirshman: "L'Iran des origins á l'islam", Paris 1951. -nivîsteke hêja ye. Danervan Serokê kolandinên Firensî bû. Ew li ser Kurd de dide axivtin.
- R. Ghirshman: "Pares: Proto-Iraniens, Medes, Achéménides", Paris 1963. -Ew li ser Kurdistanê de dide biaxivtin.
- R. Ghirshman: "Parthes et Sassanides", Paris 1962. -Danervan li ser Kurdistanê de dide biaxivtin.
- E. Herzfeld: "The Persian Empire: Studies in Geogra and Ethnology of the Ancient Near East", Wiesbaden 1968. -nivîsteke pir dewlemend li ser agehdarîyên giyografî û Miletên Iran û Kurdistanê de di heyamên kevnar de tête bidîtin. Lêbelê hin agehdarî di nava wê de bê rêk û pêkî û bê tu dîtinên giştî û encamkirina têtin bdîtin; ev jî ji ku nivîst li paş mirêna Danerê wêyî Elmanî de hatîye bibelavkirin; jibervêjî Xwendevan di nava dirêjbûna wan agehdarîyan de tête biwindakirin. Herwehajî hinek ji agehdarîyan jî hatine bikevinbûn û dîtin jî beramberî wan hatine biveguhertin.
- Cl. Huart + L. Delaporte: "L'Iran antique,Elam et Perse", Paris 1952. -nivîsteke hêja ye û têde Danervan Zaravê Lorî ji bona nava zimanê kurdî dide bixistin.
- b. Hrouda: "Der Alte Orient", München 1991. -nivîsteke mezinîyî wêneyî sipehî ye. Ew pir giranbuha û bazirganî ye. Nerxekî wêyî zanistîyî kêm têtе bidîtin. Wergerandineke wê Firensî di bin vê navnîşanê de têtе bidîtin: "L'Orient ancien", Paris 1992.
- J. L. Hout: "Iran I: des origins ause Sassanides", Genéve - München 1965. -Ew nivîsteke ji zincîra Archaelogie Mundi ye. wergerandineke wêyî Elmanîyî wêneyî tête bidîtin. Ew mêjûwa kolandinên şopênkevnarîyî Iranî ye.
- V. G. Lukonin: "Iran II: des Séleucides ause Sassanides", Genév - München 1967.
- p. Levesque: "Les Premiéres civilisation", Paris 1987. -nivîst di du bergan de tête bidîtin. Di nava wê de lênerîneke giştî li ser şehristanîyên rojhilata kevnar de tête bidîtin. Xwendina wêna ne bi dilê min ve hate bidîtin.
- L. Oppenheim: "Ancient Mesopotamia", Chicago 1964. -Çapa wêyî Firensî der sala 1970 de li Paris de hatîye biderkevtin.

- Di derîyê tê de Jean Hubert bi raxistina dozandinên Archéologie médievale -şopênkevnarîyî sedsalên navînî ve di Rojhilat de, û bi taybetî ve di Ewropa de derbarê hunera avanîkirina keniştan û katidralan de pê tête birabûn. Ez li ser wî de ji vê bêtir nayêtim birawestandin[1].

- A. Paaròt: "Assur", Paris 1969. -nivîsteke wêneyî ye û ew pir giranbuha ye. Di nava wê de serçavîyên Bibliyogarafî têtin bidîtin.
- A. Parrot: "Assur", Paris 1960. -nivîsteke wêneyî ye û ew pir giranbuha ye. Di nava wê de serçavîyên Bibliyogarafî têtin bidîtin.
- Boris Piotrovsky: "Ourartou", Genéve - München 1970. -nivîsteke başe. Ew li ser kolandinên şopênkevnarî de di Padîşahîya Orarto -Kurdistana jorîn- de têtê bidîtin. Ew li ser wan kolandina de tête biraserkirin, yên ku li wêderê de di bin serokîtîya Danervan de di Yerîvan û Ermenîstana Sovyêtî de hate bidîtin. Nivîst di zincîra Archaelogia Mundi de hatîye biderkevtin. Herwehajî çapekê wêyî Elmanî jî tête bidîtin. Danervan Rusî ye û ew zanistîya şopênkevnar di zanistgeha Leningrad de dide bifêrkirin. Ew Serpereştvanê Moseyuma Ermitage. Wî hin encamên mêjûyî şaş dane biderkirin, yên ku kolandinên wî bi xwe ve dijbûna wan didin biderxistin.
- Georges Roux: "Ancient Iraq", G. Allen Xunwin P., 1964. -nivîste başe û pir çapên wê têtin bidîtin. Çapek wêyî Ingilîzî û çapek wêyî Firensî jî ligel hin pêvekirin nuh de tête bidîtin. Paris 1991. Danervan Firensî ye, mîna ku navê wî hatîye binivîsandin.
- "The Ancient Cambridge History" -Ji bil biservekirina zincîra bi Kom ve, -Çapa sêyem di heftîyan de-.

Derbarê nivîsandinên Somerî, Babilî û Aşurîyi kevnar de -ligel wergerandina wan de- ez van bi ser wan de didim bivekirin:

- L. W. King: "Annals of Assyria", -Bi zimanê ingilîzî ve di du bergan de. Bergê yekem London 1902.
- D. D. Luckenbill: "Ancient Records of Assyria and Babylonia", Chicago, vol.I 1926, vol. II 1927. -Bi zimanê Ingilîzî ve di du bergan de hatîye bibelavkirin.
- E. Sollberger + J.- R. Kupper: "Inscriptions royals sumérienes et Akkdienes", Paris 1970. - Bi zimanê firensî di du bergan de hatîye bibelavkirin. Ismet Şerîf Wanlî

[1]Ji xwe re li ser zanistîya pûlên kevnar de mîna serçavîyên giştî li van kanîyan de bidin bitemaşekirin:
- E..Babelon: "Traité des monnaies grecques et romaines", 2 vol., Paris 1901-1932
- J. Babelon: "La numismatique antique", Paris 1944.
- Burns: "Money and monatary policy in earlya times", London 1957.

- Di derîyê tê de Jean Babelon bi raxistina "zanistîya xwendekarîya pûlên kevnar" ango Numismatique ve pê tête birabûn. Ez nizanim, magelo ji bona Numismatique -Pûlênkevnar navekî taybetî jê re di nava zimanên Rojhilat de tête bidîtin? Ji wan re tête bimercxkirin, ku ew pûl bin, belam bikaranîna xwe nala destikekî ji bona veguhertina bazirganîyê dane biwindakirin. Divê ew "kutayîbin", -ango mîkutkirîbin" yanjî ew ji lajwerdekî "hatibin biçêkirin". Ew "Nîşanan" bi ber xwe ve nadin bixistin, yên ku ew ji bona xemilandinê yanjî ji bona jêhatbûneke avrûyî têtin bidan. Gotina Numismate di koka xwe de ji Yunanî -Nomisma- û ji Romanî jî ji -Numisma- hatîye biderkevtin. Zanistvanê pê karnas jê re "Numismate" tête bigotin. Ji van jî hinek ji wan di pûlên kevnarî Yunanî yanjî Romanî, yanjî, ji yên ku ew ji bona demnekê yanjî ji bona welatekî têtin bivegerandin, têtin bidîtin.

Merovên kevnar pûl nedidan binaskirin û wan veguhertina bazirganîyê di rêya "Troc" -Serbiser- didan bikirin[1]. Ango wan malên xwe bi malekî Merovekî din ve -ji bona nimûne Cenewar beramber bi Dan ve- didan biveguhertin. Li paş de wî firaxên malêyî lajwerdî -mîna beroşê yanjî zerikê- ji bona pêwistîyên xwe dane biveguhertin. Bi derbasbûna pêleke din ve bikaranîn perçeyên lajwerdîyên biçûk date bidestpêkirin, ji yên ku hêjabûna wan li ser giranbûn û rengê lajwerdîya wan de -mîna zêr, zîv, mis, tunc yanjî hesin- dihate


- W. Giesecke: "Antikes Geldwesen", Leipzig 1938.
- b. Laum: "Heiliges Geld", Tübingen 1924.
- L. Lengyel : "L'Art gaulois dans les médailles" Paris 1954.
- A. Dopsch: "Naturalwirtschaft und Geldwirtschaft in der Weltgeschichte", Wien 1930.
- C. H. V. Sutherland: "Art in Coinage", London 1955. Ismet Şerîf Wanlî


[1]Mêjûwa aburî ji me re di vî warî hanê de tiştekî din dide bigotin. Da ku tu şaşî di vî warî de neyêtin bidîtin, divê ku em bêjin, bê çi em di bin pûlan de têtin biliberkevtin. Gava ku me pûl nala destikên guhertin û veguhertinê dane binasîn, wê çaxê peydabûna pûlan ji me re tête bihêsanîkirin û ew li seranserî dunyayê û di hemû mêjûwê de li nik hemû Miletên serûştî jî de ji bona nimûne ji şeytanoka tanî zêr û zîv jî têtin bidîtin. Cuma

birawestandin, mîna ku ev li Babilistanê de hate bidîtin[1]. Têtê bibawerkirin, ku diyarbûna pûlên kutayê yanjî çêkirî di Asya Biçûk de di destpêka sedsalên heftê b. z. de dayite bidestpêkirin. Ew di koka xwe de ji bona dana mahîyên Serbazan hatine bipeydakirin. Bi nav û bang ve tête bidîtin, ku "Cresus" -Kirêsus- Padîşahê Lydia -Lidya- di Asya Biçûk de, yê ku ew ji bal Padîşahê Mêdî "Cyaxare" -Kîxosrô, mina ku Hêrodot wî dide binavkirin, hatîye bişerkirin, pir bi xiznên xweyî pûlên zêrî ve bi nav û bang bû. Di nava xanîyêv kevnaryê de perçeyên pûlan têtin bidîtin, ji yên ku ew di pêla Dayosê Mezin Şahê Iranê de hatine bikutan. Li ser wan pûlan de neqiş têtin bixuyanîkirin, ku wê bawerîya pêşîn didin biderxistin. Bikaranîna pûlan kombûna sermiyan dane biserhevdukirin. Li paş de bank hatin biderkevtin[2].

Durustkirina Pulan di Yunana kevnar de di Perestgehan de dihate bikirin. Li paş de durustkirina wan bes û bi tenha ve di nava destê Padîşahan û Dewletê de dihate bidîtin. Di koka xwe de hêjabûna wanî kirînê li ser giranbûn û rengê lajwerdîya wan de dihate birawestandin. Wer bi hilandina wan ve tu zîyan nedihate bipeydakirin. Bi derbasbûna xurtbûna desthilatîya Dewletê ve û bi pirbûna ewletî û rêk û pêkitîyê ve dikarîbû hêjabûna kirîna pûlan ji buhabûna lajwerdîya wan bêtir bête bidîtin. Hêjabûna kirina wan di gora pêwistîya Dewletê ji bona mal dihate bihilatin û bidahatin. Di

---

[1]Ji xwe re li ser mêjûwa pûl û peran de li van nivîstên tên bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin:
1. H. Klengel : "Hammurapi von Babylon und seine Zeit", VEB Deutsche Verlag der Wissenschaften. Berlin 1980.
2. Heinz Joswig: "Das Geld", Urania-Verlag, Leipzig. Jena. Berlin. 1968.
3. Klaus Müller: "Wo das Geld die Welt regiert", Verlag die Wirtschaft Berlin 1985.
Cuma

[2]Di mêjûwa aburî de Bank wer ne hatine biderkevtin, mîna ku Ismet wan dide bixuyanîkirin. Ew rast û durust di pêla Babilistanê jî de dihatin bipeydakin û dur yanjî nêzîk bi karê xweyî niha ve dihatin birabûn. Di pêla dema vejandinê de ew li Italya de bes û bi tenha ve ji bona hêsanîkirina bazirganîyê di dane peran de hatine bipêkhatin.
Cuma

pêlên nuh de hate bikirin, ku Merov dikarîbû pûlên lajwerdî bi pûlên pelî ve bidin biveguhertin[1]. Ji bona van pelan tu hêjabûneke metiryalî nedihate bidîtin. Bes û bi tenha ve hêjabûna wanî kirinê li ser girawkirina Dewletê de û bawermendîya Merovan bi wan ve dihate bidîtin. Tête bizanîn, ku Dewlet ji bona her Merovekî dide bigirawkirin, ji yê ku ew xwedanê pelên pûlî, heger jî ku ew biyanî jî bin, veguhertina wan bi lajwerdîyekî xwedan hêjabûneke bi serê xwe ve dide bikirin. Di vê serdema meyî niha de Merov dikare pelên pûlî bi "Perên Hejmarî° ve bidin biveguhertin. Ango veguhertina jimarên hilanînan di nenkan de bidin biveguhertin

Ji nîşanên pûlên lajwerdî têtin bidîtin, ku ew bi hêsanî ve nayêtin biwindakirin, -ji wan jî zêr jî tête bihiştin- û Merov dikare wan di nava şopênkevnar de bide bidîtin. Dozandina wan ji bona hebûna civakeke bi rêk û pêk ve, desthilatîyekê û veguhertinên bazirganî dide biderxistin. Dibe, ku xwendekarîya wan jî ji bona agehdarîyên mêjûyîyî nenas bide biajotin. Ev jî bi saya nivîsandina nav û mêjuwan ve û neqşên li ser wan de têtin bidîtin.

Bi vê têgihiştina hanê ve "Numismate" -Pûlênkevnar- ew nala zanistîyeke baştirkirî yanjî alîkar ji bona mêjûwê têtê bidîtin. Ew bi serê xwe ve têtê bidîtin û pêwendiyeke wî ligel hunerên sipehîbûnê de -bi neqşên li ser pûlan de ji nigarîya Merovan, Kaxan, Çekan yanjî nîşanan- û ligel mêjûya ayînan û bawermendîyan têtê bidîtin. Karnasan komek ji nivistên wênekirî ji rengên cudayî pûlên kevnar dane bibelavkirin.

- Yves Hetman -Hêtman- derîyek li ser zanistîya "Sigillograhpie" -Tomarkirina Morênkevnar- de date binivîsandin. Bikaranîna moran ji bona heyamên dûrîyî kevnar têtê bivegerandin. Kolandinên şopênkevnar di nava dola Nîl, Mizopotamya û Êlam de mor datin bidozandin, yên ku ew berî sê hezar sal berî zayînê hatine bipeydakirin. Herwehajî li paş de mor li Ewropa jî de hatin bikaranîn. Ew di koka xwe de bi rengekî guroverîyî dirêjîyî biçûk ji kevir dihate bidurustkirin û di nava wê de koneke mîlî dihate bidîtin. Li ser morê

[1]Evaya cara pêşîn li ser çerm de û li paş de li ser pelan de di çîna kevnar de hatîye bidîtin. Cuma

de tiştên pêwist ji neqiş û nigaran dihatin bikolandin. Li paş de lajwerd ji bona vê mebestê bi rengê perçeyên pankirîyî gurover yanjî çarîndirêj ve hate bikaranîn. Morên şepîyî jî têtin bidîtin.

Bikaranîna morê -ligel navnivîsandina xwe- de dawîya nameyekê -payîna wêna, morkirina wêna-, yanjî bicînanîna xwedîbûna wênayî kesitî, yanjî ji bona parastina veşartina belgeyekî, yanjî ji bona wî belgî pêdana rengekî mîrî yanjî nala namepêdanek li ser rastîya wî belgî de dide biarmanckirin. Di belgeyên giring de dibe ku mor li ser mûma sor -yanjî kesk- de bête bilêxistin, mîna ku ev di peymanan de tête bikirin.

Mîna ku di pûlên lajwerdî de xwendekarîya morên kevnar jî kanîyeke ji kanîyên mêjûyê û mêjûwa huner dide bipêkanîn. Ev jî li gora malên moran, şêweyê çêkirina wan û neqşên kolandî li ser wan de tête bidîtin. Ji van moran jî morên berîd û di dawî jî de pûlên berîd têtin bidîtin, ji yên ku bikaranîna wan bes û bi tenha ve di nîvî sedsalê nozdehan de li Ingilistanê de di pêşî de hatine bikirin[1].

- Gerjî ku avanî, pûl, mor, tiştên çêkirî bi rengekî giştî ve, herwehajî pêrejî gewdeyên hestî, mayînên xuwarinê û nigar, yên ku ew dikarin di rêya kolandinên şopênkevnar de yanjî di şikevtan de bêtin bidozandin, ji kanîyan bêtin bidîtin, ji yên ku di rêya xwendekarîya wan de nasîna mêjê têtin bidîtin; belam maka bingehîyî mêjûwê ew her û her di nivîsandina nivîsandî de têtin bidîtin, ya ku diyarbûna wêna destpêka heyamên mêjûyî dide bipêkanîn. Destpêka nivîsandinê ji heremekê ji bona ya din têtin bicudakirin. Kevintirîn nivîsandin ew ji

---

[1]Evanan hinek ji kanîyên Bibliyografîyên zanistîya xwendekarîya morên kevnar di Ewropa û Firensa de têtin bidîtin:
- R. Gandilhon: "Bibléorahpie de la sigillograhpie Française", Paris 1951-54.
- Louis D. d'Arcq: "Collection des sceaux", Paris 1863-68. -têde pesnê 11840 moran têtin dîtin.
- Cl. Lapairc: "Corfus sigillorum Helvetiae", in "Arichives héraldiques Suisses", No. 4, 1959.
- Sir. H. Jenkinson: " A Guide to Seals in the public Record Office", London 1954.

Ismet Şerîf Wanlî

bona çar hezar sal berî zayînê tête bivegerandin.

Nivîsandin şêweyeke rê pê dide bidan, ku remana Merov yanjî gotina wî -zimanê wî- di rêya tîpan, yanjî nîşanan de bête biderkevtin, ya ku ew li ser tiştan de tête bitomarkirin, yên ku Merov dikare wan bide bixwendin. Xwendekarîya nivîsandinên nivîsandî ew bi xwe ve zanistîya philologie ango zanistîya zimanan tête biderkevtin. Merov hesta bînê ango çav ji bona xwendina nivîsandinên nivîsandî li ser tiştan de dide bikaranîn, yên ku wî ew ji bona vê mebestê nala beran, çerman, pelê- hin ji şinîyan, qermîtan, hestîyan, pertelan û pelan dane bikaranîn. Belam teknîka taze rêyên din ji bona tomarkirina nivîsa "nivîsandî" yanjî hêjî rastir ji bona gotinê bêyî nivîsandinan qawin -disques, records-, -yên ku ew ji rengekî mûmê têtin bidurustkirin-, yanjî şirîtên megnatîsî -disquetti- dane bipeydakirin. Ev nivîsandinên hanê bi çavan ve nayêtin bixwendin; lêbelê ew bi guhan ve têtin bihîstin. Ev nivîsandinên hanê, yên ku ew dikarin bi van şêweyan ve bêtin bihîstin, tevlivêjî de ji wan re "bi nivîsandinên nivîsandî" têtin bigotin.

- Gelek "zanistîyên alîkar" -Auxiliaire, Hilfsmittel- ji bona zanistîya mêjûwê ji bona xwendekarîya nivîsandinên nivîsandî li gora wan rêyan de têtin bidîtin, ji yên ko Merovan ew ji bona tomarkirina nivîsandinê dane bikaranîn. Ji van jî zanistîya Epigrahpie -Êpigrafî-Nîşanî- jî tête bidîtin, yên ku ew "bi nivîsandên nivîsandî ve li ser kêlên bîrxistinê de" têtin bipêwendîkirin, yên ku ew di reweştê de ji keviran yanjî ji neqşên li ser zinaran de têtin biçêkirin, da ku ew bînvanîyê li ser şopên çûyî de ji bona nifşên tên bidin bihiştin.

Padîşahên Rojhilata kevnar karên xwe û pêrabûnên xweyî supahî, ramiyarî, qanûnî, avanî, civakî û aburî bi kolandina nivînandinan ve di wan derbaran de li ser zinarên bilnd de yanjî li ser dirêjên ji keviran bi rengên sitûnan ve didan bimayînîkirin, yên ku ew li nêzîka rê û banan de dihatin bidanîn, da ku kerwanên pêlên tên wan ji xwe re bidin bidîtin; mîna ku Feronîyên Misrî, Padîşahên Mêzopotamya, Padîşahên Wanê -Orarto-Wan bi taybetî ve li ser dîwar û bendên kelehan de- dane bikirin. Herwehajî Daryos li ser zinarê Bihistun -yanjî rastir Bistuon -Bistun- de li nêzîka Kermanşah de li Kurdistana Îranê de date bikirin. Hinekan jî ev nivîsandinên hanêyî

Epigrahie -Nîşanî li ser devên derîyên perestgehan, avanîyan û serayên Dewletê de dane bihiştin. Herwehajî hinekan ew li ser bingehên pûtên kevirî de dane bihiştin; mîna ku ev reweşta hanê li Yunan, Roma kevnar de û di nava welatê Imperatorîya Romanî de li dora derya Sipî de dihate bidîtin. Hin ji wan jî li ser kêl yanjî diyarîyên goristanan de dihatin binivîsandin, da ku ew jîna Merovî mirî bidin binîşandan û nav, temê wî û hincaran jî karê wî bidin bibîrxistin.

Em di nivista "mêjûwê û şêweyê wê^" de, ya ku em wê dixwazin bidin biraxistin, derîyekî bi xama Louis Robert ve li ser Epigrafîya Yunanî de di Imperatorîya Romanî de didin bidîtin; jiber ku bikaranîna wêna bi firehbûn ve dihate bidîtin. Di nava vê nivistê de agehdarîyên zingînî li ser mêjûwa ramyarî, supahî, qanûnan, ayîn û berwemendîyan, civakî û abûri de têtin bipeydakirin; -herwehajî buhayên kişt û kalan û kiryên Kargeran jî di nava wê de têtin bidîtin-. Ev tevdejî di nava wê nivîstê de bi rengekî taybetî ve li ser mêjûwa cihî de tête bidîtin. Mêjûvanên Yonanîyî kevnar di nava nivîstên xwe de li ser mêjûwa Atina û Asparta didan bigirêdan û wan bi reweştî ve bajarên din di ser guhên xwe re didan biavêtin, yên ku her yek ji wan nala Dewleteke biçûk dihatin bidîtin û jimara van Dewletên hanê bi dehan ve dihatin bidîtin.

Divê ji bona nasîna mêjûwa van bajaran bête bivegerandin; jiber ku wan şopênkevnarîyî Epigrafî li dûxwe de dane bihiştin. Ji kara van şopênkevnarîyî nivîsandîyî neqişkirî li ser kevir de tête bidîtin, yên ku ew me xweser bê destikî li wan de dide biagehdarîkirin, ji yên ku wan ew dane bipeydakirin; -mîna ku ev di nava wan destnivîsandinan de tête bidîtin, yên ku divên Merov wan ji nûve heyamekî li dû heyamekî din de bide binivîsandin; da ku ew neyêtin biwindakirin. Jibervêjî di nivîsana jibergirtina wan şaşbûn têtin bipeydakirin-. Ew destnivîsên hanê jî nayêtin bixerakirin, heger ku ew li ber ba û baran de neyêtin bidîtin; lêbelê ew têtin bihiştin, heger ku ew li jêr zemînê de bêtin biveşartin. Belam Epigrafî nivîsandinên nivîsandî li ser çerm yanjî pelan de di serguhên xwe re nade biavêtin, yên ku ew di nava dam û destgehên serdarîyê de yanjî di nava nivîstxanên giştî û xanîyên Archive -Arçîv- de têtin bidîtin; jiber ku yên di nava wan de ji qanûnan yanjî peymanên navdewletî têtin bidîtin, ew bes û bi tenha ve kurtîyek bi serê xwe ve yanjî nala

wergirtinan didin biderxistin[1].

- Ji "Zanistîyên Alîkar" ji bona nasîna mêjûwê zanistîya "Papyrologie" -Papirologi- tête bidîtin, ango xwendekarîya nivîsandinên nivîsandî li ser "Pelên" Papyrus -Papiros- de tête bidîtin. Papirus ji rengekî qeselê ye, yê ku ew li ser kenarên çemê nîl de li Misrê de têtin bişînkirin. - Qaşilên wan qeselan didin biwergirtin û wan bi hev ve didin bivekirin. Bi vî rengî ve rûpelekî tenik nala pelekî tête bipêkhatin. Ew bi giranbûna xwe ve sivik û nerm tête biderkevtin. Merov dikare wî li hevdû de bide bipêçandin û wî bide bihilanîn. Ew xurte û ew ne nala pelan tête bijihevkevtin-.

Mêjûvanên Ewropî bi nivîsandinên Papirologi ve wan nivîsandinan didin bimebestkirin, yên ku ew bi zimanê Yunanîyî kevnar ve li ser pelên papiros de li Misrê de yaxud li Cîhana Yunanî de ji pêla Iskenderê Makdonî de li Misrê de der sala 331 b. z. de tanî vekirina musulmantîyê de der sala 641 zayînê de hatine binivîsandin. - Ev pêla hanê bi pêleke dujwar ve tête biderkevtin; jiber ku di berî wê de nivîsandina Misrîyî Hêroglifîyî kevnar hatibû biwindakirin û Misir di nava vê pêlê de bi çînîyên xweyî civakîyî bilind ve nala welatekî Yunanî bi zimanê xwe ve dihate biderkevtin û ew herwehajî ji giringtirîn navînîyên zanyarîyî Yunanî -di bin serdarîkirina Betalis de û di pişt re jî Romanîyan- de dihate bidîtin-.

André Bataille derîyek ji bona wê di nivîstê de di rêya nivîsandinên Epigrafî de date bitirxankirin. Nivîsanînên Epigrafi di reweştê de rengekî wanî Mîrî tête biderkevtin. Nivîsandinên Papirologi bi jîyana rojîyî Merovan ve bi pirbûn ve di diyarîyên wêyî cudan de têtin bigirêdan.

Herwehajî nivîstên Feylesuf, Nivîskar û Mêjûvanên Yunanîyî kevnar jî li ser Papiros de hatine bitomarkirin. Herwehajî Papirologiya

[1]Li ser Epigrafîya ewropîyî kevnar de ji xwe re li van de bidin bitemaşekirin:
- G. Kloffenbach: "Geschichte Epigraphik", Götingen 1957.
- K. Cagnat: "Cours d épigrahpie latine", Paris 1914.
- M. N. Todd: "A Selection of Greek historial inscriptiones", 2 Vol, Oxford 1933, 1948. Ismet Şerîf Wanlî.

Romanî jî tête bidîtin[1]. Wisajî Papiros ji bona nivîsandinê di zimanê rojhilatî jî de hatîye bikarhatin.

- "Paléographie" yaxud "Palaeographie" -Palêyografi- ew "bi zanistîya rêyên nivîsandinên kevnar ve" tête bidîtin, ango ew bi xwendekarîya veguhertinên rengên tîpan yanjî tiştan ve, yên ku li ser wan de tête binivîsandin, tête biderkevtin. Niha pê "zanistîya xwendekarîya nivîsandinên kevnar" bi rengekî giştî ve tête bimebestkirin.

Ev navê hanê ji bona Bernard Monfauconê Firensî tête bivegerandin, yê ku wî der sala 1702 de nivîstek li ser "Paléograhpie - Palêyografiya- Yunanî" date bibelavkirin. Ew bi berekî fireh ve tête bidîtin. Herwehajî derbarê zimanên rojhilatîyî cudan jî de Paléographie -Palêyografi tête bidîtin. Ji bona nimûne werjî rêya nivîsandina zimanê Erebî û xêza wîna û herwehajî nala vê jî zimanê Ermenî û Suryanî bi derbasbûna zeman ve hatin biveguhertin.

Bi vê têgihiştina hanê jî ve "papyrologie" -Papirologi- ew ji berekî Paléograhpie- Palêyografi- tête bidîtin. Jê nivîsandina destî û ne nivîsandina mîkanîkî -nala çapê- ango xwendekarîya destnivîsan û çawabûna nivîsandina wan, hunerê xêzê, çawbûna xwendina wan û çawabûna hilanîna wan tête bimebestkirin.

- Alfonse Dain -Dan- derîyek ji bona "Paléograhpie -Palêyografiya Yunanî" date bitiraxnkirin[2]. Jean Mallon derîyek ji bona "Paléograhie

---

[1]Ji xwe re li ser Papirologi de ji bona nimûne li van kanîyên têtin de bidin bimeyzekirin.
- W. Schubert: "Einfuhrung in die Papyruskunde", Berlin 1918.
- A. Calderini: Papyri", Milano 1944.
- H. Hombert: "L'Etat des études de papyrologie...", Paris 1947-48. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ji xwe re li ser Paléographie -Palêyografiya Yunanî de li van kanîyan de bidin bimeyzekirin:
- V.Gardthausen: "Geschichte Palaeographie", b. 1+ b. 2, Leipzig 1911-13.
- R. Deveresse: "Introduction á lé'tude des manuscrits greces", Paris 1959.
- C. H. Roberts: "Greek literary Hands" Oxford 1955. Ismet Şerîf Wanlî.

-Palêyografiya Romanî" date bitirxankirin[1]. Charles Perrat jî derîyek ji bona "Paléograhie -Palêyografiya sedsalên navînî" di ewropa de date bitirxankirin[2].

Ez li ser wan de nayêtim birawestandin; jiber ku kara wan ji bona Lêkolandvanê rojhilatî û serûştîya wênayî hunerî kêm tête biderkevtin. Ezê dê bidana hin kanîyan li ser wê de bidim bitêrkirin.

- Herwehajî zanistîyek ji bona xwendekarîya "Ryptograhpie" - Nivîsandinên Veşartî- tête bidîtin. Kevnaran carcaran rêyên di nivîsandinê de didatin bikaranîn, ku ji bil Nivîsvanê namê û Merovê name ji bona wîna pêve nikarîbûn bidana bixwendin; jiber ku ew li gora "Chiffre" -Kilîtê- hatibû binivîsandin. Ango ew li gora rêzanekе veşartî de hatibû bitomarkirin, ya ku ew li ser wê de hatibûn bilihevhatin. Rêya nivîsandina wêna bi guhertina tîpekê ve -yanjî pir tîpên li dûhevdû de- bi tîpeke din ve yanjî bi jimarekê ve dihate bikirin. -Ji bona nimûne A bi tîpa D ve yanjî bi jimara 13 ve tête biveguhertin-. Evaya bi rêya "Substitution" -Veguhertinê- ve tête binavkirin. Herwehajî ji bona namerêkirinê rêya "Transposition" - Veguhestinê- tête bidîtin. Ango hiştina tîpê mîna ku heye, belam cihê wê di pevikê de yanjî di xêzê de tête biveguhestin.

Ev rêyên hanê ji bona namerêkirinê di navbera paytextan û deveran de yanjî ew di navbera Padîşahan û Wênerên wan de di

[1]Ji xwe re li ser Paléographie -Palêyografiya Romanî de li van kanîyan de bidin bimeyzekirin:
- J. Gordon: "Contribution to the Papygraphy of Latin inscriptions", Univ. of California, Berkeley 1957.
- J. Mallon: " Paléograhpie Romaine", Madrid 1952.
- J. O. Tjäder: "Die Forschungen Jean Mallons zur römischen Paläegraphie", in Mitteil. d. Inst. für Oetersuch. Geschichtf., Graz-Köln 1953. Ismet Şerîf Wanlî

[2]Ji xwe re li ser Paléographie -Palêyografiya sedsalên navînî de li ewropa de li van kanîyan de bidin bimeyzekirin:
- F. Ehrle + p. lieber: "Specimina codicum Latinorum Vaticanorum" Berlin 1927.
- M. Prou: "Recueil de fac - similés d éiritures", Paris 1904.
- G. Mentz: "Handschriften der Reformationzeit", Bonn 1912. Ismet Şerîf Wanlî.

heyamên kevnar û navînî de dihatin bikaranîn. J, Richard derîyek li ser vê danava hanê de date binivîsandin. Ez li ser wî de nayêtim birawestandin[1].

- Ji heyamên kevnar de dam û destgehên padîşahî û serpereştîya li Ewropa de dest bi hilanîna "Documents" belgeyên mîrîyî nivîsandi ve û civandina wan di "Archives" de -ji qanûn û yasayên girêdayî bi jîna aburî û civakî ve- dane kirin; mîna ku berî wan kenişţê ew didan bikirin.

Herwehajî Merov û Nefrên dam û destgehên "Notaires" Nivîskarên Dadwerîyê jî bi vî karê hanê ve hatin birabûn, da ku ew jî nîşana mîrîtîyê bi peyman, belge xwedîtîyên xwe ve bidin bidan. Ev reweşta hanê ji sedsalê navînî tanî noke -ji bil hin rêyên vehilanîna belgeyan pêve- date bidirêjkirin. Ev belgeyên hanê, yên ku ew bi zimanê Firensî ve "Diplômes" yanjî "Chartes" têtin binavkirin, kanîyeke bingehî ji bona nasîna mêjê ji rexê mafeyî, aburî û civakî didin bipêkanîn. Rêya civandina wan ji bal Mêjûvan, xwendekarîya wan, rexnelêgirtina wan û jihevderkirina derew rastîyan jê ev zanistîyeke alîkar ji bona "Mêjûwê" dide bipêkanîn, yê ku jê re zanistîya "Diplomatique" tête bigotin, mîna ku me ew date bidîtin. Dibe, ku navê wî bi zimanê Firensî ve ligel Diplomasîya pêwendîyên navdewletî de şaşbûnekê bide bidurustkirin. Ew herdu bi du berên cudan ve têtin dîtin. Navê wê bi zimanê Elmanî ve "Urkundenlehre" - Fêrkirina belgeyên kevnar- tête biderkevtin. Ev navê hanê bi rengekî hûrtir ve navroka wê zanistîyê dide biderxistin.

Keşê Holendî Papenbroeck der sala 1675 de yê pîşî bû, yê ku wî belgeyên Padîşahên Firengîyî pêşîn di Firensa de dane bicivandin. Belam Keşê Firensî Jean Mabillon, -yê ku navê wî hatîye bibuhurandin-, bingehên zanistîya Diplomatique û rêzanên wê der sala

[1]Ji kanîyên li ser "nivîsandina veşartî" de ji xwe re li vanan de bidin bimeyzekirin:
- R. Cellier: "La Crypto" Paris 1681.
- A. Meister: "Die Anfänge der moderne diplomatische Geheimschriften" Paderborn 1906. Ismet Şerîf Wanlî

1681 de datin bidanîn. Di vê nivîsta hanê de, ya ku em niha li ser de didin biaxivtin, derîyek li ser zanistîya Doplomatique de bi xama G. Tessin ve têde tête bidîtin[1].

- Li paş wî de Paul Lebel derîyek li ser zanistîya Onomastique de date binivîsandin, ya ku ew bi zanistîya xwendekarîya navên taybetî ve - ango negiştî mîna nivistê, çem û yanjî xame- tête biderkevtin. Jê re gelek ber têtin bidîtin û ji wan jî zanistîya xwendekarîya "Toponvmic" -navên giyografi-, zanistîya xwendekarîya "Hydronmce" -navên çeman û zanistîya xwendekarîya "Antroponymitice" -navên Nasan û Merovan -ji bona kesekî yanjî malekê- têtin bidîtin. Ev hemû bi zanistîyên "Alîkar" ve ji bona nasîna mêjûwê û navên wê têtin bidîtin. Ev zanistîyên hanê jî ji rehên Yunanî têtin biderkevtin.

Yê pêşî ku li ser vê danava hanê de hatîye binivîsandin, ew di nivîstekê de der sedsalên pêncemînî zayinê de li navên giyografî de di welatê Galîyî kevnar de di bin navnîşana "De Nomonibus Gallici" de bi zimanê Latînî ve hatîye binivîsandin. Lêbelê Onomastique bes û bi tenha ve der dawîya sedsalê nozdehan de rast û durust bi zanistîyekê ve hatîye bikirin; piştî ku bingehên pêşkevtina "Linguistique historique" -zimananî mêjûyî hatine bidanîn.

Belê peyivandina navan bi heyaman ve tête biveguhertin û herwehajî rengê nivîsandina wan jî tête biveguhertin. Ev veguhertinên hanê jî ji heremekê û ji bona heremeke din têtin bicudakirin. Werjî bi vî rengê hanê ve zimanek ji bona zaravan bi derbasbûna zeman ve tête bibeşkirin. Pêşvekevtin di peyva nav û gotinan de li gora rêzanên dengînî de tête bikirin û ew dikare ji bona her heremekê bête bixwendekarînîkirin. Rêzimanên veguhertinên dengînî ji zimanekî ji bona yê din, na hêjîbêtir carcaran jî ji zaraveyekî ji bona zaraveyekî

---

[1]Ji xwe re li ser Zanîstîya Diplomatique -diplomatik- de li van kanîyabn de bidin bitemaşekirin:
- Dom J. Mabllon: "De re diplomatica libri VI...", Paris 1681.
- H. Bresslau: "Handbuch der Urkundenlehre für Deutschland und Italien", Leipzig 1889, Berlin 1958 -çapek nuh.
- L. Perrichef: "La Grande chacelleric de France des Origines â 1328", Paris 1912. Ismet Şerîf Wanlî.

din têtin bivecudakirin.

Wisa navê Galîyî Seltîyî kevnar Mediolanum ji bona cihên cudan dihate bidan. Ew bi derbasbûna rojgarîyê re ji bona rengên cudan li gora hereman de hate bipêşvekevtin: Ew li Firensa de bi Meylan, Meillan, Miolan, Malain û Moêslains ve û li Italya de bi Milano ve hate bikirin.

Ev vepêşkevtinên hanê carcarn jî ji bona mînahevbûna peyvêyî ji ber xwe di navbera du navan de dide bikirin, ku ew ne bi neçarî ve ji yek kokê têtin biderkevtin. Halo navê Vienne -Viyenna- ew peyv û rengê Firensî ye, yê ku ew ji bona bajarê Wien tête bidîtin, ya ku ew bi paytexata Nemsa ve tête biderkevtin. Wetovjî navê bajarê Vienne tête bidîtin, yê ku ew bi bajarekî Firensî ve tête bidîtin; belam ew û Vienne -Viyenna- ji bona yek kokê nayêtin bivegerandin; tevî ku ew herdu jî bi yek peyv û nivîsandin jî ve mînahev têtin biderkevtin.

Serdarîya Firensî ji sala 1870 bi belavbûna bergan ve ji "Ferhenga Firensîyî Topografî[1]" melbend bi melbend ve dide bikirin. Di nava van ferhengan de navên bajaran, gundan, çeman, cihên giyografî û veguhertinên wanî peyvînî û kokên wan ji kevintirîn demên karînî tanî rengên wanî taze jî têtin bidîtin. Ev tevdejî li ser bingehê belegeyan û arşîvên mêjûyîyî nivîsandî de ji yên Padîşahitîyê, yanjî ji yên Tude, yanjî ji "Cadastre" -tomarên xwedîtîya erdan-, yanjî ji kanîyên Yunanî û Romanî, ji yên ku di nava wan de li wan de hatibûn binivîsandin û yanjî ji lidûmayînên pêla Seltî têtin bikirin. Weha navê bajarê Lyon -Liyon-î niha di rojgarîya Seltî -Galî- de bi Lugudunum ve dihate binavkirin. Ev navê hanê ji Dunum ango "Keleh" yanjî "bajarê bendkirîyî xurt" di zimanê Seltî de û ji Lugus, yê ku ew navê Xwedanê Seltî bû û herwehajî ew di Irlenda jî de bi nav û bang bû; -jiber ku Irlenda jî di koka xwe de, mîna ku diyare, bi Seltî ve tête bidîtin; têtê bisuwarkirin. Navê Lyon -Liyonî kokî bi "bajarê

---

[1]Ev bi zimanê Firensî ve: "Dictionnaire topographie de la France" têtê bigotin. Der sala 1961 de -sala belavbûna nivîsta "Mêjû û Şêweyê wê"- hêjî tevaya bergên vê ferhenga hanê ji ber hoyên dujwarîyên zanîstî û jimara melbendan, -yên ku ew bi sed melbendan ve dihatin biderkevtin, nehatibûn bibelavkirin. Ismet Şerîf Wanlî.

Xwedanê Logusê xurt" ve, -yê ku ew niha bi navê taxekê ve di nava bajêr de tête bidîtin; lêbelê ew wî navî ji xwe re nade bihilgirtin-, dihate biliberkevtin.

Weha navên bajarên suwarkirî ji rexê liberkevtina xwe de di nava pir zimanan de têtin bidîtin. Ji bona nimûne navên bajaran wer bajarê Neuveville yanjî Villenneuve bi Firensî ve -ango "bajarê nuh"- werjî beramberî wî bi Elmanî ve Neustadt, bi Ingilîzî ve Newtown, bi Rusî ve Novgorod, bi Yunanî ve Neapolis û bi Galîyî Seltî ve Noviodunum têtin bidîtin. Ji bona derxistina rêzanekê li ser vepêşxistina navan de divê ev rêzana hanê li ser jimareke pir ji nimûyan de bête bicîanîn.

Di zimanê Galî de du peyv ji bona "Dunum" -Kelehê, mîna ku ew li jor de hatîye binivîsandin, herwehajî "Briga" Burc, -Burg bi Kurdî ve. Cuma-- têtin bidîtin. Jiber ku bajarên wan nala kelehan xurt bûn, pirbûna navên bajarên wan ji Dunum yanjî Briga dihatin bisuwarkirin û herwehajî navê Xwedê yanjî nîşana wî û yanjî navê çemekî bi ser ve dihate bivekirin. Ji bona nimûne navên bajarên: Noviodunum -Keleha Nuh-, Litanobriga -Keleha Pan-, Devobriga -Keleha Xwedanî-, Virodunum -Keleha Rastîyê, bi têgihiştina xurtbûnê-, Scaldobriga -Keleha çemê Scald, yê ku ew niha bi çemê Escaut dihate binavkirin. Ew berî çend heyaman bi navê çemê Escault ve dihate binavkirin-, Brivodunum -Keleha Pirê- û ji wan jî bajarê Caeserdunum bi navê Qeyser li paş vekirina wî de têtin bidîtin. Galilyan bajar, çem û daristanên xwe didan biperestkirin; jibervêjî piranîya navên wan tanî piştî vekirina Romanî jî hatin bihiştin; belam ew bes û bi tenha ve bi dema meyî niha ve hatin bigihaştin, piştî ku veguhertinên mezin di ser wan de -yanjî kevtina hin ji tîpên wan- bi me ve hatin bigihandin. Dibe, ku hin ji wan navên kevnar berî neşînbûna Galîyan di Firensa de dihatin bipeydakirin.

Belam jiber nebûna belgeyên nivîsandî, yên ku ew ji bona berî sedsalê şeşemî berî zayînê dihatin bivegerandin û yên ku ew bi Firensa ve dihatin bigirêdan, Merov nikarîbû wan bide binaskirin.

Navê "Dubron" -avê- di zimanê Seltî de ji bona suwarkirina navê hin çeman tête bikevtin. Ji van çeman jî çemê Dobre li Sipanya de, çemê Aragendoule -ava zîvînî- û çemê Verdouble li Firensa de têtin bidîtin. Çeman di welatê Galî de bipirbûn ji bona nîşana dêyêtîyê

"Ma, Matra di Seltî de- yanjı nîşana Xwedanîyê "Devra" didan bikirin. Ji van jî navên hin ji çemên Firensîyî taze nala Marne, Moder, Maronne, Moselle, Dive, Divonne û herwehajî çemê Morges li siwêsra Firensî de têtin bidîtin.

Gotina "Reinos" bi "ava xurû" ve tête biliberkevtin. Ev ji wan gotinan têtê bidîtin, ji yên ku ew ji bona berî pêla Seltî têtin bivegerandin. Ji van jî navê çemê "Rhine, Rhin" bi zimanê Firensî û Elmanî têtê bidîtin û navê çemê Reno jî têtê bidîtin, -yê ku ew ji rûbarên çemê Po li nêzîka Milano têtê bikevtin-.

Têtê bibawerkirin, ku jimarek ji navên giyografiyên Ewropî ji gotinan têtin biderkevtin, ji yên ku ew ji bona berî koçên Hindo-Ewropî têtin bivegerandin. Li gora Karnasên Italî de gotinên "Kara" yanjî "Kala" ango kevir, "Mala" -çiya-, "tala" -rengeke ji qura zîxê yanjî Argile bi zimanê Firensî, Clay bi zimanê Ingilîzî û Ton bi zimanê Elmanî- û "Gaba" -çem yanjî cihoka avê- ji bona wan heyamên kevnar têtin bivegerandin û bi rengekî yanjî yê din ew hemû di Toponomiya Ewropî de têtin bipeydakirin.

Navê daristanê di zimanê Galî de "Vidu" têtê biderkevtin. Ev navê hanê ji bona suwarbûna hin navên çemên Firensî têtê bikevtin; -jiber ku çem ji daristanan dihatin biderkevtin-. Ji van jî çemên taze Vonne, Veuve, Vouge têtin bidîtin, yên ku ew ji Vidula -ango çemê daristanê- têtin biderkevtin.

Li paş Koçên Firangîyî Germanî de ji bona welatê Galî zimanê Elmanî pir navnasîn ji bona Firenas -û di pêşîya pêşî jî de navê Firensa bi xwe jî ve, mîna ku me ew date bidîtin- date bidan[1]. Werjî navên Elmanî ji bona nava navên ciyografîyî firensî hatin bikevtin; ev jî bipirbûn bi rengekî suwarkirî ve hate bidîtin.

Navên Elmanî, yên ku ew bi "bach" ve -koka wê baki- têtin

[1]Ji bona nimûne navê Elmanîyî Bernhard ji bona navê Bernar,Bernardê Firensî hate bikirin. -ji vî navî H hate bikevtin; jiber ku Firensî ji dengên gerdenê nadin bihezkirin û herwehajî D dawî nayête bipeyivandin; tevî ku ew jî di nivîsandinê de têtê bihiştin-. Herwehajî Friedrich zimanê Elmanî de bi Fréderrique di zimanê Firensî de hate biveguhertin. Ismet Şerîf Wanlî.

bidawîkirin, mîna wan di nava navên cihên Firensî de têtin bidîtin, yên ku ew bi bec yanjî bi beque û yanjî bi bek di heremên jorîyî rohilatî de -û bi bekk di Denimark de- têtin bidawîkirin. Ew bi "bek" ve bi Firensî ve têtin bipeyvînîkirin, di gava ku di zimanê Elmanî de bi "bax" ve têtin bipeyvînîkirin. Herwehaji gotinên Elmanî ji bona nava pir navnasên Firensî hatin bikevtin. Ji van jî "Hug" -Mêrxas-, "Man" -Man,- Van-, "Ragin" -Amojgarî-, "Bald" Mêr-, "Mud" -Parastin-, "Wald" -Serkirdayetî-, "ward" -Pasevan-, "Runa" -Veşartin-, "Burg" -Liberxwedan-, "wara" -Guhpêdan-, "Fried" -Aşîtî-, "Leube" -Evindarî-, "Harî" -Leşker-, "Swind" -Hêz-, "gund" -Şer- têtin bidîtin.

Emraza pirbûna Elmanî -ing- di dawî nav de nîşana malê, yanjî eşîrê dide biderxistin, ya ku ew ji bona nava pir navên Firensî hatîye bikevtin. Herwehajî Emraza biçûkbûnê - itt, ik, in yanjî ie- di dawîya nav de bi "et" Firensî ve hatîye bikirin. -T dawî niha bi Firensî ve nayête bipeyvînîkirin-. Herwehajî navên Sikendinavî jî ji bona nava navên Firensî li paş hêrîşên Normandîyan de di sedsalên neh û dehan de hatine bikevtin.

Di ezmonkirina tomarkirinên bêşan de li paris de der sedsalê duwazdemînî zayînê de ji me re remaneke diyar li ser pêkhatina tudeyên wê dide derxistin; bê ka kî ji wan Barkirvan bû û bê ka kî jî ji wan ji melbendan bû û yanjî Bêgane bû: jiber ku Serpereştîyê koka wan dida biderxistin. Di nava tudeyên Paris de hin ji Ingilîzan jî dihatin bidîtin.[1]

---

[1]Evanan hinekin ji kanîyan têtin bidîtin, ji yên ku p. Lebel li ser "Onomastique - Namenkunde" ewropî dane bidan:

- Sê kovarên pêlî têtin bidîtin:

1. Kovara "Onoma" li bajarê Leuren = Louvain de li Belçîkya ji sala 1950 de têtE biderkevtin.
2. Kovara "Revue internationale d'Onomastique" li bajarê parisê ji sala 1949 de têtE biderkevtin.
3. Kovara "Beiträge zur Namenforschung" li bajarê Heidelberg -Haydilbêrg de li Elmanya de ji sala 1949 de têtE biderkevtin.

Herwehajî hin ji nivîstan jî têtin bidîtin:

- A. Lignon: "Les noms de lieux en France", Paris 120-29. -Çendcaran ew hatîye biçapkirin..
- A. Vincent: "Toponymie de la France", Bruxelles 1937.
- A. Bach: "Deutsche Namenkunde" 1952-54. -Çendcaran ew hatîye biçapkirin.

Derbarê Rojhilat û devera Kurdistanê de bi rengekî taybetî ve li nik me de komên pir ji navên giyografî -navên bajaran, çiyan, çeman û deveran- û navnasan têtin bidîtin, ji yên ku ew di tomarkirinên nivîsandî de têtin bidîtin û yên ku bajartîyên Babilistanî, Aşurî, Xildî -Wan- li paş jî de Iranî tanî musulmantîyê li dûxwe de dane bihiştin. Ew heyamên dirêjtir bi dehan sedsalan ve didin biderxistin, ji yên ku ew li Ewropa de têtin bidîtin.

Herwehajî serçavîyên Yunanî û Romanî jî kanîya kevnarîyî "Onomastique"î Ewropî dewlemend bi agehdarîyên xwe ve beramber bi navên rojhilatî ve ji Herodot -Hêrodot didin bipêkanîn. Ev bi xiznan ve têtin bidîtin, yê ku ew tanî niha bes û bi tenha ve bi rengekî biçûk ve hatine bikaranîn. Evjî bi saya hinekan ve ji Zanistvanên rojavayî hatîye bikirin. Ji van jî ji yên Elmanî: Weisbach, Hartmann, Nöldke û Lehman - Haupt, ji yên Rusî: di pêşîya hemûyan de V. Minorsky, ji yên Firensî: Leiment Huart, R. Ghirshman, L. Dillemann têtin bidîtin. L. Dillemann ew ji nuhtirînên wan têe bidîtin û wî lêgerandinên xwe li ser "Mêzopotamya" de der sala 1962 datin bibelavkirin. Ev bi xizneyekê ve li ser "Onomastique" devera -Kurdistana Jorî, Rojavayî û Navînî- de li ser kanîyên Yunanî û Romanîyî kevnar de û herwehajî li ser rûnkirinên wîyî taybetî jî de, -dê ez li paş de careke din di rûnkirinên xwe de lê bêtim bivegerandin-, têe biderkevtin. Herwehajî divê em R. Frye yê Emerikî di nivîsta wî de li ser "Lidûhiştinên Faris" de -der sala 1962 de- nedin bijibîrakirin.

Herwehajî li nik me de komeke dinî zingîn têe bidîtin, ji yên ku ew li bal ciyografî û Mêjûvanên pêla Islamîyî Kilasîkî de hatine bidan. -Min pişta xw bi hatinên wan belgeyan ve di lêkolandina xwe de li ser ciyografîya Kurdistanê de date bigirêdan, ya ku min ew ji bona Kongirê Rojhilatnasên Navdewletîyî Bîstûnehî li Paris de der sala 1973 de date bipêşkeşkirin-.

Le Strange Ingilîzî bi xwendekarîya vî karî ve derbarê hemû deverên Ebasî de der sala 1909 de bi rengekî giştî ve date bidestpêkirin

Hêjî hin ji navên ciyografîyên kevnar tanî nihajî li Kurdistanê

- A. Förstemann: "Deutsches Namenbuch", 1900. Ismet Şerîf Wanlî

de hatine bihiştin, ji yên ku ew ji hezaran salan de têtin bikaranîn. Lêbelê peyivandina wan hatîye biveguhertin; ji vê re hîç neçarî nebû. Ev jî tevî ku zimanê Kurdîyî Hindîyî - Ewropî cihê zimanên "Kafkasîyî" kevnar ji xwe re dayite bigirtin, yên ku ew ku li nik wan Miletên pêşîn de dihatin bikaranîn. Ji van navan jî -bes û bi tenha ve ji bona nimûne-: Navên Ilam, Erbîl, Saqiz- Sakiz -ji Gelê Sakka-, Nehrî -ji Naüri-, Çiyayê Cudi -ji Guti-, Wan -ji Biaini- Arciş -Arjish- -ji navê danînvanê bajêr Arjishti Padîşahê Wanê di pêla Orarto de-, Melazkirt -koka wî Menazkirt ji navê danînvanê wê Menua Padîşahê Wanê-, Ararat -ji Urartu- û Ruha -koka wê Urha. Ev navaya ji bona Miltê Horîyî kevnar dide binişandan- têtin bidîtin. Herwehajî "Helwan" ya ku ew di pêla Ebasî de avedan bû û ew li nêzîka Sarî Pol -rojavayî Kermanşah- de dihate bikevtin, ew niha bi kavilkirî ve tête bidîtin. -Navê wê ji navê Haluanê Lollobiyî kevnar tête biderkevtin-. Herwejajî ligeljî de navê "Kurd" bi xwe jî ve tête bidîtin, ku niha kêsa me nayête bidîtin, ku em li ser wî de bêtin birawestandin.

Mêldarîyeke seruştî li nik hinekan de ji Nivîskarên Kurd di dema azmonkirina wan de ji bona navên mêjûyî tête bidîtin, ku ew ji bona bi cînanîna dîtinên xwe ve derbarê mêjûwa Kurdistanê didin bihewildan. Ev hewildanên qencin; lêbelê pirbûna wan hîç li ser rêyeke zanistî de nayête bipiştkirin. Ev rûnkirina hanê jî werjî ew beramberî nivîsandinên hinanan ji Ewropîyan jî -ji van jî hin ji Evserên Ingilîzî, yên ku karnasîyeke wanî têr nedihate bidîtin- rast tête biderkevtin. Herwehajî piranîya Zanistvannê rojavayî û Sovyêtîyî karnas guh bi mêjûwa Kurdistanê ve nedane bidan; wan bes û bi tenha xwe ve bi rengekî perî ve heger bi carekê ve, -mîna ku Biris Piotrovsky yê Sovyêtî di mêjûwa xwe de li Padîşahîya Orarto de daye bikirin.- Dibe, ku wî ev ji bona dilxweşkirina Akadimîya Zanistîya Ermenî li Yerîvanê de dabe bikirin-, di serguhên xwe re dane biavêtin.

Bi her awayekî be, zanistîya "Onomastique" bes û bi tenha xwe ve nala "zanistîyeke alîkar" ji bona mêjûwê tête bidîtin. Mukurhatina peyvan bes û bi tenha ve yek ji rêyan ji bona pêrabûna nasîna mêjê tête bidîtin. Dibe, ku ew bi tenha xwe ve ji bona ronahîkirina mêjê nede bitêrkirin, heger ku ligel wê de agehdarîyên din neyêtin bitengalîkirin, yên ku ew bi rêyên din ve ji mîna lêkolandina şopênkevnar yanjî nivîsandinên Kevnaran têtin

biwergirtin.

Derbarê "Introponimîya" Kurd -û Farisî- -ango navên Neferande di ser wan de erebkirinek hatîye bikirin, Merov dikare bêje, ku ew bi yekcarî ve di piştî musulmantîyê de tête bidîtin-[1].Lêbelê navên Erebî, yên ku Kurd Zarowên xwe bi wan ve dane binavkirin, ew ji bona rêzanên peyivandina kurdî û bi taybetî ve li nik Qatên jêrîyî Gelêrî de -Mohamed -Miho yanjî Mustefa Misto- hatin bitewandin. Li paş pêkanîna Turkîya Kemalî de turkkirina qelp -ango bi darê ço ve- li ser navnasîyên musulmantîyê û "Otoponimîya" Kurdistanê ango navên wêyî ciyografî hate bikirin. Evaya bi xwe jî ve bi zîyaneke mezin ve ji bona mayîna mêjûyîyî Kurd tête biderkevtin.

- Zanistîya "Généalogie" Malbatî ew bi xwe jî ve ji zanistîyên "Alîkarî" ji bona mêjûwê tête bidîtin. Li ser wê de derîyek di nivîsta bi xama J. M. de Tupigny de hatîye binivîsandin. Ew bi zanistîyeke kevnar ve û bi taybetî ve ew li nik Miletên Samî de nala Ibrîyan û Ereban dihate bidîtin. Di nava wan de "Malbatînas" dihatin bidîtin, yên ku wan nasîna Merov bêyî belgeyên nivîsandî bi piştdana ser bîrwerîya xwe ve didan bikirin. Di nava nivîstên perest de mîna Tewratê û Incîlê pir nimûneyên wetov têtin bidîtin.

Di sedsalên navînî û pêla Padîşahî de li Frensa de zanistîya Malbatî bi destikekî ve hate bikirin, da ku "Zadebûna Kokê" ji bona her kesekî bête bicîanîn, ji yên ku wan dilên xwe ji bona karmendîyeke bajartîyî hêja yanjî di zanistgeha supahî de didan

[1]Li ser Zanevan û Zanîstvanên Kurdistanê de tête bipêwistkirin, ku ew bi şêweyekî zanîstîyî bilind ve ji hemû layekî de bi çavekî rexnegîrîyî dema vejandinê ve li seranserî kêra musulmantîyê de di nava civaka kurdistanê de bi derbasbûna demê ve bidin bixwendekarîkirin û ji vê xwendekarîya zanistî encaman ji bona vî nifşê niha û yên tên bidin biberdestkirin, da ku ew bi azadîya xwe ve û li gora bext, zanebûn û dilsozîya xwe de karê ji xwe re û ji bona serxwebûna Kurdistanê û bextiyarîya civaka xwe jê bidin biwergirtin. Li vêderê de divê bes û bi tenha ve zanebûn, zanîstî, hiş û dilsozî li ser felsefa mêjûwê de bête bikaranîn, da ku em bikaribin xwe bi kêmtirîn gorî û kurtirîn dem ve ji vê malwêranîya gemara buhuşta evsana Ereb bidin birizgarîkirin. Ev jî bes û bi tenhan ve bi lêbuhurandinê, bînfrehbûnê û şiyarbûneke dirêj ve tête bidîtin. Cuma

bijandin.

Li paş şûreşa 1789 de zanistîya Malbatî di Firensa de di serguhan re hate biavêtin û bi cihê qerfê ve ji bona Remangîran û Demokratan hate bikirin. Li paş de der sedsalê bîstan de bi "Mode" ve di piranîya welatên Ewropa de hate bikirin. Evjî bes û bi tenha ve ji bona nasîn hate bikirin. -Li Emerîka de ev ji bona Hevalbendên Kenişta Morons hate bikirin, da ku ew rehên malbatên xwe li Ewropa de bidin binasîn-.

Herwehajî dam û destgehên taybetî têtin bidîtin, ku her Merovek ji wan beramber bi hinek pere ve dikare bide bixwestin, ku ew li "Bavpîrên wî" de bidin bigerandin. Dibe, ku ev lêgerandina hanê bi salan ve jêhatbûnê bidin bipêwistîkirin; jiber ku zanistîya Malbatî di Ewropa de bes û bi tenha ve li ser belgeyên nivîsandîyî hilanînî de li nik dam û destgehan de -li dam û destgehên navnasînê de, li tomarên supahî de, li arşîvên şehredarîyê, melbendan, nivîsxanên giştî, xanîyên keniştan de, li tomarên zanistgehên bilinde, zanistgehan û dam û destgehên cudan de têtin bidîtin.

Rêzana bingehî di lêgerandina malbatîyê de "destpêkirin ji nasînê ji bona nenasîyê tête bidîtin", evjî hêdî hêdî ji jor ber bi jêr ve ji nifşekî ji bona nifşê din û li ser du xêzan de ji malbata Bavan -Nêr- û ji malbata Dêyan -Mê- tête bikirin. Ji rêzana "lêgerandina jor" tête bidîtin, ku ji bona her Neferekî Bav û Dêyek, çar Bavpîr, heşt Bav ji bona Bavpîran, şanzdeh Bavpîr Bavpîr têtin bidîtin. Wisa li dûhevdû de jimara Bavpîran bi rengekî Endazî ve tête biberzkirin. Herwehajî divê daneyek ji zayînnamê û ji nameya şûnkirina Bav û Dêyan derbarê her nifşekî de bête bidestxistin. Heger ev belgeyên hanê nehatin bidestxistin, divê ku ev lêgerandin bête birawestandin. Li gora belgeyên heyî de di dam û destgehên Firensî de bi berjorçûna berî Padîşah Liwis de ango Liwisê Dehem di sedsalê sêzdehan de, -yê ku Padîşahê dawîyî Eyubî der dola nîlê de şerê wî date bikirin-, nikarin bêtin bidestkevtin. Dibe, ku berjorçûna bêtir ji sedsalê çûyî jî de di bin hin resan de bi hoyên nebûna hebûna belgeyên nivîsandî yanjî windabûna wan di rêya şewatekê, şureşekê yanjî cengekî de nikaribe bête bikirin.

Jiber ku jimara Bavpîrên her Merovekî bi rengekî endazî -ducarî- ve di her nifşekî de tête bibêtirkirin. Her sedsalek nêzîka sê

nifşan di nava xwe de dide biwergirtin. Wer bi vî rengê hanê ve jimara Bavpîrên her Neferekî nêzîka yek milyon Bavpîr di sedsalê sêzdeha ango berî 21 nifşî de tête bikirin. Ew di nifşê jimara çilî de bi milyaran ve têtin bijimartin. Ev bawerîya hanê bi serê xwe ve bi nigaşekî hejmarî ve tête bidîtin; jiber Neferên, yên ku ew ji Bavpîrekî bi tenha xwe ve têtin bidakevtin, bi milyonan ve têtin bijimartin; jiber tevlihevbûna Bav û kalan di navbera herdu xêzên nêr û mê de têtin bidîtin.

Ji encamên zanistîya malbatê di herdu sedsalên dawî de bi diyarî ve tête biderkevtin, ku tiştek nayête bidîtin, yê ku Merov jêre "bi xwîna arostokratî-xanedanî- ve" dikare bide bigotin, mîna ku Zadevanan pê didan bibawerîkirin-. Wer hate bidîtin, ku piranîya Zadevanan ji kokeke Borcuwazî yanjî Cotkarî dihatin biderkevtin. Yanjî wan dikarîbûn di navbera Bavpîrên xwe de Bavpîran ji çînîyên civakîyî cudan ji Padîşahan tanî Cotkaran tanî derbasbûnê di nava Zadevanan û Burcuwazîyan jî bidin bidîtin. Werjî bi rastî ve derbarê Cotkaran û Burcuwazîyan jî tête biderkevtin, ku bi milyona ve ji wan jî dibe, ku Bavpîrên wan jî di nava Zadevanan û herwehajî Padîşahan de bêtin biderkevtin. Wisa Zarowên her Merovekî çi Dewlemend, çi Perîşan, çi Cotkar yanjî Mîrzade her û her cihên wanî civakî bi derbasbûna heyaman ve li gora rewşên Nevîyan yanjî bextên wan dihatin biveguhertin[1].

- Ji zanistîyên, ku li paş Şureşa Firensî de -bi kêmanî ve di Firensa de- hêjabûna wan berbixwar ve hate bidakevtin, zanistîya "Héraldique" bû; Ango bi xwendekarîya durujmên malbatên xanedanî ve têtê biderkevtin, yên ku wan di nava supahê Padîşahîyê de karmendî didan bikirin. Weha ji bona her malbatekê durujmekî wêyî taybetî dondeyî pê bi rengê "Blason" -depekî- çarîng yanjî çarîngdirêjî ve dihate

[1]Wer kanîyên cudan li ser Malbatên "Arostokratîyî Firensî" de têtin bidîtin. Ji van jî deh ber têtin bidîtin, ji yên ku Keşe Anselme li ser Malbata Padîşahîyê de dayite bitirxankirin. Ew li Parisê de der salên 1726 tanî 1733 de hatine biçapkirin. Herwehajî deh bergên din bi xama p. J. Hozier ve li ser Malbatên Xanedan de hatine binivîsandin. Ew li Parisê de der salên 1738 tanî 1768 de hatine biçapkirin. Herwehajî hêjî kovarên pêlî jî di vî warî de têtin biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

bidîtin û li ser wî de nigarekî endazî bi rengê xaç, sitêr yanjî gulek, yanjî balindfirekî -mîna baz- û nivîsandinan dihate bidîtin. Herwehajî ew li gora rengê çekên xwe de ji suwaritîyê, peyedarîyê, topçîyê û deryayê dihate bicudakirin. Lêbelê bikaranîna durujman ew nebes tenê bi xanedanên Derbegî ve dihatin bivegirêdan, lêbelêjî malbatên Borcuwazî jî dikarîbûn ew ji xwe re bidana bikaranîn, bi mercekî ve ku ew ligel durujmên Xanedanan de bihata bicudankirin û ew durujmên çekan -nala şûr- li ser wan de nedin bikaranîn. Ji bil malbatan jî ji bona şehredarîyan jî durujmên wanî taybetî dihatin bidîtin -û h[illegible]î ew têtin bidîtin. Ji bona her durujmekî razîbûna serdarîyê pê dihate bipêwistkirin. Hin caran jî desthilatîyê li ser malbatan û şehredarîyan de durujim didan bineçarîkirin û wê ew bi peran ve nala hatinekê ji bona xizînê didan bifirotin.

"Héraldique" ji zanistîyên alîkarî ji bona mêjûwê tête bidîtin. Di vê nivîsta ku em derbarê wê de têtin bidîtin, derîyek derbarê Héraldique bi xama J. M. de Topigny ve tête bidîtin[1].

- Ji sedsalê nozdehan de ligel belgeyên nivîsandî yanjî rengînî û yanjî tîştin din de, yên ku ew ji bal lêkolandinên şopênkevnar têtin biderkevtin, teknîka taze kanîyên nuh ji bona mêjûwê dane bianîn. Ji van jî: Wênegirtin û li paş jî de filimên sinemayî jî dane bianîn. Di serdema meyî niha de Mikrofilm şureşek di tomarkirina mêjûwê de date bikirin, yê ku ew rê bi biçûkbûna nivîst û belgeyan yanjî wênegirtîyêbûnê û tomarkirina wan ve li ser filman de û hilanîna wan di nava nivîstxanan û xanîyên arşîfan de bi jimarên pir ve dide bidan, bêyî ku cihekî mezin di nava wan de ji xwe re bidin bigirtin. Di vî warê hanê de di nava nivîsta, ya ku em derbarê wê de têtin bidîtin, derî têde li ser vê danavê de bi xamên G, Sadoul, M. François ve hatine binivîsandin. Ez li ser wan nayêtim birawestandin.

- Ligel wêne û mikrofilm jî de, yên ku Merov bi çavan ve dikare wan bide bidîtin, teknîka taze karîna tomarkirina mêjûwê bi deng ve li qawinan de û li paş jî de li ser kasêtan de date bikirin, yên ku ew bi

[1]Ez bi bîrxistina kovara mehîyî ve "Revue française d'Héraldique de Sigilloraphie" didim bitêrkirin, ya ku ew li Paris de ji sala 1938 de têtê biderkevtin. Ismet Şerîf Wanlî

fênografî yanjî radyo ve têtin bihîstin, yanjî yên ku ew di rêya telivizyonê de têtin bidîtin û bihîstin. Evaya bi rêyekê ve têtin bidîtin, ya ku ew nigaşekî bi vegerandina jîna tiştên mirî ve dide bidan. -Nivîsandin bes û bi tenha ve jînê bi remanê û xewnê ve dide bivegerandin-. Ez li ser vê rêya hanê de nayêtim birawestandin, ya ku li ser wê de derîyek di nivîstê de têtê bidîtin. Ji metirsîyên benda tomarkirî têtin bidîtin, ku hinek ji perçên wê dikarin bêtin birandin û di payînî de peyvdarî dikare bête bisextekarîkirin.

- Di nivîstê de derîyek bi xama Marcel Cohen -Kohên- ve li ser zanistîya Linguistique -zimanên beramberkirî- de têtê bidîtin. Divê ku em di navbera wî û zanistîya Philologie de bidin bicudakirin; jiber ku ev zanistîya Phlilologie bi zanistîya xwendekarîya zimanan û rêzanên wan ve her yek bi serê xwe ve têtê bidîtin, mîna ku ev ji bona xwendekarîya zimanê Çînî û rêzana wêna yanjî ji bona zimanê Erebî û rêzana wêna têtê bidîtin. Zanistîya Linguistique ew bi zanistîyeke beramberkirina zimanan ve bi hev re û xwendekarîya mirovatîya di nava hinekan ji wan de bi gotinan yanjî rêzan ve têtê bidîtin û ew qanûnan dide biderxistin, yên ku wan cudabûnên peyvdarî yanjî rengînî yanjî rêzimanî di nava zimanan de dane bikirin, yên ku ew ji yek kokeke kevnar têtin dakevtin. Herwehajî ew xwendekarîya pêşvekevtina van cudabûnên peyvdarî, rengînî û yanjî rêzimanî dide bikirin, yên ku ew bi derbasbûna zeman ve di zimanan de hatine bikirin, yên ku ew ji bona yek qurmî têtin bivegerandin.

Bi servajî van tevanjî ve li ser endazê mêjûwê jî ve dide bikirin, ango ew liberkevtina van rûnkirinên zimanî di çûna mêjûwê de bi xwe ve û di rûdanê mêjê de dide bikirin. Bi bêjeke din ve zanistîya Linguistique ew bi neynika mêjûwê ve têtê bidîtin û ew dikare rohnahîyê ji bona ser hin rûdanên mêjîyî bingehî di hêrîşan de û barkirinan de bide biavêtin. Hêjîbêtir ew bi neynika bajartîyên windabûyî û civakên merovanîyî kevnar û rêyên jîyanan wan û şeweyên ramankirina wan ve têtê biderkevtin. Girbûna vê zanistîyê hanê pir bi mezin ve têtê bidîtin; jiber ku kanîyên mêjûyîyî bingehê di nivîsandinên nivîsandî de têtin bidîtin. Bi vê têgihiştina hanê ve Linguistique bi giringtirîn zanistîya alîkar ve ji bona mêjûwê têtê bidîtin. Ji bona rûnkirina vêna divê Merov bêtir hinek ji nimûneyan

bide bidan.

zanistîya Linguistique -zimanên beramberkî- ew bi xwe ve tanî radeyekî bi zanistîyeke taze ve tête biderkevtin. Yê ku pêşî têde der sala 1815 de dayite binivîasndin, ew Rasmus Roskê Denîmarkî bû. Li paş wî de Franz Boppê Elmanî hate bidîtin, yê ku wî Sanskrit - Sansikrîtî- bi ser zimanên Ewropî ve nala daneveke beramberkirî date bivekirin. Ji bona wan herduwan danîna bingehê "zanistîya rêzimanên Hindo-Ewropîyî beramberkî" tête bivegerandin. Herwehajî ji bona wan jî rûnkirina hebûna "malbatan" û parvekirinan di nava van komên nêzîkirî de ji zimanan tête bivegerandin. Ji van jî malbata Latînî - Romanî-, Germanî, Silavî û Hindo-Iranî tête bidîtin. Di nêzîka sala 1850 de hin ji Karnasên Elman û di payîn de A. Meillet -Maylêtê- Firensî qanûnên "zanistîya Linguistique historique" -zanistîya zimanên beramberkirîyî mêjûyî- dane biderxistin. Ev zanistîya hanê der rêya beramberkirina gotinan, rêzimanên nala hev, veguhertina gotinan û çawabûna peyivandina wan de di derbasbûna zeman de dide bicîkirin, ku zimanên Hindo-Ewropîyî cuda tevî cudabûna wanî diyarî niha jî hemû bi carekê ve ji yek zimanê kokî ve yanjî destpêkî ve têtin biderkevtin. Ew zimanê kokî yanjî destpêkî "bi danînî ve tête bidîtin"; bi liberkevtina ku wî tu şopên nivîsandî jiber kevnarîya xwe li dû xwe de nedaye bihiştin. Ji van qanûnên derxistî divê du ji wan bêtin bibîrxistin:

1. Qanûna yekem ku pêşvekevtinên ango veguhertinên "Phonétique" -peyvdarî-, yên ku ew bi derbasbûna zeman ve li ser gotinan û rêzimanên zimanîyî mîna hev de di nava van zimanan de yanjî di navbera zaravayên cudan de di nava yek zimanî jî de hatine bidîtin, ji bi xwe ve nehatine bikirin; lêbelê ew.ji bona rêzanên rawestayayî têtin bizalkirin, yên ku ew ligel her gotinekê de têtin bidubarekirin.. Evaya rê pê dide bidan, ku rêzan bi çavdêrîkirina dubarekirina nimûnan ve bête biderxistin.

2. Qanûna duwem ku ev veguhertinên peyvdarî ji bona rêzaneke giştî têtin bizalkirin: "Destpêk ji dujwarîya peyvê ber bi hesanbûna wêna ve" tête bidîtin; bi liberkevtina ku bi berê giştî ve bi sivikkirina dujwarbûna peyvdaryê ve bi derbasbûna

zeman ve bi veguhertina hin tîpan ve yanjî bi xistina wan ve tête bidîtin, ku bi sivikbûna peyva wan gotinan li ziman de tête biderkevtin.

Marcel Cohen -Kohên hin ji nimûneyan dide bidan, -dê ezê Alfa Baya latînîyî Kurd di navbera du kevanan de ji bona nasîna peyva nimûneyan bidim bikaranîn, ji yên ku wî dane bidan; heger ku evaya bête bipêwistîkirin-, ji van nimûneyan jî gotina "Cinq" -Senk ango pênc bi Firensî ve- tête bidîtin, ya ku qurmê wêyî kevnarîyî hevbeşîyî danînî ji "Penkwe" tête biderkevtin. Ew ji bona Sansikritî ji bona "Panca" hate biveguhertin -û bi Pênc ve bi Kurdî û Rusî ve hate biveguhertin-. Ew bi zimanê Ermenî ve bi °Hing" ve, bi Yunaî ve bi "pente" ve, "Qinque" -Kink- bi Latînî ve, "Finf" bi Germanîya Gotî ve, bi "Penki" ve bi Letwanî ve û bi "Coic" -Koyk- ve bi Irlendîya kevnar ve tête bidîtin. Herwehajî ji nimûneyên dayînî jî gotina "Sept" -ango heft bi zimanê Firensî ve -tîpa P tête binivîsandin; lêbelê ew nayête bipeyivandin, ew bi Set ve tête bipeyivandin-. qurmê wêyî kevnarîyî hevbeşîyî danînî ji "Septem" hatîye biderkevtin. Ew ji bona "sapra" bi zimanê Védique -Vêdik- ve -bi zimanê Sensikrîtîyî kevnar ve-, "Ewthu" bi zimaê Ermenî ve, "Hepta" bi zimanê Yunanî ve hate biderkevtin. Ew bi zimanê Latînî ve "Septem hate bihiştin. Ew bi zimanê Letwanî ve bi "Septym" ve hate bikirin. Ew bi "Secht" ve bi Irlandîya kevnar ve û bi "Heft" ve bi zimanê Farisî û Kurdî ve hate bikirin.

Ez naxwazim xwe ji bona nava dirêjbûnên teknîkî bidin bixistin, yên ku Cohen -Kohên ew ji bona liberxistina van veguhertinên peyvdarîyî di navbera tîpên -P-, -k-, -W-, -H- û -F- de di nava zimanên Hindo-Ewropî de dane bianîn. -Ew li gora cihê tîpê di destpêka gotinê de yanjî di gotinê nîvê gotinê de û li gora hebûna tîpa Voyelle -dengdar- berî wê yanjî na têtin bicudakirin-. Xwezî ez dê bikaribim ji bona vê danavê derbarê zimanê Kurdî û zimanê Hindo-Îranîyî din de di beşê sêyem de ji vê lêgerandinê bêtim bivegerandin û hin rûnkirinan li ser mêjûwa Kurdistan de bi palpêdana ser bingehên zimanî ve li ser ronahîya hin lêgerandinan de bidim biderxistin[1].

[1]Ev hinek ji kanîyan têtin bidîtin, ji yên ku Cohen -Kohên- dane bidan:
- A. Meillet + M. Cohen: "Les langgues du monde", Paris 1952, -Ango" "zimanên

- Ez dê li ser derîyên di vê nivîsta hanê de, ya ku ew di nava destên me de tête bidîtin, neyêtim birawestandin, ji yên ku ew li ser "Aburîya Civakan" û "Histoire des mentalités" -Mêjûwa Rewanîyan-, mîna bi "Zanistîya Rewanîyî Tevayî" ve didin bipeyivandin. Herwehajî ez li ser wan derîyan jî de nayêtim birawestandin, yên ku ew ji bona parvekirin û parastina belgeyên nivîsandin û bihistinê, dozandinên zanistîya şopênkevnar di nava nivîsxanên giştî, xanîyên kevnarîyan, xanîyên arşîvan, Cimanthéques -Simatêk-, Discothéques -Diskotêk- û Photothéques -Fototêk, -yên ku ew cihên di nava wan de ev belgeyên hanê têtin bihilanîn û çawabûna rêxistina wan têde têtin bidîtin-, têtin bitirxankirin. Herwehajî têde derîyek li ser Bibliographie -Bibliyografî-, mêjûwa wê, rengên wê, pêwistîya wê de, -bi taybetî ve li ser zanistîya mêjûwê de- û çawabûna lidarxistina wê de têtin bidîtin. Ji kevintirîn ji wan di mêjûwê de "catologue" -lîsta- nivistên nivîstxana Iskenderîyê tête bidîtin, ya ku ew ji bona rojgarîya Yunanî di Misrê de tête bivegerandin, -ji ya ku ew ligel navrokên bi nav û bangên nivîsxanê de der vekirina musulmantîyî Erebî de ji bona vê devera hanê hatin bişewitandin-.

Herwehajî ez li ser wî derîyî de nayêtim birawestandin, ji yê ku ew ji bal A. Leroi - Gourhan de di bin navnîşana "Archéologie Préhistorique" -ango "zanistîya şopênkevnarîyî berî mêjûwê" de hatîya binivîsandin. Ev derîyekî nala derîyên din xweş tête bidîtin. Zanistîya "berîmêjûwê" bi zanistîyeke taze ve tête bidîtin, yê ku ew der dawîya sedsalê nozdehan de hatîya biderkevtin. Berê wî li ser sînorê parvekirinê de di navbera zanistîyên serûştîyê de -mîna Giyologya, Botanique -Şînatî û Zoologie -zanistîya cenawerî- û zanistîyên mirovanî de tête bikevtin. Bi gotineke din ve ew bi "Giftûgo" ve di navbera mêjûwê û van zanistîyan de tête bidîtin û ew bi alîkarîyekê ve di navbera Karnasan û zanistîya kolandinên şopênkevnar de dide bipêwistîkirin. Wer zanistîya "berîmêjûwê"

---

cîhanê" bi zimanê Firensî ve.

- Jean Perrot: "La Linguistique", Paris 1957. Ismet şerîf Wanlî

destpêkirina şehristanîkirina Merov û destpêkirina çandinyê û xwedîkirina cenaweran bi nêzîka deh hezar salan ve berî zayînê de date bidûrkirin.

devera kurdistanê ev rûdanên hanê ji xwe re datin bidîtin. Lêbelê Leroi - Gourhan -Gorhan- li ser dozandinên zanistîya berîmêjûwê de li Kurdistanê de nade biaxivtin.

Xwezî ez li ser wan de di beşê sêyem de ji vê lêgerandina hanê bikaribim bêtim bivegerandin. Leroi - Gourhan -Gorhan li ser vê zanistîyê de bi rengekî giştî ve û li ser şêweyên wêyî teknîkî de dide biaxivtin.

Ez bi hatinên jorî ve li ser raxistina nivîsta "Mêjû û Şêweyê wê" de têtim bitêrkirin, daku dirêjbûn di çûnê de neyête bikirin.

11. Li ser rêyên zanistîyî taze de ji bona nîşankirina temenê tiştan û lidûgerandina mêjûyî

Hegerjî zanistîya mêjûwê bi kevnarî ve têtê bidîtin, lêbelêjî nasîna Merov ji bona mêja xwe bi nîşankirineke têrkirîyî demî ve ji bona rûdanên wê û pêşvekevtinên wê bi dirêjbûna heyaman ve bes û bi tenha ve ji bona sedsalê heftemînî berî zayînê dihate bivegerandin; mîna ku ji me re Nivîskarên Yunanîyên kevnar dabûn bihiştin.

Ji nêzîka dusedsalan de sînorekî diyar di navbera "Heyamên Mêjûyî" û tarîyên "berîmêjûwê" de date bidestpêkirin, yê ku ew wirde wirde ber bi mêjê ve tanî destpêka hezar salê sêyemî ber zayînê dihate bilindkirin; evjî bi saya anînên kolandinên şopênkevnar ve ji dozandinên nivîsandî di welatên Rojhilat de mîna di Somer û dola Nîlê de hatin bikirin.

Tevlivêjî de tevlihevbûnê ji bona ser zanebûna me ji bona Kuronologiya -lidûhevbûna- mêjê de dida bipoşandin, çi gava ku em ji heyamên -mêjûyî- ji bona heyamên "Protohistoire" -destpêkamêjûwê- û heyamên "Préhistoire" -berîmêjûwê- ji bona demê dihatin biberjorkirin.

Li paş de zanistîyên cuda hatin bidîtin û wan ji xwe re "Kuronologiyeke Endazî" bi rengekî ji hevdû azad ve datin bipeydakirin. Bi vî karê hanê ve zanistîya "Paléontologie" -Palêyontologi- pê hate birabûn. Ev zanistîya hanê xwendekarîya zindîyên libatîyî mirî ango şînahî û cenawerên kevirbûyî -fassiles- dide bikirin. Werjî zanistîya "Anthropologie" -Antropologi-, mîna ku ew diyare, ew xwendekarîya Merov û Bavpîrên wîyî pêşînîyî nala wî "hominidés" dide bikirin. Herwehajî zanistîya şopênkevnar -xwendekarîya "Rengan" û perestgehên kevnar dide bikirin. Bi vî rengê hanê ve Merov dikarîbû tiştên dozandî di rêya kolandinên şopênkevnar -şûnwarîyê- de bide beramberîhevkirin, da ku Merov bikaribe "Kuronologiya hîmî" li ser bingehê, yê ku jêre "Méthode Typologique" -Rêya Tipologi- de têtê bigotin, bide bipeydakirin.

Di nava van dehsalîyên dawî de pêşkevtineke mizin di nîşankirina temenê tiştên mirî yanjî sarkirî de bi saya pêş kevtina zanistîyî serûştîyî birandî ve hatîye bikirin. Bi vî rengê hanê ve kimya

û fizya veşartinên bûjen û pejikê dane bibirandin. Herwehajî Biyolocya hin ji veşartinên jînê datin bibirandin. Werjî zanistîya Astronomie -Stêrnasî- xwe di zanebûna hebûnê de date bikûrkirin. Hegerjî ku van dozandinên zanistî kêrek mezin li ser jîyana Merov -û ayindeya wî- de dane bikirin, wan bi xwe jî ve alîkarîya Merov ji bona nasîna mêja wî bi rengekî hûrtir ve date bikirin. Wer bi saya hin şêweyên zanîstî ve Merov dikarîbû nîşankirina temenê tiştan bi hûrbûneke endazî ve ji bona bûjenên textan, lajwerdan, keviran û hestîyan bide bikirin. Mîna ku K. F. Werner dide bigotin, "weha ev bûjenên hanê vane ji me re didin biaxivtin, yên ku ew bi kerî ve dihatin bidîtin". Jiber ku "her tiştekî bikaribe hebûna xwe bide bidemkirin, ew ji xwe re dikare cihekî di mêjûwê de bide bigirtin. Niha dikare bête bikirin, ku Merov lidû mêjûwa erdê di hebûnê de ji nêzîk ve, mêjûwa rengên jîndar di nava jînê de û mêjûwa Merov ji seretaya wê tanî heyamên mêjûyî bide bipêkevtin"[1].

Vanên tên kurtbûyeke biçûke ji giringtirîn van rêyên zanistî têtin bidîtin. Ev kurtbûna hanê di bingehê xwe de li ser hatinên -kurtî- de di nivîsta K. F. Werner de tête bihîmkirin. Di berî raxistina wê de divê ku ez li ser "Endazîtîya" hûrbûnê de di demkirina jînê de bidim bidubarekirin.

Li gora lêkolandinên zanistî de tête bibawerkirin, ku temenê hebûnê bi nêzîka 20 milyard sal ve têtê biderkevtin, temenê zemînê bi nêzîka 4,5 milyard sal ve têtê biderkevtin û temenê Merov -ji destpêka hovbûna wî de- bi nêzîka yek milyon sal ve bi tenha ve têtê biderkevtin. Temenê şehristanîya çandinîyê, -ya ku Merov di devera Kurdistanê û hêl û berên wê de dayite bidestpêkirin-, bêtir ji dehhezar sal pêve nayête biderkevtin, ango ew bi "bêhnekê" ve ji temenê Merov têtê biderkevtin û temenê Merov jî bes û bi tenha ve bi "bêhnekê" ve ji temenê zemînê -yekek ji 4500- têtê biderkevtin. Wisa şaşbûnek di demkirinê de, ya ku ew bi hinek milyonan sal têtê biderkevtin, bi giringî ve beramberî heyamên giyologiyî zemînî ve nayête bidîtin.

[1]Ji xwe re li zincîra "Histoire de France" -mêjûwa Firensa-, de bergê yekem "Les Origines" -Kok-, bi xama Karl Ferdinand Werner, çapa Paris 1984, r. 50 û yên tên bidin bimeyzekirin. Ismet Şerîf Wanlî

Werjî bi vî rengî jî ve şaşbûnek di texmînê de bi sedsalekî yanjî çend sedsalan jî ve di mêjûwa şehrestanîya çandinyê de bi giringî ve nayête bidîtin. Wehajî hêjîbêtir ev şaşbûna hanê beramber bi heyamên berîmêjûyê û kevinartir jî ve bi giringî ve nayête bidîtin.

- Rêyek ji bona pîvandina "Thermo luminiscence = Thermonachleuchten" -ronahîya germbûnê- ji bona bûnjenên sarkirî -nala ber, qermîd û qafikan- tête bidîtin, bi mercekî ew di demeke berê de li nêzîka makeke agirî -mîna şewitandina xanîyekî- de didatin bidîtin. Herge ku ev tiştên hanê careke din ji bona nêzîka makeke agir hatin bidanîn, dê ew ronahîyekê bidin biderxistin, ya ku ew bi destikên taybetî ve dikarin bêtin bipîvandin. Pileya şewqdana ronahîyê di pêrabûnê de li ser çendbûna germitîyê de tête birawestandin, ya ku bûjenê ji xwe re di kokê de -ji bona nimûne di dema şewatê de- dabû bihilanîn û li ser dema ku herdu kirinan ji hevdû de dide bicudakirin. Ev rêya hanê encamên baş derbarê bûjena -céramique- -qafikan- nade bidan. Lêbelê encamên wê di kevirên "Silex" -qesp- û "Flint, Feuerstein" -heste- de, ji yên ku Merovên hovî ji wan destikên xweyî jêkirinê didan biçêkirin, bi başî ve tête bidîtin. Ew nîşankirinên demê tanî berî pêncî hezar sal didin biderxistin. Bi vî rengî ve kara wan ji bona zanistîya berîmêjûwê mezin tête bidîtin.

Di rastî de ji bona gihandina nîşankirina demkirinên têr hûrbûn divê bikaranîna pir rêyan di yek demê de li gora karînê de bêtin bikirin.

Bi cihanîna rêyên zanistîyî taze ve nebes tenê wan di pirbûna caran de encamên nevajî ji bona texmînkirina Karnasan û Mêjûvan, yên ku wan ew rêyên hanê nedidan binasîn, dane biderxistin; lêbelêjî hêjîbêtir wan rastîyên texmînên wan dane bidubarekirin û hûrbûna wan dane bibêtirkirin.

- Ji rêyên bi nav û bang ve, ya ku pir navê wê tête bikirin, rêya "Carbon-Karbonê- 14" -Rejûwa 14- yanjî Carbon radioactif tête bidîtin. Kurtbûna vê rêyê wer tête bidîtin, ku her Afirvanekî jîndar ji şînayê yanjî cenawer di nava laşê xwe de komeke nîşankirî ji "Radio" -şewqê- dide bihilanîn. Li paş mirina wî koma şewqa wî hêdî hêdî tête bikêmkirin û ew nîvê xurtbûna xwe li paş 5710 salan de dide

biwindakirin.

Bi pîvana pileyê şewqa mayîn di her leteki laş de, yê ku ew ji laşê Afirvanî jîndarî tête bidîtin, Merov dikare mêjûwa mirina wîna tanî berî 2000 sal bide binasîn. Dibûna şaşbûnê bi nêzîka sedsalî ve dikare bête biderkevtin. Belam dibûna şaşbûnê ji bona çend sedsalan dikare bête bilindkirin; heger ku mirin berî bêtir ji 3000 sal hatibe bidîtin. Wer tête biderkevtin, ku kara vê rêya hanê derbarê heyamên mêjûyî de bi kêm ve tête biderkevtin; belam ew derbarê heyamên berîmêjûyî de bi mezintir ve tête biderkevtin. Herwehajî dibûna şaşbûneke din dikare bête biderkevtin; jiber ku hin bûjen têtin bidîtin, ji yên ku şewqa wanî taybetî -nala Têrê, Qîrê- tête bidîtin.

- Pîvana pileyê şewqa bûjena Potassium jî ji bona nasîna mêjûwên endazî di nava pêla 8000 sal û 3,8 melyon sal de dikare bête bikirin. Weha tête biderkevtin, ku ev rêya hanê ji bona zanistîya şopênkevnar -şûnwarîyê- bi kar ve nayête biderkevtin: lebelê ew bes û bi tenha ve ji bona heyamên giyologi bi kar ve tête biderkevtin.

- Rêyek "Archéomagnétisme" ango pîvana magnetîsa tiştan tête bidîtin, yên ku ew di rêya kolandinên şopênkevar de têtin bidizandin, yên ku ew ji "brique, Ziegelstein" -qermîd- yanjî "Tuile, Dachziegel" -qermîdêbanî- û yanjî ji "Teracotta, Terre cuite" -bûjenên axîyên şewitandî hatine bidurustkirin. Ev bûjenên hanê, gava ku ew li ber germbûnê de di dema çêkirina xwe de têtin bidanîn, pilê berê Magnîtîsîyî dorhêla xwe dide bitomarkirin. Pilê berê magnîtîsî erdê ji demekê ji bona heyamekî tête biveguhertin. Merov dikare xêza veguhertina berê magnîtîsî di rêya perçeyekî qermîd yanjî qafikekên berê dozandî de ji pêlên cudan, ji yên ku em mêjûwa wan -nala perçên qermîd yanjî qafikan, ji yên ku ew ji bal kolandinên şopênkevnar de hatine biderxistin û li ser wan nivîsandinên kolandî têtin bidîtin, yên ku demên wan didin bicîkin- bide binigarkirin. Heger perçeyek ji qermîdê nenivîsandî hate bidozandin, Merov dikare mêjûwa çêkirina wîna bi hûrbûneke têrkirî ve bi pîvana magnîtîsîyî li ser tomarkirî ve bi beramberkirina wêna bi xêza pêşvekevtina berê manîtîsîyî erdê ve bide binasîn. Li vir jî de divê mero wirya be; jiber ku magnîtîsîya tiştên ji hev nêzîk bi heyamên beramberî hev ve têtin bikêrkirin.

- Merov dikare mêjûwa "os fossile" -hestîyên kevirkirî- di rêya lêvenerandina bûjena "Fluor" -Filor- de, yê ku ew di nava hestîyan tête bidîtin, bide bikirin; jiber ku hestîyên Afirîdeyê jîndar li paş mirina xwe de bûjena Filor ji erda dorhêla xwe bi derbasbûna zeman ve di rêya kevtina hêwîbûnê de ji xwe re dide mimijandin. Lêbelê ev rêya hanê bes û bi tenha ve ji bona nasîna dûrbûna endazîya demê di nava wan hestîyan de bi kêr ve tête bidîtin, ji yên ku ew li yek cihî de têtin bidozandin; jiber ku koma Filorî têrkirî di erdê de ji yek cihî ji cihekî din têtê biveguhertin

- Merov dikare suwarkirinên giyologîyî jêrin bide binasîn, yên ku jiber çavan têtin bipoşandin. Ev jî bi lêvenerandina qata erdîyî jorîn û bi nasîna suwarkirina wêyê fîzyayî û pêşvekevtina pileyê germbûna wêna ve tête bidîtin.

- Ezmonkirina bûjena "Pollen, Blutenstaub" -Tuzakulîlkan, -ango tuza kesk ya ku kulîlk wê didin bihilgirtin, da ku ew di rêya parvebûna wêna de di nava bayê de yanjî di rêya veguhestina wan de ji bal balindan yanjî moran de şînîyan pê bidin bigonkirin-, dikare temenê şînayên kevrîyî giyologî, yanjî ji yên ku hinek ji mayînên wan di kolandinên şopênkevnar de têtin bidozandin, bide binîşankirin. Ev rêya hanê jî nasîna mêjûwa nifşên cuda ji daran li ser erdê de dide biderxistin. Wer dara -Bauleau = birch = Birke" -Bîdar, darabî-derkevtina wêna ji 11000 sal bêtir nayête biderkevtin. Dara "chêne, Eiche" -Berû derkevtina wêna ji 8000 sal bêtir nayête biderkevtin.

Di serûştê de hin ji nifşên şînîyên wê di derbasbûna zeman de têtin biveguhertin û biwindakirin û herwehajî şînîyên din têtin biderkevtin. Werjî evaya derbarê cenaweran û moran jî de tête biderkevtin.

- Belam pirtirîn rêya zanistîyî hûr û ji tevan jî tazetirîn ew rêya "Dandrochronologie" -dandirokuronologi- tête biderkevtin, ya ku ew li ser ezmonkirina bazinên darê de tête bihîmkirin, yên ku ew di nava darê de têtin bipêkhatin û yên ku ew bi diyarî ve ji bona çav li paş jêkirina darê de bi rengekî asûyî ve têtin bidîtin. Em wê çaxê di wî

perçê darê de bazinên li dûhev de didin bidîtin, ji yên ku ji bona wan tevan yek navînî tête bidîtin. Bazinên ku ew di havînê de têtin bipêkhatin, ew bi nerm ve têtin biderkevtin û yên ku ew di zivistanê de hatine bipêkhatin, ew bêtir bi hişkî ve têtin biderkevtin. Bes û bi tenha ve jimarkirina hebûna bazinên li ser dara jêkirî de dide bitêrkirin, ku Merov rast û durust û bê şaşbûn û nejî salekê jî dikare nasîna temenê darê bide biderxistin. Kareke din jî ji bona vê rêya hanê tête bidîtin, ku ew jî di qalindbûna bazinan de têtê biderkevtin, yên ku ew li gora hêwîbûn yanjî zuhabûna salê de têtin bicudakirin. Wisa em di her perçeyekî jêkirî ji darê de rêstikên bazinên tenik ji bona salên zuhakirîyî lidûhevdû de didin bidîtin û yên dinî salên baran û bêrê didin bidîtin. Bi saya beramberkirina perçên darên jêkirî -yanjî textên zuhayî- cuda di devereke nîşankirî de Karnas dikarin mêjûwa ba û avê ji bona wê devera hanê di nava pêleke vegerandî tanî 6000 sal berî zayînê de bidin binasîn. Bi dubarekrina vê rêya hanê ve di deverên cudan de Merov dikare veguhertinên av û bayê di nava şepya erdê de di nava pêla heşthezar salên çûyî de û taybetîyên deverên wêyî cudayî av û bayê de bide binasîn. Ji encamên vê rêya hanêyî pirî bilindî giringî mêjûyî hate biderkevtin, ku di rêya textên zuhakirî de, yên ku ew di rêya kolandinên şopênkevnar de hatin biderkevtin û yên ku ew ji bona avanîyên perestgehan û kaxan dihatin bikaranîn, Merov dikarîbû mêjûwa jêkirina darê, ya ku ew textên zuhakirî jê hatibûn bigirtin, bi beramberkirina bazinên wê ve ligel xêza pêşvekevtina heremê de di deverê de bide binasîn. Bi reweşt ve bikaranîna textan di avanîyan de li paş jêkirina daran de bi demeke kurt ve têtê bidîtin. Ango ev rêya hanê jî dide bihiştin, ku Merov temenê avanîyê jî bide binaskirin, heger ku belgeyên din -belgeyên nivîsandî ji bona nimûne- li ser mêjûwa wê neyêtin bipeydakirin.

-Babilî û Aşûrîyên kevnar darên berûwan ji bona avanîya kax û perstgehên xwe didan bikaranîn. Wan ew darên hanê ji xwe re ji nava çiyayên Kurdistanê li nik hêrîşên xwe de ji bona wê didatin bianîn. Herwehajî wan ligel hêrîşên xwe jî de Peyayên dîl ji nava Kurdistanê didan bianîn û wan ew nala Bendan di avanî û di nava erdên xwe de didan bikaranîn. Herwehajî wan bi hêrîşên xwe ve ji bona nava Kurdistanê ji Jinên ciwan ji bona kêfpêkirinên xwe û yanjî ji bona firotina wan nala Navmalyan di nava bazaran de didan bianîn-.

- Rêyeke din tête bidîtin, ya ku ew bi biserkevtintirîn xwendekarîya mêjûwa av û bayê ji rêyên dinî berê ve tête bidîtin. Ev jî bi ezmonkirin û pîvandina şopênkevnar ve tête bidîtin, yên ku kevîyên berfê di renîya xweyî hêdî de li ser zinaran de bi derbasbûna heyaman ve didin bihiştin. Yanjî ev di rêya ezmonkirina çiyayên bestavî di cemser de û bi derxistina badayên bestavî ji nava kurbûna wan, -ya ku ew carcaran bi kûrbûna çend kilomitran ve tête bikirin-, bi alîkarîya destikên taybetî ve û bi ezmonkirina suwarkirina qatên bestavîyî li dûhev de, ya ku ji wan badaya derkirî tête bidîtin, bi kîmya û fîzya ve têtin bilêvenirandin.

- Herwehajî lêkolandinên şopênkevnar ji bona binê deryan jî hatin bidirêjkirin. Wer Merov dikare di rêya gemîyan de bide bikirin, ji yên ku ew berî çend sedsalan -carcaran jî berî zayînê-hatinê binavkirin. Ev jî di rêya ezmonkirina bujena wan, şêweyê çêkirina wan û tiştan de, yên ku Merovan di nava wan de ji kel û pel, xişran, çekan, perên lajwerdî û beroşan li dûxwe de dane bihiştin, dikare bête bikirin. Herwehajî pêrejî Merov dikare di rêya ezmonkirina qatên giyologî de ji bona qaşilê erdê di bin deryan de bide bikirin.

- Wênegirtina esmanî ji bona deverên fireh ji rûwê erdê rê bi dîtina şopênkevnar ve dide dan; ji yên ku bi çavan ve li ser ruwê erdê de nala şopênkevnarîyî rêyên Romanî di nava Ewropa re û li hêl û berên derya sîpî de, yanjî sînorên zevîyên pêla Romanî, yanjî berî wê di nava welatê Galê de û yanjî rengên endazîyî neqişkirî li ser perestgehên rojê de, yên ku ew ji bal tudeyên Emerika jêrîn û navînîyî pêşin ji Hinûdên Sor hatine hiştin, nikarin bidin wergirtin.

- Herwehajî Merov dikare şêweyên zanistîya Entropologiya taze û bijişka dadwerîya nuh li ser ezmonkirina gewdeyên hestîyên kevnar de bide bicîanîn. Wetov ev şêweyên hanê ji bona ezmonkirina gewdeyên hestîyên Merovekî "Néandertal-Niyandertal" hatin bikaranîn, yê ku mirina wî ji bona tanî 45 yanjî 50 hezar sal tête bivegerandin. Wer hate biderkevtin, ku ew Merovê hanê di dema mirina xwe de temenê wî bi nêzîka 42 salan ve dihate biderkevtin. Bi ezmonkirina çend

gewdeyan ve ji gewdeyên tudeyên wê heremê bi xwe jî ve nasîna rastenava temenê Merovî wan heyamên kevnar date biderxistin. Herwehajî ezmonkirina hestîyan û verguhertinên li ser wan de ji lawazîyê û yanjî pêçdanê rê pê dide bidan, ku Merov wan nexweşîyan dikare bide binasîn, yên wan mirin dane bikirin. Biserdejî ve lidûxwehiştinên Merovan ji mayîya gemaran di cihê nişînîya wan de remanekê li ser suwarkirina xurakê wan Merovan de didin bidan.

- pêrejî ezmonkirina xwîna Merovê niha û suwarkirina "Groupes sanguins = Blutgruppen" -guruhênxwînê- dikare nêzîkbûna yanjî dûrbûna regezî di navbera komên Merovên kevnar de bide biwênekirin[1].

Wisa zanistîya mêjûwê bi zanistîyeke sar ve nayête biderkevtin; lêbelê ew her û her di livandinê de tête bidîtin. Şêweyên zanistî pê rê didin bidan, ku ew bi hûrbûn nasîna mêjê û firehkirina asoyî wê ve ji bona sînorekî dûr bide bikirin.

[1]Ji xwe re li nivîsta: Jean Bernard: "Le sang et l'histoire" -Bi zimanê Firensî ve: "Xwîn û Mêjû"-, Paris 1983 de bidin bitemaşekirin. Ismet Şerîf Wanlî

## 12. Kanîyên Bibliyografîyên bêtirkirî

Ez ji bona ser wan kanîyên hatî de li ser lêgerandinê de li ser têgihiştina mêjûwê, felsefa wê û pêşvekevtina wê de li Ewropa de van kanîyên tên didim bivekirin. -Ji wan jî yên ku ew bi hêstoryografîya Rojhilat ve têtin bigirêdan-:


- L. Allegra + A. Torres: "La Nascita della Storia Sociale in Francia" Torino 1977 de. -Bi zimanê Italî ve: "Zayîna Mêjûwa Civakî di Fimsa de".
- J. M. André + A.Hus: "L'Histoire á Rome", Paris 1974. -Bi zimanê Firensî ve: "Mêjû di Roma de".
- H. E. Barnes: "A History of Historical Writings", New York 1963. -Bi zimanê Ingilîzî ve: "Mêjûwa Nivîsandina Mêjûwê".
- G. Barreclough: " Tendances actuelles de l'histoire", Paris 1920. Bi zimanê Firensî ve : "Berên Niha di Mêjûwê de". Ew wergerandin raportekî ingilîzî ye, yê ku ew der sala 1970 de ji bona rêxistina UNESCO hatîye bipêşkeşkirin-.
- Ch. -O. Carbonell: L'historiographie", Paris 1981. -Nivîsteke biçûkî başe ji zincîra "Que sais-je?-.
- p. Chaunu: "L'histoire Science Sociale", Paris 1964. -Mêjûwa Zanistîyên Civakî-

- p. Chaunu: " La mémoire ét le sacré", Paris 1978. -" Bîrwerî û Tiştên Perest"-.
- J. G. Février: Histoire de l'écriture", Paris 1959. -"Mêjûwa Nivîsandinê"-.
- E. Fuetter: "Geschichte der neueren Historiographie", 1911. "Mêjûwa histografîya taze"-.
- F. Gabriele: Historiens arabes des Craisades", Paris1978. -Bi zimanê Firensî ve, yê ku ew ji Italî hatîye biwergerandin: "Mêjûvanên Ereb li ser Cengên Xaçperestan de"-.
- Ch. Gardener: "Chinese Traditional Historiography", Harvcuel 1961. -Bi zimanê Ingilîzî ve "Hêstografîya Çînîyî Xweparastî"-.
- A. Gérdener: la Révolution française: mythes et interprétations", Paris 1970. -Bi zimanê Firensî ve "Şureşa Firensî: Bawermendî û Têgihiştin"-.
- G. P. Goock: "History and Historians in the Nineteenth Century", Boston 1959. -Bi zimanê Ingilîzî ve, "Mêjû û Mêjûvan di Sedsalê Nozdehan de"-.
- G. Iggers: "New Directions in European Historiography", Wesleyan, up, 1975. -Bi zimanê Ingilizî ve, "Berên Nuh di Hêstoryografîya Ewropî de"-.
- B. Lacroix: "L'Histoire an Moyen Age", Montréal 1971. -Bi zimanê Firensî ve, "Mêjû di Sedsalên Navînî de"-.

- J. Le Goff: "Histoire et mémiore", Paris 1984. - Bi zimanê Firensî ve, "Mêjû û Bîrîtî"-.

- J. Le Goff: + R. Charier + J. Revel: "La Nouvelle Histoire", Paris 1978. -Bi zimanê Firensî, Mêjuwa Nuh"-.

- G. Thuillier + J. Tulard: "Les Ecoles historiques", Paris 1990. -Bi zimanê Firensî ve, "Dubistanên Mêjûyî"-.

- H. Van Effenterre: "L'Histoire en Gréce", Paris 1962. -Bi zimanê Firensî ve, "Mêjû di Yunanê de"-.

- K. Wenke: "Vom Rebstock zum Alphabet" 1915. -Bi zimanê Elmanî ve, "Ji Neqişkirinê tanî Nivîsandinê"-.


---


Wergerandina vê nivîsta hanê di roja pêncşema 31 tîrmeha sala 1995 de, demjimara 9 de, li bajarê Berlin de hatîye bidawîkirin.

Ez wergerandina vê nivîstê ji bona Dostê xweyî hêjayî nedar Mele Ehmedê Palo didim bidiyarîkirin; jiber ku ew yekek ji gewretirîn Xweşxwevanên vê serdema me bû; belam ew di nava Miletekî bedbextî nezan de bi bedbextî û nedarî ve dihate bijîyandin. Mîna ku ji min re hatîye bigotin, ku wî panzdeh destnivîstên pir bi nerx ve li dû xwe de dane bihiştin; belam ji wan bes û bi tenha ve yek tanî niha hatîye biçapkirin.

**Dr. M. S. Cuma**

Jimara spardinê (100) li sala 1999

Çap: Çapxana Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan



- Di dawîya gulana sala 1937 de li gundê kêstek de di herema Cezîrê de ez hatime bizayîn.
- Di dibustanên bajarê qamişlo de ji sala 1946 tanî sala 1956 de min date bixwendin.
- Di dibustanên bajarê şamê de ji sal 1956 tanî sala 1959 de min date bixwendin.
- Di sala 1959 de min dest bi xwendina xweyî zanistgehê ve li zanistgeha şamê de berê felsefê de date bikirin.
- Ji sersala 1960 de ez ji bona Elmanya hatim biçûyin Piştî xwendina zimanê Elmanî li bajarê Koxil de ez di buhara sala 1960 de ji bona bajarê Monîx hatim biçûyîn û li wir de di zanistgeha wê de min zanistîyên dewletê tanî sala 1964 de date bixwendin.
- Di sala 1963 de ez ji bona Elmanya Demokrasî hatim biçûyîn û li wir de li bajarê Berlin de di Kolêca Abûrî de zanistîya abûrî û siyasîmin date bixwendin, der sala 1967 de min Diplom di zanistîya abûrîya siyasî de date biwergirtin û der sala 1972 de têde jî min Nama Doktora di zanistîya mêjûya abûrîya siyasî de date biwergirtin.
- Ji sala 1975 tanî sala 1992 de min di zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa abûrî siyasî de didate bikarkirin.

**Dr. M.S.Cuma**